



KULÎLKA HERÎ BEDEW A CÎHANÊ KU SEROKATIYA ME EV YEKANE HEBÛNA ZINDÎ YA DI HUCREYA WÎ DE ŞÎN BÛYÎ, DILÊ XWE TEVLÎ KIRIYE Û JI ME JINAN RE ŞANDIYE

# DÎROKA TEVGERA AZADIYA JINÊ

***VEGOTINA DERSÊ***

**Şehîd Delal Amed**

***WÊŞANÊN AKADEMIYA JINA AZAD A Ş. ZEYNEP KINACI***

**DÎROKA ÇAPÊ: 2019**

**CIHÊ ÇAPÊ: ÇAPXANEYA AZADÎ**

# NAVEROK

PÊŞGOTIN……………………………………………………………………………11

DESTPÊK…………………………………………………………………………..15

BEŞA YEKEMÎN

DESTPÊKA AVABÛNA TEVGERA AZADIYA JIN A KURDISTANÊ……17

Weke Jın Dîroka Xwe Rast Gırtına Dest…………………………………………..17

Dı Nav Cıvaka Kurdıstanê De Rastıya Jınê……………………………………..28

Bı Derketına PKK’ê Re Pêşketına Têkoşîna Azadıya Jınê…………………….37

Dı Rıya Bırêxıstınbûna Hêza Jın De Gavên Destpêke………………………..59

Damezrandına Yekemîn Rêxıstına Jın YJWK…………………………………...84

BEŞA DUYEMÎN

PÊVAJOYA ARTÊŞBÛNÊ Û PÊŞKETINA ÎDEOLOJIYA RIZGARIYA JINÊ…..95

Dı Serhıldanan De Pêşengıya Jın……………………………………………95

Pêşketınên Sala 1992'yê Û Dı Şerê Başûr De Sekna Jın A Berxwedêr……………………………………………………………………...111

Artêşbûna Jın û Lı Hemberî Wê Ferasetên Tesfıyekar...............125

Mudaxeleya Hêzên NATO'yê Lı Ser Kurdıstanê……………………..145

Damezrandına Yekîtıya Azadıya Jınên Kurdıstanê (YAJK)…………153

Komploya 6'ê Gulanê Û Bı Terzê Fedaî Xwedî Derketına Lı Rêber Apo……………………………………………………………………………….164

Pêşketınên Sala 1997'ê Û Teorıya Qutbûnê…………………………...171

Pêşketınên Sala 1998'ê Û Bîrdozıya Azadıya Jınê…………………..180

BEŞA SÊYEMÎN

PÊVAJOYA KOMPLOYA NAVNETEWÎ Û GUHERTINA STRATEJÎK.205

Jı Rêxıstına YAJK'ê Derbasbûna Qonaxa Partîbûnê..........................220

Dı Pêvajoya Partîbûnê De Nakokıyên Navxweyî Û Xwedîderketına Lı Xeta Azadıyê ……………………………………………….......................245

Lı Hemberî Êrîşên Komploger Sekna Jın........................................255

Lı Ser Bıngeha Israra Dı Xeta Azadıyê De Cıvînên Gırîng Ên Jın..........262

Pêşketınên Jı Sala 2007’ê Şûn De……………………………………………...300

Kongreya PAJK’ê Ya Nehemîn ......................................................306

Di Pêvajoya Şerê Gel ê Şoreşgerî De Sekin û Tevlîbûna Jin ...............307

Komkujiya Parîsê Êrîşa Li Ser Dîroka Azadiya Jinê Ye…………………….311

Encam…………………………………………………………………………………….317

## PÊŞGOTIN

Weke Tevgera Azadiya Jinê em li welatekê dijîn ku îro jiyan di bin nîrê zilmê de dinale, jin û civak giştî ji bo azadiyê, ji bo wekheviyê bi awayek bêhempa li ber xwe didin, têkoşîneke mezin raber dikin, di vê oxirê de rojane berdêlên giranbuha didin, wisa mohra xwe li serkeftinên mezin didin. Bi gotina Rêber APO mîna bîra bi derziyê bê kolandin kêlî bi kêlî hewldaneke jinûve avakirina jiyanê mijara axaftinê ye û di vê xebatê de jin pêşeng e. Lewre rastiya îro li Kurdistanê tê jiyîn, bi xwe re dîrokek nû diafirîne, bi taybetî bingeha dîroka azadiya jinê datîne.

Rêber APO dibêje, "Dîroka kolebûna jinê nehatiye nivîsîn, dîroka azadiya jinê jî li benda nivîsandinê ye." Em ji dîroka mirovahiyê ya demdirêj hatî jiyîn dizanin ku jinê di civakê de her tim rola avakirin, afirandin û pêşxistinê lîstiye, bi ked û bîrberiya xwe pêşengî kiriye, jiyana mirovahiyê dewlemend, rengîn û bedew kiriye. Encex li hemberî vê kedkarî û afirîneriya wê, sîstema desthilatdariya zilam bi zîhniyeta êrîş û çewisandinê tim hewl daye vê

heqîqeta jinê binpê bike, nehêle jin di civakê de bibe hêmana sereke. Ji bo vê jinê qedr û qîmeta ku ji vê ked û hewldana wê ya birûmet re bibe bersiv nedîtiye, tim weke hebûneke kêm, berdest hatiye nasandin, rastî şikandinên mezin hatiye, ji cewherê xwe hatiye dûrxistin. Ev feraset û hişmendî bi zilm û xapandineke ewqas mezin, kûr û zirav hatiye meşandin ku êdî jin bi xwe jî bawer bike ev cewher û çarenûsa wê ye, jê pê ve riyeke derketinê tune ye. Ango jin hebûneke kêm, şikestî, berdestê zilam e!... Esas ev berevajîkirina heqîqeta jiyanê bû, berevajîkirina heqîqeta civaka mirovahiyê bû. Her wisa dîroka hatî nivîsandin a qaşo destanên jêhatin, serjêkirin, fetihkirin, serkeftinên desthilatdariya zilam bûn, ku di wir de cihê jinê tune bû. Li hemberî vê dîroka hatî berevajîkirin, rastiya di xeta PAJK´ê de tê ziman hewldana sererastkirina van hemû çewtkirin û berevajîkirinên jiyanê yên bi hişmendiya zilamê serdest hatine ferzkirinin, xwedî derketina li mîrasa afirînerî û berxwedana jinê ye, mafê Dayika Xwedawend radestkirine.

Elbet weke Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê bi derketina Rêber APO re dîrokeke me ya ku em êdî bi şanazî dikarin behsa jinê û nirxên civaka komînal bikin, bi jinbûna xwe serbilind bin, bi vê rûmet û hêzê li hemberî hemû bendên koletiyê serî rakin, bi zanista jina azad ber bi pêşerojê ve bimeşin çêbûye. Ev di kesayeta jinên xwediyê nasnameya PAJK’ê de nûvejîna tevahî jinan e. Îro bi vê têkoşîn û berxwedana jinan a xwe dispêre paradîgmaya Civaka Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jinan gav bi gav riya serdema azadiya jinê vedibe, di vê riyê de lehengî û pêşengiya jinê eşkere dibe, jin bi hêz û îradeya xwe dihese, bi hizra xwebûnê li tevahî nirxên Dayika Xwedawend xwedî derdikeve, wana wekî nirxên herî pîroz ên jinan û mirovahiyê di roja me ya îro de zindî dike, nûjen dike, li ser vê bingehê hîmê dîroka azadiya jinê datîne. Rêheval Delal jî di vê vegotina xwe ya dîroka jinê de bi taybetî balê dikêşe ser xwedî derketina li vê mîrasa jinê ya avakirina civakê, heta xwedî derketina li vê mîrasê ji bo hemû jinên

têkoşer wekî erkekê destnîşan dike.

Bêguman îdeala afirandina jiyaneke nû bê berdêl pêkan nîn e. Îro bi hezaran jinên milîtan ên bi nasnameya PAJK'ê têkoşîn dikin li ser vê îdealê dimeşin, ked didin, gav bi gav riya vê jiyana nû ango jiyana azad vedikin. Rêheval Delal Amed jî weke fermandar û pêşenga tevahî jinên têkoşer û azadîxwaz di eniya herî pêş de kêlî bi kêlî tevahî jiyan û hebûna xwe ji bo pêkanîna vê îdeala bilind birêxistin kir, bi azwerî ked da, di encamê de gihîşt mertebe Bêmiriniyê.

Ev berhema di destê we de ji vegotinên dersa Dîroka Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê ku rêheval Delal di Dewreya Ş. Devrîm Amed a Akademiya Zeynep Kinaci de (zivistana di navbera salên 2016-2017´ê de) dayî, pêk tê. Rêheval Delal jî di beşeke girîng û demek dirêj a vê meşa dîrokî de cih girt, bi coş û heyecanek mezin ji Amedê heya Dêrsimê, ji Herêmên Parastina Medya heya Botanê gav bi gav meşiya, di her gaveke xwe de bêhna azadiyê kişand, bi biryardariya serkeftinê di gelek kêliyên zor û dijwar ên vê têkoşînê re derbas bû, ked da, berpirsiyariyên giran rakir, xwîn û xwêdan rijand, herî dawî bi sekna xwe ya leheng û fedaî bi xeta azadiya jinê re bû yek. Lewre ji nêrîn û nirxandinên kesayeta jineke wisa pêşeng û pîroz naskirina dîroka me ya Tevgera Azadiya Jinê ji bo her rêhevaleke/î di şopdariya van şehîdên mezin ên têkoşîna azadiyê de dimeşe, bi biryardariya serkeftinê dixwaze xwe jinûve ava bike, bibe xwediyê jiyaneke watedar derfetek mezin e, heman demê bextewarî û şanaziyek bilind e.

Rêheval Delal di nav nêrîn û nirxandinên xwe yên dersê de bi girîngî balê dikêşe ser xala vegera li cewherê û dibêje, "*Bi heqîqetê re yekbûn xwe gihandina cewherê xwe ye, cewherê xwe naskirin e.*" Elbet bi cewherê xwe jiyan kirin ji bo mirov cudahiyek e. Nexasim di vê serdema ku taybet jin, her wisa bi giştî civak ji her alî ve di bin bombebarana fikrî û êrîşên sîstematîk ên modernîteya kapîtalîst de ye, lêgerîna heqîqetê û ji bo vê berê xwe

dayîna têkoşînê sekneke birûmet e. Lewre dema em dîrokê digirin dest pêwîste em li ser bingeha vê rênîşandanê nêzîk bibin, xwe ji nêrandina desthilatdariya zilam a li ser jin û civakê xilas bikin, hîn zêde cewherê wê fêm bikin ku jiyan û têkoşîna xwe ya roja îro watedar bikin, li hebûna xwe xweyî derkevin.

Rêheval Delal di nav vegotina xwe de cardin wekî xaleke girîng balê dikêşe ser rastiya Tevgera me ya Azadiyê û dibêje, “*Erê em tevgereke Kurdistanî ne, lê belê em tenê di Kurdistanê de pêşengiyê nakin. Li Rojhilata Navîn erka me ya pêşengiyê heye, her wiha hedefeke me heye ku em êdî gerdûnî bibin, bikaribin tevahî cîhanê temsîl bikin… Li gorî vê divê em hem ji hêviyên wan hawirdorên çêdibin re bibin bersiv, hem jî divê em li mîrasa heyî xweyî derkevin.*” Wekî ji vê perspektîfê jî tê fêmkirin, îro Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê ne tenê ji bo jinên Kurd, ji bo tevahî jinên cîhanê têkoşîneke dîrokî û watedar dimeşîne, bi vê armancê bûye tevgereke cîhanî ku hêviya azadiyê dide hemû jinan, hemû gelên azadîxwaz. Di vê çarçoveyê de em weke Komîteya Perwerdê ya PAJK´ê, vê berhema dîrokî û bi nirx a ji nêrîn û nirxandinên rêheval û fermandara me ya pêşeng Delal Amed pêk tê, di riya naskirina dîroka Tevgera Azadiya Jinê de, li ser bingeha Îdeolojiya Rizgariya Jinê kûrbûna di xeta Azîmeyan, Bêrîvanan, Bêrîtanan, Zîlanan, Hîrayan, Şîlanan, Şîrînan, Nalînan, Şevînan, Hêlînan û Azêyan de wekî materyaleke perwerdê girtina dest û gihandina destê hemû şopdarên wan ji bo xwe erk dizanin.

Bi biryardariya rojên ronî yên bi xewn û xeyalên Nemiran bên tacîdarkirin…

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**

**03.04.2019**

**KOMÎTEYA PERWERDÊ YA PAJK**

## DESTPÊK

Di serî de wekî rêbaz, ev ders wê di sê beşan de bê dayîn.

**Beşa Yekemîn:** Grûba yekemîn ji dema PKK ava dibe ango ji salên 1970'yan heya salên 1990'î ye, ku ev pêvajoyeke em bigirin dest. Di vê qonaxê de Tevgera me ya Azadiya Jinê gav bi gav şekil digire, hîmê wê tê danîn.

**Beşa Duyemîn:** Ji salên 1990'an heya pêvajoya Komploya Navneteweyî –ku pêvajoya sala 1999'ê jî tê de ye- ya li ser Rêber APO bînin. Ev pêvajoya artêşbûna Tevgera me ya Azadiya Jinê digire nav xwe.

**Beşa Sêyemîn:** Ji sala 1999'ê ango ji pêvajoya Komploya Navneteweyî û pêvajoya partîbûna Tevgera Azadiya Jinê heya roja me ya îro bînin. Ev bi xwe weke Tevger ji bo me pêvajoya partîbûnê îfade dike. Em ê wisa di sê beşan de dîroka me ya Tevgera Azadiya Jinê bigirin dest.

Ev mijar dîrok e û pêwîste em zêdetir vekin. Her wiha em ê heya salên 1990'î bi hev re beş bi beş tevahî dîroka Tevgera me ya Azadiya Jinê binirxînin û nîqaş bikin. Em ê ji sala 1990'an û şûn de sal bi sal bigirin dest. Ji ber pêvajoyên ku mohra xwe li têkoşîna me ya azadiyê dane, pêşketinên girîng ên wekî artêşbûn, avabûna YAJK'ê (Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê), Kongreya Yekemîn a Jin hene. Dîsa Serokatî di wê pêvajoyê de arguman û prensîbên Bîrdoziya Azadiya Jinê, Teoriya Qutbûnê zelal dike. Em ê vegotina wan pêvajoyan bi komî bikin.

Beşa sêyemîn jî em dikarin bi hev re nîqaş bikin û bînin heya roja me ya îro. Bi taybetî em dixwazin di pêvajoya sêyemîn de

pirsgirêkên xwe yên partîbûnê, kadrobûnê nîqaş bikin. Yanî bi dîroka me ve girêdayî kîjan meyl derketiye pêş û mohra xwe li salê ango li pêvajoyê daye? Dibe ku dahûrandinên me hebin û di dahûrandinan de em vana dadixin kesayeta xwe, lê di encamê de vana pirsgirêkên me yên giştî ne. Lewma pêwîste em nîqaş bikin ku wekî giştî Tevgera Jinê pirsgirêkên me yên kadrobûnê, partîbûnê çi ne? Em dixwazin vê beşê bi vî awayî bigirin dest. Lê beriya em derbasî vê beşê bibin, ji bo destpêkê divê em çawa nêzîkî dîrokê bibin, em dixwazin hinekî li ser vê rawestin.

Wekî destpêk ji bo Kurdistanê mirov dikare bi awayek kurt analîza civakê bike. Ji ber di dersa Dîroka Kurdistanê de heval li ser kesayetên jin û rola jin a di nav civakê de sekinîn, em wana dubare nakin. Encex ji vê wêdetir, divê em civaka xwe tehlîl bikin. Eger em civaka xwe tehlîl nekin em nikarin fêm jî bikin. Çima têkoşîna azadiya jinê hat pêşxistin? Ji bo em pirsgirêkê fêm bikin bi awayek kurt em ê li ser vê mijarê bisekinin. Bi giştî pêşnûmeya me bi vî awayî ye.

# BEŞA YEKEMÎN

## DESTPÊKA AVABÛNA TEVGERA AZADIYA JIN A KURDISTANÊ

### Weke Jın Dîroka Xwe Rast Gırtına Dest

Destpêkê pêwîste em dîroka xwe bi vî awayî bigirin dest: Serokatî dibêje, “Jiyana Sakîne dîroka têkoşîna azadiya jinê ye.” Ji bo wê jî pêwîste em vê dersê diyarî hevala Sara (Sakîne Cansiz) bikin û wê bibîr bînin. Gelek hevalan pirtûka wê ya bi navê “***HER ŞER BÛ JIYANA MIN***” xwendine. Hevala Sara, ji pêvajoya yekemîn heya şehadeta xwe her tim bi Tevgerê re meşiyaye. Ji bo wê Serokatî roleke wisa dide û dibêje, “Têkoşîna Sakîne têkoşîna tevgera azadiya jinê ye”. Pêwîste em jî bi vî awayî bigirin dest. Belkî mafê wê yê ku bê dayîn me tam nedaye, em layiq nebûne, lê bi zanîna dîrokê re herî hindik em dikarin vê telafî bikin, xwe bigihînin zanebûna wê têkoşînê. Hevala Sakîne Karakoçan jî dibêje, “Ev maratonek e, hinek tên û alê dewr digirin”. Roja îro jî weke kesên ev al dewr girtine pêwîste em vê têkoşînê pêşde bibin, bigihînin serkeftinê. Eger nêzîkatî bi vî awayî be, wê layiqbûn

çêbibe. Ji bo wê pêwîste em vê dersê wisa bigirin dest.

Dibe ku em dem bi dem taybet li ser kesayeta hevala Sara bisekinin, lê bes di qadên têkoşînê de tevlîbûn bi çi awayî bû, rola hevala Sara çi bû, em ê li ser vana jî bisekinin. Ev ji bo me girîng e.

Di serî de nêzîkbûna me ya ji dîrokê re wê çi be? Serokatî wisa digot: “Heqîqet li cihê ku hatiye windakirin, wê bê dîtin.” Yanî heqîqet li ku derê hatibe windakirin, lazime mirov li wir bigere û li wir bibîne. Ew jî di ku derê de ye? Di kokê de ye. Ji bo wê jî Serokatî gelek caran behsa *vegera li cewher* dike. Nexwe yekbûna bi heqîqetê re girîng e, ji ber ku têkoşîna me têkoşîna heqîqetê ye, têkoşîna xwe gihandina heqîqetê ye. Bi heqîqetê re yekbûn xwe gihandina cewherê xwe ye, cewherê xwe naskirin e, her wiha xwe bi heqîqetê re kirina yek e. Ji bo wê jî bêguman dema em li rastiya jinê bigerin, pêwîste em di kokê de lê bigerin. Em li ku derê li koka dîroka jinê bigerin? Kok di civaka xwezayî de bû, li wir şîn bû û heya roja me ya îro hat. Her çendî jinê di wê demê de nasname û hebûna xwe winda kiribe, tiştên cuda li ser hatibin zêdekirin, bi zîhniyeteke cuda xwe gihandibe heya roja îro, bi her mudaxeleyê re rû bi rû mabe jî, lê bes madem em îro bi navê azadiyê derketine rê, pêwîste em vê jî wekî nirxekê bibînin.

Der barê feraseta dîrokê de Serokatî ji bo kesên dîrok nivîsîne got: “Wana dîrok yekalî nivîsîne. Ji ber ku wana bi zîhniyeta zilamtiyê nivîsîne.” Kengî zilam serwer bû û bi taybetî sîstema Modernîteya Kapîtalîst dîrokê bi vî awayî digire dest, yanî piştî zilam serwer bû, wana dîrok nivîsandin û jixwe di wê dîrokê de jî jin nîn e. Jin di wê pergalê de hatiye windakirin û zilam li gorî xwe dîrok nivîsandiye, berevajî kiriye. Serokatî der barê dîrokê de nêrandinek çawa bi me re pêş xist? Serokatî got: “Dîrok di du aliyan de pêş ketiye. Desthilatdarê ku xwe bi zîhniyeta zilamtiyê pêş dixe êdî desthilatdariya xwe bisazî dike. Erê ew jî dîrokeke xwe heye, ku em ji vê dîrokê re dibêjin **dîroka şaristaniyê**; lê bes li beramberî wê, aliyekî din ê li ber xwe dane hene. Serokatî vana wekî

beşeke civakê, wekî “**hêmanên demokratîk**” bi nav kir û dîrokeke vana ya berxwedanê jî heye.

Yekemîn beşa demokratîk, jin bû. Çima? Ji ber di nêrandinê de hat dîtin ku desthilatdariyê cara yekê li ser nakokiya zayendî xwe daye rûniştin, li ser xistina jinê desthilatdariya xwe ava kir. Ji bo wê ev nakokiyeke herî kevn e, heta nakokiya destpêkê ye. Ji bo wê êdî nêrandineke me li ser dîrokê heye. Lewma dema em dîroka xwe jî bigirin dest, divê em li gorî vê bigirin dest. Em nikarin dîrokê tenê ji xwe ve bidin destpêkirin. Roja îro ji ber em wekî tevgereke azadiya jinê derketine, me ji salên 1970’yî heya îro têkoşîn kiriye em bibêjin ku her tişt em in, her tiştî bi me destpê kiriye, ev dibe înkarkirin û rast jî nabe. Nêzîkatiyeke wisa dibe înkarkirin, dibe nedîtina paşerojê, nedîtina kokê. Ji bo wê pêwîste em bi vî şêwazî nêzîk nebin. Mîrasek heye û em îro li ser wê mîrasê têkoşîna xwe mezin dikin.

Elbet xwedî derketina li vê mîrasê bi vî awayî nabe; tu bixwazî tiştê heyî wekî berê pêk bînî, ev nabe. Çima? Ji ber ku dem tê guhertin, tiştek wekî berê namîne, her tişt hatiye guhertin. Ji bo wê lazime ew jî xwe nûjen bike. Pêwîste em dîroka Tevgera me ya Azadiya Jinê bi vî awayî bigirin dest.

Yek jî, ev mijar girîngiyeke xwe ya bi vî awayî heye; pergala Moderníteya Kapîtalîst bi nêrîna “duh duh bû, îro îro ye, wana jî ji bîr bike, deyne aliyekî, li kêliyê (an’a) binêre û li pêşerojê binêre” felsefeyekê pêş dixe. Hinek jî vê felsefeyê bi gotina “heya sibe Xwedê kerîm e” nêzîk dibin û sibe jî wê çi derkeve pêşiya mirov ne diyar e, lê gava tu jiyan dikî, divê tu baş jiyan bikî. Ev felsefeyeke li ser kêliyê ye. Esas ev tê wateya ku tu kêliyê bijî û ew jî tê wateya înkarkirinê. Heman demê ev feraseteke qederperest e. Em nikarin bi vî awayî nêzîk bibin. Nêzîkatiyeke wisa wê bê wateya ku em ê dîroka xwe înkar bikin.

Di paşerojê de xwedî derketina li vê mîrasê pir tune ye. Ji bo wê erkeke me ya wisa jî heye ku, em li vê mîrasê xweyî derkevin.

Erê hatiye jiyîn, ji aliyê desthilatdaran ve hatiye veşartin û nehatiye ronîkirin. Bi vî awayî erka me ya yekemîn ew e ku, tiştê hatiye veşartin em êdî ronî bikin, zelal bikin û di vî alî de zanebûnê pêş bixin. Rast e mîras heta îro hatiye, lê bes xwedî derketinek jî nîn e. Têkoşînên bi navê azadiya jinê derketine, elbet herî hindik xwestine nasnameya xwe bi vê mîrasê re çêbikin. Hewldanên bi vî rengî hene û roja îro wekî Tevgera Azadiya Jinê esas roleke me ya bi vî rengî derket holê. Em îro pêşengiyê dikin. Erê em tevgereke Kurdistanî ne, lê belê em tenê di Kurdistanê de pêşengiyê nakin. Li Rojhilata Navîn erka me ya pêşengiyê heye, her wiha hedefeke me heye ku em êdî gerdûnî bibin, bikaribin tevahî cîhanê temsîl bikin. Bala gelek tevgerên din ên femînîstan dikişîne. Me herî zêde balkêşiya wê di ku derê dît? Mînaka wê jî, di şehadeta hevala Sara û hevalên pê re (şehîd Fîdan Doğan û Leyla Şaylemez) de derket holê ku, hemû dunya lê xwedî derket. Çima? Wana dîtin ku li wir dîrokek bû. Hevala Sara bi xwe dîrokek bû, ji bo wê xwe tê de dîtin û di bûyera şehadeta wana de ji aliyê tevahî cîhanê ve lêxweyîderketineke cidî çêbû.

Her wisa têkoşîna me bi taybetî di Kobanê de gihîşt astekê, di Şengalê de bala hemû dunyayê kişand. Bi taybetî têkoşîna ku îro li hemberî DAÎŞ'ê tê dayîn girîng e. Çima? Ji ber ku her kes DAÎŞ'ê nas dike, dunyayê wehşeta wana tê zanîn û di roja me ya îro de kî li hemberî wana li ber xwe dide, ev rastî hat dîtin. Esas di wir de rizgariya xwe dîtin. Her çiqasî çirûskek biçûk be jî, ronahiyek dîtin û baldarî nîşan dan. Li gorî vê divê em hem ji hêviyên wan hawirdorên çêdibin re bibin bersiv, hem jî divê em li mîrasa heyî xweyî derkevin. Ev girîng e.

Dîrok bi bûyeran nayê destgirtin. Di jiyana mirovan de bûyerên derketine holê bêguman girîng in û di dema xwe de bandor kirine. Pêwîste mirov di wextê de bigire dest, lê pê ve aliqî nemîne. Û bûyer tenê nikare dîrokê îfade bike, ji ber ku teng dimîne. Bûyer bêwate nîn e, tiştê ku îfade dike heye, lê çarçoveya wê teng e. Em nikarin hemû dîrokê tenê bi bûyerekê bînin ziman.

Carina hizrê me yê teng dihêle em dîrokê bi bûyeran re bigirin dest, ku gelek caran bûyerên biêş di dilê mirov de bi cih dibin. Elbet dîrok êşên xwe jî hene, kêfxweşiyên xwe jî hene, lewre mirov nikare vana bêy hevdû bigire dest. Lê pir zêde bi êşan ve aliqî mayîn rast nabe. Heval dema dîroka azadiya jinê didin, dibe wekî mîsala *dîwarê giriyê* yê Filistîniyan; em nikarin dîroka xwe bi vî rengî bigirin dest, yanî êşên xwe bînin ziman û vê carê em li ser wê bigirîn, derdê xwe bi hev re parve bikin û nêzîkatiyên hwd. têrê nake. Ev nêzîkatiyek pir teng e.

Bûyer çi ye? Tiştek çêdibe, sedema çêbûna wê, qonaxa çêbûna wê û piştre encam tê. Hele hele ku ev bûyer derbas bûbe, em li encama wê dinêrin û dinirxînin. Li gorî encamê em nikarin hinek tiştan binirxînin. Rastiya xwe çi ye? Çi çawa hat jiyankirin? Serokatî ji bo heqîqetê dinirxand û digot: “Têkoşîn ku bi ser neketibe jî, ev nayê wateya ku ew ne heqîqet e.” Em bibêjin ku, di encamê de kê qezenc kiribe ew serkeftî ye, ew heqîqet e, em nikarin bi vî awayî bigirin dest. Dibe ku binkeftin jî tê de hebe, lê di encamê de ev rastiyeke civakî ye û divê em wî heqî bidin. Pêwîste em dîrokê jî wisa bigirin dest. Ev girîng e.

Hinek nêrandinên berê yên hebûn Serokatî ew rexne dikirin. Bi taybetî dîrok wekî xeteke duz girtina dest. Nimûne, dema civak îfade dikirin, digotin *civaka komînal a paşketî, dûvre civaka koledar, piştre civaka feodal, piştre civaka kapîtalîst*, her wiha ji Sosyalîzma Pêkhatî re jî digotin sosyalîzm wê biçe komunîzmê. Li ser van bingehan adeta dîrok wekî xeteke duz e û piştî wê mecbûre ev merhele bê jiyîn. Ev jî guhertineke tekamûlî (evrimsel) ye. Bi nêrîna wana wekî ku tu tiştekê nekî jî hatiye nivîsandin û diyarkirin, jixwe piştî sosyalîzmê wê komunîzm were. Lê vaye pêk nehat, nebû. Çima? Sosyalîzma Pêkhatî hilweşiya. Gelek sedemên wê hebin jî, eşkere bû ku dîrok wisa pêş nakeve. Bi taybetî di mijara dîroka jinê de pir girînge mirov bi vî şêwazî lê nenêre. Yek dibêje dîrok wekî qederê ye, tê qebûl bikî û wisa lê binêrî. Ev jî te bêçare dihêle. Êdî di van sedeman de tê ji bo çi têkoşîn bidî? Wekî

bibêje, “jixwe jinê nasnameya xwe winda kir, bû kole, êdî ji vê şûndetir her wê wisa dom bike” nêzîkatiyeke qederperest tîne. Ya duyemîn jî, guhertinên tekamûlî nahêlin guhertinên şoreşî çêbibin. Di rewşek wisa de tu nikarî biryara têkoşînê bidî. Halbûkî guhertin tenê di warê tekamûlê de nîn e. Tekamûl jî rola xwe heye, ji ber di gerdûnê de her tişt di nav guhertinê de ye, lê şoreş pir girîng e. Ji ber ku tu mudaxele dikî.

Hêzên mudaxele dikin, di têkoşînê de hêza wana pir diyarker dibe. Asta wan, aliyê ku çiqas dikarin wê têkoşînê bi ser bixin pir girîng dibe. Ji bo wê lazime em bi vî awayî li dîrokê binêrin. Yek jî, ev feraseta dîrokê wek xeteke pêşketinê ya duz digire dest esas ji bo vê pêş xistine; statuya jinê ya hatî kolekirin, hatî xistin wekî herikîneke xwezayî ya gerdûnê be, xwestine di hafiza jinê de bi cih bikin. Tê gotin ya, *îlkel komunal toplum,* ku em ji vê re dibêjin civaka xwezayî, di hundirê wê de şoreşa neolîtîkê ya pêş ketî heye. Jin di wir de hakim bû, di civakê de desthilatdarî nebû, wekhevî hebû, mirovan azad jiyan dikirin. Jixwe piştî wê jin hat xistin, civak bû kole, hinek jî xwediyê koleyan bûn û civak dimeşandin. Ev feraset di mejiyê jinê de dan rûniştin, dan windakirin, êdî ew nikare vê rastiyê biguhere.

Ji bo jinê tiştê herî zêde girîng, biryara têkoşînê dayîne. Pirsgirêk ne tenê koletiya ku zilam li ser ferz kir û zext kir; tiştê ku jinê bi xwe xwe di mejiyê xwe de ava kiriye heye, esas koletî di wir de kûr e. Jinê ew wekî rastiyekê qebûl kiriye. Jixwe ger em jî wisa nêzîkî dîrokê bibin û wan ferasetan esas bigirin, em ê jî bibêjin *civaka koledar çêbû, jin bin ket, ev êdî qederek e, ev herikîneke dîrokê ye*, ango ev wekî mecbûriyetekê ye. Serokatî jî ew xist nîqaşê û got: “Ma gelo ev mecbûriyetek bû?” Yanî destpêkê civaka xwezayî, civaka neolîtîk dema têrê nekir, ma mecbûr bû ku civaka koledariyê derkeve yan jî pergala koledariyê xwe li ser wê ava bike? Encama ku em dûvre gihîştinê çi bû? Esas ev mecbûrî nebû. Hêzên ku wê demê têkoşîn dikirin ku bi ser biketan, belkî dîrok wisa nemeşiya. Ji bo wê jî divê em dîrokê wekî xeteke

pêşketinê ya duz negirin dest.

Yek jî, dîrok di şikandinên pir dijwar re derbas bûye. Di dersa jineolojiyê de zêdetir li ser tê sekinîn. Di wê mijarê de Serokatî behsa *şikestina yekemîn, duyemîn* kir û got, *“niha dixwazin şikestina sêyemîn pêk bînin, lê em êdî dixwazin wê bizivirînin, em niha mudaxele dikin.”* Divê em van şikestinên çêbûne, bibînin.

Dema em nêzî dîroka xwe dibin, pêwîste em zeman û mekan bidin ber çavan. Bêy zeman û mekan tiştek nayê avakirin. Di dîrokê de tiştê diyarker, mudaxele ango çalakî ye. Di wan kêliyên çalakiyê de zeman û mekan roleke xwe ya diyarker heye. Serokatî ji bo vê digot “hêza sazkar”, ango hêza ava dike. Zeman û mekan roleke xwe ya sereke heye. Ji bo wê mirov bêy zeman û mekan nikare dîrokê bigire dest. Mirov nikare dîrokê ji tiştên li hawirdorê hene qut bigire dest. Eger em bi nêrîna îro bigirin dest, em ê bêjin “way van hevalan çima wisa kirin, çima wisa girtin dest? Çima bi vî awayî bû? Pêwîst bû wisa nekirana. Diviya bû bi vî awayî ba”, lê em roja îro difikirin. Ferq heye, asta zanebûnê cuda ye, asta birêxistinbûnê cuda ye, şert û merc cuda ne û her wiha dîtina vê girîng e.

Serokatî di pêvajoya Komploya Navnetewî de dema ji Sûriyê derketa got, “Wê careke din zeman û mekanek bi vî rengî neyê jiyîn.” Bi rastî jî nehat jiyîn û rewş cuda bû, esareta Serokatiyê çêbû. Digot, “Nirxê roja îro bizanin, baş binirxînin.” Ji bo xebatên jinê jî got: “Xebata min a jinê nîvçe ma, lê ez ê bixwazim berdewam bikim.” Wexta li derveyî welat Rûsya û Ewrûpa bû, di axaftinên xwe yên telefonê de digot, “Xwe cuda nekin, ez amadekarî dikim ji bo we bikişînim.” Yanî ji bo grûbên lêhûrbûnê, komên di perwerdeyê de bûn digot em ê xebatên xwe bidomînin. Lê mekan cuda bû, zeman cuda bû. Eger em faktora zeman û mekan rast binirxînin, an jî em dîrokê bi şaşîtî bigirin dest, vê carê jî ev ê bibe sedem ku em ê bi awayekî ku lêpirsîn bike û darizîne nêzîkî dîroka xwe bibin, hesab bixwazin. Mirov encamê ji dîrokê

derbixe ku şaşîtî di ku derê de ye, rastî di ku derê de bû. Heta mirov wan rastiyan ji xwe re bike bingeh û bizanibe wê şaşîtiyan çawa telafî bike, jê encamê derbixe. Ev nêrandin girîng e. Her wiha di pêşveçûna dîrokê de kî mafdar bû, kî ne mafdar bû? Dîrok bi vê nêrandinê jî girtina dest mirov nagihîne encamek rast. Li şûna em bêjin ev mafdar e, ev ne mafdar e, divê em dîrokê li ser heqîqetê binirxînin. Di vir de nêzîkatiyeke bi exlaq, bi edalet lazim e. Divê em bikaribin bi heqîqetê re şîrove bikin. Bi exlaqî nêzîkbûn girîng e.

Em çima dixwazin vê dîrokê fêr bibin? Ji bo em bikaribin pirsgirêkê derxin zanebûnê ku pirsgirêk çi ye. Nimûne, ji bo jinê pirsgirêka hebûnê heye. Vê pirsgirêkê ji kîjan sedemê bingeha xwe girt? Dijminê jinê kî bû? Çima bi vî awayî bû pirsgirêk û roja îro xwe wisa ferz dike? Divê em bikarin pirsgirêkê pênase bikin. Ev ji bo pirsgirêka Kurd jî wisa ye. Em nikarin yekalî nêzîkî pirsgirêka Kurd jî bibin. Zanebûna dîrokê heman demê ji bo çareseriya pirsgirêkan jî lazim e. Bi qasî îfadekirin û pênasekirina pirsgirêkê, ji bo çareseriyê jî nêrandin û zanebûneke dîrokê pêwîst e. Yan na tê li ser kîjan esasan çareseriyê pêş bixî? Çareserî li ser çi pêş dikeve? Dema em pirsgirêka azadiya jinê digirin dest û pênase dikin, kîjan rastiyê hişt ku bibe pirsgirêk? Eger mirov vê derxîne zanebûnê, wê bizane li beramberî wê çi bike. Esas tu bi vê yekê re dijminê xwe baş nas dikî. Ji bo çareseriyê yek jî hêza ku pê re têkoşîn bikî, tu wî pênase dikî, yan na mirov bêy wê nikare çareseriyê bîne. Li hemberî wê pêwîste mirov hêza xwe nas bike. Nimûne, palpiştên te wê çi bin? Tê xwe bispêrî çi? Tê ji çi hêz bigirî? Divê palpişteke mirov, mîraseke mirov hebe. Divê berxwedaneke ku mirov ji xwe re kiribe hêz hebe. Mirov ji wana nirxê moralê digire.

Dîrok ji bo çareseriyê çima pêwîst e, wê bi xwe re çi bîne? Di çareseriyê de çi diyarker e? Avakirina hêza jin pêwîst e. Hêza tu pêre şer dikî, pêwîste tu wî jî pênase bikî. Pêwîste balpişta te ya têkoşînê ku tu jê moral bigirî, hebe. Nirxê manewî bingehekê çêdike, tecrûbeyekê çêdike. Eger tu rêbazên hatine ceribandin ka

bê çi encam dane nizanibî, tê heman tiştê dubare dubare jiyan bikî, yanî tê ji tune ve destpê bikî. Di roja îro de em nikarin wekî Înanna têkoşîn bikin, lê rêbaza ku wê pêk anî ji me re bûye tecrûbe. Gelek caran ji bo jinê dibêjin esas hîs, pêhesîna xwe xurt e. Di kûantûmê de tiştek wisa jî heye, lê ev hîs û pêhesîn ji tecrûbeyê tê. Jin ji ber bi jiyanê re eleqedar e, tecrûbeyên xwe pir zêde ne. Yek jî, tiştê li ser hatiye ferzkirin pir kûr e. Her di nav şer de ye. Hevala Sara vala vala negot jiyana min her şer bû. Jixwe jiyan ji bo jinê bi vî awayî pênase dibe, cuda pênaseya xwe nîn e. Ji tiştên hatine ceribandin hinekan encam girtine, hinekan encam negirtine. Jixwe mirov bi vana re xwe dike hêz. Ya yekê, tu dijminê xwe nas dikî; ya duyem jî, tu hêza xwe nas dikî, spartekên xwe çêdikî, xwe xurt dikî. Nimûne, niha palpişta me ya esasî birêxistinbûna me ye. Em bê rêxistin tu caran nikarin derkevin saha şer. Feraseta sîstema zilamtiyê ya li ser me tê ferzkirin, ji bo derbaskirina wê birêxistinbûn, moral, hêz pêwîst e. Divê tu bi vana dînamîkên xwe têkoşîna xwe zindî bikî. Tabî mirov vê yekê ji dîroka xwe digire. Ev girîng e.

Ji bo nêzîkatiya ji dîrokê re Serokatî, wekî rêbaz dîrok çawa pênase kir? Rêbazê Serok ji bo dîrokê çi bû? Ya yekê, dîrok bi awayekî yekpare girt dest. A duyem jî, Serokatî behsa zanista wateyê kir û got, “rêbazê min, şîrovekirin e”. Em bi xwe jî bi nîqaşan re esas şîrove dikin. Tabî şîrove, li ser tiştê hatiye jiyîn derxistina zanebûnê û wate dayînê tê kirin. Tenê agahî, zanîn têrê nake, yek jî şîrovekirina ku xwe dispêre zanebûnê pir girîng e. Esas rêbazê Serok, şîrovekirina li ser esasê zanînê ye. Nimûne; şerek heye. Dema mirov wî şerî pênase bike dibêje, ew şer sedema xwe çi bû, çima derket, piştî wê çawa pêk hat, piştre encam çi ye, kî bi ser ket û kî bin ket? Wekî giştî ev şer bûyerek e. Baş e, em van hemû sedeman bizanin ku şer çawa çêbûye; yek jî divê em bikarin wê şîrove bikin, wate bidin wê. Wate dayîn girîng e. Yan na em ê dîrokê tam fêm nekin. Jixwe Rêbertî heqîqet jî bi vê rêbaza xwe ya zanista wateyê rave kir. Hêza wate dayînê dibe

zanebûn, nêzîkatiya din dibe agahî. Serok, heqîqet jî wisa pênase kir. Heqîqet xwe bizanebûnê dike xwedî palpişt, lê hêza şîrovekirinê hêza watedayînê ye. Ev dibe zanebûn, a din dibe agahî. Yek rêbazê Serok ev e.

Serok dibêje, "ez tespîtên Fernand Braudel ên *sosyolojiya demdirêj* ku wek rêbaz wê jî nêzî xwe dibînim, *binyada sosyolojiya avabûnê* û her wiha *sosyolojiya demkurt*.

Du, di warê sosyolojiyê de dema herî zêde di jiyana mirovahiyê de hatî jiyîn, civaka xwezayî ye, emrê mirovahiyê yê herî demdirêj e. Eger dîroka mirovahiyê ji sedî 98'ê xwe civaka xwezayî be, pêwîste em xwe bispêrin wê.

Pêvajoya avakirinê çi ye? Avahî û saziyên ku çêbûne, ka bê çawa ava bûne îfade dike. Ev avabûn bi destê mirov bi xwe çêdibe, bi destê însan tê îcatkirin. Yanî jixweber pêk nayê. Şoreşa Neolîtîkê jî saziyên xwe li gorî pêwîstiyên xwe ava kirine. Ew jî bi destê însan çêbûye. Heman demê pergala desthilatdar jî saziyên xwe ava dike. Tê zanîn ku ew jî bi destê însan hatine avakirin. Tiştê bi destê mirov hatibe avakirin, mirov dikare mudaxele bike û wê biguhere jî. Van sazîbûnên ku di dîrokê de desthilatdariyê ew çêkirine, pêwîste em mudaxele bikin û hêdî hêdî biguherin. Em ji dîrokê jî fêr bûn ku, di serdema Neolîtîkê de jinê dikarîbû saziyên xwe ava bike û ew hêza wê jî hebû. Nexwe em dikarin van sazîbûnên sîstema desthilatdariyê xira bikin.

Serokatî di parêznameyên xwe de behsa *sosyolojiya avabûnê* kir. Ev sosyolojiya demkurt çi ye? Guhertinên di wê demê de çêkirine îfade dike. Ev tê wateya ku dîrok bêbûyer jî nabe. Hinek bûyer hene ku guhertinê çêdikin. Mînak; hikûmeteke ku ava dibe, ew bi xwe sazî ye. Ev di çarçoveya wextê avabûnê (yapısal süre) de ye. Yek jî, ew hikûmet di demek kurt de tê guhertin. Ma ev dikare hemû dîrokê biguhere? Na, lê bandorê li ser dîrokê dike. Serokatî jî herî zêde li ser demê herî kurt ango li ser kêliyê disekine. Serokatî taybet got, "ji bo çêkirina dîrokê kêliyên aloziyê he-

ne.” Ev di dîrokê de tê jiyîn. Kêliyên alozî, qeyranê ji bo çêbûnê zemînek amade ye. Lê kî mudaxeleyê wê kaosê bike û têkoşîna wî bi ser bikeve, ew dikare çêbûneke nû pêk bîne. Ew kêlî dikarin azadiyê pêk bînin. Em ê jî herî zêde sosyolojiya demdirêj, sosyolojiya avabûnê, sosyolojiya demkurt hemûyan ji xwe re esas bigirin. Encex ji bo me ya herî girîng, sosyolojiya azadiyê ango kêlî ye. Ha di vir de hêza mudaxele bike girîng e. Pêwîste em dîrokê giştî wisa bigirin dest. Em ê tenê wekî pergal negirin dest, em ê yekpare nêzîkî dîrokê bibin. Em ê xwe bispêrin agahiyên heyî, lê divê em bikarin hêza watedanê derxin holê, şîrove bikin.

Der barê dîrokê de nêzîkatiyên şaş hene, divê em bi zanebûn nêzîk bibin, tenê bi aliyê bûyeran negirin dest. Bi zanistê nêzîkbûn elbet nêrandineke serdestiya zilam e. Eger li gorî çarçoveya me li jor anî ziman dîrok neyê destgirtin, tenê di bin navê ez bi zanistî nêzîkî dîrokê dibim de nêzîkbûn, esas wê bibe nêzîkatiyek ku mirov dîrokê li gorî zîhniyeta zilam binirxîne. Ev jî dibe alîgiriya zilam. Bi nêrîna jinê li dîrokê meyzandin girîng e.

Niha jî em dîrokê çêdikin, dinivîsin. Dîrok ne tenê pênûs e, em dîrokê çêdikin, em tevlî dîrokê dibin, pêwîste em pozîsyona xwe jî li gorî vê bigirin dest. Tevlîbûna dîrokê ji bo me girîng e. Ev bi xwe meşek e. Serokatî berî vê wekî Tevgera Azadiya Jinê ji bo me got, “Ji bo gihîştina azadiyê hûn hîn di rê de ne” û hinek şaşîtiyên me jî anî ziman. Heta Serok hinek şaş fêmkirinên me jî anî ziman -ku em ê paşê li ser wê bisekinin- û got, “Ez li hinek hevalên jin dinêrim, şaş fêmkirinek wisa heye ku wekî şoreş hatiye kirin li meselê dinêrin.” Bi vî awayî Serok ev nêzîkatî rexne kir û got, “Hûn hîn di rê de ne, lê belê hûn hîn di rê de ne”. Yanî di rê de bûyîn jî girîng e. Ev tê wateya ku, em tevlî vê dîrokê bûne û em ê vê dîrokê çêbikin. Bi vê îdîayê pêvajo gihandina serî girîng e, lê em hîn di rê de ne. Tevlîbûna vê dîrokê jî, bi tevlîbûna jiyanê re dibe. Divê em ji dîrokê bendewariyê nekin, tiştê esas em tevlî dîrokê bibin. Tevlîbûna me wê vê diyar bike; di pêşerojê de wê çi çêbibe, ev rêya em tê de wê dawî biçe ku derê? Lazime em diyar

bikin ku di pêşerojê de em ê çi bikin. Eger beşdarbûneke wisa çêbibe, em ê rast nêzîkî dîroka xwe bibin.

### Dı Nav Cıvaka Kurdıstanê De Rastıya Jınê

Em niha dixwazin di vê beşê de li ser rastiya civaka Kurd bisekinin, ji ber em tevgereke Kurdistanî ne. Eger rastiya civaka me nebe, em nikarin xwe jî tam pênase bikin. Girêdayî mijarê analîzeke kurt ji bo civaka Kurdistanê lazim e.

Bi giştî di Rojhilata Navîn de, bi taybet jî di rastiya Kurdistanê de mijara jinê qadeke herî zêde bi êş e. Mezopotamya axa xwedawendan e. Demek pir dirêj kevneşopiyên (gelenek) xwedawendiyê, civaka xwezayî tê de hatine jiyîn, lê bes piştî wê, şikandina herî dijwar jî di vê qadê de hatiye jiyîn. Bêguman em nikarin bibêjin jina Rojhilata Navîn an jî jina Kurdistanê ji vê bandor nebû. Vê şikestinê herî zêde li ser nasname û hebûna jinê bandor kir. Tabî em nabêjin tenê şikestinê bandor kir, kevneşopiya xwedawendiyê jî pir zêde bandor kir, lê bi yekemîn şikestina cinsî re serdema xwedawendiyê xilas dibe, jin êdî dibe kole. Ev rastî jinê bandor dike.

Her wiha şikestina duyemîn a bi rêya ol hat çêkirin, bi taybetî di Kurdistanê de herî zêde jî bi Îslamiyetê re bandora xwe li ser nasnameya jinê kiriye. Di warê tehlîlkirina civaka xwe de em kêm dimînin û rexmê wê heya roja îro kevneşopiyên berxwedanê yên kûr dijîn. Heta Serok di hinek tespîtên xwe de dibêje, “bêdengiya goristanê ya di Rojhilata Navîn de herî zêde jin dorpêç kiriye.” Li Kurdistanê jin hem di warê neteweyî de, hem jî weke nasnameya cins dagirkeriya li ser hatî pêkanîn pir zêde kûr e. Pêwîste mirov vê baş tehlîl bike.

Rastiya jin a di Kurdistanê de bi xwe re kevneşopiyeke berxwedanê ya pir kûr anî û heya roja îro jî di Kurdistanê de kevneşopiyeke kûr a jinê heye. Dij-derketinên çêbûne ne bi rengê ku bibêje ez ji bo pirsgirêka cins an jî pirsgirêka azadiya jinê li dijî

derkevim. Bêhtirê xwe ne bi vî awayî ye, lê nakokiyên neteweyî wê dixe nav liv û tevgerê. Ji ber ku jin wekî civakê hatiye kolekirin. Em di vê mijarê de tenê civaka xwe pênase bikin, ev têrê nake. Nimûne; heya niha jî li hinek gundên Botanê jin otorîter e. Dayîk hîn otorîter e, jin bi tevahî nehatiye tunekirin. Dayîk hîn pîroz tên dîtin, civakê bi xwe re rêve dibe, dimeşîne, tîne cem hevdû. Ev tê wateya ku kevneşopiya xwedawendan hîn jî maye.

Cardin hinek dem hebûn ku jinên li ber xwe dane derketine. Taybet jî di serdema serhildanên Kurdan de, hêzên dijmin ku bi armanca komkujiyê tên ser civakê, ji ber dijmin dixwaze Kurdan tune bike, li beramberî wê berxwedan heye. Di wan berxwedanan de gelek jinên weke Zarîfe, Besê, Yaşar Xanim, Dayê Gulnaz û hwd. navê gelek jinan tê ser ziman. Wekî vana gelek kesayetên jin di wan berxwedanên Kurdistanê de pêşengî kirine. Eger di berê de bingeheke xwe ya berxwedanê nebe, bingeheke xwe ya ku xwe bibandor bike nebe, wê li ser çi esasî bikaribe wisa li ber xwe bide? Ev ne pêkan e. Nexwe kevneşopiyeke bi vî rengî heye û ji Leyla Qasiman, Zarîfe û Besêyan heya roja îro tê. Lê li kêleka vê, nasnameya jinê hatiye jibîrkirin û betonkirin. Nimûne; jin ji Kurdbûna xwe şerm dike, hebûna xwe ya Kurdîtiyê ji bîr kiriye. Wekî cins bi gelek tiştan re rû bi rû dimîne. Em bandora pergalê bidin aliyekê, heta bandora civaka ku tê de jiyan dike heye. Ev bav e, birayê xwe ye, ger zewicî be zilamê xwe ye. Ji bo jin tune bibe û nasnameya xwe ji bîr bike, vana her li ser wê zext dikin. Vê carê di serdema Modernîteya Kapîtalîst de di bin navê ku malbata dendik çêbikin de esas jin nasnameya xwe ya neteweyî jî ji bîr dike. Pergalê çi jê re pêş xistibe, bi vî awayî dixwaze malbatekê ava bike. Jin di vir de esas wê rola xwe ya diyarker vê carê bi neyînî dilîze. Pêwîste em her du milan jî bibînin.

Di vir de dema em rastiya jinê ya di nav civaka Kurd de pênase dikin, divê em balê bikêşin ser çanda eşîriyê. Serokatî ji bo nasnameya Kurd û Kurdistanê jî behsa çanda eşîriyê kir û got, “ê ku herî zêde Kurdbûna xwe ji bîr nekiribe, esas ev ji meseleya eşîriyê

tê.” Bi vî awayî aliyekî erênî yê eşîrê heye. Jinê bi rengê eşîrê nasnameya xwe ya Kurdîtiyê parast. Çima? Eşîr ku derket çiyê, pê re li hemberî wan êrîşên bi ser de hatin hebûna xwe parast. Di nav eşîran de jî yê herî zêde kevneşopiya Kurdan parastî, jin e. Ji ber ku zilam di nav eşîrê de be jî, di encamê de bi rengekê bi sîstemê re dikeve têkiliyê, bi derve re danûstandin dike. Lê jin wisa nîn e. Jin yek bi yek bi sîstemê re têkiliyê çênake. Di nav eşîra xwe de girtî ye, zêde dernakeve derve, orf û adetên xwe, çanda xwe ya kurdî diparêze. Bi vî awayî nasnameyeke jina Kurd heye. Ev ji bo me jî çavkaniyeke gavavêtinê ye. Ma hîn em ê xwe bispêrin kîjan hêzê? Bi derbekê re hema tevgerek çêbû, bi navê azadiya jinê derket û me jî tê de cih girt; ne bi vî awayî ye. Di vir de çanda kurdîtiyê ya hatî parastin heye û em xwe dispêrin vê rastiyê. Der barê eşîran de lazime em vê bibînin.

Li milê din, di nav çanda eşîrê de taybetmendiyeke wisa jî heye; mesela, hevalek dibêje ya “em Botanî ne, partîlî ne û em eşîr in, me xwe parastiye.” Dibe PKK jî nas kiribe, lê ev têrê nake. Di nav rastiya civaka me de hinek kevneşopiyên ku divê em red bikin jî hene. Ev çi ne? Di bin navê qelenê de jin hîn jî tê firotin. Tu jinek bêy qelen nayê dayîn. Zarokên keç heya temenekê digihînin, ji wê şûndetir ji bo zilamekî tên amadekirin. Di encamê de jin esas hinek taybetmendiyên xwe jî winda dike. Ji zarokatî heya emrekê cuda ye, ji wî emrî pêve jê re dibêjin “êdî tu keçik î, êdî emrê te bûye yê zewicandinê, lazime tu têkiliyên xwe ji xortan qut bikî. Hevalên te yên zarokatiyê divê xort nebin, pêwîste tu bi keçan re bî. Pêwîste tu dernekevî derve, êdî lîstok jî ji te re qedexe ye. Tê di malê de firaxan bişo, ger hebin tê li zarokan binêrî, karê malê bikî” û hwd. Ev zext li ser jinan tê kirin. Hele keçek ku piçekê xweşik be, keçeke eşîran be, qelenê xwe hîn zêdetir e. Nimûne; di nav civakê de hinek malbatên feqîr hene, keçên xwe xweşik jî nebin, hema lê digerin ku di wextek zû de yek li ku derê hebe, pereyek kêm be jî bidin wî. Ji ber dema zû nede zewicandin, civak wê bibêje “keçên filan kesî di malê de

mane!” Lewre lazime keç bizewice. Ger ne zewice, tê wateya ku ev keç kêr nayin. Ji bo zilamekî divê kêrhatî bin. Ev feraset jî di heman eşîrên Kurdan de heye. Yanî jin, di nav civaka Kurd de bi qasî otorîter e, nasnameya kurdîtiyê diparêze, yek jî li kêleka wê rastiyeke bi vî awayî heye. Pêwîste em çanda eşîrê bi vî awayî bigirin dest.

Çima eşîr ji bo Kurdan pir pêwîst bûne? Wekî ji dîroka Kurdistanê tê zanîn, berê pir sefer li ser Kurdistanê çêbûne. Adeta Kurdistan bûye wekî qadeke şer. Belkî giştî Rojhilata Navîn wisa bûye, lê navend bi taybetî Kurdistan bû. Di wan şeran de ya herî zêde bandor bû jin bû, nasnameya jinê bû. Îskender hat 10 hezar keçên Kurd bir, bi leşkerên xwe re zewicand, ango dest danî ser wana. Çima? Feraset wisa ye; şer e, dema diçe ku qadekê fetih bike, her tiştê wê qadê dibe yê wî. Encex di nav hemû tiştan de ya esas, jin e. Jin di şeran de xenîmeta yekemîn e. Di pêvajoya belavbûna Îslamiyetê de Xalid Bin Welîd dema Îslamiyetê li Kurdistanê belav dike, zilaman qetil dikin, an jî bi zorê dikin Misilman û tevlî xwe dikin. Heman demê wî jî 20 hezar keç wekî xenîmeta şer ji xwe re birine. Yek jî, hinek di Kurdistanê de, bi navê ku bibin ji malbata ehlîbeyt vê bi dilê xwe dikin, keçên xwe bi dilê xwe dane wana. Nexwe jin ji bo wana ne tiştekî esasî ye; kengî bê xwestin dikare bide dijminê xwe jî. Rexmê ku jin kevneşopiya civaka Kurd e, nasnameya zilam esas di kesayeta jinê de tê temsîlkirin jî, dikare wê bifiroşe. Ji bo bi dijminê xwe re li hev were pir rihet dide dijminê xwe.

Heman nêzîkatî çi Komkujiya Şêx Seîd dibe, çi Komkujiya Agirî dibe, çi Komkujiya Dêrsimê dibe û hwd. di hemû serhildanên wê demê çêbûne de hatiye jiyîn. Bi taybetî di Komkujiya Dêrsimê de ev pir balkêş tê jiyîn. Ji ber hejmareke zêde komkujiyên fizîkî çêbûn. Di Dêrsimê de herî zêde jin hatin qetilkirin. Heta hinek jinên ducanî yên li ber zarokanînê bûn, leşkerên Tirk çûne û bi singuyan zikê wana parçe kirine, bi vî awayî hem jin, hem jî zarok kuştine. Hinek jinên li hemberî van kiryaran li ber xwe dan û hewl

dan xwe xilas bikin, gelek ji wana xwe ji zinaran avêtine. Heya niha jî li Dêrsimê Tehtê Îksor heye. Jêra wî tehtî çem e, gelek keçan ji bo bi saxî nekevin destê dijmin xwe ji wir avêtine. Heta wekî serpêhatî dibêjin, 40 keçan li ser wî Tehtê Îksor keziyên xwe bi hev ve girê dane û xwe bi hev re ji tehtê avêtine. Nexwe di pêvajoya serhildanan de jî herî zêde jin bûye hedef. Jinê jî pêwîstî dîtiye xwe ji vê êrîşê biparêze. Jina ku nasnameya xwe ya berxwedanê diparêze jî seknek wisa nîşan daye.

Herî dawî li Şengalê bi xwe rewşek wisa yek bi yek hat dîtin û jiyankirin. Dîsa çeteyên DAÎŞ'ê hatin û keçên me yên Êzidî birin. Heya niha jî hinek hîn di destê DAÎŞ'ê de ne. Şer bû, qadeke şer çêbû, lê êrîş herî zêde li ser keçan çêbû. Serokatî di vê der barê de wisa dinirxîne û dibêje, Kurdistan qada şer bû, di qada şer de herî zêde jin bi komkujî û tecawuzan re rû bi rû ma. Gelek leşkeran dest danîne ser keçan û ew tecawuz kirine, an jî hinek bi xwe re zewicandine, yan jî piştî tecawûz kirine ew avêtine çolê. Serokatî dibêje, "Em tevgera tolhildana wana ne." Ev girîng e. Wekî Tevgera Azadiya Jinê em ê niha xwe bi çi pênase bikin? Rast e, em tevgera tolhildana vana ne. Yek jî, Serokatî wisa pênase dikir û digot, "dijmin dirûşmeya xwe ya yekemîn ev e; **DESTPÊKÊ LI JINÊ BIDE**. Ji bo wê ez jî dibêjim, **DESTPÊKÊ JINÊ RIZGAR BIKE**." Di beşên pêş de em ê hîn zêde li ser bisekinin, di felsefeya Serok de ev heye; erê nakokiya yekemîn nakokiya cins e, di Kurdistanê de koletiya herî kûr jî jinê jiyan kiriye, ji bo wê esas ev xeleka herî zeîf e. Ev xeleka herî zêde koletiyeke kûr tê de hatiye jiyîn, ger tu wê azad nekî mumkûn nîn e ku tu bibêjî civak azad bû. Lewra mirov azadiya civakê encex bi azadiya jinê ve dikare îfade bike. Yanî jin azad nebe, civak jî azad nabe. Jin hem beşeke mezin a civakê ye, di civakê de roleke xwe ya diyarker heye, hem jî bi awayek herî kûr koletî di kesayeta wê de hatiye jiyîn. Herî zêde jin rû bi rûyê koletiyê, mûameleyên derve yên dijmin hatiye. Lewma girînge em destpêkê di wir de bigihin azadiyê.

Pêwîste em vê pirsgirêkê tenê wekî pirsgirêka jinê nebînin. Di-

be ku em weke jin hîn zêde li ser disekinin û dikin mijara perwerdê, heman demê divê em bi zilam jî bidin qebûlkirin ku ev pirsgirêka wî ye jî. Pirsgirêka jinê tenê ne aîdê jinê bi xwe ye, heman demê pirsgirêka zilam e. Mirov vê yekê di rastiya Kurdistanê de pir balkêş dibîne. Rast e, hemû zilm li ser jinê hatiye kirin, lê di vê rewşa Kurdistanê de pozîsyona zilam çi ye? Serok ji bo zilam pênaseyek wisa dike û dibêje, "Di Kurdistanê de zilam hatiye pîrek-kirin." Çima? Ji ber zilam pozîsyoneke xwe ya wisa heye ku, ew li derve ye, bi pergalê re rû bi rû ye, esas hatiye kolekirin. Di vir de hebûna wî pê didin jibîrkirin, di nav sîstemê de nikare xwe bi nasnameya xwe ya Kurdîniyê îfade bike. Zilam ger Kurd be mafê jiyanê jê re nîn e, jixwe ji bo wê Kurdîtiya xwe înkar dike. Vê carê çi dike? Ji bo pariyek nan, ji bo çend qurûş pere bi mûçe dişuxile. Zilam, esas bi vî awayî bûye koleyê sîstemê. Di vê rewşê de çi dike? Ev zilamê koleyê sîstemê, gava tê malê dibe kesê desthilatdar. Bi vî awayî hemû êşa koletiya xwe esas di serê jin û zarokan re derdixe. Di malê de kesê serwer ew e, vê carê jina xwe diperçiqîne. Li Kurdistanê herî zêde di nava malbatan de tundîtî pêş dikeve. Tundîtiya zilam, tundîtiya bav, bira û hwd. Bav di nava sîstemê de li pêşber dewletê destê xwe dide pêş, stûyê xwe xwar dike, lê gava tê malê, kesê efendî ew e. Efendîbûna xwe li ser jinê, li ser zarokan pêk tîne. Ji bo wê Serok dibêje, "yekane qada desthilatdariyê ya ji zilam re hatî hiştin, li ser mala wî ye, li ser jina wî ye. Cuda tu qadeke desthilatdariyê jê re nehatiye hiştin." Encex li beramberî vê, ji ber desthilatdariya xwe di wir de dimeşîne xwe desthilat û azad dibîne, xwe wekî kole nabîne. Ji ber ku qadeke desthilatê jê re hatiye hiştin. Xwe xapandin di nasnameya zilam de hîn zêdetir e. Erê jin ger negihîştibe wê zanebûnê û di ferqa kolebûna xwe de nîn e, lê herî hindik xwe naxapîne wekî ku azad be.

Ya rastî mirov vê dema niha şîrove bike, rewş cuda ye. Nimûne; hinek dibêjin, "Ez li malê serbest mezin bûme." Esas tu serbestbûn tune ye, mutleqa kevneşopiyên civakê li ser wê tên ferz-

kirin. Tu kes ji me jî bêy ku em kevneşopiyên civakê bihesibînin ne mumkûne em gav bavêjin. Mutleqa bi rengekî zextek li ser me çêbûye. Eger em li malê serbest hatibin mezinkirin, bavê me, birayê me pir ji me hez kiribe jî, gava em derdiketin kolanê em bi tacîza zilamekî re rû bi rû diman. Bi çav tacîz kirin, bi dest tacîz kirin, bi gotin tacîz kirin çêdibe. Di encamê de jin bi vana re rû bi rû tê. Ne mumkûne kes xwe ji vê xilas bike.

Encex di zilam de vê carê xwe xapandinek heye. Ji bo wê lazime ev pirsgirêk wekî pirsgirêka zilam jî bê dîtin. Di encamê de civak ji jin û zilam pêk tê, lewre ev pirsgirêka civakê bi xwe ye. Dema em li ser dîroka têkoşîna Tevgera Azadiya Jinê disekinin, ev têkoşîn tenê ji bo azadkirina jinê nîn e. Esas armanc, azadiya civakê ye. Her wiha rizgarkirina zilam a ji wê nasnameyê ye. Pêwîste em wisa bibînin.

Li ser van esasan piştî ku têkoşîna me hinekî kemilî Serokatî got, "hûn berpirsiyar in ji bo guhertina zilam" û projeyeke guhertina zilam danî pêşiya me. Îro em lê binêrin, vîna wî ya şikestî li beramberî pergalê ye. Zilam jî niha dibêje, "pirsgirêka we ye, ne ya min e, wê çaxê werin min biguherin." Bi vî awayî xwe ferz dike. Ev di pişt guh re avêtine, rihet nêzîkbûn e. Li hemberî sîstemê, li hemberî dewletê îradeya wî hatiye şikandin, ji hêzê hatiye xistin û her wiha ku tê malê, qada desthilatdariyê ku pergalê jê re hiştiye mal, jin û zarok in û di wir de desthilata xwe dewam dike. Di nav civakê de pêwîste mirov vê pozîsyona jinê bibine.

Di civakê de ji bo pozîsyona jinê Serokatî wiha digot: "*Weke çûkek ku di qefesê de hatiye girtin, feqet tu kengî deriyê wê vekî, wê jê bireve.*" Di encamê de refleksa xwe ya mirovahiyê bi kar tîne, ji bo vê li ku derê çirûskeke hêviyê bibîne, xwe tavêje wir. Ev potansiyelek cidî ye ji bo jinê. Dibe ku zehmetiyên xwe zêde bin, lê azadkirina jinê li gorî ya zilam hîn hêsantir e. Çima? Ji ber ku tu bixwazî nexwazî jin di ferqa kolebûna xwe de ye û gava çirûskeke hêviyê jî bibine, wê bireve wir. Lê zilam wisa nîn e, ji ber hîn di

ferqa kolebûna xwe de nîn e. Tabî ferqa kolebûnê jî bi zanebûnê çêdibe. Yek jî di Kurdistanê de tiştekî wisa heye ku ew zehmetiyê çêdike; bandora ol pir zêde ye. Niha ol bi xwe re çi pêş dixe? Feraseta qederê pêş dixe ku jin êdî kolebûnê ji bo xwe wekî qederê bibîne, xwemalî dike. Ji wê yekê derketin hinek zehmetiyên xwe hene. Ji bo wê Serok got du şikestinên esasî. Eger şikestina yekemîn tenê bûya belkî derfetên derketina ji koletiyê hîn zêdetir bûya. Lê yek jî bi ser de ol zêde bû, vê feraseteke qederperest jî di jin de pêş xist, yanî wekî bibêje ev qedera te ye, pêwîste tu razî bî, cuda riyek din nîn e, ji bo te cuda hêvî û jiyanek din jî nîn e pêşî li lêgerîna jiyaneke cuda digire. Pêwîste mirov bandora vê jî di Kurdistanê de bibîne. Mirov dikare li ser vê zêde nirxandinan bike. Mesela ji bo civaka Kurdistanê, parçe parçe xweseriyên cuda hene, lê wekî analîzeke giştî mirov dikare vana bibêje ku, koletî pir kûr li ser jinê hatiye kirin piştî axa xwedawendan, piştî kevneşopiya xwedawendan; didu, Îslamiyetê pir zêde bandor li ser kiriye; sise, zilamê ku ji aliye sîstemê ve tê perçiqandin û kolekirin, gava tê malê bi navê kevneşopiyên civakî zextê li ser jinê dike. Yanî nasnameyek wisa ku her tim dibin zextan de ye, her tim hatiye kolekirin. Nasnameyek bi vî awayî heye. Bêguman şert û mercên xwe ji vê sîstemê xilas bike hene. Ya yekê, eger koletî di cihekê de pir kûr be, hema hêviyekê bibîne, dikare gavekê pêşde bavêje, ya duyem jî kevneşopiyeke xwe ya ji dema xwedawendan tê, kevneşopiyeke xwe ya berxwedanê heye û dikare gav pêşde bavêje. Bi kurtahî em dikarin analîzek wisa ji bo civakê bikin.

Niha sîstem destpêkê xwe di zîhniyetê de dide rûniştandin. Sîstema koledariyê destpêkê zîhniyet fetih kir. Serok vala vala negot rahîb destpêkê xwe di perestgehê de xebat meşandin. Ew xebat destpêkê xebata zîhnî bû. Ol jî argumaneke bîrdozî ye, lazime destpêkê zîhn fetih bike. Destpêkê dixwaze îqna bike. Dema îqna nebû, vê carê şerê fetihkirinê dikeve rojevê, qetil dike, vê carê bi zorê xwe ferz dike û xwe bi vî awayî dide rûniştandin. Ma eger xwe li ser civakê ferz neke wê desthilata xwe li ser çi bide

rûniştandin? Lazime li ser civakê ferz bike. Jixwe civakê dike kole û wisa desthilata xwe bilind dike. Û jin di civakê de esas e, lewma herî zêde ew jê bandor dibe. Serok jî xwe dispêre fikreke zanistî, vala vala nabêje, “ez ê jinê azad bikim.” Ev bingeheke xwe heye, di civakê de diyarker e. Jixwe sîstemê jî destpêkê êrîşî jinê kir. Bi giştî Kurdîtî çima di nasnameya jinê de tê temsîlkirin? Ji ber kevneşopî di wir de tê temsîlkirin. Civaka xwezayî hemû nirxên xwe di kesayeta jinê de temsîl dibe. Jin cilên kurdî li xwe dike, jin bi zimanê xwe diaxive, jin zarokan fêr dike, perwerde dike. Ji ber wê di civakê de roleke xwe ya diyarker heye. Ji ber wê sîstem jî herî zêde bandora xwe li ser jinê dike ji bo civakê qezenc bike.

Îslamiyet jî bi vî awayî ye. Kevneşopiya ku herî zêde ferz dike li ser jinê ye û Kurdistan ji vê yekê bandor bûye. Em nikarin cuda binirxînin. Dayîkên me li gelek cihan turban nagire, xwezayî nêz dibe, porê xwe hinekî vekiriye, lê ev nayê wê wateyê ku qet ji Îslamiyetê bandor nebûye. Îslamiyet tenê pênc wextan nimêjkirin nîn e. Îslamiyetê jin girt malê. Niha di Kurdistanê de derketina derve ji jinê re qedexe ye. Tê gotin ku jin tenê du caran dikare ji malê derkeve derve: Yek, dema dizewice, dudu dema cenazeyê wê derdixînin. Kevneşopiyek wisa heye. Zilamê wê ewqas zilmê lê dike, lê kevneşopiyeke civakî li ser tê ferzkirin ku ew nikare berde, berdan tune ye, nayê qebûlkirin. Kîjan civakê qebûl kiriye, ango jin û zilamê xwe li hev nekirine hevdû berdane? Ev ne pêkan e, bi ser de jî jê re jiyan nîn e, nikare dîsa vegere mala dayîka xwe jî. Ji bo vê bandoreke cidî dike, divê mirov wisa binirxîne. Lewma divê mirov dîrokê yek alî negire dest, dualî bigire dest. Yanî kevneşopiyeke me ya civaka xwezayî, kevneşopiyeke me ya berxwedanê heye.

Bi giştî ji bo civaka Kurdistanê Serokatî di parêznameya xwe ya pêncemîn de dahûrandineke wisa dike û dibêje, “Jin taybetmendiyên xwe yên xweserî klan û eşîrê jî diparêze, lê bes bi taybetî di pêvajoya Modernîteya Kapîtalîst de êdî tebeqeya jor bi sîstemê re bû yek, ew jî di berdêla firotina nasnameya xwe de çêbû,

Kurdîniya xwe ji bîr kir, xwe înkar kir, bi sîstemê re bû yek û tebeqeya jêr jî hat dagirkirin, hîn zêde hat perçiqandin. Serok wana wekî Kurmanc bi nav dike. Tabî herî zêde jin ji vê bandor bûye. Yanî divê mirov der barê civaka me de tehlîlek wisa ji bo roja îro bike.

Xisûseke din, niha pir gelên têkoşîn dane hene, lê kêm gel ji bo hebûna xwe têkoşîn dikin, ango kêm gel hebûna wana tê înkarkirin. Lê di Kurdistanê de wekî gel hebûna me tê înkarkirin. Ji ber vê divê em têkoşîna xwe wisa pênase bikin; ev şerê hebûnê ye, her wiha şerê azadiyê ye. Her du ketine nav hev. Em gelek deman bi nav dikin û dibêjin êdî hebûn temam bû, zanebûnek çêbû, têkoşîn gihîşt astekê û ji bo Rojhilata Navîn ku em niha behsa şerê cîhanê yê sêyemîn dikin, di cîhanê de êdî Kurd bûne wekî aktorekê. Ev bi têkoşînê hat qezenckirin. Lê rexmê wê jî di Kurdistanê de dagirkeriya li ser me tê ferzkirin, wana dixe nav hev. Eger firsendekê bibînin, wê komkujiyên fizîkî li ser hebûna me pêk bînin. Yanî şerê hebûn û azadiyê bi hev re ne. Ji bo jinê jî dema em nakokiyê pênase dikin em dibêjin, li beramberî vê wê berxwedanî çêbibe, lazime em wisa bigirin dest. Yanî em şerê hebûn, nasname û her wiha şerê azadiyê bi hev re dimeşînin. Ev di nav hev de ye. Wekî netewe ji bo Kurd û Kurdistanê jixwe xeteriya komkujiyên fizîkî heye, lê ji bo jinê hîn zêdetir e. Azadiya jinê ji dest hatiye girtin û jin têkoşîna azadiyê dimeşîne. Ji bo civakê giştî em dikarin vê pênaseyê bikin.

### Bı Derketına PKK’ê re Pêşketına Têkoşîna Azadıya Jınê

Em tevgereke Serokatî ne. Dema em têkoşîna azadiya jinê digirin dest, em dibêjin “Di PKK’ê de Jin”. Çima? Ji ber ku têkoşîna PKK’ê ji bo me diyarker e, em nikarin bêy wê xwe bigirin dest. Bi giştî weke Tevger em tevgereke Serokatiyê ne, lê dema em têkoşîna azadiya jinê jî digirin dest, bêy pêşketina PKK’ê û Serokatiyê em nikarin têkoşîna jinê bigirin dest; pê ve girêdayî ye, yan na wê înkar be. Em nikarin bibêjin dîrok me bi xwe destpê kir û

dîroka xwe bê PKK û Serokatiyê bigirin dest. Pêwîste em bi vî awayî bigirin dest.

Şert û mercên ku PKK jî tê de derket, salên 1970'yê ne. Serokatî, derketina destpêkê di salên 1970'yan de kir, wê salê jî li Kurdistanê komkujî hatine jiyîn, êdî Kurdîtî tê înkarkirin, tune tên hesêb û her wiha pêvajoyeke hebûn û tunebûnê heye. Lê bes bi qasî vê, derketin jî di cîhanê de hene. Mesela, Hereketa sala 1968'an di pêşengiya ciwanan de çêbûye. Bêy ku wekî Modernîteya Kapîtalîst şîrove bike, nakokiyên ekolojîk, femînîst xwe didin der. Ew tevgerên ku di 1968'an de derketine, hinekê xwe dispêrin vê nakokiyê. Yanî tevgerên ekolojîk, cins û çandî ne û vana wê bandora xwe li ser civaka Tirkiyê û Kurdistanê bikin. Serok jî xwe dispêre vê bingehê. Erê di aliyekê de nasnameyeke ku hatiye înkarkirin, li ser wê hatiye betonkirin, ji Kurdîtiya xwe direve, lê li aliyê din hêdî hêdî di cîhanê de hereket jî çêdibin. Em nikarin bêy vana dîroka xwe bigirin dest. Yek jî, salên 1970'yan ji bo kapîtalîzmê esas dibêjin *serdema fînansê,* lê belê dema krîzê ye û dixwaze krîza xwe bi wê derbas bike, yanî sîstem bi xwe di krîzê de ye. Vana kêliyên kriz û kaosê ne. Rêbazê Serok ê ji bo dîrokê digot, "kêliyên sosyolojiya azadiyê", ew ev kêlî ne. Di Tirkiyê de jî wisa ye. Heta Serok di parêznameyên xwe de ji bo Komara Tirkiyê dibêje, faşîzma spî êdî dema wê ya qeyranê ye. Ango pêvajoyeke krîz û kaosê ye û di demek wisa de wekî PKK em bi tespîta "**Kurdistan mêtingeh e**" dikevin rê; Tevgera Azadiya Jinê jî bi vê tespîta "Kurdistan mêtingeh e" dikeve rê û li ser vê bingehê xwe ava dike.

Serokatî, di pêvajoya paşvekişînê de (sala 1999'ê ku quwetê leşkerî yê li Bakurê Kurdistanê paşve hat kişandin) nêzîkatiyek diyar kir, vê carê di Tevgera me de fikar hebûn. Serokatî got, "Em hêza xwe ya gerîla ji Bakurê Kurdistanê bikêşin û pêvajoya Careseriya Demokratîk têxin dewrê." Serok, di wê demê de belavokek belav kiribû, li ser wê belavokê hevalan gumanên xwe anîbûn ziman. Heta hinekan digotin dewletê hinek tiştên wê guhertine,

hemû nedane me. Wekî Tevger nîqaş di nav me de hebûn û me got fikar hene û hwd. Piştî dewletê ferq kir ku gumanên me hene, dewlet jî hinekê di wê xalê de hat ser. Serok wê demê got: “Ev îmzeya min a 50 salan e”, ango ev 50 sal in ez şoreşgertiyê dikim, pêwîste heval jî wisa nirxê wê bizanin, yanî pêwîste bê fikar qebûl bikin. Di vê wateyê de ew nêrîna xwe anî ziman. Ew tê wê wateyê ku şoreşgeriya xwe ji 7 saliya xwe heya niha digire dest, ji nakokiyên xwe digire dest, ji ber ku ji wê demê ve redkirinên Serokatiyê hene. Civak û malbatê red dike, ji wir ve şoreşgeriya xwe destpê dike. Bêguman nakokiyên ku Rêbertî di zarokatiya xwe de jiyan kirî, li ser Tevgera me bandor kir; ji bo vê em dibêjin Tevgera me Tevgera Serokatiyê ye. Yanî karakterê Serok çi be, li ser pêşçûna Tevgera me bandor kiriye, em nikarin xwe serbixwe bigirin dest. Serok çima ewqas li ser jiyana xwe disekine? Jiyana Serok esas jiyana têkoşîna Tevgera me ye. Îro ji bo Tevgera Azadiya Jinê jî got, têkoşîna jiyana Sakîne têkoşîna azadiya jinê ye, jê qut nîn e. Ew kesayet êdî bûye kesayeteke Tevgerê. Lazime em wisa bigirin dest. Ji bo wê em nikarin dîroka xwe ji pêşketina rastiya Serokatiyê qut bigirin dest.

Em ji bo Serok dibêjin, ew zarokê Civaka Dayîksalarî ye. Ji ber ku di malbatê de bav pasîf e, qels e. Heta Serok herî dawî di parêznameyên xwe de ji bo wî wisa nirxandibû: “Rast e, bavê min wisa bû, lê ji min re gotiye dema ez bimirim tê yek rondikê ji çavên xwe nebarînî. Esas li vir rastiyek dianî ziman. Bi rastî wexta bavê min mir, yek rondik ji çavê min nehat. Bal dikişand ser rastiyekê.” Di encamê de ew jî li ser mezinbûna Serok bandor dike, dihêle ku di malbateke dayîk serwer de mezin bibe.

Tabî dayîk li ser pêşketina karakterê Wî bandor dike û dibêje: “Min dersa destpêkê ji dayîka xwe girtiye.” Mînak; dema Serokatî li derve ye, lêdanê dixwe, dayîka wî jê re derî venake û dibêje, “Biçe tola xwe hilîne û piştre were malê.” Ev ders e, ango perwerdeyek bi vî rengî fêr dike: Eger zext li ser te hebe, tê li ber xwe bidî, tola xwe hilînî. Ev di kesayeta Serok de taybetmendiyên

tolhildanê pêş dixe. Ew jî ji dayîkan hîn bûye. Desthilatdarî dibêje ya "destpêkê li jinê bixin", em jî dibêjin "destpêkê jinê xilas bikin." Em tevgereke tolhildanê ne, pêwîste em jinê xilas bikin. Nexwe dersa tolhildanê ji dayîkê tê girtin. Lê belê ferzkirina dayîkan heye, wekî kur ê civakê ye, divê ji rêza civakê dernekeve. Hema hema dayîkên me tevan dibêjin, "ji xwe re bixwîne, bibe karmendekî/e dewletê, min xwedî bike." Wisa te bi dewletê ve girê dide. Li ser Serokatî jî dayîka Wî jê re dibêje, "Biçe bibe karmendekî dewletê û çend metre qumaş ji min re bikire", lê ew vê yekê qebûl nake.

Serokatî têkiliyên xwe û dayîka xwe wekî têkiliya mirîşk û çûçikê pênase dike û ji wê dipirse: "Tu dizanî ku tu ji zarok çi dixwazî?" Di 7 saliya Serok de ji Wî re digotin "ew wekî civa ye", ji ber ku di cihê xwe de nasekine. Paşê di 10 saliya xwe de ji dayîka xwe pirs dike: "Ma tu dayîk î, te di dunyayek çawa de ez anîm dunyayê, te ez bi kîjan derfetan re rû bi rû hiştim?" Ji dayîka xwe hesab dipirse, ji ber ku di zarokatiya xwe de bi tiştên cur bi cur re rû bi rû dimîne, bi lêdanê re rû bi rû tê, bi kevneşopiyan re rû bi rû tê. Ma zarok çi sûcê xwe heye ku bi van tiştan re rû bi rû tê? Sûc ê dayîkê ye, lê zarok dikişîne. Tiştên ku pêwîste zarokek nejî û divê ji zarok tiştek neyê xwestin. Piştî parêznamê careke din pirtûka "Zimanê Şoreşê û Çalakiya Wê" bixwînin. Dibêje min gotiye, "Tu ji vî zarokî çi dixwazî, tu di ferqê de yî?" Barekê dide ser zarok. Serok dibêje, "Tu vê cîhanê li ser min ferz dikî ku ez vî barî rakim. Min di zarokatiya xwe de fêm kir ku divê dayîk ji zarokên xwe tiştekê nexwazin. Min ev red kir." Çima? Ji ber tiştek nedaye ku bixwaze. Di vir de hesabxwestinek heye. Serok dibêje, "Dayîka min wekî zanyarekê diaxivî û digot, "Rojek wê were tê bi tena xwe bimînî, wê hevalên te nebin." Ferq dikir ku ji derveyî civakê derketiye. Dîsa dibêje, "Dayîka min wekî alimekê dipeyivî, "rojek wê were *tê bi tene bimînî, kes li dora te nemîne.*" Esas dayîk di ferqa zarokê xwe de ye ku ew derketiye derveyî rastiya civakê.

Ya din, Serokatî di nav civakê de bi gelek pirsgirêkên jinê re rû

bi rû dimîne, li ber çavên xwe dibîne ku keçik rastî çi tên. Di vê der barê de Serok gelek mînakan dide. Mînaka yekemîn ji bo hevala xwe ya zarokatiyê Elîf dide, dema di wî temenê xwe yê biçûk de dizewicînin. Yanî Elîf hîn zarok e, di kolanan de bi hev re dilîzin, lê piştî wê dizewicînin. Serok diçe û gazî wê dike, dibêje were em dîsa bilîzin. Lê êdî keçik nikare were û bilîze, ji ber zewicî ye. Serok dibêje, “ev bûyer nayê bîra min, lê Elîf di nav bîranînên xwe de gotiye. Dibe ku min wisa kiribe, ji ber ez wisa bûm, min dikarî ez biçim û bang bikim.” Elîf jî hevala Serok a zarokatiyê ye, ji malbata şehîd Hasan Bîndal e, dotmama wî ye. Ew malbat jixwe dijminê malbata Serokatiyê dihat hesibandin, jixwe bi hevalê Hasan Bîndal re têkiliya xwe heye, yek jî bi keçika malbatê re jî hevaltiya xwe heye. Li ser vê Serok dibêje, “min dît hevala min a zarokatiyê ji destê min girtin, zewicandin, êdî ew nikare bi min re bilîze.” Yanî Serok hevaleke xwe winda dike. Ev pir girîng e, ji bo Serok wekî nakokiyekê ye. Di encamê de hevala xwe ya zarokatî winda dike. Niha em li ser zarokatiya xwe bifikirin dibe ku me jî gelek tişt jiyan kiribin, lê me jibîr kiriye. Di rastiya Serok de çi heye? Serok dibêje, “ez li xeyalê xwe yê zarokatî îxanetê nakim.” Li xeyalên xwe yên zarokatî xiyanet nekirin, li pey xeyalên xwe gerîn di çêbûna karakterê însan de pir girîng e. Piştî wê bi du rojan dema tên xwişka wî dixwazin, nakokiyê jiyan dike û dibêje: “Çend kîs genim û hinek pere anîn, di nava du rojan de xwişka min birin û çûn. Zilam wekî feodalekî bû, ji riya du rojan hatibû. Ez zarok bûm, min ê çi bikira! Yanî xwişka min dibin, lê ez nikarim li pêşiyê bibim asteng. Ev rastî ji min re wekî nakokiyê hat. Eger îro têkoşînek hebe, ev xwe dispêre wê nakokiyê.” Hevala Wî ya zarokatî dibin, xwişka Wî di berdêla hinek tiştên madî de dibin. Serok li ser vê dibêje, “Wê demê her kes di civakê de ji xwe re li keçekê digeriya. Di berdêla qelenekê, zadekê, heywanekê de keçên me dibin û diçin. Ez hîn di civakê de bûm, min hinek tişt dibihîstin. Carekê keçek bi zorê dane zilamekî, lê ew keçik li malê namîne, ew keçik bi dîrekekê ve girê dane; ji bo bielime wê malê û ji wê malê nereve, lê dîsa ew keçik benê xwe diqetîne û ji wê

malê direve. Wê demê wê keçê bala min kişand, yanî tu çiqas wê bi dîrekan ve girê bidî jî di encamê de ew keçik ji wê malê baz dide, direve. Carekê jî min dît ku zilamek wê zewaca xwe ya duyemîn bike. Jixwe jineke xwe heye, hat keça hevala me ji xwe re wekî jina duyemîn bir. Wê demê ev ji min re pir ecêb hat! Keçek ewqas biçûk çawa didin zilamekî ewqas emir mezin û bi jin! Ev ji bo min her wekî nakokiyekê bû. Vê carê ew keçik birine, xeyal meyal tê bîra min, carekê ew keçik hat gel min û ji min re gotiye 'xwendin û nivîsandinê nîşa min bike'. Pir eleqedar bû li hemberî pêşketinê. Belkî wê demê min peyvek nîşa wê da yan neda. Ez xwe hîn jî deyndarê wê dibînim, min nikarîbû tiştek bidayê. Lê ew keç eleqedariyeke xwe hebû ez xwendinê nîşa wê bikim, lê min nikarîbû, ji ber ji destê min girtin, birin dan zilamekî. Min hîn jî wate nedaye vê tiştê, jixwe vê têkiliyê qet bala min nedikişand. Ev keçên bi emrê biçûk ji lîstikê qut dikin û didin zilamên emir mezin, min tu caran ev têkilî qebûl nekir."

Serokatî mînakeke din dide û dibêje: "Keçek zerik cîranê me hebû, bala min dikişand. Têkiliyek platonîk bû, paşê dan malbatek cîranê me yê kêlekê. Bi vî awayî tevahî keçên me ji destê me diçûn." Ya yekemîn, Serok ji bo jinê vê pozîsyonê qebûl nake. Wê demê her kes ji xwe re li keçekê digeriya, yan jî dilê wî biketa yekê, direvand. Di wê demê de li gundê me her kesî keçek direvand, xort dihat emrekî, keçek ji xwe re dibir. Carekê dayîka min, ji dûr ve dengê wê hat min: 'Keçek hebûya, me yê bianiya.' Esas lêgerînên dayîka min ên wisa hebûn."

Di pîvanê civakê de yek heta emrekî were divê serê wî girê bidin, jê re yekê bînin, bi malekê ve girê bidin. Paşê dayîka min fêm kir ku kesayeta min ne kesayetek wisa ye ku, bi malekê ve were girêdan û wê jî dev jê berda, hêviya xwe ji min nema. Serok dibêje, "Wexta em li Fakulteya Zanistên Siyasî xwendevan bûn, hevalekî min hebû, kurê miftiyê Licê (Amedê) yekî camêr bû, her roj aşiq dibû. Carekê dîsa aşiqê keçekê dibe, ez jî hevalê wî me, tê hêz ji min digire. Rojekê kêr anî, tevahî mekteb li bin guhê hev

da. Min wê wextê ev ji xwe pirs kir, 'ev kurê miftî ye wisa dike, gelo yên din çawa nin?' Ji bo keçekê kêr aniye, mekteb tevlîhev kiriye, tenê ji bo wê keçikê ji xwe re bigire." Berevajî, bersiva Serokatî ji van bûyeran re wiha ye: "Ez xiyanetê li xeyalên xwe yên zarokatiyê nakim." Dîsa dibêje: "Jinên gund cuda li min dinêrîn û li ser van esasan belkî di min de hêvî dîtin." Di parêznameya xwe de vê yekê wiha pênase dike: "Ey zarok, tiştên ku hatiye serê me tu nizanî, rewşa me wekî tu dibînî nîn e, ji vê hin girantir e, lê tu tiştên ku qewimiye bizanibî tu zilam bî jî, dîsa hêviyên me ji te hene." Di encamê de fêm kirin ku civakê red dike, rastiya heyî qebûl nake. Serok di jinê de xweşikbûnê dibîne û dibêje: "Ji bo qewmê keçeke Kurd, mirov dikare şerekî netewî bike." Ji bo jinekê ev pir girîng e. Esas em carina dibêjin ya, di kesayeta jinê de netewebûn kom bûye, em têgîna netewe bi jinê pênase dikin. Çima? Ji ber ku hemû koletiyên wekî netewe, wekî welat li ser Kurdistanê tên meşandin jixwe di jinê de kom bûne. Ev ji bo netewe, ji bo welat, ji bo Kurdistanê dikare bibe sedema têkoşîneke xurt. Serok jî xala gavavêtina xwe wisa digire dest. Serok dibêje, "gelek dilxwaziyên min jî çêbûn, feqet min tu caran cesaret nekir ez ji keçekê re bibêjim tu xweşik î, ez ji te hez dikim. Min ew hêz û cesaret di xwe de nedît." Nexwe zilamek ji bo ji keçekê re bibêje ez ji te hez dikim, an jî tu xweşik î, lazime di ber wê de ked bide, têkoşîn bike. Yan na, bê ked, bê têkoşîn keçekê bigire û birevîne, yan qelenekê bide û ji xwe re bigire, wisa nabe. Ev adetên civakê ne. Lê di feraseta Serok de tiştekî wisa nîn e. Ji bo wê Serok dibêje, "dilxwaziyên min ên platonîk hebûn, hinek keçikan bala min dikişandin, lê min tu caran cesaret nekir ku ji wana re bibêjim tu xweşik î, ez ji te hez dikim."

Bala xwe bidinê; niha ev nêzîkatî pir erzan bûye. Di vir de mesele ne pirsgirêka têkiliyê ye. Hezkirin lazime çi be, ji bo tu ji jinekê re bibêjî ku tu xweşikî lazime tu çi bikî? Hema tenê bibêje tu xweşik î, ev nabe. Di civaka me de niha her kes hema bi derbekê re dil dikevin yekê. Niha yek li cihekê ji yekê hez dike, cihê wî tê

guhertin; li wir jî ji yeka din hez dike. Ev nêzîkatî erzan e. Serok vê pênaseyê red dike û dibêje, “ji bo tu ji yekê re bibêjî ez ji te hez dikim, pêwîste tu wê ji wê rewşê derxî.” Wekî din nabe. Serok di pirtûka bi navê Evîna Kurd de mînaka çûkekê dide û dibêje; “Heta çûkek jî dema dest didin hêlîna wê, ew wê hêlînê berdide.” Ango lazime hêlîna wê neyê dagirkirin, desteke biyanî nekeve ser hêlîna wê. Lê di Kurdistanê de her tiştekî me destavêtina ser çêbûye. Eger eyb nebe, hinek bin darekê bibînin hema dixwazin tiştên cuda bikin! Mane hîn ew der nehatiye azadkirin. Her kêliyê dibe ku dijmin were, di wê bêhnê de te bigire. Xeteriyeke wisa heye. Rexmê vê jî bi hestê xwe re şerkirin nîn e. Di zarokatiya Serok de jî van nakokiyên wisa li pêş in. Dibe ku wê demê nikare wekî niha pênase bike, lê ji bo Serok dibe çavkaniya gavavêtinê. Ji bo wê Serok malbatê terk dike, civakbûna heyî terk dike. Çima? Ji ber ku ew civak nahêle bi hevalên xwe yên zarok re bilîze, piştî demekê ji destê Wî digirin. Di roja îro de em dibêjin di civaka me de pîvanên exlaq zêde nîn in. Dikare keçekê bifiroşe, bikire, yan zilamek pir rihet dikare ji xwe re birevîne, ji bo mala xwe bigire û bi dîrekê ve gire bide. Eleqedariya Serok ji tiştên dijberî vê rastiya civakê re heye. Serok dibêje, ev jin be jî, zilam be jî vê statuyê ji bo xwe pir rihet qebûl dike. Pirsgirêka me ev e; em niha xwe dahûrandin dikin, di me de ev nakokî kêm-zêde hene. Em dikarin gelek mînakan jî bidin, nakokî hene, lê me ew nakokî nezivirandine têkoşînê, me wekî heyî qebûl kiriye. Yanî civak tiştê li ser me ferz dike, em wê qebûl dikin. Beşdarbûna nav refên têkoşînê bêguman gavavêtinek e, di encamê de redkirineke, di nav de hêviya azadiyê heye. Jixwe em ji bo wê tên nav refên şoreşê. Behsa wê nakin. Lê di gelek aliyan de qebûlkirina tiştên tên ferzkirin jî çêdibe. Jixwe Serok ew zivirand têkoşînê. Serok ji bo xwe vê jî dibêje; “Tiştê ku ez birim welatparêziyê esas hêmana yekemîn jî, tiştên li derdora jinê çêdibûn, diqewimîn bûn. Ez bi wê re ketim ferqa welatparêziya xwe. Bi vî awayî min got jin welateke ku were azadkirine. Wê demê belkî ev hestek biçûk bû, lê min niha kiriye wekî dirûşmeyeke esasî.” Niha em jî dibêjin jina azad

bibe, ew Kurdistana azad e, heta zilamê azad e jî. Serok dibêje, “Wê demê min dît ku têkiliya bi jinê re esas wekî dagirkirinê bû. Yanî jinê dagir dike. Piştre min dît welat ji dest çû, azadî ji dest çû û ez dikevim nav hestên wisa, lê min dît ku jin û azadî çiqas di nav hev de ne.” Ev dihêle ku şekilgirtina Tevgera PKK’ê jî pêk were, nêzikatiyên Serok ên bi vî awayî bandor bike.

Dîsa wê demê salên 1970’yan e, Tevger wê demê derdikeve. Ji derveyî grûba Serok, gelek tevgerên derveyî me yên çepên Tirkan hene, hinek tevgerên çep ên bi navê Kurdîtiyê xwe birêxistin kirine hene. Têkiliyên wana yên bi jinê re wekî terzê têkiliya burjûvaziyên biçûk in. Têkiliya jin û zilam têkiliya zewacê, ya wekî xwişk û bira û hwd. çêdibûn. Di tevgerên din de pênaseya “bacı” ango xwişk pir di pêş de ye. Serok vana li ber çavên xwe dibîne. Lê belê ev tişt me ji tevgerên din cuda dike. Mînak; tevgera TÎKKO di bin navê zewaca şoreşgerî de têkilî pêş dixe. Li Dêrsimê me dît, zilam pêwîste fermandarê leşkerî be, yê siyasî nikare bizewice û jin jî pêwîste herî kêm saleke xwe temam bike, wisa dikarin bizewicin. Bi awayek din nabe. Di vê çarçovê de li gorî xwe pîvanan datînin. Jin û zilam wisa dikarin bi hev re di nav şoreşê de cih bigirin.

Dema me behsa civaka Kurd were kirin, di civakê de bandorek wisa jî heye, jin nikare bibe şoreşger, ê ku dikare têkoşîn bike zilam e, jin jî dikare bibe xwişka şoreşgerî. Jin divê nêzî dayîka xwe, bavê xwe, yan jî zilamê xwe, hezkiriyê xwe be. Bi taybetî dema Tevger xwe di nav xwendekaran de birêxistin dike, eleqeyek tê nîşandan, ji ber ku xisletê xwe sosyalîst e, ew jî dibe pêvajoya yekemîn a avakirina grûbên bîrdozî, ew jî xwe dispêrin Marksîzm û Lenînîzmê. Wisa rêxistineke Marksîst-Lenînîst saz dibe. Jixwe nêzîkatiyên wan sosyalîst bûn, jin û zilam wekhev digirtin dest. Ji bo wê jin dikare beşdar bibe. Nêzîkatiyeke bi vî awayî jî heye. Di vir de ferqa Serok ji wan tevgerên din heye, ev jî hêdî hêdî di şekilgirtina Tevgera me de bandor dike.

Tevgera Apocî destpêkê hêdî hêdî grûp çêdibe. Sala 1973’yan li

milê Bendava Çûbûkê (Ankara) civîna yekemîn pêk tê û biryar tê girtin ku wekî grûb xwe birêxistin bikin. Esas tespîta "Kurdistan mêtingeh e" tam nayê zelalkirin, lê bingeha wê tê danîn, rewşa Kurdistanê tê tehlîlkirin, nêzîkbûna ji pirsgirêka Kurd re wê çi be, li ser vê bingehê tez tên avakirin. Piştî wê civînê, manîfestoya yekemîn a PKK'ê di sala 1975'an de hevalê Xeyrî Durmuş dinivîse. Her tişt di wir de zelal tê pênasekirin û li ser teza "Kurdistan mêtingeh e" bîrdoziya Tevgerê şekil digire. Ew civîna yekemîn a ji 6 kesan pêk tê, ji wan îro Serok û hevalê Fuat mane, yên din hemû reviyane, jixwe her 6 kes jî zilam in, jin di nav wana de nîn e. Lê grûp vê nêzikatiyê jî zelal dike; jin dikare beşdarî Tevgerê bibe. Tiştekî wisa jî heye ku, di nav grûbê de hevalên heyî nimûne dayîkên wan hene û alîkarî didin, xwişk an jî hevjînên wana hene û alîkariyê didin, xizmet dikin. Yanî destpêkê nêzîkatî ew e ku, jin dikare xizmet bike, her wisa dikare beşdar bibe.

Esas beşdarbûna jinê ya di nav refên PKK'ê de salên 1976-77'an çêdibe, ew jî destpêkê sala 1976'an Fatma (Kesîre Yildirim) bi awayek fermî beşdar dibe, sala 1977'ê jî hevala Sara (Sakîne Cansiz) bi awayek fermî beşdar dibe. Fatma jî, hevalê Mazlûm Doğan wê bi grûbê dide nasîn ango hevalê Mazlûm wê tîne. Wê demê pêvajoya ADYÖD'ê (Komeleya Xwendevanên Welatparêz, Demokratîk ên Ankara) heye. Di esas de ADYÖD di destê me de nebû, TSİP'ê (Partiya Karkerên Sosyalîst a Tirkiyê) ew ava kiriye, lê piştre grûbên şoreşger beşdarî ADYÖD'ê dibin û meyla wê ber bi şoreşgeran ve diçe. Hevalê Hakî Karer demekê tê de cih digire, serokatiya wê komaleyê dike, Fatma jî tevlî semînereke Serok dibe, li wir guhdar dike û wisa nas dike.

Ji sala 1973 heya '75-76'an, êdî li ser tezên "Kurdistan mêtingeh e" xwe birêxistin dikin û bi navê **Apociyan** di nav xwendekaran de xwe birêxistin dikin. Li Kurdistanê jî bandor dikin. Di heman demê de esas di nav jinan de jî bandorbûnek çêdibe. Lê belê nakokî ne nakokiya cins e, nakokiya welat e. Çima? Ji ber îdeolojî ew e; Kurdistan mêtingeh e. Ango ev nakokiyeke netewe ye û jin

jî ji bo wê dixwaze beşdar bibe û xebata rêxistinê destpê dike.

Esas sala 1976’an di civîna duyemîn a Grûba Îdeolojîk de biryar tê girtin ku êdî sefera gera li Kurdistanê destpê bike. Serok diçe bajaran, civîn, semîner û têkiliyên xwe danasînê çêdike û sala 1977’an Serokatî dizivire Ankara. Di encamê de nêzîkî salekê li Kurdistanê demeke seferberiyê tê jiyîn û wê demê beşdarbûn pir çedibin. Hevala Sara jî wisa tevlî Tevgerê dibe. Giraniya wê jî li ser sînorê Tirkiyê ye, ango Rojavayê Firatê ye. Sala 1979’an bûyera Komkujiya Mereşê, beriya wê bi ser de di bin navê nakokiyên Elewîtiyê de êrîş li ser dihat kirin. Hewldanên bişaftin, êrîşên fizîkî û hwd. li ser wî gelî tên meşandin. Kurdîtî destpêkê li wir tê windakirin. Li vê derê şerê giran di navbera faşîstan û sosyalîstan de destpê dike. Ji ber vê jî Serokatî destpêkê li ser xwendekarên milê Qers, Meletî, Semsûr, Dîlok, Mêrdîn, Amed û cihên din digere. Wexta civîn çêdibin jin jî beşdar dibin û bandor dibin.

Destpêkê ji jinan re civîn cuda tên çêkirin. Hevala Sara di pirtûka xwe de behsê dike. Carekê li Dêrsimê 80 jin kom dibin û Serokatî tê, ji wana re civînekê çêdike. Yek jî, di pîvana civakê de jin û zilam zû bi zû nayên gel hev û heman demê nikarin hemû pirsgirêkan li ser bingeha cins bigirin dest. Lê pêwîste bi awayek xweser jî li ser pirsgirêka jinê bisekinin. Nêzîkatiya jin di şoreşê de wê çawa rol bilîze, ferqa jin ji zilam wê çawa be dibe mijara nîqaşê. Bi bandora wan civînan profesyonel nebe jî, êdî gelek jin wekî sempatîzan, welatparêz tevlî xebatan dibin. Hevala Sakîne Karakoçan, Elîf Pazarcik di salên 1979-80’yî de beşdarî PKK’ê dibin. Karê wana her birêxistinkirina jinan e, ji bo ku jinan jî bibînin mecbûr in bikevin nav civakê. Nimûne; dema heval diçûn malbatan, zilaman karê siyasetê dikir û jinan jî karê xizmetê dikir. Ji ber vê yekê ji bo jinan birêxistin bikin bi wana re diçin mutfaqê, bi wana re firaxan dişûn, xwarinê çêdikin. Jinan bi vî şêwazî birêxistin dikin.

Di sala 1975’an de Nûray Erenler a ku ji Dêrsimê bû, yek ji

sempatîzana me ye ku ji milê faşîstan ve hatiye şehîdxistin. Hevala Nûray yekser şehîd nakeve, çend rojan li nexweşxanê dimîne. Ez bawer im hevalê Cuma û hevalê Karasû behsê dikin û dibêjin, “Bavê wê pir qurnaz bû, xwedî li cenazeyê keça xwe derneket, em mecbûr man û çûn di nexweşxanê de me nobeta wê girt. Ji ber faşîstan lê daye ji bo êrîşa xwe temam bikin îhtimal heye faşîst herin, di nexweşxanê de wê şehîd bixin. Em çûn me nobeta wê girt, em bi mesref û pêwîstiyên wê yên tedaviye yên wekî xwîn dayîn, derman û hwd. re mijûl bûn.” Jixwe piştî du rojan şehîd dikeve. Ew bi xwe jineke sempatîzan e, ne kadro ye. Tevgera me ya Azadiya Jinê, şehîda xwe ya yekemîn bi vî awayî jineke welatparêz e.

Sala 1977’an hevalê Hakî Karer ji aliyê rêxistina bi navê Têkoşîn ve ku wekî Stêrka Sor jî tê naskirin, li Dîlokê tê şehîdxistin. Ew jî şehîdê PKK’ê yê yekemîn e. Her wiha cihê xwe di merheleyên gavavêtina grûbê de girtiye û wekî serokê Tevgerê bû, bi qasî Rêbertî bandora xwe li ser Tevgerê hebû. Li hemberî wê şehadetê wê bersiva me çi be? Ew dihêle nêzîkatiyên Serokatî li hemberî şehîdan êdî şekil bigire. Heman demê ferq dike ku ji ber faşîstan û hwd. nikarin şehîdên xwe pêşwazî bikin û li ser van esasan biryara têkoşînê digire ku grûb pêwîste bibe partî. Heya 27’ê Mijdara 1978’an partîbûn pêk tê û li gundekî Lîcê yê bi navê Fîs yekemîn kongreya PKK’ê, bi tevlîbûna 22 kesan tê lidarxistin. Di nav wana de 2 jin hene; hevala Sara û Fatma beşdar dibin. Êdî li wir manîfesto, bername û xebatên hwd. şekil digirin. Di wê demê de amadekarî hebûn, heta hevala Sara digot, ji wana re dibêjin ‘grûba keçan’. Hemû jî kadro û sempatizan in. Li ser jinê lêkolîn çêdibin, heta amadekariyên broşûrê dikin.

Divê li ser hevalên şehîd zêdetir bê sekinandin. Yek ji wana jî hevala Turkan e, semîner dide. Hevala Turkan, hevaleke xwediyê zanebûnekê bû, ji Karakoçanê û mamoste bû. Hevala Sara hingê li Kurdistanê digere, rewşa jinê dişopîne, dahûrandinan dike. Heta parvekirina erkan hebû di navbera hevala Sara, Meral Kidir û

Ayten Ozturk de. Di wê demê de wekî komîteyek hevbeş in û der barê xebatên jinê de broşûrê derdixin. Ev jî xebateke pêşnûmeyê ye. Hevala Sara dixwaze di Kongreya PKK'ê ya 1. de encama xebatan parve bike, bi vî awayî destpêkê ji Fatma dipirse, ji ber ku wê ji xwe kevintir hesab dike û bibandor e. Lê belê bersiva Fatma wê demê bi rengê “pêwîst nake” çêdibe. Li ser van esasan jî hevala Sara tiştekê pêşkêş nake. Lê wê demê amadekariyên wan ên rewşa jinê di civakê de analîz bikin, mijara ku wê rizgarî çawa çêbibe lêkolîn bikin hene, pêşnûmeyek amade kirine.

Di wê kongreyê de hevala Sara û hevalê Cuma delegeyên Elazixê ne, bi xwe jî berpirsiyarên wir bûn. Bi erebeyên cuda cuda diçin, heman demê Fatma jî bi Serokatî re qet naaxive, heçkû di navbera wana de tiştek çêbûye û aciz bûne. Dema diçin malekê, hevalên xort li odeyekê ne, cihek jî dane hevala Sara û Fatma. Hevala Sara jî di pirtûka xwe dibêje Serok bi sermayek giran ketibû, ji Fatma re dibêje “em gazî Serokatî bikin, bila were gel me biraze”, lê Fatma vê bersivê dide “na, gazî neke”. Di kongreyê de Fatma qet naaxive, tenê hevala Sara carekê diaxive, ew jî li ser mijarên giştî diaxive. Beşdarbûna jin a di Kongreya PKK'ê ya 1. de wisa çêdibe.

Di manîfestoya yekemîn a PKK'ê de şîroveyek wisa heye: “Qedera jin wekî qedera gelê Kurd e.” Ango çawa ku qedera gelê Kurd reş e, ya jinê jî ewqas reş e. Bi vî awayî şibandina hev heye. Dîsa pênaseyek wiha heye: “Pêwîste rêxistina jin a girseyî bê avakirin. Eger hedef avakirina Kurdistana Demokratîk be, wê demê pêwîste zextên hêzên feodal, komprador û hwd. ji holê rabin.” Ji bo ku ew beşên feodal ên komprador ji holê rabin divê jin azad bibe, ji ber ku herî zêde xwe li ser jinê ferz dikin. Dîsa wekî pênase dibêje: “Beşên biyanî xwestin beşên din bandor bikin, lê ya ku nedikarî bandor bike tenê jin e. Jin di serdema çînayetî de hatiye kolekirin.” Belavoka ji bo damezrandina PKK'ê hatiye amadekirin, ji bo jinê jî di manîfestoyê de nêzîkatiyek heye. Sala 1979'an piştî kongreyê Serokatî hevala Sara erkdar dike. Ew bi xwe li navçeya

Elazixê ye ji bo ku rêxistina jinan bê avakirin, bila amadekarî bên kirin, li gor wê grûb lêhûrbûn bike. Her wiha Serokatî dibêje: “Huqûqa Roma bixwînin, lêkolînan li ser tecrûbeyên cîhanê bikin” û her wiha vê wekî xebatekê dide pêşiya wan ji bo ku bingehek çêbibe. Di sala 1979’an de ev kar destpê dike, feqet hevala Sara jî wê salê tê girtin, ji ber wê ev kar nîvçe dimîne.

Wekî min berê anî ser ziman, hevala Sara û Fatma di nava PKK’ê de ji bo Tevgera Azadiya Jinê beşdarbûnên yekemîn in. Hevala Sara nakokiya xwe ya destpêkê parve dike û dibêje: “Min nakokiya xwe ya ewil bi dayîka xwe re jiyan kiriye.” Ew jî dayîka wê nedihişt derkeve, ango bi ser de tepisandinek dida jiyankirin. Dayîka xwe jî wiha bi nav dikir “jina ji hesin”. Di pirtûka xwe de wisa pênase dike. Malbata dayîka wê hemû kom dibin û xwe birêxistin dikin ji bo li bavê wê bixin. Di vê bûyerê de dibêje: “Min dît ku jin çiqas roleke tehrîkwarî dilîze, ji bo ku bavê min lêdan bixwara. Min fêm kir ku rola jinê di nav şer de çi ye.”

Dema Serokatî rol dide jinê, tenê ne ji bo xwe birêxistin bikin, heman demê ev bangewaziya şer e. Ya rastî di civaka Kurdistanê de rola rakêşer heye. Ji bo wê jî jin dibe sedema şer û teşwîq dike. Mînak; di destana Derwêş û Edûlê de nimûneya fîncanê tê dayîn. Dihat gotin ku fîncan sê rojan li erdê dimîne, kes ranake û zilam çûyîna şer nadin ber çavan. Ji ber ew şer şerekî giran e, li hemberî Tirk û Ereban e. Carekê hemû jin li beramberî zilam li ser kaniyê kom dibin. Wexta grûbek zilam derbas dibin, jin jî etekên xwe radikin û zilam dibêjin, “şerm e, hûn çima wisa dikin?” û zilam derbas dibin. Bersiva jinan jî wiha bû: “Em we zilam nabînin!” Çima? Ji ber ku zilam eger biçe şer bike zilam e, yanî ferzkirinên bi vî rengî hene û her wiha di kevneşopiyên Kurdan de wexta şer destpê dike, jin jî çarika xwe tavêje erdê û bi vî awayî şer dide sekinandin. Hevala Sara di nakokiyên xwe de vana parve dikir. Dîsa jî malbata wê xwestin wê bi pismamekî wê yê bi navê Metîn re bizewicînin, lê ew red dike, ji wê demê û pê ve nazewice. Jixwe ya ku dihêle hevala Sara beşdar bibe yek ew nakokî bû, ango ci-

vak zewacê ferz dike û dayîka wê zext li ser dike. Ew jî ji ber van sedeman diçe derve, di fabrîkayan de kar dike, li wir weke sempatîzanekê xebatên birêxistinkirinê dike heya beşdar dibe. Hevaleke ji Dêrsimê ye, Kurdeke Elewî ye.

Hevala Sara, têkoşîna xwe herî zêde beriya darbeya 12'ê Îlonê dimeşîne. Li zîndana Amedê berxwedanek bêhempa nîşan dide. Ji ber berxwedana di zîndana Amedê de dibe efsaneyek. Bi vî rengî di tevahî malbatên welatparêz ên Amedê de wêneyê hevala Sara daleqandine. Li vê derê li hemberî dijmin serî netewandiye. Mînak; berî ez tevlî bibim, min di malê de wêneyên wê yên bi cilên kurdî dîtin. Rola wê ya serî netewandina li hemberî dijmin heye.

Sala 1979'an dewleta Tirk piranî hevalên me girtin û di zîndana Amedê de kom kirin. Hevala Sara jî grûba Elazixê ye. Dijmin jî wê demê nêzîkbûna xwe ya li hemberî Tevgerê nîşan dide û zîndana Amedê dixe model. Ji ber vê jî hemû hevalan li wir kom dikin. Wê demê li zîndana Amedê Esat Oktay Yildiran heye, piştre tê kuştin. Jixwe PKK'ê biryara cezakirina wî daye û Tevgera me ji destpêkê ve biryara ku kî îxanet bike tê cezakirin, girtibû. Hevala Sara tu carî serê xwe li hemberî Esat Oktay natewîne û yekem car di zîndanê de parastina siyasî li gel wê destpê dike. Dijmin dixwaze îradeya hevalan teslîm bigire, bi vî awayî dijmin bi hinek zextan hinek encaman digire. Mesela, dijmin yek kesayet û yek cil bi wan dane qebûlkirin. Esat Oktay bi zanebûn dema ku hevala Sara diçe dadgehê, ji bo bibîne, hevalên ku tên naskirin, wekî hevalê Xeyrî Durmuş û hevalên din di ber re derbas dikin. Hevala Sara wana dibîne ku hin hevalên wan cilên yek tîp li xwe kirine, pejirandine. Qawîşên jin û zilaman ji hev cuda ne. Ji ber vê jî gelek caran hevala Sara ji biryaran qut e, ango agahiya xwe nîn e; wekî ji greva birçîbûnê, çalakiya hevalê Mazlûm Doğan, Çalakiya Çaran. Ew kengî pê dihese? Esat, di dema greva birçîbûnê de dengê radyoyê bilind dike û dibêje: "Me bi zorê xwarin daye wana", heman demê navê hevalan dide. Hevala Sara wisa fêm dike ku heval ke-

tine greva birçîbûnê û bi gotina Esat Oktay bi çalakiya hevalên ku agir berdayîn bedena xwe dihese. Van hemû agahiyan ji dijmin dihese.

Hevala Sara, wekî bersiv çalakiya xwe ya yekemîn sala 1983’yan pêk tîne. Rexmê ku zextek giran tê meşandin jî, ji Esat re dibêje, “Tê nikaribî ji vê qawîşê xayînan derxînî”, lê belê hin hevalên jin qebûl kirine, yanî jin li hemberî zilam dişixulandin. Hinek heval têkiliyên xwe hene. Mesela, hevalê Kazim (Hamîlî Yildirim) hinek şertê wan qebûl kiriye, ew jî ji ber Ayten li hemberî wî şixulandine. Hevala Sara rexmê ku lewaziyên hin jinan hene jî, nahêle bikevin şaşîtiyek bi vî rengî, wana digire û bi wê re tevlî çalakiyan dibin. Bi giştî li zîndana Amedê ferzkirina teslîmiyetê ku li ser kadro tê kirin, li beramberî wê sekna hevala Sara destpêkek e. Sekna hevala Sara bi berxwedana xwe dihêle gelek heval jê hêz bigirin. Ji bo zilam jî wek rola teşwîqê dileyîze. Mînak; di civakê de jinê her wekî namûsê dibînin, ango ger ew li ber xwe bide, pêwîste zilam hîn zêdetir li ber xwe bide. Bi demê re parastina siyasî pêş dixin û bi vî rengî hevala Sara wekî endama avaker a PKK’ê û navenda wê tê darizandin. Halbûkî ne di navendê de ye, lê helwestên wê di wê astê de ne, ji ber ku di wê astê de rola xwe dileyîze û bandor dike.

Hevala Sara ji bo hevalên di zîndanê de, bi taybetî dema destpêka greva birçîbûnê bandorê li ser wana dike. Fatma Çelîk, Aysel Çûrûkkaya û Cahîde her sê pê re di eynî qawîşê de ne. Her sêyan jî bi xwe re dixe çalakiyê. Cahîde hinek pirsgirêkên xwe hene, bi hinek pirsgirêkan re rû bi rû maye. Ji ber vê yekê wate nedayîn heye, bêbiryarî heye. Aysel Çûrûkkaya ji Selîm Çûrûkkaya bandor bûye, di hinek pîvanên xwe yên kevneperest de israr dike. Rexmê ku van kesan di warê zîhniyetê de zehmetiyê dikişînin jî hevala Sara bi her awayî wana bandor dike. Bi giştî di dîroka PKK’ê de di wê pêvajoyê de ya ku şekil da dîroka berxwedana zîndanan, hevala Sara ye. Ji hevalê Mazlûm Doğan destpê dike, heya sala 1983’yan êdî hevala Sara dewr digire. Heya roja îro jî

berxwedana zîndanan di nav Tevgera me de kevneşopiyek e. Her çiqasî dijmin dem bi dem xwest polîtîkayên xwe bi ser bixe jî, cihê ku lê dînamîk hebûya heval bi ser diketin, zindîbûnek dihat jiyîn. Lê zextên 12'ê Îlonê cuda bûn. Dixwest bi her awayî te bêîrade bike û teslîm bigire, ji bo vê çi hebe bi kar dianî. Her çiqasî dijmin dixwaze encam bigire, berxwedana hevalan yekser pêşiya wî digire. Dema hevalê Mazlûm Doğan çalakiya xwe pêk tîne, hevalê M. Xeyrî Durmuş dibêje, "Diviyabû min ev çalakî bikira." Ji ber ku ew endamê Navendî yê PKK'ê bû. Hevalê Mazlûm jî hevalekî ciwan bû. Dîsa kesên Çalakiya Çaran li dar xistin hevalên ciwan bûn.

Ji bo Fatma jî tevlîbûna wê ya PKK'ê di pêvajoya ADYÖD'ê de ku diçe semînera Serokatiyê, li wir jê bandor dibe. Dîsa hevalê Mazlûm Doğan wê dide naskirin û bi vî awayî tevlî grûbê dibe. Lê demekê li ser meseleya ku beşdar bibe yan nebe bi nakokî dibe. Ji ber malbata wê cuda ye, bavê wê Alî Yildirim di dadgehkirina Îmralî ya (wê demê ji Îmralî re dibêjin Yassı Ada) Adnan Menderes de cihê xwe digire. Di wan deman de ji keça xwe re dinivîse û wê dema darizandinê pê re parve dike. Ya rastî bi awayekî wê ji siyasetê re amade dike, di malbatê de yeka bêtirs e. Birayên wê jî hene, lê rexmê wê ji wan bibandortir e, taybet tê amadekirin. Mesela, Serokatî ji bo vê hîn jî dibêje, "objektîf e, subjektîf e em nizanin". Dîsa dibêje, "ji tarîtiyê hat, çû nav tarîtiyê". Ango tiştên ne zelal hene, rexmê wê jî Serokatî qala têkiliya xwe ya pê re dike, pozîsyona wê pênase dike. Ji biçûkatiya xwe ve hatiye amadekirin. Ev diyar e û bandora kevneşopiyên CHP'ê heye. Di avakirina Komara Tirkiyê de CHP'ê cihê xwe girtiye, rol leyîstiye. Siyaseta destpêkê ya înkar û îmhakirinê li ser Kurdistanê û gelê me CHP'ê meşandiye.

Her çiqas beşdarbûna wê dikeve nîqaşê jî, herî dawî tevlî dikin. Serokatî dibêje 3 nakokiyên esasî hebûn ku me Fatma beşdar kir; yek jinek Kurd e, sosyal demokrat e û ji Dêrsimê ye, ango dîroka xwe ya berxwedanê heye. Li ser esasê van nakokiyan Serokatî wê digire û dixwaze jin beşdarî partiyê bibin. Fatma, berê di Dev-

Yol’ê de cihê xwe digirt. Ev çima girîng e? Wê demê di navbera tevgerên çepgir de jî, ji bo tesfiye bibin dijmin berê dest avêtiye wana û dijmin di nav Dev-Yolê de xwe birêxistin kiribû, îxanet di nav wan de derketibû. Serokatî vê tiştê dixe nîqaşê ku gelo Dev-Yolê ev bi zanebûn dane me? Mînak; gelek serokên Kurdan hene, dijmin dixwaze wana bi riya jin bixe; heta Serokatî vê gumanê jiyan dike ku Dev-Yol bi zanebûn wê rêdike nav me ji bo me bixe. Di encamê de Fatma ji Dev-Yolê qut dibe û tê gel me, ew jî pêkane ku taybet hatibe erkdarkirin ji bo kadroyan bixe. Yanî rewş ne zelal bû.

Bavê Fatma Alî Yildirim sala 1985’an di nivîseke xwe de dibêje, “me keça xwe ji çav derxistiye.” Ji ber wê tê gotin ku taybet amade kirine. Balkêş e, dema Fatma tevlî grûbê dibe, malbata wê jî tê li Ankara bi cih dibe. Li wir semta Etîler heye, cihê ku piranî beşên dewlemend lê dijîn. Serokatî got, “Carekê ez çûm wê malê, lê pozîsyona min pir cuda bû, ji ber ku maleke luks û dewlemend bû. Ew jî xwe wekî zarokekî gundî digire dest.” Dema tê pêşiya deriyê malê jî bitirs nêz dibe û ji malbatê re dibêje, “keça we li ku ye? Hevala min e.” Heman tişt sala 1978’an piştî zewicandina Serokatî ku diçe Amedê bi cih dibe, dayîka Fatma diçe li wir jî ji wana re malekê amade dike. Li Amedê di apartmana Günaydin de malekê amade dike. Di wê demê de riya xistina zilamê Kurd dimeşîne; ango jin bide, mal bide, wisa tu dikarî zilam bixî.

Tabî Fatma li ser grûbê bandor dike û taybet dixwaze nakokiyê di navbera hevalan de çêbike. Mînak; ji hinek hevalên Dêrsimê re dibêje, “Tu ji Dêrsimê yî, tu nêzî min î”, ji yên din re dibêje, “tu ne nêzî min î” û nêzîkatiyên hwd. raber dike. Cardin taybetmendiyên xwe yên bi kevneşopî (geleneksel) bi kar tîne. Ji bo wê êdî ji grûbê re dibe xeteriyek. Serokatî van tiştan ferq dike û ji wê re pêşniyar dike û dibêje, “ji bo tu bikaribî rihet bimînî di nav grûbê de lazime tu bi yek ji me re bizewicî”, lê Fatma destpêkê Serokatî hilnabijêre. Wê demê kesekî bi navê Îsmet Kiliç heye, ji navçeya Araban a Dîlokê ye, bi wî re dergistî dibe. Piştî demekê dev ji wî

diqere û ji nû ve tê gel Serokatî, pê re dizewice. Jixwe paşê Îsmet Kiliç direve, herhal bandora Fatma li ser çêdibe. Esas ji bo silametiya grûbê teklîfek wisa ji Fatma re dikin.

Serokatî tu carî têkiliya xwe înkar nekir, yanî bi rengê "şoreşger bû, tevlî têkoşînê bû" wisa nanirxîne. Lê belê wiha dibêje, "ma wê li deriyê min xist, an jî min? Wê min bandor kir, an min wê bandor kir?" Ango dixwaze vê îfade bike: "Hestên min jî hene, dibe ku ez bandor bûm, min li deriyê wê xist." Di encamê de Fatma jineke wisa bû. Hevalên me yên kevin ên weke hevala Aysel Doğan di nirxandinên xwe de pesnê wê didin. Mesela digot, "Jinek zekî bû, bandorker bû, taybetmendiyên lîderiyê pê re hebûn." Hem jî jinek bandorker nebûya Serokatî jê bandor nedibû. Ji ber ku Serokatî Fatma tercîh dike, ew jî tê wê wateyê ku hin taybetmendiyên xwe yên cuda hene. Bi rastî taybet hatiye gihandin, bi zanebûn tiştên xwe pêş dixe. Feqet Serokatî di van salên dawî de gumanên xwe dadixîne holê û bi taybetî di pêvajoya Komploya Navnetewî de hin nîşaneyên hebûn, wekî daxuyaniyên cuda, jiyana Serok di naveroka nîqaşan de bû. Dewleta Tirk hinek dîmenan dişixulîne. Mînak; digotin, "Serok ewqas jin dişixulîne", ew jî hişt ku pêhesandin di hundirê me de jî çêbibe, di nav me de jî hin feraset pêş ketin. Fatma heya wê demê neaxiviye, ji ber wê jî gumanên Serokatî çêbûn û got, "Ev bêdengbûna Fatma îhtimalek heye ku amadekariya komployek mezine li dijî me û wê niha wê derxin ser sehnê." Lê belê rexmê di bendewariyek bi vî rengî de bû jî, Fatma derneket.

Reva Fatma jî hinekî balkêş bû. Nimûne; çawa Yûnanîstan rola yekemîn di nav Komploya Navnetewî de leyîst, ew jî li wir gazî birayê xwe dike, piştre jî îstixbarata Yûnan wê direvîne. Fatma niha jî li Îsveçê jiyan dike. Li ser van bingehan Serokatî digot, "gelo ji me bandor bûye ku heya niha neaxiviye?" Mumkûn e bi vî awayî be. Me weke hevalên jin wisa dinirxand: "Ewqas sal bi Serok re jiyan kir û maye, çiqas bi dijmin re be jî, çiqas xirab be jî, di encamê de dibe ku ji Serok bandor bûye." Carekê axivî, ew jî de-

ma Osman wana reviyan, gotin, “Fatma jî bi me re ye”; wê jî li hemberî wana bersiv da û got, “Rast e ez ji Tevgerê qut bûme, lê belê ez ne bi tu kesî re me û rêz didim nirxan, têkoşîna wan.” Daxuyaniyek wisa dabû.

Piştî hevala Sara diçe Ewrûpa, dixwaze Fatma bibîne û hewldanek çêdibe, xeber jê re dişîne, lê ew pir dereng bersiv dide û dibêje “lêborîna xwe dixwazim ji bo min dereng bersiv daye, ji ber ku min xwe amade nedidît ji hevdîtinek wisa re.” Di netîcê de bandora xwe li ser têkoşîna me heye û heya sala 1988’an ango heya qut bûye dem bi dem mohra xwe li têkoşîna me dide. Di nav hevalan de nakokiyan çêdike, gelek kesan bi xwe ve girê dide. Di pêvajoya destpêkê de wekî ku di parêznameya pêncemîn de derbas dibe, pir kesan li hemberî wê bertek girtine û heya niha jî hevalê Cuma dibêje “Fatmê, Fatmê” pir bertekî ye. Wê çaxê biryar girtibûn ji bo bikujin, lê hevalê Kemal Pîr nahêle û dibêje, “Belkî tiştekî ku Serokatî dizane heye.” Heman demê helwestên hevalê Kemal Pîr hebûn. Serok dibêje, “Hevalê Kemal Pîr di wesiyetnama xwe de dibêje ‘bila Serokatî û heval li hemberî Fatma xwe biparêzin û dîqet bikin.” Ji ber vê jî Serokatî digot, “Mumkûn e bi Kemal Pîr re jî leyîstibe, xwestibe dest bavêje wî.” Roleke xwe ya wisa diyarker li ser grûbê heye. Di tevlîbûnên yekemîn de me di şexsê hevala Sara de dît zehmetiyê xwe pir bûn.

Di salên destpêkê yên têkoşînê de jin derketina xwe ya ji malê zehmet e, her wiha di nav tevgerê de jin û zilam li gel hev in. Mînak; gerîlayê destpêkê li Botanê gel jê dipirse: Wê jin û zilam çawa li gel hev jiyan bikin? Ev nakokî ye, ji bo civakê zehmet e. Ji bo ku jin bikaribe ji malê derbikeve di şexsê hinek kesan de zewacên şoreşgerî pêş dikevin, lê ev ne wekî kevneşopiyên berê, dikare zewaca şoreşgerî pêş bixe. Ew tenê heya ku jin bikaribe derbikeve. Mînak; hevala Sara ji bo bikaribe derbikeve bi pismamê xwe Bakî re dizewice. Dîsa di hin grûban de ji bo keç bikaribe beşdar bibe xortek ji wê grûbê diçe, wê dixwaze. Ev ne qural û qaîdeyên me ne, lê heval destpêkê mecbûr diman. Her ku diçe

Tevgera me mezin dibe, grûb zêde dibin û di encamê de zewac jî zêde dibin û tu bixwazî naxwazî nêzîkatiyên kevneşopî derdikevin holê. Mesela, hevalê Kazim li hemberî dijmin li ber xwe dide, lê ji ber nêzîkatiyên kevneşopî nikare sekneke bi îrade nîşan bide. Bi demê re ev zewicandin li ser Tevgerê bandor dike. Êdî ji bo em bikarin rast dahûrandinekê bikin, em ê çawa nêzî zewacê bibin, kevneşopiyên jin an zilam e? Zilam jî bi nêrîna kevneşopî jinê weke jina xwe dibîne û lê dinêre, rexmê ku di nav şoreşê de zewiciye jî. Di vir de nîqaşên kesayeta jin û zilam ên bi kevneşopî wê çawa derbas bibin, wê çawa bibe mijara nîqaşan? Mînak; hevalê Fuat bi Seher Yildirim re zewiciye. Heya van salên dawî jî Serok dahûrandin dike û dibêje, "Ev ketiye qirika Fuat, ji wê derê dernakeve, em nikarin wî jê xilas bikin." Seher jî piştre reviya, lê bandora xwe li ser hevalê Fuat dike, heya jê zarok dixwest. Ev nêzîkatiyên zilamê Kurd ê klasîk û kevneşop in. Hevala Sara diçe, Ayten bi hevalê Kazim dide naskirin, dergistî dibin. Esas tiştekî pir xwezayî jî tê dîtin, ne tiştekî ku bê redkirin. Her wiha Aysel Çûrûkkaya bi Selîm Çûrûkkaya re heya demekê têkiliya xwe li ser Tevgerê ferz dikin. Ev têkilî bi demê re êdî li ser Tevgerê tê ferzkirin. Weke jin pêwîste bi zilamekî re bizewice. Ev ne ferzkirina Tevgera me ye, pêwîste em wisa şîrove nekin. Ev nabe nêzikatiya tevgereke îdeolojîk, ev dibe nêzîkatiya kesan. Ji ber ku pê ve tê girêdan.

Dawud heye, rolek pir xirab dilîze. Dawud jî roleke berevajî dileyîze, berê jî zewiciye. Ango tirsa wê dike mesele, hevalên berê yên zewicî hene; wekî hevalê Karasûngûr hevjîna wî heye, her diçe mala wan, hevjîna hevalê Karasûngûr tehrîk dike, li dijî hevalê Karasûngûr dişixulîne. Dixwest dest bavêje jinên hevalan. Serokatî dibêje, "Nîmet heye, xwişka wî Qîmet heye, birayê wê jî tevlî civîna sala 1973'yan bûye, paşê malbata wî ji nav me dikişîne. Ji Dêrsimê tevlî bûye… Heçkû taybet hatiye û bi 26 kesan re têkiliya wan eyar kiriye." Jixwe ev derdikeve holê, ew ê çawa Tevgera me birizînin, tesfiye bikin. Dibe ku hinek kes objektîf bûn,

lê di encamê de nêzîkatiyeke civakî heye, ew jî dixwazin kevneşopiyên xwe li ser Tevgerê bi kar bînin. Ji bo tevlîbûna jin ev ne çare ye, lê wekî rêbaz hat bikaranîn. Jixwe piştî demekê êdî pêşiya wan tê girtin. Ji ber xuya dibe ku wê kevneperestî li ser têkoşînê bandorek neyînî çêbike. Yek jî armanc mal çêkirine, ji ber kadro çêbûne, ji wana re malên partiyê lazim in. Dixwazin wekî zewicandî nîşan bidin, wisa malekê bigirin û ew mal bibe mala rêxistinê. Ev wisa jî tê bikaranîn û ev kevneşopî li ser hevala Sara jî tê ferzkirin. Bêguman di têkiliya xwe de hestên wê jî hene, ev nayê înkarkirin. Mecbûr e destpêkê bi pismamê xwe re bizewice, lê pismamê wê li pey wê bernade, rexmê ku di partiyek cuda ya bi navê Azadiya Gelan de cih digire. Di pirtûka xwe de jî wê diyar dike. Ew, hevala Sara aîdê xwe dibîne. Çima? Ji ber ku zewicî ne. Piştre tecrûbeyek din jî jiyan dike, ew jî bi hevalê Kazim re, dîsa ferzkirina kevneperestiyê heye. Hevala Sara xwediyê kesayetek wisa ye ku nayê wan sînoran, elbet hestên xwe hene, nayê înkarkirin. Mînak; Serokatî di dahûrandinên xwe de ji bo dema Şener jî wiha digot: “Bi hestên te xwestin te êsîr bigirin”, lê di hevala Sara de wê wextê nehatina kevneperestiyan heye, dijberî wê derket. Rexmê wê jî Şener wê pozîsyona hevala Sara dişixulîne û bi vî awayî ji wê re helbest dinivîse, jê re dibêje, “Ji bo min tu weke Mazlûm Doğan î”. Şener dixwaze berxwedana wê, nasnameya wê ya partiyê bixe amûrê xwe, bi vî rengî wê bandor dike.

Heman nêzîkatî di şexsê Fatma de jî derdikeve holê. Ew jî xwe li ser Tevgerê, li ser Serokatî ferz dike. Di rastiyê de ew malên rêxistinê ne, Fatma wekî mala xwe û Serokatî digire dest. Heta carekê Şahîn Donmez (wê demê endamê merkeza partiyê ye) diçe malê, lê ew wî diqewitîne.

Serok şerê xwe yê li hemberî Fatma wisa nîşan dide; bêguman nêzîkatiyek siyasî tê de heye, lê heman demê ev şerê hestan e. Di warê siyasî de dewlet bi riya Fatma dixwaze Tevgerê bixe bin kontrola xwe. Serokatî jî berevajiyê wê dibêje, “me jî bi riya Fat-

ma têkiliya dewletê xist bin kontrolê." Bi vê riyê hebûna xwe didomîne, ango wê dewlet bi ser te de were. Bi vî awayî Serok dewletê dixe bin kontrola xwe. Tabî zorahiyek cidî heye, ji ber ku Fatma sînorên kevneperest pir zêde ferz dike. Serok ji bo vê dibêje, "Kesî nedikarî vî şerî 10 salan bimeşîne."

Der heqê Fatma de gelek heval biryarên cuda digirin. Mînak; hevalê Kemal Pîr li saha Serokatî ye, ecele ji wir diçe. Hevalê Cuma jê pirs dike, "Tu çima hatî?" Bersiva hevalê Kemal jî wiha ye: "Min êdî ji ber Fatma tehemûl nedikir" û wisa tevlî xebatan dibe. Li kampê namîne û gelek hevalên din bi vî rengî jê direvin hene. Serokatî, di dahûrandineke xwe de eşkere dike ku ji ber Fatma 15 rojan ji Tevgerê qut dibe, agahiya tu kesî jê çênabe. Serok dibêje, "min xwest tenê ji ber Fatma birevim." Tam rev nebe jî, qutbûnek bi giştî 15 rojan tê jiyîn, paşê vedigere. Serok dibêje, "dibe ku ew pêvajo neyê bîra hevalên derdorê jî, digotin qey karekî min heye", lê na, xwe bi paş de kişandiye. Têkoşînek bi vî awayî tê meşandin û ev heya roja îro jî berdewam dike.

## Dı Rıya Bırêxıstınbûna Hêza Jın De Gavên Destpêkê

Kongreya PKK'ê ya 1. çêdibe, manîfesto tê amadekirin, lê belê damezrandina Partiyê yekser çênabe. Li ser navê PKK'ê (Partiya Karkerên Kurdistanê) biryar hat girtin ku, wê di çalakiyê de bê damezrandin. Ew jî wê bi çalakiya Hîlwan-Siwêregê çêbibe. Berxwedana Hîlwan û Siwêregê di dîroka PKK'ê de girîng e. Bi taybetî berxwedana Hîlwanê bi ser dikeve, lê Siwêreg nîv encam digire. Di roja me ya îro de jî ew terz, taktîk tên nirxandin û em wekî dîrok rexneya wê didin. Her wiha destkeftiyên me yên mezin hene. Nimûne; yek ji cihê destpêkê yê ku tecrûbeya rizgarkirinê çêbûye, Hîlwan e. Li dijî eşîra Suleymaniyan derketinên me yên destpêkê çêbûne, paşê şaredariya wir dikeve destê me, hevalê Nadir dibe serokê şaredariyê.

Di berxwedana Hîlwanê de rola jinê di pêş de ye. Di pêvajoya şer de hinek bandora eşîretan nehat şikandin û heya bê şikandin,

grûb grûb heval bi cih dibin û di malan de dimînin. Li wir jin malên xwe vedikin û wana vedişêrin. Dîsa jin herî zêde cebilxane dibin û tînin, wek kurye erk digirin, notan dibin û tînin. Ew jî ji ber ku jin zêde bal nakişîne, wisa roleke cidî dilîze. Dayîka Dûre heye, roleke xwe ya cidî heye. Dema berxwedana Hîlwanê bi ser dikeve, dibe alîkara serokê şaredariyê û ji derveyî wê çend jinên din jî cihê xwe di şaredariyê de digirin. Wana piranî jin dixistin tevgerê, not dibirin û dianîn. Lê paşê dayîka Dûre dikeve zîndanê, bi hevala Sara re dimîne û li wir jî helwesta wê xurt e. Heman demê dayîka hevala Hawa (Hanim Yaverkaya) ye. Wê demê her çiqas nû be jî, şopandina me li ser wê qadê hebû û me serweriyek dabû rûniştandin. Lê îro berevajiyê wê didin xuyakirin. Wê çaxê şaredariya Batmanê jî dikeve destê me, dikeve destê şoreşgeran. Edîp Solmaz serokê wir bû, piştî 20 rojan şehîd dixin. Bi vî awayî ji hev bandor dibin û bandora xwe di Kurdistanê de nîşan dide.

Di hinek qadan de bandora dewletê tê şikandin û dikeve kontrola me. Li Siwêregê, li hemberî eşîra Bûcakan berxwedan tam bi ser nakeve, bandora eşîra Bûcakan tam nayê şikandin, nîv bi nîv encam tê girtin. Ji ber vê di dîroka PKK'ê de Siwêreg wekî nîv serkeftî tê şîrovekirin. Hîlwanê tam bi ser xistiye, heya ji xwe re şoreşa Vîetnamê jî mînak digirtin. Ji bo serkeftina wir dibêjin, Zafera Dîen Bîen Phû (Zafera Dîen Bîen Phû sala 1954'an li Vîetnamê tê jiyîn). Girîngiya vê ew e, rexmê ku em roja îro şerê gel ê şoreşgerî nîqaş dikin, gerîla mezin dibe, di encama wê de şerê me pir danakeve civakê. Serokatî dema behsa dema çetegeriyê dike, li ser gel pir bandor dike, me rexne dike. Dîsa dema gerîla di bajaran de şehîd diketin, digot: “Ma çi karê gerîla li wir heye? Divê ew gel bibe gerîla.” Destpêkê têkoşîna ku civak tê de be lazim e. Divê qad azad be, heman demê civak jî tê de be ku kontrola dijmin bişkê. Hevala Hawa piştî ku dayîka wê Dûre ji zîndanê derdikeve, tola wê bi tevlîbûna xwe digire.

Li Hîlwanê wê wextê komîteyên mehelan tên avakirin, komîteyên jinan, ên zarokan û hwd. çawa ku îro li Rojava tê ava-

kirin, li wir jî heman xebat ava kiribûn. Civak êdî naçe pirsgirêkên xwe bi dewletê re çareser nake, bi riya wan komîteyan çareser dike. Şaredarî bi çareserkirina pirsgirêkan jî îdara civaka Hîlwanê tam dixe destê xwe, wisa Tevger li ser wê herêmê serwer dibe. Esas piştî van çalakiyan pêwîste Partî îlan bibe, lê berî îlan bibe sala 1979'an di bin navê “Doza Elazixê” de girtin çêdibin, Şahîn Donmez jî wê demê tê girtin. Dewlet nizane, lê grûb bi navê Apo-ciyan dihat naskirin, di rastiyê de jê re “Şoreşgerên Kurdistanê” dihat gotin. Cara yeke êdî wê navê PKK'ê were girtin, lê Şahîn Dönmez beriya damezrandina navê nû, hemû agahiyan dide dij-min, di kongreyê de çi tê nîqaşkirin, kî beşdar bûye hemûyan îti-raf dike. Hevala Sara jî di wê kongreyê de amade bû, lewma weke endama damezrîner a PKK'ê û Komîteya Navendî tê dadgehkirin.

Me got sala 1979'ê ew girtinên hevalên Elazixê hene. Hêdî hêdî nîşaneyên Darbeya Faşîst a 12'ê Îlonê pêş dikevin. Dijmin jî di ferqê de ye ku wê li vê grûbê bandoreke çawa bike. Pergal bi xwe jî di nav aloziyekê de ye û ji bo vê rêveberiya teng tê gel hev, hikûmet îdare nake, nikare serwer bibe li ser tevgerên şoreşger. Ma çawa xwe belav dikin, xwe rêxistin dikin? Hikûmet vê nizane. Her çiqasî darbeya 12'ê Îlonê sala 1980'yî çêdibe jî, beriya wê nîşaneyên vê hebûn. Wekî nîşaneya destpêkê dewlet sala 1979'an Komkujiya Mereşê li ser gelê Kurd û Elewiyan pêk tînin, paşê berê xwe dide ser grûban û êrîşî wan dike. Di vê demê de bi Serokatî re pêşdîtin heye, ango ferq dike û vê rewşê dinirxîne. Ji aliye din ve dewlet bi riya Şahîn Donmez di hundir de dixwaze tevgerê dorpêç bike. Di wê demê de bi riya Pîlot (Necatî Kaya) Tevgerê dixin bin kontrola xwe. Dîsa Fatma heye, dijmin dixwaze bi riya wê di hundir de Tevgerê beralî (yönlendirme) bike û li der-ve jî zext hene. Serok wê demê ango di pêvajoya sala 1979'ê de biryara derketina Rojhilata Navîn dide û rexmê ku wê demê li Amedê bi hev re di malekê de jiyan dikin jî, dîsa bêy agahiya Fat-ma derdikeve. Esas Serok bi rêxistinî derbas dibe. Di eynî demê de ji bo giştî partiyê talîmata paşdekişandinê tê dayîn. Semîr

rexmê ku endamê navendî yê Partiyê ye xeber nadin wî.

Serokatî amadekarî dikir, ji bo 250 kesan hedef dikir ku derbasî Lubnanê bikin. Li Lubnanê bi Filistîniyan re hevdîtinan çêdike. Li Bekaayê kamp hemû bi hev re ne, rêxistinên Filistînê hene û cih didin me jî. Lubnan ji bo gelek kesan bû saheyeke nimûne ya çepên Tirkan, Hizbullah û hwd. gelek rêxistin xwe li wir digirin. Di encamê de nêzîkî 150 kes derbas dibin, lê di hundir de gelek kadroyên pêşeng ên wekî hevala Sara, Mazlûm Doğan, M. Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr tên girtin. Hevalê Kemal Pîr çend serpêhatiyên xwe hene, hewldanên fîrarê dike, lê di dawiyê de dîsa tê girtin.

Di wê demê de sê tiştên esas tên girtin hene: Yek, ên ku bikaribin xwe bigihînin saha Rojhilata Navîn; dudu, yên ku hatine girtin hene; sisê, yên ku pêwîste derbasî Rojhilata Navîn bibin hene û di dema benda rê sekinandinê de heval diçin çiya.

Di beşdarbûnên destpêkê de hevala Sara, Fadîme Killi, Fatma Çelîk, Cahîde Şener, Aysel Çûrûkkaya, Ayten Ozturk dikevin zîndanê. Dîsa di beşdarbûnên destpêkê de hevala Sakîne Karakoçan, Azîme (Mîhrîban Saran), Çîçek Selcan Gönül Atay (destgirtiya hevalê Riza Altûn e) hene. Paşê Gönül Atay tê girtin û dikeve zîndanê. Di çaxê Ankara de dema grûb xwe birêxistin dike “Malên Tuzluçayır” zêde xwe spartine mala wan. Jixwe piştre ew hevalê Riza red dike.

Hevala Sakîne Karakoçan, Azîme ya Mezin (Mîhrîban Saran), Çîçek Selcan jî di grûbên ku li çiyê benda rê dimînin de, ji bo derbasî Rojhilata Navîn bibin. Bi tena serê xwe ne, her yek di grûbekê de dimînin. Hevala Azîme yekem jin e ku derdikeve çiyayê Şerefdînê. Wê derê zozan in, çiyayekî mezin e û xwe dispêrin wan çiyayan. Wê çaxê grûb pênc pênc dimînin, lê hin qad hene ku grûbên ji 15 heya 20 kesan hene, wana belav dikin û dixin 3 heya 4 grûban. Ew jî ji bo bikaribin xwe ji êrîşên dijmin biparêzin. Ti tecrûbeya wan a li çiyê nîn e, tenê dizanin ku wê bên girtin û ji bo xwe biparêzin heya bikaribin derbasî Rojhilata Navîn

bibin li çiyayan dimînin. Hevala Azîme di grûba Şerefdînê de ye, tecrûbe nîn e, nizanin wê çawa derbas bibin. Destpêkê bi etekê xwe ve diçe û heval dibînin ku zehmetiyê dikişîne, nikare pê bimeşe, ji ber wê dixwazin wê vegerînin. Lê nikare, ji ber ger vegere, wê bê girtin. Dibêje, “ez venagerim.”

Hevala Sakîne Karakoçan jî sala 1979’an tevlî rêxistinê bûye. Heya demekê di xebatan de dimîne û heman demê ji bo birêxistinkirina jinan gelek ked dide. Tê gotin ku ew di malekê de ye, dijmin tê ser malê digire, ew jî ji bo ku belgeyên di destê wê de nekevin destê dijmin xwe ji qata sêyemîn di balkonê de diavêje. Kesayetek wisa ye, kes nikare wê bisekinîne. Hevala Sakîne xwe wisa xilas dike û paşê derbasî çiyê dibe.

Hevala Rûken (Çîçek Selcan) xwedî zanebûn e. Dibêjin, bi xwe pir caran der barê manîfestoya PKK’ê de, dahûrandinên pergalê û hwd. de perwerde dide grûbên hevalên jin. Zanebûneke xwe ya îdeolojîk heye.

Grûba hevalên jin a destpêkê derbasî Rojhilata Navîn dibe nêzîkî 25 hevalan e; Evîn (Ayşe Akarsû), Delal (Saîme Aşkin), Havva (Hanim Yaverkaya), Sultan Yavûz, Fadîme Killi, Necla Çelîk, Mizgîn (Gurbet Aydin), Zehra (Meral Kidir), Aysel Çûrûkkaya, Azîme (Mîhrîban Saran), Emîne Gerger, Ayşe (Bîrcan Yildiz), Besê Îtmeç, Rûken (Çîçek Selcan), Cahîde Şener, Seher (Cemîle Merkît), Bihar, Nadîre (Şenay, bi eslê xwe Yoguslav e), Cahîde Çelîk, Ronahî Pazarcik (Fîdan Yildirim), Mîne Çelebî…

Azîme Demîrtaş di tevlîbûnên destpêkê de cihê xwe digire. Di grûba ku wê derbikevin çiya û li benda rê dimînin ji bo derbasî saha Serokatî bibin, lê di Kanûna 1981’an de li Dêrsimê şehîd dikeve.

Di nav grûba ku derbasî saha Serokatî dibe de hevalên bi tecrûbe hene; wekî hevala Saîme Aşkin, Mîne (Emel Çelebî) Meral Kidir, Cemîle Merkît, Nadîre, Ayşe Akarsû, Ayşe (Bîrcan Yildiz)

di xebatên welat ên birêxistinkirinê de mane, tecrûbe girtine. Wexta ev grûba destpêkê derbasî Rojhilata Navîn dibe, hîn akademî venebibû, ji ber wê jî di malên lêhûrbûnê de dimînin. Grûba yekemîn a lêhûrbûnê Fatma, hevala Saîme Aşkin, Besê Îtmeç û Meral Kidir hene. Ev grûb grûba lêhûrbûnê ya yekemîn e. Hin ji wana jî di nav xebatên ragihandinê de cih digirin. Di Nîsana 1981'an de cara yekem akademî vedibe. Di wê dewrê de nêzîkî 15-20 hevalên jin cih digirin, rêveberiya wê hevala Saîme Aşkin û Mîne (Emel Çelebî) bû. Van hevalan li ser navê jin di rêveberiya akademiyê de cih digirin. Hevala Saîme Aşkin û Mîne rêveberên me yên yekemîn in.

Li saha Serokatiyê xebatên perwerdê destpê dikin, lê tecrûbeyên leşkerî kêm in, ji bo vê jî Filistînî tên perwerde didin hevalan. Kesek bi navê Yûsûf (bi xwe Filistînî bû) perwerde dide, niha hîn îro perwerdeyên me çavkaniya xwe ji wan perwerdeyên berê digire. Mînak; tecrûbeyên sabotajê ji wan hatiye girtin. Dîsa kemîn, tetbîqat û perwerdeyên hwd. Ew Yûsûf di perwerdeyan de her tim fîşekan dişixulîne ji bo zîrekbûn çêbibe, bizane çawa xwe biparêze. Sultan Yavûz di perwerdê de ji lingê xwe birîndar dibe, ji kesî re nabêje. Piştre heval ferq dikin ku birîndar bûye. Di encamê de me tecrûbeya leşkerî ji Filistîniyan girt. Bi pêvajoyê re kamp tam dibe ya me, di pêvajoya ku Îsraîl êrîşî Filistînê dike. Heya di wî şerî de me 11 şehîd dane. Yek ji wan di nobetê de bi hawanê şehîd dikeve. Dema fermandarê Filîstiyan cenazeyê wî hevalê me tîne kampê, dibêje qey em ê xwe aciz bikin, lê dema sekin û nêzîkatiya hevalên me dibîne, bandor dibe. Wê wextê jixwe kampan cuda dikin û ew dibe aîdê me.

Di perwerdekirina hevalên jin de li akademiyan bandorek çêkirine. Her wiha wekî ceribandina rêxistinî cara ewil e ewqas hevalên jin bi hev re dimînin, civînên xwe çêdikin, tevlîbûnek rêxistinî heye û bingehek tê danîn. Dîsa bi hevalên xort re jiyan dikin, perwerdeya leşkerî bi hev re dibînin, spor dikin, perwerdeyên bîrdozî dibînin, nîqaş û parvekirin pêş dikevin. Di roja îro de ji me

re pir asayî tê, lê belê di wan kêliyan de berevajî bû, ji ber ku rastiyeke civakê hebû. Ev tê wê wateyê ku cihê zilam lê hebe, jin dikare pê re parvekirinekê bijî. Bi rastî destpêk cuda ne. Di wan rojan de zehmetiyên cidî di van mijaran de dihatin jiyîn, lê dema em lê dinêrin, îro ne bi wî awayî ye. Êdî sîstemeke me heye, tecrûbeyên jiyanê hene, em dizanin di van çiyayan de em ê çawa bijîn. Tevgera me di wan zemînên me yên hevbeş de gelek tişt şikand. Hevalê Cuma û hevalê Karasû behsê dikin ku dema grûba Apocî bûn, tu teorî û şîroveyên wan li ser têkoşîna jinê nebû. Feqet cihê ku şîdet lê hebûya, piştî çûyîna wan ew radiwestiya. Çima? Ji ber ku Apocî hatine. Divê ev tişt basît neyê dîtin. Ev nêzîkatiyekê rave dike. Her kesî dizanî ku helwestên me di vê mijarê de hebûn.

Gelek tişt hene ku em rexne dikin; di Tevgera me de di warê kuştina zilam de, pîvanên feodalbûnê, kevneşopiyên li ser me tên ferzkirin, yek jî bandoreke PKK'ê heye. Mînaka Mahîr Welat heye, berê zewicî bû û zêde şîdet li ser jina xwe bi kar dianî, lê dema heval diçin mala wan, şîdetê li ser jina xwe hew dike. Ne ku heval dibêjin şîdetê li ser jina xwe neke; heval pê didin hîskirin û jê şûndetir nayê jiyîn, pêşî li ber tê girtin. Divê bê zanîn bêy ku kes tiştek bibêje, grûba Apocî giranbûneke xwe bi vî rengî çêdike. Ev jî ji bo civaka me şoreşek e, bi xwe re guhertinê ava dike. Jin ji malê qut dibe û tê tevlî dibe. Di netîcê de nêzîkatiyên Serokatî diyarker in, ji ber ku li Rojhilata Navîn taybet li ser van mijaran disekine, li gorî wê qadan amade dike.

Di destpêkê de hevalên xort zû bi zû wate nedidan. Mînak; hevalên jin li saha Serokatiyê dernediketin mutfaqê, hin hevalên jin jî ji vê rewşê kêfxweş diçûn hevalên xort tehrîk dikirin. Esas Serokatî xwest li wir kevneşopiyekê bişkîne ku "cihê jinê tenê ne mutfaq e". Mesela, li saha xwe her tim bi hevalên jin re civîn çêdikir, cihên wan cuda ne, lê ew nayê wê wateyê ku nêzîkatiyên feodal pêş nediketin. Hevala Sara jî di pirtûka xwe de pênase dike ku ew û hevalê Cuma rêveber bûn, gelek caran ji navendê not, talîmat,

perspektîf û belge dihatin, lê belê pê re parve nedikir rexmê ku pir caran pêwîst bû. Ev dide xuyakirin ku jin biçûk didîtin, jê bawer nedikirin, ango ne pêwîste van agahiyan bizanibe. Ne ku di vir de bi jinê ne bawer in, mesele wê çawa jin bi min re di eynî astê de be, karê rêveberiyê parve bike.

Li saha Serokatiyê Fatma jî pîvanên hişk li ser jinê ferz dike. Nimûne; Bekaa pir sar e, sobe kêm in, tenê di mangeyên hevalên jin de sobe hene. Dema hevalên xort li ber baranê yan berfê şil dibûn, li gel mangeyên hevalên jin xwe ziwa dikirin. Feqet bi ferz-kirinên Fatma êdî hevalên jin jî hevalên xort qebûl nedikirin. Pîvanên wisa feodal ferz dikirin. Heman demê di zemînê giştî de pîvanên civakê, nêzîkatiyên kevneperest li ser jinê ferz dikirin. Di zemînê giştî de danûstandin wê bi hev re çawa be, wê çawa nêzî hevdû bibin, wê bi zilam re çi were parvekirin û hwd. tevahî mi-jarên nîqaşê bûn. Nêzîkatiya ku jinê bêbandor bike, îradeya jinê bişkîne dixin pêş. Nêzîkatiyên ku dibêjin, “tenê nemîne, serê xwe bigire” wekî pîvan tên danîn, vana girîng in, ji ber bingehê datîne.

Kesên wekî Semîr, Dawud, Seher bi derxistina ferasetên nû bandora xwe li ser Partiyê kirine. Semîr, ferasetên cuda cuda pêş dixistin. Mesela Semîr herî zêde ev digot, “Mayîna li welat mirin e”, ango ew bi xwe ji zextên 12’ê Îlonê ditirsiya. Di encamê de dema ji aliyê dewleta Tirk ve tê girtin, li beramberî zilm û zora 12’ê Îlonê şikestinekê dijî. Ew wehşeta 12’ê Îlonê pir bi nav û deng e, tiştên ku di zîndanan de tên jiyîn normal nîn in. Ji ber vê jî dilxwazên tesfiyeyê hewl didin di saha Serokatiyê de hevalan bera hev bidin û têkiliya jin-zilam a kevneşop li ser Tevgerê ferz bikin, bi taybetî bi riya kesên wekî Seher pîvanan bixin. Dibe ku dijmin hin kesan bi zanebûn şandiye nav me û ji bo hawirdora xwe bixe bin kontrola xwe û heman demê kesan bi riya madiyatê bixin. An jî zilam bi jin, jin bi zilam bi riya têkiliyan bixin. Li saha Serok van nêzîkatiyan pêş dixin. Di pêvajoya derketina Rojhilata Navîn de li hundir jî, ango li qadên welat jî heval hene, lê di en-camê de yê ku welat beralî dike Rojhilata Navîn e, yê diyarker ew

der e.

Li saha Serokatiyê Konferansa PKK’ê ya Yekemîn di 15’ê Tîrmeha 1981’an de tê lidarxistin. Hevalên jin ên beşdarî Konferansê dibin Saîme Aşkin, Cemîle Merkît, Meral Kidir, Ayşe Akarsû, Hatîce, Xalîde û Fîdan Yildirim in. Fatma li wir ne amade bû, ji ber ku li Îsveçê bû. Hevalê Egîd (Mahsûm Korkmaz) cihê wî di konferansê de pir xuyayî bû, bi taybetî di sekna xwe ya li beramberî hevalên jin de. Di wê konferansê de êdî ferasetên Semîr zelal dibin. Xwe ferz dike ku têkoşîn di hundirê welat de nabe, lê belê di derveyî welat de dikare bê meşandin. Ev xeta reva ji welat e û êdî kadro ji bo têkoşînê helwest datîne. Ruhek nû tê avakirin. Serokatî jî fêm dike ku dilxwazên tesfiyekariyê xwe li ser Tevgerê ferz dikin. Ferz dike ku PKK yekalî nameşe, yekalî xeta Serokatî ya berxwedanê ye, aliyê din ê ku tesfiyekar e, xeta xwe li ser Tevgerê ferz dikin.

Serokatî, di pêvajoya konferansê de dahûrandinek wiha dike: “Di destpêkê de pirsgirekên pir cidî nebûn, rêgez hebûn û her kes li gor wê tevdigeriya. Hîn pîvanên dijwar tune bûn, grûb jî li ser esasê hevaltiyê dihat avakirin. Lê her ku zextên dijmin zêde dibûn û xwe li ser me ferz dikir, daxwaza wan a ku em xwe bi têkoşîneke sînordar re bihêlin, heye.” Mînak; berê jiyana te ya civakî hebû, her çiqasî li gel me hinek cuda be, dîsa qutbûnek giştî dihat jiyîn. Kengî têkoşîn dijwar bû, divê tu fedaî be û jiyana xwe bixî kêlekê. Serok dibêje, wê demê pirsgirêkan destpê kirin. Êdî jin û zilam her du kevneperestiyên xwe ferz dikirin û nakokiyên wan derdiketin holê. Civak jî heman demê êdî ser û binê hev dibe. Yanî dema em malbatekê birêxistin dikin, bi xwezayî pergala wê malê jî tê guhertin. Mînak; jina ku berê lingê zilamê xwe dişûşt, piştî ku Partî nas kir ji wê şûn ve nake. Ê ev jî ji bo zilam hilweşandine. Ev guhertin ji bo civakê şoreşek e. Ji bo em pêşiya van ferasetan bigirin me têkoşîn kir û di azadiyê de israr kir.

Dema ev grûba destpêkê tê gel hevdû, di nav wana de jî ferqa

çînayetî pêş dikeve, ya ku me ji civakê girtiye xwe bibandor dike û di encamê de bi qismî şerek çêdibe. Her tişt bi gul û gulîstan nîn e. Rexmê van bi hev re jiyankirin fêr bibûn, bi vî awayî hevdû hîs dikirin, hez dikin û herî dawî bawerbûnek di her hevalekê/î de hat avakirin. Serokatî jî bi zanebûn pirsgirêkên hevalên jin çareser nedikir û digot, "biçin di navbera xwe de çareser bikin. Ev pirsgirêkên jin in û divê di navbera we de bê çareserkirin." Dixwaze em ji bo hev ked bidin. Ê dema tu digihî encaman di kesayetê de bawerbûn ava dibe, parvekirin xurt dibe. Îcar tu her tiştê xwe parve dikî, lewaziyên xwe derbas dikî, hêza xwe parve dikî. Ev hezkirinekê di nav jinan de pêş dixe.

Di Tevgera me ya Azadiya Jinê de ya ku şekil dide têkoşîna me, grûbên ku li çiyê tecrûbe girtine. Di dîroka me de şerê destpêkê yê bi KT (Komara Tirkiyê) re Berxwedana Şikestûnê ye ku li milê Mêrdînê, sala 1981'an diqewime. Heta hevala Mizgîn jî li ser stranek gotiye.

Me ji bo şehîdên xwe yên yekemîn got, weke kadro hevala Besê Anûş sala 1981'ê li eyaleta Tolhildanê bû. Ne ku şer derket, şivanek wana dibîne û diçe îxbar dike, her wiha dijmin serê sibê bi çilo li ser hevalan sizma dike, hevala Besê ferq dike û diçe agahî dide hevalan. Hevala Elîf jî li wir amade ye, berpirsiyarê wan hevalekî xort e. Di wê kêliyê de ew di tulumê şevê de ye û bi vî rengî tên girtin. Dijmin hatiye ser te, divê tu li ber xwe bidî. Jixwe yekser çek jî nîn in, yek an du ne. Dîsa tecrûbeya şerkirinê nîn e. Heya hevala Besê diçe û hevalan şiyar dike, bêy ku bikevin şer hevala Besê şehîd dikeve û hevalên din jî sax dikevin destê dijmin. Hevala Elîf û hevalê xort ê berpirsiyar tên girtin. Ev dibin tecrûbeya destpêkê, herî hindik wê çawa xwe bispêrin çiyê, xwe çawa biparêzin û di mijarên hwd. zanebûn çêdibe. Lê tecrûbe esas di Rojhilata Navîn de tê bidestxistin.

Di navbera 20-25'ê Tebaxa 1982'yan de Kongreya PKK'ê ya 2. tê lidarxistin. Ji ber ku di wê pêvajoyê de êrîş li ser sînorê Sûriyê

hene, ji bo hatina hin hevalan astengî derdiketin û beşdarî Kongreyê nebûn. Bi giştî 60 delege amade bûn. Kongre girîng bû, li wir biryara çûyîna welat derket, wê li pêşiya provokatorên tesfiyekar bê girtin. Ferasetên Semîr bi giştî derdikevin holê, heya li wir çûyîna welat wiha pênase dike: “Çûyîna Hakkarî mirin e.” Carinan em dibêjin, “jixwe min di filan civînê de helwest danî, min pir têkoşîn kiriye”, lê belê ew şêwazê têkoşîna me nîn e. Alternatîfên me çi ne? Derketinek pêngavî pêwîst e. Di vê Kongreyê de biryara çûyîna welat tê girtin. Di grûbên ku wê biçin welat de hevalên jin jî cih digirin. Di hevalên xort de ferasetên feodal pêş dikevin, pir naxwazin hevalên jin bi wana re derbasî Bakur bibin, wekî bargiranî li jinê dinêrin, qey em nikarin bimeşin û hwd. nêzîkatiyên bêbawer, bêhêz rû didin. Hinek di bin navê parastinê de dibêjin, “Pêwîste jin di şer de nebe, di şert û mercên zehmet de nebe.” Lê Serokatî di vê biryarê de rola xwe diyarker e. Di wan grûban de nimûne 40 heval hene, ji wana 4 hevalên jin in.

Di salên 1983-84’an de grûb tên Lolanê, Fatma jî tevî wana ye. Erka biryargeha Lolanê ew e ku, şerekî çekdarî li welat bê meşandin û amadekarî tên kirin. Hevalê Karasûngûr jî ji bo amadekariyan amade bû. Fermandarê van amadekariyan û vî şerê ewil hevalê Kemal Pîr e. Ew û hevalê Karasûngûr bi hev re tên welat. Hevalê Kemal Pîr ji bo gerîlabûnê li Batmanê çiyayê Sasonê keşif dike, 3 kes bûn. Wê demê dijmin tê pêşiya wan digire, lê hevalê Egîd tenê birîndar dibe. Hevalê Kemal Pîr heya diçe şehadetê vê tiştê tîne ziman: “Di girtina min de tu sûcê hevalê Egîd nîn e”, xwe deyndar dibîne. Ji ber ku wek qusûrekê dibîne, 3 kes di erebê de ne û dijmin pêşiya wan digire; ew jî xwe ji erebê diavêjin. Hevalê Egîd xilas dibe, lê her du hevalên din tên girtin. Esas erka wan ew bû ku werin welat, amadekarî bikin û di çiyê de gerîlabûnê pêş bixin.

Li Lolanê tabî ferasetên cur bi cur pêş dikevin. Serokatî jî pir caran rexne dikir. Hingê Fatma û hevalê Abbas rêveberiyên wir bûn. Çi hêza ji saha Serokatî derdikeve û diçe gel wana, ji bo paşê der-

basî saha Botanê bibin, lê wana li gel xwe disekinînin û cardin perwerde dikin. Ji ber vê jî Serokatî ji bo Lolanê dibêje, “Serokatiyê teqlît dikin”. Diviyabû wana pratîk bimeşanda, lê wan bahane dîtin û wiha digotin: “Nû hatine welat, heya hinek tecrûbe bigirin û fêrî çiyê bibin” û hwd. Piranî hevalên jin dihêlin û grûb parçe parçe derbas dibin. Hevalên jin ên dimînin jî dixin xebatên çapemeniyê, hinekan dixin xebatên lojîstîkê û bi karên cuda re mijûl dikin. Di vir de du meylan pêş dixin: Yek, saha Serok teqlît dikin, xwestin wir bikin saha perwerdê; du, feraseta rastgirt pêş dixin. Bi bandora ku bêjin “şer nabe” jî pêngavê pêş naxin. Pêwîst bû çalakiya 15’ê Tebaxê di 1983’yan de pêk bihata, lê belê wê wextê Lolan rola xwe naleyîze, ji ber vê jî heya sala 1984’an hat paşxistin. Serokatî vê pêvajoyê wisa dinirxîne: “Eger Lolanê rola xwe bilîsta, ev çalakî di sala 1983’yan de pêk bihata, me dikarîbû pêşî li çalakiyên ku di zîndanê de hatin pêşxistin bigirta.” Te bala dijmin bi çalakiyê bikişanda cihek din, dibe ku ewqasî bi ser zîndanan de neçûna. Dibe ku ewqas hevalên pêşeng şehîd neketana. Heya roja îro Serokatî van pratîkên Lolanê tîne bîra me. Li wir bêbiryarî tê jiyîn, feraseta ku dibêje “em dikarin şer bikin, an nikarin şer bikin” tê jiyîn. Heman demê xwe sipartina hêzên Başûr (PDK û YNK) heye.

Rola PDK’ê, her wê çawa pêşî li Tevgera me ya Azadiyê bigire, ji bo vê hewl dide. Dema hevalê Karasûngûr diçe ji bo navbera wana çêbike, wekî hevalekî me yê pêşeng bi komployê tê şehîdxistin. Xala din jî, PDK terbiye dike, li Başûr ambargo pêş dixin, heta salekê nedihiştin tu erzaq ji hevalan re were. Ji ber wê hevalan salekê sax li ser berûyan jiyan dikirin.

Yek jî Fatma di Lolanê de li ser hevalên jin pir zext dike, nêzîkatiyên wê li hemberî jinê perçiqîner e. Pir zêde nahêle jin pêş bikeve. Dema dibîne jinek pêş dikeve, pêşiya wê digirt. Sûretê wê yê Lolanê heye, dema dimeşe parêzvana wê çeka xwe çeprast digire, ewqasî dikeve hewa Serokatiyê. Ev hewaya xwe li Bekaayê destpê dike û li Lolanê berdewam dike. Ew jî rihet e, ji ber ku ji

bin kontrola Serokatiyê derdikeve. Ev jî tam zîhniyeteke zilam e. Serokatî, ji hevalên jin ên wê demê mane re, wekî hevala Sara, Sakîne û hevalên din re dibêje, “Hûn di bin enqaza Fatma de mane.” Fatma li ser serê wana enqazek e, pozîsyona xwe ev e.

Di destpêka 1983’yan de ferasetên Semîr, Fatma û kesên tesfiyekar xwe belav dikin û birêxistin dikin. Her çiqas dixwazin bi kongreyê pêşiya wan bigirin jî, berevajî nayê girtin. Nimûne; Semîr piştî wê diçe Ewrûpa û li wir ferasetên xwe belav dike, tirsekê li ser kadroyan çêdike. Dema ev sekna Semîr xwe li ser xebatên Ewrûpa ferz dike, Serokatî êdî Fatma wekî hêzeke mudaxeleyê erkdar dike. Jixwe Fatma berê jî ji bo xebatan diçû û dihat. Di Konferansa PKK’ê ya 1981’an de ji ber li Ewrûpa bû, ew tevlî nabe. Mixabin feraset yek derdikevin, di eynî ferasetê de ne, lê ji ber ew wekî mudaxele diçe, wê pozîsyona xwe ya hevjîna Serok dişixulîne, ango dibêje “ez hevjîna Serok im.” Di têkoşîna me de yek, Bakî Karer xwe dispêre wê û Fatma jî xwe dispêre Serokatî. Rexmê feraset yek in jî, ji ber Serokatî wê wekî mudaxele dişîne, Semîr tam teşhîr dike. Rêbertî vê zîhniyetê di dahûrandinên xwe de dinirxîne û dibêje, “Fatma karê me zehmet kiriye, ya rastî wê Semîr zeîf nekir, berevajî hîn xurtir kir.” Ji ber vê şêwazê têkoşîna me girîng e. Mînak; em carinan dibêjin “tu mafdar î, lê ji ber rêbazên te şaş in tu xwe dixî pozîsyona ne mafdar û di encamê de tu tê rexnekirin.” Dema Serok pê dihese, jixwe wê paşve dikişîne. Êdî bi zanebûn an bêzanebûn Fatma wisa dikir ne zelal e, ji ber ku Fatma û Semîr dibin yek. Fatma terzekî xwe yê wiha heye; digire beramberî xwe û pê re şer dike. Fatma, li Ewrûpa xwe hinek din birêxistin dike, Semîr jî dibêje, “Fatma mudaxela Serok e”, xwe dijberî wê birêxistin dike. Di vir de Fatma ne jineke ku bi nezanî bike, bi zanebûn dike. Ji ber paşê dibin yek, ferasetên wana yek in. Dibe ku bi zanebûn jî kiribin.

Fatma, di pratîka xwe ya Lolanê de hevalên jin biçûk dibîne, wekî bêje divê di karên stratejîk de nebin, dixwaze wana bi karên biçûk re mijûl bike. Lê Serokatî dema wan hevalan ji sahê dişîne,

bi rol û mîsyon derdikevin, lê Fatma pêşiya wan digire. Êdî bi zanebûn an bê zanebûn, objektîf cinsê xwe biçûk dibîne, diperçiqîne, bêbawer nêz dibe, subjektîf jî dibe ku bi zanebûn be, ferq nake; di encamê de pêşiya hemleyekê digire. Ji ber vê sekna wê gelek hevalên jin berê xwe dan întiharan, hinek êşkence dibînin, hinek direviyan. Di beşdarbûnên destpêkê de hinek ji wan di bin enqaza Fatma de dimînin û tên qetilkirin. Hevala Evîn (Ayşe Akarsû) heye, Serokatî jî vê dawiyê di parêznameyên xwe de bal kişand ser wê û got, “Divê nirxê wê bê îadekirin”, piştre jixwe şehîd tê îlankirin. Hevala Evîn ji Pazarcikê ye û keça muxtarê gund e, ji malbateke dihat nasîn bû. Dema xwendekar e di dibistana amadeyî de Tevgerê nas dike. Kesayetek ji pêşketinê re, ji azadiyê re vekirî ye. Di bin navê ku têkiliyeke wê bi zilam re heye de Fatma wê digire, li kampa Bekaayê dixe şikeftekê û êşkence lê tê kirin, birçî dihêlin heya ku li wir şehîd dikeve û tu tiştekê ji Serok re jî nabêjin. Navê Fatma tê dayîn, lê hemû meylên tesfiyekar tê de ne.

Hevala Sakîne Kirmizitaş bi heman rengî ye, ew jî dibe qurban, keçek pir xweşik e. Ev heval ji Mazgîrta Dêrsimê ye, li Elazix dibistanê dixwîne û li wir mezin dibe. Demekê di xebatan de nûneriya me ya Amedê dike. Di pêvajoya 12’ê Îlonê de tê girtin, lê demek kurt di zîndanê de dimîne ji ber ku li ser wê tiştek nîn e. Gava derdikeve tê, tevlî gerîla dibe. Li Lolanê kesek bi navê Dawud (Resûl Altinok) heye, ji hevala Sakîne re teklîfa têkiliyê dike, lê ew red dike. Ji bo ev pratîka wî derneke holê hevala Sakîne ji holê radikin. Di bin navê “sîxur e” de qetil dikin. Vê jî ji Serokatî re nabêjin û dikujin. Wê weke sîxur îlan dikin û ji xwe re xistin hincetek li hemberî vê kuştinê.

Ji bo hevalên bûne qurbanê tesfiyekaran, dîsa li Lolanê hevala Lamîa Baksî heye, xwişka Mahmût Baksî ye. Ji Farqîna Amedê ye, xwendekar e. Tiştan lêpirsîn dike, hawirdora xwe rexne dike, her tiştî qebûl nake. Dema hevalê Egîd şehîd dikeve dibêje, “Vana wê me hemûyan bikujin.” Ji ber dibîne ku nêzîkatiya hevalê Egîd li

beramberî jinê cuda ye, hêvî di jinê de dibîne. Hevalê Egîd di Konferansa Partiyê ya sala 1981'an de roleke sereke dileyîze. Hevalê Egîd di wê demê de dibêje, "hevalên jin jî dikarin derbasî welat bibin." Nêzîkatiya xwe ya ji bo jinê ji yên din cudatir e. Hevala Lamîa ev ferq û cudahî dîtiye. Heman demê Fatma ji Serokatî re dibêje, "Egîd hebû, ew jî şehîd ket, tê niha çi bikî?" Ango yê ku bi Serok re bimeşe, pratîk bike çû, wê niha çi bibe? Hevala Lamîa jî eynî tiştê dibêje, wê jî ev ferqa hevalê Egîd dîtibû û li Lolanê ji aliyê tesfiyekaran ve tê qetilkirin.

Hevala Ayşe (Bîrcan Yildiz) xwişka hevala Zinarîn e, ji Dêrsimê ye. Herî zêde bi çalakiyên xwe tê nasîn, di qada çiyê de xwedî tecrûbe ye. Di çalakiyan de roleke sereke dileyîze. Li Başûrê Rojava, Dîlokê pratîkên Terzî Cemal pêş dikevin û wê sûcdar dikin ku têkiliyeke hestiyarî jiyan dike. Bi vî awayî der barê wê de biryara îdamê digirin û dikujin.

Fadîme Killi ji Nazmiya Dêrsimê ye. Li Ankara Fakulteya Zîraetê dixwîne. Dema xwendekar e Tevgerê nas dike. Di çaxê Kor Cemal û Zekî de li Botanê ye, Zekî jî îftira tavejê ser û dibêje "ev sîxur e", bi vî awayî wê qetil dikin. Xeta tesfiyekar û şexsên ku tê de cih digirin heya kadroyek şehîd dixin, her ku diçe dixwazin xwe zêde bikin. Gelek ji wan jî bi destê Fatma tên birêxistinkirin.

Li Lolanê ji ber sekna nîvçe û ne pratîkbûnê û meylên rastgir ji tesfiyekaran re dibe zemîn û Fatma bi vî rengî xwe dide rûniştandin. Serokatî, heya roja îro rexneya wan pratîkan dide. Ji ber vê kî hat bîra wî, got, "Divê nirxê wan bê îadekirin." Çima? Ji ber êdî di Serokatî de jî lêpirsînek heye. Ne ku Serok wê demê qet ne di ferqa wan pratîkên tesfiyekar de bû, lê di encamê de vana diçin ji bo pratîkê bimeşînin. Ew hinek tiştan ji rêxistinê vedişêrin, tekmîlên wan nadin Serok. Em lê binêrin, van salên dawiyê jî hinek caran bûyerek di qadekê de çêdibe; tu dinêrî wê grûbê li hev kiriye û ji rêxistinê re nabêjin. Ferasetên wisa hîna jî bi tevahî ji holê ranebûne. Îcar wê demê kesên bi zanebûn tesfiyê dikin he-

ne. Nimûne, Fatma yek ji wan kesa ye, Semîr û Dawud bi heman awayî yek ji wana ne. Nêzîkatiyeke wisa pir xuyayî heye. Niha jî pirsgirêkek heye, divê tu qiyametê rakî; dibêjin “normal e, şoreş e.” Jixwe meyla tesfiyekar xwe li ser vî zemînî birêxistin dike. Di wî çaxî de her tiştî normal dijîn. Ji Serokatî re agahiyên nerast dihatin, ji bo vê digot “Di encamê de ev hevalên min bûn, ji ber vê ez mecbûr bûm bawer bikim.” Rexmê van ferasetan du xet bi hev re di nav têkoşînê de ne; xeta serkeftî her tim a Serokatî ye û ya din jî her tim xeta tesfiyekaran e. Li ser vê bingehê hemleya 15’ê Tebaxê ya 1984’an di bin fermandariya hevalê Egîd de pêş dikeve. Ev jî ji bo Tevgera me xaleke werçerxê ye. Ji nû ve armanca wê bersivdana berxwedana zîndanan û eniyên din e. Serokatî jixwe bi salan e grûbekê amade dike ji bo bikaribe wê çalakiyê pêk bîne. Perwerde dike ji bo derbasî welat bike.

Di Hemleya 15’ê Tebaxa 1984’an de sê kom hene. Koma Erûh, Şemzînan û Çataxê. Grûba Erûhê navê xwe ***Yekîneya Propagandaya Çekdarî ya 14’ê Tîrmehê*** bû. Ev ji bo çalakiya Rojiya Birçîbûnê bersivek e. Di fermandariya wir de hevalê Egîd, Erdal û Bedran hene. Hevalê Egîd beriya çalakî bike, li Erûhê mêze dike û dibêje, “Erûh, bi rastî tu biçûk î, dibe kes te nas jî nake, lê tê binêrî, sibe tevahî dunya wê behsa te bike.” Bi giştî ev çalakî serkeftinek e. Piştî çalakiyê di radyoya BBC’yê de behs kirin. Navê grûba Şemzînan ***Yekîneya Propagandaya Çekdarî ya 21’ê Adarê Newrozê*** bû. Fermandarê wir hevalê Gozluklu Alî (Abdullah Ekîncî) ye, ev çalakî nîv encam digire. Grûba Çataxê bi navê ***Yekîneya Propagandaya Çekdarî ya 18’ê Gulanê*** bû, ji bo bîranîna şehadeta hevalê Hakî Karer e. Fermandarê wê jî Terzî Cemal e, lê bi hinek bahaneyan ew qet teşebûs jî nake.

Her çiqasî Fatma asteng dikir jî, hin hevalên jin derbasî Botanê dibin. Li Erûhê hevala Havva (Hanim Yaverkaya) hebû, li wir fermandara mangê bû. Wê demê wekî niha nîn e, mange têkel bûn, ne tenê hevalên jin bûn. Yanî hevalên jin û xort di nav hev de bûn. Tê gotin, hevala Havva jî tevlî çalakiya 15’ê Tebaxê bûye, lê

hîn tam zelal nîn e. Ya girîng ew nîn e kî beşdar bû nebû, di encamê de hevalên jin derbasî welat dibin û ji bo pêngavê alîkarî kirine. Di serî de biryardariya hevalê Egîd û hevalên pê re, ked û biryardariyek di welat de heye. Di encamê de ked heye, amadekarî hatine kirin, heta gihîştiye wê astê ku Pêngava 15'ê Tebaxê pêş bikeve. Yek, lazime em vî aliyê wê bibînin; didu, ev bandorek çawa li ser têkoşîna me dike, ev pir girîng e. Jin nikare pêşveçûna xwe ji vê pêngavê serbixwe bigire dest. Roja îro em bêjin ku em bûne artêş, ewqas tecrûbeyên me yên gerîlatiyê çêbûn; herhal ger ew fîşeka yekemîn nehata avêtin tu tecrûbeyeke me ya gerîla jî çênedibû. Lewma em nikarin pêşketina Tevgera xwe ya Azadiya Jinê ji wê serbixwe bigirin dest. Ev çalakî di Kurdistanê de derketinek e, tu hebûna xwe bi wê îspat dikî. Tu kesî bawer nedikir ku wê careke din li Kurdistanê fîşek li hemberî dijmin bê teqandin. Ji ber dewlet li ber çavê gel mezin bû; "Dewlet mezin e, teqez nayê hilweşandin." Ev nêrîn heya roja îro didome. Lê pêngava 15'ê Tebaxê wê nêrînê destpêkê di mejiyê Kurdan de dişkîne, yek jî ji dijmin re dibe bersivek. Halbûkî dijmin jî xwe îqna kiribû ku kadroyên pêşeng hemû di zîndanê de girtî ne û wê teslîm bibin, bêîrade bikevin û kî li ber xwe bide wê êşkence bibîne heya bê qetilkirin. Heçkû bi vî awayî wê Tevger tune bibe. Ev çalakî hem ji bo dijmin, hem jî ji bo civaka Kurd bersivek e.

Bi giştî di pratîka salên 1984, '85, '86'an de ked û hewldana hevalê Egîd pir e, lê gerîla hîn tam nehatibû rûniştandin. Rast e, 15'ê Tebaxê çêbû, hevalên dixwazin pratîka gerîla pêşve bibin hene, têkoşînek tê meşandin. Terzî Cemal, wekî çalakiya 15'ê Tebaxê vala derxistiye, gelek kesên wekî wî jî hene. Ev kesên tesfiyekar derbasî welat bûne û meylên xwe yên tesfiyekar li wir jî li ser xeta Partiyê ferz dikin. Serokatî vê pêvajoyê bi vî rengî dinirxîne: "Derfetên heyî xerc kirin." Mesela, kadro erzan erzan xerc kirin, dikêşin revê, xwe kuştinê û hwd. Bi çetegeriyeke serhildêr, eware ferasetên xwe ferz dikin.

Ji bo hevalên jin yek jî mirov dikare vê bibêje; di têkiliyên jin û

zilam de hinek bandoriyên paşketî, kevneperest derdikevin. Pîvanên feodalbûnê bi dijwarî xwe ferz dikirin. Mesela, li Xakûrkê ji bo ku hevalên jin serê xwe bi kefiyê bigirin, bi zilam re neaxivin Ferhat ew mecbûr dikirin, heya îro jî şopa wî maye. Hevalekê li xwe binêriya, pêwîstiyên xwe yên xweser dabîn bikira şerm bû û ji ber wê berê platformên gelek hevalan çêbûne. Heya salên 1992-93'yan hinek fermandarên şer ên wekî Celalê Şirnexî û hwd. nedigotin hevalên jin, digotin "piyekno", ango weke nasnameya jin nabîne.

Piştî salên 1986'an ji bo însanan tevlî rêxistinê bikin Qanûna Leşkerî pêş dikeve. Ji ber vê jî tevlîbûn bi xwezayî zêde dibin. Mixabin ev tesfiyekar tenê li ser kadro û pêkhateyê bandor nakin, li ser gel jî, li ser civakê jî bandor dikin. Mesela, diçin gundekê temenê kî gihiştibe, wî tevlî dikin. Di aliyekî de gerîla mezin dibe, di aliyê din de ferasetên tesfiyekar dikevin meriyetê. Ji bo ev pêvajo were nirxandin, li ser xeta me ya şer ferasetên tesfiyekar, nerûniştina gerîla, meylên ku derdikevin derve û hwd. ji bo bersiva van pirsgirêkan were dayîn Serokatî dixwaze sala 1986'ê Kongreya PKK'ê ya 3. kom bike. Jixwe kongreya me ya esasî ya partîbûnê ew e.

Di meha Cotmeha 1986'an de li saha Serokatiyê Kongreya PKK'ê ya 3. tê lidarxistin. Biryara birêxistinbûna jinê di wê kongreyê de tê girtin. Her wiha xeta tesfiyekar zelal dibe û li beramberî wê xeta Partiyê ya têkoşînê jî zelal dibe.

Rexmê hewldanên hevalê Egîd ên ku terzê gerîlabûnê bide rûniştin hene, pratîkeke eware û çetewarî pêş dikeve. Hevalê Egîd ji beşdarî Kongreya PKK'ê ya 3. bibe dikeve rê û wê gavê şehîd dibe. Lê heya roja îro ev şehadet di dîroka me ya Partiyê de bi guman tê. Ji ber ku di heman grûbê de Zekî (Şemdîn Sakik) heye. Ji wê grûba digihe saha Serokatiyê kesekî bi navê Ferhat heye û ew întihar dike. Jixwe ew întihar jî biguman e. Ji ber vê Serokatî dibêje, "Di dîrokê de pêwîste gelek lêkolîn bên kirin."

Şehadeta hevalê Egîd li ser Serok pir bandor dike û di parêznameya xwe de bi vî rengî tîne ziman: “Min ji ber wê nexwest beşdarî Kongreya PKK’ê ya 3. bibim.”

Li wir kesayeta hevalê Egîd hat nirxandin û li ser van esasan wê valahiyek cidî bihata jiyîn. Hevalê Egîd, hevalê herî zêde xeta Serok diparast, pêş dixist, pratîkên tesfiyekar û çeteyan asteng dikir bû. Bi ked û hewldanê xeta Partiyê zelal dikir. Serokatî dem bi dem tevlî wê kongreyê dibû, dianî ziman ku hestên wî ranake. Ji bo asta biryaran li hemberî xeta tesfiyekaran ev kongre girîng bû. Dîsa cara yekemîn Rêbertî dahûrandinên kesayetî dike û wisa şîrove dike: “Ya tê dahûrandin ne kêlî dîrok e, ne şexs çîn e.” Ango di vê dema em tê de dijîn dîrokê dahûrandin dike. Rast e şexs dahûrandin dike, lê di şexsê wana de heman demê çîna ku jê hatine dahûrandin dike. Cara ewil lêpirsînek navxweyî pêş dikeve, wisa berfireh pîvanên rexne û rexnedanê pêş dikevin. Ya yeke, xeta provokasyonan a ku di şexsê Semîr, Fatma û yên din de pêş ket hat mehkûmkirin, wekî feraset jî dahûrandin têne kirin. Xala duyemîn, ferasetên li gor xwe, ferasetên xwe birêxistin kirin, rêgiriya navîn (orta yolculuk) hatin mehkûmkirin. Ev heya roja îro di kesayeta gelek hevalan de derdikeve holê. Jixwe ev feraset jî di wê kongreyê de tê dahûrandin. Dîsa jî xeta navîn hat mehkûmkirin ku xwe pratîk nake, ango oportûnîzm e. Ev xet tenê di ya şer de dernakeve holê, heman demê di xeta têkoşînê de jî derdikeve pêş. Eger tu xeta Partiyê neparêzî û ji bo wê têkoşîn nekî, wê gavê tu dibî xeta navîn. Mînak; em dibêjin, *lingekî xwe di nav pergalê de ye û yek jî di nav Partiyê de meşandine*, ew jî pêkan nîn e ku bi hev re bimeşin. Li ser vî esasî feraseta xeta navîn tê mehkûmkirin. Xala sêyemîn, xeta pênaberan li Lolanê pêş dikeve; ev jî tê mehkûmkirin. Ji ber ku xwe sipartin partiyên cuda yên wekî PDK, YNK, Îran û hwd. Êdî ew nikarin bi îradeya xwe hebûna xwe diyar bikin. PDK kengî bixwaze ambargo dane, dike. Hebûna wan jixwe li ser esasê dijberiya me ye. Li Lolanê salekê sax pratîka xwe dereng xistin, heya Serokatî wê wiha dinirxîne: “Pratîka bos-

tanan kirin.” Ji xwe re qadek vekirin û xwe didin jiyîn. Eger tu pratîk nekî, qadekê ji xwe re ava bikî, li wê derê xeta rêxistinê nayê pêşxistin. Li wir dîsa di bin navê zewaca şoreşgerî de zewicandinan pêş dixin. Jixwe destpêkê zewicîn mecbûrî bû, ew jî li wê derê pêş dixin. Hevala Fehîme bi xwe berê bi dergistî bû, bi Welat re dizewicînin, heta daweta wana jî çêdikin. Ji ber ambargoya PDK’ê heye, tam salekê her bi berûyan jiyan dikin. Halbûkî dikarin ji xwe re derfetan biafirînin, pêdiviyên xwe yên jiyanê pêk bînin. Di wê demê de diviyabû cihê hevalê Mehmet Karasûngûr ne li wir ba. Lê di nava rêxistinên din de pevçûn derketiye, dixwaze here wan li hev bîne. PDK’yî bi komployekê hevalê Mehmet Karasûngûr şehîd dixin. Tu bikeve kontrola hinekên din, xwe bispêrî wana û bixwazî xwe bidî jiyîn, tiştê bibe ev e. Ev feraset di wê kongreyê de tê mehkûmkirin.

Kesayeta Fatma li ser Tevgerê çawa bandor kiriye, hat dahûrandin. Jixwe pratîka wê hemû li holê ye û Serokatî di kongreyê de wê pratîkê dadihûrîne. Kî bi kê re çawa eyar dike, kê bandor dike, hevalên jin diperçiqîne, vekirî bi tesfiyekan re yekbûn heye û xeta tesfiyekar li ser Tevgera me ferz dike. Serokatî cara yekê di wê Kongreyê de li ser van esasan dahûrandinên li ser jinê di kesayeta Fatma de pêş dixe. Esas Kongre sala 1986’ê tê lidarxistin, piştî wê bi salekê ango ji sala 1987’an û pê ve Serokatî dahûrandinên li ser jin û malbatê hîn kûr dike, ew jî ji şexsiyeta Fatma dikeve rê û wisa dahûrandin dike. Divê em dîrokê wisa negirin dest. Fatma roleke tehrîkê dileyîze. Ma Fatma bû sedema van dahûrandinên Serokatî? Na, jixwe nêzîkbûneke Serok li beramberî jinê heye. Pratîka wê tenê hişyarbûnê kûrtir dike. Mesela, eger jin neyê birêxistinkirin, wê jin çiqas xeter derkeve holê? Ji bo vê jî Serokatî giraniyekê dide azadiya jinê û kûrkirina şexsiyeta wê birêxistin dike. Esas di vê Kongreyê de têkoşîna ku Serok dimeşîne û xeta Partiyê serkeftina xwe îlan dikin. Di asta biryaran û têkoşînê de zelaliyek çêdibe.

Di parêznameya pêncemîn de Serok dibêje, “Di kongreyê de

min dît ku bi carekê re hemû hevdû didarizînin”, ango yê dadgeh dike bi xwe jî bi wî rengî ye. Di encamê de dema her du feraset nabin yek, her du jî li dijî xeta Partiyê ne. Serokatî ji bo tesfiyekariya sala 2004’ê jî heman tişt got: “Xeta çep û xeta rast her duyan bi hev re şer kirin, lê yê xeta Serok parastî nebû.” Xeta Serok di holê de ma. Yan bihevketinên çînî ne, yan pevçûna ferasetan e, lê wê kêliyê Serokatî di roja îro de dinirxîne. Di wê kongreyê de ev nêzîkatî bi xwe re pêşketinekê çêdike. Di vê wateyê de ferqa sala 2004’ê û wê demê ji hev çi ye? Serokatî sala 2004’an bi fiîlî amade nebû, lê di Kongreya PKK’ê ya 3. de bi fiîlî amade bû, dikarî pêşiya hin tiştan bigire. Her wiha dibêje, “Tesfiyekar pir kûr bûn, ji ber wê tenê heya astekê me tehlîl dikir.”

Sal derbas dibin, dîrok jî derbas dibe û hinek tişt nû nû derdikevin holê. Li Kurdistanê Rewşa Awarte (OHAL) cara yekê di sala 1987’an de tê danîn, lê beriya wê amadekarî hene. Di wê demê de JÎTEM, rêxistinên Hizbullah û hwd. derdikevin. Serokatî digot, “Wê demê bandora xwe li nav me jî kir.” Dijmin wê demê ferasetên xwe di nav me de diçîne, neçar nîn e ku sîxur bên. Nimûne; hin tişt dibin mijarên nîqaşan ku mirov dizane ew ên dijmin in. Her wiha li Rojava hin tişt dibin nîqaş û divê bi rastî ew bên rexnekirin. Hin axaftin ji zîhniyeta PDK’ê tên, ev jî bêbaweriyê pêş dixin, şoreşa me dixin nîqaşê û bi vî rengî tu dibînî hevalê herî dûrist jî radibe û bi bertekan diaxive; ango ew jî dibe amûrê wê tiştê. Ji ber vê Serokatî di çaxê Kongreya Sêyemîn de got, “Şehadeta hin hevalan ku ji aliyê JÎTEM’ê ve hatiye sazkirin, ez hîn jî napejirînim.” Şehadeta Hozan Serhat û grûba wî jî bi komployê pêş ket. Ya rastî JÎTEM ketibû dewrê, lê belê hîn tam ferq nekiribûn. Serok dibêje, dahûrandinên me yên wê demê tam li ser nehat sekinîn, tam cihê xwe negirt. Ji sala 1987’an heya ‘88’an herî zêde çetekarî xwe digihîne lûtkeyê. Tabî Kongreya 3. di wextê xwe de bibandor e.

Di wê kongreyê de platformên Semîr û Fatma çêdibin, der barê Semîr de biryara cezakirinê tê girtin. Lê belê Serokatî wê pêk

nayne, statuya wî ya endametiya partiyê disekinîne û di statûya cephe de rêdike pratîkê. Ya rastî Serok şansê duyemîn dide û heman demê riya vegerê jê re vekirî dihêle. Serok vî şêwazî tim dişixulîne, riya qezençkirinê her vekirî dihêle. Li ser Fatma jî gelek nîqaş derdikevin û ji bo wê jî biryara cezakirinê pêş dikeve. Heta kesek jê re dibêje, "Tu hesp dixwazî, yan satir?" ji bo kuştina wê. Hevalê Ferhan ê şoforê Serokatî ji bo Fatma dibêje, "em bi 4 lingên hespê ve girê bidin û bikişînin, wisa bikujin." Di encamê de Fatma kesayetek pir xeter bû, lê di encamê de ev nêzîkbûnên feodal ên li beramberî jinê pir êş da kişandin. Elbet divê Fatma neyê efûkirin û pêwîste bê dadgehkirin, li hemberî wê bertek pir kom bûne. Dema em dikevin mijara jinê, hewce ye şêwazê kuştinê cuda be. Tiştên ku Fatma kirin kêm nîn in, yekser Serok hedef girtiye û gelek heval vê qebûl nakin, gelek tehrîk dibin. Her wiha navê Serok dişixulîne, dixwaze li pêşiya gelek hevalan asta Serok bixîne; ji ber xwe di asta Serok de dibîne, rolek wisa daye xwe. Lê ew jin e û hewce ye bê edalet pîvan pêş nekeve. Ev feraset roja îro jî di zilam de pir derdikeve. Eger em dîrokê dixwînin, agahiyên me çêdibin, divê em şîrove jî bikin. Mesela, şîroveyên me wê li ser çi bin, divê çawa bûna? Semîr jê xirabtir bû, eynî ne. Ji bo Semîr biryara cezakirinê digirin, ji bo Fatma heta li ser divê şiklê kuştina wê çawa be jî nîqaş dikin. Şoforekî Serokatî hevalê Orhan bi întiharwarî diçe pratîkê û pir ecele dikir ji bo biçe pratîkê. Ji ber vê jî Serok got, "Gelo Fatma dixwest bi riya şoforê min tiştekî ji min bike?" Heta hinek ji wan wexta diçin welat, dibêjin, "Fatma dîqet bikin!" Dibe ku xwestibe bi wana bilîze, têxe nava karê xwe jî. Encex Serok hem ji bo Fatma, hem jî ji bo Semîr biryara cezakirinê erê nake. Em dîroka xwe dixwînin, lê şîroveyên wê jî pêwîst in. Di dawiyê de Semîr ji bo xebatên eniyê diçe Ewrûpa û Fatma ji bo heman xebatê diçe Yûnanîstanê, paşê dawiya sala 1987'ê û ber bi sala 1988'an ve herdû ji PKK'ê qut dibin. Her çiqasî riya qezenckirinê ji wan re hat vekirin jî, wana nenirxandin.

***Biryarên di wê Kongreyê de hatine girtin ev in:***

- Berê artêşê xwe wekî HRK (Hêza Rizgariya Kurdistanê) bi nav kiribû, lê êdî hem ji bo bîranîna şehîd Egîd û hem jî artêşa rizgariya gelê me li ser esasê ARGK'ê (Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê) hat birêxistin kirin. Berê xwe wekî hêz birêxistin dikir, lê êdî biryara artêşbûnê tê girtin. Ji bo ku artêş jî mezin bibe û qanûna leşkerî bû biryar.

- Biryar tê girtin ku xebatên eniyê wekî ERNK (Eniya Rizgariya Netewî ya Kurdistanê) jinûve were birêxistinkirin. Tabî Fatma erk digire ku li Ewrûpa belavokê belav bike û ERNK'ê ragihîne. Lê ew her dereng dixe. Armanca di bin sîwana wê de, xwe bigihîne her beşên civakê, xebatên ciwan û jinan bê birêxistinkirin. Erê di zemînê legal de gelek saziyên me hene, zemîneke demokratîk çêbûye. Di nav civakê de gelek beşên hîn jî em nagihin wana hene. Xebatên eniyê li Ewrûpa destpê kir û li her qadên din belav bû. Tabî cara yekemîn di bin sîwana ERNK'ê de wê xebatên jin bi awayek xweser xwe birêxistin bikin. Di vir de têkiliya kadro bi gel re wê çawa be, tê nîqaşkirin û zelalkirin. Tê li ku, çawa nêz bibî? Li ser vê nêzîkatiyek derdikeve holê. Dîsa biryara avakirina yekîneyên milîsan tê girtin.

- Di vê kongreyê de biryara avakirina Akademiya Mahsûm Korkmaz tê girtin. Jixwe akademî berê li Bekaayê hebû, xebatên xwe, cihê lêhûrbûnê jî hebûn, lê ev cara yekemîn e fermî bi pergala xwe wê di bin navê Mahsûm Korkmaz de birêkûpêk pergala perwerdê bê dayîn. Li ser van esasan jî Serokatî digot, "Min di salekê de bi hezaran kadro amade dikir." Her dewreyekê sê mehan didomand. Piştî wê kongreyê nîzama akademiyê çêdibe û êdî Akademiya Mahsûm Korkmaz perwerdeyên xwe dibîne. Tevahî hevalên ku beşdarî kongreyê bûne û yên ji welat hatine kişandin Serokatî wana dixe perwerdê. Li ser perspektîfên kongreyê û li ser esasê hemleyeke partîbûnê hevalan di saha xwe de perwerde dike. Yên ku tevlî kongreyê dibin Fatma, Nadîre (Şenay), hevala

Bêrîvan (Binefş Agal), hevala Mizgîn (Gurbet Aydin, di xebatên çand û huner de bû), Şafak, Meral Kidir e. Di vê kongreyê de esas têkiliyên jin û zilam digirin dest, ferasetên gelemperî li ser xeta Serok çiqas bandor dike û li beramberî vê divê têkiliya jin û zilam çawa be û hwd. perspektîfek derdikeve. Serok jî dahûrandina der barê jinê de kûr dike. Xebatên jin ên xweser bi biryargirtinê sîstema wê jî tê avakirin.

Ber bihara 1987'an hevalên ku beşdarî kongreyê bûne û yên ku tevlî akademiyê bûne, Serokatî wana dişîne ji bo bikaribin encamên kongreyê bigihînin welat. Ji bo hemû dewreyan Serokatî hedef diyar dike û dirûşmeyên wan hene. Mesela, dewreya yekemîn wiha bû: “Weke hemleyekê wê hemû biçin ji bo artêşbûnê di welat de pêş bixin.” Bi rastî hevalek-du heval be jî di encamê de ji qada Serok tên, rola xwe dileyîzin. Çima? Ji ber ku Serok wana li ser rol û mîsyonekê rêdike. Wekî me got Serokatî di salên ‘87'an de der barê jinê de dahûrandinên xwe berfirehtir dike. Ji bo wê em beşekê ji pirtûka bi navê **Jin û Malbat** bixwînin:

“*Divê jibîr nebe ku dema jinek dibe şoreşger, ev bi serê xwe pirsgirêk e. Kesên hîn nizanin di nav civakê de çawa bigerin, heta di nava malbatê de bi awayek rast û dûrist ne xwediyê gotinekê ne, di saheyeke şoreşê ya herî zêde azadiyê dixwaze, jiyana milîtan a şoreşgeriya azad dixwaze de wê nikaribin bi hêsanî bimeşin. Ev tê fêmkirin. Ji bo vê karê perwerde û birêxistinkirinê di nava şert û mercên xwe de pêkanîn jî girîng e.*

*Ez meselê, tenê wekî meseleyeke basît a exlaq nagirim dest. Pirsgirêk ev nîn e, ji ber siyasîbûn pir xirab tê destgirtin ev pirsgirêk e. Keseke ku pêwîste bibe milîtan, ger hewl bide kariyera di nava Partiyê de, birêxistinkirina di nava Partiyê de, hiyerarşiya di nava Partiyê de evqas bi sixtekarî derbas bike û jinbûna xwe derxe pêş, wisa bi kar bîne, elbet wê ev bibe rêxistineke newekheviyê. Yan jî ji ber ev bilindbûneke bê ked e, bilindbûneke ku kesayeta xwe nade axaftin, milîtaniya xwe nade axaftin xeter e. Yek jî,*

*ji ber dixwaze jinbûna xwe bi kar bîne yan jî hinekê ji cinsiya xwe feyde bigire û wisa vê bike, ev hîn xeter e. Ji ber ku li cem me zilam di vê mijarê de heta dawî ketî ye. Lewma herî kêm şerte em şîrove û nêzikatiyeke şoreşgerî ji bo vê mijarê danin.”* Serok di vê nirxandina xwe de balê dikêşe ku, ger kesayeta jinê neyê dahûrandin ji bo Partiyê çi xeteriyê bi xwe re tîne. Ji bo wê şoreşgerbûna jinekê bi serê xwe pirsgirêkek e.

Diviya encama Kongreya PKK’ê ya 3. bigihandana welat. Hinek kesên tesfiyekar hene ku encamên kongreyê rast şîrove nakin. Kesên wekî Kor Cemal û Şêxmûs wisa pênase dikin: “Semîr û Fatma beşa burjûvayê biçûk in, ew jî hatin darizandin. Ango rewşenbîr bin ketin û gundiyan serkeftina xwe îlan kirin.” Feraseta “em bibin gundî, em şer bi ser bixin” herî zêde li Botanê pêş ket. Êdî di artêşbûna gerîla de xeta çeteger dixwaze xwe li ser van ferasetan birêxistin bike. Serokatî ji bo vê digot **Çeteya Çaran,** ango Metîn, Hogir, Kor Cemal û Zekî. Van her çar çeteyan ferasetên çînî heya piştî salên 1990’an jî bibandor dikirin. Burjûvayê biçûk nikare bimeşe, kî bi berçavk be dibêjin, “ev sîxur e” û ferasetên wisa çeteger tên ferzkirin.

Konferansa Tehtereşê ya sala 1990’î çêdibe, ji ber van ferasetan nehat qebûlkirin, Serokatî mudaxeleyê Hogir dike. Serok, di parêznameya pêncan de ji bo wê çaxê dibêje, “me tam tehlîl nekir, hinek feraset nehatin çareserkirin. Piştî Kongreya PKK’ê ya 4. me xwest em komîteyê fireh bikin. Biryara artêşbûnê hatiye dayîn, pêwîste her kes pêşengiyê bike.” Li vê derê komîteyeke berfireh çêdibe ji bo bar rakin ser milê xwe, Hogir jî di vê komîteyê de cihê xwe digire. Jixwe Hogir xwe temsîlê çîna gundî dibîne. Di vê komîteyê de grûba bîrdozî ji bo xebatan diçûn Ewrûpayê û li wir tên girtin û dadgehkirin, saha welat jî ji çeteyan re mabû. Ewqas Serokatî li ser Hogir mudaxele dike, lê ji ber ku Serokatî di wê Konferansa Tehtereşê de amade nebû, pênûsekê rêdike û dibêje, “Kîjan fermandar serkeftî be, vê pênûsê bi navê min bidin wî/wê.” Ew jî wê pênûsê didin Hogir. Halbûkî pratîka

Hogir li ber çavan e, jinên di bin kontrola xwe de diperçiqîne û dixe bin kontrola xwe, ferasetên gundîtiyê pêş dixe. Nêzîkatiyên xwe bi gel re pir xeter in, di bin navê *qanûna leşkerî* de kesên pir biçûk tevlî rêxistinê dikin.

Serok, li hemberî xeta çeteyan du çekên xwe hene; yek gerîlabûn e, yek jî azadiya jinê pêşxistine. Serok dibêje, “Ez encex dikarim bi van her du çekan bersiv bidim.” Dîsa dibêje, “Çavkaniya çeteyan ferasetên pratîkên teng in, ji ber ku perwerde jî asteng dike, xwe tenê bi pratîkê rave dike. Her wiha yê ku ji jinê re rêz nîşan nade, jixwe nabe sosyalîst û ev jî ji çeteyan re dibe zemîn.” Li ser van esasan Rêbertî ji bo gerîla dibêje, “Pratîkvaniya teng divê bê derbaskirin, bi giranî perwerde bên dayîn, ê ku hurmetê nade jinê û şerê wê yê azadiyê û piştgiriyê nade, nikare di nav me de rizgariya netewî jî pêş bixe. Azadiya jinê asta azadiya civakê ye.” Wekî din di nirxandinên xwe de got, “Eger azadiya jinê pêş nekeve, azadiya Kurdistanê jî pêş nakeve.”

Di wê salê de li Ewrûpa Fatma heye û parêzer Hûseyîn ku li Ewrûpa kar dike, hevala Sara di pirtûka xwe de pir behs dike. Heya wê demê jî gumanên hevalan hebûn, lê tenê tedbîrên pratîk digirin. Hingê dixwest greva birçîbûnê bide sekinandin, ji bo vê hewl dide. Hûseyîn, Seher dixwazin xeta Semîr bi ser bikeve, lê dema dibînin ku bi ser nakeve, ew jî direvin.

## Damezrandına Yekemîn Rêxıstına Jın YJWK

Sala 1987’an biryar tê girtin ku, di bunya ERNK’ê de rêxistina jin a xweser were avakirin. Cara yekemîn jin êdî bi navê YJWK’ê (Yekîtiya Jinên Welatparêz ên Kurdistanê) rêxistina xwe ya xweser saz dike. Jin li Ewrûpa di navbera 31’ê Cotmehê û 1’ê Mijdara 1987’an de yekemîn kongreya xwe çêdike. Hevala Mizgîn (Gurbet Aydin) beşdarî kongreyê dibe û ew axaftina vekirinê dike. Li wir ji pirtûka Serok a bi navê **Jin û Malbat** tehlîlên li ser jinê tên xwendin, dîsa perspektîfên Wî tên xwendin. Li ser van encaman biryar tên girtin û bername di meha Hezîranê de zelal dibe û tevî

bernameyê îlankirina YJWK'ê tê ragihandin.

**Di bernamê de hinek beşên xwe wisa ne;**

"Rizgariya jinê, gava jin ji bin zext û kedxwariya neteweyî, sinifî xilas bibe, hêza xwe ya fikir û qabiliyetên xwe yên mejî li gorî feydeya civakê, bi azadî, bi terzekî demokratîk û bi însiyatîf bi kar bîne wê pêk were. Her çendî di cewher de pirsgirêka sinifî û şoreşa neteweyî hebe jî, mirov nikare çareseriya pirsgirêkên jinê yên di warê civakî, çandî, perwerdehî, tenduristiyê de bi tevahî daxe asta sinifî û şoreşa neteweyî. Di nava malbatê de weke cins li ser jinê zext û kedxwarî heye û rakirina vê aliyê duyemîn ê rizgariya jinê ye. Weke cins windakirina jinê û li ser sinifên kedkar avakirina serdestiya sinifê di nav hev de ye û bi hev re yekpare ne; li gorî vê, rizgariya jinê pirsgirêka rizgariya civakê ye. Asta azadiya di civakê de bi asta azadiya ku ji jinê re tê naskirin re tê pîvandin. Wekî civaka Kurdistanê, sedema bingehîn a rewşa jina Kurdistanê ya îro nîzama desthilatdariya mêtinger û feodal-komprador e. Pirsgirêka jinê ku bûye binkeya qeyran û dejenerebûnê, sedema vê yekê desthilatdariya burjûva ya kedxwar e." Wekî ji van nirxandinan jî tê fêmkirin dijmin tê zelalkirin, dijminê desthilatdar wekî dijminê esas tê nîşandan û çîna feodal komprador wekî dijminê yekemîn tê binavkirin. Her wiha pirsgirêkên çandî, perwerdehî, tenduristî, malbatî digire bernamê. Dîsa pirsgirêkên gelên din jî esas tê girtin.

Di Kongreya YJWK'ê de hevala Sakîne (Zelîha Toros) ji Pazarcikê ye, di rêveberiya YJWK'ê de cihê xwe digire. Li wir amade nebû ji ber ku li saha Serokatiyê bû, ji bo rêveberiyê tê hilbijartin. Piştî perwerdê derbasî qada Bakur-eyaleta Tolhildan dibe, piştre li Mereşê şehîd dikeve.

Wê wextê hevalên jin ji kêm tecrûbeyên xwe rêziknameyê ji hevalê Abbas re rêdikin, dixwazin nêrînên wî bigirin. Hevalê Abbas jî wê demê di zîndanê de ye. Rêziknameya PKK'ê çi be, hevalê Abbas ji bo wê heman tiştê pêşniyar dike û hinek nêrînên xwe

dibêje. Ev jî encamên bêtecrûbetiyê ne. Ferqa wê ev e ku, PKK partî ye, YJWK yekîtî ye û girêdayî ERNK'ê ye. Heya wê demê di tu Kongreya PKK'ê de hevalên jin di dîwana kongreyên partiyê de cih nedigirtin. Biryara birêxistinkirina jinê derdikeve û bi vî rengî di her qadan de wê komîteyên xweser çêbibin. Wê rêveberiya xwe hilbijêrin; nizanin, tecrûbe tune ye, ji bo vê yekê lîsteya xwe didin hevalê Cemal, ew jî lîsteyekê pêşkêş dike, rêveberî wisa tê neqandin. Biryara ku di tevahî qadan de komîteyên YJWK'ê bên avakirin derdikeve.

Sala 1988'ê li Tirkiyê jixwe OHAL pêş dikeve û êdî NATO mudaxelê Kurdistanê dike. Hingê Serokatî di dahûrandinên xwe de digot, "NATO bi riya Gladiyoyê mudaxeleyê hundirê Tirkiyê dike." Ya rastî mudaxele li ser PKK'ê tê kirin. Dadgehkirina hevalê Abbas, hevalê Fuat mudaxelekirina NATO'yê ye. Êdî zextên pir cidî li ser Tevgerê çêdibin. Ev tenê êrîşên Tirkiyê nîn in, ên NATO'yê ne. JÎTEM jî wekî rêxistina Gladîoyê ye.

Serokatî ji sala 1988'ê di saha xwe de giraniyê dide perwerdekirina hevalên jin. Mînak; di dewreyekê de 75 hevalên jin kom dibin. Di hemû qadan de êdî her kes dipirse ma wê kî derbasî saha Serokatî bibe. Ji bo çûyîna sahê û li gel Serokatî perwerde dîtinê eleqeyek tê nîşandan. Hin kesên tesfiyekar ji bo ku bikaribin jinê bixin bin kontrola xwe, soz didan ku wê wana bişînin saha Serok. Mînak; li Garzanê Ebûbekir soz daye gelek kesan ku wê wana rêbike Akademiya Mahsûm Korkmaz. Jin jî wekî riya azadiyê perwerdeya Serok dibîne. Jixwe Serok grûb grûb hevalan ji qadan dikişîne ji bo perwerdê.

Sala 1988'ê saleke ku qanûna leşkerî hîn derbasdar e, tevlîbûna hevalên jin pir zêde dibe. Ji bo vê jî tevlîbûnên jin zêde dibin. Ji ber ku di nav şerê gerîla de welatparêzbûn zêde dibe. Divê ev jî bê zanîn ku bîlançoya tevlîbûn û şehadetên wan salan li gel me nîn e. Mînak; hîn çend hezar şehîdên me hene, ev nehatiye zelalkirin. Di roja îro de xebateke arşîvê ji bo wê heye. Çend

nav anîna ser ziman nayê wê wateyê ku em ferq û cudabûnê dixin navbera hevalan. Em wekî sembol dixwazin destnîşan bikin. Ev ne ferq û cudabûna nava hevalan e. Şehîd Çiçek di sala 1988'an de bi qanûna leşkerî tevlî dibe. Hevala Medya Xinis jî bi wî rengî, hevala Nafiye, Gulîzar, li Dêrsimê û Garzanê çend heval hene, bi qanûna leşkerî beşdar dibin. Dîsa sala '88'an Aysel Çûrûkkaya ji zîndanê derdikeve û diçe pratîka Dêrsimê. Serhat (Hidir Kaya) heye, paşê direve, li wir Aysel heman pratîkên Fatma dimeşîne, perçiqîner nêz dibe. Di bin navê sîxuriyê de gelek kesan dikuje. Pratîkên wana yên bi vî awayî jî hene.

Êdî zehmetiyên jiyana çiyê ji bo jinê derdikevin holê, hinek tişt ji wana re giran tên. Tiştên ku me ji hevalên xort cuda dikin, hene. Mînak; di warê dabînkirina pêwîstiyên xweser de zehmetiyê dikêşin. Her wiha ferzkirinên zilam ên bi vî rengî hene: "Em çi bikin divê hûn jî bi wî awayî bikin!" Feqet jin bi qasî ku zilam bar radike ew nikare rake, lê belê ew bi zilam re dikeve reqabetê. Ji ber ku ew jî di çiyayan de ye û ji bo mayîna wê ew pêwîst e. Serokatî mîsyoneke wisa dide jin ku divê bi van ferasetan re nebin yek, ango rexne bikin. Lê wê demê berdêla rexneyan pir e, hele hele cihê ku tesfiyekarî lê hebe hêsan nîn e. Dema te ji Serokatî re rapor binivîsanda jî, li gel te rapora te diqetandin. Ji ber ku ew li wê derê serwer bûn. Ew mesafeyekê dixin navbera te û rêxistinê, ango têkiliya te û rêxistinê li ser wijdana wî dimîne. Dilê wî bixwaze wê têkiliya te bi Serok an jî Partiyê re çêbike, nexwaze çênake. Wê demê nêzîkatiyeke "ez ê rabim rexne bikim, ew ê jî rabe rexneya xwe bide" nebû, ewqas hêsan nebû. Hevala Sakîne Karakoçan behs dike; li Xakûrkê di manga wê de du hevalên jin digirin, ew jî qebûl nake, manga bi giştî tê girtin. Serok paşê mudaxele dike, wexta hevala Sakîne dipirse, jê re dibêjin ku kêmasî kirine û ji ber wê hatine girtin. Serok jî dibêje, wana berdin. Ji ber pîvanên feodal ji aliyê zilam ve tên ferzkirin. Heke bala we kişandibe di wêneyên berê de serê hevalên jin girtî ye. Ne ku bi dilê xwe dike, berevajî nêrînên wekî divê hevalên jin bêkefî neçin

hemberî xortan, bi wana re nekenin û pîvanên hwd. di wan salan de tên ferzkirin.

Bi rastî di wan salan de hevalên ku ew pêvajo jiyan kirine xwediyê vîneke pir xurt bûn. Hêdî hêdî zanebûna cins pêş dikeve, bi feraseta şoreşê tên nav refên gerîla, tên şoreşê, lê bi heman zehmetiyan re rû bi rû dimînin û ev dihêle jin hevdû bigirin. Li hemberî eynî zorahiyê li ber xwe didin, têkoşînê dimeşînin û xwe li hev digirin.

Di salên 1988'ê xeta tesfiyekar di zîndanan de jî dixwaze pêvajoyekê pêş bixe. Bi taybetî bi riya Şener dixwazin jiyana me, xeta me ya bîrdozî deforme bikin. Xeta reformîstan tê ferzkirin. Ya rastî xeta me xwe li ser esasê berxwedana zîndanan ava kir, têkoşîn hat pêşxistin. Wê demê Şener rêveberiya zîndanê digire destê xwe. Rexmê ku piraniya hevalên me li zîndana Amedê kom bûne, ew wana belav dike û perçe perçe dike, nahêle rêxistinek ava bibe. Esas polîtîkaya "perçe bike û birêve bibe" dixe meriyetê. Şener dixwaze reforma civakî li ser hevala Sara taybet ferz bike. Çima hevala Sara? Ji ber ku pêşenga berxwedanê ye, hevala Sara dixe hedef. Şener dixwaze xeta xwe li hemû zîndanan belav bike û helwestên berxwedanê lewaz bike. Hevala Sara di pirtûkên xwe de wê pêvajoyê wiha pênase dikir: "Me biryar girt ku em ê li ber xwe bidin, lê bi navê Komîteya Navendî digotin 'ne hewce ye', an jî digotin 'pêkanînên dijmin hene, wana qebûl bikin, ji bo ku tiştek bi kadroyên me neyê'." Dixwaze di bin re bi xeta berxwedanê bilîze.

Ji salên 1986'an heya '89'an di Rojavayê Kurdistanê de xebatên Serok hene, civakbûnê (gelbûn) çêdike. Mesela, Serok car caran gel kom dikir, ji wana re civîn çêdikir. Di civakê de jî êdî malbatê birêxistin dike, kadroyan rêdike nav gel, ên ku ji wir beşdar dibin heya salek du salan li wir xebatan dimeşînin. Ew jî dihêle gelek tevlîbûn çêbibin. Bi taybetî ev hemû xebatên Serok bûn. Hevala Rûken, hevala Sozdar, hevala Şîlan Kobanê û gelek hevalên din

wê çaxê tevlî dibin. Li Bakur jî bi vî awayî civak hêdî hêdî xwe birêxistin dike. Di wan salan de hevala Bêrîvan (Binefş Agal) li Cizîrê kar dike, ev li ser tevlîbûnên jin bandor dike.

Hevala Bêrîvan di meha Çile ya 1989'ê de li Cizîrê ji aliyê hêzên dewletê ve tê şehîdxistin. Berê li Ewrûpa di xebatên civakê de bû, ji ber vê li wir hemû gel hevala Bêrîvan nas dikin.

Salên 1988-89'an li Ewrûpa ji bo Kongreya YJWK'ê ya 2. amadekarî tên kirin. Li ser van esasan di navbera 29-30'ê Nîsana 1989'an de Kongreya YJWK'ê ya 2. tê lidarxistin. Ev kongre li ser bîranîna hevala Bêrîvan tê çêkirin. Tenê kadro tevlî nabin, di eyaletan de 13 herêm hene, ji wana jî 40 kes wekî mêhvan ji gel beşdar dibin. Kongreyeke ku gel tevlî bûye. Herî zêde xweserbûn tê nîqaşkirin ku wê pratîka wê çawa pêş bikeve. Rexmê gelek heval di xebatên giştî de ne, heman demê nûneriya xebatên xweser jî dikin. Û ev xebat esas xebatên jinê ne, wekî kêleka karê giştî were dîtin na, divê wek xebatek esasî birêxistin bike. Jin, esas divê xebatên jin ên xweser pêş bixin. A din jî şêwazê dogmatîk pir tê rexnekirin. Feraseta ku di vir de derdikeve, *giştî pêş bikeve, wê xweser jî pêş bikeve* ye. Zanebûna xebatên xweser pêş dikeve. Ferasetek din ku tê rexnekirin; kadroyên di wê xebatê de xwe azad dibînin. Çima? Ji ber ku kadro ye, tevlî Partiyê bûye. Nexwe pirsgirêkên azadiyê tenê ji civakê re derbasdar e, wisa tê destgirtin. Di wê kongreyê de rêveberiya navendî tê hilbijartin. Ji ber bêtecrûbetiya xwe gazî hevalê Cemal dikin û ew lîsteyekê pêşkêşî wan dike û bi vî awayî tê hilbijartin. Pênc esîl û du yêdek 7 endamên navendî yên tevgerê tên hilbijartin; hevala Sozdar Avesta, hevala Mîne (Emel Çelebî), Delal, Ayten, Xanê, Zelal û Şafak.

Hevala Sara, ji bo kongreyê ji zîndanê nameyekê dinivîse û ew tê xwendin. Li welat di bin fermandariya hevala Azîme ya Mezin de yekîneyên jin hene. Li welat hema bi giştî ser 50 kesan re hevalên jin di pratîkê de ne, hevala Azîme jî wêneyê hemû hevalan bi hev re dikişîne û ji kongreyê re rêdike. Cara yekê li Ewrûpa

wêneyê hevalên jin ên gerîla dibînin, ev jî kêfxweşiyekê çêdike.

Di sala 1989'an de her ku diçe tevlîbûna jinan zêde dibe. Jixwe qanûna leşkerî heye, heval jî di qadan de xebatê dimeşînin û heman demê şehîd dikevin. Bi taybetî li Cizîra Botan şehadeta hevala Bêrîvan bandorekê dike û hiştiye ku gelek tevlîbûn çêbibin. Heman salê ferasetên ku divê em rexne bikin, meylên tesfiyê binkeftina xwe bi jinê rave dikin. Dibêjin hevalên jin giraniyê çêdikin, bi vî awayî pratîka xwe bi jinê rave dikin. Heya roja îro jî ev nêzîkatî cih cihan pêş dikevin. Ji ber hejmara jin jî zêde bûye, ji bo vê hevalên jin wekî barê giran dibînin, bawerî nadin. Jinê ji binketina pratîka xwe re dikin sedem. Di '89'an de Metîn (Şahîn Balîç) diçe Akademiya Mahsûm Korkmaz, li Bekaayê ferasetên tesfiyekariyê ferz dike. Gelek ciwanên nû tevlî dibin, di bin navê *sîxur in* de, rexmê li saha Serokatî ye, li Bekaayê wana qetil dike.

Kongreya YJWK'ê ya 3. di navbera 10-11'ê Tebaxa 1991'ê de li Ewrûpa, bi tevlîbûneke girseyî tê lidarxistin, nêzîkî 1500 kesan tevlî dibin. Jixwe gelek kesên di nav gel de agahiya wan nebû ku kongre ye, heya ku Serokatî bi riya telefonê pêwendî çêdike û beşdar dibe. Gelek endamên xebatên me yên Ewrûpa tevlî dibin. Di wê kongreyê de jî biryara ku dewreyên perwerdê yên xweser ji gel re bên vekirin, tê girtin. Du beş tên vekirin; yek tirkî û yek jî kurdî. ERNK, cara yekê xwe li Ewrûpa birêxistin dike, ew jî xebatên gel ên civakê ye. Tevahî rêxistinên xweser jî di bin sîwana ERNK'ê de xwe birêxistin dikin. Her çiqasî nûneriya gerîla bike jî, tam nagire nava xwe. Piştî hejmara hevalên jin di gerîla de zêde dibe, êdî di qada leşkerî de pergala mange, taximên xweser çêdibe.

Cara yekemîn tevgera jin sê kongreyên xwe çêkirine, lê zêdetir li ser esasê birêxistinkirina civakê derbas bûne. Êdî xebatên Rojava û Bakur çêdibin. Ango YJWK, bandora xwe li ser xebatên perçeyên din jî dike. Li Rojava jî dewreyên perwerdeya jinan destpê dikin. Her çendî giştî gerîla nagire nav xwe jî, xwedî derketineke li

gerîla heye.

ERNK, xwe li Bakur jî birêxistin dike. Di salên 1990'an de di pêvajoya hevala Sara hîn li Bakur de, cara yekê YKD (Komala Jinên Welatparêz) tê avakirin û jin xwe birêxistin dikin. Hevala Sara perspektîfa wê dide, L… jî di wê xebatê de cih digire. Ev jî di bin sîwana ERNK'ê de xebat dike, lê heman demê girêdayî YJWK'ê ye. Her wisa di kongreyê de biryara derxistina "Kovara Jina Serbilind" tê dayîn, ew jî kovara yekemîn a jin e û heya roja îro heye.

***Şehadetên jin ên di navbera salên 1980-1990'an de:***

Di navbera salên 1980-90'an de dibe ku gelek şehîdên din hebin, lê navên ku di dîrokê de derbas dibin ev in:

**Hevala Besê Anûş;** ji Pazarcikê ye, keça malê ya yekane ye û zewicî ye. Bi hevjinê xwe re tevlî PKK'ê dibe û qada ku hevjinê wê lê dimîne, ango hevjînê wê li eyaleta Tolhildanê berpirsiyarê leşkerî ye. Piştî Komkujiya Mereşê bi hev re giraniyê didin ser perwerdeyên leşkerî. 17'ê Adara 1981'ê şehîd dikeve. Hevala Besê wiha digot, "Xeyala min a herî mezin ew e ku, jin xwe bi xwe birêxistin bike, perwerde bibîne". Vê ji xwe re wekî hêvî û hedef datîne. Xuya ye heya astekê zanebûna jinê dijî, bi vîn û fedakarbûna xwe tê nasîn. Di pêvajoya darbeya 12'ê Îlonê de dixwazin derbasî saha Rojhilata Navîn bibin, lê belê xwe tavêjin qadên çolan. Di wê demê de 15 heval xwe paşve dikêşin û pênc pênc di stargehan (sığınak) de dimînin. Rojekê devê wê stargehê vedikin û şivanek wana dibîne, paşê ew şivan diçe cem dijmin, wana îxbar dike û bi vî awayî dijmin tê ser wan. Her çiqasî hewl dide bireve, ji ber çek li gel nîn e, nagihe û tê şehîdxistin. Piştî şehîd dikeve, gel li cenazeyê wê xwedî derdikeve. Ya girîng jî ev e ku, gel li Pazarcikê bi awayek girseyî xwedî li cenazeyê hevala Besê derdikeve.

**Hevala Azîme Demîrtaş;** ji Dêrsimê ye, di 26'ê Kanûna 1981'an

de şehîd dikeve. Ew jî dixwaze derbasî saha Rojhilata Navîn ango saha Serokatiyê bibe. Êvarê di cihekê re derbas dibin, li wir agir pê dixin, hin kes wana dibînin û îxbar dikin. Li ser van esasan dijmin tê ser wan û wana şehîd dixe. Hevala Azîme xwedî tecrûbeya çiya bû û di qadên çolê de çalakvan bû. Her xwe perwerde dikir û taybetmendiyên Dêrsimê yên serhildêr jiyan dikir.

**Hevala Seadet (Rahîme Kahraman);** ji Karakoçanê ye. Dîrok tam zelal nîn e, li gorî agahiyên heyî sala 1983'yan ji saha Serokatiyê tê qada çiyê, demekê li Lolanê dimîne, paşê derbasî Botanê dibe û li Besta di kemîneke dijmin de şehîd dikeve. Dîroka wê tam zelal nîn e. Piştî ku şehîd dikevin, dijmin ji bo bandora ku gerîla li ser gel kir bişkîne, bi her şêwazan antî-propaganda dikin. Li ser vê hevalê jî dijmin dibîne bakîre ye û fermandarekî dijmin dibêje, "Niha ev li cem we bûya, wê di çi halî de bûya! Ewqas sal in di çiyê de ye, lê bakîre ye." Ev yek di civakê de belav dibe; jin di çiyê de bi zilam re jiyan dike, lê bakîrebûna xwe diparêze ango bi exlaq jiyan dike. Gel tirba wê hevalê ji xwe re dike ziyaret, heta li Cizîrê Kamîl Atak ê serbazê cerdevanan, diçe ji ser tirba hevala Seadet, axa wê ji xwe re radike. Ewqasî pîroz tê dîtin.

**Hevala Turkan Derîn;** sala 1985'ê bi nexweşiyê şehîd dikeve, lê der barê wê hevalê de pir agahiyên me tune ne.

**Hevala Sultan Yavûz;** ji Hîlwanê ye. Di navbera çend eşîran de xwîndarî hene û ji bo lihevhatinê keçên xwe didin hevdû. Hevala Sultan jî dixwazin bidin xwîndarên xwe, lê ew vê kevneperestiyê red dike. Jixwe kevneşopiyê red dike û di encamê de tevlî rêxistinê dibe. Di grûba yekemîn a akademiyê de cihê xwe digire, perwerdeya leşkerî jî dibîne û li wir birîndar dibe. Ew jî di 26'ê Gulana 1988'ê de li Bênavoka ser bi Şemzînanê di şer de şehîd dikeve. Li wir 8 heval bi hev re şehîd dikevin. Hevalan digotin dema şehîd dikeve, hingî xistibû hembêza xwe bi zorê çek ji destê wê derdixin.

**Hevala Havva (Hanim Yaverkaya);** ji Hîlwanê ye, keça Dayê

Dûre ye. Dema dibîne dayîka wê tê girtin, wekî berteka li hemberî dijmin tevlî rêxistinê dibe. Ew jî di grûba yekemîn a derbasî Botanê dibe de ye, li Erûhê fermandara mangê ye. Ji bo artêşa me divê bê xuyakirin ku wekî fermandarekê bû. Taybetmendiyên xwe yên şerker, bi însiyatîf hene, cara yekê di nav hevalên jin de fermandarî kiriye. Li Erûhê di nava şer de şehîd dikeve. Agahî der barê şehadeta wê de tune ye.

**Hevala Adîfe Sakik;** ji Mûşê ye, heman demê xwişka Şemo ye. Sala 1985'an li Sasonê dema ku dixwaze derbasî saha Başûr bibe şehîd dikeve. Li Garzanê bandora xwe hiştiye û bûye sedem gelek kes ji wir tevlî rêxistinê bibin. Li Sasonê gelek malbat navê zarokên xwe dikin Adîfe.

**Hevala Rûken (Çîçek Selcan);** di dawiya sala 1981'ê de li Dêrsimê tevlî bûye. Taybetmendiyên xwe yên birêxistinkirinê hene, di warê teorî de zanebûna xwe pir e. Hevala Sara jî di pirtûka xwe de tîne ziman: "Ji me re manîfesto dixwend." Bi piranî wê perwerde û semîner dida hevalan. Demekê di qadên çolê de dimîne, paşê derbasî saha Serokatî dibe û dîsa derbasî welat dibe. Li Botanê gerîlatiyê dike û di bihara 1985'ê de li Besta di nav şer de şehîd dikeve. Ji bo artêşa me ew jî fermandarek e.

**Hevala Zahîde;** ji gundê Xirbika Besta ya ser bi Şirnexê ye, di sala 1988'an de li Xirbikê Besta şehîd dikeve. Li Botanê rola xwe lîstiye.

**Hevala Cahîde;** ji Batmanê ye. Di warê siyasî û teorîk de xurt e. Derbasî Botanê dibe, piştre dîsa tê Lolanê, li wir kovara bi navê Pêşmerge derdikeve û di derxistina wê de cih digire. Ji destê Fatma zehmetî dikişîne, lê dîsa jê bandor nabe û terzê Fatma rexne dike. Li Botanê sala 1991'an şehîd dikeve. Tam zelal nîn e, lê heval dibêjin bi aşûtê şehîd dikeve.

**Hevala Zozan (Saniye Ürün);** ji Baykanê ye. Di 1988'an de tevlî bûye û di 29'ê Mijdarê 1989'an de şehîd dikeve.

**Hevala Dîcle Kobanê;** ji Rojava ye. Ew jî ji bo bikaribe tevlî Partiyê bibe bi pismamê xwe (pismamê wê piştre îxanet dike) re dizewice û roja destpêkê ya zewacê tevlî dibe. Jixwe zewaca wana li ser esasê tevlîbûnê pêk tê. Hevala Dîcle sala 1986'ê tevlî xebatan dibe, sala 1987'ê li akademiyê perwerde dibîne. Sala 1988'ê dema derbasî welat bibe, li ser Ava Hêzil dikevin kemînekê û şehîd dikeve.

**Hevala Rûken Efrîn;** jî yek ji hevalên jin ên destpêkê tevlî rêxistinê bûye. Bi qasî hatina wê ya nav têkoşînê, jiyan û şehadeta wê jî bi lehengî çêbûye. Hevala Rûken ji bo tevlî Partiyê bibe çend caran ji malê direve û malbat cardin tê, wê paşde dibe. Malbat dixwaze wê bi zorê bizewicîne, lê ew şeva dawetê direve û tevlî Partiyê dibe. Tevlîbûna wê sala 1987'ê çêdibe û sala 1988'ê tevî hevala Dîcle Kobanê li ser Ava Hêzil şehîd dikeve.

**Hevala Leyla Efrîn;** di sala 1986'an de têkoşîna me ya azadiyê nas dike, sala 1987'ê ji Rojava tevlî rêxistinê dibe. Ew jî li saha Serokatî perwerde dibîne û di 1987'an de dema derbasî welat bibe, di deşta Sîlopya (Bakur) de şehîd dikeve.

**Hevala Perwîn û Peyman**; ji malbatên welatparêz ên Kobanê ne. Her çendî dîroka şehadeta wana tam zelal nebe jî, li gorî agahiyên hene hevala Perwîn sala 1987'ê dema derbasî welat bibe şehîd dikeve. Taybet hevala Peyman, li Cizîrê Botan di asta berpirsiyara herêmê de xebatan dimeşîne. Dema ji wir dixwaze derbasî Gabarê bibe, tên îxbarkirin û di rê de dikeve kemînê dijmin, wisa şehîd dibe.

**Hevala Sozdar;** yek ji hevalên destpêkê ye ku ji Qamişlo tevlî rêxistinê dibe. Der barê şehadeta wê de zêde agahî tune ye.

Ji şehadetên jin ên di navbera salên 1980-1990'î de çêbûne hevalên weke nav tên naskirin, ev heval in û heman demê ev heval berpirsiyariya serdemekê digirin ser xwe.

# BEŞA DUYEMÎN

## PÊVAJOYA ARTÊŞBÛNÊ Û PÊŞKETINA ÎDEOLOJIYA RIZGARIYA JINÊ

### Dı Serhıldanan De Pêşengıya Jın

Der barê dîroka Tevgera me ya Azadiya Jinê de ku em salên 1990’an binirxînin; bi giştî di sala 1990’î de li cîhanê pêşketinên cuda hene. Rûsya bloqeke ji bo tevgerên şoreşger, têkoşîna neteweyî û hwd. Dibe ku yek bi yek piştgirî nedida, lê wekî bloq piştgiriyek bû. Ji bo eniya çep û beşên demokrat, tevgerên netewî wekî hêviyekê bû. Di salên ‘90’an de Rûsya Sovyetan sîstema xwe hilweşiya. Kapîtalîzmê bi vê hilweşînê re serkeftina xwe ragihand. Êdî dunya ji du qutûban bû yek qutûb. Ev pêşketinek cuda bû. Li ser wî esasî wê demê rêveberiya Amerîka diguhere, Clînton tê ser rêveberiyê û hemleya xwe ya yekemîn li ser Rojhilata Navîn pêş dixin. Li Iraqê alozî derdikeve, Şerê Kendavê diqewime. Kapîtalîzm, serkeftina xwe îlan dike û ji bo xwe hîn pêşve bibe amadekariyên mudaxeleya li ser Rojhilata Navîn dike. Elbet hilweşîna Rûsya Sovyetan di hinek tevgeran de bêhêvîtiyê pêş

dixe, şerê qutûban bi dawî dibe. PKK jî her diçe asta têkoşîna xwe bilind dike, tevgera me wekî hêvî ji eniya sosyalîzmê re pêşengiyê dike, wê valabûna heyî dadigire. Ev pêşveçûn hem bandorê li nav me dike, hem jî dihêle Tevgera me wekî hêvî bandora xwe li ser hawirdorê xuyayî bibe.

Li ser vî esasî di sala 1990'an de êdî PKK civakî dibe, bi kadroyan re sînordar mayînê derbas dike. Beriya wê grûbekê destpê kir, bû partî, di çiyê de xwe birêxistin kir, hêdî hêdî xwe di nava gel de jî birêxistin kir û di salên '90'î de gihîşt asteke herî bilind. Heta di salên 1992-93'yê de ev hevsengî berdewam dike. Di asta stratejiya şer de em vê wekî merheleyekê dinirxînin. Çima? Ji ber êdî dijmin nikare me tune bike, em di herêmê de wekî aktorekê derdikevin holê. Ev ne pêvajoyek e ku tu hêsan bigirî dest, pêvajoyeke karaktera xwe wisa ye.

Berê jî me anî ziman ku piştî salên 1987-88'an li Tirkiyê Rewşa Awarte (OHAL) hatiye îlankirin, êrîşên GLADYO, NATO û yên sîstemê dikevin dewrê. Meylên bi vî awayî hene, lê em wekî rêxistina PKK'ê di qada navnetewî de tên nîqaşkirin. Di wê demê de hêzên Moderníteya Kapîtalîst ku dixwazin mudaxelê Rojhilata Navîn bikin, li pêşiya wana kî asteng e? PKK ye, ji bo wê amadekarî dikin, dinêrin ku nikarin bi vî awayî PKK'ê hilweşînin. Vê carê çi digotin? *"Ji PKK'ê re erê, ji APO re na!"* Ji ber xeta Serok cuda ye, alternatîf e, wisa dikin hedef. Di encamê de dixwestin bi riya çeteya navxweyî dest bavêjin PKK'ê jî.

Me berî niha jî behsa Şener kiribû; di zîndanê de meylên tesfiyekar, marjînal, ferasetên derveyî xeta partiyê ferz dike. Li aliyê din, Şener ji bo ji Hereketê re serokatiyê bike tê amadekirin. Mînak; di wê pêvajoyê de Şener ji zîndanê derdikeve. Ya rastî ev konsepteke wisa ji rêzê nîn e, her tişt bi zanebûn çêdibe. Şener, piştî derdikeve diçe saha Serok, li wê derê serokatiyek sexte pêş dixe. Herî zêde jî dixwaze jinê bi kar bîne. Esas hedef ev e, here tevahî qadên rêxistinê têxe destê xwe. Di wê demê de li Ewrûpa

hevalê Fuat û hevalê Abbas tên girtin û darizandin. Serok dibêje, esas ev jî amadekariya vê bû. Hêzên navnetewî dibêjin, “eger em îradeya wan teslîm bigirin, em ê xeteke sexte bi serokek sexte bidin avakirin. Em bi êrîşên wisa re rû bi rû bimînin jî, li kêleka vê Tevger roj bi roj fireh dibe, girseyî dibe. Ji bo wê em vê pêvajoyê heta ‘93’yan di aliyê Tevgera xwe de wekî pêvajoya serhildanan bi nav dikin.

Di dîroka Tevgera me de çar qonaxên serhildanê hene:

**Qonaxa 1.-** Serhildana gel a bi çalakiyên Hîlwan-Siwêregê destpê bûyî. Ev rabûneke girseyî ye, tenê bi çalakiyên kadro re sînordar namîne.

**Qonaxa 2.-** Serhildanên ji pêvajoya 1989’an heya 1992-93’yan didome ku, em bi esasî jê re dibêjin *Pêvajoya Serhildanên ‘90’î*. Ev pêvajoya serhildanan ji Cizîrê destpê dike, heya Nisêbîn, Amedê belav dibe.

**Qonaxa 3.-** Pêvajoya Komploya Navnetewî ya li ser Serokatî ye, ew jî ji sala 1998’ê heya sala ‘99’ê didome. Karakterê vê serhildanê cuda ye û her çar perçeyên Kurdistanê digire nava xwe.

**Qonaxa 4.-** Pêvajoya serhildanên Şerê Gel ê Şoreşgerî ye. Ev qonax esas bi sala 2011’ê re destpê dike, sala 2012’an bi pêvajoya Şoreşa Rojava re digihe lûtkeyê. Dîsa sala 2012’an pêngavên gerîla di qadên çiyê de destpê dikin, bi esasî li Bakurê Kurdistanê jî bi sala 2015’an destpê dike, heya 2016’an didome. Bi cewherî ev qonax ji sala 2011’ê destpê dike û heya sala 2016’an didome.

Van serhildanan mohra xwe li dîroka me ya têkoşîna azadiyê dane. Ji bo wê em dixwazin hinekê li ser pêvajoya sala 1990’î bisekinin.

Ji serhildanên yekemîn ên herî mezin çêbûne li milê Kerboran, Hezex û deverên din destpê dike, lê vana ji gerîla qut nîn in. Di wan pêngavan de esas êdî gel û gerîla dibin yek. Ya yekê, sala

1988'an li çiyayê Bagokê şerekî dijwar diqewime û berxwedana hevala Ayten mohra xwe li wî şerî dixe. Heta stranek bi navê "*li Mêrdînê li Bagokê, şer dewam kir şev û rokê*" li ser wê bûyerê heye. Hevala Ayten bi eslê xwe ji Nisêbînê ye û fermandara eyaleta Mêrdînê ye. Hevalê Sabrî endamê yêdek ê Navenda Partiyê ye. Du grûb ji hev cuda ne û dikevin nav şerekî dijwar, heya gel yekser li wan temaşe dike. Mêrdîn jî cihekî wisa ye gerîla nêzîkî navçe û gundan e, ji ber wê gel her tiştî li ber çavên xwe dibîne û xwe jê dûr naxe. Ew jî dibe wesîle ku serhildan destpê bike. Cara yekê li wir çeka afarof (weke BKC'yê ye) tê bikaranîn, heval wê çekê ji saha Serokatî tînin. Wê wextê ew çek tune bûn, hevalan bi zorê qilêşek peyda dikirin, ji bo wê qîmeta vê çeka afarof cuda bû. Bi giştî li wir 8 hevalên me şehîd dikevin û di sala 1988'an de li Nisêbîn, Hezex û Kerboranê gel radibe serhildanê.

Li eyaleta Mêrdînê Stewrê jî sala 1990'î 13 heval bi komployekê tên jehrkirin û şehîd dikevin. Di wê bûyerê de hevalê Kamûran, Dundar û hevalên din şehîd dikevin û gel xwedî li cenazeyê hevalan derdikeve. Li wir yekbûna gel û gerîla çêdibe. Ev şer li ser Nisêbîn, Cizîr, Kerboran û derdorê bandor dike.

Li Cizîra Botanê hevala Bêrîvan (Binefş Agal) heye. Ew bi xwe ji Batmanê ye, heman demê Êzidî ye. Xwişka wê li Ewrûpa zewicî ye, diçe gel xwişka xwe û ji wir tevlî Partiyê dibe. Li Ewrûpa heya demekê di nav xebatan de dimîne, paşê derbasî saha Serokatî dibe û li Rojava jî di nav gel de xebat dike. Ji ber wê hemû gelên herêmê wê nas dikin. Di xebatên birêxistinkirina gel de pêşengiyê dike, bandora xwe dike. Meha Çile ya 1989'an wê biçin bi 2 milîsan re civînekê çêbikin, lê yek ji wan sîxur e. Dema wê bi rê bikevin ew kesê sîxur jê re dibêje, "ji ber xeter e di rê de çekê nebe, ez ê paşê bidim te." Ango çekan digire û ji hevala Bêrîvan û wî kesê milîs qut dibe. Ew sîxur îxbar dike. Ji bo ku hevala Bêrîvan û ew kesê milîs bikaribin xwe veşêrin xwe didin malekê, lê malbat nizane çi bûye. Zilamek extiyar heye, dema polîs bi cilên sivîl tê û pê re kurmancî diaxive û dibêje, "Zilamekî jina min revandiye,

hatine van derdoran. Te nedîtiye?" Li ser vê ew zilamê extiyar cihê wan eşkere dike, yanî nizane ew heval e. Di encamê de dijmin wan dorpêç dike, lê ji ber çek bi wana re nîn e sax dikevin dest. Bi vî awayî dijmin zêde êşkenceyê li wan dike. Hevala Bêrîvan her dema êşkence dibîne qîr dike ku gel pê bihese û rabin. Jixwe bi êşkenceyê şehîd dikeve û cenazeyê wê bi panzêrê ve girê didin, ji bo bibe îbret wê di bajêr de digerînin. Niha gelê Cizîrê vê bûyerê ji xwe re wekî rûreşiyê dibîne, xwe deyndarê şehadeta hevala Bêrîvan dibîne, ji ber ku îxbar li gel wan çêbûye, li wir tê girtin, êşkence dibînin û tên qetilkirin. Yek jî hevalek jin e û nirxê civakê li beramberî wê heye. Dijmin jî bi her awayî dixwaze bi cenaze bilîze, ji ber wê mijarên namûs û hwd. hemûyan binpê dikin. Li ser van esasan salên salvegera şehadeta hevala Bêrîvan gel ji bo wê radibe serhildanê. Keda wê pir çêbûye, kolan bi kolan, tax bi tax, mal bi mal geriyaye, gel birêxistin kiriye û gel wê nas dike. Şehadeta hevala Bêrîvan jî dibe wesîle ku gel rabe serhildanê. Ha wê demê li Cizîrê serhildanek mezin tê lidarxistin, her wisa rabûnên li Cizîr û Nisêbînê wekî pêlekê pêş dikeve û li tevahî Kurdistanê, heya Ewrûpayê belav dibe. Girseya me ya li Ewrûpa ji sala 1992'yê heya '94'an ku di vê navberê de çalakiya hevala Ronahî û Bêrîvan pêk tê, pêvajoyeke serhildanan e.

Piştî Cizîrê, vê carê li navçeyên Amedê Kulp û Licê serhildan çêdibin. Zivistana 1991'an di araziyê Pasûr (Kulp) û Mûşê de, serê sibê di berfê de 13 heval li Serê Spî şehîd dikevin, di nav wana de hevalê Şêxmûs hebû. Hevalekî bi nav û deng e, daweta xwe dike, paşê hevjîna xwe digire û tên tevlî Partiyê dibin. Gelê Pasûrê dixwazin biçin xwedî li cenazê wan derkevin, rexmê giştî arazî berf e û çiyayî ye jî gel heya Serê Spî diçe. Ev serhildana gel jî li ser esasî xwedîderketina li cenazeyê hevalan pêk tê, ango êdî Amed pêla serhildanê dewr digire.

Di vir de ya herî girîng, di hemû perçeyan de her jin pêşengiya van serhildanan dike. Jixwe ya ku dihêle PKK girseyî bibe, gel rabe ser lingan pêşengiya jin e. Elbet têkoşîn heye, hevalên xort

tevlîbûna xwe hene, şer dikin, bi giştî kedek heye, lê bi qasî jinê bandora xwe li ser civakê nîn in. Êdî exlaqê jiyana PKK'ê civakê bandor dike, sekna jinê bandor dike. Bêguman ev kedek mezin e, gel li ser vî esasî radibe serhildanê. Divê tevgera jin wê pêvajoyê wekî perçekî ji dîroka xwe binirxîne.

Sala 1990'ê 21'ê Adarê di Newrozê de hevala Zekiye Alkan li ser sûrên Amedê agir berdide bedena xwe. Cara yekê di zîndanê de hevalê Mazlûm Doğan bi peyama "Em Newrozê bi bedena xwe pîroz dikin", bi 3 kibrîtan temsîla wê dike. Ya rastî ew jî pêlek e, belav dibe. Yek jî li Amedê ji ber bandora agirê ku Mazlûm Doğan pê xistiye, li wir bû û bi Zekiye Alkan re domand.

Zekiye Alkan, bi eslê xwe ji Dêrsimê ye. Esas malbata wê koçberî Erzîncanê bûye û li wir mezin dibe. Demekê bi malbatê re li Îzmîrê jiyan dike. Lêgerînên xwe yên nasnameyê pir xurt in. Fakulteya Tenduristiyê (TIP) dixwîne, li nexweşxaneya TIP a girêdayî zanîngeha Dîcleyê, li ser derî wê demê wêneyê hevala Zekiye Alkan daleqandîbû. Li Silêmaniyê peykerê wê çêkirine. Wê çaxê fakulte di destê xwendekarên welatparêz de bû, ji bo vê kesî nedikarî zêde mudaxele bike. Hevala Zekiye hevalek ji rêzê nebû, bi moral bû, zindî bû û redên xwe hebûn. Jê re digotin "Zekiya Entel" ango zanebûna wê ya entelektûel pir bû. Dema çalakiya xwe dike dibêje, "***Agirê Newrozê herî baş wê di bedena însanan de bişewite.***" Esas ev çalakiya bedena xwe şewitandinê destpêkê ye.

Der barê hevala Zekiye de nirxandinên Serokatî hene. Li ser wê dibêje, "*Mazlûm çawa ku di zîndanê de li hemberî teslîmiyeta li ser Partiyê tê ferzkirin çalakiyek mezin e û bi şehadeta xwe dibe serkeftina vê, berxwedana Zekiye Alkan jî dibe derbaskirina tepisandin, tirs û bêçaretiya li ser Amedê, her wisa li ser tevahî Kurdistanê û gelê Kurd hatî ferzkirin. Herî kêm têkiliya vê bi wê re çêdike, dixwaze xwe derbasî berxwedaneke wisa bike.*

*Tê gotin rêheval Zekiye, hewl daye bibe jineke azad, lê belê ev bi ser nexistiye, tengav bûye, li hemberî vê bihêrs bûye û adeta*

*wisa dom kiriye, tam jî di pêvajoyek wisa de serî li çalakiyek wisa dixe. Ji bo me ev hîn watedar e. Jixwe keseke rihet û ji xwe bawer çalakiyeke wisa mezin nake. Keseke ji xwe memnûn, dildara xwe qethiyen çalakiyek wisa nake. Lêgerîna wê ya jina azad girîng e. Ev lêgerîn nehata destpêkirin jixwe gengaz nebû çalakiyek wisa bike, ji bo wê cesaret bike.*

*Lê belê tam negihîştina çareseriyê jî divê bi wate were pêşwazîkirin. Ji ber şerê azadiyê, çalakiya wê dê hîn bi rêxistinî bike, hîn bi plan pêş bixe. Lê cardin dixwaze bibe çalakiyeke mezin, bibe dildariyeke azadiyê ya mezin. Vê jî, di Newrozê de li ser sûrên Amedê xwe dike meşale, wisa îlan dike. Dîsa mirov dikare bibêje watedar e. Jinbûna wê hîn zêde tê fêmkirin. Ji ber însan encex gava nakokiyeke wisa zêde bijî dikare bigihe wê cesaretê.*

*Di rastiya rêheval Mazlûm de jî ev heye. Ew dibe ruhê partiye, dibe ruhê berxwedana mezin a partiyê. Li wir êdî însanek heye, ev jin e yan jî zilam e, qet girîng nîn e. Li wir berxwedana însan a herî mezin, çalakiya wê ya mezin mijara axaftinê ye. Di vir de jî jinbûna wê hîn watedar e. Çima? Ji ber Amed bi xwe ji jineke fahîşe ya herî zêde weriyayî rewşeke hîn xirab dijî. Yanî zilamtiya di wir de ji jinê hîn xirabtir e, di rewşeke hîn jêr de ye. Esas ji fahîşeyekê hîn xirabtir e. Teqez ger em ê behsa bandoreke Amedê bikin, an jî em ê bêjin cihekî navenda Kurdistanê ye, dema nirxandina jina fahîşe tê kirin, tê xwestin ku sînorê ketinê were xêzkirin, Amed di wan şert û mercan de ciheke ku hinekê jî dişibe vê yekê. Tê evqas bibî navenda mêtingeriyê, tê evqas bêdeng bimînî û her roj evqas bê perçiqandin, bê tecawuzkirin: Ev, ji derveyî jina fahîşe tu wateya xwe nîn e. Ji vî alî ve destgirtina wê dibe ku bibe mijara axaftinê. Li hemberî vê mutleqa nerazîbûnek pêwîst e. Nerazîbûna jina fahîşe yan jî jina ketî tê fêmkirin. Li gorî ku Amed wisa bûye, li hemberî wê divê nerazîbûnek were raberkirin. Di vê şehadetê de mutleqa bandoreke vê li ser heye.”* Tabî li cihekî wekî Amedê lidarxistina çalakiyek bi vî rengî hîn watedar e. Vê dema dawiyê hinek dayîkên gerîla çûbûn, li ber bînaya partiyê

rûniştibûn, zarokên xwe dixwestin. Serok ji bo wê jî got, ev fahîşetî ye. Ya rastî bedena xwe firotina dijmin e, teslîmbûn e, lewma dibêje navenda Amedê ku wekî pozîsyon xwe difiroşe, di cihekî wiha de çalakiya hevala Zekiye li beramberî wê bersivek e.

Sala 1991'an Kongreya PKK'ê ya 4. tê lidarxistin. Cara yekem kongreyeke Partiyê li welat pêk tê, yên din hemû li saha Serokatî çêbibûn. Bi bandora serhildanan tevlîbûnên ji bo gerîla gelekî zêde bûn. Asteke xwe girtiye, hedefa artêşbûna gerîla mezin dibe û fermandarî zû pêş dikeve. Serokatî heta ji bo vê pêvajoyê pênaseya "*nexweşiya zû desthilatbûnê"* dike. Hêja ye mirov tehlîlên vê bike. Hinekê bandora kesayetên Kurd hene. Nimûne; dema derfet dibînin xwe winda dikin. Dîsa mezinbûna Tevgerê wana dixe hewayek cuda. Berê ku meyla tesfiyekaran heye, vana meylên şaş ên wekî zû bûyîna desthilat dimeşînin. Ew jî dihêle perspektîfên desthilatdariyê di Kurdistanê de belav bibin. Heya salên 1993'yan Tansu Çîller îtiraf dike, wiha dibêje: "Me esas li Kurdistanê desthilatdarî winda kiribû." Fermandarek bêy ku kesayetek pijiyayî be, di warê xetê de xwe zelal bike zû dibe fermandar. Bi derfetên şoreşê yên çêbûne xwe bi wana dixapîne, serkeftinên ku hene wek ên xwe dibîne. Rexmê hejmara gerîla zêde bûye jî, derfetên ji bo çalakiyan nehatin nirxandin. Ji bo vê êdî ev kongre dixwaze hemleyeke nû pêş bixe. Hejmara gerîla êdî zêde bûye, di şer de dipije, astek çêdibe. Rast e bandora civakê li ser tevlîbûnan çêdibe, lê êdî şerê hundirîn destpê dike, nakokî zêde dibin û ev nakokî ji bo pêşveçûnê girîng in. Nakokî bingeha pêşketinên nû jî ava dike. Mixabin rexmê derfet hene jî, çalakiyên pir mezin nayên kirin. Halbûkî derfet heye, şert û merc guncaw in, dikarin pêş bixin. Li Rojhilata Navîn giştî valahiyeke otorîteyê tê jiyîn. PKK aktorê şoreşê ye, dikare şoreş bike û derfet heye, lê ew baş nayê nirxandin.

Gel radibe ser lingan, diviyabû parastina vî gelî bihata kirin. Sala 1992'yê li Şirnexê komkujî tê kirin, lê parastina gel pir pêş neket, ji ber wê Serokatî heya roja îro rexneya wê dide. Dijmin bi

tankan, bi panzêran dimeşe ser gel; zarok, jin, ciwan şehîd dikevin. Erê gerîla û gel bi hev re rabûn, lê bes gerîla ne di pozîsyona parastina gel de bû. Ev rewş bi giştî di Kongreya PKK'ê ya 4. de tên nirxandin. Bêguman ev kongreya ku Serok kom dike, vê rewşê dinirxîne. Derfetên hene wê çawa bên nirxandin û bifetilînin şoreşê? Nexweşiyên zû desthilatbûnê wê çawa bên mehkûmkirin? Li hemberî wê alternatîf çi ye? Gerîla ji bo rabûna gel, wê çawa wan pêşwazî bikin, çawa parastina gelê serhildanan bikin? Ev di kongreyê de tên nirxandin. Serokatî bi xwe ne amade ye, lê belê li ser esasê perspektîfên Serokatî pêş dikeve. Dîsa ev kongre bi dirûşmeya "Serhildanên Gel û Gerîlabûnê" pêk tê. Esas gerîlabûn tê destgirtin.

Serok, rewşên ku li herêmê hene dinirxîne. Di wê kongreyê de rapora polîtîk pêşkêş kiriye. Tê pênasekirin ku Sosyalîzma Pêkhatî çima hatiye hilweşandin, rastiya cîhanê çi ye, qeyrana li Rojhilata Navîn pêş ketiye çi ye, Serok piranî li ser wana disekine. Mirov wisa dikare li Kurdistanê gerîlabûnê pêş bixe û wê bizivirîne şoreşê û şoreşgeriyê pêş bixe. Di vê Kongreyê de Şener di komîteya amadekar de ye û li ser navê wê komîteyê bi însiyatîfa xwe nameyekê ji Serokatî re dişîne. Di kongreyê de bi xwe jî di dîwanê de ye. Esas Serok bi wê nameyê fêm dike û dibêje: "Şener kongre girtiye destê xwe, hakimiyeta xwe li ser Kongreyê çêkiriye". Li ser vî esasî Serok mudaxeleyê kongreyê dike û wê dîwanê diguherîne ji bo kongre di bin siya Şener de nemeşe.

Dîsa ferasetên komploger û feodal tên nirxandin. Ferasetên çîna burjûva ku xeta me lîberal dikin, têkoşîna xetê nade rûniştin, li ser van tê sekinîn. Bi taybetî texrîbatên hatine çêkirin, berpirsiyarên wana kî ne, ev hinekê tê tespîtkirin. Serok, yek jî dixwaze pêşî li dadgehkirinên bêmaf bigire. Pir kesan bêy ku agahiya Serok pê hebe, bêy ku were pejirandin hinek di bin navê sîxuriyê de, hinek di bin navê têkiliya jin û zilam de hatine qetilkirin. Bi vî awayî rexmê dikare van pirsgirêkan çareser bike jî, bi şêwazê cuda qetil dikin. Serokatî mudaxelê van ferasetan dike. Serok di

kongreyê de biryar digire êdî bêy agahiya Wî tu cezakirin, dadgehkirin neyê kirin. Bi vî awayî tedbîr tên girtin. Ji gel re jî bi heman rengî ye. Jixwe ev êrîşên dijmin in, dijmin dixwaze di nav gel de çetetiyê pêş bixe. Ev meylên derveyî xeta me pir in. Mînak; îro hevalên fermandar hene, lê di wan deman de pêşengiya van meylan dikirin. Mesela, hevalek di gundekê de şehîd biketa, diçû ew gund dida ber guleyan. Ji bo vê jî qanûna leşkerî salekê tê sekinandin. Jixwe bi dilxwazî tevlîbûn heye, wekî tedbîr salekê tê rawestandin. Kongre biryara heya niha yên ku çete bûn, efûya xwe bixwazin wê bên efûkirin digire. Di netîcê de ev kongre bi îdîa bû. Hem ji aliyê gerîla ve, hem jî ji aliyê rêxistina girseyê şoreşê hedef dike.

Di Kongreya 4. de yek jî, ji bo gerîla wekî terz biryara çêkirina qadên rizgarkirî tê girtin, paşê wisa tê binavkirin: “Qadên sor, qadên zer û qadên spî”. Ango qadên sor bi giştî bên paqijkirin, tê de ji derveyî gel dijmin nemîne. Hakimiyet di destê gerîla de ye. Qadên zer nîv bi nîv in; hem gerîla, hem dijmin tê de heye. Qadên Spî jî dijmin tê de hakim e û gerîla jî tê de veşartî xebatên xwe dimeşîne. Yekîneyên gerîla divê bên birêxistinkirin, mezinkirin. Yên ku tevlî bûn şehîd Cahîde, şehîd Mizgîn, hevala Sakîne Karakoçan, Aysel Çûrûkkaya û çend hevalên din jî hene. Ev kongre komîteya navendî ya PKK’ê diyar dike, hevala Sakîne Karakoçan jî tê de cih digire. Lê paşê kongre, civîna wê komîteyê çêdike û kes ji hevala Sakîne re nabêje tevlî civînê bibe. Ev hemû girêdayî ferasetên paşverû ne, pêwîstî nabînin wê beşdar bikin. Hevala Sakîne wan rojan wiha pênase dike: “Wana civîna komîteyê çêdikirin, min jî di mutfaqê de savara pîvazkirî çedikir.” Rexmê di kongreyê de hatiye hilbijartin jî, wisa nêzîk dibin. Berê me anîbû ziman, jin biçûk dîtin, cidî negirtin, nêzîkatiya jin nebe jî dibe û hwd. wisa ji rêzê derdikevin. Bi qismî li eyaletên din gerîla heye. Esas piştî kongreyê biryar hat girtin ku bi fermî ji eyaleta Botanê gerîla xwe li hemû qadên Kurdistanê belav bikin. Hêz diçe Garzanê, Amedê, heya Dêrsimê. Dijmin jî difikire qey gerîla piranî di Botanê de ye û

wê di wir de gerîla bifetisîne û biqedîne. Ji ber vê esas ev biryar ji bo valaderxistina hedefên dijmin e.

Bi giştî sala 1991'an girîng e. Ji ber ku Şerê Kendavê di wê salê de tê jiyîn. Bê guman ev şer wê çi encamê bi xwe re derxîne, em jî dibêjin an em ê wê firsendê binirxînin û bizivirînin şoreşê, ji ber ku ji derfetên şoreşê re jî mudaxele çêbûne. Nimûne; li Sûriyê çawa mudaxele çêbû, me jî zivirand şoreşê û niha li giştî Kurdistanê derfeta şoreşê heye. Wê demê jî wisa bû, ji ber dema mudaxela Kendavê dike, ji bo mudaxelekirina xwe bide rûniştin kê asteng dibîne? PKK'ê ji xwe re asteng dibîne. Bi vî awayî konsepta xwe ya êrîşkirina ser Tevgerê pêş dixe. Di destpêka sala '91'an de cara yekê li ser Başûrê Kurdistanê êrîşên hewayî çêdibin. Tirkiye jî li ser operasyonên derveyî sînor nîqaş dike, plan dike û dikeve rojevê. Ya rastî ev konsepteke navnetewî ye, ne tenê Tirkiye ye. Ji bo ku bikaribin PKK'ê biperçiqînin ne tenê Bakur, dixwazin derveyî sînor jî biperçiqînin. Dixwazin bi şerê Kendavê re Iraqê biperitînin, jinûve ava bikin. Hedefa wan herêmên Kurdan e, Şiî ji hev cuda kirine, li beramberî wê serhildanên gel jî hene. Gelê Başûr radibe serhildanê. Li Başûrê Kurdistanê rexmê hêza herî birêxistinî PKK ye jî, em vê derfetê nanirxînin. Ji ber ew perspektîfa me ya ku em Başûr jî daxilê şoreşê bikin nîn e, perspektîfên me teng in, nêrînên me teng in. Wekî em ê şoreşê tenê li Bakur çêkin heye, em ê şoreşa Başûr çêkin nagirin dest. Ji bo wê nazivirînin şoreşê. Tu dibê qey em ê şoreşê û serhildanan tenê li Bakur pêş bixin, lê Başûr jî perçeyek ji Kurdistanê ye.

Wê demê hêzên YNK'ê û PDK'ê rêveberiyên xwe hemû derve ne, çûne xwe spartine hêzên derve. Hin hemleyên me yên leşkerî pêş dikevin û hem li hemberî êrîşan heya wê demê me Zaxo jî girtiye, bi riya hevalê Sadiq Omer gel jî tevlî dibe, Zaxo dikeve bin kontrola me. Lê perspektîfeke me ya wisa tune ye. Paşê dewrî PDK'ê û YNK'ê dikin. Wekî tenê ew hêzên Başûr in nêzîkatî derdikeve. Feqet ji ber ku perspektîfên me bi vî awayî nebûn, çekan radikin û dewrê PDK'ê dikin. Ango hêz a wan e û divê em radestî

wan bikin. Ji ber ku Sadiq Omer wana li Heftenîn bi me re bûn, PDK hîna wê malbatê nagire nav xwe.

Di heman salê de çalakiyên qereqolên Êrîş û Mawa (Zagros) çêdibin. Em hedefên xwe yên rizgarkirina qadan, rakirina qereqolan, îmhakirina wana pêk tînin. Heya vîdeoyên çalakiyên Êrîş û Taşdelen hene û di nav gel de jî dihatin guhdarkirin. Hêdî hêdî hevalên jin tevlî çalakiyan dibin, yek ji wana jî hevala Çîçek (Geyîk Yetîm) e.

Ber bi dawiya salên '91'an ku îro em dibêjin Qadên Parastina Medya, wê demê wekî Zagros tê binavkirin, êdî li wir yekîniyên xweser ên jinê tên avakirin. Ev jî ji bo artêşa me dibe bingehek. Bi taybetî li qadên Heftenîn, Xakûrkê, Avaşîn û Zagrosê ji taximan heya yekîneyên jin ava dibin.

Pêlên serhildanan berdewam dikin, ji Newrozê destpê dike, heta 15'ê Tebaxa sala 1991'an pêl bi pêl rabûna gel heye. Pêlên serhildanên Nisêbîn, Cizîrê çêdibin. Dema Vedat Aydin tê qetilkirin di 10'ê Tîrmeha 1991'an de li Amedê serhildanên pir mezin çêdibin. Dijmin jî wekî bersiva van serhildanan dest bi komkujiyan dike. Ji bo vê ceribandinan li ser gel dike û dinêre ma wê parastina gerîla bi çi awayî be. Gel bi girseyî rabin, ew ê bikaribin xwe biparêzin, an na? Vê yekê di merasîma cenazeyê Vedat Aydin de diceribînin, tîmên taybet eşkere guleyan li gel direşînin. Piştî wê esas komkujiya mezin li Şirnexê dikin. Di encamê de sala 1991'an ji bo gerîla du qadên navendî çêdibin; yek Qadên Parastina Medya ango Zagros, yek jî Botan wekî navendî bi navê biryargehê tê birêxistinkirin. Her wiha taktîkên şer, serdegirtinên qereqolan çêdibin û her çiqasî nêzîkatiyên feodal jî hene hevalên jin beşdarî van çalakiyan dibin. Li Botanê jî taximên hevalên jin ên xweser çêdibin û li eyaletên din hevalên jin cihê xwe digirin. Her wiha xebatên Serokatî didomin. Li Şamê malên lêhûrbûnê hene. Bi vî awayî dixwaze xebata jin di asta stratejîk de bigire dest. Dixwaze bingeha artêşbûnê ava bike, bi perspektîfan kadro amade dike.

Hêdî hêdî kadro ji zîndanan derdikevin, bi taybetî hevala Sara di sala 1991'an de ji zîndanê derdikeve û tê saha Serokatî. Wekî me berî niha jî anî ziman, Şener jî beriya wê derdikeve, hedefên wî hene û li saha Serokatî xebatên xwe aktîf dike. Hewl dide li sahê xeta Serok vala derxîne û ya xwe pratîk bike. Heman demê li Rojava di nav gel de kar dike û li wir xwe birêxistin dike. Hîna jî li Qamişlo û Dêrikê malbat in hene, ji wana re dibêjin "*Malbatên Şenercî*". Mehmet Şener herî zêde bi riya jinê xwe birêxistin dike. Ceribandina destpêkê li ser hevala Sara di zîndanê de destpê kiriye. Hevala Sara jixwe di pirtûka xwe de behsê dike, ji ber ku zehmetî dikişîne. Ji bo dahûrandina vê pêvajoyê heya salên 1998'an li saha Serokatî dema Bîrdoziya Azadiya Jinê tê îlankirin panelek tê çêkirin. Li wir her heval ji cihekê ye, ji perçên cuda cuda ne. Ji bo bernameya televîzyonê tê amadekirin û li wir Serok ji bo hevala Sara dibêje; "Jixwe keça me, di warê hestan de ew jî dikeve bin bandora tesfiyegeriyê, em tengav kirin." Ew bername çawa xilas dibe, hevala Sara ji ber rihet nêzîkî Serok dibû jê re dibêje, "Serokê min, ez ê kengî ji vê rewşê rizgar bibim." Wî jî wiha bersiv da: "Rizgarbûn wisa hesan nîn e". Yanî Serok van bûyeran dîrokî digire dest. Serok vê pêvajoyê wekî dîrok digire dest. Ev pêvajo nayê înkarkirin. Dîsa dixwest encam bê derxistin. Jixwe wê jî dixwest her vê pêvajoyê dahûrîne, encam jê derbixe.

Şener li Rojava jineke bi navê Dîcle Qamişlo birêxistin dike. Dîcle diçe saha Serokatî perwerdê dibîne, li wir xwarinpêja Serok e û dixwest jehr bide Wî. Şener jî xwe ji bo asta Serokatî amade dikir, li ser van esasan kar dike. Yek jî, di 25'ê Çileya sala 1990'î de hevalê Hemze şehîd dikeve, dibêjin bi qeza wisa bûye. Ew hevalê Hemze şehîd dixin, esas êrîşên xwe nêzîkî Serok dikin û bi vî awayî Serok tehdît dikin. Ji ber ku hevalê Hemze hevalê Serok ê zarokatiyê bû. Wê demê jî hevalê Hemze di rêveberiya Akademiya Mahsûm Korkmaz de ye, ango van karen xwe li saha Serok dike. Dema Şener di saha Serokatî de ye, di mitîngekê de bi riya zarokekî not ji hevala Sara re dişîne, hevala Sara vê bi Serok re

parve dike. Serokatî jê re dibêje, “Tiştek nabe, bersiv bide, ji bo em bikaribin wî bikşînin.” Paşê Dîcle deşîfre dibe, lê rexmê wê jî Serok wê ceza nake û heya sala 1997’an jî li saha Serok bû, piştre direve. Di şexsê wê de diyar bû ku Şener jinan hildibijêre. Jixwe piştî ku Şener jî deşîfre dibe, tê cezakirin û dîsa du jin li cem wî ne.

Hevala Sara, di wê pêvajoyê de pir zehmetiyê dikişîne. Ji ber ku dema dikeve zîndanê hinek tevlîbûnên zewaca şoreşgerî hebûn û pêşveçûnên Tevgerê kêm zêde bandor li ser zîndanan dike. Hevala Sara di pêvajoya zîndanê ji pêşveçûnên nav rêxistinê qut dimîne, paşê perçe perçe dibin û wana dişînin cihên cuda cuda. Dema hevala Sara tê sahê, gustîlk di destê wê de ye, ew bi xwe dikire, yekê li gel xwe dihêle, ya din jî ji Şener re dişîne. Hevala Sara hevaleke ku şaşîtî bike jî, divê rêxistin bizanibe, ji ber ku xwe aîdê rêxistinê dibîne. Yanî şaşîtî hebin jî jê nareve, ewqas yekbûnekê bi Partiyê re jiyan dike. Ji ber wê dema tê sahê wê gustîlkê ji destê xwe dernaxe, dibêje, “Eger ez derxînim wekî ez vedişêrim”, ew jî difikire ku Şener beriya wê hatiye û wî bi Serok re parve kiriye. Ji ber vê jî ew bi wê rihetiyê tê sahê.

Partî tiştek wisa ye, eger tu sûc bikî jî divê tu ji Partiyê re vekirî bî, ji ber ku esas sûcê herî mezin tiştekî xwe ji vê Partiyê veşartine, nexwe ew ê girêdana te bê lêpirsînkirin. Hestên beramberî Serok pir cuda ne. Mesela, dibe ku haya wê ji ti pratîkekê nîn e, ya rastî tu xwe li beramberî Serok tazî hîs dikî. Bi vî awayî di dahûrandinên xwe de tu dibêjî qey behsa te dike, wekî ew tiştê ku me veşartiye dizane. Ew jî dihêle êdî tu durist be li hemberî Partiyê. Ev jî çanda Apocî ye. Di roja îro de eger em ê pirsgirêkên partîbûnê yan jî kadrobûnê nîqaş bikin, hinek tişt tên tehlîlkirin, şermbûn pir nemaye. Dema sûc dike rûyê wê/î sor nabe. Ev çand e, divê mirov ji hesabê wê netirse û nereve. Divê tu her tim li hemberî Partiyê vekirî bî, tu çi bî ew be.

Piştî Serok dibîne di hevala Sara de zelalî çêdibe, dibêje: “Dij-

min xwest keça me biguhere, lê bi ser nexist. Me jî xwest em keça dijmin (li vir behsa Fatma dike) biguherin, me jî bi ser nexist.” Hevala Sara çi zehmetî bikişanda, xwe dispart Serokatî. Dema wate nade mijarekê yekser direve gel Serokatî. Her çiqasî Serok pir xwezayî ye, her kes cesaret nake biçe gel Wî nîqaş bike jî, hevala Sara wexta zehmetî dikişand xwe dispart Serokatî. Di vî alî de pir vekirî bû. Hevala Sara xwe bi ferasetên paşverû re nedikir yek. Bi kesî re cesareta ku baz bidin ba Serok û bixwazin nîqaş bikin tune bû, lê bi hevala Sara re ev cesaret hebû. Kengî zehmetî bikişanda baz dida ba Serok. Ha wê demê rêveberiya Akademiyê wê gelek tehrîk dikin, roja Şener înfaz dikin hevala Sara di hundir de ji xwe re rûniştiye; ew jî tên gel wê dîlan digirin, tevahî hevalên di Akademiyê de fîşekan diteqînin. Tu dibê qey çi bûye! Rast e Şener tesfiyekar bû û hat cezakirin, lê belê pêşwazîkirinek bi vî rengî li hemberî hevala Sara nerast bû. Mahîr Welat wana wê demê jê re dibêjin, “Ji bo ku tu ti agahiyê li cihek din nebihîsî em ji te re dibêjin” û bi taybetî balê dikêşin ser mijara ku dema Şener tê înfazkirin du jin pê re hene. Esas hevala Sara di ferqa wê de bû ku dihat tehrîkirin. Paşê tekmîlê didin Serokatî ku hevala Sara ev bûyer qebûl nekiriye. Van kesan hewl didin hevala Sara û Serok bînin hemberî hev.

Di sala 1991’an de dema hejmarek baş ji zîndanê derdikevin, Serokatî dixwaze wan hemûyan kom bike û li ser van esasan Konferansa Zîndanan li sahê pêş bixe û pêş xist. Hevala Sara bi xwe jî beşdarî konferansê dibe. Serokatî, wan hevalên ji zîndanê derketine li saha xwe dixe nava lêhûrbûnê û dixwaze li ser encamên wê re vê konferansa zîndanan li dar bixe. Di wê Konferansê de nîqaşên li ser berxwedana zîndanan tên meşandin û ev çanda berxwedanê wê çawa bizivire jiyanê û çawa bizivirînin sekna kadro tê nîqaşkirin. Ji ber ku êdî di zîndanan de şiklekî din hatiye girtin. Ya rastî ew konferans heman demê wekî mudaxeleyekê ye. Dîsa siyaseta dijmin a di zîndanan de çawa kadro teslîm bigire, li hemberî vê divê mirov seknek çawa nîşan bide, di van waran de

konferans zelaliyekê çêdike. Ji bo wê ew Konferansa Zîndanan girîng e.

Bi giştî ji bo sala 1991'ê pêşketinên ku mirov bêje; yek jî Hikûmeta Botan-Behdînan a Şer dikeve nîqaşê. Tê nîqaşkirin ku Botan û Behdînan bibin yek, em sînoran derbas bikin, ango sînoran ji holê rakin. Li ser vê perspektîfek tê pêşxistin. Mînak; gelê Nisêbînê heta ber sînoran tê, Cizîr wisa. Li ser vî esasî amadekariyek heye ku Botan û Behdînan bibin yek, wekî Hikûmeta Şer were avakirin. Di wê demê de zemînek ji bo pêşketina rêxistina jin ava dibe, yekîne û taximên jin tên avakirin ji bo hêz û îrada xwe bi xwe derxe holê. Tabî di sala 1991'ê de van nîqaşan tên meşandin, fermî îlankirina Hikûmeta Botan-Behdînan di sala 1993'yan de pêk tê.

Sala 1991'an hem di aliyê gerîla de, hem jî di aliyê rêxistina girseyî de bi giştî Tevger mezinbûnekê jiyan dike, fireh dibe. Lê belê wê salê şêwazê me yê têkoşînê wekî raperîn tê diyarkirin. Raperîn jî, ne tenê gel rabe serhildanê, heman demê gerîla û gel bi hev re bibin yek. Lê şêwazê me yê raperînê pir giştî nabe. Dîsa li cihên ku serhildan tên pêşxistin, pêşî li komkujiyên dijmin nayê girtin. Mirov dikare vê wekî kêmasiya wê salê binirxîne. Her wiha gerîla di aliyê çalakiyan de kêm maye, yanî ne li gorî hedefan e. Rast e, hinek çalakiyên mezin ên li ser qereqolan hatine çêkirin, lê li gorî hedefa salê vana têrê nakin, kêm in. Di warê tevlîbûnan de keda jinê pir çêdibe, aktîf tevlî pratîkê dibe, di çalakiyan de cih digire. Li aliyê din, kevneperestiyên jin û zilam xwe derdixin pêş û Tevgerê tengav dikin. Ev ne tenê ji aliyê tesfiyekaran ve, tevlîbûn ji ber ku zêde bûne, dema ferasetên civakê baş neyin dahûrandin ev wekî kevneperestî xwe dide rû û xwe li ser xeta partiyê ferz dike.

***Di salên 1990-91'ê de hevalên jin ên weke sembol şehîd ketine;***

**Hevala Mîne (Emel Çelebî)**; ji navçeya Kîxilî ya Çewlîkê ye. Ji Serhedê dema derbasî Çewlîkê dibe, di rê de şehîd dikeve. Di

weşana yekemîn a kovara Serxwebûn de cihê xwe digire, li Ewrûpa jî tê naskirin.

Di tevlîbûnên salên 1988-89’an de **hevala Nafiye** heye. Ew jî bi komployê tê girtin, li Dêrsimê bi êşkencê di nav gel de tê qetilkirin.

**Hevala Gulîzar;** di nav şer de ji bo teslîm nebe xwe diavejê ava Mûnzûrê û wisa şehîd dikeve.

**Hevala Sozdar Dêrik**; ji Rojava ye, tê naskirin. Ew bi xwe destgirtiya hevalê Zinar bû, li ser pira Zapê di kemînê de şehîd dikeve.

Di encamê de sala ‘90’î hevalên sembol ên şehîd ketine, ew in û ji vana jî zêdetir şehîd hene.

**Hevala Rojîn (Halise Yildirim);** ku sala 1972’yê li Nisêbînê tê dunyayê, sala 1988’ê tevlî Partiyê dibe. Di Nîsana sala 1989’an de diçe saha Serokatî, pir aktîf tevlî kar dibe. Piştî perwerdê derbasî eyaleta Mêrdînê dibe. Di sala 1991’ê de li Qerejdaxê di araziyê Çinarê de şehîd dikeve.

**Hevala Xelat (Hatice Keser)**; di xebatên bajaran de cih girtiye, di zîndanê de maye û di xebatên rêxistinî de cih digire. Di salên destpêkê de tevlî dibe, li saha Serokatî perwerde dîtiye. Li Botanê di sala 1991’an de şehîd dikeve.

## Pêşketınên Sala 1992’yê Û Dı Şerê Başûr De Sekna Jın a Berxwedêr

Ji bo sala 1992’yan mirov dikare bibêje hevkarên Kurd li hemberî Tevgera me ya Azadiyê ketin dewrê, konsepta êrîşê pêş xistin. Heman demê bi mudaxeleya hêzên derve ya li ser Rojhilata Navîn re esas konsepteke navneteweyî jî di dewrê de bû. Ji bo wê sala 1992’yê saleke girîng e, têkoşîneke dijwar tê de hat jiyîn. Hem mezinbûna gerîla ya di warê hejmarê de, hem jî bi bandora serhildanan girseyîbûna Tevgera me didome. Jixwe salên me bi Newrozê destpê dikin, ev sal serhildanên ku li Kurdistanê çêdibin

dipekin metropolan jî. Ji sala 1990'î şûn de êdî di xebatên qada civakî de jî, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê Komeleya Jinên Welatparêz tê sazkirin. Her wiha saziyên wekî Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) û Navenda Çanda Mezopotamya (MKM) tên avakirin. Bê guman jin jî tê de cihê xwe digirin. Di qada civakî de ji aliyê gelê Kurd ve sazîbûn çêdibe, hemberî siyaseta tunekirinê ya dewleta Tirk vekirinek çêdibe, gav tê avêtin. Nimûne; sala 1991'an parlamenterên gelê Kurd çêdibin. Leyla Zana wana tên hilbijartin. Ango danehevên di nav civakê de hene derbasî siyasetê dibin. Meclîsên gel ên neteweyî pêş ketin, rêxistina milîsan pêş ket. Heta di roja me ya îro de jî milîsên ku di wan çaxan de hatine birêxistinkirin, hîn jî xebatan dimeşînin. Tabî van pêşketinan bandora xwe li ser têkoşînê dikin.

Di Newroza sala 1992'yan de li Kadîfekaleya Îzmîrê hevala Rahşan Demîrel çalakiya xwe pêk tîne, adeta wê pêla Mazlûm Doğan, Zekiye Alkan didomîne. Temenê wê 17 salî ye, bi eslê xwe ji Nisêbînê ye, lê belê li Îzmîrê mezin bûye. Esas welatparêziyek kûr dijî û dixwaze beşdarî partiyê bibe, lê riya tevlîbûnê nabîne. Her wiha ji komkujiyên dijmin di serhildanên Newrozê de li ser gel pêk tîne, bandor dibe. Yek jî, di wê salê de dewletê daxuyanî dabû ku wê Newroz neyê pîrozkirin û li gelek cihan qedexe kiribûn. Li ser van esasan hevala Rahşan çalakiya xwe pêk tîne. Di kêliya çalakiyê de got, "*Ez ê li Kadîfekale xwe bixim Newroz, ez dixwazim bersiva serhildanên Cizîrê, Mêrdîn, Nisêbînê bidim.*" Wê demê Îsmet Sezgîn li Tirkiyê wezîrê karê hundir bû, jixwe paşê dibe serokomar. Hevala Rahşan dibêje, "*Ez vê peyamê ji Îsmet Sezgîn re dişînim, bila bizanibe ku Newroz wê bê pîrozkirin. Eger bi lastîkan neyê pîrozkirin jî, wê bi bedena me were pîrozkirin.*"

Li wir girseya ku ji bo pîrozbahiya Newrozê tê, sibê zû cenazeyê hevala Rahşan dibînin ku, bi tiliyên destê xwe îşareta serkeftinê dike. Yekser li wir gel xwedî li cenazeyê wê derdikeve, dayîka wê jî nagirî û cenazeyê keça xwe bi tilîliyan pêşwazî dike. Li ser van esasan di dayîkan de zanebûna ku zarokên wan ji bo welatê xwe

canê xwe feda dikin pêş dikeve.

Serokatî der heqê çalakiya hevala Rahşan de wisa dinirxîne: “*Rahşan Demîrel, ji bo girseya me ya li metropolan derbasî welat bike, pirek e. Berxwedanek, li ser sûrê Îzmîrê bûyera xwe şewitandinê heye. Bi navê Rahşan Demîrel berxwedana keçeke Kurd a pir ciwan heye. Rastiya Mêrdîna Kurdistanê ya derbasî wir hatî kirin, heye. Welatparêzî jixwe bibandor e. Di vê keça ciwan de ji aliyekî ve dildariya şer û azadiyê heye, lê ji aliyê din ve pir zeîf e. Şerê rêxistinî rastiyê bandor dike. Rojên Newrozê jî cardin bilez û têr û tijî tên jiyîn. Xuya ye di vir de dixwaze bi awayek seyr xwe bide şerê azadiyê û tiştekê bike. Lê belê ji ber hêza vê ya teorîk zêde nabîne û derfeta pêşxistina pratîkê bi dest nexistiye, yanî ji ber di cihekê de dildarî, teorî û asta vê ya rêxistinî derbas kiriye, wekî bersiva vê yekê ji ber sond xwariye tiştekê bike berê xwe dide çalakiyek cuda. Dema şert û mercên şermdêr ên girseya me li wir di nav de jiyan dike, şert û mercên zor ên di nav malbata wê de, şert û mercên jiyana nizm ên bi feraseta wê ya azadiyê û jiyana azad re li hev nakin bi zindîtî û balkêşiya Newrozê re digihin hev, bi vî awayî çalakiyeke meşaleyê derdikeve holê. Gengaz e, di ruhek wisa de cesaretek wisa û dûvre çalakiyek wisa dibe ku derkeve û derdikeve jî. Me got em vê çalakiyê watedar dibînin. Bi awayek hîn balkêş hat dîtin ku vê şehadetê girseya me ya li metropolan ronî kiriye, bi sedan kesên di nav şert û mercên jiyaneke ketî de kişandiye şer, tirba li ser wana tê ferzkirin kun kiriye, ji bo gelê me yê li metropolan bîne ser xwe û derbasî welat bike rola rakirinê û rola pirê lîstiye. Peyamê di vê wateyê de bi qasî qîmeta meşaleyê xwe îspat kiriye. Ez dibêjim, wê îspat kiriye ku ew bûye hêzeke fermandeyê. Ji ber ku gava karî bi sedan kesan bimeşîne, ew rola fermandeyekê dilîze. Bi taybetî ji bo tevlîbûna pir jinan rê vekiriye, hema hema rê vekir ku ji hejmara zilaman zêdetir jin tevlî bibin. Ev yek nîşan dide ku ew, destekek mezin dide azadiya jinê, dibe fermande û hêza vê ya artêşê.*” Ev heval bi çalakiya xwe re ji bo girêdana bi welat re ji gelê me yê li metropolan re dibe

ronahî. Ji ber ev bûyer mohra xwe li salê dixe, divê em bi wateyek kûr nêzî vê çalakiyê bibin.

Heman salê di Newroza Şirnexê de gel ji bo pîrozbahiyê kom dibin, lê li wir dijmin komkujiyê pêk tîne. Hevala Bîşeng şehîd dikeve, ku ew bi xwe keçeke 17 salî ye û dibistana amadeyî dixwîne. Di wê demê de berpirsiyara xebatên ciwanan e. Ji bo vê di dîroka ciwanan de divê hevala Bîşeng esas bê girtin. Divê her beşên xebatên me xwedî li mîrasên xwe derkevin. Ji ber ku di xebatan de ye, gelê Şirnexê jî wê nas dike. Hevala Bîşeng di serhildanê de birîndar dikeve destê dijmin û bi êşkencê qetil dikin. Paşê cenazeyê wê bi panzêrê ve girê dane û di nav bajêr de gerandine. Li Cizîrê hevala Bêrîvan li ser gel çi bandor kiribe, hevala Bîşeng jî li Şirnexê heman rolê dilîze. Ev bûyer tenê bi kuştina hevala Bîşeng re sînordar namîne, dewlet li giştî Şirnexê komkujiyê çêdike. Ya rastî dijmin peyama ku eger Newroz bê pîrozkirin, wê di komkujiyên bi vî rengî re derbas bibin, dide. Esas van bûyeran karakterê salê jî eşkere dikin.

Der barê qadên di bin kontrola gerîla de pêş dikevin, wê salê Botan wekî qadeke rizgarkirî bû, heta hevalan al jî danîbûn, dijmin nedikarî bikeve wir. Amed jî bi heman rengî bû, derfet zêde bûn, gel ji bo gerîla xwe di warê madî û manewî de seferber kiribû. Lê ji ber ferasetên şaş ên wekî paşverûtî, nexweşiyên zû desthilatbûnê yên pêş ketin, ew nahêlin van derfetan bizivirin şoreşê, encam jê nayê girtin. Nimûne, derfet pir zêde bûn, gel jî hemû derfetên xwe ji bo gerîla seferber kiribû, adeta hemû tişt ji gerîla re diherikî. Hem tevlîbûnên nav refên gerîla, hem derfetên madî di her milî de mezinbûnek cidî di aliyê Tevgera me de tê jiyîn. Lê hinek ferasetên şaş nahêlin ew derfet bifetilin şoreşê.

Her wiha di sala 1992'yê de çalakiyên mezin ku çêdibin; çalakiyên Helena, Perîxan, Rubarok, Bêzelê li ser xeta Zagrosê tên lidarxistin, gelek hevalên jin jî tê de cih digirin. Rexmê piraniya wan tevlîbûnên nû ne û tecrûbe nîn e, hevalên jin tevlîbûna xwe

di nav şer de diyar dikin. Heman demê li eniya Xakûrkê nêzîkî 100 hevalên jin hene. Li ser van esasan nirxandinên Serok ên bi vî awayî hene: “*Jinan bi van beşdarbûnan re dikarîn 10 caran şoreşê bikin.*” Jixwe paşê Serokatî li her derê herî zêde Serokatî wan kom dikir û wan hevalan perwerde dikir, da ku bibin bingeha artêşê. Dema tevlî pratîkê dibin jî di kesayetê de ji xwe bawerbûnek ava dibû. Bi vî awayî hêza xwe dibînin, hêza wan di nav şer de derdikeve holê. Di vê mijarê de li ser disekinin, ji ber ku di lûtkeyê de tu li ser van encaman gavavêtinê çêdikî. Di wê demê de çalakiyên serdegirtina qereqolan zêde çêdibin, gelek qereqol dikevin. Mixabin di wan salan de gelek windahiyên me çêdibin. Di çalakiya Rubarok de windahiyên me zehf çêdibin. Paşê Serokatî rexne kir. Di encamê de tevlîbûna hevalan zêde ye, bi giştî 44 hevalên jin tevlî wê çalakiyê dibin, tenê yek heval birîndar dibe. Cara yekê ji bo çalakiyekê di vê astê de beşdarbûna hevalên jin çêdibe.

Xeta Xakûrkê û Şemzînanê, wekî tê zanîn cihek stratejîk e. Li wê derê daneheveke hevalên jin heye. Ya din jî, Xakûrkê sêgoşe ye, sînorê Rojhilat, Bakur û Başûr digire nav xwe. Ferhat wê demê li wir berpirsiyar bû û wekî sedem digot, “Ji ber zextên Îranê gelê Rojhilat kevneperest e, girtî ye, taybetmendiyên feodal zêdetir pêşde ne, ji bo vê divê hevalên jin serê xwe girê bidin.” Bi vî awayî sergirêdana hevalên jin bi awayek fermî dibe biryar. Jixwe Ferhat berê jî di nav van lêgerînan de bû. Qet ji bîra min naçe, sala 2003’yan civîna Navenda Partiyê çêbû, wê demê meylên tesfiyekaran zelal bûn û Ferhat eşkere hin tiştan got. Di destpêka beşa duyemîn a civînê de Ferhat çû milê hevalên jin rûnişt, kî dihat wî derbas dikir, kes neçû gel wî nerûnişt. Li wir Sakîne Zagros (paşê îxanet kir) di ber wî re derbas dibe û Ferhat dibêje, “Sakîne ma çi bûye, hûn çima ji cem min direvin, were li gel min rûne”; Sakîne jî wekî bersiv jê re got, “Na, ma destpêkê te serê me girt di nav vê Partiyê de.” Wî jî wiha got: “Na, min paşê şoreşek pêk anî, min kefiye guhert û şepqe da serê we.” Yanî li wir henekê xwe bi hevalên jin dikir, esas meyla xwe ya tesfiyekar

eşkere dikir. Ev tiştên ku tên ferzkirin êdî di nav hevalên jin de dibe şêwazekî jiyanê. Ya rastî ev bû wekî tabûyê di nav me de. Mînak; bê êlek dernakeve pêşiya hevalên xort, êlek dîsiplîna te nîşan dide. Tu di zanebûna wê de be cuda ye, tu wekî şerm bigire dest ji ber ku êlekê te nîn e, cuda ye. Her wiha li pêş hevalên xort divê porê te vekirî nebe, kefî li serê te be. Serokatî ji van nêzîkatiyan pir aciz dibû, digot, “Ev çi lastîke we bi porê xwe ve kiriye û heps kiriye? Rihet bihêlin!” Wisa destê xwe diavêt wê lastîka li ser porê hevalan û derdixist. Yan jî dema kenê hevalên jin diçû manga hevalên xort, dihatin wan hişyar dikirin. Ev hemû di bin navê ku zilam wê bandor bibin de, tên tehrîkirin, pêşiya têkiliyên kevneperest vedike û hwd. de tên ferzkirin. Wan salan tevlîbûna jin a di nav şer de wekî bargiranî didîtin û her di nav karên paşde dihîştin, lojîstîk û cepxane amade dikirin, bi mutfaqê re mijûl dikirin. Heta fermandarên ku qebûl bikin çend hevalên jin di yekîneya wana de be pir kêm in, pir kêm hevalên wekî hevalê Egîd difikirîn û nêz dibûn hebûn. Çima? Li gor nêrandina wana jin bargiranî ye, nikare barê xort rake, di şer de wê paşde bimîne, nikare beşdar bibe. Çawa ku di şoreşên rizgariya netewî kar dikirin ên cîhanî de jin hemû karên paşde dikirin.

Sala 1992’yan tevlîbûna hinek hevalên jin a di çalakiyan de ew pêşdaraziyên ku hatibûn avakirin, şikandin. Êdî nîşan da ku jin jî dikare di şer de rol bilîze, tevlî bibe. Ev nakokiyeke bi vî awayî bi xwe re derdixe; ya rast ev dînamîkek e, tu rast bizivirînî pêşketinê dînamîkek zindî ye û nakokiyek esasî ye. Serok xwest bi vê nakokiyê rotayekê bide Tevgera me. Jin di şer de roleke bikişîne, pêşengiyê bike, bandor bike dikare bilîze. Em tenê hêza jin wisa çors negirin dest; jixwe şer e, zilam çiqas tevlî bibe bila jin jî tevlî bibe, ne wisa ye. Serok tu carî wisa lê nenêrî. Mesela, di hinek qadên şer de jinê nikaribû xwe tê de birêxistin bikira. Serok li hemberî gotinên digotin, “ne pêwîste jin di wir de cih bigire” derdiket. Bi rastî cihê ku jin bikare rol û mîsyona xwe bileyîze, pêşengiyê bike, birêxistin bike vedikir. Serok, di hemû kongre û

konferansên Partiyê de dixwaze jinê wekî temînata Partiyê pêş bixe. Di eynî demê de ji bo xeta şer jî were parastin wekî temînatekê ye. Ferasetên wê demê mirov dikare wisa binirxîne.

Gelek kes dikevin zîndanê, ji ber ku di pêvajoya serhildanan de hinek eyalet jinan nagirin nava xwe û hevalên tevlî dibin paşde dişandin û ew diketin zîndanê. Hinek qadan digotin, “hejmara me bes e, hejmara hevalên jin zêde dibe.” Paşê em ê li ser pratîka Şemo bisekinin; digot, “jin di şer de nabe” û hema vedigerîne. Di zîndanan de jî her cureyê êrîşan pêş diketin, ji êşkence heya tecawuzan bigire bi hemû nêzîkatiyan re rû bi rû dimînin. Îcar ev potansiyela jin mecbûr dimîne ku di zîndanan de li hemberî dijmin li ber xwe bide.

Tevlîbûna di nava çalakiyan de çêdibe, di navbera jin de perçebûneke wekî di nav şer de yên dikarin bikin, ên nikarin bikin çêdibe. Çima? Zilam ferzkirineke wisa çêdike; ya kaba û fizîka wê xurt be dikare tevlî şer bibe. Jixwe zilam vê dixwaze, ji ber ku bi gelemperî ew berpirsiyar e, şer di bin serweriya wî de dimeşe. Jineke ku fizîka xwe xurt be, çûye çalakiyan, wê cuda dike û dibêje bila ew were tevlî bibe. Niha ev bi xwe re pîvanan derdixe holê. Di vê demê de kîjan jin tê qebûlkirin? Tenê jina ku di şer de xurt be, bikaribe bar rake, dikare bimeşe tê pejirandin. Belê wê jinên din çawa bin? Meyleke bi vî awayî nîn e; bi giştî jinê beşdar bike, bi hevsengî beşdar bike. Heya roja me ya îro bi awayekî ev feraset didome. Ev tenê wisa nêz nabe, ev di nav jin de jî bandor dike, wekî pîvan pêş dikeve. Heta sala 2012’an ku em di pêş de bûn, di Hemleya Şerê Gel ê Şoreşgerî de cih digirin. Di wê hemlê de taximên xweser çalakiyên xweser dikin. Hevalên jin van çalakiyan bi biryarên xwe, bi hedefên xwe pir berfireh dikin. Rexmê wê jî nêzîkatiyeke wisa hebû; yên di şer de rol lîstin pêşde bûn, rexmê feraseta xwe ya jiyanê tune ye, ji pîvanên azadiyê pir dûr e, lê ji ber hinekê fizîk xurt e xwe wisa ferz dikirin. Wê wextê jî me ev feraset mehkûm kir. Ev feraset di nav jin de jî dibe pîvan; eger fizîka xwe ne xurt be li derve tê hiştin. Esas ev zîhniyeta zi-

lam e, lê dema em jin bigirin dest, em nikarin jinê ji zîhniyeta zilam qut bigirin dest. Di encamê de em jî bi wê zîhniyetê hatin mezinkirin. Jin vê nakokiyê di hundirê xwe de dijî. Wekî feraset mirov dikare vana bibêje.

Sala 1992'yan hêzên Kurd ên Başûr ên wekî PDK û YNK'ê bi hêzên Tirkan re hevkarî dikin. Her wiha konseptek li ser Tevgera me tê destpêkirin. Wê demê li Başûr 3 kampên esasî hene; Heftenîn, Çelê û Xakûrkê. Ev eniyên pêş ên esas in. Li wir erkên gerîla ew e ku wekî eniya paş, şervan û kadroyan amade bikin, mewziyên hatine bidestxistin saxlem bikin. Lê di wê demê de konsepta dijmin tam nayê xwendin. Di vê demê de îhtimala ku dijmin hêzên PDK û YNK'ê jî bigire nava xwe û êrîşî Tevgera me bikin nayê dayîn. Di dawiya sala 1992'yan de şerê Başûr destpê dike, hêzên PDK û YNK'ê êrîşî gerîla dikin, lê bi esasî koordîneya vî şerî dewleta Tirk bi xwe dike, bi balafir, cebilxane desteka teknîkê didin wana û ew jî bi teknîka xwe êrîş dikin. Pêşmerge bi gerîla re dikevin nava şer. Bi vî awayî li Xakûrkê û Heftenînê êrîş destpê dikin û ev şer nêzîkî du mehan didome. Di dîrokê de ev şer wekî **Şerê Îxanetê** tê pênasekirin, ji ber ku hêzên Kurd îxanetê li Tevgera me ya Azadiyê dikin.

Bi giştî di nav vî şerî de 144 heval şehîd dikevin û bi qasî wan birîndar hene. Kesek bi navê Adnan hebû, ew bi xwe ji Şemzînanê bû. Li eyaleta Garzanê subjektîf bi kesên dijmin re kar dikir. Ew jî di şerê Başûr de cihê xwe digire. Paşê bi xwe îtiraf dike ku gelek birîndaran di bin navê êdî ev birîndar in û di şer de giraniyê çêdikin de înfaz dike. Piştî lêpirsîna wî çêdibe bi xwe wan kiryarên xwe îtiraf dike. Gelek kesên nû tevlî vî şerî bûne, heya hin bi cilên xwe yên sivîl diketin nav şer û rola xwe dilîstin. Zanebûn û tecrûbeya hevalên jin hebû hem di eniya Heftenînê de û hem jî di Xakûrkê de. Jixwe tevlîbûn her çêdibin, kampên şervanên nû hene. Hinek heval di mewziyan de şer dikin, hinek heval di qampê de xwarinê çêdikin, dibin mewziyan û hwd. roleke aktîf dileyîzin.

Hevala Azîme ya Mezin li Heftenînê di eniya Batûfa de fermandar e. Li wê derê şerên pir giran rû didin û di wî şerî de hevala Azîme fermandara eniyekê ye, hevalê Cemal fermandarê eniyekê ye, hêza wan eynî ye, asta wan yek e. Di artêşa me de rola hevala Azîme pir cuda ye. Hema bêje bi qasî hevalên din ên mîna Havva (Hanım Yaverkaya) û hevalên ku niha Tevgera me dimeşînin tecrûbe, zanebûna xwe heye. Lê ji ber ku jin e pir dernakeve pêş, lê rola wê pir diyarker e. Ew jî di şerê Behdînanê de cihê xwe digire.

Niha ew şer wisa tê pênasekirin; eniya Heftenînê şer dike, wekî şêwaz ev şer şerê mewziyan bû, şerê parastina qadan bû, nermahiya şer nîn e. Yanî em ê qadan biparêzin, lê çawa qadan biparêzin? Ji ber ku diviyabû qad bihatan parastin. Tengbûn di warê taktîkê de derdikeve, lê ew xeta berxwedanê ye. Serokatî piştre ev pêvajo wekî *gerîlayê întiharwarî* nirxand, ango li ber xwe dide, lê di taktîkê de nermahî nîn e. Ji bo vê jî gelek windahiyên xwe zêde çêdibin.

Li eniya Xakûrkê heval di mewziyan de şer dikin, li ber xwe didin, şehîd dikevin, lê belê Ferhat di wê xeta şer de rastgir e û piştî demekê diçe teslîm dibe. Bi PDK'ê re hevkariyê dike û rê jê re vedikin û diçe Zelê. Di encamê de xeta Ferhat îxanet e. Rexmê tevgerînên Ferhat ên xayînane jî, hêzên di nav mewziyan de îrade nîşan didin û şer dikin. Berevajiyê vê sekna Ferhat, di heman pêvajoyê de hevala Bêrîtan di eniya Xakûrkê de li ser taximekê disekine. Ya rastî xeta berxwedanê di şexsê hevala Bêrîtan de derdikeve holê. Jixwe hîn jî qada Şehîd Bêrîtan li Xakûrkê tê naskirin. Ev derketina hevala Bêrîtan ji bo me girîng e. Serokatî sala 2004'an dema dîsa tesfiyekarê Ferhat û Botan xwe dan pêş, diyar kir ku xeta hevalê Kemal Pîr û xeta hevala Bêrîtan xwedî sekneke serbilind û berxwedêr e, bi vî rengî me jî dawetî vê xetê kir. Ango cihê teslîmiyet û îxanet lê hebe, sekna Bêrîtan û Kemal Pîr mînak e. Dîsa di têkoşînê de ewqas tecrûbe û danehev avabûn û ew jî ji artêşbûnê re bingeh e. Serokatî bingeha artêşbûna jinê bi şeha-

deta hevala Bêrîtan re digire dest. Yanî divê xeta jin di şer de çawa jiyanî bibe, ev bingeheke ji bo artêşbûna jin bê avakirin. Ya rastî ji avakirina artêşa jinê re şehadeta hevala Bêrîtan bersiv e. Wê jin di nav şer de çi bibe zelal dibe û em hevala Bêrîtan wekî fermandara xwe digirin dest.

Hevala Bêrîtan xwedî kesayetek cuda bû. Ji serhildanên salên ‘90’î bandor dibe û sala 1991’an tevlî rêxistinê dibe. 25’ê Cotmeha 1992’yan di Şerê Başûr de çalakiya xwe li dar dixe. Jixwe bi tevlîbûna xwe re hema hatiye Xakûrkê, hevaleke ku hîn saleke wê di nav partiyê de çêbûye. Rexmê wê jî bi çalakiya xwe re dîrokek afirand. Hevala Zîlan jî hevaleke salekê ye, ev heval ne yên kevn in, lê weke hevalên salekê dikarin bi xwe re dîrokekê ava bikin û biafirînin.

Di nav jiyanê de lêgerînên hevala Bêrîtan ên azadiyê pir xurt in. Jixwe ev ferqa hevala Bêrîtan rave dike. Wekî din jî di nav Şerê Başûr de di asta taximê de fermandariyê dike. Hevalek bi coş e û bi vîn tevlî dibe. Xwediyê sekneke serhildêr e. Çawa ku di civakê de nasnameyeke jinê hatiye çêkirin; her girtî ye, li hemberî zilam şermok e, nikare hêza xwe derxe holê, hevala Bêrîtan jî berevajiyê vê ye. Hêza xwe derdixe holê, îradeya xwe derdixe holê û her wekî vê taybetmendiyên xwe yên pir xweş, serhildêr hene. Pêşniyara wê hebû ku romana Serok binivîse, ji bo vê jî bala Serokatî dikişîne. Serok dibêje, “zû bi zû kes vê nabêje, naxwaze.” Ev yek bi naskirinê re têkildar e, bi girêdana wê ve girêdayî ye.

Serokatî der heqê şehîd Bêrîtan de wiha dibêje: “*Hevala Bêrîtan ku di Şerê Başûr de şehîd ketiye, bi her awayî xwedî hewldaneke mezin e. Heval nameyek xwe ji min re hebû, hîn min nebihîstibû ku şehîd ketiye, lê ev heval her di bîra min de bû. Digot ‘ez dixwazim ji dahûrandinên Serok sûd bigirim û ceribandina romanekê bikim.’ Heta niha tu kesî ji me re tiştekî wisa negotiye. Ev hevaleke heta tu bêjî bes baldar bû. Min ev heval bidîta û pêre nîqaş bikira wê pir baş bûya. Lê paşê xebera şehadeta wê hat.*

*Keçek leheng e. Di çalakiya Rubarok de, di asta fermandara taximê de tevlî bûye, birîndar bûye. Rexmê birîndar e jî di Şerê Başûr de li eniya herî pêş cihê xwe digire. Paşê wê dorpêç dikin. Hêzên hevkar, îxanetkar ên djmin bang dikin û dibêjin, 'teslîm bibe, em tiştekê bi te nakin', lê helwesta heval 'we bi dijmin re hevkarî kir, hûn xayîn in, ez teslîmî we nabim.' Tabî bi dirûşmeya Serokê Partiyê bi dengekî serhildêr xwe ji zinarê diavêje. Tabî bi wate ye, çalakiyek pir bi wêrekî ye. Kesayetên ku bi biryardarî wate didin û her cureyê berxwedana lehengî nîşan didin jî derdikevin. Divê bîranîna wê baş bê jiyandin. Ne kesayetek e ku ji rêzê bê girtin, ne jî helwesta wê ji rêzê ye. Ne ku heval bêjin em pê ve girêdayî ne, navê wê li tabûrê bikin. Mesele ne ku tu navê wê li tabûrekê bikî, çawa li ber xwe daye bêje, wisa çareser nabe. Mesele, ew helwesta wê şopandine, tu bidî jiyîne. Jixwe yê ku ev helwest derxistiye holê ew bi xwe ye. Tabî em ê jî vê esas bigirin.*"

Sala 2014'an di dema tesfiyekarî de Serok got, "*jin girêdana xwe bi çiya re heye, ev çiyayîbûn ji bo jin pir girîng e. Ji ber ku girêdana wan bi çiya re heye. Heya aştiyeke birûmet çênebe, jin wê ji çiya danekevin, ji ber ku wê di çiyayan de jina azad biafirînin, jiyana xwe biafirînin û her wiha xeta jinan a têkoşînê xeta Ş. Bêrîtan e.*" Di hevala Bêrîtan de hezkirina çiyê di asteke jor de ye. Herî dawiyê dema hevala Doga çalakî dike, di nameya xwe de wiha got; "Ji bo jinekê çiyayîbûn pir girîng e." Çima? Ji ber ku tu xwe ji pergalê qut dikî, jiyaneke ji pergalê qut bi hêza xwe, bi îrada xwe diafirînî. Azadî di van mekanan de pêş dikeve.

Ez çima vê dibêjim? Rast e hevala Bêrîtan di çiyê de şer kir, li ber xwe da, fedakarî kir, teslîm nebû, riya azadiyê nîşan da, lê divê em milê din jî bibînin. Mînak; niha gelek qadên me yên têkoşînê çêbûne, em siyasetê dikin, lê tu dinêrî, meylên cuda pêş dikevin. Li bajaran xwe ji çiyê qutkirin, xwe ji çiyê dûrxistin, ji siyasetê re meyl, ji dîplomasiyê re meyl, ji civakê re meyl û hwd. pêş dikeve. Lê mekanê ku tu azadiyê tê de biafirînî, çiya ye. Ji ber zehmetiyên çiya bi xwe te fêrî yekbûna navxweyî dike. Di vir de

hezkirina cins pêş dikeve. Yek karekê dike, hêza wê têrê nake, ya din diçe alîkariyê, yanî bi hev re diçin kar dikin. Tu wê hêza xwe nas dikî, hêza hevala xwe nas dikî, desteka hevala xwe dibînî. Dîsa cihekî ji pergala Modernîteya Kapîtalîst qut e. Di çiyê de kok heye, tu li ser vê kokê şîn bibî, ew pêşketin hîn rastir dibe. Tabî di roja me de mesele, ew ruh jiyankirine. Dibe ku ez ji vir biçim qadeke din jî kar bikim, lê hinek heval koka jê hatine kêm dibînin, koka xwe ji bîr dikin. Me hinek hevalên li bajaran kar dikirin bi zorê kişandin. Nayên, li çiyê namînin, ku tên çiyê jî xwe demkî dibînin. Tên perwerdê dibêjin, “hema bila perwerda min xilas bibe, ez vegerim cihê xwe.” Di vir de çi te dikişîne cihê te yê li deştê? Pergala Modernîteya Kapîtalîst te dikişîne. Esas taybetmendiyên pergalê ne. Hevala Bêrîtan ferqa xwe ev e. Ya din jî, hevala Bêrîtan li hemberî xeta Osman a teslîmkariyê tenê ne bersivek e, li hemberî êrîşên dijmin jî peyamek e. Piştî şehadeta hevala Bêrîtan li Başûr bandora wê maye. Ji ber ku cara yekemîn e pêşmerge bi jin re şer dikin û dibînin ku jin teslîm nabe, li şûna teslîmbûnê xwe di zinaran de davêje. Ev bandorekê li ser dijmin dike, hîna jî hinek pêşmerge behsa şehadeta hevala Bêrîtan dikin.

Bi giştî di wê salê de ji Bakur heya Başûr xeta berxwedanê pêş ketiye, jin beşdar bûye, beşdarî şer dibe. Tevlîkirina jin heye. Ferasetên ku digotin jin di şer de bar e, nikare tenê ne ferasetên zilam in, em wisa nenirxînin. Zîhniyeta zilamtî ye, lê di jin de jî ev nêrîn pêş dikeve. Jin hîn bi hêza xwe nebawer e, hinek dibêjin, “ez ê çawa şer bikim?” Çima? Ji ber qet şer nedîtiye. Şikandina wê nêrînê ji bo jin jî rola xwe heye. Ji ber bi zîhniyeta zilam hatiye mezinkirin, ku di civakê de hat dayîn jê re zehmet e, ji ber ku bi zîhniyeta zilam hatiye mezinkirin. Bi vî awayî dema tê nav şer û bi ferasetên bi vî rengî re rû bi rû dimîne, xwe biçûk dibîne, ji xwe bêbawer e û paşê ew jî dibe ferasetên wê bi xwe. Şerê Başûr gelek ferasetên seqet ên li hemberî kadroyên nû û kevin serûbinê hev kir. Ji ber ku kadroya herî nû jî dikare bibe xwedî sekneke herî birûmet, barê şer rake. Jin dikare roleke aktîf, pêşeng bilîze.

Hevala Bêrîtan ji bo artêşbûnê fedaîbûnê şênber dike.

***Hevalên xuyayî yên sala 1992'yê şehîd bûne;***

**Hevala Rehîma Reş**; ji Efrînê ye, rêxistin ji bo xebatê wê dişîne Siwêregê û Siwêreg jî wê demê qadek zehmet bû. Bi taybetî hîn di dema avabûna PKK'ê de şerê li hemberî Bûcakan çêbû, tam bi ser neketibû, serkeftineke nîv bi nîv bû. Yek jî, ew eşîra hevkarê dijmin bi awayek cidî cihê xwe tê de girtibû. Hevala Rehîme jî diçe qadeke ewqas zor kar dimeşîne, heta li wê derê komîteya jin ava dike. Sala 1992'yê li wê herêmê bi dijmin re dikeve nav şer û heya guleya xwe ya dawî şer dike. Paşê dijmin cenazeyê wê datîne ser ereba hespan û wê di nav bajêr de digerînin. Dijmin bi vê kiryara xwe dixwaze bibêje, "namûsa we ev bû", wisa dixwazin wê teşhîr bikin, rencîde bikin û bi vî awayî îradeya gel bişkînin. Yek jî, pir balkêş e; niha hinek dibêjin "ev xebatê Bakur e, lazime hevalên Bakur biçin li wir xebatê bimeşînin, an jî divê nas bike..." Li cem Serok nêzîkatiyeke wisa qet nebû. Berê, Serok gelek hevalên ji Rojava rêkirine metropolên Tirkiyê, kar bi wana daye kirin. Li cem Serok nêzîkatiyeke wisa neteweyî heye.

**Hevala Çîçek (Geyîk Yetîm)**; dawiya sala 1992'yan li Zagrosê di Ava Basya de şehîd dikeve. Di nav şer de rola xwe lîstiye.

**Hevala Rengîn (Halîme Özhan)**; dawiya sala 1990'an bi grûba xwe re tevlî dibe. Di meha Çile ya 1992'yan de li milê Çiravê ya Gabarê şehîd dikeve.

**Hevala Bêrîvan (Emîne Boran)** û **Mizgîn (Ferîde Demîr);** ji milê Stewrê ya ser bi Mêrdînê tevlî bûne. Di meha Gulanê de li Stewrê dijmin cihê wana tespît dike û bi kîmyasalê van hevalan şehîd dixe.

**Hevala Bêrîvan (Zînet Karaaslan);** di sala 1988'an de beşdarî partiyê bûye. Piştî Kongreya PKK'ê ya 4. diçe navenda Wanê ji bo civakê birêxistin bike û ji wana re pêşengiya xebatên serhildanan bike. Rola wê li wir pir diyar e. Sala 1992'yê dijmin li Wanê wê

dorpêç dike, wisa dikeve nav şer û şehîd dikeve.

**Hevala Mizgîn (Gurbet Aydin);** di 11'ê Gulana 1992'yan de li Bidlîsa Tetwanê şehîd dikeve. Ew bi eslê xwe ji Batmanê ye, di sala 1982'yan de rêxistinê nas dike. Destpêkê ji hevalê Mazlûm Doğan re kuryetiyê dike, wisa tevlî xebatan dibe. Her wiha di avakirina Koma Berxwedan de cihê xwe digire. Hem gerîla ye, hem fermandar e, hem jî hunermend e. Pir aliyên xwe yên wekî din jî hene. Jixwe li Ewrûpa ye û di 1988'an de derbasî Lubnanê saha Serokatî dibe. Li wir perwerde dibîne, paşê sala 1989'ê weke berpirsiyara Mêrdînê derbasî herêmê dibe. Wê çaxê li Mêrdînê piraniya xwe xebatên eniyê tên meşandin, ji bo vê jî di nav rêxistina gel de roleke xwe ya diyarker heye. Piştre weke berpirsiyara Mêrdînê tê, tevlî Kongreya PKK'ê ya 4. dibe û pratîka Mêrdînê tê rexnekirin. Li ser vê pratîkê ji bo hevala Mizgîn rexne pêş dikevin. Esas mirov di wir de jî nêzîkatiya zilam a ji jinê re çawa ye, dibîne; esas hevala Mizgîn piştî dikeve lêpirsînê û derdikeve, bê çek derbasî eyaleta Garzanê dibe. Hevala Mizgîn pêvajoyek wisa giran jî jiyan kiriye. Destpêkê di xebatên eniyê de ye. Paşê hevalê Otomatîk Merwan û hevalê Xeyrî li Garzanê şehîd dikevin. Hevalê Kemalê Spêrtî li wir e û Serok jê re dibêje, bila hevala Mizgîn were koordînatoriya eyaleta Garzanê bimeşîne. Li wir êdî di navenda Norşînê de di Newrozê de serhildanan pêş dixe. Gelê eyaleta Bidlîsê jî êdî wê nas dikin û di xebata eniyê de bandora xwe heye.

Balkêş e, Serokatî hevala Mizgîn erkdar dike û heman demê ji ber ku Ferhat fermandarê Biryargeha Başûr e, ew jî yekî bi navê Mahîr ji bo heman erkê dişîne Garzanê. Halbûkî Mahîr yekî tirsonek bû, di şer de ditirse û paşê direve, hewl dide li ser hevalan jî komployan pêş bixe. Hevala Mizgîn û Roza bi hev re karê eniyê dimeşînin. Li Norşînê hevala Roza di malekê de ye, dijmin wê malê dorpêç dike, hevala Roza xwe bi demançeya xwe şehîd dixe. Bi vî awayî hevala Mizgîn diçe xebatên serhildanê bimeşîne. Heval dixwazin wê bikişînin, lê ji ber meha çile ye, berf e, nikarin wê

bikişînin. Mala ku lê dimîne wê îxbar dikin, dijmin malê dorpêç dike. Hevala Mizgîn di nav şer de, li gel wê jî demançe heye û di encamê de xwe bi demançeya xwe şehîd dixe. Hevala Roza û hevala Mizgîn herdû ji bo nekevin destê dijmin xwe bi demançe xwe şehîd dixin. Her du heval jî bi fedaîtî û lehengî şehîd dikevin.

**Hevala Dozdar (Kezban Kiziltoprak)**; ji Amedê ye. Li Stenbolê di YKD'ê (Komeleya Jinên Welatparêz) de xebat meşandiye. Di sala 1992'yan de li Dêrsimê tevlî dibe. Di heman salê de meha Kanûnê di nav şer de bi 5 hevalên din re şehîd dikeve.

**Hevala Rojîn (Hanim Özdemir);** ji Kahta ya Semsûrê ye. Li saha Serokatî perwerde dîtiye. Di meha Cotmehê ya sala 1992'yan de li Malatya Doğanşehîrê şehîd dikeve.

**Hevala Sakîne (Zeliha Toros)**; ji Pazarcikê ye. Di sala 1988'an de li Akademiya Mahsûm Korkmaz perwerde dibîne. Paşê di xebatên bajaran de cih digire. Di sala 1992'yê de li Mereşê Turkoglu şehîd dikeve.

Her çiqasî em sal bi sal pêşketinên di nav Tevgera me de hatine jiyîn bidin jî, esas ji salên '90'an heta '95'an pêvajoyek e. Ev ferasetên em tînin ziman tenê aîdê sala 1992'yê nîn in. Dibe ku di karakterê salê de hinek pêşketinên cuda hene, lê ji sala 1990 heya 1995'ê bi vî awayî ye, ango gav bi gav rola jinê derdikeve pêş. ,

## Artêşbûna Jın Û Lı Hemberî Wê Ferasetên Tesfıyekar

Di sala 1993'yan de atmosfer hinek cuda ye. Ya rastî Serokatî di Kongreya PKK'ê ya 4. de dibêje di şêwaz de, di rêxistinê de di asta stratejîk de û piştî hilweşandina Sosyalîzma Pêkhatî hinek guhertin pêwîst in û her vana dixe rojevê. Piştî hilweşîna Sosyalîzma Pêkhatî hêdî hêdî dahûrandinên bîrdozî jinûve dike. Lê hîn tam teoriya bîrdozî çênekiriye, wekî xeteke bîrdozî birêxistin nekiriye. Pratîk wisa heta sala '93'yan berdewam dike. Bi taybetî me-

zinbûna Tevgerê jî bi dijmin re qenaeteke wisa çêdike ku êdî PKK nayê tunekirin. Ango ev Hereket konseptên der heqê wê de hatin pêşxistin ji bo tesfiyekirina wê ye, gel di qetlîaman re derbas kirine û bi vî awayî xwestin Tevgera Azadiya Kurd tune bikin. Lê sala '93'yan di hemûyan de nebe jî, hinek hêzên navdewletî, bi taybetî yên bi me re şer kirine, di wana de meyleke bi vî awayî pêş dikeve ku PKK bi hêsanî nayê tunekirin. Wê wextê mirov li rêya çareseriyê bigere. Elbet armanc ne çareserkirina pirsgirêka Kurd e. Dibînin ku PKK êdî hêzek e û her diçe girseyî dibe. Dinêrin ku bêy wê nikare tiştekê bikin. Dijmin xwest Tevgera me tune bike, lê nedikarî, ji bo vê bi pêşengiya Turgut Ozal, bi navbeynkariya Celal Talabanî peyama dewletê ji Serokatî re tê. Dewlet dixwaze agirbestê pêş bixe, yanî pêşiya çareseriya demokratîk veke, lê belê hêza dewletê têrê nekir. Dibe ku dibêjin em ê bi riya çareseriyê Tevgerê tesfiye bikin û li vê derê rêbazê tesfiyê cuda pêş dikeve. Serok dibêje di dewletê de wek du meylên cuda çêbûne. Serok êdî vê derfetê wekî firsend dinirxîne, ji ber ku dixwaze guhertin çêbibe.

Derfetên şoreşê çêbûne, şer gihîştiye astekê, çalakiyên gel girseyî bûne, lê em wana nikarin bizivirînin şoreşê. Li ser van esasan guhertineke stratejîk pêwîst e. Me wê demê ev wekî gaveke guhertinê, stratejîk nenirxand. Jixwe Serokatî xwest dewletê biceribîne. Di encamê de Serokatî di Newroza 1993'yan de bangewaziya agirbestê kir. Elbet çareserî ji gelê Tirk qut e? Na, lê bi yekbûna Kurd û Tirkan re wê ev pirsgirêk çareser bibe. Rexmê vana jî, agirbest sabote bû, yanî dewletê di nav xwe de sabote kir. Ji ber ku di nav wan de şer hebû. Heya îro jî kurê Turgut Ozal dibêje, "Bavê min hatiye kuştin." Tenê ew nebû, Eşref Bîtlîs hebû, hin generalên artêşê yên ku ev meyl diparastin dewletê ew di nav xwe de tune kirin. Heman meylê di nav me de jî bandor kiriye. Çi meylên tesfiye di nav me de hebin divê mirov ji êrîşên dijmin qut negire dest. Dibe ku hinek kesayet hîn nehatibûn perwerdekirin, hîn nebibûn milîtan û ev ji wana re dibe zemîn, dewlet ne yekser

be jî, wana beralî dike. Mesela, Şemo (Şemdîn Sakik) hîn gelek tiştên wî zelal nebûne. Serokatî, di sala 1997'an de der heqê wî de dahûrandinên berfireh kir. Di pêvajoya 1992-93'yan de di nav artêşê de hin kes hebûn ku, yekser bi Şemo re di têkiliyê de bûn, wekî di asta JÎTEM'ê de pê re di pêwendiyan de bûn. Şemo wê demê fermandarê eyaleta Amedê bû. Li wir hevalek şehîd dikeve rexmê ku pêvajoya agirbestê ye. Li cihekê bi yekîneyên dijmin re rû bi rû tên û hevalên ku di nav şer de ne yek ji wan şehîd dikeve. Paşê di bin navê em ê bersiv bidin de li Çewlikê çalakiyek mezin tê lidarxistin û 33 leşker tên kuştin. Hevalê Zeynel wê çalakiyê di cihê xwe de pêk tîne, lê bi talîmata Şemo pêk tîne. Jixwe hevalê Zeynel li Amedê tê naskirin, piştre li Dêrsimê şehîd dikeve. Hevalê Zeynel û hinek hevalên din ne ku bi zanebûn dikin, dikevin nav. Yekî ku ne yekser be jî çalakiya wan dikeve bin xizmeta dijmin, lê Şemo bi zanebûn ew beralî kir. Ji ber ku ev 33 leşker bêçek çûbûn, di tatîlê de bi çalakiyê tên kuştin. Hevalên ku çalakiyê pêk tînin nedizanîn bi vî rengî ye. Li ser van esasan agirbest xira bû, sabote bû. Ev ji bo me bû pêvajoya ceribandinê, ji ber ku em nizanin wê dijmin bi rastî ji bo çareseriyê rêbazên cuda bikaribe pêş bixe, meyl heye, nîn e, divê zelal bibe. Serokatî dixwaze vê fêm bike. Lê di her pêvajoyeke agirbestê de şerê pir dijwar jî hatiye jiyîn û em ji pêvajoyek tijî derketin. Ji sala '90'an heta '93'yan şerekî pir dijwar tê jiyîn. Niha gerîla her çiqas şer sekinandîbe jî, xwe ji bo her pêvajoyeke nû amade dike. Ev taktîka Serokatî pêş xistî û li gorî wê perspektîf dayî me, ji bo di her kêliyê de em amade bin. Eger ev agirbest bê sabotekirin jî, derfetên heyî ew ê bizivirîne hêza çareseriya siyasî, lê eger derfet nebe, wê gerîla amadekariya xwe bike. Ji ber ku tam fêmkirin di wan mijaran de çênebibû amadekariyên xurt jî çênebûn. Mînak; di wan salan de em zêde ketin rihetiyê. Li biryargeha Amedê em pir rihet bûn, êdî gel dihat, cihê me dizanîbû û gerîla xwe pratîk nekir.

Xaleke din jî, ji bo pratîka sala 1993'yan Şemo mohra xwe li wan salan dide. Pêkan e ku têkiliya xwe bi dijmin re hebe. Dewle-

ta Tirk zêde propaganda Şemo nekir. Wekî destê rastê yê Serokatî yan jî di Tevgerê de zilamê duyemîn dihat binavkirin. Di '92'yan de hinek qereqolên mezin dihatin girtin, lê dijmin hingî pesnê wî bi gotinên wekî "dema ew dimeşe erd diheje", "di rêxistinê de zilamê duyemîn e" dida, wî jî xwe dixist şûna Serokatî. Di hundir de wekî eyaleta Botanê bandora xwe zêdetir bû. Dixwest cihê çûyî, wir fetih bike. Gelek ciwan ji ber taybetmendiyên xwe yên welatparêz, ji bo Serok tên û tevlî rêxistinê dibin. Dema Serokatî behsa jiyana xwe dike, ew ji bo ku em bikaribin xwe tê de bibînin, em bikaribin bi nakokiyên xwe re rû bi rû bimînin wisa nêzîk dibe. Şemo jî heman tişt ji bo xwe dikir, jiyana xwe nivîsandibû bi navê "Sîneklî Hiso". Ew çawa bû fermandarekî mezin û dergistiya wî hebû û li benda wî bû û hwd. Serok li ser vê mijarê gelek nirxandin pêş xistin. Dîsa di fîlmê Eşqiya de, senaryoya Şener Şen nivîsandiye, pêkane ku tê de bandora jiyana Şemo hebe. Yanî Şemo jiyana xwe ya nivîsandiye, êdî wekî perwerdê dide kadro.

Her wiha li Amedê texrîbatên mezin kiribû. Di salên '93'yan de got, "Jin di şer de nabe, jin weke kulîlkek narîn e." Ferasetên wisa pêş dixe, lewma hevalên jin ên tevlî dibin, şûnde rêdike. Yên ku digirt jî ji bo xebatên çapemeniyê bûn. Jin weke metayek cinsî pêşkêş dikir û eşkere dikir. Ji bo hinek fermandaran jin eyar dikir û rewa dikir, normal didît. Jixwe jiyana wî bi wî şêwazî bû û xwe dixist mînak. Xwe wekî kesê herî pêşketî digirt dest û yên ku tevlî nedibûn, wekî kesên herî paşketî raber dikir. Jinên ku hinek xwe jê dûr dixistin ji wana re digot, "Hûn çiqasî kevneperest in!" Bilançoya sala 1993'yan ji bo jinên ku tevlî dibin û şûnde dizivirîne malê, 300 kes in. Hin ji wan di nav xebatên eniyê de mane. Mînak; hevala Rîhan hebû. Pir kêm çek peyda dikirin, ên ku didîtin jî çend demançe bûn. Wê çaxê gelek heval hatin girtin, şehîd xistin. Ango Tevgera me heya astekê tesfiye kir, a din jî êrîş li ser xeta Serok kir. Serok digot, "Temînata xeta Serok xebatên jinê û gerîlabûn e", Şemo jî jixwe darbeyê li herdûyan dixe,

nahêle xebata jin mezin bibe, texrîbatan çêdike, çend kesên mane jî wekî cinsê meta bi kar tîne, yên din jî jixwe piranî rêkirine hepsan, rêkirine malê. Ev Li ser civakê jî bandor dike; eger keçek tevlî bibe û tu bizivirînî malê, êdî di civakê de zû bi zû nayê qebûlkirin. Li hemberî rêxistinê jî bêbawerbûnê pêş dixe.

Sala 1993'yan li eyaleta Tolhildan jî Terzî Cemal heye, hema bêje heman pratîka Şemo meşandiye. Xeta wî sîxurê provokatîf e û wê li ser Partiyê ferz dike. Gelek ciwanên ku nû tevlî bûne ji wana re dibêje sîxur in û wana qetil dike. Gengaz e ku hin kes nehatine ronîkirin. Serokatî jî di parêznameyên xwe de 3 navan dide; Saîme Aşkin, Ayşe Akarsu û Ayten Nisêbîn. Têkiliya jin û zilam dike sedem û wan kesan qetil dike, di êşkenceyan re derbas dike. Wekî din a balkêş, gelek heval şehîd dikevin û kes nikare mudaxele bike. Nimûne; Serok hinek grûbên hevalan wekî mudaxele dişîne eyaleta Tolhildanê, lê ew grûp diçin, paşê şehîd dikevin. Lewma ez dibêjim, van meylan ji dijmin qut nîn in. Wê demê ango meha Tebaxê ya sala 1993'yê li çiyayê Engîzekê grûba hevalê Şexo Dîrlîk ku ji 18 hevalan pêk dihat, tev bi hev re bi kîmyasalê şehîd dikevin. Li cihekê 13 heval bi hev re tên girtin û demek dirêj rastî êşkenceyeke giran tên. Nimûne; dijmin wê demê kimyasal bi kar anî, hinek heval bi kîmyasalê şehîd ketin. Heta tê gotin, grûbeke şervanên nû ya ji 70 kesan pêk dihat, 22 heval hîn bi cilên xwe yên sivîl di kemîneke dijmin de şehîd dikevin. Dîsa li Islahiyê grûbeke hevalan dikevin dorpêçê, dijmin agir berdide daristanê û li wir 9 heval ji ber dûxanê şehîd dikevin. Dîsa roja 3'yê Nîsana 1993'yê li Pazarcikê 11 heval bi kîmyasalê şehîd dikevin. Wisa grûb grûb şehadetên komî çêdibin. Adeta komkujiyên wisa giştî çêdibin.

Li eyaleta Tolhildanê divê em li ser rewşa hinek hevalên jin bisekinin;

**Hevala Fîdan (Zeynep Kalan)**; ji herêma Tolhildanê ye û li wir di nav civakê de xebat meşandiye. Heta dijmin jî ew nas kiriye, ji

ber wê jê re dibêjin *Kara Fatma*. Di meha Cotmehê ya sala 1992'yê de li gundê Armutlu ya girêdayî Pazarcikê bi 5 hevalan re şehîd dikeve. Balkêş e, di wê bûyerê de tenê Terzî Cemal xilas dibe, hevalên din tev şehîd dibin. Dijmin cenazê van hevalan bi panzêrê ve girê dide û di nav gund de digerîne, paşê dibe navçeyê, li wir jî kiryarên xwe yên derveyî mirovahiyê raber dike. Li hemberî vê kiryara dijmin a derveyî exlaqên mirovahiyê berevajî bandor dibe, ji bo bersiva vê nêzîkatiya dijmin, ji nav gel 22 ciwan xwe birêxistin dikin û tevlî Partiyê dibin, wisa kîna xwe raber dikin.

Hevala Şîrîn (Emîne Dalkiliç) û Kurdistan (Aynur Turan) hene, ev herdû heval di '93'yan de ji aliyê Terzî Cemal ve hatine qetilkirin. Ev navên tên zanîn in û gelek navên nayên zanîn jî hene.

Serokatî di dawiya salê de wan hemûyan kesên tesfiyekar dikişîne saha xwe, mudaxele dike.

Heman demê sala 1993'yan pratîka Mêrdînê heye. Tevlîbûn gelek çêdibin û qada serhildanê ye. Li Mêrdînê jî pratîka Egîdê Qaso heye. Egîdê Qaso li ser gel pir texrîbatan dike û jinê pir bi kar tîne. Van tesfiyekaran her jinê dixin amûrê xwe û dişixulînin. Jina ku nû tevlî rêxistinê dibe nizane, wana wekî fermandar ji xwe re mînak digire. Li Mêrdînê di xebatên eniyê, nav gel de ye. Nimûne; behsa hevala Rojîn dikirin ku, hevaleke pir xurt e. Digotin, hinek zilam hene bi dijmin re dixebitin, an li hemberî gel an jî li hemberî gerîla şaşîtiyek kiriye; ew derdixist hemberî civakê, bi simbêlên zilaman digirt û teşhîr dikir. Vê bi hevalên jin dide kirin. Civak feodal e, zilam be dîsa, lê bi hevalek jin dana kirin tiştek cuda ye. Bi giştî ev, nêzîkatiyên feodal di nav civakê de pêş dixe. Yanî civakê bi vî awayî ji Partiyê dûr dixe. Ji ber tevlîbûnek xurt heye, ew jî dixwaze bi gel re aciziyekê çêbike ku bi zanebûn pêşiya tevlîbûn û pêşketinên civakê bigire. Jixwe paşê Mêrdîn nehat ser xwe, her grûbên ku diçûn îmha dibûn. Mêrdîn ji bilî Bagok û çend cihên din hemû stargeh in, gel bi te re nebe tu nikarî xwe li

wê derê bidî jiyîn. Heta ji bo pratîka Mêrdînê digotin, “pratîka mirîşkan”. Çima? Ji ber gel ji gerîla hez dikir. Jixwe paşê Egîdê mala Qaso ji vê pratîkê tê darizandin.

Di Şerê Başûr de Ferhat diçe peymanekê çêdike û riya Zelê jê re vedikin. Paşê hêz çû, li wir kom bû. Nêzîkî 600 jin li wir kom dibin, wekî 7 tabûran xwe birêxistin dikin. Hevala Azîme wê demê li ser tabûrekê disekine, ji ber ku hevaleke ji xwe bawer e, tabûra xwe heya astekê diparêze. Heman ferasetê li Amedê Şemo û li Zelê Ferhat li ser Hereketê ferz dikin. Ya rastî wê demê Ferhat şerê xwe yê li dijî xeta Serok destpê dike. Hin pîvanên çîna burjûvayên biçûk ji bo jinê derdixîne û hin kesan li derdora xwe kom dike. Ev kesên ku li derdora Ferhat diman Sewra, Peyman bûn.

Wê demê hevaleke jin pir ciwan e, nû tevlî bûye. Ferhat wê digire ba xwe di bin navê “ez ê wê pêş bixim” de. Pîvanên pêşxistina wî jî şêwazê jiyana burjûvayê biçûk e. Van pîvanan wekî pîvanên azadiyê dide der. Ya rastî li Zelê Ferhat xwe xistiye şûna Serok, xwe kiriye serokê sexte. Çawa ku Serok li Akademiya Mahsûm Korkmaz hevalên jin perwerde dike, ew jî teqlîda Serok dike, hevalên jin li derdora xwe kom dike, perwerde dike.

Li Zelê jiyana xwecihî (yerleşik) ferz dike, yanî li Başûr cara yekê jiyana rûniştî pêş dixe. Heya roja îro me ew terz derbas nekiriye rexmê ku em di nav şer de ne û hêz tê guhertin. Li Lolanê tiştê ku tê mehkûmkirin esas Ferhat heman tiştê dike. Bi YNK û PDK’ê re peyman daniye, teslîm bûye. Wê xanî ji xwe re ava bike û tê de bimîne, ango xwe dispêre hêzek din. Yek jî, bi vî awayî jiyaneke dejenere bûyî ferz dike.

Hevala Azîme ji ber van nêzîkatî û ferasetên wî pir zehmetiyê dikişîne. Çima? Eger neyê xetê, wê derveyî xwe dibînin û bi rengekî serde diçin, ji bo vê li wir Hevala Azîme teşhîr dikin, qaşo pratîka wê rexne dikin. Yanî yên ku wekî wî neke li derve dihêle. Hevala Azîme jî ne keseke ku her tiştî qebûl bike. Rexne dike, red

dike, ji bo wê Ferhat hevala Azîme ji xwe re hedef digire.

Tabî Serokatî dixwaze danehevên ku li Zelê kom bûne binirxîne, ji ber ku gelek jin ji şer hatine û tecrûbe girtine, ast zêde ye, hejmar zêde ye. Bi vî awayî dixwaze kongreyekê bide çêkirin. Heya wê demê YJWK rêxistina jin e, lê belê li Ewrûpa ye û bi taybetî xebatên civakî dimeşîne. Hevalên ku di nav artêşê û gerîla de cih digirin YJWK'ê weke rêxistina xwe ya esasî dibînin. Mixabin rola YJWK'ê wisa nîn e ku hemû welat û xebatan koordîne bike. Lê zanebûna xwe heye, rêxistina me ya xweser YJWK ye. Heya sala 1991'an pêvajoya Kongreya PKK'ê ya 3. xwe birêxistin dike.

Serokatî dixwaze ew tecrûbeyên jinê yên hene, êdî jin bi xwe bingeha artêşbûnê pêş bixe, hem jî rêxistineke xwe hebe ku bikaribe hemû jinan îdare bike û tenê bi hinek xebatên civakî re sînordar nemîne. Li ser vî esasî Serok dixwaze Zelê binirxîne. Perspektîf dide û ev wê bibe Yekemîn Kongreya Jin a Kurdistanê. Eşkere ye Ferhat dixwaze şekil bide kongreyê û dike jî. Pêwîste ev kongre pratîkên herêman ên hene, li ser jinê texrîbatên çêbûne, tesfiyekarên xwestine jinê bi kar bînin û ferasetên ku di nav pratîkê de derketine holê bigire dest, her wiha jinê ji vê rewşê xilas bike. Li ser van esasan ji bo di kongreyê de were nîqaşkirin Serok 49 pirsan amade dike û pêşkêş dike;

**1.** Bandorên Îslamiyetê yên li ser jinê çi ne?

**2.** Em li ku dera azadiyê ne?

**3.** Li hundir û derve dijminên azadiya jinê kî ne? Em baş nas bikin û teşhîs bikin.

**4.** Yên ku vê pirsgirêkê îstismar dikin, dikin tabû kî ne? Em wana baş nas bikin û teşhîs bikin.

**5.** Şoreş û zewac, taybetmendiyên şoreşgerî hûr bikolin, rexne bikin (di nav şert û mercan de).

**6.** Yên ji nêzîkatiya şoreşgerî direvin kî ne?

**7.** Encamên nêzîkatiya şoreşgerî, rastiya kesên ji derveyî ajoyên xwe nêz nabin çi ye?

**8.** Feraseta mulk û azadiyê, bandora wê ya li ser têkiliya jin û zilam.

**9.** Têkiliyên ku hene divê kengî bên derbaskirin an jî redkirin?

**10.** Hinek taybetmendiyên nêzîkbûna desthilatdariya zilam a li ser jiyan û rastiyê çi ne?

**11.** Di têkiliyan de pîvanên azadî û koletiyê çi ne, ji hezkirinê dûrbûn wê çawa be?

**12.** Di têkiliyan de pîvana şer û Partiyê divê çawa be?

**13.** Hezkirin û xerîze, nêzîkbûnên derveyî erkan, li beramberî wê pîvanên ku xwe bispêrin rêzdayînê çi ne?

**14.** Di têkiliyan de pîvanên qebûl-red çi ne?

**15.** Têkiliya ku divê rêz jê re were raberkirin divê bi çi awayî be? Destpêka wê û pêşveçûna wê çawa ye?

**16.** Di têkiliyan de rewşa cinsîtiyê divê çawa bê fêmkirin? Di warê aborî û çandî de bandora xwe li ser rastiya cins çi ye?

**17.** Li beramberî rastiya me ya siyasî û şoreşgerî, ji pirsgirêkên têkiliya cinsî re çawa nêz bibin?

**18.** Di bin têkiliya zayendî û namûsê de rastiya heyî çi ye?

**19.** Exlaqê zayendî dema tê gotin, çi tê fêmkirin?

**20.** Ji pirsgirêka jinê re nêzîkbûnên şoreşger, wê çawa pêşengî jê re bê kirin?

**21.** Eşq û dildariyên ku mirov rêz raber bike, der heqê wan de em

çi bêjin û asta pêşketina wê çi ye?

**22.** Zewac divê çawa bê pênasekirin? Girêdana xwe bi pergalê re, bi mulkiyetê re, bi koletiyê re, bi têkiliya hakimiyetê re zext çi ne?

**23.** Pêvajoya zewacên şoreşgerî, derfeta wê heye yan nîn e? Şekil û naveroka wê xwe dispêre çi?

**24.** Têkiliya di nav şoreşê de, windahiyên jin û zilam çi ne?

**25.** Di bin navê zewacê de tiştên ku em jiyan dikin, em çawa xwe dixapînin û girêdana wê bi nêzîkbûnên kevneşopî re çi ye?

**26.** Asta pêşketinên hevalan pêwîste rast bê nirxandin. Erka xwe, nêzîkbûnên xwe û hêza çareseriyê çiqas çêdibe?

**27.** Di kesan de qabiliyeta hilbijartinê û sedemên hilbijartinê, modela wê û tiştên ku pê ve girêdayî xwe bispêrin hedefê wê çi bin?

**28.** Têkiliyên destpêkê çi ne, tê çi maneyê û wê çawa bê derbas-kirin?

**29.** Jin şoreşgeriyê pêş dixe, karaktera wê serkêşiya şoreşê dike. Çima?

**30.** Jin divê zilam biafirîne, neçar e. Ji ber çi?

**31.** Di Kurdistanê de têkiliya şoreşê bi hezkirin û xweşikbûnê re çi ye?

**32.** Pîvanên jin û zilam ên îdeal çi ne?

**33.** Jina ku pêwîste bê qebûlkirin wê çawa be?

**34.** Kîjan têkilî dejenere ye, kîjan têkilî bi xwe re bilindahiyê pêş dixe?

**35.** Jina ku gotin û çalakiya xwe dixe yek kî ye?

**36.** Azadiya hal-hereketê pêşiya hilbijartina azadiyê vedike?

**37.** Dîtin, fêmkirin û zanebûn pêwîst e. Girêdana wê bi têkoşînê re çi ye?

**38.** Sedema ji hev qetandina jin û zilam? Di têkiliyan de bi-yanîbûn, dijbertî û valabûn çawa vedigerin zewacê?

**39.** Li gorî zilam ger jin şekil dide xwe, ew kole ye.

**40.** Li zanîngehan di bin navê azadiyê de jin hîn zêdetir tê koleki-rin.

**41.** Bêy ku tu nas bikî têkiliya ku bê pêşxistin çawa bi xwe re însan ber bi tunebûnê ve dibe?

**42.** Nêzîkbûnên lîberal ên burjûvayên biçûk bê nirxandin.

**43.** Kesayeta jin ku bawerî digire.

**44.** Têkiliya jin bi obje-sûbje re, bawerî û koletî, di sûbje û azadiyê de yekbûna wan çi ye?

**45.** Di zewacê de fermiyet, sextekarî û durûtî, zewicandin û aza-diyê muqayese bikin.

**46.** Li beramberî van rastiyan divê tevahî hevalên me asta pêşke-tinên xwe binirxînin, ji pirsgirêkan û erkan re wê çawa nêz bibe û bibe hêza çareseriyê? Ev têgîn asta wê ya pêşketina di nav PKK'ê de çi ye?

**47.** Di PKK'ê de pirsgirêk û çareserî gihiştiye çi astê, bandora xwe ya erenî û neyînî çi ye?

**48.** Cihê ku Partî û Serokatî lê hebe têkilî dihejin.

**49.** Çareseriyên Serokatiyê çi ne? Xofa ku jin jiyan dike bersiva wê ye.

Wekî tê zanîn kongreya TAJK'ê di bin siya Ferhat (Osman Oca-

lan) de tê lidarxistin. Jixwe hin biryarên ku li wir tên girtin derveyî xetê ne. Yanî armanca van pirsan ew e ku lêpirsînek çêbibe û alternatîf jê re bê danîn. Her wiha mirov ji van pirsan fêm dike ku Serok tevgera jin tenê şer bike, yan jî ji pirsgirêkên şer re bersiv bide, ne wisa ye. Heman demê pirsgirêkeke civakê tehlîl dike. Tevgera jinê ku çêbibe, divê ji civakê re pêşengiyê bike. Di civakê de tiştê ku tu pê re rû bi rû bimînî, bandora wê li ser pêkhateya milîtanan çi ye? Wekî xwedî kesayeteke jinê divê bikaribe tehlîl bike, wê çawa azad bibe, koletiyê çawa çareser bike, di civakê de têkiliyên ku hene wek zewicîn û ji hev qetandin û hwd. Ya rastî em ji hemû pirsgirêkên jinê re nabin çareserî. Bûyer tê milê me û divê em çareser bikin, lê em rêbazê wê nizanin. Rêbazê me yê çareseriyê wê çi be û jê re çareserî danaxin holê. Ji bo vê jî Tevgera me her ku diçe dûrîçav dibe û danakeve civakê.

Xuya ye ku Serokatî dixwaze rêxistineke jinê wisa ava bike û dixe hedef ku bikaribe ji hemû civakê re bibe bersiv. Ji bo ji pirsgirêkên azadiya jinê re bibe bersiv û heman demê ji civakê re bibe bersiv. Lê di wê kongreyê de Ferhat li gorî xwe pîvanan pêş dixe, dibêje “Ez im zilamê azad”. Ango eger hilbijartin çêbibe wê Ferhat bi ser bikeve. Heman demê Şemo ji kongreyê re nameyekê rêdike û dixwaze heman bandorê li ser bike. Jixwe di wê nameyê de “Jin çîçekek narîn e” nivîsandiye. Serok jî dinêre kongre di bin siya wana de derbas dibe, ji bo vê got, “Jin jî teslîmî xeta teslîmiyetê ya zilam bûye” û li ser van esasan vê kongreyê napejirîne û red dike. Berevajî dibêje, divê jin bi vîna xwe ya cewherî biryar bigire.

Serokatî, li şûna wê di sala 1993’yan de perspektîf da hevalên Ewrûpa ku kongreya jin a çaremîn were birêxistinkirin û bi vî awayî Kongreya YJWK’ê ya 4. tê lidarxistin. Li şûna kongreya din a li Zelê hatî çêkirin cihê xwe digire. Li wir biryar hat girtin ku tevgera jinê êdî bibe TAJK (Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê). Hedef ew e ku bikaribe jinên li welat hatine birêxistinkirin, bigire nava xwe. Lê TAJK zêde di nav me de rûnenişt, ji ber ku YJWK bingeha

xwe rêxistinek gel bû û jixwe bi girseyî tevlî kongreyê dibin. Di şopandina xeta Serokatî de hin biryar tên girtin. Ev jî ji bo kongreya jin a li Zelê di bin siya tesfiyekaran de hatî çêkirin bersivek bû.

Serokatî bi wê kongreya jin a li Ewrûpa hatî çêkirin mudaxeleyê kongreya li Zelê kir, lê mudaxeleya esasî bi biryara avakirina artêşa jinê pêk tîne. Serok dawiya meha Mijdarê û destpêka Kanûnê ya 1993'yan dahûrandinekê pêş dixe û dibêje, divê artêşa jin were pêşxistin. Yanî talîmata avakirina artêşa jinê dide. Esas xebata Serok wisa stratejîk dibe. Di welat de ev xebatek stratejîk e. Serok wê demê nêrînên fermandarên eyaletan jî digire, ji ber nêrînên fermandarên herêman diyarker bûn. Wê demê li Botanê rêxistina jin heye, taxim, yekîne, tabûr û hwd. hene. Li eyaletên Amedê, Dêrsimê jixwe li milê çiya gerîla nebûn, piraniya xwe di eniyan de bûn. Qismê hebûn jî weke mangeyên xweser xwe birêxistin dikirin. Ne tenê di mangên hevalên xort de bimînin, êdî di mangên xwe de dimînin. Van guhertinan xebata jin di aliyê leşkerî de zêdetir kûr dikin. Me ji bo dîroka artêşbûna jinê, di konferansa YJA-STAR a dawî de li ser nêrîna ku divê destpêka wê hebe, roja şehadeta hevala Bêrîtan 25'ê Cotmehê diyar kir. Tabî hêja ye ev dîrok were nîqaşkirin. Çima? Ji ber ku Serokatî talîmata der barê artêşbûna jinê de dawiya meha Mijdarê û destpêka meha Kanûnê dide. Ji wê dîrokê şûn de ev gava artêşbûna jinê dikeve pratîkê. Tabî wekî sembolîk em roja şehadeta hevala Bêrîtan dihesibînin. Dema Serok nêrînên fermandarên eyaletan li ser mesela artêşbûna jinê digire, esas fermandarê tu eyaletekê tevlî nabe, tenê li eyaleta Botanê hevalê Cemal tevlî dibe. Ew jî, ji ber hevalê Cemal li eyaleta Botanê tevlîbûna hevalên jin a di nav şer de dibîne ku, jin çawa rola xwe dilîze. Serok bi xwe jî nêrînên xwe der heqê hejmaran de dide, dibêje "ji sedî deh an jî bîst bila hevalên jin bin". Rexmê ewqas îtiraz hene jî Serokatî cardin talîmatê dide. Ji ber ku di aliyê Serok de bi rastî nêzîkbûneke stratejîk heye. Pêwîste jin bi xwe xwe birêxistin bike, daneheveke jin heye,

tecrûbeyek heye. Jixwe tune be, nikare biryarek wisa bistîne. Artêşek bê bingeh nabe, jixwe bingehek xwe heye. Yek sedema wê jî ji pratîka Mêrdîn, Amed, Rojavayê Başûr (Güneybatı) û Zelê re bibe bersiv. Tesfiyekariyê çawa jin bi kar anî, dixe amûrê xwe û hilweşandinekê di nav partiyê de çêdikin? Serok li dijî tesfiyekaran dixwaze di şexsê hevala Bêrîtan de berxwedana jinê weke xetekê derxe pêş. Mesele, ne tenê xizmeta Tevgera Azadiya Jinê bike, Serokatî bi vê yekê re esas dixwaze di giştî Partiyê de gavavêtinekê çêbike. Jin pêşengiya vê bike, lê divê xeta berxwedanê bilind bike. Yek armanc jî, ev e.

Xala din, êdî jin jî gihiştiye wê astê ku Serok dixwaze jin bi hêza xwe ya cewherî xwe birêxistin bike, yanî xwe bispêre vîna xwe ya cewherî. Ji bo vê jî Serok kongreya jin a Zelê napejirîne, ji ber ku li wir vîna jinê nabîne. Artêşbûn bingeha vîna cewherî ava dike. Ji bo ku jin bikaribe bi cewherê xwe tevbigere, jê re firsendê amade dike. Mekanê herî guncav jî çiya ye, vê jî nikare li mangên hevalên xort pêş bixe.

Serok dixwaze xebata azadiyê bigihîne asteke stratejîk. Li vir ne ku Serok dibêje "*jin azad nebe, civak azad nabe*", stratejîk digire dest. Yanî wê jin di şoreşa Kurdistanê de roleke çawa bilîze? Ya rastî zemînê şoreşa jinê ava dike. Li hemberî tevahî kesên tesfiyekar, ên ku xwe li ser xetê ferz dikin, nêzîkbûnên zilamê serdest, jinê biparêze û wê jî berevajî xwe bixe hêzek û seknekê nîşan bide. Her wiha ew xeta tesfiyekar ku xwe li ser xeta me û Tevgera me ferz dike, pratîka "çeteya çaran" û şer bi texrîbatên zilam re bandor dike. Ya rastî Serok dixwaze artêşa jinê wekî amûrekê li beramberî wê pêş bixe. Yek jî, şer karakterê xwe yê wisa heye, nakokiyan hîn zêdetir zindî dike. Nimûne; li Ewrûpa çar kongreyên jinê çêbûn, ew zemînê jinê ye, lê şer tiştekî cuda ye, nakokiyan hîn zindî derdixe. Serokatî artêşbûnê wiha pênase dike: "Newekheviya heyî bi riya artêşê re em bikaribin wekheviyê pêş bixin". Mînak; newekheviya ku di navbera jin û zilam de heye. Em ê çawa vê newekheviyê bizivirînin wekheviyê. Ango di nav şer de,

em hebûna nasnameya xwe dixin holê. Jixwe di Kurdistanê de hebûna me tê înkarkirin, nasnama cins jî tê înkarkirin. Niha tu dixwazî hebûna nasnama xwe ya cins derxî holê. Di vê mijarê de wê bi çi çêbibe? Wê bi şer çêbibe. Ji ber cuda tu derfeta te nîn e. Di Kurdistanê de ne pêkan e ku tiştek çêbibe, weke jin bikaribe hebûna xwe biparêze. Tu wekî Kurdekê nikarî jiyan bikî, hele hele weke jin ne pêkan e.

Jin kevneperest be dibe xeteriyek ji bo xeta partiyê, eger bi kevneşopiyên zilam re bibe yek, ew ê bi xwe re hilweşînên mezin bîne. Di encamê de artêşa jin amûra çareseriyê ye ku ji bo kevneşopî û kevneperestiyan ji holê rake. Heman demê di artêşê de cih girtin bi xwe re pergala dijmin, pergala civakê diguherîne. Li ser van esasan Serok digot, “*Artêşa jin tenê artêşa leşkerî nîn e, heman demê artêşek siyasî ye, civakî ye, çandî ye.*” Ji ber ku bi demê re çandeke wisa bi xwe re ava dike, guhertina civakê daye pêşiya xwe. Mesele ne tenê amûreke leşkerî ye, ne wisa ye. Pê re modela civaka nû tê avakirin, esas alternatîf tê afirandin.

Xisûsa din, şer karakterê zilam e, artêş karakterê zilam e. Şer kengî destpê dike? Dema zilam xwe birêxistin dike ji bo ku bikaribe desthilatdariya xwe ferz bike, destpê dike. Tundiyê jî wisa bi kar tîne, zîhniyeta zilam e. Ango artêşên çêbûne li ser esasê karakterê zîhniyeta zilam çêbûne. Artêşbûna jinê ji şer re nêzîkbûneke nû ye, têkoşînek nû ye. Şer ji bo wekhevî, aştî û afirandina civakek nû ye. Serokatî dibêje, “Artêşa jin erka xwe azadî û wekhevî ye.” Ji bo zîhniyeta zilam were derbaskirin erkeke wisa dixe pêşiya jin. Dîsa artêş bi xwe re pîvanên qebûl-red tîne. Wê jinek çawa bê qebûlkirin? Ev hem ji bo jin û hem jî ji bo zilam zelalbûnê ava dike. Kesekî wekî Hogir di şer de cih girtiye, lê texrîbatên xwe pir zêde ne, pratîkeke çete meşandiye, dîsa jî xelat jê re tê dayîn. Çima? Di şer de xurt e. Ev tê qebûlkirin. Jixwe artêşbûna jinê pêşiya van nêzîkatiyan digire. Rêbertî di dahûrandinên xwe de digot, “Ji bo ku tu bikaribî asta civakê tehlîl bikî, asta jin li wir çi be asta civakê jî nîşan dide.” Ji bo rêxistina me jî

wisa ye. Jin di rêxistinekê de kom bûne, nêzîkatiyên te ji bo wê çi bin, li giştî jî ew in. Tu pîvanên feodal ferz bikî, wê karakterê wê hereketê jî ew be. Asta azadiya jin çi be, ya giştî jî ew e. Artêşa jin roleke wisa dileyîze. Ji vê re nêzîkbûn çawa bû? Me berî niha got, gelek fermandarên herêman artêşa jinê qebûl nekirin. Heta paşê henekê xwe dikirin, digotin “artêşa sor hat, em ê hêza we bibînin bê ka hûn çiqas in” û hwd. nêzîkatiyên wisa hebûn. Bi giştî nêzîkatiyên wan wisa bûn na, di encamê de rêxistinek bi Serok ve girêdayî ye. Eger fêm nekin jî ji ber ku Serok gotiye pêk tînin, yanî tiştekî dizane wisa dibêje.

Elbet ferasetên paşverû zêde ne û xwe rû didin. Çiqas qebûl bike yan red bike jî di pratîkê de ferasetên xwe nîşan dide. Her wiha gelek jinan jî wate nedidan ew ê ji ber çi bên cudakirin, ji ber rewşa ku heyî qebûl dikirin. Artêşbûn tê wê maneyê ku êdî tê ji zilam qut bibî. Lê belê jina kevneşopî naxwaze ji zilam qut bibe. Dema em ferasetan digirin dest divê em bizanin em ê kîjan kesayetan red bikin. Halbûkî jin wê hêza xwe derxe, wê hezkirina xwe ji hev re derxe, amûreke wisa ye. Çima red dike? Ferasetên kevneşop in, ji ber girêdayî zilam e, ji xwe ne bawer e, wê bê zilam çawa şer bike, wê çawa xwe di çiyê de biparêze û hwd. fikirandinên wisa hebûn.

Berevajî hin ferasetên esasî bûn sedema moraleke mezin. Jin êdî cara yekê di nav şer de maye, wê hêza xwe birêxistin bike, wê xwe bi xwe birêve bibe. Kelecanek cuda di hinek hevalên jin de ava kir. Hema piştî wê li tevahî qadên leşkerî li gor derfetan hinek taxim û yekîneyên jin saz bûn. Mînak, li Amedê carekê gelek heval di eniyê de kom dikin û tînin, gelek ji wan bê cil bûn, zivistanê bi etekên xwe bûn. Îçtima, perwerde bi vî rengî derbas dibû. Baregeha zivistanê me bi xwe çêkir, me qural pêk dianîn. Vê jiyanê hiştiye ku em ji hêza xwe bawer bin. Cara ewil çalakiyên xweser tên lidarxistin, ew jî li ser riya di navbera Cudî û Şirnexê de çêdibe. Di bin fermandariya hevala Sozdar Xelîla de rê qut dikin. Cemsê leşker tê û lê didin, leşkerek dimire, yek jî birîndar dibe.

Heval di wê çalakiyê de tu windahiyan nadin.

Di bihara 1994’an de li Amedê hevala Besê (Suna Çiçek) heye. Diviyabû ji Botanê derbasî Dêrsimê bibe, lê ji ber şert û mercên zivistanê nikarin berfê derbas bikin, wisa li Amedê dimînin. Di berpirsyariya wê de yekîneyek tê avakirin. Di bihara 1994’an de çalakiyekê pêk tînin, riya di navbera Genç û Licê de qut dikin. Di wê çalakiyê de 11 hevalên jin beşdar dibin. Hevala Çîçek li saha Serok maye, di çalakiyan de cih girtiye, wisa ji xwe bawer e. Bi rastî fermandar bû, çalakvan bû.

Li Zagrosê hêzeke mezin a hevalên jin heye, rexmê ku şert û mercên zivistana Zagrosê zehmet in, Serok perspektîf da ku li wir kampa hevalên jin ava bibe. Tabûra yekemîn ku li wir çêdibe, rêveberiya wê Newal Serhed, Zekiye Botan û Zozan Fereşîn in ku paşê her sê jî ji partiyê qut dibin. Ev şêwazê birêxistinbûnê piştî perspektîfa Serok a der barê artêşbûnê de tê pêşxistin. Êdî wê di pratîkê de wekî taxim û yekîneyê bimeşîne, Serok ji bo vê erk da fermandarên eyaletan. Esas di pêşketina artêşa jin de eyalet berpirsyar bûn, lê hin kesan derfetên madî li ser hevalên jin qut dikirin, di bin navê “Bila jin ji xwe re pereyan peyda bikin.” Jixwe ew tişt hemû aîdê partiyê ne. Di zilam de ferasetek wisa pêş ketiye; xwe xwediyê partiyê dibîne, hemû derfetên rêxistinê yên heyî xwe xwediyê wan dibîne. Jixwe tu ne aîdê partiyê bî, kesek gepek nan jî nade te. Hemû li ser nasnameya PKK’ê digirin. Lê nêzîkatiyên wisa çewt hebûn.

Ji bo meşandina artêşê Komîteyên Wekhevî û Azadiyê saz bûn. Rola wan ew bû ku mijarên hevbeş bi hev re nîqaş bikin. Êdî jin di komîteyên jor ên rêxistinê de cih digirin. Pirsgirêkên heyî wê bi hevbeşî çareser bikin, çalakiyên hevbeş bên kirin, pratîkên hevbeş werin meşandin. Wê têkilî li ser van komîteyan re werin çêkirin, lê di pratîkê de cuda dimeşiya. Her kes bi navê komîteyê nedimeşiya, lê bi xwezayî ew dibû berpirsyar, zilam jî dibû muhatab. Ji bo artêşbûna jinê Serok digot, “*Em çawa wekî gelekî*

*daxwaziyên hebûna xwe bigihînin artêşa gerîla, pêwîste jin jî weke cinsekê daxwazên xwe bi artêşbûnê re îfade bike. Heya niha hemû artêş li gorî karakterê zilam ava bûne û pêşengî kirine, lê me ev kûr kir. Jinê ewqas di nav şer de, di serhildanan de rol leyîstiye.*” Serok wisa perspektîf dide: “*Me çawa wekî gelekî xwe kir artêş, me daxwazên xwe bi serkeftî kirin rêzê, hûn jî weke beşekê, wekî gelekî rêxistina xwe ya cins bikaribin bikin, li gor min hûn ê bibin artêşek bihêz. Milîtan û berdevkên we hene. Ya din jî, di ceribandinê de hêzek derketiye holê. Jin di serhildanan de rol dilîze, di gerîla de rol dilîze. Artêş di dîrokê de heta roja îro wekî karê zilam tê ecibandin. Xebata leşkerî ketiye bin yekdestiya zilam. Di vê sahê de nêzîkatiyên jin hem wekî exlaq û hem jî wekî siyasetê hema bêje hatiye qedexekirin. Bala xwe bidinê; em vê qedexeyê hildiweşînin. Dîroka ku li pêşiya mehkûmkirina artêşa jin, dîsa di roja me de pir hindik cih dane jinên leşkerbûnê dahf didin. Jixwe xwesteka wê ya gerîla ev e. Xwesteka wê ya gerîla bi xwesteka wê ya azadiyê ve girêdayî ye. Dixwaze azadiya xwe di nav gerîla de pêk bîne. Yanî di nava gerîla de artêşbûna jinê wê çi îfade bike. Pêwîste ji vê re zelaliyek çêbibe. Ji bo we ev hîn pêwîst e. Wexta ji me re dibêjin gerîla ‘şeklê ku ev hîn bêhtir karê zilama ye, nêzîkatiyên kevneşop bibandor in. Jin jî zêde îdîa xwe nebe, herî hindik fizîkî, ruhî û di aliyê din de xwe tam tevlînekirina civakê rê li ber çîna wê ya duyemîn vedike. Îhtimala xeteriya ku li ser artêşbûna zilam zêde bibe jî heye. Yanî îhtimala ku bê rewşa xeteriya ku li artêşbûna zilam zêde bibe heye. Hindik maye bi siya zilam tevbigere. Li vê derê pasîf, bi daxwaza xwe ya azadiyê re ne hevsengbûn û gerîlabûnê ji bo azadiya kesayeta xwe nedîtin, adeta zilam jê re çi bêje, ji ber xwe ve pêre wekî koleyan hevsengî nîşandan, li vê hêla xwe ya baş û nebaş binirxîne û tevlî bike dûr e. Vesaziya wê ya nava civakê çi be, eynî wê jî tîne nav gerîla. Ev xeter e. Ji ber vê yekê gerîla dibe, heta xebatên siyasî dibin, birêxistinkirina jin, artêşbûna wê, taybetmendiyên wê, daxwazên xwe yên xweser têxe saxlemiyê girîngiyek pêwîst dihewîne. Eger em vê nekin, wê azadiya jin vala derkeve. Bi qasî ku di pirsgirêka*

*netewî de ji pirsgirêka jin xilasbûn, bi xwe fikrên xwe, birêxistinkirina çalakiyan pêwîste bimeşîne. Madem em bi gerîla ava dikin, jin jî xilasbûna xwe di xilasbûna gerîla de dibe. Bi giştî parçeyek ji artêşbûna gerîla ye. Di nav artêşê de ye, lê xweseriya xwe heye. Dikare vê xweseriya xwe di artêşbûna gerîla de jî nîşan bide. Wekî di nav civakê de jina ku bi temamî di bin însiyatîfa zilam de be bi zanebûn, ji ber xwe ve bigihe hêza artêşekê û di nav artêşbûna gerîla de cih girtin a herî rast e. Ev jî bi daxwaza wê ya azadiyê ve girêdayî ye.*"

Gelek caran pirsgirêk hilweşandin dihatin jiyîn, Serok jî ji xwe pirs dikir: "*Gelo me şaş kiriye?*" Her wiha digot, "*Gelek cesaret dixwaze, hêz dixwaze, bi hezaran salan kevneşopiyek heye, lê min jî jin aniye xistiye artêşê, ez bi agir re dileyîzim. Min jin ji destê zilaman xilas kir û xistiye rêxistinê. Nakokî jî zêde di asteke jor de ne. Jixwe jina ku daxwaza xwe ya azadiyê hebe, berê xwe dide şer. Em jî bersiva wê didin, eleqa ji Serok re derve pir çêdibe. Dema gerîla tê gotin, ew jî wek karê zilaman tê dîtin. Ji bo pêşiya van nerînan bê girtin divê jin di her qadê de bikaribe di nav civakê de rêxistina xwe wekî artêş ava bike.*" Serokatî dibêje, "*Artêşa me ya giştî heye, jin jî wê di nav de cih bigire, lê heman demê xweseriya wê heye.*" Ango ne wek kes, wê wekî rêxistin tevlî qaîde û quralan bibe. Serok di van xebatan de xwe dîtin, xwe naskirin, hêza xwe derxistina holê, hedefên xwe tespît kirin û di nav artêşê de cihgirtina jinê girîng dibîne. Lewma dibêje; "*Tevahî giraniyên me ferqa artêşê diyar dike. Pêwîste artêşa jin sosyalîst be, ferqa xwe derxe holê, wekheviyê biparêze. Li hemberî nêzîkatiyên şaş wekî rêxistin dikarin pêşî lê bigirin. Desthilatdariya zilam, wekî wî dikişîne newekheviyê û her wiha ji hemû balpiştan dûr mayîn, heta bi wî re derfeta têkoşînek bi wate dayîn, li kêleka jin bi xwe nasnameya xwe dîtin, ji bo derxistina hêza xwe ya ez çi me, ji ku têm, kî me, divê ez çawa bim, pêwîstiya min bi jiyanek çawa heye? Destpêkê ez xwe nas bikim, ez xwe bigihînim îradeyek azad, ez xwe bikim xwediyê azadiyek zana, ez xwe bikim xwediyê hêzek*

*zana. Ji bo ev pêkan be, divê artêşbûna jin bibe amûreke ku tu nikaribe dev jê berde. Hinek heval dibêjin 'ez pîvanên azadî û wekheviyê dikarim pêş bixim.' Dibe kadroyên partiyê bi hejmarek sînordar pêk bînin, lê pirsgirêk ne tenê çend kes pêk bînin, mesele ne tenê pêkanîna çend komîteyan û rêveberan e, pirsgirêk gel in. Pirsgirêk, ji niha ve bi hezaran keçên tevlî gerîla bûne, şoreşgerbûna wana ye. Em ji bîr nekin ku ji niha ve keçeke ciwan ku nû tevlî bûye fermandarek, rêveberek eger pîvanên azadiyê li ber çavan negire pir rihet dikare çors, feodal nêz bibe. Keç û xortên ji zanîngehan hatine, têkiliya şexsî bi hev ve hatine girêdan. Dikarin navgînê şîlo bikin, an jî çiqas hereketê berevajiyê artêşan hene, dikarin heta dawiyê xwe bidinê, heta objektîf dikarin şeklê xeteriyên sîxuran, tesfiyekaran bidin jiyîn. Ev têkilî rewa dîtin, qebûl kirin, di nav xwe de jiyankirina sîstemê ye. Ev jî qontrayê ku nikaribin zirarê bidin, didin.*

*Bifikirin ku mekanîzma we ya parastinê heye, zilamek dixwaze neheqiyê li jinekê bike. Ew rêxistin, yekbûn li dijî wî bisekine, zilam dikare çi bike? Ji ber her roj bi hezaran neheqiyên wisa dibin. Yek bi yek zîhniyeta zilam hûn xwe bavêjin niyeta baş, hevjîn an jî rêhevalekî te, hûn çareseriyê nabînin. Hûn bi artêşa xwe, bi rêxistina xwe çareseriya herî rast in.*"

Di zîndanan de gelek hevalên me girtî ne, kêm zêde jî zehmetî tê dîtin, ji ber ku ji pergala wir piraniya xwe hevalên xort berpirsiyar in. Wê jin di zîndanê de çawa xwe birêxistin bike, di wê mijarê de zehmetî hene. Di navbera salên 1990-93'yan de xeta berxwedana zîndanan didome. Serokatî bi taybetî hin hevalan amade dike û dixe lêhûrbûnê. Li ser mudaxeleyên ku hatine kirin, li beramberî wan alternatîf tên amadekirin. Bi vî awayî di dawiya sala 1993'yan de Konferansa PKK'ê ya 3. bi dirûşmeya "***Em Partîbûnê Pêk Bînin, Şer Qezenc Bikin***" tê lidarxistin.

Di dawiya sala 1992'yan de li Bekaayê kampa Serok tê girtin. Li şûna wê, li Şamê êdî dibistan vedibe, dîsa malên lêhûrbûnê hene.

Jixwe Konferansa PKK’ê ya 3. li saha Serok çêdibe, pratîkên eyaletên Tolhildan, Amed, Mêrdînê tên nirxandin. Li wir biryara şerê bitevger tê girtin, ev jî ji bo fêrbûna terz e. Mixabin piraniya hevalan di êrîşên li ser qereqolan de şehîd neketin. Ji bo vê Serok dixwaze perspektîfên terz û şêwazekî nû di gerîla de pêş bixe.

***Di sala 1993’yan de hevalên jin ên şehîd bûne:***

**Hevala Mizgîn Serhed**, weke fermandara taximê li eyaleta Zagrosê erk digire û her wiha di rêveberiya wir de ye. Ji bo xebatên eniyê sala 1993’yan diçe Geverê. Di dema xebatan de li malekê îxbar çêdibe, paşê di nav şer de şehîd dikeve. Li ser Geverê bandora wê hebû.

**Hevala Mizgîn Pazarcik (Ayşe Acar)**, di meha Gulanê ya 1993’yê de beşdarî nav refên Partiyê dibe. Li eyaleta Amedê Mijdara 1993’yê di kemîneke dijmin de şehîd dikeve.

**Hevala Rewşen (Semra Aba)**, di sala 1992’yan de tevlî bûye, di meha Îlonê ya sala 1993’yê de li Kerboran şehîd dikeve.

**Hevala Hulya Bingol (Zeynep-Bêrîvan)**, di sala 1992’yan de tevlî bûye. Li Dêrsimê gerîlatiyê dike. Di meha Adarê ya 1993’yan de dikeve operasyonê û di nav şer de şehîd dikeve.

## Mudaxeleya Hêzên NATO’yê Lı Ser Kurdıstanê

Salên 1994’an wekî atmosfera siyasî têkoşîneke pir dijwar tê meşandin. Li beramberî wê mudaxeleyên yekser ên Amerîka di bin navê hêzên NATO’yê de çêdibin. Di rêveberiya Tirkiyê de kesên wekî Demîrel, Çîller û Doğan Güreş hene. Wê demê li ser vê mijarê Çîller got, “roniya kesk ji me re pê xistin.” Her wiha li Almanyayê PKK tê qedexekirin, pêşî li çalakiyên girseyî tê girtin. Bi taybetî li Kurdistanê şerê taybet dikeve dewrê, kuştinên failê wê ne diyar tên destpêkirin, rêxistinên wekî Hizbullah, kontrgerîla zêdetir pêş dixin. Di gerîla de jî rastiyeke stratejîk a wisa heye; gerîla masî ye û gel jî behre, ango gerîla bê gel nikare jiyan

bike. Dijmin ji bo vê di sala ‘93’yan de dest bi şewitandina gundan dike, heta ‘94’an didome. Dijmin berê xwe dide gel, gundan vala dikin û dişewitînin. Di fermiyetê de tê gotin ku 4000 gund li milê Bakurê Kurdistanê hatine şewitandin, wisa koçberî zêde çêdibe. Paşê gelek kes derbasî metropolên Tirkiyê dibin, xelkê milê Botanê piraniya xwe derbasî Başûr dibin. Di nav operasyonên ku pêş dikevin de motîfên dînî pir zêde tên bikaranîn. Der heqê gel de bangewaziyên weke, “PKK ne misilman e, vana ermenî ne” tên kirin. Dijmin êdî di operasyonên sala ‘94’an de bi navê “eyşecîk” jinan jî tînin nav operasyonan, ji bo leşkerên xwe wana dişixulînin. Ji ber bi mehan wê li araziyê bimana. Carina jinên eyşecîk tîşort li xwe dikirin û derdiketin ser giran, dizanîbûn ku gerîla li wê derê hene.

Sala 1993’yê ewil 52 balafir bi hev re hemwext êrîşî ser Zelê dikin, ji ber dijmin wê derê lewaz dibîne. Hevala Binefş roleke girîng li wir dileyîze. Hevala Binefş di sala 1991’an de li Xakûrkê herêma Geliyê Azadî balafirekê dixe xwarê, paşê li Zapê şehîd dikeve.

Ji ber ev sal saleke cuda ye Serok di dibistana xwe de êdî grûban dixe lêhûrbûnê û bi vî rengî amadekariya Kongreya PKK’ê ya 5. dike. Di warê jin de li Başûr, Botanê, Amedê, Dêrsim û Erziromê pratîkên xweser û yekîneyên xweser pêş dikevin. Dîsa di zivistanê de perwerdeyên xweser hatine dîtin.

Van operasyonên sala ‘94’an çawa ku bandora xwe li ser qadên Bakur dikin, heman demê bandora xwe li ser xebatên me yên artêşbûna jinê jî dikin; ji ber ku dijmin dikeve araziyê û ev bû sedem ku gerîla bi hejmarek kêmtir tevbigere, veşartî bimîne, hevalên jin jî perçe dibin. Hevalên xort gelek caran ev rewş li dijî me dişixulandin. Digotin “hûn çima yekîne bûn, niha bûne taxim?” Wekî bê halê we ew e. Gelek qad di destê me de ne, dijmin jî hewl dide wan ji destê me bigire. Jixwe ji vê operasyonê re digotin “Operasyona Melkesê” (Süpürge Operasyonu). Gerîla jî zeh-

metî dikişand, ji ber ku bi carekê re berê xwe dan ser wê qadê, gund şewitandin û gel nema. Mesela, berê em bi hejmarek zêde tevdigeriyan, lê êdî bi vî terzî nabe. Ya ku di Konferansa PKK'ê ya 3. de pêş ket, em ê çawa şerê bitevger bimeşînin. Dîsa hin qad hene rizgarkirî ne û dijmin di yek-du rojan de dikete wir. Rexmê van operasyonan xeta berxwedanê her didome û hevalên jin jî rola xwe dileyîzin.

Di heman salê de li Ewrûpa, bi taybetî li Almanya qedexekirina pîrozbahiyên girseyî hatin kirin û hevala Bêrîvan û Ronahî di şeva Newroza sala 1994'ê de agir bi bedena xwe dixin. Me berî niha jî anîbû ziman ku, pêla serhildanê li ser hemû perçeyên Kurdistanê bandor dike. Li Ewrûpa jî pêla serhildanan destpê dike. Serok di dahûrandineke xwe de ji rêveberiya Ewrûpayê re dibêje, “Hûn ê çiqas girseyê kom bikin?”, hevalên rêveberiyê bersiv didin û dibêjin, “Encex derdora 10.000 kesan.” Halbûkî wê salê 40.000 kes tevlî çalakiyan dibin. Li ser van esasan Serok rêveberiyê rexne dike û dibêje, “Hûn ji gel bêbawer in.” Li wê derê hevala Bêrîvan û Ronahî asta êrîşên dijmin dibînin, ji ber dijmin Newrozê qedexe dike.

Hevala Bêrîvan ji Dêrsimê ye, malbata wê dixwazin wê bizewicînin, lê ew red dike û tevlî rêxistinê dibe. Hevala Ronahî ji Elbîstana Mereşê ye. Her du heval di nav xebatên rêxistinî de cihê xwe digirin, li Ewrûpayê di sala 1992'yan de perwerde dibînin. Dîsa sala 1994'an di heman perwerdê de dimînin, jixwe li wir hevdû nas dikin. Çalakiyê bi hev re plan dikin. Cihê ku çalakiya xwe çêdikin girîng e. Li Manheîmê pêk tînin, di nav parqekê de li derdora wan jî av heye, girseya gel jî dibîne. Ango ev tê wê maneyê ku ya rastî îradeyek di holê de heye. Nimûne; eger bixwaze dikare xwe bavêje avê ji bo agir bitemirîne, lê belê ew li hemberî avê agir berdidin bedena xwe. Lewma ji wana re dibêjin, “**Topên Agir**”. Hevala Bêrîvan yekser li wir şehîd dikeve û hevala Ronahî radikin nexweşxanê, rojekê sax dimîne û ew jî şehîd dikeve. Dema çalakiya xwe dikin nameyekê dihelin û tê de îfade dikin ku ev

çalakî ji bo girseyê tê çêkirin, ango bangewaziya wan ji gel re ye. Newroza gel pîroz dikin û dibêjin, “Em dixwazin vê çalakiyê dewrê we bikin”, ango divê gel lê xwedî derkeve. Dîsa baweriya wan bi jinê heye ku bikaribin di têkoşînê de rola pêşeng bileyîzin û bang li jinan dikin. Heman demê dibêjin, “Çiqas gelê Ewrûpayê hebe, divê têkoşîna xwe bidomîne û berê xwe bide Kurdistanê”. Bi rastî Ewrûpa navenda pergala Modernîteya Kapîtalîst e. Serok gelek caran digot, “hevalên çûne Ewrûpa mane û sax filitîne, ne heliya ne, ev kesên ku bi têkoşînê ve girêdayî ne.” Her du heval jî di navendek wisa de çalakiya xwe dikin. Serokatî, çalakiya hevala Bêrîvan û Ronahî wisa pênase kir: “*Eger azadî hêsan bûya Ronahî û Bêrîvan xwe nedişewitandin. Esas ev cewhera milîtaniya şoreşgerî ne. Lewma divê em bi rêz vê çalakiyê pêşwazî bikin. Heman demê ev heval pir zana û bi plan vê çalakiyê pêk tînin. Mesela, cihê ku çalakiyê li dar dixin kes nikare mudaxele bike, nikare wî agirî bitefîne. Tenê ji xwe re encamgirtinê hedef dikin. Ev jî li hemberî pergala Ewrûpayê ku jinê dixe, kesayetê dixe bersivek e.*”

Şemo sala 1993’yan ji pratîkê tê kişandin û tê saha Serokatî, paşê li ser Serhedê re careke din tê welat û pozîsyona wî fermandarê saha Bakur bû. Ji Serhedê destpê dike, heya sala 1995’an diçe Dêrsimê. Dixwest hemû welat fetih bike. Ji vê rêwîtiya xwe re digot, “Meşa Mao”, ango biçe kîjan eyaletê wê feraseta xwe li wir biçîne. Li Serhedê meylên kûr hatin jiyîn, li wir jî grûba hevalê Aliyê Dirêj şehîd dikeve û hevalên jin jî di grûbê de hene. Dijmin dixwaze Bakur bi giştî teslîm bigire. Her wiha hêza fermandar a jin şehîd dikevin. Mînak; Serokatî hevala Rûken Turk ji bo fermandariyê amade dike û dişîne, lê di rê de şehîd dikeve. Hevala Cîhan Goyî li Botanê sala ‘94’an şehîd dikeve. Li Erziromê, Dêrsimê di asta fermandariyê de şehadet çêdibin. Di wê salê de li Dêrsimê hevalê Zeynel û hevala Besê şehîd dikevin. Her wiha li Botanê ji bo bersiva operasyonan berxwedanek çêdibe. Vê rewşê hiştiye ku bi jinê re di têkoşîna zayendî de kûrbûnek bê jiyîn. Di wê mijarê de zanebûna ku pêş dikeve dizivirîne têkoşînê. Li hem-

berî zilam êdî xwedî seknek û helwestekê ne. Bi artêşbûnê re xeteke ku ji hêza xwe bawer e û di nav şer de rol dileyîze derket holê. Ev jî dihêle têkoşîna zayendî di jinê de pêş bikeve. Her ku şer xurt dibe zanista cins û artêşbûnê jî pêş dikeve.

Serokatî di wê salê de dixwaze xebatê bi çepên Tirkan re pêş bixe û rêxistina DHP'ê (Partiya Şoreşgerên Gelan-Devrimci Halklar Partisi) tê avakirin. Meral Kidir heye, jê re pêşengiyê dike û heman demê Tirk e. Li ser van esasan Serok jî wê weke nirx dibîne û her dixwaze wê pêş bixe. Meral, karakterê xwe hinek weke ya Fatma ye û roleke wek seroktiyê dide xwe. Dema ji Serok re not rêdike, ne li ser navê xwe, li ser navê Koordînatoriya DHP'ê ango serokê partiyekê rêdike. Dijmin di sala '94'an de li ser wan jî êrîş dike, lê ew tedbîrên xwe nagirin, ji bêtedbîriyê qederek ji wan tên girtin.

***Şehadetên jin ên di sala 1994'ê de çêbûne;***

**Hevala Azîme ya Mezin (Mihriban Saran)**; sala 1994'ê li Botanê bi hawanê şehîd dikeve. Hevala Azîme di artêşbûna giştî û jin de di asta koordînê de cihê xwe digire. Di vê wateyê de bi zilam re şer kirin tu bikî nekî bandora ferasetên zilam çêdibe. Hevala Azîme jî hinekî bandor dibe. Di encamê de ji bo artêşbûna jinê rola hevala Azîme ya girîng, pêşeng e. Di nav HPG'ê de wateya hevalê Egîd çawa be, di nav artêşa jin de jî wate û girîngiya hevala Azîme bi heman rengî ye. Hevala Azîme ji Varto ye, dema tevlî dibe mamoste ye. Dema nû tevlî dibe li çiyayên Şerefdînê dimîne, paşê di sala 1981'an de tê saha Serokatî. Piştî perwerdê jî her di nav artêşê de dimîne. Esas ew mînaka fermandariya jin e. Her wiha di Şerê Başûr ê sala 1992'yê de roleke xwe ya pêşeng heye, li eniya Batûfa fermandariyê dike. Dîsa bi helwestên xwe yên zelal, radîkal tê naskirin. Yanî gava ferasetek şaş hebûya, li hemberî wî disekinî.

**Hevala Rûken Turk (Hatice Afitap Demirer)**; ji Çorumê ye. Di 1987'an de di nav YCK'ê de xebat meşandiye, di 1989'an de li

Edîrne di nav Komîteya Ciwanên Welatparêz de cih girtiye. Sala ‘90’î tevlî partiyê dibe, li ser Rojhilatê Kurdistanê re tê Xakûrkê û li wir û Zelê dimîne. Heman demê di nav şerê Başûr de cihê xwe girtiye û li wir birîndar dibe. Li Akademiya Mahsûm Korkmaz dewreya perwerdê dibîne, tevlî Konferansa PKK’ê ya 3. dibe û paşê vesaziya wê li eyaleta Serhedê çêdibe. Di 10’ê Gulana 1994’an de di nav kemîneke dijmin de şehîd dikeve.

**Hevala Besê (Suna Çiçek)**; ji Dêrsimê ye, ew jî destpêka sala 1991’an li ser Botanê re tevlî rêxistinê dibe, piştre tê Zagrosê, li wir demekê dimîne. Dawiya 1991’an derbasî saha Serokatî dibe û perwerde dibîne. Bihara 1992’yê di asta berpirsiyar de careke din derbasî Botanê dibe. Di 1993’yan de tê li Amedê dimîne û ji wir diçe Dêrsimê. Hezîrana 1994’an di çalakiya li ser qereqola Tanzê de şehîd dikeve. Bi girseyî cenaze li Dêrsimê tê pêşwazîkirin, gel xwedî li cenazeyê heval derdikeve. Ev jî li Dêrsimê cara yekê pêk tê.

**Hevala Azîme Efrîn;** sala 1992’yan li saha Serokatî dimîne. Serok ji bo xebata artêşbûnê wê amade dike. Sala 1993’yan derbasî welat dibe û li Heftenîn, Zelê û Xakûrkê dimîne, li wir fermandara yekîneyê bû. Di sala 1994’an de li Zapê Çiyayê Reş şehîd dikeve. Tabî van hevalan di artêşbûna me ya jinê de rol lîstine.

**Hevala Xezal (Sakîne Laylagül)**; ji Meletî ye û sala 1992’yê tevlî rêxistinê bûye. Di meha Sibata 1994’an de li navçeya Dîgor a girêdayî Qersê bi hevalek din re di nav şer de şehîd dikeve.

Li Geverê **hevala Dilovan** heye, ji Batmanê ye û di sala 1991’ê de tevlî hereketê dibe. Zanîngeh dixwend û paşê ji Stenbolê tevlî dibe. Di dawiya 1992’yê de derbasî Geverê dibe û di asta xebatên parastina cewherî de kar dike. Li Geverê li ser mala tê de ye îxbar çêdibe, di nav şer de şehîd dikeve.

**Hevala Sînem**; sala 1970’yê li Doğubeyazit tê dunyayê. Dema li Malatya zanîngehê dixwîne, li wir di nav xebatên YCK’ê de cihê

xwe digire. Sala ‘90’î tevî 8 hevalên xwe tevlî rêxistinê dibe û demekê li Heftenînê dimîne, piştre derbasî eyaleta Amedê dibe. Di nav artêşa jinê de rola wê zêde bû. Di nav rêveberiya herêmê de cihê xwe digirt, fermandara taxima hevalên jin bû. Di meha Tebaxa 1994’an de wekî çalakî bi ser gundekî cerdevanan ê bi navê Deşta Xuytê de (girêdayî Mûtkî) digirin, di wê çalakiyê de şehîd dikeve.

**Hevala Semra Hatîpoglu**; ji Bedlîsê ye. Malbata wê pir welatparêz nîn e, lê bi xwe xwendekar e, li Stenbolê dimîne û heya demekê di nav xebatên YCK’ê de cihê xwe digire. Di sala 1993’yan de tevlî Partiyê dibe û li Stenbolê xebata gel dimeşîne. Sala 1994’ê li Beyogluya Stenbolê di nav amadekariyên çalakiyê de mayîn di destê wê de diteqe. Hevalekî xort jî pê re ye û her du bi hev re şehîd dibin.

**Hevala Serhildan (Hatîce Kileş)**; ji Mêrdînê ye, di sala 1992’yan de tevlî dibe. Li Zelê dimîne û di 1994’an de meha Hezîranê li Zagrosê şehîd dikeve.

**Hevala Cahîde Qehreman (Yildiz Uçar)**; di sala 1991’an de tevlî dibe, li Metîna dimîne û li qadên cur bi cur xebat dimeşîne. Sala 1994’ê li Zagrosê di nav kemînê de şehîd dikeve.

**Hevala Nêrgiz Mijînî (Bahar Kaplan)**; sala 1989’ê tevlî rêxistinê dibe û di sala 1994’an de li Garzanê di nav şerekî bi cerdevan re şehîd dikeve. Rola xwe li Garzanê zêde hebû.

**Hevala Zarîn (Aygul Çaçan);** sala 1993’yê tevlî rêxistinê dibe. Bi eslê xwe ji Tetwanê ye. Li Manîsa xebatan di nav gel de dimeşîne. Di meha Îlona 1994’an de li Manîsa ji bo ku nekeve destê dijmin bi demançê xwe şehîd dixe.

Hinek heval taybet li qadên Tirkiyê şehîd dikevin. **Hevala Elîf (Hêvî Leyla Çelîk)**, di sala 1992’yan de tevlî bûye. Li Sakarya û Adapazarê xebat dimeşîne. Amadekariyên çalakiya sabotajê dike, lê ji ber ku bomba wê zû diteqe ji ser hişê xwe diçe û dijmin bi

êşkencê wê şehîd dixe.

Tabî mirov ji van şehadetan fêm dike ku, erê di welat de artêşa jin ava bûye, li saha welat şehadet hene, lê bi qasî wê di metropolên Tirkiyê de jî şehadetên me hene. Ji ber ku êdî xebat di bajaran de jî tên meşandin. Bi taybetî bi navê YCK'ê xebat destpê dikin, yek jî Serok kadro dişîne bajaran û salên 1992-93'yê gelek ji wan tên girtin. Bi rastî di zîndanê de jî van hevalan li ber xwe dan. Mînak; li Stenbolê gelek heval di asta kadro de ji aliyê dijmin ve tên girtin. Hevala Besê Erzîncan jî wê çaxê li Stenbolê tê girtin. Hingî li ber xwe dide nasnameya xwe jî ji dijmin re nabêje. Tabî ev sekin wekî xeta berxwedanê mohra xwe li wan salan dixe.

Heman demê hevalek bi navê Sorgul hebû, piştre li Garzanê ma. Dibe ku paşê aqilê xwe winda kir, lê ev hevala Sorgul sala 1992'yê dijmin resmê wê di televîzyonê de dida û digot, "kî vê nas dike bila îxbar bikin", wê hevalê heta navê xwe jî negot. Yek jî, dema ji zîndanê derdikeve diçe saha Serok, piştî wê derê Serok wê dişîne Garzanê. Pir zanebûn di nav hevalên jin de nebû ku tiştên rast-şaş tam ji hev derbixin. Lê hevala Sorgul sala 1994'ê, Ebûbekir wê demê fermandarê sahê bû, civînekê ji hevalan re çêdike. Ew heval cesareta xwe hebû ku, di wê civînê de rabû û got "tu tesfiyekar î, tiştên tu dibêjî tev ên tesfiyekaran e". Ebûbekir got, "rûne cihê xwe!" Wê hevalê got, "Ez rûnanim!" Çawa? Ev hevalek wisa bû ku, xeta Serok çawa were parastin dizanî. Ya din jî, wate nedida gelek tiştan, qebûl nedikir. Herhal ji ber wê aqilê we winda kir. Vê carê dibû qîreqîra wê, qiyamet radikir. Elbet terzê xwe yê têkoşînê bê rêbaz bû, lê qet bêdeng nedima. Nimûne, hevalên jin rastî zextan dihatin, Ebûbekir dixwest hinek nêzîkatiyên cuda pêş bixe; hevala Sorgul heval diparastin, bi wan dihesiya û digot, "ma Ebûbekir şaş nêzî te bû? Careke din nece cem wî!" Gava Ebûbekir gazî hevalekê dikir, wê digot "bila tenê neçe!" Yanî hevalek wisa bû. Tabî vana bi taybetî di birêxistinkirina girseya me ya li metropolên Tirkiyê de rolek cidî lîstin, hem jî di zîndanan de berxwedana xwe ya li hemberî dewleta Tirk mînak

e.

## Damezrandına Yekîtıya Azadıya Jınên Kurdıstanê (YAJK)

Sala 1995’an Serokatî erkeke stratejîk wekî sala guhertinê digire dest, bi vî awayî rol dide. Bi taybetî piştî sala ‘90’î bi pêşketinên cîhanê ve girêdayî bi mudaxeleya Rojhilata Navîn re eleqedar jinûve guhertina paradîgmayê pêwîst dibîne. Li ser van esasan Sosyalîzma Pêkhatî hilweşiya ye, êdî cîhan ne du qutûb e, divê hemû têkoşîn spartekên xwe diyar bikin, hedefên têkoşînê diyar bikin. Ev jî stratejiya têkoşînê diyar dike. Ya rastî Serok li ser vî esasî dixwaze guhertinê pêş bixe. Bi vî awayî Kongreya PKK’ê ya 5. li Heftenînê tê lidarxistin. Di Kongreyê de pirtûka Serokatî ya bi navê ***Di Sosyalîzmê de israrkirin, di Însan de Israrkirin e*** (Sozyalizmde ısrar, insan olmakta ısrardır) tê xwendin. Ev rapora polîtîk a wê kongreyê ye. Serokatî li ser sosyalîzma zanistî ya hatiye jiyîn tehlîlekê pêş dixe. Cara yekê di wir de li ser Sosyalîzma Reel rexneyan pêş dixe. Dîsa ji ber ku Kongreya PKK’ê ya 4. herî dawî sala 1991’an hatibû lidarxistin, diviya pratîkên 4 salan bihata nirxandin. Her wiha pratîkên giran hatibûn jiyîn. Wekî pratîka Zelê li Amedê pratîka Şemo heye, li Mêrdînê pratîka Egîdê Qaso heye, pratîka Gûneybati ya Terzî Cemal heye û pêwîste vana bên nirxandin. Bi taybetî di Şerê Başûr de du xet pêş ketin; xeta teslîmiyetê û xeta berxwedanê. Pêwîst bû vana tev di wê kongreyê de bihatan nirxandin, ev rol jî ji vê kongreyê tê dayîn.

Mijara din, nêzîkatiyên ji bo jinê tên nîqaşkirin. Bi taybetî hin pratîkên şer hene ku zilam dixwaze bi jinê îzah bike. Di bin navê jin hebûn, têkiliyên kevneşopî çêbûn, ji bo wê evqas texrîbat derketin û hwd. Serok dixwaze ev di wê Kongreyê de bên nirxandin, ji ber ku di hemû pratîkên sûc de jin jî hatiye şixulandin. Ji bo di wê kongreyê de biryara herî stratejîk derket ew e; jin pêwîste kongreya xwe li dar bixe û welat bi giştî bigire nava xwe. Rast e berê tecrûbên rêxistina YJWK û TAJK’ê hene, bi artêşê gaveke din xebatên jin pêşve çûn, lê belê ne di asteke ku welat hemû bigire

hundirê xwe de bû. Ya rastî di Kongreya 5. de guhertinên bingehîn tên jiyîn, lê di pêkhateya kadro de ev tam nayê fêmkirin. Ji bo wê Serok di Kongreya Pêncemîn de wekî perspektîf dide. Eger tehlîlên di wê kongreyê de ji bo herêmê, ji bo cîhanê ku hatine kirin rast bihatan fêmkirin, esas PKK'ê xwe li gorî wan guhertinan bigirta dest, diviyabû wekî pêvajoya 1998-99'an bûya. Dîsa agirbest çêbibû, lê belê ji aliyê Şemo ve hatibû sabotekirin û pêwîst bû ew bihata dadgehkirin, ji ber ku kiryarên Şemo yên wê demê sûceke mezin bû. Berevajî, di kongreyê de erka xwe zêde bû û berpirsiyariyên mezin digire, jixwe paşê diçe biryargeha navendî. Di warê leşkerî de biryarên werimandî tên girtin, Serokatî ji bo taktîkek nû pêş bikeve digot, "Şerê Bitevger". Lê li wir biryara ku em Tûgayê birêxistin bikin hat girtin. Tûgay bi xwe di artêşên sazûmankirî de dibe, lê di artêşên gerîla de nabe. Wisa xwe mubalexe kirin heye.

Êdî ji ber pratîkên artêşa jin pêş ketine, di çarçoveya xebatên ku hatine meşandin de ew raporekê amade dikin, eyalet eyalet nêrîn tên girtin û rapora tê nivîsandin 17 rûpel in. 350 xort, 45 delegeyên jin tevlî Kongreya PKK'ê ya 5. dibin. Cara yekê hejmarek jin ewqas zêde tevlî kongreyekê dibe. Li vê derê raporek xweser ji du rûpelan ji xebatên jin çêdibe tê pêşkêşkirin. Heman demê 2 navend û 1 yêdek bi giştî 3 hevalên jin dikevin Navenda Partiyê; hevala Sozdar Avesta, Xanê Êzidî (xwişka hevala Binefş Agal) weke endamên navenda PKK'ê û hevala Fatma Adir jî wekî yêdek tên hilbijartin.

Piştî Kongreya PKK'ê ya 5. ji ber ku biryar hat girtin jin kongreya xwe pêk bîne, yekser dema heval belav dibin komîteya amadekar a kongreya jinê tê hilbijartin û hevala Sozdar Avesta berpirsiyariyê digire ser milê xwe. Paşê di navbera xwe de parvekirina kar dikin; hevala Sara wê bi amadekirina belgeyan re eleqedar bibe, hevala Şîlan Kobanê wê amadekariyên pratîk bike. Wekî Kongreya YAJK'ê ya 1. tê destgirtin, ji ber ku cara yekê ewqas bi giştî rêxistinê digire nava xwe. Kongreya YAJK'ê di navbera 8-18'ê

Adara 1995'an de li Metîna tê lidarxistin. 350 delegeyên jin tevlî dibin û hema hema ji her eyalet û qadekê hevalên jin beşdar dibin. Di nav şikefteke Gulka de li Metîna tê çêkirin û heya niha jî her hevalên jin wê derê dişixulînin. Di wê demê de hevalan ji wir re digotin, "Perestgeha Jinê" wek sembolîk e, ji ber cara yekê gaveke wisa di aliyê jin de tê avêtin.

Çima rêxistinek bi vî awayî hat avakirin? Me berê jî gotibû ji bo çi artêşa jin hat avakirin? Rast e, artêş hatiye avakirin, lê hîn nebibû rêxistin û hîn nav lê nehatibû kirin. Her wiha xebatên jin tenê bi xebatên gerîla re sînordar nîn e, di zîndanê de, di nav gel de û hwd. divê hemû xebatan bigire nava xwe. Lê şanseke mezin jî heye; gelek rêxistin destpêkê partiyê ava dikin, paşê baskên xwe yên mîna artêş, enî, civakî û hwd. birêxistin dikin û pêş dixin. Lê di nav rêxistina me de ne wisa ye, pratîk heye. Ya rastî li ser esasê pratîkê pijandin çêdibe. Di gerîla de artêşa jin heye, di qada civakî rêxistinên jin hene, pêşengiya ji serhildanan re heye, berxwedana li zîndanan heye û her wiha bingehek çêbûye. Li ser bingeha wê pijandina rêxistinî çêdibe û ev şansek mezin e. Encamên derketine holê tê de ked heye, xeta fedaîtiyê zelal bûye, pêwîste ev ji bo têkoşîna azadiya jinê xwe bizivirîne hemleyekê. Ew jî bi avakirina rêxistina xwe ya xurt pêk tê. Heman demê ev dibe xebateke stratejîk. Dîsa armanc ew e, çawa Serokatî Sosyalîzma Reel tehlîl dike ku di kongreya pêncemîn de rastiyek heye, di tecrûbeyên şoreşên din de şoreşa netewî çêdibe û jin jî tê de cih digirin, fedakariyê dikin, ked didin, lê piştî şoreş bi ser dikeve careke din jin dizivire pozîsyona xwe ya berê. Di gelek şoreşên cîhanê de ev rastî derketiyê holê. Jixwe piştgiriya xwe ji Sosyalîzma Reel digirtin.

Serokatî destpêkê şerê rizgariya netewî li pêş dibîne, ji bo vê di nav şoreşa netewî de şoreşa jinê stratejîk dibîne. Li vê derê garantiya pirsgirêka Kurd dide. Eger çareser bibe û rizgariya netewî pêk were, wê jin jî bikaribe xwedî li keda xwe derbikeve û dîsa jin nezivire pozîsyona xwe ya berî şoreşê. Jixwe wê ev bandora xwe

li ser şoreşê giştî bike. Karakterê me cuda ye, ji bo vê ferqa me ew e. Tu şoreşekê bi hakimiyeta zilam pêş bixî ferqa te ji şoreşên din namîne. Serok bi nêzîkatiya jinê re dixwaze bigihe vê rastiyê, esas şoreşa jinê hedef dike. Zemînê tesfiyeyan, têkiliyên kevne-perest ên jin û zilam hilweşandinên ku bi xwe re tîne û hwd. ev pratîk dihêle rêxistina jin saxlem bibe, li hemberî van nêzîkatiyan bikaribe xwe biparêze.

Di vê Kongreya YAJK'ê de ferasetên kevneperest tên tehlîlkirin. Yek jî, kongre di aliyê xeta azadiya jinê de wateyeke xwe ya wisa heye; êdî biryargeha navendî ya jinê tê avakirin. Êdî wê xebatên jin bi tevahî ji aliyê yek navendê ve bên birêxistinkirin. Bi wê ve girêdayî wê di eyaletan de jî xwe birêxistin bikin. Perwerdeyên xweser wê bi xwe bibînin. Ya herî girîng, der barê jinê de çi biryar pêwîste bê girtin, ew ê jin bigire. Muhatab wê jin be, ango wê rêxistina wê be. Zilam êdî nikare der barê jinê de biryar bigire. Tabî yek ji armanca artêşbûna jinê, pêşî li hewldan û texrîbatên tesfiyekaran girtin bû. Ji ber ku gava jin birêxistinkiribî be hîn zêde dikare rêgeha (doğrultu) xeta şer diyar bike. Yan na, bi awayek nerêxistinî ked bide, fedakarî bike jî, gava bi îradeya xwe nebe xwedî biryar û hêz pir zêde nikare bandora xwe li ser derdor çêbike. Ji bo wê artêşbûna jinê roleke bi vî awayî dilîze.

Jixwe Kongreya YAJK'ê ya 1. heman demê yekemîn kongreya jin a neteweyî ye, bi vê statuyê tê lidarxistin. Di wê kongreye de wekî perspektif nirxandinên Serok ji bo YAJK'ê wiha ne: "*Weke milîtanên Tevgera Azadiya Jinê yên bijare, divê hûn pêwîstiyên vê jiyana şerker hem di aliyê fikrî de, hem jî di aliyê pratîkê de bi îdîayek mezin bimeşînin. Bi qasî wê, divê hûn xebata vê di asteke pêşeng de bi xurtahî bimeşînin û yek kêliyê jî dev jê bernedin. Tevlîbûna we ya nav şoreşa me yan jî cih girtina jinê ya di nav şoreşê de ger ji rêzê were destgirtin, nirx jê re neyê dayîn, ev dibe helwesta herî neyînî. Berî her tiştî pêwîste hûn ji xwe re rêz nîşan bidin, bi xwe bawer bin, îdîaya we hebe. Kesê ji xwe re rêz nîşan nede, bi xwe bawer nebe, nezanibe çi ji bo wê çi bixwaze û ji pirs-*

*girêkên cinsê xwe re nebe hêza çareseriyê, ev tê wateya ku wê kesê di rêjeyek girîng de dev ji îdîaya jiyanê berdaye, ji wê hatiye qutkirin. Em îro di Kongreya Jin a Neteweyî ya 1. de civîneke asta xwe ya azadiyê pêşketî lidar dixin. Jin lazime hemû hêza xwe, destpêkê bi qasî fikrê afirîner-şoreşger, pratîkên xwe jî raxin holê. Di her astekê de birêxistinbûn û bisazîbûna artêşa jinê ji bo wekheviyê, ji bo azadiyê rastiyekî dev jê nayê berdane. Eger hûn dixwazin xwe jinûve qezenç bikin, bawerî bi bilindbûna cinsê jinê tînin û dizanin ku hûn ji zilam zêdetir muhtacê birêxistinbûnê ne, divê hûn bizanin birêxistinkirina di bin bandora xwe de, xwe birêxistinkirinê, xwe bi artêş kirine bi xwestekek mezin, bi dildarî û feraseta berpirsiyariyê bi ser bixin. Li ser vê bingehê ez 1. Kongreya we ya Jin a Neteweyî silav dikim, ji we re serkeftinê dixwazim.*

***Bijî Artêşbûna Jin a di Riya Kurdistana Azad de!*”** Ji vê dirûşmeyê jî tê fêmkirin ku, artêşbûna jinê tenê ne ji bo jinê çareseriyê tîne, yek jî ber bi Kurdistaneke azad ve diçe. Esas ev ji bo rêxistina jin a YAJK’ê wekî hedef e.

Ev kongre heman demê xet û meyla azadiyê zelal dike, ji pirsa “çawa bijîn?” re bersiv e. Pirsa “jiyaneke çawa” di cewher de pirseke îdeolojîk e, argumanek bîrdozî ye. Em nikarin wisa hêsan bigirin dest. Tevahî dahûrandinên Serok li ser çawa bijîn e, wê kî vê pêş bixe. Wê ewil YAJK vê pêş bixe. Di vir de em wisa negirin dest, tê vê çawa birêxistin bikî? Esas tu diçî şoreşa Kurdistanê. Mesela, tu di Kurdistanê de jiyanek çawa li pêş dibînî, ev karakterê şoreşa te diyar dike. Yanî karakterê jiyana te çawa ji jiyaneke wekhev û azad re bersiv e.

Esas berê hemû xebatên jinê bi navê YJWK’ê girêdayî ERNK’ê dihatin meşandin, lê bi avabûna YAJK’ê re êdî ji wê qut dibe û YAJK jî yekser girêdayî Serok e. Di nav pratîkê de hêz dikeve nav hev, yê ku bipejirîne, yan jî perspektîf bide jinê yekser Serok e. Biryargeha navendî jî li gorî Serok dimeşe. Xisûsa din, êdî wê têkiliya xwe ya bi pêkhateya giştî re li ser nasnameya xwe ya YAJK’ê

be. Êdî ne weke kesekê, bi navê yekîneyekê nake, wê bi nasnameya rêxistinekê bike. Ji ber îradeya te hatiye rewakirin, qebûlkirin. Serok wiha artêşê pênase dike: “*Artêşbûn çawa ji Bêrîtanan re bû bersiv, YAJK jî ji tevahî şehîdan re bersiv e û her wiha berbiçavbûna meyla azadiyê ye û keda ku hatiye rijandin, ji wê kedê re bersivek e.*” Serok pirsek wisa dike: “*Çima jin? Ji bo jiyana azad jin. Çima şerê jin?” Ji bo ku tevahî koletî û newekheviya heyî bê rakirin.*”

Serok 3 prensîbên YAJK’ê yên esasî diyar kir:

**Yek;** welatparêzî, heya dawî bi wê ve girêdan pêwîst dike. Her kes dikare dev ji welatparêziya xwe berde, lê YAJK tu carî nikare dev jê berde. Wek mîsala zewacê pêwîste bi welatparêziya xwe ve were girêdan, axa xwe, welatê xwe li ser her tiştî re bigire.

**Du;** rastiya şer ango şerkirin, têkoşîn dayîn, jixwe tercîha li hemberî dijmin şerkirinê çêbû, lê bi qasî wê şerê hundirê partiyê, şerê rêxistinê, ji pêwîstiyên jiyana azad re xwedî derketin girîng e. Ji bo vê pêwîste YAJK şerkerî û têkoşînê esas bigire.

**Sê**; birêxistinbûn e, bi taybetî hêza partiyê esas girtine. Divê weke hêzeke herî rêxistinî bê destgirtin, ji ber ku bê rêxistin jin nîn e, jin weke nasname encex bi rêxistina xwe heye. Ji bo vê herî zêde divê ew xwedî li xeta Partiyê derbikeve. Serok di vir de xeta Partiyê giştî digire temînatê. Jin divê hebûna xwe di wir de bibîne, ev partî nebe hebûna xwe jî namîne.

Her wiha nirxandinên Serokatî yên bi vî awayî hene: “*Xebatên rêxistinê li ser hemû karan re bigirin, derveyî wê divê hûn wate nedin tu tiştekê. Rêxistina bêsînor hêza bêsînor e. Ev jî bi kûrbûna bîrdoziyê pêk tê. Ev bingeha bîrdoziya rêxistina jin e. YAJK bi xwe wê xwe rizgar bike. Em tenê wek rêhevaltî dikarin alîkariyê bidin û jê re zemîn amade bikin, lê belê esas jin bi xwe wê hêza xwe, şerkeriya xwe raber bike. Dirûşmeya ku me got, ‘Destpêkê bila jin rizgar bibe’ ew dirûşmeyek rast e.*” Ango YAJK êdî xeta xwe ya

îdeolojiyê diyar dike.

Di tevahî eyaletan de navendên YAJK'ê çêbûn, di asta rêveberiyê de gelek heval çûn eyaletan. Ev çawa tê pêşwazîkirin, ev jî girîng e. Bingeha artêşbûnê çêbûye, dibe hêz, moralek heye, kelecanek heye, li ser vî esasî tê pêşwazîkirin. Nêzîkatiyên şaş jî hene. Êdî bi artêşbûnê re nakokiyên cins rû dane, ji cinsê xwe re hezkirin çêbûye. Lê di milê hevalên xort de tam fêmkirin çênabe, ji ber ku dema jin birêxistin dibe dikare cinsê xwe biparêze, li hemberî ferasetên şaş helwest deyne. Ji bo vê bi taybetî ferasetên zilam ên şaş û paşverû henekên xwe dikirin û digotin, "YAJK aşq e", yanî rêxistina eşqê ye, wisa dikirin mijara henekan. Zilamê ku lê xwedî derdiketin jî pîvanên li gor xwe diyar dikirin. Mînak; kesê girêdayî vê rêxistinê ye, divê red bike. Ango nasnameya jina birêxistinkirî red dike û li gora xwe pîvanan pêş dixe. Di nav şer de bandora vê heye, li gor xwe kadro, kadro li gor eyaletê pêş dixe. Ji ber kê li ku tevlî dibe, bi salan li wir jiyan dike, li wir şer dike, li wir şekil digire, li wir mezin dibe û bi vî awayî dibe kadroya wê herêmê. Dixwestin YAJK'ê weke kadroyên herêman bi kar bînin.

Mesela, YAJK'ê mudaxele kiriye, wê navenda xwe were, wê rêxistina me jinûve were destgirtin. Şansê me Sakîne Batman (dûvre çû îxanetê) hat, bêşansiya me ew bû. Îca wexta tê, lingê xwe ji cih derdikeve. Hevalê xort ji bo wê digotin, "rêveberiya we lingê wê li hewa hat, negiha vir, şemitî!" Wisa henekên xwe li wê dikirin. An jî digotin, "hûn hene, çi pêwîst e, hûn vê derê nas dikin, we li vê derê ked daye" bi vî awayî wek xitabê hestan dikin. Ji ber dizivire hestên hundir jî. Di ragihandina encamên kongreyê de amatorî jî heye, nêzîkatiyên teng çêdibin. Wê heta ku derê bi rêxistinî be, wê sewq-îdare heta ku be, wê keda xwe ya heyî çawa komî ser hev bike, hemûyan çawa bike yek? Xebat giştî belav bûye, em ê çawa têxin rotayekê û çawa bikin malê giştî rêxistinê? Di van hemû xisûsan de amatoriyên cidî hatin jiyîn. Her wiha

pirsgirêka pratîzekirinê jî derket.

Di wê demê de yek ji bêşansiya hatî jiyîn ew bû ku, piştî Kongreya YAJK’ê ya 1. çêbû hema paşê, sala 1995’ê li Başûr ji aliyê artêşa Tirk ve Operasyona Çelîk destpê kir. Esas kongre hîn didome û li Başûr şer derdikeve. Jina ku naxwaze ji zilam qut bibe û di nêzîkatiyên kevneşopî de israr dike li hemberî birêxistinbûna sîstema xweser a jinê bertek raber dike. Di wê salê de nêzîkatiya herî zêde mohra xwe lê dide, teqlîdkirina zilam e. Ev jî ji ber ku îdare kirin ji zilam fêr bûye. Halbûkî pêwîste jin bi rengê xwe tevlî bibe. Serokatî wê demê rexne dike û wisa dibêje: “Azadî ne teqlîd e, teqlîd ti nirxeke xwe nîn e û pêşde nabe.” Ango divê bê qedandin. Mixabin ev wisa pêş dikeve, şer ji zilam fêr dibe, êdî jê re dibe pîvan. Yanî jina ku dixwaze di nav şer de çalak bibe divê xwe bişibîne zilam, ji ber ku bi wî re dibe hêz. Nezanîna çavkaniya wê hêzê bi awayek xwezayî jinê di warê terzê rêvebertiyê de ber bi teqlîdkirina zilam ve dibe.

Ev operasyon çima çêbû? Pêwîste em hinekê li ser wê jî bisekinin. Wê demê Şemo ji Serhedê destpê kir û wê Bakur hemû fetih bikira. Jixwe piştî wê, zivistana 1994-95’an li Dêrsimê mabû. Hevalan bi birçîbûnê re rû bi rû dihêle, mutfaq di dolek kûr de kiriye û cihê her yekîneyekê dor 2-3 saetan jê dûr e û heval mecbûr dimînin her roj ewqas saet ji bo xwarinê biçin û werin. Heman pratîk paşê dixwest li Zapê jî pêş bixe. Pratîka Şemo li Amedê, bi riya cinsîtiyê xwest pêkhateya kadro bêîrade bike, li Dêrsimê jî vê carê bi riya xerîzeyên birçîbûnê xwest terbiye bike. Bi vî awayî dixwest îradeyê bişkîne, gerîla hilweşîne. Dîsa wê salê rêxistin dixwaze li Koçgirî vebûnekê çêbike, Şemo dixwaze jê re bibe asteng û pêşî lê bigire. Ji ber ku teqlîdê Serok dikir civînên xweser jî ji hevalên jin re çêdikir. Di civînên xwe de her digot, “Zilam di şer de zirzop e, êrîşên bêkontrol dike, ji bo vê divê jin pêşiya wî bigire.” Ne ku jin di şer de li pêş be, hêzek herikbar be, zilam bi xwe re bikişîne. Berevajî, bi vî awayî dixwaze pêşiya zilam bigire û bi xeta me ya şer bilîze. Hewldaneke xwe ya wisa heye. Dîsa di wê

salê de bi taybetî li Amedê beriya wê ev pratîka xwe ferz kiriye, li Dêrsim û Serhedê windahî zêde çêbûne. Esas wekî ku ji dijmin re peyameke bi vî awayî hiştiye: "Quwetê Bakur temam bû, hem bi êrîşên derve, hem jî bi êrîşên hundir me ew bêîrade kirine." Di vir de ku der dimîne? Başûr dimîne, vê carê dijmin were li Başûr gerîla bike hedef. Ji bo vê yekê Operasyona Çelîk çêbû.

Di encamê de sala 1995'an rewşa me pir baş nebû. Li Botanê ji aliyê Serok ve mudaxele çêbû û qad jinûve bi kadroyên nû hat tijîkirin, heya astekê berxwedan heye. Her wiha Amedê dixwaze xwe jinûve birêxistin bike, tevlî şer bibe. Hewldanên wisa hene, lê ev hewldan pir bibandor nîn in. Di van pêvajoyên pratîkî de bi taybetî li Başûr biryargeh hat vekirin, ev pratîka destpêkê ye, lê di pratîkê de zeîfî xwe didin der. Vê yekê bi cinsê xwe bawer nebûn pêş xist. Çima? Ji ber ku di şer de dîtin ku rêveberiya jin nikare hêza xwe koordîne bike. Halbûkî bi hêza xwe bawer be, bi cinsê xwe bawer be wê rewş cudatir be, lê ev pratîka wê ya yekemîn e, tu bixwazî nexwazî bandorek wisa kir. Ya rastî şaşîtiyeke me bi vî rengî heye, em çawa gavekê diavêjin, yekser em li benda encaman dimînin. Eger encam ne li gorî tê xwestin be, êdî zû bêbawerbûn pêş dikeve. Dibe ku ev nêzîkatiyên kevneşop bin, lê jin ji zilam zûtir ji cinsê xwe bêbawer dibe. Rêveberî li holê maye, dest û lingê wê ketiye hev, îca wekî desthilatdaran teqlîdê zilam dike, dengê xwe bilind dike. Vana tiştên li hemberî hev nakok in. Bi rastî ev jî mirov aciz dike. Li aliyê din, tu bendewariyek wisa dikî. Halbûkî cara yekê Serok digot, "Ez her tim xwedî li şaşîtiyên we derdikevim." Wisa Serok li şaşîtiyên me xwedî derdiket, an na wê xortan em biperçiqandana, wê bigotana "pratîka we ev e, me di pratîkê de dît." Ev derbasî hundir jî dibe, jin zû ji jinê bertek digire, zû bêbawer dibe. Di kadroyên me de ferasetên wisa hene. Dibe ku kesek şaş nêzîk bûye, dibe rêveberî jî şaş nêz bûye, rê dide, dibe ku texrîbata wê li ser te pir zêde be, lê em pir zû tên aliyê ku em vê bizivirînin rêxistinê, ji cinsê xwe dûr bikevin. Pêwîste em vê jî bibînin.

Dîsa nêzîkatiyên zilam jî wisa hene. Jixwe Serok perspektîf dabû ku biryargeha xweser a jinê yek saetê ji biryargeha giştî dûr be. Her çiqasî derfetên biryargeha xweser kêm bûn jî, cîhaza wan a mezin hebû. Hevala Sozdar wê rojekê tekmîlê digire, dijmin jî ketiye navberê û wana guhdar dike. Heman demê Ferhat jî guhdar dike. Jixwe pir kesan tekmîlên hevalên jin pir meraq dikirin. Paşê Ferhat dikeve navberê û ji dijmin re dibêje, “Vekişin, vekişin ji navberê, hûn çima mudaxele dikin? Jixwe tekmîla jin e.” Esas li wir jin biçûk dibîne.

Di wê pêvajoyê de hevala Jiyan (Yildiz Durmuş) heye, ew jî di salên destpêkê de tevlî partiyê bûye, xwişka hevalê Xeyrî Durmuş e. Heya demekê di zîndanê de mabû, di xebatên gel de mabû, di pêvajoya artêşbûna jinê de li Erziromê bû. Heya roja me ya îro jî hevalên li Erziromê perwerdeya hevala Jiyan li ser wan bandor dike. Çawa biryara artêşbûnê hat girtin, hevala Jiyan ji bo ku di her mijarê de li gel aliyê fizîkî, zîhniyeta hevalên jin xurt bike, her berpirsiyarî digirt ser milê xwe. Mesela, dema spor dida hevalan, di nav berfê de gomlekê wan dida derxistin, ji bo ku fizîka xwe xurt bikin. Bi rastî xwedî vînek pir xurt bû, dixwest vîna jin derxe holê. Wê salê berpirsiyara Erziromê bû û piştre sala ‘95’an dema ji bo erkê diçe Dêrsimê, li wir şehîd dikeve. Destpêkê birîndar dibe, lê ji bo nekeve destê dijmin bomba xwe bi xwe ve diteqîne, wisa digihe şehadetê.

Heman sala 1995’ê piştî gund hatin şewitandin gelê me yê Bakurê Kurdistanê ku koçberî Başûr bûne, hevala Jiyan (Zeynep Erdem) ji gel re pêşengiyê dike. PDK dixwaze pêşiya gel bigire, hevala Jiyan dixwaze asteng bike, lê paşê hevala Jiyan li kampa Etrûşê di rêza pêş a serhildana gel de şehîd dikeve. Wê demê PDK û YNK’ê operasyon li Başûr dikirin û heman demê li ser gel jî zext dikirin. Operasyona Çelîkê di biharê de destpê dike, lê wekî du hemleyan derbas dibe û heya payîzê didome.

Di 11’ê Kanûna 1995’an de Serok yekser li hemberî hêzên PDK

û YNK'ê agirbestê îlan dike, lê jixwe ew jî di bin kontrola Tirkiyê de bûn. Ya rastî wê agirbestê hişt em hinekî xwe komî ser hev bikin.

Di dîroka me de 3 agirbestên mezin çêbûne; agirbesta sala 1993'yê, agirbesta 1995'ê û agirbesta 1998'an e. Di encamê de wê salê berxwedanek pêş ket, lê belê di nav şer de gavavêtineke hemleyî çênebû. Eyaletên Bakur jî di pozîsyona parastinê de man.

***Hevalên jin ên di sala 1995'ê de gihîştine şehadetê;***

**Hevala Çîğdem;** bi eslê xwe Tirk e, sala 1991'an li Cudî tevlî rêxistinê bûye. Li saha Serokatî dimîne û Serok wê ji bo şoreşa Tirkiyê amade dike. Piştre di sala 1992'yê de derbasî welat dibe, li Metîna di nav yekîneyan de cihê xwe digire. Pevçûn li ser girên Qedîşê û Enîşkê heye û şerekî dijwar li wir tê jiyîn. Di wî şerî de tevî 21 hevalan şehîd dikeve. Di Operasyona Çelîk de rola xwe leyîstiye.

**Hevala Binefş Şikêr**; ji Silopya ye û sala 1989'an beşdarî nav refên rêxistinê dibe. Li qadên Botan û Zagrosê maye. Ew jî sala 1995'an di Şerê Başûr de li Kurêjaro şehîd dikeve.

**Hevala Jiyan (Zeynep Erdem)**; ji Sêwasê ye û di 1988'ê de tevlî bûye. Di sala 1992'yê de derbasî Heftenînê dibe. Li wir di kampa Şehîd Mahîr de fermandara taximê ye. Dîsa di nav şerê Başûr de weke perwerdekar rola xwe dileyîze. Demekê li Botanê dimîne, li Cudî û Besta maye. Piştî ku operasyon çêdibe demekê li kampa Etrûşê dimîne, dema diçe jî naxwaze ji çiyê qut bibe, ji ber bi çiya ve girêdayî ye. Pêşengiyê ji gel re dike, dema dijmin dixwaze pêşiya meşa wana bigire bi çekan êrîşî gel dike û guleyan li gel direşîne. Di vê êrîşa pêşmergeyên PDK'ê de hevala Jiyan jî destpêkê giran birîndar dibe, piştre şehîd dikeve.

**Hevala Dîlan Dilsoz**; ji Cizîrê ye. Ew bi xwe ji hevala Bêrîvan (Binefş Agal) bandor dibe û sala 1992'yan tevlî Partiyê dibe. Li Botanê û Colemêrgê di nav pratîkê de maye. Heman demê li saha

Serokatî maye. Ew jî li Metîna bi grûba hevala Çîğdem re tevî 22 hevalan 10'ê Cotmeha 1995'ê şehîd dikeve.

**Hevala Koçerîn Varto**; bi eslê xwe ji Dêrsimê ye, lê bi salan e koçberî Mûşê bûne. Di sala '91'an de ji Ewrûpa tevlî rêxistinê dibe, di Şerê Başûr ê 1992'yan de dimîne. Piştre derbasî Botanê dibe û li Gabarê dimîne. Wê demê di xebata çapemeniyê de bû, bi hevala Berçem re bû. Hevala Koçerîn li dijî nêzîkatiyên zilam ên feodal ên li ser jinê dihatin ferzkirin bû. Her ev nêzîkatiyên zilam dianîn ziman. Di warê pratîk de xurt bû, heya astekê tevlî çalakiyan bû, herî dawî di çalakiya dorpêçkirina Bêgova de cihê xwe digire û sala 1995'ê şehîd dikeve.

## Komploya 6'ê Gulanê Û Bı Terzê Fedaî Xwedî Derketına Lı Rêber Apo

Zivistana di navbera salên 1995-96'an de êdî hêzên YAJK'ê bi nasnameya xwe dikevin perwerdê. Wê demê Newal Serhed dibe rêvebera biryargeha YAJK'ê. Heman demê li biryargeha navendî ya Partiyê jî hevalê Fuat, Kazim û Şemo rêveber in. Şemo beriya wê li hemû eyaletên hundir sefera xwe ya ku jê re digot "sefera Mao" temam kiribû, bandora xwe hema hema li ser hemû eyaletan bi rengekî çêkiribû. Şemo bandora xwe li ser eyaletên hundir hebû, lê Botan rexmê li gorî karakterê Şemo cihekî pir ters bû cardin bi qismî be jî hinekî bandora xwe li ser wir jî dike. Ango wekî Bakur hemû di ber destê xwe re derbas dike, vê carê berê xwe dide biryargeha navendî, li gor nêrîna xwe dixwaze wir jî fetih bike. Jixwe xwe kiribû yekemîn fermandarê tevahî gerîla. Bi vî awayî di rêveberiya wir de hevala Şervîn Dêrik û Newal Serhed jî hene, lê hevala Şervîn zêde bibandor nabe. Ya diyarker Newal e, ew jî wê demê hêza jin pêşkêşî zilam dike. Zilam dixwaze biryargeha YAJK'ê bi awayekî bixe bin bandora xwe, bixe bin teserûfa xwe û bi kar bîne. Berê tenê yek kes bihata pêşkêşkirin dibe ku ewqas zirar nedaba, lê tu rêxistinekê bixî bin kontrola kesên tesfiyekar ên wekî Şemo yan jî tu bixî kontrola zilam, xeterî

di wir de çêdibe. Serok ji bo Newal digot, “Mata Harî”. Mata Harî, di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de rola sîxuriya gelek welatan dilîze. Serok ji bo wê digot “sêkoşeya şeytan” ango di navbera hevalê Fuat, Kazim û Şemo de diçe û tê, lê Şemo ew xistiye bin bandora xwe û adeta biryargeha navendî teslîm girtiye. Di Newal de xwe sipartina zilam heye. Rexmê nûneriya tevgerekê dike, lê ew bi desthilatdariya zilam re li hev dike, ango bi desthilatdariyê re li hev dike. Di wê demê de Zekî û Osman digotin, “ev jin çend sal in di nav rêxistinê de ye, hîn nizane zimanê kurdî yan jî nizane nivîsê”. Her wisa kî dimîne fermandar? Newal dimîne. Ev jî kişandina lihevkirinê ye. Serok van pratîkan wekî “hevkarî” bi nav kir, yanî ji bo desthilatê bi zilam re hevkariyê dike. Ya rastî êrîş li ser xeta Serokatî heye. Serokatî bi hêza YAJK’ê re esas dixwaze temînata xetê çêbike, li hemberî tesfiyekariyê bibe xwediyê seknekê, lê Newal vê carê hêza jin pêşkêşî zilam dike, bi kurtahî ji kiryarên zilam ên paşverû re dike amûr. Bi rastî ew pratîkek xirab bû. Êdî bi vê pratîkê re hevkariya bi zilam re mohra xwe li pratîka sala 1996’ê dixe. Paşê Serok mudaxele dike û Newal dikişîne sahê, hevala Şervîn ji erkê tê girtin û tên darizandin. Ew bi siyaseta desthilatdariya zilam re dibe yek.

Elbet hemû hevalên jin wisa nebûn, lê ev jî wekî tîpekê derdikeve. Beriya wê tîpê karîkaturê zilam, şibandina zilam derdikeve, vê carê jî hevkariya bi zilam re derdikeve holê. Di beşên pêş de em ê wekî tîpên di nav me de şekil girtine cardin li ser vê xalê bisekinin. Bi kurtahî, ji bo pratîka biryargehê ya sala 1996’ê mirov dikare vana bibêje.

Sala 1996’ê yek jî saleke ku gelek pêşketin tê de tên jiyîn, dijmin jî êrîşî Tevgera me dike. Bi taybetî di 6’ê Gulana 1996’an de dijmin komployekê li ser Serokatî pêk tîne, dixwaze Serok suîqest bike. Ev hewldana suîqestê tenê ne ji aliyê Tirkiyê ve, bi hevkariya Îsraîl, hêzên hevkar ên Başûr û îstixbarata Sûriyê tê birêxistinkirin. Di wê kêliyê de Serok li ser telefonê diaxive û teqîn çêdibe. Nêzîkî dibistana tirkî ya li saha Serok erebeyek tijî teqemenî di-

teqe. Malên wê derê hemû dişibin hevdû, wisa çend qat in, cam û deriyên wan hemû dişibin hevdû. Ew teqemenî ne li mala Serok diteqe, li ber mala Serok diteqe. Derî û camên akademiyê hemû dişkin. Wê demê di hundir û derve de êrîşên girtin û komkujiyên li ser gerîla, civakê tên çêkirin. Teqemeniyek ewqas bi bandor û mezin bû. Ev tê wê maneyê êdî dijmin tenê bi gerîla re mijûl nabe, li ser Serok êrîş pêş dikevin. Dîsa di salên 1982'yan û wan derdoran de li ser Serok teşebuseke wisa pêş ketiye û ew jî bi ser neketiye. Her hêzên navnetewî tê de cihê xwe digirin. Ew cara yekemîn bû ku komployek di asta suîqest de li ser Serokatî pêş dikeve. Lê belê Serok vê rewşê rexne dike û dibêje "Eger dijmin we derbas kiriye û hatiye heya saha min, ev tê wê maneyê ku hûn mirine." Rexmê ewqas hêzên gerîla hene, qada civakî heye, wan datîne aliyekî û xwe digihînin Serok. Jixwe di pêvajoya Komploya Navnetewî ya sala 1999'an de jî Serok wiha dinirxîne: "Ez bi tenê mam, ez bûm hedef." Ev pratîk tevahî ji ber ku eyaletên hundir rola xwe neleyîstin hatin jiyîn. Halbûkî derfeta pêkanîna şoreşê heye, nekirin. Piştre Serok komploya 6'ê Gulana 1996'an wiha nirxand: "6'ê Gulanê hem roja ku Denîz Gezmîşan hatin darvekirin, hem li Kerbela Hesen û Huseyîn hatin qetilkirine. Ya rastî ev rojek dîrokî ye. Lê li Şamê yekser min hedef girtin, ji dijmin re cesaret dixwaze. Yê ku li vir hatiye hedefgirtin tenê Serok an biryargeha Serok nîn e, tevahî îtifaqên asta ku partî gihîştiyê hedef tê girtin. Eger hêzeke partiyê nebûya, hevsengiyek nebûya Sûrî derfet nedida. PKK hêzeke, nakokiya Sûriyê bi Tirkiyê re heye, destek dayîna bi me re pêşiya nakokiya xwe digire." Piştre jî îtifaqên gelan çedibin, PKK di herêmê de dibe hêzek. Serok dibêje, "hemû pêşketinên PKK'ê hedef digirin."

Di wê salê de xitimandineke taktîkî tê jiyîn. Li ser van esasan Serokatî got, "di taktîkê de dubarebûn". Piştî Kongreya PKK'ê ya 5. derketinek nû çênabe. Heman demê eyaletên me yên hundir darbe xwarin. Li Amedê jixwe pratîka çete ya Zekî bandora xwe hebû û her wiha Sakîne jî wekî berpirsiyara YAJK'ê bû. Li wir êdî

ferasetên jiyaneke yoz pêş dixin. Dema têkiliyek pêş nediket jê re digotin “paşverû ye”, ya rastî dixwestin vê rewa bikin. Di serî de Sakîne ket nav têkiliyên şaş. Mîna civakê yeka ku têkiliya xwe tune bûya jê re digotin “kesî qîma xwe bi te neaniye”, wekî civakê bê di mal de maye. Dijmin jî ji ber ku ev dizanî operasyoneke pir berfireh da destpêkirin, jê re digotin Operasyona Atmaca.

Wê pêvajoyê Zekî li biryargehê bû û di bin navê biryargeha navendî de hevdîtinan bi riya telefonê çêdikin. Wisa jî hin têkiliyên di nav artêşê de dewrê eyaletan kir. Jixwe dihat zanîn ku wê operasyon destpê bike, heya saetên dereng jî li benda hevdîtinên telefonan bû ji bo agahî bidin. Agahî jî dan, lê belê berê me ber cihekî şaş ve dan. Wê çaxê jî hêzên me yên ku dixwestin herî zêde şer bikin, me dabûn pêş. Hêzên ku paşde bimînin jî şervanên nû ne, biryargeh û hêzên hwd. in. Lê ev operasyon berevajî destpê kir, paşve kişandin li ku derê be, ji wir ve destpê kirin. Lê dijmin taktîkê xwe guhertiye, bi balafirê leşkeran dadixe û bi carekê re hemû gir digirtin û êrîş dikirin. Aliyê piştê hat girtin. Li wê derê jî piranî hevalên nû bûn, ên nikarîbûn şer bikirana, quwetê biryargehê bûn, ên bêerk bûn û hwd. rasterast ew bûn eniyên pêş. Ji bo wê ev operasyon pir giran bû, nêzîkî 120 hevalan şehîd ketin. Ev ji bo eyaleteke hundirê Bakur tesfiye ye.

Di sala 1997’an de hema hema operasyoneke mîna wê li Dêrsimê hat jiyîn, dîsa 120 heval şehîd ketin. Di sala 1998’an de li Botanê bi heman rengî, li wir di asta fermandariyê de gelek heval şehîd ketin. Dijmin li wê derê perçe perçe operasyon dikir. Jixwe dema Zekî teslîm dibe, rasterast Serok hedef nîşan dide. Ya rastî saleke ku em gavavêtineke xurt bikin, berevajî dijmin operasyon li ser operasyonê kirin. Şer wisa ye; yan tê hemle bikî, yan jî wê dijmin bike. Li ser van esasan Serok dixwest em dest bi lêkolînan bikin. Jixwe di sala 1998’an de dema Zekî direve, êdî Serok hedef digire. Serok ev rewş wiha nirxand: “*Em pêwîste şer bilind bikin ku pêwîst be em terzê fedaîtiyê yê Hamasê jî esas bigirin.*”

Hevala Zîlan (Zeynep Kınacı) jî wê demê bi vî awayî pêwîstî dît li hemberî xitimandina taktîkê, êrîşên li ser PKK'ê hene, çalakiyekê li dar bixe. Hevala Zîlan dixwaze bi vê çalakiyê pêşiya wê bigire. Ev çalakî hem ji dijminê êrîşkar re û hem jî ji bo ferasetên navxweyî wekî bersivekê bû. Ew jî êdî kesayeteke dîrokî ye, tu têkoşînê digire nava xwe û li hemberî pêwîstiyên wê tu xwedî helwestekê yî. Ev çalakî ne çalakiyek normal ji rêzê ye, çalakiyek dîrokî ye, ji bo me destpêkek e. Niha tiştek li holê nîn e, tu dibînî dibe 15'ê Sibatê hinek çalakiyê pêk tînin. Li hemberî çi? Derfetên te yên têkoşînê zêde ne; birêxistin bike! Ev ne çalakî ye. Çalakî di dema xwe de ev gavên dîrokî ne. Berî niha bi çend salan li Qendîlê hevalek ciwan bomba xwe bi xwe ve diteqîne, dibêje, "ez dixwazim bibim Zîlan." Ê wisa nabe Zîlan! Hevala Zîlan xwe bi ser dijmin de teqand, hûn li hemberî partiyê dikin. Tu li xwe dixî, ew can ne aîdê te ye, aîdê partiyê ye. Tu wisa bersiv didî kî?!

Di 30'ê Hezîrana 1996'an de hevala Zîlan çalakiya xwe pêk anî. Ya rastî li hemberî xeta hevkariyê ya ku Newal pêş xistî, hevala Zîlan xeta azadiyê temsîl dike. Jixwe vana di nameyên xwe de vedike.

Hevala Zîlan bi eslê xwe ji Malatya ye. Hevalek pir kevn nîn e, beriya wê kêmekê di nav kar de maye, li eyaleta Dêrsimê saleke wê çêbûye. Li çiya jî hinek zehmetiyên fizîkî jiyan dike û ev jî jê re dibe nakokî. Heta carekê derdikevin ser girekî, li beramberî xwe qereqolekê dibîne, dibêje, "em ê çawa li vê qereqolê bixin?" Kesên xwediyê nêzîkatiyên kevneperest dibêjin, "tu nikarî derkevî ser girekê, tê çawa li qereqolekê bixî?" Lê asta wê ya fikir û kûrbûnê pir cuda bû. Hevdû fêmkirin pir lewaz bû. Esas li gorî plansaziya ku eyaleta Dêrsimê jê re dayî diviyabû biçe walîtiya Dêrsimê çalakî bike, lê paşê ew bi xwe diçe hedefê diguhere. Ya rastî dixwaze di navendekê de çalakiyê pêk bîne ku gel bibîne û jê re bibe bersiv. Ji bo vê jî hinekî dereng çalakiya xwe li dar xist. Dêrsim ewqas di komkujiyan re derbas bûye, di qirkirina çandî re derbas bûye, betonbûn û ya herî girîng jî ketiye xeta Kemalîzmê.

Çima dixwaze gel wê bibîne? Ji bo çanda berxwedanê di Dêrsimê de jinûve zindî bike. Her amadekariyekê ew bi xwe dike, dema leşker li meydanê di nav merasîmê de ne, di wê kêliyê de çalakiyê pêk tîne. Dema hevala Zîlan wê biçe çalakiyê rojnivîsa wê heye, lê tenê yek pel ji wê rojnivîsê li gel me heye. Yê ku ji rojnivîsê mayî jî davêje nav agir. Wê demê heval jê pirs dikin çima wisa kir, ew jî dibêje, “Ez rojekê ji hevalekê aciz bûm û min nivîsandiye, eger ez çalaki bikim û şehîd bikevim ew heval wê di bin tohmetê de bimîne. Ez jî nikarim qebûl bikim ku li ser wê hevalê axaftin çêbibin.” Yanî rexneyên xwe hene, lê naxwaze hevalên wê pê biêşin. Pela ku ji wê rojnivîsê hatiye xilaskirin saetên rojê wana nivîsîbûn. Paşê hevalan ew pel ji bo arşîvê dane Akademiya Şehîd Bêrîtan.

Serok ji bo hevala Zîlan dibêje, “*Ew ne kesek e; xetek e, şêwazê jiyanê ye, şêwazê şer e û şêwazê serkeftinê ye. Ev jî ji bo me emr e, ev sembol e, ev şêwaz e û sond xwarine. Ev çalakî jî ya yekemîn e û ya dawî ye, ji ber ku dîrokî ye.*” Jixwe hevala Zîlan di nameya xwe de dibêje, “Çavên min wê li pişt nemînin, ji ber ku Serok heye, wê xwedî li şehîdan derbikeve.” Di hevala Zîlan de naskirineke kûr a Serokatiyê heye. Piştî vê çalakiyê Serok dixwest em vê wekî xeta têkoşînê esas bigirin, ji bo vê jî got, “*Vê çalakiyê xeta tevgera jinê eşkere kir. Zîlan ji bo azadiya jinê manîfesto ye. Pîvanên jiyana azad şênber dike.*” Ya rastî hevala Zîlan bersiva pirsa çawa bijîn, da.

Serokatî ji bo hevala Zîlan van nirxandinan dike: “*Bila zorî tu caran we neşkînin, berevajî bila we bike weke pola. Dîsa jiyanê bi tiştên hêsan na, bi yên zehmet qezenç bikin ku, nirxê wê mezin be. Jiyana ku bi hêsanî were qezençkirin, ne hêja ye were jiyîn. Jixwe jiyana hêsan ji bo me gengaz nîn e. Jiyana pêvajoyên zor jiyana dildariyê ye, jiyana evînê ye. Kesayetên ku zehmetiyên mezin bijîn, dikarin mezin bijîn. Wekî Zîlan dibêje, jiyana mezin bi çalakiya mezin pêkan e. Di nav me de yekane felsefeya jiyanê, ya*

*rast jî ev e.”*

Dîsa di wê salê de 2 hevalên din jî çalakiya fedaî li dar dixin. Hevala Bermal (Güler Otaç) 29’ê Cotmehê 1996’an li Sêwasê çalakiyê pêk tîne. Wê jî li pişt xwe nameyek hiştiye. Hevala Rewşen (Leyla Kaplan) di 25’ê Cotmehê de li Edenê çalakiya xwe pêk tîne.

Ev terzê çalakiya fedaî ji xeta tesfiyê re jî bersiv e û di nav gerîla de nûbûn e. Serok bi mudaxela xwe û van çalakiyan dixwaze wê salê qezenc bike. Dîsa beriya wê Konferansa YAJK a 1. di dîroka navbera 30’ê Adarê û 15’ê Nîsanê de hatiye çêkirin. Ev hemû hêza keda jinê bi xwe ye. Ji ber ku hemû hevalên jin in. Bêguman Serokatî mîsyonekê dide jinê. Esas ev berê pêşveçûna rêxistina jinê jî diyar dike. Di wê salê de li Botan û Zagrosê heta dawiya salê di asta yekîneyê de ketina pratîkê çêdibe, pê re rêxistinên jin ên cidî pêş dikevin. Li eyaletên hundir hinek seknên pasîf hene. Nimûne, li Amedê operasyon çêbûye, şehîd zêde ne, dîsa li Dêrsimê rêveberî pasîf dimîne, lê tenê hevala Zîlan, Bermal û Rewşen li Dêrsimê çûne çalakiyên fedaî. Li ser seknên van hevalan re eyalet hinekê dixwaze xwe kom bike.

Bi avakirina YAJK’ê re hevala Dîlan wekî endama navenda rêxistina jinê diçe Garzanê, dixwazin rêxistina jin li wir pêş bixin û di demek kurt de şehîd dikeve. Hevalên di asta rêveberiyê de li Garzanê pir zû şehîd diketin. Ji bo vê jî Serok digot, *komkujiya jinê*. Ew jî ji ber ku hin kesan ji derve bi dijmin re di têkiliyê de bûn. Nimûne; kesên wekî Ednan. Ji bo wê windahî zêde çêdibûn. Wê rewşê li Garzanê hinekê bandor kir, lê bi esasî li Garzanê quwetê jin nîtelîkeke xwe ya cidî hebû. Wana tevlî şer bibûn, tecrûbeya rêxistinî çêbûye, piştî konferansa YAJK’ê teqwiye ji eyaletên hundir re tên şandin.

***Hevalên jin ên di sala 1996’ê de gihîştine şehadetê;***

**Hevala Dîlan Dêrik**; ji Rojava bû. Di sala 1988’an de dikeve nava xebatan, sala 1991’an li saha Serokatiyê dimîne. Dawiya

1991’an diçe welat û tevlî şerê Başûr dibe, paşê li Botanê jî dimîne. Di kongreya yekemîn a YAJK’ê de di asta navendî de tê hilbijartin û derbasî eyaleta Garzanê dibe. Di asta rêveberiyê de bû. Ew jî di meha Hezîranê ‘96’an de di nav kemînê de li Garzanê bi du hevalên jin û du hevalên xort re şehîd dikeve.

**Hevala Selamet (Newroz Ateş)**; ji Hezexê ye. Ew jî sala 1991’ê tevlî partiyê dibe û li saha Serok perwerde dibîne. 25’ê Nîsana 1996’ê li Garisa şehîd dikeve. Wê demê fermandara yekîneyê ye.

**Hevala Bêrîvan GAP;** sala 1993’yê tevlî partiyê dibe. Ew jî meha Mijdarê li Kelha Dêrşew a herêma Botanê şehîd dibe.

**Hevala Rojhan;** sala 1992’yê ji Dêrsimê tevlî partiyê dibe. Di pratîkê de tevlîbûneke çalak raber dike, paşê sala 1995’ê derbasî saha Serok dibe. Piştî perwerdeya Serok, weke fermandareke xurt derbas qada Amedê dibe. Sala 1996’ê li Amedê di şerekî de tevî taxima xwe bi qehremanî li ber xwe dide û dawiyê şehîd dibe. Tabî li Amedê tevlîbûna wê diyarker bû.

**Hevala Dilovan (Saadet Yılmaz);** ji Meletî ye. Hevala Dilovan li Îzmîrê dixwîne, sala 1991’ê ji Zanîngeha Dokuz Eylül tevlî refên têkoşînê dibe. Paşê derbasî saha Serok dibe. Sala 1992’yê tê Dêrsimê, sala 1996’ê jî derbasî Koçgirî dibe. Li Koçgirî tevî 33 hevalan di paşvekişîna çalakiyeke serkeftî de şehîd dikevin.

**Hevala Fehîme**; ji Gundikê Melê ya ser bi Şirnexê ye. Bi qanuna leşkerî tevlî partiyê dibe. Demekê li Lolanê dimîne, di şer de dibe fermandar. Demek dirêj li Cudî dimîne. Di sala 1991-92’yan de li cihên wekî Silopya di xebatên bajaran de dimîne. Di 1996’an de li Dola Şîvê bi hawanê şehîd dikeve.

## Pêşketınên Sala 1997’ê Û Teorıya Qutbûnê

Serok sala 1997’an wekî sala fînalê dinirxîne û li gor wê perspektîfên xwe pêş dixe. Bi baweriya ku bi çalakiyên fedaî çêbûne,

êdî xeta me ya şer zelal bûye. Mirov divê van çalakiyên fedaî wisa wekî xwe teqandin negire dest; ji ber pir bi plan in. Erê yek kes dike, lê bi qasî artêşekê ye. Mesela, Serok ji bo hevala Zîlan dibêje, “Yek kes e, lê bedêla tabûrekê ye, tabûrek encex ewqas encam bigire.”

Xisûsa din, her çiqasî meylên şaş di nav de hebin jî Serok dixwaze rêxistina jinê bigihîne astekê. Jixwe çiqas diçe ev rêxistin xwe mezin dike. Serok amûrê di destê xwe de dixwaze xetê pê mezin bike. Bi pêşxistina tevgerê re dixwaze pêngavekê bide destpêkirin. Meylên fedaî di nav hêzan de dibe çavkaniya moralek mezin. Li Zagrosê jî êdî Serok dixwaze însiyatîfa jin derbikeve pêş, paşê li Zagrosê Herêma Heftemîn (Yedinci Bölge) tê avakirin û berpirsiyarê wir hevalên jin in. Heman demê Serok dixwaze bi wê fînalê ew hevsengiya ku di navbera me û dijmin de heye bişkîne. Ew jî bi terz û taktîkên nû yên gerîla pêş dikeve. Dijmin êdî xwe kişandiye parastinê. Êdî em ê lê bixin û qadan bigirin.

Li ser van esasan Serok di saha xwe de xebatan kûrtir dike. Têkoşîna cins jî pir kûr dibe, jin êdî dikare têkoşîna xwe bi îrade bike û encam bigire. Serok wê demê teoriya qutbûnê, wek argûmana bîrdozî pêş dixe. Di wê salê de Serok mudaxeleyê biryargeha navendî dike, Zekî ji biryargehê dikişîne saha xwe, hevalê Cemal dişîne biryargehê. Serok li saha xwe dahûrandinên pir berfireh çêkir. Di şexsê Zekî de pratîkên çetewarî dahûrand û digot “ûnîtebûn heye”. Ûnîte di nav şoreşê de bi xwe xwe birêxistin dike, lê belê wek dijberî wê şoreşê ye. Ango di hundir de çawa tesfiye dike. Paşê Zekî ji bo xwe li hemberî Serok îspat bike bi israr dixwaze biçe Ankara, lê Serok wî dişîne Amanosê. Li wir jî mehek di ser re derbas nebû hat ser sînorê Sûriyê, xwest ji wir Amanosê birêve bibe. Serok careke din wî dikişîne û jixwe êdî zelal bû. Dahûrandinên li ser Zekî ji bo me pir girîng in, ji ber ku her bi şixulandina jinê re xeta tesfiyeyan ferz dike. Wê demê rexmê çekê Zekî ji yê Ferhat xurtir jî bû, Serok wisa lê kir ku dema Zekî çû, bi tena serê xwe çû, lê dema Ferhat çû, bi sedan kadro bi

xwe re bir. Ev yek bi asta têkoşîna me ya li dijî tesfiyegeriyê ve girêdayî ye.

Dîsa di wê salê de ji eniya jin ve quwetek xurt heye, Serok dixwaze li ser wê amadekarî bike. Heta hevalên jin beşdarî xebatên giştî jî dike. Yek jî, hinek ferasetên wekî xwe bi zilam îzah kirin wê demê hatine mehkumkirin. Di wê salê de biryara vekirina Akademiya Zeynep Kinaci tê girtin.

Sala 1997'an saleke dijwar e, rêveberiya biryargehê hat guhertin. Hêlîn wê demê li wir e. Careke din li Başûr operasyon çêdibe, Operasyona 14'ê Gulanê. Di vê operasyonê de hevalên jin nayên sewq-îdarekirin, rexmê ku di eniyên pêş de berxwedanek heye û tevlîbûnek aktîf jî di nav şer de heye hêz pir zû belav dibe. Lê tiştê herî biêş, di Herêma Heftemîn de taximeke rehabîlîtê tê avakirin. Avakirina vê taxima rehabîlîteyê di dîroka me ya têkoşîna azadiya jinê de wekî lekeyek reş e. Dive bê xuyakirin ku di nav jinê de şaş xwe girtina dest heye, şaş nêzî xeta azadiyê bûyîn çêdibe. Hinek kesên wê demê di rêveberiya jinê tekmîl didin Serok û dibêjin, "Hinek kes hene nayên xeta azadiyê, pirsgirêk in, bar in, giran in, di şer de nabin û hwd. Em ê wan hemûyan bînin gel hevdû û taximekê bi navê rehabîlîtê saz bikin." Divê em vê feraseta rehabîlîteyê wekî ji rê derketinek bîrdozî bigirin dest. Ev nêzîkatiyeke dijberî xeta me ya îdeolojîk e, ne însanî ye. Di nav operasyonan de gelek kes ji wê taximê şehîd dikevin, hevala Zeynep (Gurbetellî Ersoz) dixwaze taximê ji wir derxîne, lê paşê bi wana re şehîd dikeve. Serok piştre mudaxele dike û dibêje: "Di nav me de hêzeke ku giraniyê çêdike û were rehabîlîtekirin, tiştê wisa cihê xwe di nav me de nîn e û nayê qebûlkirin. Eger pêwîste rehabîlîtasyon bê çêkirin, a herî baş nêzîkbûnên azadiyê divê mirov pêş bixe. Dîsa lewaziyên van hevalan çi dibe bila bibe, ku vesaziyên rast çêbûna qet nedibû hêza YAJK'ê wisa teşwîq bikin. 25 can in, eger di cihekê de biryareke şaş hebe, eger bi rêvebirineke şaş çêbûye, pêwîste mirovê ku vê biryarê digire wijdanê xwe lêpirsîn bike. Heta kûrahiya dilê xwe divê vê hîs bike. Ev mirov

wekî tê fikirîn bên rehabîlîtekirin, belê van kesan wisa di serî de hatin van çiyayan. Eger hatine jî çima heya niha bi vî awayî ne. Divê hûn xwe lêpirsîn bikin! Hûn ê bi zanebûn pirsgirêkan di nav partiyê de giran bikin û wek çareserî vê pêşkêş bikin. Tiştê ku hûn wekî çareserî pêş dixin, berevajî hîn zêdetir ji xeteriyê re rê vedike. Ev rewş nayê qebûlkirin. Xwe negihandina feraseta rêveberiyê ya rast heye. Çiqas hewldan hebe jî, hûn bersivek rast nadin."

Mixabin heya niha jî em nikarin dîroka xwe ya jin binivîsin, yek sedem jî ev taxim e. Heta berpirsiyariya wê jî heval nagirin ser milê xwe. Kî ji wê pratîkê berpirsiyar e, kî kir; vê nagirin ser milê xwe. Hinek kes jixwe tesfiyekar bûn, reviyan, lê tenê bi wana nayê îzahkirin. Serok dibêje, "divê mirov berpirsiyariya wê ya wijdanî di kûrahiya dilê xwe de hîs bike. Ji ber ku di wê taximê de gelek kes bê çek in û di nav operasyonê de mane. Hevala Zeynep (Gurbetellî Ersoz) berpirsyariyê digire ser milê xwe, dixwaze hevalan xilas bike. Lê nikarin xwe di vir de biparêzin, hemû şehîd dikevin. Tabî di van operasyonan de tangên Tirkan hene, piraniya hevalan bi tangan şehîd dikevin. Dewleta Tirk bi hêzên Başûr re li hev kirine û operasyon daîmî bûne.

Di sala 1997'an de nakokiyên ku di jinê de pêş dikevin bîrdozî ne. Nimûne, peyva *hevkar* bi kar anîn şaş nîn e, lê heya roja me ya îro jî şaş bikaranîna wê heye. Gava tu şaş bi kar bînî, wê çaxê rast û şaş dikeve nav hev, tevlîhevî û mûxlaqî çêdibe. Di pîvanên red û qebûlê de xumamê çêdike, vê carê tu nikarî ji nav hev derbixî. Kî şaşîtiyek biçûk bike, tu yekser jê re bibêjî ew hevkar e, wisa mohra hevkariyê lê bixî, nabe. Gelek heval wisa hatin mohrkirin. Nimûne, hinek heval di nav karên giştî de ne, ked didin, di giştî de kar dike; jê re dibêje "ev hevkar e!" Eger nêzîkatî wisa be, tê çawa ji nav hev derbixî? Ango têgihîştinên wisa şaş hene. Sala 1997'ê dîsa nêzîkbûnên çînî derdikevin holê, bi taybet di bunya biryargeha YAJK'ê de. Adeta hinek kesên ji çîna burjûvayê biçûk xwe azad dibînin, xwe wek pîvana azadiyê raber

dikin, nizanim xwe dixin şuna xwedawendan. Ev feraset ji şiklê por bigire heta di hal û hereketên wana de xwe dide der. Vê carê peyva azadiyê jî bi hinek kesên elît re sînordar dimîne. Bi taybetî ger tu rêveber be, tu azad î, yên din hemû kole ne. Ev nêzîkatî dihêle yên din xweziya xwe bi wana bînin. Belkî hevalek qet têkiliya xwe bi wê çînê re nîn e, lê belê li gorî xwe wê dike pîvana azadiyê, paşê tu dinêrî ew ji rastiya xwe direve, vê carê dixwaze liv û tevgerên xwe bişibîne yên çîna burjûvaziya biçûk. Bandora vê heye ku, heya roja îro hin heval hene ger li gorî cewherê xwe tevbigerin hevalên pir xweş in, lê xweziya xwe bi çîna burjûva tînin, bi tirkî diaxive, nizanim liv û lebatên cur bi cur raber dike. Esas pêşketineke çewt bi xwe re pêş dixe. Ev jî dihêle di nav jinê de ref çêbibin. Elbet dema di warê peyv û têgînan de tevlîhevî çêbibe, meylên cur bi cur jî derdikevin. Yek jî ew taxima rehabîlîteyê esas rastiyekê jî bi xwe re derdixe. Erê biryargeha YAJK'ê ye, lê di şer de ye, di nav şer de xwe birêxistin kiriye. Pêwîst dike li gorî şer vesaziyek saxlem çêbike, li gorî şer tevbigere, pozîsyona xwe li gorî şer be, lê di sewq û îdarekirina şer de jî amatoriyên pir cidî derdikevin holê.

Esas sala 1997'ê di warê têkoşîna cins de saleke pir kûr e. Zilam jî êdî jinê wekî eniyeke hember dibîne. Ji ber ku jin hêzeke rêxistinî û xwedî îrade ye û zilam jî nêzîkbûneke dijber raber dike. Di encamê de wê salê têkoşîn pir dijwar e. Eger me meylên azadiyê yên rast bi ser bixistan qezencên salê wê pir zêde bûna, lê ev berevajî çêbû. Ango hinek tişt ji sala 1997'ê qut nîn in. Roja îro ger jin evqas girtî bûbe, ji bo têkoşîna cins tam cesaret nake û xwe digire, esas ev çavkaniya xwe ji wir digire. Pêwîste mirov wisa bigire dest.

Der barê rewşa giştî Tevgerê de, wê salê li Bakur operasyonên dijmin hene, dijmin vê carê li ser eyaletên Dêrsimê, Erziromê êrîşên dijwar pêk tîne. Li wir di asta fermandariyê de em windahiyan didin. Di asta rêveberiyê de li wir hevala Dilzar û Newal şehîd dikevin. Jixwe di wan deman de eyalet 120 şehîdan didin.

Berpirsiyara eyaleta Erziromê hevala Dîlan Bîngol heye, ew jî ji navenda YAJK'ê bû, li wir şehîd dikeve.

Li eyaleta Amedê piştî pratîka Sakîne wana cardin hinek kombûn çêbû, lê vê carê '97'ê piştî Konferansa YAJK'ê ya 1. Dewran bû rêveberî û ew ket nav têkiliyên cuda. Eyalet dîsa di meseleya têkiliyên cinsî û têkiliyên jin-zilam ên paşverû de ku çawa rewa bike, eyalet cardin wisa bi xwe re mijûl bû. Lewma wana jî pratîkeke pir serkeftî dernexistin holê. Her wiha eyaleta Garzanê êdî pratîkên Ednan derdikevin holê, eşkere komkujiya jinê hat jiyîn. Ji ber ku Ednan di rêveberiya Garzanê de cih digire û dizane wê kîjan hêz di ku derê re derbas bibe, wisa şehadetên komî hatin jiyîn. Paşê zelal bû ku bi dijmin re têkiliya xwe heye û bi riya cîhazê agahiyên li ser grûbên hevalan dide dijmin. Ednan jî têkiliyên paşverû yên jin û ziam li ser eyaletê ferz dikir. Di pratîka Garzanê de jî hêza jin pir perçiqandin. Ev meyleke tesfiyekar bû. Jixwe piştre Serok hêza hevalên jin ji wir kişand. Pir bi êş e, lê bi nêzîkatiyên wisa dijwar re rû bi rû mabûn.

Li Botanê rêxistineke cidî heye. Wê salê li gorî eyaletên din êrîşên zêde li ser Botanê çênebûn. Jin rêxistina xwe heye û diparêze jî. Feqet Serok wê demê rexne kir û got, "şêwazê şer derdikeve holê, lê girêdayî zilam derdikeve." Ji ber ku wê demê her kesî dixwest kadroyên xwe yên eyaletê pêş bixe, ji bo vê jî demekê digotin "Gulên Botanê hene". Qaşo vana şerker in, di şer de li pêş in, lê di bin de hêzek bi xwe ve girêdayî dixwazin ava bikin û di bin siya xwe de bide şerkirin û têxe bin teserûfa xwe.

Li Başûr operasyonên ku di payîzê de pêş ketine û di 14'ê Gulanê de windahî pir çêdibin. Bi taybetî di her du operasyonan de windahî bi giştî 62 heval in, ji wana jî 42 hevalên jin bûn. Dîsa li Zagrosê di Herêma Heftemîn de hêz hinek zehmetî kişandiye, hem şertên xwezayî tengav dike, hem piştî ku çend hevalên jin şehîd dikevin, êdî dixwazin paşde bikişînin û werin Dola Xedarê, lê ew jî pir zehmet e. Ji ber ku berfa xwe zêde ye, li wir hevala

Berçem şehîd dikeve. Heman demê li ser nexweşxaneya Avaşînê serdegirtin çêdibe û li wir gelek hevalên birîndar şehîd dikevin. Di 14’ê Gulanê de operasyon destpê dike û di 16’ê Gulanê de li Hewlêrê PDK li ser nexweşxaneya me komkujiyê pêş dixe, paşê bi cenazeyên hevalên me dileyîzin û di encamê de gelek heval şehîd ketin. Ji hevalên jin hevala Hêlîn, Roza, Berbang, Ronahî û gelek hevalên din şehîd dikevin. Serok wê demê em dan lêpirsînê û got, “Hûn hîna nafikirin ku nexweşxaneya we li Hewlêrê çêbûye û wê PDK were, êrîş bike.” Heya niha jî li Başûr bandora wê Komkujiya Hewlêrê heye. Gelek kesan li hemberî PDK’ê bertek girtine, ji ber ku derveyî mirovatiyê êrîş li ser cenazeyan çêbûne.

Di nav şer de kêmasiyên ku derdikevin holê çi ne? Ya yekê, hêza jinê esas li ber xwe dide, lê di sewq û îdarê de pirsgirêkên cidî hene. Dîsa zilam dixwaze neserkeftina xwe bi jinê rave dike. Dawiya sala 1997’an û destpêka 1998’an Serok perspektîf da ku civîna navendî ya partiyê li ser esasê encamên şer bê çêkirin. Di wê civînê de pêwîst dikir pratîka şer were nirxandin, li wir jî tespîteke bi vî awayî çêbû û gotin, “YAJK faşîst dibe”, ew jî Ebûbekir ev tespît kir. Kasetên wê civînê giştî şandin saha Serokatî û Serok wan nirxand. Lê esas Serok dixwest di wê civînê de bê ka xeta çete-hevkaran çiqasî li ser xeta me ya şer bandor kiriye. Di encamê de Serok vê civînê napejirîne, mudaxele dike, 3 pirsan dike û dibêje, “Bila navenda partiyê bersiva van 3 pirsan bide.”

**1-** Koordîne di nav şer de ye, lê bêy ku agahiya Serok hebe cihê xwe terk dike û biryargeha navendî radestî Merwan û Korsan Suat dike. Çima? Kî berpirsiyariyê vê yekê ye?

**2-** Ewqas nirxên me ketin destê dijmin. Berpirsiyarên wê kî ne? Divê bê zelalkirin.

**3-** Ewqas heval şehîd ketine. Berpirsiyarên wê kî ne? Pêwîste ew bê zelalkirin.

Bi taybetî ji bo nirxandina salê pratîkên ku hatine jiyîn, ji bo têkoşîna cins, wekî nêzîkatiyek cins a stratejîk Serok perspektîfa *teoriya qutbûnê* dabû. Mirov di vê wate bide vê. Bi teoriya qutbûnê re çima têkoşîna cins hinek din kûrtir dibe? Jixwe Serok qutbûnê yek milî nagre dest, fizîkî, zîhnî, ruhî qutbûn e. Ji ber ku êdî bingeha bîrdoziya azadiya jinê şekil digire. Tabî ev bi zilam re tirsekê çêdike. Me berê jî li ser civaka Kurd gotibû ji bo zilamê Kurd tenê çi jê re tê hiştin? Di malbatê de jin û zarok jê re tên hiştin. Di encamê de eger zilam partî be jî, wexta zilamtiya sîstemê di kesayeta xwe de nekuştibe, wê bertekek xwezayî çêbibe. Ji ber ku qada xwe ya desthilatê wekî jin winda dike. Hêrsa zilam hinekê jî ji vê tê. Ji bo vê ferasetên serdestiya zilam di asta jor de ye. Lê qada biryargeha jin çêdibe, dibêjin “YAJK e, faşîst e.” Ya rastî ev êrîşek e jî. Bi taybetî ew şerê ku li Başûrê Kurdistanê hatiye meşandin, gelek windayî, lewazî hebin jî, argumanê têkoşînê zelal dibe. Jin nîvê xwe ji zilam qut dike, êdî sîstema xwe ava dike, tedbîra xwe digire, tedbîra xwe nade zilam, navenda xwe heye û hwd. aciziyên zilam zêde dibin. Serok li ser van esasan got, “Kes nikare rojevê ji rê derxîne û xwe bi jinê îzah bike.” Heman demê êdî jê re bû zelaliyek, wisa pênase dike: “Edî wê kî bi min re û bi xetê re bimeşe, ez ê bi wan re bimeşim. Ez kesekê wekî barekê li ser pişta xwe ranakim, divê her kes rewşa xwe zelal bike.” Di sala 1998’an de adeta li ser televîzyonê hinek tiştan bi gel re cara yekê parve dike. Dibêje, “teoriya qutbûnê”, di wê salê de ev pêş xist û ji bo têkoşîna zayendî dahûrandineke bi vî rengî pêş xist: “*Hinek dibêjin çima qutbûn? Ev qutbûn ji derveyî zilam jiyanbûne, ji qirêjbûnê, bêbandorbûnê qutbûn e. Heman demê yê ku dixwaze jiyanê bifetisîne jî ji wê qutbûn e. Di encamê de ji rastiyê qutbûn e. Mezopotamya çavkaniya jiyanê bû, dergûşa mirovatiyê bû, ji bo vê ev qutbûn ji bo ku em careke din bigihin rastiya jiyanê ye.*” Em jî divê wisa bigirin dest. Ev bi fizîkî jî qutbûn dibe.

Ya rastî Serok dixwaze em ji zilam bi fizikî jî qut bibin ku em bi-

karibin xwe bi xwe, bi hêza xwe jiyaneke nû biafirînin. Ji bo vê jî Serok digot, "*Qutbûna we ya fizîkî di riya azadiyê de gava we ya yekemîn e.*" Bi wê ve girêdayî ji pergala zilam qutbûn e. Ya rastî ji tehekûma zilam xilasbûn e. Jin ji bin koletiya zilam xilas kirin heye. Heman demê projeya guhertina zilam e. Yê ku ji cinsê xwe hez nake, bawerî nede xwe cinsê wê xwe bispêre zilam. Ya rastî di vê qutbûnê de Serok xwest jin bi cinsê xwe ve bê girêdan.

***Şehîdên xuyayî yên sala 1997'ê tevlî karwanên nemiran bûne;***

**Hevala Meryem Çolak**; dema ji Heftenînê derbas dibe, bi grûbekê re di kemîna tangan de şehîd dikeve.

**Hevala Zehra-Azîme**; li Garê di nav operasyonê de şehîd dikeve. Taxima şehîd Nêrgiz hemû di 24'ê Kanûna 1997'an de şehîd dikeve. Hevala Zehra jî di wê taximê de cih digire.

**Hevala Dîlan Bîngol**; di navenda YAJK'ê de erk digirt, her wisa dema şehîd ketî berpirsiyara eyaleta Erziromê bû.

**Hevala Zekiye Efrîn**; berê li Zagrosê fermandara yekîneyê bû, di artêşbûna jinê de roleke xwe ya girîng heye. Li Garısa şehîd dikeve.

**Hevala Rojîn Denîz**; ji Mereşê ye. Di sala 1992'yan de tevlî dibe, bi taybetî xebatên DHP'ê meşandiye, di 1994'an de li Botanê maye, paşê diçe saha Serokatî, piştre jî sala 1996'ê diçe Koçgirî û li wir şehîd dikeve.

**Hevala Bêrîvan (Hasret Ergîn)**; ji Amedê ye, di sala 1991'ê de tevlî bûye. Di Kanûna 1997'an de li navenda bajarê Amedê şehîd dikeve.

**Hevala Berçem (Nuriye Demîr)**; di sala 1992'yan de tevlî dibe. Ew jî li Xakûrkê roleke girîng dilîze. Di meha Mijdara 1997'an de li Xakûrkê şehîd dikeve.

**Hevala Berfîn Tolhildan (Emîne Bozan)**; ji Dîlokê ye û di sala

1994'an de tevlî dibe. Li eyaleta Amedê û Garzanê dimîne. Paşê derbasî saha Serokatî dibe û herî dawî li Başûr Karoxê şehîd dikeve.

**Hevala Ronahî (Ayşe Kuşne)**; ji Elbîstanê ye, ji zanîngehê tevlî dibe. Li Başûr hîn bi cilên xwe yên sivîl şehîd dikeve.

**Hevala Canda Turk;** ji saha Serokatiyê hat û di nav operasyonên 1997'an de şehîd dikeve.

**Hevala Fereşîn**; ji Dêrsimê bû, sala '97'an di operasyona Başûr de şehîd dikeve.

**Hevala Dr. Zelal** ji Amûdê ye, tevlîbûna xwe cuda ye, çend caran dixwaze tevlî bibe, malbat naxwaze tevlî bibe, ji bo vê wê li malê girê didin, paşê xwe ji wan xilas dike û tevlî partiyê dibe. Herî dawî sala 1997'ê li Kurêjaro şehîd dibe.

### Pêşketınên Sala 1998'ê Û Bîrdozıya Azadıya Jınê

Salên 1998'an ku têkoşîna cins pir dijwar bû, Serok ji bo wê salê dirûşmeya *"di şer de serkeftin, di jiyanê de azadî"* pêş xist. Çima? Ji ber ku êdî zelal dibe, eger di jiyanê de pîvanên azadiyê neyin rûniştandin, di şer de jî serkeftin nayê bidestxistin. Girêdana serkeftina şer esas girêdayî avakirina jiyana azad e. Ji bo vê jî Serokatî xebatên jinê di vê salê de pir kûr kir. Serok ji bo xebatên jinê mîsyoneke wisa jî da pêş: "Êdî em şoreşa jinê pêk bînin." An na şoreşa jinê nebe jiyana azad jî pêş nakeve. Bi vê jî sê argumanên bîrdoziyê diyar dike û dixe rojevê;

**1-** Partîbûna jinê

**2-** Bîrdoziya jinê

**3-** Şoreşa jinê (di şoreşa jinê de esas şoreşa civakî ye)

Paşê şoreşa jinê ya civakî kesên tesfiyekar ji rê derxistin, wekî reforma sosyal pêkanîn. Halbûkî di sala '98'an de hedefa Serok

şoreşa jinê ye û hemû perspektîfên xwe jî di vê çarçovê de pêş dixe.

Li ser van esasan Serok di 8'ê Adara 1998'an de wekî mizgîniyekê ji bo hemû jinan **Bîrdoziya Azadiya Jinê** îlan kir. Bêguman ev encama lehûrbûnekê ye. Serok, bi îlankirina Bîrdoziya Azadiya Jinê dixwaze tevgera jinê bigihîne astekê. Cardin daneheveke salan pêk hatiye, berhema derxistiye holê, ev e. Serok bi tevlîbûna paneleke televîzyonê Bîrdoziya Azadiya Jinê îlan dike. Di wê panelê de gelek hevalên ji gelên din hebûn, ji tevahî Kurdistanê heval hebûn. Mesela, hevalek di pratîka Botanê de maye, hevalek di pratîka Zagrosê de maye, hevalên di eyaletên hundir de mane û hevalên din bi vî awayî tevlî bûne hene. Heya hevalên Tirk jî hebûn. Li wir Serok dixwaze hinekê karakterê Bîrdoziya Azadiya Jinê bide. Hinekê jî rewşa jina Kurd tehlîl dike. Jin çi ye? Di Kurdistanê de rewşa xwe çi ye? Piştî hat nav partiyê çawa bû û hwd. Hevala Sara jî li wê derê amade ye, Sakîne Batman jî li wê derê ye, Serok dibêje, "Yê ku kesayeta xwe tam tehlîl neke, nekeve xeta milîtaniyê, bi xwe re çi xeteriyê tîne?" Tehlîlên wisa dike. Heman demê jina ku nayê xetê bi xwe re çi xeteriyê tîne hat dahûrandin. Dîsa karakterê Bîrdoziya Azadiya Jinê tenê bi gelê Kurdistanê re sînordar nîn e, karakterê xwe gelên din jî digire nav xwe heye.

Serok pênaseyek bi vî awayî dike: "*Rizgariya giştî ji bo jinê nayê wateya rizgariyê. Ji şoreşên din cudahiya xwe ev e; di nav şoreşa giştî de pêwîste şoreşa jinê jî çêbibe.*" Ango ev ne têkoşîneke ku mirov taloqî piştî şoreşa giştî bike, paşê ya jinê çêkin. Nêzîkatiyek wisa nebû. Ji ber tecrûbeyên tevgerên cîhanê hene. Rexmê jin di şoreşan de ewqas xwedî berxwedan e, şoreşên giştî çêdibin, lê jin rizgar nabe, dizivire pozîsyona xwe ya berê. Li ser vî esasî dijwartir di nav şoreşa giştî de şoreşa jinê bê birêxistinkirin.

Serok, ji bo Bîrdoziya Azadiya Jinê wisa digot: "*Hemû îdeolojiyên hene mohra zilam li ser wana ye. Her çiqas nêzîkatiya dest-*

*hilatdariya zilam a li ser civakê hakim bi sedê salan her tim veşartibe jî, kesekî ku hinekê rêzdariya xwe ji zanistê re hebe, hinekê bi rizgariya jinê ve girêdayî be, li ser bingehek hişk eleqedariya xwe ji gel re, ji rizgariya gelekî re hebe gengaz nîn e ku vê nebîne. Lewre di fikir de jî pêwîstiya afirandina îdeolojiyeke di eksena jinê de girîng e. Eger em dixwazin bikevin nav tevgereke şoreşger û xebateke civakî ya cidî, wê çaxê bi dijwarî pêdivî bi xebateke îdeolojîk a aliyê jinê esas digire, heye. Eger em rizgariya jinê dixwazin, pêwîste em saziyên girêdayî îdeolojiyên desthilatdariya zilam bi tundî rexne bikin û derbas bikin. Tevahî rêxistinên milîtarîst, malbat di vê çarçoveyê de ne. YAJK wê hemû zilaman bîne hîzayê. Ez bi vê bawer im. Ez bi jinê bawer dikim û vana pêş dixim. Hinek dibêjin harem, bila biteqin. Jinên me li çiyê ne, jinên ku em herî zêde ji wana hez dikin di çiyê de ne û piraniya wana jî mîna Zîlan çûne şehadetê. Vana jinên me ne. Û bi rastî jinên leheng in. Em ê bi jinan re bijîn, cuda tu kesî re nejîn. Em zilamên van jinan e.*"

Der barê Bîrdoziya Azadiya Jinê de jî wiha dinirxîne: "*Îdeolojiya jinê îdeolojiyek sosyal e. Ev îdeolojî tenê di wateya rizgariya cinsekê de nîn e. Îdeolojiyeke rizgariyê ya di eksena jinê de, bêguman ne nêzîkatiyek femînîst e. Ez bi xwe ne jin im. Em ji çareserkirina pirsgirêkên şer bigirin heya aştiyeke girêdayî azadiyê pêdivî bi pêşketineke îdeolojîk a bi vî awayî heye. Hemû îdeolojiyên hene mohra zilam li ser wana ye, zêdehiya xwe îdeolojiyên zilam in. Pêwîstiya afirandina îdeolojiyeke di eksena jinê de girîng dibîne. Tevahî rêxistinên ku giraniya zilam li ser wana hene, tabî pêwîste mirov pir zêde rexne bike. Li ser hemû rêxistinên milîtarîst ji sedî sed mohra zilam heye. Vana ji serî heya binî rêxistinên zordest in, rêxistinên şîdetê ne. Pêwîste mirov saziyên girêdayî îdeolojiyên desthilatdariya zilam bi tundî rexne bike. Di nav malbatê de dîktatorî heye, mulkiyet heye, ji her cureyê maf-huqûqê bêparbûna jinê heye, êşên wê hene. Berî her tiştî bi fizîkî tunekirina wê heye. Ji bo ez kesekê zêde tawanbar nekim û di bin tohmetê de nehêlim, di vê wateyê de ez dibêjim min destpêkê xwe*

*kuşt. Çi jin biqehire, çi zilam biqehire, qet li xema min nîn e. Ji bo min ev felsefeyek e, ji bo min ev îdeolojiyek e. Ez nikarim dev ji jiyana li gorî wê berdim. Dibe ku hinek bibêjin bêexlaqiyek mezin e, nizanim hinek dikarin bibêjin jirêketineke mezin e. Ev nêrîna wana ye. Rêzdariya min ji nêrîna wana re heye. Pêwîste ew jî ji nêrîna min re rêzdar bin. Li şûna bibin zilamên di sîstemê de, ez ji zilamtiyê nefret dikim. Mirovê ku bibe zilamekî wisa, ez vê wekî rezîliyek mezin, ketîbûneke mezin, wekî çavkaniya kirêtiyeke mezin dinirxînim. Kurd esas gelekî ji hezkirinê jî pir bêpar hatiye hiştine. Hezkirin rastî komkujiyê hatiye. Dilê Kurd li ku dere ye, kengî qediyaye? Dilê di Kurdan de heyî dilê kî ye? Ev hest hestê kî ye? Ger ruhê xwe hebe, ev ruhê kîjan biyaniyî ye? Ev ruhê kîjan xulamî ye? Ev kîjan bêwijdanî ye, kîjan bêçaretî ye? Pêwîste vana bên vekirin. Ma jiyana bê evin dibe, yan jî jiyana bê hezkirin dibe? Li gorî ku nabe, li gorî hatiye qetilkirin, belê em ê vê çawa biafirînin? Zilamên me çawa difikirin? Jinên me çawa difikirin? Ez êş dikêşim, heta dilê min jê diçe. Ji bo em jinê di wateya çors de bidin şerkirin na. Ji bo em zilamê di nav me de bînin hîzayê. Dema dibêjim bînin hîzayê, hinekê wî biguherin, veguherin… Niha piçekê jî naxwaze nêzîkatiya xwe biguhere. Ez van zilaman layiqî keçên me nabînim. Çima? Ji ber ku ez bejim cinsiyeta wî ya çors, ew jî zêde li pêşberê min nîn e. Ji ber ku bi serê xwe bûye bela. Wekî mayîna serseri dixwaze di serê jinê de biteqe. Hêza wî têra dijmin nake. Nikare plana çalakiyeke cidî, rêxistinekê pêş bixe. Sûc tavêje ser jina li kêleka xwe. Ez dibêjim ku ez di xizmeta jinên me yên azad de me, dîsa destpêkê dayîk, bi taybetî hemû jinên me yên leheng ên gerîla yên şer dikin, ez însanê wana û hemû jinên me yên di nav têkoşînê de me, ez zilamê wana me.”*

Esas Serok di şexsê xwe de destpê dike û kuştina zilam wekî projeyekê datîne holê. Pêwîste mirov Bîrdoziya Azadiya Jinê wisa nebîne. Destpêka Tevgera me tenê ne ji bo jin rizgar bibe. Êdî jin dibe hêz, bi vê hêzê zilam jî biguherîne û her wiha bikaribe pê re civakek azad biafirîne. Hedef jina azad, bi zilamê azad re civaka

azad biafirîne. Ev jixwe karakterê têkoşîna me nîşan dide, jinûve jiyana heskirî û evînî afirandine. Serok evînê, hezkirinê jinûve pênase dike. Jixwe di civaka Kurd de evîn, hezkirin nehiştiye. Bi navê hezkirinê koletî, bi navê evînê kolekirin çêdibe. Serok, bi tevahî bi vê Bîrdoziya Azadiya Jinê bibe çareserî. Di bîrdoziyê de armanc ev e; Serok dixwaze bersiva şehadeta hevala Zîlan bide. Ji bo vê digot, "Ez wek zilamê van hemû şehîda me." Ango wê ji bo wan jiyan bike. Ji ber ku di wê demê de Serok hevala Zîlan wekî statuya xwedawendan girt dest û bi vî rengî "Zîlana Xwedawend" pêş ket. Ya rastî di bin peyva Jina Xwedawend de jina zana heye, hêz heye. Her wiha êdî Serok perspektîfên pêwîstiyên azadiyê bi nasnameyeke bîrdozî şênber dike, amûrên têkoşînê xurt dike.

Rêgezên Bîrdoziya Azadiya Jinê hene; em ê yek bi yek li ser wana bisekinin.

**1- Welatparêzî:** Serok bi welatparêziyê vê dibêje, "rizgarî û azadiya jinê destpêkê welatparêzî ye", yanî jiyan di axa xwe ya ku tê de hatiye dinê, girêdana bi axê ve, di ferqa welatparêziya xwe de girêdana bi axa xwe re. Di ferqa welatparêziya xwe de be, ji bo xwe bike têkoşîna yekemîn. Ax nebe mirov nikare azad bijî. Me berê jî mînaka wê dabû; eger çûk di hêlîna xwe de destek biyanî li ser hebe, ew çûk jî hêkên xwe terk dike. Çima? Ji ber destê biyanî lê ketiye. Nexwe ji bo ku mirov bikaribe azad bijî welatekî azad pêwîst e, axeke azad pêwîst e. Welatê di bin dagirkeriyê de be, li ser her tiştî êrîş heye, tê çawa azad bijî? Ji bo vê welatparêzî şert e.

**2- Fikra Azad û Vîna Azad:** Serok ji bo jinê vê dibêje; "Pêwîste bi fikrê xwe yê azad û vîna xwe ya azad divê tevlî jiyanê bibe." Eger ev bîrdozî pêk were, wê demê jin wek bixwaze bijî, xwe bi xwe biryar bide. "*Em jî bi fikrê jinê bawer in û em ê bi rêz bin li hemberî vîna wê. Ev rêgez divê dev jê neyê berdan û di nav bîrdoziya azadiya jinê de ye. Eger ez bim jî divê jin sekna xwe û helwestên xwe diyar bike, bêje ez ê bi vîn û fikra xwe tevlî bibim.*"

Yanî xwedî biryarbûn, xwedî nêrînbûn, di hestan de, di fikir de û her wiha dev ji wan nêzîkatiyên kevneşop berdane. Dest ji hest û fikrên ku di civakê de hatine avakirin berde û sekna serbixwe girîng e. Bi rastî jî serxwebûn di pîvanên azadiyê de esasî ye. Tu nikaribe bifikire, nikarîbî bi xwe bikî, bi fikrên din ên eklektîk, ji vir bigirî, ji wir bigirî, hele hele ev jî dijmin şekil daye. Di bin navê adetên civakê de şeklekî wisa daye. Bi vana re azadî çênabe. Ji bo vê xwe rizgarkirin girîng e.

**3- Birêxistinbûn:** Serok dibêje, "*Jiyaneke ku xwe bispêre azadiyê pêwîst e. Hem jiyana xwe bispêre azadî û rêxistinê. Mirovek bêrêxistin tune ye. Rêxistina destpêkê jî bi jinê re destpê kiriye. Zilam dikare bêrêxistin be, jixwe saziyên rêxistinên wan pir û pir zêde ne. Lê pêwîste hûn wek biharekê rêxistina xwe binivîsin. Bêy rêxistinbûnê ne pêkan e hebûna we hebe, ji ber ku tu hêza xwe ji wir digirî.*" Di civaka xwezayî de jî me dît, eger jin xwe birêxistin neke, nikare bijî. Jin rêxistina xwe heye. Xwe birêxistin dike, civakê birêxistin dike, her kes tê de rol û mîsyona xwe heye. Ev e hêza wê, ango xwedawend çawa bû hêz? Xwedawendan hêza xwe ji rêxistina xwe girtin. Hele hele derfetên niha em tê de jiyan dikin hem serdestiya zilam, êrîşên zîhniyeta sîstemê hene, ne ji rêxistinê be nikare xwe li ser piyan bihêle. Bi vê projeyê jiyana azad dikeve meriyetê.

**4- Têkoşîn:** Serok li ser vê dibêje, "*Bi rêxistinê ve girêdayî divê hûn jiyana xwe tevahî ji têkoşînê pêk bînin. Yanî jiyan tevahî têkoşîn e. Ji ber ku jixwe nasnameya jinê di nav çar dîwaran de ye. Ji bo vê jî divê bêje 'yek, ez ê birêxistinî bim û dudu, karê min têkoşîn kirine.' Jixwe bêy têkoşînê wateya xwe nîn e.*" Serok ji bo jiyanê, ji bo azadiyê jî û di tevahî pênaseyên xwe de dibêje "*Xwe bispêre esasên bîrdozî, polîtîk û leşkerî û vê her tim bike.*" Di vê wateyê de têkoşîna me tenê ne leşkerî ye. Têkoşîneke bîrdozî, polîtîk, leşkerî û her tim pêwîst e. Azadî di kêliyan de tê avakirin. Kaos heye, tiştên di wê kêliyê de tên avakirin, tu mudaxele dikî. Hêza te diyar e. Tê bi çi mudaxele bikî? Tê bi rêxistina xwe mu-

daxele bikî. Ya rastî ew kêliyên azadiyê kêliyên têkoşînê ne. Nexwe bêy têkoşîn tu wateya xwe nîn e, tu nikarî bêjî ez azad im.

**5- Xweşikbûn û Estetîk:** Ya rastî Serok li vir rêgezên jiyana azad datîne. Jiyana azad divê xweşik be, bi estetîk be. Ji çav bigire heta nêzîkatiyan pêwîste rêgezeke xwe ya estetîkê hebe. Diyar dike ku wê cewherê jiyana mezin çawa birêxistin be, asta rêxistinê be. Divê cilên wê jî nexşê hûnandina xweşikbûnê be. Ev çi ne? Ziman e, çand e, xweşikbûna hal û hereketa ye. Heman demê Serok wekî hunera şoreşî, çanda şoreşî, exlaqê nû û pîvanên xweşikbûnê datîne. Jinek xwe çiqas makyaj bike, pêşkêşî zilam bike, ne bi vî awayî ye. Divê şekil bide xwezaya xwe jî. Mesela, di pîvanê perwerdeya Serok de kî xweşik e, kî zana ye, ev qet pîvan nebû. Carina pirs dikir, heval heta bersiv dida digot, “*zû biaxive, çi tê devê te wê bêje, uslûbê we bila herikbar be.*” Bi rastî nayê fêmkirin. Ev çi ye? Xweşikbûna ziman e, dana fêmkirine û her wiha jinek pêwîste derdora xwe bandor bike. Jinek hîn nikare xwe îfade bike, şerm dike, hal-hereket e, ev hemû ji civakê hatine. Ev eyarkirin, wê dengê xwe çawa bilind bike. Dengê jin zilam tehrîk dike; divê jin xwe ji van taybetmendiyan xilas bike. Serok digot rast bisekinin, yanî bila bejna we rast bisekine. Min bi xwe ji pêş ve gelek caran kulm xwarine. Çima? Ji ber Serok lê dida, digot, rast bisekine, bila her kes ji te bandor bibe. Wekî carina em dibêjin ya “filan kes dîk e, bi heybet disekine” vê wekî serbilindiyê dibîne.

Piştî ku Serokatî ev Îdeolojiya Rizgariya Jinê îlan kir û prensîbên wê diyar kir, di nav têkoşîna me de yek ji hevala herî zêde bi kûrahî jê bandor bû û xwest yekbûna xwe bi vê bîrdoziyê re pêk bîne, hevala Sema Yuce ye.

Hevala Sema Yuce di sala 1991’an de tevlî partiyê bûye. Berê li Enqerê dixwîne. Zanebûna wê ya kurdewarî heye û jixwe di malbatê de çanda kurdewarî heye. Dema xwendekar e bi partiyê re dikeve nav têkiliyê. Tecrûbeyên xwe yên jiyanî pir in. Bi naskirina

nakokiyan re rû bi rû dimîne gelek caran. Di destpêka xebatan de navê wê Leyla bû, paşê jî navê Serhildan dişixulîne. Ji Leyla Qasim pir bandor bûye. Di sala 1991'an de derbasî saha Serok dibe, piştre dawiya sala 1992'yan diçe qada Serhedê. Li wir diçe bajarê Agirî û xebatan dimeşîne, piştre der heqê wê de îxbar dikin û dikeve zîndanê. Nameyeke pir kûr nivîsandiye, piştî çalakiyê jixwe yekser şehîd nakeve. Heya 10'ê Hezîranê li nexweşxanê li ber xwe dide û li wir jî rojnivîsê digire, ew dibêje û kesek jî li cem wê dinivîse. Asta dahûrandinên şehîd Sema pir kûr bûn. Hem di dema xwe ya bihurî de, pêvajoya li zîndanê jiyan kiriye hemûyan dinirxîne. Jineke ku kole be, jineke ku bi zilam ve bê girêdan, di xetê de ne zelal be û hwd. van hemûyan bi awayek berçav datîne. Dîsa di şexsê Meral Kidir de jinên ku dibin desthilat, zilamtiyê li ser ferz dike, bi wê re jî fetisandinekê jiyan dike.

Bi rastî dahûrandinên hevala Sema pir kûr in, mirov dikare paşê li rapora hevala Sema binêre. Serok dahûrandineke bi vî awayî kir: "*Ya rastî wê pir tengav kirine. Di aliyekî de Can Yuce, di aliyê din de Meral Kidir pir wê êşandine. Rast e kûrbûnek pir cidî heye, lê ewqas xistine bin bandorek wisa ku navgîna me rexne kir. Xwestiye bibe jineke azad, lê belê hawirdor jê re musaîd nîn e.*" Heman demê ji bo kesayeta wê got, "*Eger firsenda xwe hebûya belkî di dîroka me de cara yekê wê pîvanên jiyana azad û jina azad jiyanî bikira.*" Esas Serok ev çalakiyên ku bedena xwe didin ber agir qebûl nekir û di her mijarê de rexne kir. Eger derfeta jiyankirina pîvanên azad hebûya dibe ku ev çalakî jî nekira. Ji ber ku ev çalakî wekî xet di nava me de pêş ketiye. Lê ya hevala Sema wekî ji navxweyî re jî bersivek e. Serok fêmkirin heye, ketina xeta bîrdoziya azadiya jinê heye. Rast e Serok jî vê wek xet dinirxîne, lê dem û war girîng e. Li ku derê, bi çi wateyê ev biryar e? Dîsa Serok ji bo hevala Sema Yuce digot, "*Di zîndanê de ye, li derve bûya pêkan bû derketinên xurtir jî bikira.*" Her wiha ji bo hevala Sema û Zîlan dibêje, "*Ez pir mafê xwe nabînim ku ez li ser wan gotinan bêjim, jixwe wana her tişt anîne ser ziman.*" Armancên

çalakiyên xwe anîne ziman.

Hevala Sema xeta Serok fêm kiriye, ketiye xeta têkoşîna bîrdoziya rizgarî û azadiya jinê. Li aliyê din jî di zîndanê de xeta tesfiyekaran heye, Can Yuce û Meral Kidir hene. Ji bo wê hevala Sema dibêje, “di asîman de du roj nabin.” Can Yuce mîsyoneke wekî serok jî dide xwe, ji hemû kovar û rojnameyan re li ser jinê nivîsan dinivîse. Xwe kiribû serokê xeta azadiya jinê jî. Dixwaze li ser pêkhateya tevgera jin bilîze, têxe bin bandora xwe. Li wê derê Meral Kidir wana jî bi Can Yuce re dibin yek.

Herî dawiyê di van çalakiyan de wext û mekan pir girîng in. Di van salên dawî de ev çalakî pir pêş dikevin. Mesela, di roja bîranîna şehadeta hevala Viyan de gelek kes dibêjin, “em ê xwe bişewitînin.” Tê çima xwe bişewitînî? Çima? Wisa fêm dike; mirov di vê Tevgerê de bedena xwe bide ber agir, mirov dibe milîtan. Halbûkî derfet û amûrên me yên berxwedanê pir zêde ne. Berê gelek heval tevlî dibûn, tehlîlên Serok tunebûn ku bixwînin, tesfiyekaran jî ji vê sûd digirtin. Lê niha ne tenê em hevalên di Tevgerê de, derveyî me li Kurdistanê û derveyî welat civak hemû tehlîlên Serok digihe her kesî, her kes dixwîne. Ev bi xwe re zanebûnekê ava dike. Zanebûn amûrê te yê têkoşînê mezin dike. Tu di ferqa rastiya wê de yî ku rastî û şaşiyan ji hev derdixî. Tu ne bêhêzî ku nikaribe têkoşîn bikî û hele hele tu di zemînê çiyayên azad de bî û di nav rêxistinê de bî, divê helwest hîn cuda be. Ji bo vê watedanek rast pêwîst e.

Yê ku çalakiya hevala Sema xurtir kir hevalê Fikrî Baygeldî ye. Hevalê Fikrî ji Licê ye û ew jî di zîndanê de ye. Li wir çalakiya hevala Sema dibihîse û ji bo bersiva çalakiya hevala Sema di zîndanê de heman çalakiyê pêk tîne. Sala ‘98’an li zîndanê tesfiyekarên mîna Can Yuce dixwazin xeta xwe bibandor bikin. Hevalê Fikrî Baygeldî di nameya xwe de wiha dibêje: “Hevala Sema fermandara min e, ez jî leşkerê emrê wê me.” Li vir mirov pêşengiya jina azad dibîne, ev zilam jî bi xwe re diguherîne. Serok jî ji bo hevalê

Fikrî digot, “*Fikrî dibe Prometeûs*”. Heman demê ev çalakî ji kuştina zilam re bersiv e. Di pêşengiya jinê de em ji zilam re çi bersiv bidin? Hevalê Fikrî cardin dibêje, “Hevala Sema fermandara min e. Jina Kurd ku bûye fermandar, ez bi çalakiya xwe re tenê neferekî emrê wê me.”

Serok ji bo van çalakiyan wiha dinirxîne: “*Di hevala Zîlan de asteke teorîk û bîrdozî heye, rêgezên wê hene. Ferqa hevala Sema ew e, hîn zêdetir bi pirsgirêkên pratîkî re rû bi rû maye û pê re têkoşîn dike. Ber bi pratîkbûnê ve temamkirin heye, ango perspektîfên pratîkê wê çi bin, dizane, ev di asta lêhûrbûna wê de zelal dibe. Hevalê Fikrî jî, wê çawa zilam bi kesayetek nû şekil bigire, li beramberî wê şiyarbûneke pir mezin û bersiveke pir watedar heye.*”

Serok hevala Sema jî wiha pênase dike: “*Dema 88 rojên xwe li nexweşxanê derbas kir, piştî ku bedena xwe dabû ber agir, hin nameyên hevala Sema hebûn. Wê demê bedena wê hemû şewitîbû û şewat bi xwe re êşeke pir mezin tîne. Rexmê wê jî hevala Sema got ‘Jiyana ku min herî zêde tam jê girt, ew roj bûn.’ Ev jî ji ber ku armanca çalakiya xwe dizane, hedefên xwe dizane û pê re bûye yek. Em hereketek in ku nirxên xwe yên moralê herî bilind e, em jî di nav vê hereketê de jiyan dikin. Ji bo vê jî hevala Sema pirsa ‘Moralê te çawa ye?’ pir bêwate dibîne. Bi hêza jiyana azad re kesayeteke berxwedêr, biwate derdikeve holê. Nexwe ne pêkan e ku mirovek bi ewqas şewatê li ber xwe bide. Ya rastî li vir gihîştina jiyana azad heye. Ez pê bawer im ku ev nêzîkbûn wê zilam jî neçar bike xwe biguhere.*”

Serokatî dixwaze her şehîdan fêm bike û wana bixe pîvanên me yên jiyanê. Eger em gotinên şehîdên xwe ji xwe re nekin rêgez, rêgezê ku divê em li ser bimeşin, em zêde wate nadin. Di Serok de ev heye; dixwaze li ser her şehîdê çi bêje, behsa moral dike. Dîsa di roja me ya îro de moralê me pir guherbar e. Carina em dibêjin ya, “ez ne rihet im, bila îro kes nêzî min nebe!” Niza-

nim yek xebera şehadetê bihîstiye moralê xwe xistiye, rexneyek xwariye û her wiha moralê xwe dixe. Moral nirxek e. Em wekî Tevger li ser kîjan nirxan dimeşin? Wisa tiştê bêîstikrar, rojekê geş, rojekê bêmoral. Em milîtanên vê Tevgerê ne. Em ne Tevgerek wisa ne, hele hele kesek ku milîtanê vê Tevgerê be, pêwîste tiştê em tê de êş dikişînin, bersivên me ji bo wana cuda bin. Bi moral, zindîbûnê hêza vê têkoşînê xurt bike. Rojekê ji bo vê pêwîste tu bizanibe tu li ser çi dimeşî. Her çiqasî em êş bikêşin jî pêwîste hemû bersivên me bi moral û zindî bin, ku bikaribe hêza têkoşînê bilind bike. Hemû tiştên ku hêza têkoşînê zeîf dikin ne yên xeta me ne. Ji bo vê em carina hinek têgînan bi kar tînin, em di ferqa wê de ne. Em hema ji hevalekê re dibêjin, tu çima bêmoral î? Mesela, hevala Sema di nav têkoşînê de ye, ber bi riya azadiyê ve dimeşe, moralê xwe pir û pir bilind e. Wê çima pirsek bi vî awayî bike kî? Ya din jî, em dibêjin "heval şehîd ket", hevalên kevn dibêjin "şehîd bû". Esas ev têgîn wisa tê bikaranîn. Em Tevgereke bîrdozî ne, pêwîste her gotineke em bilêv dikin wê bi xwe re çi wateyê derxe, em baş bizanin. Ez jî di dersê de dibêjim "şehîd ket", ev şaş e; ya rast "şehîd bû". Meseleya moral jî wisa ye.

Sala 1998'ê saleke hinekê tijî bû. Ya rastî Serok ji bo mîsyona vê salê got, "*di şer de serkeftin, di jiyanê de azadî*". Di wê demê de amadekarî dikir, hinek lêhûrbûn destpê kiribû. Çima? Ji ber ku Civîna Navenda PKK'ê çêbû, pratîka herêman hat nirxandin. Serok di vir de rexne dike. Gelek şehadet çêbûne û her wiha dixwaze van hemû pratîkan bigire dest. Serok her salê mîsyonekê dide, em ji wê mîsyonê re nabin bersiv. Li hemberî wê got, "*Ez êdî ji PKK'ê îstifa dikim. Ji îro şûndetir ez tu kesî wek bar li ser pişta xwe ranakim. Kî wê bi me re be, ez ê bi wana re bim, ez ê hevaltiyê bi wana re bikim, êdî yên din bavêjim.*" Yanî Serok dixwaze di Tevgera PKK'ê de nûbûnekê di pêşengiya Tevgera Azadiya Jinê de pêk bîne. Di Tevgerê de nûbûn, vê nûbûnê jî bi tevgera jinê re bide çêkirin.

Serok wê salê li saha xwe di asta konferansa partiyê de Konferansa Rojhilata Navîn li dar xist. Jixwe di pêvajoya wê konferansê de Zekî jî diçe îxanetê. Serok di konferansa giştî de dixwest rêgehekê dane. Divê ev pratîka hevkaran û çeteyan mirov tehlîl bike û li hemberî wê, pratîkên hemû eyaletan dahûrînin. Heman demê du xet diyar kir; yek xeta Zîlan, a din jî xeta Zekî bû. Li ser van esasan Serok digot, *"Du Z hene. Divê pêkhateya me ya milîtan û kadro li hemberî vê xetê xwe zelal bike. Yan em ê xeta hevala Zîlan bişopînin, an jî em ê xeta Zekî bişopînin."* Ji bo vê konferansê digot "sererastkirina xeta şer", wisa bi nav dikir.

Di wê salê de 2. Konferansa Jin a Rojhilata Navîn hat lidarxistin. Hem hevalên di nav akademiyê de, di nav xebatan de, di malên lêhûrbûnê de û hejmarek mezin kom bûne. Ew jî di 25'ê Adara 1998'an de pêk hat. Konferansa Jin a Yekemîn di sala '96'an de li welat çêbibû, ev jî wekî konferansa duyemîn hat binavkirin. Esas ev amadekariya Kongreya PKK'ê ya 6. bû, lê Serok ji bo Konferansa Jin jî amade kir, dixwest partîbûna jinê ava bike. Jin êdî bibe partî, ji bo wê bingehek bû. Armancên vê Konferansê, di xeta azadiyê de ferasetên şaş ên ku xwe ferz dikin pêwîste bên zelalkirin. Serok bi fiîlî tevlî nebû, ji ber ku xebata jin e û dixwest jin bi xwe konferansa xwe li dar bixe. Di roja yekemîn de rojevên konferansê hatin diyarkirin, ew ê di vê çarçovê de derbas bibe; nirxandina pêvajoyê, nirxandinên pratîkê, nirxandina rêxistinî û biryarê. Komîsyona biryarnamê jî hatibû sazkirin. Rojane tekmîl ji Serok re dihat dayîn. Lê dema kaset ji Serok re çû, wekî rexne got; "*Rojev şaş e û ev neketina cewhera milîtaniya jin e*", yanî neketina rojevê neketina cewhera milîtaniyê ye. Her wiha wisa nirxand: *"Ji bo min yek rojev heye, du xet hene, ew jî zelal bûne; yek ji Fatma û Semîr destpê dike heya bi Zekî didome. Ev xeta çete-hevkariyê ye. Dudu, xeta Zîlan e, ji Zekiye heya Sema xeta jina azad ku temsîl dike, ev xet zelal e û nirx derxistiye holê. Ji bo vê jî di konferansê de şerê di navbera herdû Z'yan de pêwîste vebe û zelal bibe."* Serok bi vî awayî dixwest rêgeha têkoşîna azadi-

ya jinê zelal bike.

Heman demê Serokatî xwest pratîka Tevgera Jin a ku derketiye holê hemû lêpirsîn bike û di şexsê kesan de girt dest û ferasetên heyî dahûrand. Li ser van esasan Serokatî dahûrandinên tîpan kir. Ez vê girîng dibînim, em vê nakin, şexsek radibe nirxandinekê dike, em dibêjin “aîdê wê ye”. Jixwe şexs aciz dibe, rexneyan qebûl nake, bertekên xwe rave dike. Ji ber tenê ya xwe dibîne, yê din jî pir encam jê dernaxe, ji ber aîdê xwe nabîne. Mesela, em hevalekê radikin, encama wê nakin malê her kesî. Ev nayê vê wateyê ku ew heval qet di xwe de nabîne, lê tu encamê dikî malê giştî. Yê me pir dubare dibe. Çima? Ji ber em aîdê xwe nabînin, ji wê jî encam dernaxin. Ev aîdê filan kes e, ev ê filan kesî ye. Eynî şaşîtî kirine, dibêje “ez ê jî bikim.” Bi rastî ev şêwazekî fêrbûnê yê pir paşde ye. Gotinek klasîk heye, dibêjin “Kurd heya bi çavên xwe nebînin, bawer nakin.” Divê bi çavê xwe bibîne, serê wî li tehtê bikeve. Ê serê hevalê me li tehtê ketiye; çima ez ê jê encam dernexim? Di encamê de Serok di şexsê kesan de pratîk dahûrandin kir û kir malê giştî. Li hemberî xeta azadiyê, şaşîtiyên me yên rû didin, kîjan meylan xwe dane der, Serok dixwaze wana diyar bike.

***Tîpên dane avakirin ev in:***

**1-** Kesayeta polîtîk û hestiyarî ku bi hestên xwe dikeve bin bandora tesfiyekaran. Bi taybetî di şexsê hevala Sara de girt dest û di şexsê Dîcle Qamişlo de (ya xwestî jehr bide Serok) tehlîl kir. Ango kesayetên bi Şener ve hatin girêdan. Şener li vir dixwest bi riya hestan wana mehkûmê xwe bike; bi vî rengî dikevin bin xizmeta dijmin. Serok li ser vî esasî wisa digot: “*Bi Şener ve girêdan jirêderketin e. Jin jî dibe amûrê vê, ev xizmetkirina ji dijmin re ye.*” Serok ev wekî hemleyeke dijmin jî digirt dest. Em carina dibêjin ez pir hestiyar im, rexneya xwe jî didin. Em zû bandor dibin, em ji bandorê re vekirî ne. Ev ne îradeyek bi ser bixe. Serok ji bo hevala Sara got, “*dîroka we tevahî Sara ye*”. Dîroka azadiya jinê dîroka

Sara ye. Bala xwe bidinê; hest jî neyin birêxistinkirin, dikevin bin xizmeta dijmin. Şener tenê kesayetek bû, xwest Partiyê xira bike; ne wisa bû. Ev siyaseta dijmin bû, dijmin diwest Şener wekî serokekî sexte ava bike, alternatîfê Serok ava dikir. Kî şixuland? Jin şixuland. Kîjan jin şixuland? Jina ku hestên xwe birêxistin nekiriye. Bi vî awayî jin ji tesfiyekaran re dibe zemîn.

**2-** Kesayeta jina hevkar, ango jina yekser bi tesfiyekaran re hevkariyê dike. Ev jî di şexsê Sakîne Batman de nirxand. Sakîne Batman hîn sala 1990'î diçe saha Serok, li gor xwe hinek pîvanên xwe hebûn, heta hinek tiştên Serok red dike. Hêzeke xwe heye, tim digot "Ez azad im. Ev rast e, ev şaş e." Bi vî şêwazî Serok dixist nîqaşê, lêpirsîn dikir û wisa pîvanên xwe datanî. Temam mirov tiştan bixe lêpirsînê, lê wê pîvanên te yên rast çi bin? Tiştên em bêjin pîvanên min in, ew ên dijmin in. Çima? Ji ber em partiyek in, sîstema Modernîteya Kapîtalîst zîhniyeta me bandor kiriye. Ji bo wê tiştê Partî dibêje, ew dixe lêpirsînê. Bi rastî ev jirêderketin e, divê mirov kesayeta Sakîne Batman wisa bizane. Ez çima vana dibêjim? Vana kî bûn, çi kes bûn, çi feraset bûn? Divê em nas bikin, ji xwe re encaman derxin. Ev ders di eynî wextê de dersa Partiyê ye jî. Mesela, dîroka me ne ev e em tenê wekî kronolojik bêjin di vê dîrokê de ev bûye, ev bûye. Jixwe arşîva dîroka me heye, ya pêwîst em ji xwe re dersan jê derxin û asta xwe ya partîbûnê bilind bikin. Ji ber kesayeta xwe ji rê derketiye diçe, yek bi yek bi ferasetên Zekî re dibe yek. Yeka rêgeza Tevgera me red bike, têxe lêpirsînê, wê bi ferasetên djmin re bibe yek û xeta hevkariya bi zilam re ye. Me eynî tişt ji bo pratîka sala 1996'ê li ser kesayeta Newal jî gotibû, ji ber ew jî bi Zekî re dibe yek. Heta hêza jinê pêşkêşî zilam dike û dixe bin xizmeta zilam. Wisa ye, ango ew yekser bi tesfiyekaran re dikeve nav hevkariyê. Ev jî di şexsê Sakîne Batman de tehlîl kir. Serok digot, "*Di şexsê Sakîne de dijminiya jinê bi amûrê jin tê kirin.*" Ev kesayet wisa ne tenê dijminê partiyê ne, dijminê jinê ne jî. Di encamê de xeta azadiyê heye, vê naparêze, xeta hevkariya dijmin diparêze.

**3-** Ev jî di kesayeta Zekiye Botan de tê pênasekirin. Ji ber ew di Botanê de bû, Serok got, “*Kesayeta karîkaturê zilam, xwe şibandina zilam, girêdana zilam, hundirê xwe vala.*” Berî wê jî hinek nirxandinên Serok hebûn, digot, “teqlîdkirina zilam”. Teqlîdkirina zilam tiştekî pir xirab e. Mirov çi be, xirab be jî, cardin bila yê xwe be. Ev ne aîdê xwe ne, aîdê zilam in. Zilam saha şer ji jinê re girt; an tê wekî wî bî, yan jî te nedida şerkirin.

**4-** Kesayeta ku ji xeta azadiyê dûr e, ji wê bêxeber jiyan dike. Ango bê xeta azadiyê jiyan dike, xwe pêş naxe. Ev tîp, di şexsê Rengîn Efrîn de hatibû tehlîlkirin. Serok digot, “*Rengîn Efrîn ji xeta azadiya jinê dûr e, bêxeber e, tenê wisa dimeşe. Ew jî di bin bandora zilam de dimeşe.*” Çima? Tu xwe zana nekî, zanebûneke bîrdozî-polîtîk, di warê fikir de ava nekî, wê tenê bimeşe.

**5-** Kesayetên esasî jî, kesayetên Zîlan û Sema ne. Vana xeta azadiyê ne û divê her kes li beramberî vê xetê rexneya xwe bide. Yanî ev tîpên din hemû divê bi vê tîpê re rexneya xwe bidin.

Di van salên dawî de hevalan yek tîpê din li ser zêde kirin, ew jî;

**6-** Kesayeta ku ferasetên azadiyê qaba-red dijîn. Ango di têkoşîna cins de redkirineke qaba heye. Ev jî di pratîkan de derket holê. Di şer de dijminê tu pê re şer dikî, tu dişibî wî. Ya rastî tu bibî yêdekê wî jî, Modernîteya Kapîtalîst bi xwe muxalifê xwe ava dike, ji bo kesê ku li dijî derkevin jî di bin wê siyê de kom bike. Yanî muxalîfan jî dixe bin venêrana (denetim) xwe, divê di bin venêranê de be. Pratîka qaba-red jî bêencam e, me dît hinek kesên pir qaba red dikirin paşê bi dijmin re bûn yek. Hinek heval ji zilam qut bûn, xwendibûn, zilam red dikirin, bêşêwazî hebû, lê di şexsê hinekan de jî hat bikaranîn. Qaşo hinekan zilam red dikir, di quncikan de dikarîn her tiştî bi zilam re nîqaş bikin. Qaba-red tiştekî zirav e. Hinek hevalan jî bê zanebûn dikirin, hinekan jî di bin navê *em sîstema xwe birêxistin bikin* de dikirin. Lê vê carê çi dikir? Zilam digirt hemberî xwe, xwest şer bike. Ê wexta hêza wê

têrê nekira yan wê teslîm bibûya, vê carê li ber piyan diçû.

Di vê konferansê de ew ferasetên ku xeta azadiya jinê ji rê derdixin, Serok got divê ev wekî broşur derkeve, ji welat re were şandin. Jixwe ew broşur, broşura bi navê **Ji Xwedawend Îştar Heta Zîlanan** bû. Piştî esareta Serok çi bi wê broşurê hat em nizan in. Ji ber wê çaxê Osman digot, “em merciyê biryaran e, divê belge hemû di erêkirina me re bên derbaskirin.” Ji bo partiyê wê dîrok jî bihata nivîsîn. Li ser dîroka partiyê Serok bi xwe hinek pirtûk anîbûn. Grûbên lêhûrbûnê hebûn, Serok dida wan û digot bixwînin, lêkolîn bikin, cewherê wê bidin min. Grûba lêhûrbûnê xwendin, cewherek jê derxistin û dan Serok. Serok got, “heta ev pirtûk dernekeve, pêwîste kes belav nebe.” Ji bo bê nivîsandin israr kir. Herî dawiyê got, “wê destana Derwêş û Edûlê jî bêxin nav de”, ew perspektîf bi xwe dabû. Navê pirtûkê jî “**Şoreşa Jinê, Ezmûna YAJK’ê**” bû. Di wê demê de me wekî reşpelê derxist û belav jî bû. Grûba ku ew pirtûk nivîsandin her yek ji wana çû cihekê. Li Ewrûpa, Rojava jî derxistin, hîn yek du ji wan mane. Heta wê çaxê jî Ferhad gotibû, “haya me jê nîn e, çima we bêy erêkirina me derxistiye?”

Di vê Konferansê de biryara ku her eyaletek konferansa xwe ya jin çêbike hat girtin. Serok dixwest encama vê konferansê wekî belgeyekê bê amadekirin û bişînin, di wan konferansên eyaletan de were xwendin. Wê demê ev Konferans li Dola Xedarê ya Zagrosê kom bû, Serok bi telefonê tevlî bû. Ev axaftin perspektîfek pir berfireh bû, di Zagrosê de mirov jiyana azad çawa biafirîne, wisa perspektîfek şênber da. Konferans li qada Soran çêbû, li Dêrsimê çêbû. Li Amedê wê wextê hinek çalakî hebûn, Serok carina bi cîhazê di nav me de diaxivî. Li Amedê Eylem hebû, cara yekê Serok ewqas xwe aciz dikir û bi gotina “Tu dixwazî xeta me berevajî bikî, ji rê derbixî, xira bikî. Hûn xeta azadiyê naşopînin.” rexne kir. Ji bo wê Amedê konferans çênekir, lê Dêrsim, Botan û Zagros vana konferansên xwe yên jin çêkirin. Serok ev jî xwest ku encamê wek nameyeke hişyariyê binivîsin û ji rêveberiya YAJK’ê

re bişînin. Pratîka sala '97'an ew grûba rehabîlîteyê jî hebû, wekî hişyariyekê rêkin, bila sewq û îdareya xwe bikin, bedêlê wê giran e. Heman demê biryara ku têkoşîna cins bê bilindkirin hat girtin. Ya rastî Serokatî xwest di saha Wî de zelalbûn çêbibe û vê jî bi welat bidin hesandin.

Sala 1998'ê bi rastî ji bo me salek dijwar e, îşaretên komployê jî xwe nîşan didin. Serok ji bo vê jî digot, "Di saha min de li ser min êrîş hene." Di aliyekî de ew dîmenê Serok ê bi grûba lêhûrbûnê re, xwezayîbûneke Serok heye, dijmin ew pir şixuland. Ango gotin, Serok harem jiyan dike, tiştên wisa digotin. Dijmin jî di vir de ferq kir ku Serok dixwaze di xeta azadiya jinê de vebûnekê çêbike. Ji bo wê Serok ji xwe re kiribûn hedef.

Eynî tişt bandora xwe li saha Serok jî kir. Sala '98'an saleke zehmet bû. Berê jî carina hevalên xort dixistin nîqaşan, pir eşkere nîqaş dikirin. Bi taybetî dewreya perwerdê ya 1998'an, wê wextê Sedûnê Zer li wê derê bû, ji Botanê hatibû. Dr. Alî hebû, jixwe paşê bi tesfiyekaran re bû yek û reviya. Berî wê dewreyê perwerdeya Ebûbekir xilas bibû, Serok digot "li ser min êrîş heye". Mesela, dema dewreya perwerdê destpê kir, tiştê ewil xistin nîqaşê ev bû: "Madem em wekheviyê jiyan dikin çima hevalên jin dernakevin mutfaqê?" Jixwe paşê Serok mudaxele kir û got, "*Vir saha min e û kes nikare xwe bide rûniştin.*" Dîsa pîvanên kadroyên eyaletan pir derdixistin pêş û bû şerê eyaletan. Her wiha jin dixistin amûr û Serok ev pir eşkere dianî ziman. Tesfiyekaran her tim jiyana Serok dixistin nîqaşê. Heya pêvajoya Komploya Navnetewî jî Serok pir tengav bû. Serok wekî rexne nêrînên xwe wisa dianî ziman: "*Ev serokên taktîkî di eyaletên xwe de rola xwe naleyîzin, çi pirsgirêk hebe rêdikin ji min re.*" Serok di wê demê de difikirî ku dewreyan jî cuda bike.

Sala 1998'an li eyaletên hundir êrîşên dijmin hebûn, bi taybetî li Botanê operasyonên berfireh destpê kirin. Dewleta Tirk bi Operasyona Muratê xwestin eyaleta Botanê tesfiye bikin. Bi taybetî

biryargeh hat hedefkirin û gelek hevalên di asta rêveberiyê de şehîd bûn. Hevala Zelal, Agirî, Şervîn Dêrik, Rewşen Mêrdîn, Warşîn, Hebûn, Bêrîvan Amûdê, Nûjîn (Xeyîc) û hin hevalên din hemû di nav vê operasyonê de şehîd bûn. Van şehadetan windahiyên giran bûn. Li vê derê xeteke berxwedanê jî heye.

Li eyaleta Erziromê pratîka Zekiyê Biçûk hebû, li wir gelek kadroyên pêşeng şehîd bûn. Sala beriya wê berpirsiyara YAJK'ê hevala Dêrsim (Aynur Narîn) ji Dêrsimê bû, li wir şehîd bû. Hevala Sara Varto û Gulîstan Bîngol rola pêşeng li eyaleta Erziromê leyîstin.

Li Amedê piştî Eylem, hevala Hêvîdar çû, wê xwest wir kom bike, lê di nav operasyonan de di asta fermandariyê de şehîd bû. Dêrsimê konferansa xwe çêkiribû, hinekî xwe komî ser hev kiribû. Lê Serok ji bo şêwazê şer rexne kir û ji bo Zagrosê û Botanê got, "*Jin di bin siya zilam de şer dike, ji wê ewqas şehadetên jin çêdibin. Berxwedanek pir cidî heye, lê pêwîste di bin siya zilam de nebin.*" Yanî di bin siya zilam de jin bi şêwazê zilam şer neke. Li Zagrosê tecrûbeya jinê pir bû û pergal êdî hatibû rûniştandin.

Di 1'ê Îlona 1998'an de Serok agirbest îlan kir, ev agirbesta sêyemîn bû. Sala '95'an agirbesta duyemîn bû, '93'yan a yekemîn bû. Ji dijmin peyam digihin Serok. Serok wê demê wisa got: "An amadekariyên komployê hene ku me bi giştî tesfiye bikin, an jî nêzîkatiyeke dewletê ya cuda heye. Divê mirov binirxîne." Ji ber êrîşên ku bi ser hereketê ve tên întiharwarî ne. Wê demê li Tirkiyê Erbakan hikûmet bû, Serok got, "Eger dewlet samîmî be divê mirov binirxîne." Jixwe Ozal kuştin, Serok jî dixwest guhertina stratejîk bike. Eger nebe jî wê nêzîkatiya dewletê zelal bibe. Jixwe 1'ê Îlonê Serok agirbest îlan kir.

Heman demê xebatên zîndanan jî baş in, piranî têkel in û piranî rêveberiya xwe xurt in. Dijmin jî wekî siyaset hin zîndanên xwe diyar kir. Mînak; li zîndana Sêwasê zêdetir jin kom kirin, hema hema 100 jin hene û wana tecrîd dikin. Ji bo di nav xwe de bimînin, bi pirsgirêkên xwe yên navxweyî re mijûl bibin. Ji bo

destpêkê Sêwas wek model diyar kiribû, paşê Sakarya, Amasya û yên din pêl bi pêl ji xwe re hedef girtibûn. Êdî girtiyên siyasî nasnameya xwe ya siyasî bi dijmin dane qebûlkirin, bi nasnameya xwe tên naskirin. Dijmin jî siyasetek wiha dimeşîne; tecrîd dike, tenê dihêle, ev dike ku li hemberî cinsê xwe bêbawerî pêş bikeve. Di zanebûna cins de kêmbûn, zilam rast tehlîl nekirin çêbû. Serok wê demê digot, “*Şener di saha min de, Can Yuce jî di zîndanê de xwe kiribû serokê sexte.*” Jixwe bi riya nameya şehîd Sema rewşa zîndanan hîn baş tê fêmkirin ku armanca Can Yuce çi ye û dixwaze çi bike, zelal dibe.

Dîsa di zîndanê de pratîka Zubeyde heye, dijmin jî her wê surgûn dike û di hemû zîndanan de digerîne. Li ser navê me hatiye girtin, lê îhtimaleke pir mezin ew jî sîxur e, dijmin wê li her girtîgehê digerîne. Zubeyde, di nav pêkhateya jin de hinekan êşkencê dike, hinek hevalan bi navê sîxuriyê înfaz dikin, gelekên din ceza dike, bi mehan tecrîd dike. Bêy agahiya rêxistinê gelek kes li wir hatin cezakirin. Bi vî awayî îradeya pêkhateya jin dişkîne. Di zîndana Batmanê de kesek bi navê Cîran heye, wê jî heman pratîk meşandiye. Ew jî Zubeyde teqlîd dike, di bin navê pirsgirêk hene, ez ê çareser bikim de mudaxele dike, nêzîkatiyên ne însanî dike, gelek kesan ceza dike. Ev çi ye? Pêkhateya jin di komkujiyan re derbas dike. Meral Kidir di zîndana Çanakkale de ye, xwe bi Can Yuce re dike yek. Nêzîkbûnên desthilatdar li ser jinê dimeşîne. Xwe wekî seroka tevgera Tirkiyê dibîne.

Ji bo qada civakî jî Serok êdî yekser perspektîf dida û bi xwe li ser disekinî. Ewrûpa, Rûsya, Bakur û saha Rojava ya Serokatî. Êdî pergalekê ava dike. Mînak; li saha Rojava zêdetir jin rêveber bûn. Carina du hevalên jin bûn, yek qurye xort di nav wan de hebû. Niha xort dibêjin “rêveberiya xurt du jin in, yek xort e. Jin hejmara xwe kêm e, divê yek be.” Di wê demê de Serok xwest kordîneyê wekhev çêbike. Ji ber ku dixwest pêşengiya jin li pêş be.

***Di sala 1998’an de hevalên şehîd bûne:***

**Hevala Cîhan Goyî, Viyan Silopya** û **Bihar Beytûşebap** li Botanê şehîd dikevin.

**Hevala Hêlîn Çerkez**; ji Ewrûpayê, Avusturya tevlî Partiyê dibe. Bi eslê xwe Çerkez e, li saha Serokatî jî dimîne. 13'ê Cotmeha 1998'ê li Garê di şerê bi PDK'ê re şehîd dikeve.

**Hevala Sozdar Xelîla**; li Botanê cara yekê çalakiyek xweser lidar dixe, hevaleke di aliyê leşkerî de xurt e. Li Kêla Memê şehîd dikeve.

**Hevala Ronahî (Andrea Wolf);** Alman e. Di tevgerên çepgir ên Alman de maye. Di sala 1996'an de derbasî saha Serokatî dibe û 1997'an careke din diçe welat. Salekê li biryargeha YAJK'ê dimîne. Paşê di bihara sala 1998'an de diçe Botanê. Li wir di nav operasyonan de sax dikeve destê dijmin. Dijmin jî jê pirs dike, ma kî ye, çi ye? Li hemberî êşkenceyan eşkere dibêje, "Ez sosyalîst im". Dema dijmin bi êşkencê wê şehîd dixe bi berxwedanekê dirûşmeyên "Bijî Serok Apo!", "Bijî PKK!", "Bijî Biratiya Gelan!" qîr dike, wisa li Bêşebabê di 21'ê Îlonê de bi êşkencê şehîd dixin.

**Hevala Zelal Botan**; ji Hezexê ye. Li eyaleta Botanê fermandara YAJK'ê ye. Di sala 1990'î de tevlî rêxistinê dibe û li gelek qadan di nav pratîkê de dimîne; wekî Besta, Cudî, Bêşebap, Gabar, Metîna, Zap. Di sala 1996'an de diçe saha Serokatî. Di nav artêşbûna jin de roleke girîng dileyîze. Di sala 1995'an de dema Kongreya YAJK'ê ya Yekemîn hat lidarxistin, wê demê di navendê de cihê xwe digire. Piştî saha Serokatî di 1997'an de tê welat. Sala 1998'ê li ser biryargehê serdegirtin çêdibe û di 14'ê Nîsanê de şehîd dikeve. Di nav wî şerî de hevalê Cemal jî birîndar dibe, hevalên din bi vî awayî xwe dixin pêş. Jixwe Rêbertî paşê ev pratîk rexne kir; çawa windahiyeke di asta fermandariyê de bi vî awayî çêbû? Hevala Agirî, Cîhan û Delal jî bi hevala Zelal re şehîd dikevin.

**Hevala Nûjîn Botan (Xeyîc - Wesîle Guleçe);** di sala 1989'an de di temenek biçûk de ji Besta tevlî partiyê bûye. Ew jî di artêşbûna

jinê de rolekê dilîze. Di heman operasyonê de bi suîqestê di meha Cotmehê de şehîd dibe.

**Hevala Şervîn Dêrik**; di sala 1996'an de rêveberiya navenda YAJK'ê bû. Li akademiya saha Serokatî maye. Di 1992'yan de tevlî dibe û di nav şerê Başûr de cihê xwe digire. Paşê derbasî Zelê jî dibe. Herî dawî bi tabûra bitevger re derbasî Gabarê dibe, di nav şer de birîndar dibe û her du lingên xwe winda dike. Ji hevalan xwest ku li cihekê bimîne heya şer xilas bibe. Bi vî rengî 4 rojan di arazî de dimîne û dema dijmin arazî bi giştî dide ber xwe û digere, li wir hevala Şervîn şehîd dibe.

**Hevala Warşîn û Rewşen;** di heman operasyonê de ji bo ku nekevin destê dijmin bombeyên xwe bi xwe ve diteqînin. Hevala Rewşen ji Nisêbînê bû.

Xebatên qada civakî dikeve nav pergalekê, bi taybetî Serok li ser disekine. Di Rojhilatê Kurdistanê de em bi fiîlî ji salên 1983-84'an ve li milê Ûrmiyê û Mako kar dikin. Li Rojhilatê Kurdistanê piştî 1998'an xebat firehtir dibe. Li aliyê Mûkriyan, Kirmanşah, Sine û li giştî Rojhilat rêxistina me pêş dikeve. Ji 2004 û şûn de PJAK, YRK tên avakirin. Li wan deran jî tevlîbûn hene, lê belê sînordar in.

Şehîdê yekemîn ê Rojhilatê Kurdistanê hevala **Ronahî Rojhilat** e. Ji Ûrmiyê ye û di sala 1994'an de şehîd dikeve.

**Hevala Berfîn**; ji Mako bû, di sala 1996'an de li Zapê şehîd dikeve.

Yek jî, sala 2000'î bûyera Qeredaxê heye. Pêşmergeyên YNK'ê êrîşî ser kampa hevalan dikin. Di wê bûyerê de hevala Tawar, Ronahî Sine û Arezor li wê derê şehîd dibin.

Piştî ku hereketa me li Rojhilat birêxistin dibe, ji bo qada siyasî PJAK û qada leşkerî YRK hatin avakirin. Di roja me ya îro de hêzên leşkerî yên jin bi navê HPJ (Hêzên Parastina Jin) xwe didin nasîn.

Şehîda Rojhilat a yekemîn hevala **Ronahî Rojhilat** e, lê piştî HPJ ava bû şûnde şehîda wan a yekemîn **hevala Tara** ya ji Sinê bû, di sala 2004'ê de li Dola Kokê ji kendal dikeve û şehîd dibe.

Dîsa perçê Başûrê Kurdistanê Tevgera Jinên Azadîxwaz a Kurdistanê (TJAK) û PÇDK di sala 2002'yê de tên avakirin. Beriya wê jî xebat di bin navê YAJK'ê de hene. Ji sala 1998'an ve em rojnameyê derdixin. Bi vî awayî xebatên me yên rêxistinî di qada civakî de hene. Şehîda me ya yekemîn ji Başûr **hevala Seadet** e. Hevala Seadet ji Şêladizê ye û ji eşîra Rêkaniyan e. Di sala 1995'an de tevlî rêxistinê dibe û di sala 1996'an de li Sêdarê di bin berfê de şehîd dikeve.

**Hevala Hîra**; di sala 1992'yan de ji Başûr tevlî rêxistinê dibe. Yekem tevlîbûna ji Başûrê Kurdistanê hevala Hîra ye. Di sala 2003'yan de li Qendîlê bi qezayekê şehîd dikeve.

Di Komkujiya Hewlêrê de hevalên ji Başûr jî hene. Hevala Rûken, Peyam, Berxwedan û Rewşen şehîd dikevin.

**Hevala Zîlan**; ji Metîna, gundê Nîskan bû, bi eslê xwe Suryan bû. Di sala 1996'an de tevlî dibe û di sala 1997'an de li Garê bi hevala Bêrîvan Kobanê re şehîd dikeve.

**Hevala Têkoşîn**; li saha Serokatî maye. Ji ber Serok li ser nirxandinek kiriye ku, yekemîn fermandara diçe çalakiyê û şehîd dikeve, ya din jî diçe cenazeyê şehîd rake, ji bo cenaze nekeve destê dijmin, di wir de şehîd dibe. Ev ruhek e, çandeke di nav me de. Em ê cenazeyê xwe nedin destê dijmin, em ê birîndarê xwe di destê dijmin de nehêlin. Serok got, "ev ruhek e, ez pir bi rêzdarî pêşwazî dikim, lê pêwîste hûn bi aqil vî şerî bimeşînin, hûn li ser cenazeyekê pênc şehîdan bidin, ev jî nayê qebûlkirin." Şêwazê me rexne kir û got, "pir biêş e, me rêkir, me ewqas hêvî da, divê tu erzan nemirî." Lê ev di hevalên me de bûye şêwazek. Temam adeteke berxwedanê ye, adeteke fedaî ye, pêwîste mirov xwedî li cenazeyê xwe derkeve, lê Serok dibêje, "divê hûn biaqil nêz bi-

bin.” Hevala Têkoşîn fermandara yekîneyê ye, hevalê Qelender jî fermandarê yekîneyê ye, şehadeta herdû hevalan jî wisa çêdibe.

Bûyereke din jî, ew îxaneta komî ya li Cudî çêbû di dîroka me de cara yekê çêdibû. Di zemînê şer de zû bi zû îxanet dernediket. Rexmê ewqas îxanetan jî, girêdanek heye. Di qadên şer de îxanet kêm bûn, di van salên dawiyê de zêde bûye, ev jî bi pirsgirêkên hundir ve girêdayî ye. Ji ber em çareser nakin, ji wê ye. Di wê demê de pirsgirêk hebûna jî -ku xwe ferzkirinên tesfiyekaran hebû-, dîsa hêviya mirovan nedişkand, ji ber bawerî hebû. Yanî her kesî ev dizanî; rojekê wê Serok pê bihese, mudaxele bike. Ev mirov zindî dikir, hêz û moral dida. Jixwe mirov hêza xwe ya têkoşînê ji hundir digirt. Tabî ev pêvajo girîng e.

Tabî cara yekê revên komî çêdibûn. Li vê derê yekîneyeke me hebû, 10 kes bûn. Berê sîstema me ne wisa bû. Carina 25 heval bi hev re diman. Taximek wisa diçin îxanetê, li beramberî wê helwest hat danîn. Lê kesên wekî Eylem û Dîrok jî bi xwe re hejmarekê dibin. Ev nezanî heye ku li dûv xwe dibe. Ew kesên bi wana re diçin hema dixwestin îxanetê bikin, ne wisa ye. Di şer de hinek dem hene, qudûmê mirov dişkê, ji ber dijmin jî dixwaze hema îrada te bişkîne. Di wê kêliyê de dibe ku fermandareke mezin ji te derkeve, yanî pêşengek baş hebe, dikare rota bide, lê berevajî, kesê ku li ser navê fermandariyê bike, te pêşkêşî dijmin jî bike! Bi rastî ev dîrokî û girîng e. Dibe ku paşê yek-du bûyerên wisa yên revê hatibin jiyîn jî, yek yek in. Ez çima vê dibêjim? Dusê sal berê taximeke me li Zapê, fermandara wan ji Rojava bû, sêçar sal in tevlî rêxistinê bûye, heval jî hema wê dikin fermandar. Vana li milê eniya Ertûşê ne. Ev kes taxima xwe birêxistin dike, 9 kes in, dixwazin biçin qereqola Bilîcanê û bi komî teslîm bibin. Bûyer hat ferqkirin, mudaxele çêbû. Yek ew bûyera li Cudî bû, du jî sala 2014’an bû.

Qismek pêkhateya me pir nezan e, pir nû ne. Lê fermandar jî di nav de derdikeve, zanebûna heye jî nade qezenckirin. Tu bi ast

rêve bibî dikare bike qehreman, tu şaş birêve bibî dikare bibe teslîmiyetê jî. Nexwe me ji dîroka xwe tecrûbe xurt derbixista, di van salên dawiyê de wisa nedibû. Eşkere ji taxima xwe re dibêje, “qereqol li wê derê ye, em ê herin teslîm bibin!” Li wê derê kes nabêje em ê çima biçin, ji bo çi em ê herin, çi qewimî ye? Nezane, dibêje fermandar e, herhal rast dibêje! Paşê yek-du heval dibêjin “ma wisa dibe?”, wisa eşkere dibin. Bi serê xwe ne, li ser girekê ne, rojekê kes neçûye ba wana. Ji bo wê kes diyarker nîn in, lê li wê derê nezanî hebe, kes diyarker dibin. Dîrok li ser kesan ava nebûye, li ser kesan jî xira nebûye. Di wan deman de rexmê ku derfeta perwerdê nebû, ewqas nezanî nebû. Hele niha derfet zêde ne, perwerdeyên bisîstem hene, belgeyên Serok hene, perwerde li ser wana tên dîtin û bi vê ve girêdayî zanebûn pêş dikeve. Di vê watê de divê em dîrokê bi zanebûn bigirin dest, quwetê xwe bi îrade bikin.

Ji bo têkoşînê hêz dayîn girîng e. Şêwazê Serok, çima ewqasî pirsgirêkan eşkere nîqaş dike? Mesela, Serok vekirî nîqaş dikir, bi kesî re bêhêvîbûn çênedibû. Berevajî mirov zana dibû, lêpirsîn dikir, bi mirov re hêz çêdibû. Li vê derê mirov digot divê ez her im bi ser vê derê de, ev şaş bû, ez rexne bikim, hesab jê bixwazim. Ew hêz bi mirov re pêş diket. Li gorî nêrîna min, divê em vê encamê ji vê dersê derbixin. Eger em hinek bûyeran tînin ziman, esas ji bo vê ye; îxanetên komî sedemên xwe çi ne? Çima em birin wê xalê? Roja îro em ê çi encamê jê derbixin? Divê em wisa nêzî vê bûyerê jî bibin.

Di destgirtinê de hinek lewaziyên me hene. Em di bûyeran de aliqî dimînin, bûyer diyar in. Eger em dîroka xwe bi bûyeran re bigirin dest, wê hinek qehreman derkevin, hinek jî gunehbar bin, wê pêwîst bike em hesab bixwazin. Bi vî awayî em ê negihin encamek rast. Ev pêvajoya ku em heya niha li ser sekinîn, jixwe Serok nirxandiye. Di vê pêvajoyê de meylên diyarker çi bûn, asta me çi bû, divê em di vê çarçoveyê de bigirin dest. Halbûkî pêşveçûn wekî xeteke dûz nîn e. Tê de şaşîtî nîn e, ne wisa ye. Serok

dibêje, "*dîroka me hemû bi şerê navbera xeta tesfiyekar û xeta Apocî de ye. Ev şerê herdû xetan e.*" Tiştê derdikeve holê çi ye? Encama ku em ji vê dîrokê derxin û çawa bigirin dest, girîng e.

# BEŞA SÊYEMÎN

## PÊVAJOYA KOMPLOYA NAVNETEWÎ Û GUHERTINA STRATEJÎK

Me dîrok heta sala 1998'an dabû, êdî em dixwazin bi giranî kongre û konferansan bidin ji bo feraset bên çareserkirin. Hinek bûyerên xuyayî hene, em dixwazin hinekê li ser wana bisekinin. Ji ber ku yan di têkoşîna me de texrîbatên berçav kirine, yan jî bandorên xuyayî kirine. Heta sala '98'an Bîrdoziya Azadiya Jinê û her wiha wekî bersivekê çalakiya hevala Sema, dîsa şehadetên ku hatibûn jiyîn, bi vana re saleke girîng bû. Komloya navnetewî ku hêdî hêdî Serokatî hedef digire, êdî em dikevin pêvajoyeke bi vî awayî. Di aliyekî de jî Serok amadekariya Kongreya PKK'ê ya 6. dikir, ji ber ku berê pêşveçûna me baş nabîne. Di wê salê de nirxandinên Serok hene, dibêje, "*Ez ê ji PKK'ê îstifa bikim, êdî ez we wek bar ranakim, ez êdî wek berê nêzî we nabim. Ez ê wek barekê li ser pişta xwe nemeşînim. Ez ê we bidim aliyekî.*" Wisa di van aliyan de zelaliyek çêdikir. Di asta têkoşînê de jî Serok dixwaze her sal qevastinekê çêbike, lê bes serokatiya taktîkê rola xwe

tam nalîze. Erê pratîk heye, berxwedan heye, di encamê de guhertinên ku ji Kongreya PKK'ê ya 5. heta niha dixwaze pêş bixe, tam pêş nakeve. Xeta hevkarî û çetetiyê li pêşiya wê asteng e. Ya duyemîn, dewlet jî ji vê tiştê re ne amade ye. Hem pirsgirêkên me yên navxweyî yên partiyê nahêlin em qevastinekê bikin, hem jî di eniya dewletê de ji bo guhertinê bi vî awayî ye.

Êdî hêzên navnetewî dixwazin mudaxele bikin. Ji bo bikaribin bi fiîlî mudaxelê Rojhilata Navîn bikin, zemînê xwe yê mudaxelê fireh bikin êdî Kurd wekî aktorekê derketine holê. Ji bo mudaxela Rojhilata Navîn siyasetek tê kirin. Lê bes heval wekî hêzên demokratîk ên bikaribin tevgerê temsîl bikin Tevgera me ye û Serokatî ye. Yanî heta Serok hebe, Tevgera me hebe, ne gengaz e tu xwe pispêrî quwetê PDK û YNK'ê. Dixwazin bi wî beşê hevkar re mudaxelê Rojhilata Navîn bikin. Lê di pêşiya wê de kî asteng e? Serokatî asteng e. Ji bo wê Serok dikin hedef. Ev ne meseleyeke Tirka ye ku Serok kirin hedef, ne bi vî awayî ye. Biryareke navnetewî ye. Serok heta niha jî dinirxîne û dibêje, "*ev Şerê Cîhanê yê Sêyemîn di Rojhilata Navîn de bi mudaxela li ser min re destpê kir.*" Mudaxela yekemîn bi Komploya Navnetewî re li ser Serok çêbû. Piştî wê sala 2001'ê mudaxelê Afganîstanê kirin. Sala 2003'yê mudaxelê Iraqê kirin, an jî bi Komploya Navnetewî, bi mudaxeleya li hemberî Serok re destpê kir. Pêvajoyeke bi vî awayî ye, nameya hevala Sema bal kişandiye ser vê. Ya rastî rewşa zîndanê dibîne. Amadekariyên dijmin dibîne, çi dibe bila bibe êrîş li hemberî Serok e, divê mirov hişyar nêz bibe. Hişyariyekê dike, di aliyekî din de îşareta hebûna jiyana Serok dixistin nîqaşê. Ev nîqaş li hundir bandor dike, lê di esas de dijmin pir zêde dida pêş ku Serok çawa jiyan dike, tiştê ku Serok pê hemle bike, amûrên xwe yên têkoşînê û bi taybetî xebatên jin. Bala xwe bidinê; Serok di nirxandinên xwe yên '98'an de dibêje, "*kî çi bêje bila bêje, ez ê van jina me.*" Her mînak dida. Çima? Ji ber êrîş zêde dibûn. Serok çawa jiyan dike bi jinan re, çi dixwaze bike? Ya rastî di wir de ji bo komployê jî Serok wisa nirxand û got; "*Erê ez*

*im hedef, lê belê esas xebatên min hedef in, ji nav xebatên min jî ya yekemîn xebata jin e.*” Jixwe ew tê kirin. Dîsa li Tirkiyê yên ku stratejiyê diyar dikin hene. Kesên wekî nivîskar an jî bi îstixbaratê re dixebitin hinek agahiyan didin. Di wê demê de ew Şükrü Elekdağ hebû, nivîseke wiha pir balkêş bû, Serok dixwend û digot ev zilam çi dixwaze, bal dikişand ser Şamê. Digot, “Wê Apo ji Sûrî derkeve yan na?” Serok digot xuya ye amadekariyek heye, dixwazin me ji Sûrî derxin û pir zelal nivîsandibû. Vî zilamî wisa jî digot. Şemo wê demê reviya bû, îfadeyên Şemo hebûn. Şemo di îfadeyên xwe de ji dijmin re wisa dibêje: “Hûn biçin ku derê hûn ê eyaletekê tesfiye bikin. Heta ew Serokatî hebe, wê her kadro amade bike, wê dagire. Hûn gerîla jî îmha bikin, hûn qada civakî jî tesfiye bikin, wê dîsa Serok amade bike û şûna wê dagire. Ji bo wê jî ne pêkane hûn PKK’ê bi vî awayî tesfiye bikin. Eger hûn dixwazin PKK’ê tesfiye bikin, divê hûn Serokatî tesfiye bikin.” Şemo agahiyên wisa dabûn dijmin. Jixwe dijmin li ser îfadeyên Şemo jî disekine, ew jî yekî ji tevgera Kurd e û dibêje yek keleha ku li ber xwe dide Serok e, ji bo vê divê APO ji holê rabe. Li ser rewşa Rojhilata Navîn jî digot, “Eger hûn bixwazin di Rojhilata Navîn de pergalekê ava bikin, divê hûn astengiya APO ji holê rakin.” Hema Serok nîşan dida. Bi vî awayî yekser Serok hedef nîşan dide û agahiyên bi vî awayî dide dijmin.

Serokatî, di 1’ê Îlona 1998’an de agirbest ragihand. Ya rastî wexta agirbest ragihand, îşaretên komployê hebûn. Serok digot, “*Wê rewş zelal bibe. Yan vana di nav lîstokek pir mezin de ne, yan wekî bi vî rengî xwestin gav bi me bidin avêtin. Ya rastî dixwazin bi vî rengî me tesfiye bikin, wê helwestên dewletê hîn zelal bibin. Yan jî ger derfeteke pir biçûk hebe jî, mirov ji bo çareseriyê rê di qadên cuda yên wekî siyasî, demokratîk û hwd. de pêş bixe.*” Jixwe em ê wê jî binirxînin. Serok wisa agirbestê digire dest. Rexmê wê jî Serokatî navber nade xebatên xwe, lê nerihetî hebû.

Ez vê bêjim; me jî ew pêvajo hinekî ji nêz ve şopand. Serok hinek şevan xew nedikir. Rejîma Sûrî agahî şandibû ku, Serokatî pir

tevnegere. Serok demekê wisa qet derneket. Serok tiştekî pir balkêş got. Carek du caran nobedar raza bû, Serok wî di xew de dîtibû û qet wî şiyar nake. Paşê got: “*Hûn çiqas rihet radizin!*” Em wisa rihet heta şefeqê razabûn. Serok her şiyar dibû û digot, “*hûn qet di ferqa cidiyeta pêvajoyê de nîn in, xeterî li ser me heye.*” Carekê jî hat û got: “*Min xewnek dîtiye, hûn ê xewna min şîrove bikin, hûn çi ji xewna min fêm dikin? Di xewnê de ewrek tarî hebû. Li mala ku Serok lê dimîne, baxçê xwe mezin bû, lê belê baxçe hîn mezintir bû, li dawiya bexçe cihekî wekî kulûbeyê hebû. Ew kulûbe pir balkêş bû, wisa dibiriqî, wekî yek ji min re bêje ‘were wir’. Ez diçûm, lê belê min digot hûn çima nayên bi min re, kes bi min re nedihat. Paşê ez çûm wî xaniyî. Ez dema çûm xanî, hêdî hêdî derî li ser min dihat girtin. Lingekî min tenê mabû, dawiyê lingê min ê din jî bi xwe re xist hundir. Dawiyê derî li ser min hat girtin. Şîrove bikin, hûn çi ji vê xewna min fêm dikin?*” Wê demê îşaretên komployê jî hene, hinek vexwendinên ku Serok derkeve derve hebûn. Serokatî ew xewn jî nîqaş dikir û digot, “*Em çawa bikin? Me saha Sûriyê zêde şixuland. Ji ber we me ewqas şixuland. Her tim me xebatên perwerdê dikir, we li welat cihek jî ji me re amade nekir. Diviyabû me ewqas neşixulanda. Pêwîst bû me cih biguherta, lê me nikarîbû biguherin, lewazî çêbû. Ez mecbûr im xebata perwerdê bimeşînim. Ji bo wê me zêde şixuland.*” Wê demê ji Yûnanîstanê hinek vexwendin ji bo Serok hebûn. Serok digot, “*Ecêb ew kulûbên Ewrûpa bûn, me dikişîne xwe? Pergala Modernîteya Kapîtalîst me dikişîne. Ez tenê bûm, min bang dikir, kes nedihat.*” Kêliyekê paşê digot, “*min pir gazî dikir, kes nehat li gel min.*” Balkêş e, pêderxistinên Serok pir cuda ne. Di pêvajoya salên ‘80’yî de çend caran di xewna xwe de dibîne. Hinek hevalên kevin ku wê demê mane, ew dibêjin Serok gotiye, “Min çend caran vê xewnê dîtiye. Wê demê jî darbeya 12’ê Îlonê heye. Serok di xewna xwe de dibîne û dibêje, “*Leşker hene û kum di serê wana de ne, hinek generalên Tirkan jî di nav de ne, li pey min in, lê ez dibezim, dixwazim xwe bigihînim cihekê.*” Xuya ye pêhesînên Serok ên pêşerojê ne. Rast e, hîs hinekê jî bi tecrûbeyan ve

girêdayî ne ku di ferqa xeteriyê de ye.

Di 9'ê Cotmehê de Komploya Navnetewî destpê kir. Serokatî xala "em biçin ku derê" pir nîqaş dikir. Hevalan jî li welat amadekarî dikirin. Serokatî di nava nîqaşan de digot, "*Em biçin wê welat hedef bikin û ji bo min pir êrîş bikin. Dibe ku gerîla jî tesfiye bibe. Çi bibe bila bibe, divê gerîla daîmî be, tesfiye nebe. Em wê bigirin saxlemiyê.*" Ji bo wê jî digot, "*Çi dibe bila bibe divê em Kongreya PKK'ê ya Şeşemîn çêkin. Em rêveberiyê jî nû bikin û hereketê bixin saxlemiyê.*" Sûriye jî hat nîqaşkirin. 5'ê Îlonê Atîlla Ateş fermandarê artêşa Tirk ê giştî bû, li Hatayê daxuyanî da û got, "Ger Abdulah Ocalan ji Sûrî dernekeve, em ê li hemberî Sûrî şer ragihînin." Wê demê fuze jî anîbûn. Serok got, "*Êdî ev zurûfên dawiyê ne, Sûriyê heta niha dostanî bi me re kir, bila ji rûyê me neçin.*" Tabî her tişt ne mesela dostaniyê ye. Paşê Serok xwest bi malbata Beşar re dostaniyê pêş bixe, lê her tişt ne wisa bû.

Li Rojhilata Navîn her tişt li ser hevsengiyan e. Çima Sûriyê hişt Serok bi salan li wir bimîne? Nakokî di navbera dewletên Rojhilata Navîn bi xwe de hene. Di navbera Sûriyê û Tirkiyê de nakokiyên pir cidî hene. Tirkiye av qut bike, wê Sûrî bêav bimîne. Sûrî ne dewletek pir mezin e, hêza xwe ya ku li hemberî Tirkan li ber xwe bide pir nîn e. Me wekî kozekê di destê xwe de bi kar tîne. Mirov pêwîste hevsengiyê wisa nenirxîne. Hinek tiştên îtifaqên polîtîk in. Dewleta Sûrî berjewendiyên xwe hene, ew nebe wê çima ewqas sal cih bide te. Wekî hereket em jî hêzek in, em dibin amûrê vê tiştê û polîtîka wisa tê kirin. Di encamê de em jî dizanin ku Sûriye muhtacê vê tiştê ye. Ew jî li gor berjewendiyên xwe nêz bûn, lê Serok tenê bi vê ve sînordar nehişt ew têkiliya xwe, xwest wekî têkiliya dostanî pêş bixe. Yek jî, wê demê hinek generalên nav artêşa Sûriyê hatin kuştin, hatin darvekirin. Diyar bû ku ji bo Komploya Navnetewî pêş bixin, li hember Sûriyê şer dabûn ber çavan. Di hundir de jî hinek nakokiyan gur dikin. Dema general hatin kuştin Serok got, "*Rewş cidî ye, wê Sûriyê*

*hilweşînin. Ji bo wê jî divê em derkevin.*”

Ji bo derketina rê nîqaşên pir kûr çêbûn. Hevalan li Ewrûpa, Yûnanîstan û li hinek dewletên din dîplomasî dikirin. Paşê biryara çûyîna Yûnanîstanê hat girtin. Hinek parlamenterên Yunanî hatin bi Serok re hevdîtin kirin. Ayfer Kaya (Rozerîn) ji xebatên Yûnanîstanê hatibû, di dewrê de bû, tercumanî wê dikir. Serok vexwendin Yûnanîstanê. Hemû îhtimal hatin nirxandin, herî dawiyê biryara çûyîna Yûnanîstanê derket. Qedafî wê demê xwest Serok biçe gel wî; Serok got, “*Qedafî yekî dîn e, ez jî li pişta wî bim dibe ku hemû cîhanê bide hemberî xwe, lê hêzeke wî nîn e. Eger dawî jî hêza wî têrê neke, dibe ku bibe lîstokê destên hinek kesên din. Xeter e.*” Di serî de dewleta Sûrî jî di nav vê komployê de bû, dibe haya wan jî ji hinek tiştan hebe. Yûnanîstanê got, “Em ê werin bi balafirê bigirin”, Sûriyê got, “Pê neçe!” Beşar bi xwe bi dizî balafirek eyar kir, wî bi xwe bir Yûnanîstanê. Bi xwe dizanîbûn û haya wan jê hebû. Îhtimaleke mezin roja derketina ji Sûriyê ew ê tiştek bi Serok bikirana. Lê belê Sûriyê nehişt, gotin em ê eyar bikin. Ewqas sal dostaniyek hebû, ya din jî nexwestin ji axa wan hema derê û tiştek pê were. Heta di pêvajoya komployê de şoforê ku Serok dibir her dereng dixist, hîn di balafirgehê de qeza çêbû. 36 welatan di nav Komploya Navnetewî de cih girtin.

Çûyîna welat ji bo Serokatî wek tercîhekê bû, lê ji bo gerîla hebûna xwe biparêze neda ber çavan. Di Serok de lêgerîna guhertinê bide çêkirin, di stratejiya têkoşîna me de guhertinê çêbike, heye. Serok got, “*Gelo em ê bikaribin vê rewşê bizivirînin firsendekê?*” Jixwe 9’ê Cotmehê ji Sûriyê derket, wê demê li Rûsya bû, paşê ji Rûsya çû. Serokatî got, “*Em ji Ankara derketin em bûn partî, em çûn Rojhilata Navîn em bûn artêş, em ê niha bi vebûna dunyayê re bibin dewlet. Êdî dibe ku ev pirsgirêk bê çareserkirin. Em derfetên cîhanê jî binirxînin. Lê belê ez ê çiqas vê hemlê bizivirînim çareseriyê? Tabî gelek welatên dîtir nêzîkbûnên wan pir hatine nirxandin, ez nakevim vana.*” Pergala ku bi me re şer dike, pergala kapîtalîzmê ye. Lê belê çûyîna Serok bi xwe sekneke fedaî

bû, wê bi xwe bi pergalê re têkoşîn bike. Serok dibêje, “*Jixwe em çûn ku derê, ew der ji me re hatibû qedexekirin. A din jî rêxistina me pir zêde cidiyeta pêvajoyê fêm nekir.*” Di me de elimandinek heye; wekî bibêjin “Serok e, jixwe wê vê jî derbas bike.” Serok, di encamê de bi kadroyên xwe hêz e. Hêza esasî ku rol nelîze, wê çi encam derbikeve? Ango em pir ne di giraniya wê de bûn. Me digot, Serok çû, wê derfetê çêbike.

Serok dema li Kenya bû, bi riya telefonê axivî, ji me re got, “*xwe belav nekin, jixwe ez ê we bikişînim.*” Me jî digot, “Serok amadekarî dike. Wê grûba lêhûrbûnê bikişîne. Serok li wir dixwaze derfetên perwerdê pêş bixe.” Eşkere digot, ez hinek qadan vekim. Berî wê çend rojan got, “*Lazime her kes xwe amade bike.*” Ji ber ku rewş pir cidî ye. Em hîn nû nû wisa jê bandor bûne. Ew jî çawa? Em bi hestiyarî jê bandor dibûn. Ew bandorek bû. Mesele tiştek bibe, em ê çi bikin û hwd. wê helwesta me çi be, kes ji me tiştek wisa nedifikirî. Serok got, “*hûn tiştekê dipirsin?*” Me got, “Ka tenduristiya Serok çawa ye?” Got, “*We pir hewl da ji bo zikê min bihelînin, êdî ew zikê min heliya.*” Me gelek tişt ji Serok re qedexe dikirin ji ber kîlo digirt. Îca em hemû rûniştin giriyan, tenê hestiyariyek wisa ye. Atmosfera kadro wisa bû. Tenê mayîna Serok bi vê ve girêdayî ye; kadro di dema xwe de rewşê fêm neke, nekeve nav helwestekê, yan tiştê were kirin çi ne, vê nikare tespît bike. Serok tenê dimîne, li gor şert û mercên wê pêvajoyê bersivdana te fêmkirine. Ê ev nebû.

Serok wekî bi pirsgirêkên hundirîn re ket nav fetisandinekê. Bi salan e her wekî bargiraniyekê li ser Serok çêbû, Serok her bi vana re mijûl dibû. Rexmê pêvajoya komployê jî Serok dîsa bi pirsgirêkan re mijûl dibû, bandora wê wisa çêbû.

Li girtîgehê di pêşengiya hevalê Halît Oral de, bi dirûşmeya “HÛN NIKARIN ROJA ME TARÎ BIKIN!” hevalên girtî dest bi çalakiya xwe şewitandinê kirin. Ev çalakî bandora xwe li ser gel çêkir û di nav gel de hişyarbûnek ava kir. Çima Serok çû Ewrûpa û hemû

cih li ber hatin girtin, êdî vê hinekê em hejandin, em nû ketin cidiyeta wê pêvajoyê. Wê çaxê ji aliyê gerîla û gel ve pêvajoya çalakiyan destpê kir. Gelek hevalan bedena xwe dan ber agir, êdî wisa pêvajoya berxwedanê destpê kir.

Di wê pêvajoyê de Serok her xwest Kongreya PKK'ê ya 6. kom bibe. Komplo berdewam e, îhtimal heye tiştek cuda jî çêbibe. Serok dixwaze rêxistinê xurt bike. Kongre li Xinêrê çêbû, Ferhat di komîteya amadekar a kongreyê de cihê xwe digirt. Du tabûrên me yê jin hebûn, di wê navberê de du caran cihê wana diguherînin. Wê demê hevalên jin nerazîbûn nîşan didan. Dibêjin, we çima cihê me guhert? Êdî di vir de jin biîrade bûye, rêxistina xwe heye, helwestên komîteya amadekar red dikin. Li ser vê yekê tabûrê dixin lêpirsînê. Ew tabûr ji bo Ferhat dibêjin, "tesfiyekar e, Ferhat êrîşî me dike, cihê tabûrên me diguhere." Heta hinek dibêjin, "Ferhat sîxur e, çima wisa dike?" Vedat Varto, hevala Elîf, hevalê Îsa di komîsyona lêpirsînê de ne. Li ser vê bûyerê digirin, ji ber kongre berdewam e. Ya rastî Ferhat dixwest zemînê jin tehrîk bike û atmosfereke polîtîk ava bike. Lê belê kes wisa nake, pêşeroj wisa nîn e. Êdî çûyîna kongreyê çêdibû. 72 hevalên jin tevlî kongreyê dibin. Cara yekem e ku em bi nasnameya xwe ya YAJK'ê tevlî kongreyeke PKK'ê dibin. YAJK êdî rêxistin e û em bi nasnameya xwe tevlî kongreyê dibin. Serokatî mîsyoneke wisa dide jinê ku jin bi quweta xwe pêşengiyê bike. Jin bûye îrade, jin bûye rêxistin û divê jin di guhertinê de pêşengiyê bike. Ango YAJK bingeha têkoşîna herî xurt e. Serok wisa digire dest.

Kongre destpêka sala 1999'ê di pêvajoya Komploya Navnetewî de çêbû. Di esnaya kongreyê de Serok dîl tê girtin. Kongre dema destpê dike, ev radibin Hêlîn, Sakîne, Dr. Silêman, Zekiyê Biçûk digirin. Komîteya amadekar berpirsyar e. Ya rastî mesele ev e; Sakîne, Hêlîn çi kirine, çima hatine girtin, agahiya hevalên jin ên Kongreyê jê nîn e, tu agahî nayê dayîn û du jin tên girtin. Ji ber vê yekê hevalên jin vê rewşê protesto dikin. Hevalên delegasyonê

diçin pêşiya kongreyê rûdinin û tevlî kongreyê nabin.

Di vê der barê de divê mirov wisa bigire dest; di encamê de girtinek heye, pirsgirêkek heye, pêwîste pêşiya wê were girtin, lê belê ev bi nîqaşan çêdibin. Jin hêzeke rêxistinî ye, tu çima bêy agahiya hêza jin, du jinan digirî? Dibe ku hinek tiştên xirab jî kiribin. Ez çima dibêjim? Ji ber ev mijar pir tê nîqaşkirin. Dibêjin, çi bû jin protesto dike? Protestoyeke wisa ne hostetî ye? Mesele di vir de ye: Bêusûliyek heye, pêkhateya jin xebera xwe jê nîn e, ev pir zêde nayê nirxandin; vê carê şêwazê rexnekirina hevalên jin tê nîqaşkirin û dibêjin, “Çima hevalên jin wisa protesto dikin?” Ev şêwaz bi xwe re çi tîne? Ev dihêle di nav zilam de nakokiyên cuda derkevin. Mesela, bi her yekî re meylên cuda hene. Nimûne; Ferhat xetek e, Dr. Silêman xetek e û hwd. xetên cuda cuda rû didin. Ev dihêle li hemberî jinê paşverûtî îtifaqê çêbikin. Çima jin şaş e? Jinê dixe rojevê. Tu helwestê datînî, tu dixwazî pê re têkoşîn bikî û pêşiya şaşîtiyan bigirî, lê belê şêwazê te dihêle tu bibî rojev. Vê carê paşverûtî li hember te xwe dike yek. Me ev ji bo hinek pêvajoyan û terzê têkoşînê diyar kir. Fatma heta demekê bi ser ferasetên Semîr de diçe, lê paşê çi dike? Wî ji xwe re dike enî û vê carê navê Serok jî dişixulîne. Serok ji bo wê demê dibêje, “*Ev şêwaz Semîr wana xurt dikir.*” Şêwazê jinê bi vî awayî eniyek dijber bi xwe re xurt dike, wana tîne gel hev û paşverûtiyê tîne gel hev û digihîne hevdû. Niha tu dibêjî hinek kes têkiliyên teng dijîn û di nav wana de heye, grûb in. Dibe ku hinek îşaretên xwe hebin. Lê dema tu bêşêwaz bî, tu dihêlî ew kes werin gel hev û êrîş bikin. Têkoşîna te dibe sedem bertek kom bibin, xwe rêxistin dikin. Ev jî hîn xeter e. Hinek din jî ger şêwazê te cuda nebe, ew ê jî bi wan re bibin yek, eniyê xurtir dike, ev jî dihêle îtifaqê çêbikin. Mirov di têkoşînê de nehêle yên dijber li hemberî me bibin enî, lê me nikarîbû vê bikira. Ew helwest di cihê xwe de bû, bêusûlî hebû, lê pêwîst bû têkoşîna me hîn pispor bûya. Em hesabê wê rojê naxwazin, lê belê em dikarin îro vê wekî encamekê binirxînin.

Di pêvajoya kongreyê de komplo li ser Serok heye. Lê belê di kompoyê de lewaziyên hene aîdê hemû kadroyan e, jin jî di nav de ye. Wekî jin berpirsiyariya me çi ye? Wekî jin xwe girtina dest, ew jî pir çênebû. Ya rastî tesfiyekarî heye, xet bi Serok re nabe yek, paşverûtî heye. Em vana derxin pêş, lê belê di kompoyê de berpirsiyariyên me çi ne? Di Kongreya Şeşemîn de xwe tê de dîtin nîn e, di Kongreya 6. de rewşa hevalên jin bi vî awayî bû.

Rewşa kongreyê bi Serok re tê parvekirin û Serok ev rewş wisa nirxand û got: "*Ji rojevê derketin heye, hinek dixwazin rojevê ji rê derxin.*" Ev bûyerên ku derketine Serok wek provokasyonê nirxand û got, "*hûn nikarin bi vî awayî pratîkên sûc jî tespît bikin. Hûn di esnaya Kongreyê de hinekan bigirin, hûn nikarin van bûyeran zelal bikin.*" Bi rastî pratîkên sûc hene. Pêwîste pratîka Dr. Silêman bê darizandin, Zekiyê Biçûk jî wisa ye, li Erziromê tiştên kiriye ne hindik in. Divê têkiliya Hêlîn û Sakîne ya bi wana re were zelalkirin. Serokatî wisa got: "*Madem kongre bû, we bihişta bila şêwazê wana di kongreyê de bihata nirxandin… Pêşiya kongreyê li ber derketinek bi vî awayî, provokasyon e. Ev atmosfera kongreyê provoke kirine û her wiha rojev ji cewher derxistine*" û bi vî awayî mudaxele kir.

Niha li derekê pirsgirêk pir zêde bin û tu hinek pirsgirêkên din derxî pêş, esas hemû pirsgirêkên din di bin wê de tên veşartin. Serok ji bo wê got, "*hûn nikarin bi ser bigirin. Yek jî, hûn dixwazin vê pêvajoyê bi jinê îzah bikin.*" Mesele çi ye? Girtin çêbûye û ev bi xwe tehrîkek e. Beriya wê jî tiştên ji bo tabûrê tên kirin jî tehrîk in. Herî dawî ji pêkhateya jin re nebêjin û digirin; ew jî tehrîk e, provokasyon e. Tu quwet tînî provokasyonê, piştre jî dibêjî "hevalên jin protesto kirin, tevlî nebûn, di kompoyê de xwe nabînin…" Vê carê jî wisa gunehbar bikî, ev nayê qebûlkirin. Jixwe hîn ji berê ve pratîkên xwe yên lewaz hemû bi jinê îzah kirin wekî şêwazekî di zilam de derdikeve holê. Serok jixwe mudaxele kir û bi vî awayî hem nirxand, hem jî dîwana Kongreya Şeşê guhert. Serok dibêje, "*Ev kongreya kesên di nav dorpêça agir de ne. Ez di*

*sêdarê de dixebitim û ji nav dorpêça agir diaxivim.*" Wê demê gel hemû li Roma rabibû ser piyan. Hevalên ku bedena xwe dan ber agir, ji gelek însanên ji gel bedena xwe dane ber agir. Serok ji bo wê bi giranî xwest were hîskirin.

Esas di kongreyê de divê pratîkên hundir, pratîkên biryargehê û dîsa di '97'an de pratîkên eyaletên hundir hene, wana binirxîne. Erzirom tesfiye bûye, pratîkên Amedê, Garzanê hene û heta hevalên jin hatine kişandin. Pratîka Soran heye, di berpirsiyariya Ferhat de ye. Li eyaleta Botanê ji bo şêwazên şer hinek rexneyên Serok hebûn. Zagros dîsa wisa. Diviyabû di vê kongreyê de ev pratîk hemû bihatan nirxandin. Pir zêde nayê destgirtin. Li şûna vê, li beramberî jinê wekî sekneke giştî tê nîşandan.

Ji bo Kongreya PKK'ê ya Şeşemîn li Roma axaftineke Serok heye. Heta piştî wê dijmin got me cihê Wî tespît kir. Ya rastî hemû tişt ne pê ve girêdayî ne. Serok axaftin dirêj dikir, hinek dewletan gotibûn, "me di telefonê de cihê Wî tespît kir." Elbet hemû tişt ne ew in, lê belê bandor jî kir. Tabî Serok tenê bi vê axaftinê nayne ziman, xwe dispêre nirxandinên xwe yên derbasbûyî jî, pêwîste nêzîkatî ji YAJK'ê re çi be. Zilam wisa nikare erzan nêz bibe. Me xeteke qehremaniyê ava kir, jin jî pêwîste şopdarê vê be. Erê, dibe ku hinek kêmahiyên xwe jî hebin, lê em jî carina înkarker nêzîk dibin. Temam zilam e, dixwaze bi desthilatdariya xwe nêz bibe, xwe bi jinê îzah bike, kêmahiyên jin derxe pêş, lê em nikarin wisa înkarker nêzî dîroka xwe bibin. Serok nirxên ku hatine avakirin, ji wê re nêzîkbûn bi çi awayî çêbibe rave kiriye. Jixwe Serok di pêvajoya komployê de Derwêşê Evdî û Edûlê xist rojeva me. Zilam jî dikare wisa nêz bibe, zilam kişandina têkoşînê ye. Zilam li beramberî wê wisa bigire dest. Jixwe di vê demê de girtina Sakîne wana jî, ji ber têkiliyên wana hene tên girtin. Bi şev diçin hev dibînin, dibe têkiliyek siyasî be jî, lê belê her tişt wateyeke xwe ya siyasî heye. Dibe ku xerîzeyê wana jî di nav de hebe, lê te dibe nêzîkatiyek siyasî. Encex Serok ji van têkiliyan re nêzîkatiyekê datîne. Ji van têkiliyan re nêzîkbûna me çi be, pêwîste ew were

pêkanîn. Di Kongreya Şeşemîn de Serok dixwaze pêşî lê bigire.

Ji bo vê Kongreyê, tiştê esas ê ku em derxin pêş, helwestên me di wir de çareserker nebûn. Serok ji bo pêvajoya komployê wisa got: "*Çiqas komplo li ser min e, hûn ji min xetertir di nav çarmixê de ne.*" Jixwe Serok dîsa ji bo xebata azadiya jinê got, "*Xebata min a jin nîvçe mayî.*" Çima? Ji ber xebatek nîvçe ye, yanî pêkan e ku her kêliyê êrîş li ser çêbibe. Êrîş tenê di wateya dijmin de nabêjim. Di encamê de hîn tam têgihîştinek çênebûye, nîvçe ye, temamkirina wê lazim e. Lê ev komplo ne tenê li ser Serok e, esas li ser xebateke stratejîk e. Serok digot, "*Hûn hîna dibin xeteriyekê de ne, lê ez ê we ji bin çarmixê derxînim.*" Wekî jin jî bi şert û mercên komployê ve girêdayî hîn şêwazê têkoşînê girtin, xeteriya ser xwe dîtin û her wiha ev meseleyek wisa ye. Tu biryarekê dide ku têkoşînekê bikî, wê wextê pêwîste tu dijminê xwe baş nas bikî, hêza xwe baş nas bikî û tu xwe baş xurt bikî. Vana pir girîng in, an na tê bikevî. Temam binketin dibe êşek e, lê dibe heqîqet be, yan jî bêheqîqet be, di encamê de em dixwazin vê têkoşînê bi ser bixin. Ya yekê, pêwîste em wisa binirxînin; di şêwazê me de jî kêmayî hebûn. Dudu, em di ferqa cidiyeta Komploya Navnetewî de nebûn. Her wiha Serok ji bo sedemên komployê got, "rêhevaltiya kêm", esas aliyê wê yê mezin em in, pêwîste em xwe jî tê de bibînin. Ango em nikarin bêjin "zilam bû, berpirsyar ew bû, ew lazime xwe tê de bibînin." Belê me rolek çawa leyîst? Dîsa di vê Kongreyê de ferasetên zilam ên serdestî dixwest xwe bi lewaziyên jinê îzah bikin. Hinekî ev derket pêş. Ya rastî lewaziyên jinê jî pêşî lê vekir û ji zilam re jî bû wek sedem ku xwe bi jinê îzah bike.

Xisûsa din jî, ev Kongreya herî dirêj e. Erê komplo tengav bû, Serok got, "êdî belav nebin", jixwe hîn di nav pêvajoya kongreyê de Serok êsîr hat girtin. Piştî esareta Serok Kongre biryareke wisa derdixe; biryara fedaîbûnê derdixe. Di wê demê de gelek hevalan biryar girtin çalakiyên fedaî bikin. Bi taybetî jî hevalê jin biryar didin. Êdî di vê Kongreyê de hêzeke fedaî çêdibe. Serok çû

Ewrûpa, rêxistinên me yên Ewrûpa jî pêvajoya komployê tam fêm nekirin. Li qadên din jî wisa, yên di nav pratîkê de wisa nefêmkirinek hebû. Serok wexta diçe Ewrûpa, êrîş li ser Serok zêde dibin, dixwazin Serok ji wê derê derxînin. Rêveberiyên me yên Ewrûpa digotin, “Serok li vir e, êdî em nikarin xebatan bikin.” Ev gotinên pir biêş in. Wê wextê tu li wê derê li ser navê çi kar dikî? Hêza Serok e, hêza tevgerê ye, lê ne di ferqê de ye. Hatina Serok a Ewrûpa ji bo xwe wekî tengasiyê dibîne, ji ber ku xwe perçekî ji rêxistinê nabîne.

Xala din, Serok Kanî Yilmaz dişîne Kongreyê, ji bo rewşa heyî ji Kongreyê re ragihîne. Kanî Yilmaz jî di rêveberiya Ewrûpa de ye. Kanî hîn berî Serok were girtin bi du rojan dibêje, “rewşa Serok pir baş e”, Serok saet şeşê êvarê tê revandin, roja din nîvro saet duwazdeh Ecevît daxuyanî da, dîmenê Serok nîşan dan. Rêveberiya Ewrûpa dizane ku Serok hatiye revandin, wê demê Dîlan Şemsê li ba Serok e, heta di revandinê de hevalên kêlekê dixin cihekî, Serok dixin cihekî. Dîlan ji Serok re dibêje, “demançê bibe”; Serok dibêje, “pêwîst nake”. Di wê demê de Mahîr Welat li wê derê ye, dikare xeber bide, ji gel re bêje Serok hatiye ravandin, jixwe gel rabûye, ji ber hinek xeber derdikevin. Lê Mahîr Welat hîna jî dibêje tiştek nîn e, Serok diçe cihekî saxlem, bi vî awayî pêşî li rabûna gel digire. Rojava jî di hewayeke li ser lingan de bû, ji ber Rojava qada Serok e. Rewş çi ye, wê çawa bibe, lê Mahîr Welat dibêje, “tiştek nîn e, niha nekevin tevgerê, hûn wisa dikin wê Ewrûpa li me zorahiyê bike”, wisa pêşiya serhildana gel digirt. Êdî em nizanin, bi rastî sîxur bû wisa dikir, an jî xeflet bû wisa nêz dibû! Di vê komployê de roleke xwe ya diyarker heye? Yanî xefletek hebû. Subjektîf e, ne subjektîf e em nizanin, lê objektîf daxilê komployê kiribûn.

Yek jî, wê demê li ser navê rêveberiya Ewrûpa Mizgîn Şen daxuyaniyek di radyoya BBC de da û ji bo girtina Serok got, “darvekirin, an nedarvekirina Serok ne pirsgirêk e” û li ser navê rêxistinê diaxive. Got, “Ya muhîm PKK bikaribe xwe berdewam bike.”

Çawa ji bo tevgerekê Serok hebe nebe ne pirsgirêk e!? Komplo ye, pêwîste tu hişyariyekê çêbikî, pêşî lê bigirî; ew radibe çi dibêje! Wê demê ji bo Mizgîn digotin, “Gelo ev sîxur e, sîxura Almanya ye?” Heta Serok beriya wê carekê gotibû: “Gelo ev sîxura Almanya ye?” Dîplomasî bi dijmin re di nav têkiliyê de ye, ji ber lîstokên wan dewletan jî di nav de hene. Dibe ku hinek rasterast, hinek jî nerasterast xistibûn. Ev girîng e.

Ez çima vê dibêjim? Ji ber di navberê de salek derbas nebû, Mizgîn hat Kongreya PKK’ê ya 7. û ket Konseya Rêveber a PKK’ê. Yeka ku der barê Serokê me de daxuyaniyek wisa daye, di aliyê din de dikeve rêveberiya Tevgerê. Ev tişt hestê mirov ranedikir. Bi rastî yên ku li pêşiya Serok bûn mertalê zindî, ew hevalên çalakî kirin. Li zîndanê hevalê Halît Oral got, “HÛN NIKARIN ROJA ME TARÎ BIKIN!” û ew pêvajo berdewam kir. Dirûşmeya wê demê jî, “Bê Serok jiyanê qet qebûl nakin!”

Me wekî Tevger komplo wisa pêşwazî kir; li milekî hevaltiya kêm e, xeflet e, li milê din jî fedaîbûn e. Amerîka daxuyanî da û got, “Me tiştek wisa texmîn nedikir.” Kesekî hesabek wisa nedikir. Li her çar perçên Kurdistanê jixwe rêxistin hebû. Vê jî bide aliyekî; li ku derê Kurdek hebû, rabû ser piya. Li vê derê me fêm kir ku li ku derê Kurd hene. Li Amerîka li pêşiya Qesra Spî daxuyanî çêbûn. Heta li gelek welatên ku me navê wana jî nedizanî, gel li wan deran rabû ser piyan. Ango rabûneke komple ji aliyê tevahî gelê Kurd ve çêbû. Esas mirov di vir de vê yekê dibîne; Serok di wir de rastiyek ava kiriye. Esas rola parastinê ev dilîze, ev xeleka ji agir li dor Serok çêdike. Ev girîng e.

***Hevalên ku di pêvajoya Komploya Navnetewî de bi dirûşmeya “Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin” çalakî lidar xistine:***

Berî esareta Serokatiyê 3 hevalên jin çalakiyên fedaî lidar dixin. Hevala Rojbîn û Berwar ji Kampa Xedarê diçin, çalakiya fedaî lidar dixin, hevala Binefş Çinar jî ji eyaleta Amedê diçe, çalakî dike.

Hevalê Tayhan li Rûsya li gel Serok dimîne, esas Serok wî ji bo Kongreya PKK’ê ya 6. amade dike, dibêje “bila here”, hinek nêrînê xwe jî jê re gotiye. Lê ew jî bi hevalê Cîhad re bedena xwe dide ber agir, çalakiyê dike.

Di zîndanê de hevalê Halît Oral heye, ew jî bedena xwe dide ber agir.

Li Ewrûpa hevalê Berzan Öztürk hebû, ew jî bedena xwe daye ber agir.

Dîsa dayîka Hatîce bedena xwe dide ber agir û paşê xwe di balkonê de davêje.

Li Kobanê 8 dayîk xwe bi dar ve dikin.

Piştî esaretê, hevala Şaristan ji Kampa Xedarê diçe, 29’ê Adarê sala 1999’ê li Batmanê çalakî dike.

Hevala Meral Mamyak (Zîn) li Taksîma Stenbolê çalakî dike. Hevala Zîn ji Ardahanê ye, piştî êşkenceya dijmin dibêjin “mirî ye”, tavêjin ser çopekê, lê şehîd neketiye, piştre radibe û tê.

Hevala Bêrîtan (Hükmiye Seyhan) ji Nisêbînê ye, li Rûsya bedena xwe dide ber agir.

Hevala Rozerîn (Şükran Kaymaz) ji Nisêbînê ye, ji Amedê diçe li Elazixê çalakî dike.

Hevala Dîlan Wan li Edenê bi dirûşmeya “**BÊ SEROK JIYAN NABE!**” çalakî dike.

Di zîndanê de hevala Kurdê û Rotînda li zindana Midyadê bedena xwe didin ber agir. Herdû heval bi hev re li saha Serok jî mane.

Hevalê Xebat Qamişlo li Botanê, hevalê Akîf Kobanê li milê Zaxo, hevalê Felat Hesekê li Colemêrgê çalakiyên fedaî dikin. Xeta Egîdan di şexsê van hevalan de da der. Di dîroka mirovahiyê de

pêşketineke bi vî awayî cara yekemîn e, kesî tiştek wisa hêvî nedikir. Di nava du salan de ji gel û hevalan 162 çalakiyên fedaî çêbûne. Ev çalakî di dijmin de tengasiyek mezin çêdike

## Jı Rêxıstına YAJK'ê Derbasbûna Qonaxa Partîbûnê

Bêrî vê em li ser Kongreya Şeşemîn û pêvajoya komployê sekinîn. Di Kongreya 6. de nêzîkatiyên derketine, mirov tenê bi zurûfên kongreyê ve, yan jî di wê kêliyê de hişmendiyên derketine ve girêdayî nenirxîne. Tiştên derketine danehevên salan e. Bi taybetî êdî xebatên jin pêş dikevin, rêgeha rast ku Serokatî daye, êdî jin qutbûna ji zilam jiyan dike. Bi giştî rêgeha ku Serok daye Tevgerê, êdî jin bi xwe bûye xwedî îrade û li ser lingên xwe disekine, hêza xwe ya cewherî derdixe holê. Esas sedem hinek ji ber vê ye. Êdî jin wê wekî amûreke xurt a têkoşînê bi rêxistina xwe re têkoşîn bike. Danehevên hene hişt ku nêzîkbûneke bi vî awayî çêbibe.

Piştî Kongreya 6'an meha Nîsanê wan deran civîneke Merkeza PKK'ê heye. Ferhat li wir tiştekî îtiraf dike û dibêje, "di nav Konseyê de rola perçiqandina jinê, yek bi yek bi jinê re muhatab bûn min girtibû ser milê xwe. Haya hevalên dîtir jî jê hebû." Ferhat vê rolê dilîze. Ya din jî, digot, "em dikarin we kom bikin". Ev çi ye? Feraset "Em biperçiqînin, bînin hîzayê, bila ji xeta me dernekevin." Ji ber ku êdî jin ji bin bandora zilam derdikeve. Êdî zilam wek berê tiştê ku bixwaze ferz bike, wê nikaribe bike. Ma berê her yek ji me, kîjan zilam fermandarê ku derê bû, hema mabû me wekî kadroyên xwe bihesibînin. Çima? Ji ber ku wan bi xwe şekil dida. Di wê demê de jin jî gelek tiştên xwe ji wana fêr bibûn. Lê niha jin ji wê rewşê derketiye. Jin bi rêxistin, bi îrade û bi hêza xwe ya cewherî hesiya. Zilam wekî berê nikare hakimiyetê li ser jinê çêbike. Ya rastî vana bi çiqas nîqaşan çêbûn. Di civîneke navendî de Ferhat vê îtiraf dike; "perçiqandina jinê wekî rolekê ji min re hatibû dayîn." Paşê ez bawer im hevalê Cuma dema dîro-

ka PKK'ê dide, dibêje, "Ya rastî me ferq kir ku Ferhat hişk diçe ser, lê ji ber birayê Serok bû, pêvajoya komployê bû, di vê pêvajoya hesas de biçûba cem dijmin nebaş bû. Ji bedêla ku biçe cem dijmin, bila di nava me de be, lê çi bike jî jê re meydan vekirî ye." Hevalê Cuma rexnedaneke bi vî awayî dike, lê çiqas rexnedanek kûr e, ev mijarek cuda ye. Tabî bi xwe re çi anî?

Kongreya Şeşemîn erkeke xwe ya wisa jî hebû. Ji ber ku Serokatî êdî têkoşîna xeta azadiya jinê aniye astekê, ponijandiye, erkek wisa xistibû pêşiya jinê ku bibe partî. Êdî partîbûna jinê xistiye rojevê. Dema me bîrdoziya azadiya jinê ragihand, Serokatî behsa rizgariya jinê kiribû. Em li ser vê sekinîbûn. Esas ew amadekariya partiyê bû. Partî çi ye? Amûrên vê têkoşînê xurt dikin. Niha tu wekî yekîneyekê werî û bikî cuda ye. Bala xwe bidinê; gav bi gav pêş ket. Di destpêkê de rêxistineke me di nava gel de heye. Paşê rêxistina gerîla çêdibe û artêşa wê di asta taxim, yekîne de tê birêxistinkirin û bi eyaletan ve girêdayî ye. Her çû bi YAJK'ê re bû rêxistin, êdî pêwîst bû tevgera jin bibe partî. Partîbûn êdî şoreşê bi xwe re hedef dike. Çima? Êdî xwedî bîrdozî ye, şoreşê dike hedefa xwe ya pêşî. Her wiha bi şoreşa jinê re şoreşa civakê wekî erkekê dide pêşiya xwe.

Piştî Kongreya PKK'ê ya Şeşemîn, Kongreya Jinê hat lidarxistin. Bi giştî em ê wê perspektîfa Serok bixwînin: "*Dema em rastiya YAJK'ê bi kûrahî digirin dest, em nêzîkatiya ji jiyan û şer re tevî hemû aliyên wê fêm bikin, hêza pêkanînê raber bikin. Di nav avahiya trajîk a dîroka Kurd de xalek pir balê dikêşe. Bi taybetî di meşa serokatiyê ya dawî de, vê hinek din xwe eşkere kiriye. Bi rabûna gel re jin bi qehremaniyek hîn zêde tevlî dibe. Herî dawî di çalakiyên qehremaniyê yên hevala Rojbîn, Berwar û Binefş de hat dîtin, dîsa di xwe fedakirina dayîkekê ya bi qehremanî de ev rastî eşkere bû. Eşkere bû ku, vê bi bûyera serokatiyê re têkiliya xwe çêkiriye. Divê ev baş bê fêmkirin. Pêşketina di azadiya YAJK'ê de ji aliyê zilam ve tam nehatiye fêmkirin. Cewherê kar ev e. Qutbûna ji zilam teqez çêbûye, wê hîn kûrtir bibe. Bi temamî redkirina zi-*

*lamtiya heyî mijara axaftinê ye. Bi taybetî ev zilamtiya ku bi temamî êsîrê dijmin e û tu şanseke xwe ya serkeftinê tune ye, bi rastiya YAJK'ê re ji bo jina azad pêwîste bê redkirin. Ev di warê felsefîk, rêxistinî û siyasî de wisa ye. Di warê leşkerî de jî bi vê armancê re têkiliya wê çêbûye. Ji ber ku ev bi giştî di nav quwet de, bi taybetî di nav quwetê zilam de tam nehatiye fêmkirin, dibe wekî çavkaniya pirsgirêkan. Feqet ji ber pratîka ku min di vê meşa dawî de jiyan kirî, min hinek destanên Kurd ji hev derxistin û min pêwîstî dît ku ez bi kinahî bînim ziman. Di dîroka Kurdan de ev taybetmendiyek e. Di nav şer de jin, YAJK, evîn ev e. Zêde şansê serkeftinê çênabe. Çima? Ji ber ku pêvajoya tunekirinê ya dijmin dimeşîne, firsendê nade vê. Li hemberî vê, vaye encamên trajîk derdikevin holê. Tabî dijmin ev li ser hemû avahiya neteweyî ferz kiriye. Zilamê ku ji jinê hîn xirabtir anîne serê wî, yanî zilamê hatî xesandin û kirin rewşek pir çewt de, hewl dide jinê û civakê ji vî alî ve birêve bibe. Jixwe ev xefkek e. Pêşiya hemû mêrxasiyan girtin, tevahî xebitîna dil û mejî sekinandinê û bi vî awayî zilamê Kurd ê tune bûyî, qediyayî, kirinê bela serê jinê; bi vî awayî jin xistineke rewşekê ku neyê naskirin, azadiya welatê xwe, nasnameya xwe înkar bike. Ev ji encamek wisa re rê vedike. Feqet serokatî, çareserkirin û bihurandina vê, li şûna vê di şer de xwe bi serkeftinê ve girêdan, ji bo serkeftinê bûyîna xwedî îrade, bûyîna hêza rêxistin, perwerde û rêveberiyê îfade dike. Bûyera serokatiyê ev bû û careke din bi awayek balkêş derket holê. Feqet berî niha me ev bergeh bi riya dahûrandinan pêşkêşî hemû hêzên xwe kiribû. Encex derket holê ku, tam li ser vê nehatiye sekinîn. Dibêjin qey dahûrandinek giştî ye. Na. Ev rastiya me ya herî dîrokî ye, hem jî rastiya me ya bidestxistina azadiya herî nûjen e. Sedema ku ez vê nîşan didim, di vê destana neteweyî de evînek çiqas di asta dildariyê de be, divê mirov kesayetê jî ewqas bigihîne asta şerekî mezin ê bi dijmin re. Divê ev esas be. Her çendî ev şerekî berî dused salan bûyî mijara destanê be jî, felsefeya xwe û rastiya xwe ya xwezayî ev e. Hemû gerîla mecbûr in vê fêm bikin ku, ev saha şer e. Ev bûyer li saheyên Botanê, Garê, Cudî pêş ketiye. Niha rewşeke li*

*paş wê mêrxasiyê, li paş wî ruhî dimîne, heye. Heta rastiyeke hatî înkarkirin heye. Ev, ji bo destana Mem û Zîn a van sêsed salên dawiyê jî derbasdar e. Li vir rastiyek heye. Heya dijmin neyê çareserkirin, jiyan nabe. Bala xwe bidinê; yên direvin têkiliyên xwe hene. Di bûyera jin û zilam de vana beşên herî ketî, herî fitne û fesad in. Vana encamên zîhniyeta ku dîroka me bin xistiye û rewşa îro afirandiye û encama elimandinên wê ne. Tabî dixwazin vê binkeftinê bînin serê me jî. Li gel vê, em hîn jî li hemberî vê di nava berxwedaneke girîng de ne. Ez vê gavê naxwazim zêde vekim. Dema bi dîrokê re têkiliyek wisa tê çêkirin, di roja me de jî xwestibûn bi rengê YAJK'ê, di kesayeta jina azad de vê berbiçav bikin. Hêmana zilam jî saxlem e, me ew xistine şeklê gerîlayên xwediyê terzê Egîd. Em dikarin ji vê re bibêjin, gerîlatiya Egîd. Cewherê vê jî, fikir û aqilê wî li ser dijmin e. Heta ew neyê têkbirin, neyê paşxistin jiyan nabe, lewre jin jî nabe. Min li vê derê vala vala mînaka Derwêşê Evdî ji we re neda. Yanî keçeke Kurd a berî dused, sêsed salan jî her çendî xwediyê evîneke pir mezin be jî, riya vê di şerkirina li dijî dijmin re derbas dibe, ku bi rastî gotin, îrade û hêzeke xweşikbûna destaneke mezin heye. Rexmê wê jî, evînê bi şer ve girêdayî digire dest. Dibêje, di şer de piştî şehadetê jî êdî jiyan namîne, jiyan encex bi şerê serê çiyan gengaz dibe. Ev jî felsefeyek e. Di aliyê YAJK'ê de rastî ev e. Wateya vana vekirî ye. Tabî ev ji bo me prensîb e. Aliyekî wê yê neyê fêmkirin jî nîn e. Heta ji bo vê, guhdarkirina stranekê jî têrê dike. Bi taybetî rewşa kesên reviyan ku hîna vê li ser me ferz dikin, pir ketî ye. Yekane şertê rûmetê ew e ku, mirov li vir di moralê de bilindiyeke mezin çêbike. Bi hêrseke pir mezin çûyîna ser dijmin e. Tabî îxaneta li evînê çêdibe. Ev jî îxaneta li welat, îxaneta li azadiyê ye. Ez careke din dibêjim, di vê mijarê de eger wê behsa girêdanekê were kirin, destpêkê divê çareserkirina rastiya dijminê ku welat xistiye rewşeke neyê jiyîn, esas bê girtin, divê çareserkirina îxanetê esas bê girtin û ger îleh wê têkiliyeke jin zilam bibe mijara axaftinê, divê têkiliya wê ya bi serkeftinê re esas bê girtin. Ev wisa dibe. Ev jî tenê bi yek-du çalakiyên şeklî nabe. Dema bibe xwediyê terz û*

*tempoyeke bi serkeftina dawiyê ve kilît bûyî, çêdibe. Ev eşkere ye. Min pir caran ev xwest, lê mixabin hîna jî quwetê me, bi taybetî quwetê zilam ji fêmkirina vê ya tam dûr e. Lewma kesayetekî fermande yê tam, mêrxasiyek tam pêş nakeve. Feraseteke rast a artêşê pêş nakeve. Feraseteke rast a şer pêş nakeve. Rewşa niha di pêvajoya Kongreya 6. de derketî holê, ev e. Dîsa sala bihurî li biryargeha navendî û di pir biryargehên me yên din de rewşa derketî holê, jinê weke bar dibîne, ya rast xistina bin desthilata xwe ye. Halbûkî desthilateke ji azadiyê bêpar hatî hiştin, ji evînê bêpar hatî hiştin û ji serkeftina şer bêpar hatî hiştin; mirov bixin bin desthilatek wisa, ev rasterast mirov dibe îxanetê. Yek jî, pir paşgotinî (dedikodu), fitne û fesadiya wê tê kirin. Encama vê jî, ji îxanetê hîn xirabtir e. Niha rewşên wisa ji aliyê hinek hevalan ve bi israr tê ferzkirin. Qedemeya fermande ya navîn, heta merkez ji ber destpêkê xwe tehlîl nekiriye, bi awayek xeter nêzîk dibe. Bi taybetî pir erzan nêzîkî jinê dibe. Bêy ku wateya vê bizane, bêy ku dîroka wê bizane, nêzîk dibe. Vê bi dijwarî rexne dike. Ji bo her kesî, ji bo merkeza me jî, ez tînim bîra we ku pêwîste di vê yekê de israr nekin. Riya vê hatiye raberkirin. Dahûrandina vê hatiye kirin. Divê pêwîstiya wê bê pêkanîn. Nêzîkatiyeke ji derveyî vê, têkiliyeke ji derveyî vê, fikareke ji derveyî vê, rastiyeke evîn û dildariya ji derveyî vê çênabe. Ya pêwîste bê zanîn, ev e. Serokatî vê dimeşîne, hem jî bi wate dimeşîne. Pêwîste mirov ji vê re rêzdar be, bi vê yekê ve girêdayî be. Ya herî xweşik jî ev e. Feqet ez dubare dikim, yekane pîvana vê ew e ku, şervaniyeke bin nakeve di bin her şert û mercekê de heta dawî bê mezinkirin û meşandin. Li şûna vê, jinê sûcdar bikin û bibêjin jin giraniyê çêdike, dibe pirsgirêk, em bixin tetbîqê, biqewitînin, vana nêzîkatiyên bêwate, metirsîdar û dijmin xurt dikine. Vana nêzîkatiyên ku xwe bi hedefa esasî ve kilît nakin û rojevê ji rê derdixine. Misoger firsend ji vê re nayê dayîn. Dibe ku kêmasiya YAJK'ê hebe. Lê belê li gorî vê, wekî di van çalakiyên qehremaniyê yên dawî de hat dîtin, di beşek zêde de esas pêşketineke li ser bingeha azadiyeke rast, welatparêziyek rast, evîneke rast heye. Pêwîste zilam vê baş bibîne.*

*Pêwîste ji vê re rêzdar be. Eger ji destê zilam tê, lazime vê li ser bingeha binxistina dijmin weke ferdekê, weke hêzekê, weke çavkaniya hêzê bibîne. Mirov ji derveyî vê, wateyeke din dernaxe.”*

Pêvajo jî pêvajoya komployê ye. Di wê pêvajoyê de nîqaşa partîbûnê çêbû, pêwîst an jî ne pêwîst bû, di encamê de çêdibe. Çima? Ji ber ku nêzîkatiyên şaş jî hene, ji derve jî pêvajoya komployê tê ferzkirin. Di vê pêvajoyê de partî çêkirin çiqas lazim e, pêwîste em zelal lê binêrin. Ev şêwazê Serok e. Mesela, li ser Serok êrîşên pir hişk çêdibin, ji bo em jî bikevin pozîsyona parastinê. Serok wisa nêz nabe. Carina tu qet hêvî nakî, tu dibêjî em tengav dibin, êrîş hene, lê Serok rêvekirineke hemleyî dike. Ango di pêvajoya komployê de jî partîbûneke saxlem a jinê çêbibe, têkoşîna wê karibe xurtir bike, roleke xwe ya wisa heye. Lazime mirov wisa lê binêre. Yan jî wekî min got, ev mijareke nîqaşê ye. Di nav wan şert û mercan de mirov vê partîbûnê çêkiriba, yan jî çênekiriba tiştekî wisa mirov zelal li vê meselê mêze bike baş e. Perspektîfeke Serok e û hema ne wê rojê derketiye holê. Bi salan e têkoşîna wê tê dayîn. Destpêka jin tevlî vê hereketê bûye heta vê rojê têkoşîna wê tê dayîn. Êdî gihîştiye astekê ku asta wê ya rêxistinê, asta wê ya îradebûnê her çiqas di nav de pirsgirêk hene, ma ew vana çima nîqaş dikin? Xeta azadiyê zelal bûye û di şexsê hevalan de şênber bûye. Ev rewş di komployê de hîn ronîtir derket holê. Jin çawa xwedî li xeta Serokatiyê derket, ev jî di şexsê hevala Zîlan de destpê dike û heta komployê, bi hevala Berwar wana re zelal bûye. Li beramberî wê tiştê şaşîtî jî çi ye? Em dem bi dem li ser sekinîne. Ew jî zelal e, rast û şaş çi ye zelaliyek heye. Tu li ser wê dikarî partiyê ava bike.

Tiştê esasî, partîbûn girîng e. Lazime mirov wisa bibîne ku em careke din dubare nekin. Bingeha wê bi bîrdozî û teoriya qutbûnê re meylên xuyayî derketine. Jixwe Serok karakterê karîkaturê zilam zelal kiribû. Serok, tîpê karîkaturê zilam çêkiribû, wana xetê zelal dikin û ev bingeha partîbûnê ye. Li ser vî esasî Kongreya YAJK’ê ya 2. piştî Kongreya PKK’ê ya 6. çêdibe. Zivistana 1998-

99'ê ye. Komploya Navnetewî jî lidare. Di 13'ê Adarê de 140 delege beşdarî kongreyê dibin. Divê kongreyê de armanca yekemîn, ragihandina partiya jinê ye. Her wiha bi YAJK'ê re xebat hinekî navendî bû. Lê bi her awayî pratîkên ku hatin jiyîn, operasyonên 1995 û '97'an re rû bi rû ma. Bi giştî xebatên me ji bo meha Nîsan û Sibatê navendî nebû. Bi taybetî eger xebatên derve navendî bibe û di navenda jin de kom bibe, tam nehat çêkirin. Ji bo wê jî diviya vê kongreyê ev biryar bida; êdî em bi partiyê re navenda xwe çêkin. Hemû qadên xebatê bi navendê ve girêdayî bimeşînin. Dema ez dibêjim hemû qad, ez tenê qala gerîla ku di kîjan eyaletê de ye nakim, ne tenê ew; qada civakî ye, qadên siyasî û qadên derve yên mîna Ewrûpa, Rûsya û hemû xebatên jin. Armanc, divê hemû di navendekê de kom bibin.

Yek jî kongre di pêvajoya komployê de çêdibe, bandora komployê heye. Di aliyê jin de di kongreyê de li beramberî komplo xwe destgirtin tam wekî tê xwestin çênabe. Ew lewaz dimîne. Ev kongre biryara fedaîbûnê derdixe, ew girîng e. Bi Kongreya 6'an re jî em ber bi avabûneke fedaî ve diçin, hinek hevalên jin ji vê re pêşengî kirin. Girêdayî PJKK'ê hinek tabûrên fedaî yên jin çêdibin. Esas biryara fedaîbûnê li hemberî komployê derdikeve. Ew girîng e. Aliyê kêm ê Kongreya PJKK'ê ev e; di Kongreya 6. de em bi rewşa Sakîne û Hêlîn re rû bi rû man û pratîkên me yên berê hene. Ew taxima rehabîlîtê ya sala '97'an me di şer de tam bersiv neda. Diviyabû Kongreya PJKK'ê ev rewş bi giştî binirxandan, bigirta dest û berpirsiyariya wê zelal bikira. Lê ew jî kêm dimîne di vê kongreyê de. Pir zêde nanirxîne, rewşa Sakîne û Hêlîn jî tam nayê destgirtin. Her wiha destgirtina pratîkên heyî jî wisa seresere dimîne. Niha tu çima vê pratîkê digirî dest? Eger tu rast bigirî dest tê rast tehlîl bikî, ji bo ew kêmahî careke din xwe dubare neke, tu wan lewaziyan telafî bikî. Ev kêm maye.

Kongre ji ber ku êdî xwe dike partî, rêziknameya partiyê ava dike û rêvebernameya gerîla ya ku hêza jin wê çawa beşdar bibe, ew jî tê çêkirin. Hevalên xort dixwazin beşdarî vê rojeva nîqaşa li

ser rêzikname û rêvebernameyê bibin, ji ber ku ew dixwazin gava jin biryarek şaş bigire mafê wana jî hebe ku bikaribin veto bikin, lê belê heval destûr nadin tevlî nîqaşê bibin. Şixulê saetekê beşdar dibin, dixwazin di rêziknameyê de tiştek wisa derbas bibe; bila biryara vetoyê hebe. Nimûne, gava biryarek nerast were girtin, rêveberiya vê Tevgerê bikare veto bike. Di wê Kongreyê de hevalên jin vê nêrînê qebûl nakin û dibêjin "biryara der barê jinê de wê jin bigire." Biryar wisa derdikeve. Di vir de nêzîkatiya hevalên xort, xwe wekî rênîşandinê didin der. Hevalên jin destûr nadin vê tiştê. Me berê jî got, nêzîkbûnên Serok wisa nîn in. Rast e, di saha xwe de konferans da çêkirin, rojev diyar kir ku em li ser çi nîqaş bikin, lê bi xwe mudaxele nekir. Serok tenê rêgeh diyar kir ku, wê rojev çi be, xet wê çi be. Elbet her tiştekê divê mirov li gorî zeman û mekanê wê bigire dest û wate bide. Ez nizanim hevalên xort xwe çawa digirin dest li hemberî vê pêvajoyê, lê dema em li dîrokê dinêrin, divê nêrîneke me ya wisa hebe. Belkî yê wana jî tirsek e û jixwe komplo li ser Hereketê heye, Serok bi fiîlî ne amade ye, Hereketê em ê çawa bimeşînin. Fikarên bi vî awayî pêkan e hebin. Lê wexta bi giştî em binirxînin, ev ji nêzîkatiya desthilatdariya zilam qut nîn e. Mafê mudaxelekirinê di xwe de dîtin ji vê ne qut e.

Xala din, ji bo Kongreya PJKK'ê mirov dikare wisa bêje; Em ê li hemberî komployê xwe çawa bigirin dest? Ji ber Serok got "kêm hevaltî", ev tam baş nehat destgirtin. Me ji ku derê ve "kêm hevaltî" kir. Di vê wateyê de xeta Serokatî pêkneanîn kêm hevaltî ye. Mesela, gelek pratîkên me hene ku ne li gorî xeta Serok ango ji derveyî xeta Serok meşiyane. Em ji tesfiyekaran re bûne zemîn. Pratîkên me bi xwe re serkeftin ava nekirine, wekî tesfiyegerî ye. Wê demê divê em xwe rast bigirin dest. Ev çênebû, rexmê ku Serok xebata jin pir girîngî didayê. Di têkoşînê de amûrê rêxistina tevgera jinê xurt bû. Serok, ev perspektîfa xwe her nû dikir û digot, divê jin radîkal be. Serokatî çima tekmîlên hinek deveran digirt, tenê bi hevalên xort re sînordar nedihişt? Rêveberiyê

tekmîl dida, ev dikir. Rexmê wê jî ji hevalên jin dipirsî ku çi heye? Serok carina kadroyên ku li gel xwe perwerde dikir, ji wana re digot, “hûn sîxurên min in, hûn herin ku, li wê derê bidin hîskirin ku divê xeta Serok were parastin. Lazime hûn wê rolê bilîzin.” Cesaret dida te, hêz dida te. Digot, ji kesekî netirsin, rexne bikin, ev helwestek radîkal e. Hele ku êdî em gihîştin asta rêxistinê, Serok helwestek radîkal pêşde didît. Lê ev radîkalbûn me çiqas xwemalî kir? Ez çima vê dibêjim? Eger me ev radîkalî xwemalî bikira, rewş wisa nedibû. Em bi zehmetiyekê re rû bi rû dimînin hema bes dikin, an xwe paşve dikişinin, an jî lîberalîze dibin. Em bi rewşên wisa re rû bi rû man. Tê zanîn xeta têkoşînê ewqasî hêsan nîn e. Jixwe wê bi ser te de were û wê red bike. Ev şerek e û şerekî pir dijwar e. Tê çiqas bedêlê wê bidî ber çavan. Bi rastî tê hîna jî di helwesta xwe de israr bikî, berdewam bikî? Lê me dît ku ev feraset pir xwemalî nebûye. Kongreya PJKK’ê di parastina xeta jinê de ku bû partî, wê çawa xeteke radîkal ji xwe re esas bigire, diviyabû hilbijarta. Diviyabû me radîkalbûn xwemalî bikira. Hebûna xwe ya esasî divê bispêre vê ferasetê. Ya rastî vê kongreyê van xal û ferasetan zelal nekir. Ji bo wê piştre hinekî lihevkirin, hinek tengasî û hinek bêbawerî jiyan kirin, reş jiyan kirin, hinekan xwe paşde dan. Xeta têkoşînê lîberalîze bû. Ev jî mijarek girîng e. Dîsa kesayetên wekî Hêlîn, Sakîne, yan hinek pratîkên hene, berpirsiyarên wan berçav bûn, diviyabû ew kesayet bihatana zelalkirin. Di wê demê de wê têkoşîna navxweyî jî xurtir bibûya. Têkoşîna cins bi qey em li hemberî zilam didin diviya bû me ewqas jî di nav xwe de bimeşanda. Di nava me de gava hemû meylên derveyî xeta azadiyê jî bikarin xwe bihewînin, ew nabe têkoşîneke cins a rast. Ev çima girîng e? Wê demê ger ev xurt bûba, bihata nirxandin, wê têkoşîna hundirîn hem xurt bikiriba û hem jî ji zilam re nedibû zemînek. Mesela, vê hişt zilam li ser vê teserûfê pêş bixe. Ji zilam re zemînekî vekirî hişt. Berê di civînan de rojevên me yên esasî ev bû û kongre jî wisa dinirxîne ku, asta têkoşîna cins çawa ye, nêzîkbûna zilam çi ye. Di hemû civînên me yên xweser de wekî rojevekê dihat nirxandin. Polîtîkayên serdes-

tiya zilam asta xwe çi ye, kîjan nêzîkatiyê raber dike, me xwe li hemberî wê amade dikir. Me amûrê xwe yê têkoşînê xurt dikir. Wê demê ev di asteke xurt de tê nirxandin, lê hîseke pêşerojê ya xurt jî nîn e.

Di Kongreya Şeşan de hinekî zemînê wê çêbûye. Lê komlo wisa bilez çêbû, di van şert û mercan de em ê bi çi re rû bi rû werin, vana zûtir bibîne û xwe li gorî wî amade bike, ne di asteke jor de bû. Pêşeroj nedîtin pir cidî derket holê. Em di vê mijarê de jî lewaz man. Rexmê zemîn hebû di Kongreya Şeşan de pêşeroj hinek din bihata nirxandin, ji bo zemînê pêşerojê jinê palpişta xwe ya siyasî, polîtîk çi ye, wisa bihata destgirtin dibe ku di pêşerojê de zemînê jinê hinekî din amade bûya. Lê pir zêde nehat nirxandin. Jixwe hîn di kongreyê de em bi tiştên cuda re rû bi rû man û bi giştî kongre bi vî awayî bû.

Kongreyê piştî van mijaran nîqaş kir, hevalên xort hin tiştan ferz dikin. Xebatên jin Serok yekser dimeşand, ji bo wê jî rêziknameya xwe li ser wê ava kiriye. Erê xebatên jin kirin mercî, lê Serok bi temamî wisa diyar dikir. Ev nêzîkbûnek rast e, ne şaş e jî. Serok niha di esaretê de ye, em nikarin bêjin desteya erêkirinê. Em wê demê nikarin bêjin bila demekê rêveberiya Tevgerê be, em nikarin vê bikin. Serok jî tu caran tevgera jin wisa ji însafa hinek kesan re nehişt. Di saha Serok de jî rêveberiya Tevgerê bû, ew jî di perwerdê de bû, nedihişt wisa nêz bibin, an jî biçin bi grûba lehûrbûnê re civînê çêbikin. Serok tu caran negot ez nizanim çi bikim, hûn berpirsiyar bûn, wisa nekir. Berevajî Serokatî digot, “Jin pêwîste bi xwe biryara xwe bide.” Ew jî ji bo ku îradeya jinê derkeve holê. Jixwe heta niha Serok xwestiye jinê bigihîne wê astê. Her wiha wekî partî jî wê bikaribe biryara xwe bigire û erêkirina kongreyê Serok bide, ango merciyê dawî Serok dike. Lê belê derket holê ku di hevalên xort de ev feraset pêwîste erêkirina biryara der heqê jinê de mercî ne, Serok ji ber ku fîîlî ne amade ye, erêkirina biryarên jin pêwîste Konseya Partiyê ya giştî bike. Ev feraset ji milê hevalên xort ve hat ferzkirin. Piştre mudaxele

kirin ku Kongreya PJKK'ê belav nebe. Quwetê Kongreyê belav nebû, di vê nîqaşê de kilît bû. Tenê tiştekî baş, hevalên jin van nêzîkatiyan pêşdetir dîtin; ango mudaxeleyek çêbibe, em tedbîreke bi çi awayî bigirin. Di vê kongreyê de em bûn partî û bi pêşniyara Serokatî navê rêxistina jinê bû PJKK (Partiya Jinên Karkerên Kurdistanê). Roja piştî kongreyê hevalan PJKK îlan kirin. Bêy ku em ji rêveberiya giştî re bêjin, me xwe wekî partî ragihand. Esas ev tedbîreke me bû. Yanî sibe-du sibe mudaxele jî çêbibe, me jixwe partî ragihandiye. Ji damezrandinê û şûnde tên telefonên hevalan jî ji destê wana digirin. Nêzîkatiyeke bi vî awayî jî çêdibe.

Pêkhateya vê kongreyê sê meh û nîvan belav nabe. Nîqaş sê meh û nîv kilît dibe. Piştî demekê li ser hevalên jin ferz dikin, lê ew di helwestên xwe de israr dikin, bernadin û dibêjin “çi dibe bila bibe em erêkirina mercî naguherin.” Ji bo çareseriyek pêş bikeve, bangî 13 hevalên jin ên rêveberiya kongreyê dikin. Dibêjin werin em nîqaş bikin, ew 13 heval qaşo ji bo nîqaşê diçin, lê li wir tên girtin. Jixwe ewlehiya hevalan jî hatine, hevalan dibin. Hevala Elîf vê wekî trajediyekê tîne ziman û dibêje, “em bêpêlav meşiyan, em birin, em bi armanca nîqaşê birin, lê digirin.” Ango “heta hûn îqna nebin, em we bernadin!” Helwest neguherî. Ew 13 kes jî helwestên wan nayê guhertin. Di vê der barê de israr dikin. Piştre pêkhateya kongreyê hemûyan tînin. Armanca wan, grûb bi grûb nîqaş bikin û îqna bikin, lê helwestên hevalan nayên guhertin.

Sê meh û nîvan li derve çi dibe, çi diguhere û çi diqewime kes nizane. Heman demê di avahiya derve de jî fikar pir zêde ne. Wekî kongreyek tê çêkirin, her kes di bendewariyê de ye ku çi bû? Kêm zêde tê texmînkirin. Nêzîkatiyên hevalên zilam cuda çêbûne, ew jî wê çi bi xwe re bîne bendewariyên pir cidî hene. Tevgera jin bi tevahî bê rêveberî maye. Kongre di encamê de wê rêveberiyê diyar bike. Kar di nîvî de maye. Piştî wê heval bi wana re nîqaş dikin ku wê çawa bibe? Dawiya sê meh û nîvan ango di

meha Hezîranê de pêkhateya kongreyê dibêjin, “em êdî tevlî pratîkê bibin, bi vî awayî nabe.” Li ser vê bingehê jî rayeya merciyê dibe rêveberiya Tevgerê. Piştî sê meh û nîv tê pejirandin. Li vir armanca me, em beşdarî pratîkê bibin. Ji ber ku bi vî awayî em derveyî pratîkê dimînin. Jixwe komplo li ser Serokatî dimeşe, pratîkeke têr û tijî tê xwestin, ji ber wê biryar wisa tê girtin.

Dawiyê li Dola Eyşê şeş rojan civîn tê çêkirin, êdî lêpirsînek tê çêkirin. Pêkhateya kongreyê bi tevahî ketiye lêpirsînê. Piştî wê civîna şeş rojan, civîna îqnakirinê çêdibe. Lê belê ev civîn ji hevalan re pir giran tê. Yekem car dadgehkirina Rêbertiyê destpê kiriye. Ev jî psîkolojiyek pir cuda bi xwe re ava dike di avahiya hevalên jin de. Di milekî din de dijmin dixwaze dadgehkirina Serokatî pêş bixe û darvekirin di rojevê de ye, hewayeke pir cuda heye. Yek ev e, ya duyem jî hevalên derveyî quwetê Kongreya PJKK’ê tînin û beşdarî wê civînê dikin. Di bin navê bila avahiya partiyê jî binirxîne, tenê di navbera tevgera jin û rêveberiya hevalên xort de nemîne. Ji bo wê pêkhateyê kom dikin, lê tê xuyakirin ku kesên tevlî civînê kirine hatiye provokekirin. Ya rastî hinek jin jî di nav de, hêdî hêdî hinek ferasetên hevkariya bi wana re çawa tê pêşxistin, zemînê wê jî tê avêtin. Beriya wê di şexsê Newal de pratîka hevkariya bi zilam re ku derketibû holê, wê demê jî ji wê re vekiriye, di nav pêkhateya jin de perçebûn çêkiribû. Mînak; tu pêkhateyekê amade bikî û tu bêjî “ev tesfiyekar in” pêvajoyeke wiha ya komployê ye. Serok di bin esaretê de ye, ev jî ferzkirineke û tiştên cuda dibin. Di wan civînan de hinek hevalên jin bi awayekî hatin girtin.

Wê demê feraset bi vî awayî tê şîrovekirin; “tesfiyekarên hestiyar” (duygusal tasfiyeci). Pirtûkên wan û nîqaşên wan jî hene. Di encama wan civînan de lêpirsîn derdikeve û piştre hinek argumanên me yên bîrdozî tên mehkûmkirin. Ev girîng e. Ya yekê, teoriya qutbûnê li wir tê mehkûmkirin û dibêjin, “Pêwîste wekî Tevger, em her bi hev re bin.” Halbûkî teoriya qutbûnê ji milê Rêbertî ve hatibû pêşxistin û divê em pratîkî pêk bînin. Dibe ku di

pêkanîna pratîkî de ji ber fêmnekirinê lewazî derbikevin, lê belê tu vana wekî arguman mehkûm bikî, ev tiştek cuda ye. Teoriya qutbûnê wekî têgîna hevkariya bi zilam re tê mehkûmkirin. Dibe ku hevkariya bi zilam re wisa neyê bikaranîn. Jixwe hinek jin bi zilam re hevkariyê dikin. Ev tişt şaş e. Serokatî ji bo Newal got "hevkarî" û tevgera jin pêşkêşî zilam kir. Pratîka wê wekî hevkariya bi zilam re nirxand. Zexteke bi vî awayî çêdibe, di encama van nîqaşan de Tevgera jin wekî "mezhebên ji rê derketî" tê nirxandin. Mezhebên jirêderketî, ne tenê helwestên wan rojane, dibêje ku ev bingeha xwe ji salên 1996-97'an digire. Lê belê wê demê ji ber ku rêxistina xwe xweser bû nikaribû binirxanda. Ji ber rêxistina xweser bû me nikaribû bigirta dest. Ji wê demê heta roja îro hatiye, lê em çiqas di ferqa wê de ne? Cudabûn, qutbûn, ew xweser xwe birêxistin kirin Serokatî pêş xist. Tevgera jin dibe ku di warê pratîkê de lewazî bijî, lê di encamê de perspektîfên Serokatî bûn. Dibe li hemberî jin şer tê hesibandin, lê di rastiyê de ne wisa ye. Şer li hemberî xeta Serokatî tê kirin. Pêwîste wisa neyê hesibandin ku jin pir baş bû û qet kêmasiyên xwe nebû, wekî dihat xwestin pêk anî, wisa nîn e. Di pratîkê de dibe kêmasiyên me hebin, lê em wek feraseteke bîrdozî mehkûm bikin, ev tiştek cuda ye. Ew tê wê wateyê ku tê feraseta Serokatî jî şaş dibînî. Serokatî dixwaze bi perspektîfên xurt Tevgera Jin bigihîne asteke bilind, lê ew jî şaş dibînin. Li ser quwetê jin du mijar pir tengasiyê çêdikin; yek ji wan zexta pêvajoya komployê ye, ya duyemîn di nav hevalên jin de jî di xeta azadiyê de meylên ne zelal hene. Ev jî bi xwe re Tevgera me ya jinê tengav dike. Wê demê helwesteke hevbeş tê raberkirin, lê rexmê wê di nav de meylên cuda jî hene. Bi taybetî tiştên ku vê demê wekî mîrasekê heta roja îro tê, em dikarin vê binirxînin. Dema ku jin bi zehmetiyan re rû bi rû tê, paşde dizivire. Ev êdî ji bo jin dibe sekneke rast, zilam hinekî hişk biçe ser, êrîş bike û ferasetên xwe ferz bike, êdî jin li beramberî vê zorahiyê dişkê, bes dike û paşde çerx dike. Her wiha nêzîkatiyên çînayetî jî pir derketin. Dibe ku ev bingeha xwe ji pratîkên berê digire, cudahiyên çînî derdikevin. Ya din, sekneke ku ji zilam

qut nabe, meylên xwe yên kevneperest hebe, helwestên bi ezezî tevlî dibe vê demê di nav jinê de derdikevin holê. Xeteriyên herî mezin esas ev bûn. Bandoreke bi vî awayî li ser me kir.

Li aliyê din, ji ber civîn û kongre çêbûne, alozî derketine, vê carê di hemû saheyan de nirxandinên wisa li ser jin tên pêşxistin; ango jin tesfiyekar bû, li hemberî komployê helwest nedanî, helwesta xwe cuda bû, Serok çû, vê carê şerê desthilatê destpê kir, wekî dest danin ser mîrasê Serok, şerekî bi vî awayî jin serî kişand. Tiştên wisa li saha derve jî atmosfer terorîze kir. Di wê pêvajoyê van helwestan esas ji bo şikandina îradeya jinê bûn. Di cihekê de kongre kilîtbûye û nikarin biryar bigirin, çi bû ne diyar e. di milekî din de zilam tê û dibêje, "jin tesfiyekar bûn." Bi ser de jî esareta Serokatî di rojevê de ye. Bi vî awayî navgîna me ya rêxistinê terorîze bû. Heta ji te re dibêjin ku, "jin xirab e, pêşveçûna heta niha Serok xwest çêbike, çênebû. Di dawiyê de çi derket? Tesfiyekar derketin." Esas yekser êrîş li ser xeta Rêbertî ye. Çima? Ji ber ku di hinek saheyan de, bi taybetî li saha Serokatî ev xuyayî derketin holê. Her yek ji me saha Serok wek saha perwerdê ji xwe re dinirxand. Serok gelek heval rêdikirin ji bo fêrî zimanê kurdî bibin û hinek fêrî rêvebertiyê bibin. Mînak; tiştek çêbûya, me agahî dida Serok. Me digot filan zilam wisa ye, di nav xebatê de wisa ye. Her wisa terzekî xebatê hatibû rûniştandin. Piştî Kongreya 6. hinek bi navê rêveberiyê hatin Rojava, eşkere ev digotin: "Serok hûn vala vala danîne vir, divê em we belav bikin." Jixwe dixwestin belav bikin.

Ya duyem; hinekan mala Serok lê mabû, ji ber berê tiştek wisa nedîtibûn digotin, "vay be!" Esas ev nêzîkatî li hemberî Serok bû. Çima? Ji ber ku hevalên jin di wan malan de mabûn. Adeta navgîn êdî ji wana re vebûye, vê carê wê çawa xwe li ser bidin jiyîn! Xwestin gelek tiştan bixin nîqaşê. Bi vî awayî hem di quwetê jin de îradeyê dişkîne, hem jî te bêbawer dike, te reş dike û tu bi têkoşînek çawa re rû bi rû yî, di van waran de nakokiyê çêdike. Vê carê lêgerînên cuda pêş dikevin, zilam hêz dibîne û tu dibêjî ma

gelo ez bi vî zilamî re bim? Mesela, hinek fikarên xwe cuda hebin, di bin navê pozîsyona xwe biparêzin de bi vî awayî hêdî hêdî desthilatdarî dikeve nav me. Hinekan rêvebertî kirine, di ferqa hêz de ne û hinekan jî xwe ji bo desthilatdariyê amade dikirin. Di encamê de wê desthilatdariya xwe çawa bike? Zilam bi hêz be wê çawa xwe bispêre wî û bi wî re îtifaq bike? Rê li tiştên bi vî rengî vekirin.

Piştî sala 1999'an êdî delegeyên Kongreya PJKK'ê belavî qadan bûn. Xwestin xebatan bimeşînin, lê belê sekna rêveberiya PJKK'ê pir bibandor nebû, pasîf bû û xwe pir nîşan neda. Dîsa di milê moral û baweriyê de pir zor û zehmetî hatin jiyîn. Vê yekê jî bandor li xebatên jin dikir, sekneke bibandor derneket. Jixwe bi vî awayî enerjiyeke pozîtîf dernaxîne. Yanî tê ji çi hêz bigirî û çawa bimeşînî? Di vê çarçoveyê de nediyarî, şîlobûn bi xwe re derxist holê. Pêvajo bi vî awayî derbas bû.

Sakîne û Hêlîn qaşo di Kongreya 6. de hatibûn girtin. Hêlîn di Kongreya PKK'ê ya 6. de wekî endama yêdek a navenda partiyê hat hilbijartin. Rexmê ku endama yêdek a navendê ye jî, wê dikin endama esasî ya navendê. Helîn bû Konseya PKK'ê. Pîvanan kê diyar dike ne xuya ye. Pîvan şîlo dibin. Zêdetir heval dibêjin, hevalên xort diyar kirin ku Hêlîn bibe navend. Bêguman nêrînên jin jî di vê biryarê de hene. Hema hevalekî xort diyar kir ku filan kes bibe rêveberî, ne bi vî awayî ye. Di encamê de zilam jî vê nade ber çavan û herî kêm dixwaze nêrînên xwe bike nêrînên jin jî. Zilam ji xwe re jî zemîn amade dike. Pîvan pir şîlo bûne, qaşo sekna wan cuda bû, hatibûn girtin. Belê çima bû navenda konseye? Ango konseya tevahî Tevgerê dide meşandin.

Dîsa li Qeletûka li hemberî Komploya Navnetewî yekîneyên fedaî hatin sazkirin. Rêveberiya wê Ferhat bû, ew jî çû Sakîne weke rêveber anî danî ser. Di vê mijarê de hevalên jin xwedî lê derneketin. Çima? Dibêjin ku hevalên jin napejirînin, hinek hevalên din cuda pêşniyar dikin, hevalên xort jî wê napejirînin, bi taybetî Fer-

hat dibêje bila Sakîne be. Sakîne vê carê dibe rêveberiya xebata me ya herî stratejîk. Bi vî awayî erkdarkirin çêdibe.

Tîştê ku li vir tê dîtin, nêzîkatî û helwestên lîberal derdixistin pêş. Di eniya jin de herî zêde zilam vê dike. Her wiha di eniyên jin de nakokiyên hundirîn zêdetir tehrîk dikin. Hem di milekê de tu dibêjî "şaşîtiyên Sakîne hene", hem ger bi vî awayî ye, çima tu wê dixî xebatên herî sereke? Wisa nakokiyên hundirîn jî hîn kûrtir dike, tehrîk dike. Jixwe piştî vê êdî pêvajo hinek hat guhertin. Dîsa di vê pêvajoyê de guhertinên stratejîk jî di rojevê de ne. Serokatî êdî gav davêje ku guhertinên stratejîk çêbike. Erê jin jî tevlî xebatan dibe, lê nerihetî heye, ne aramî heye, bêbandorbûn di aliyê jinê de heye. Heman demê seknên lîberalîze bûne hene, adeta li hemberî wan êrîşan teslîmkarî jiyan kirine. Navgîn wê demê bi vî awayî ye.

Piştî wê, jixwe Serokatî bangewazî kir, xwest pêvajoya agirbestê ya 1'ê Îlonê destpê kiribû, berdewam bike û guhertinên stratejîk çêbibin. Pirsgirêka Kurd û pirsgirêka Tirkiyê bi hev re wê werin çareserkirin. Rêbazê wê jî hevpeyvîn in. Beriya wê me ji bo guhertina stratejîk digot *Stratejiya Têkoşîna Şerê Gel ê Demdirêj* (uzun süreli halk savaşı). Bi vê re çi dihat hedefkirin? Kurdistaneke azad û serbixwe dihat hedefkirin. Êdî bi rêbazên demokratîk di nav pergalê de têkoşîn dayîn êdî wekî guhertineke stratejîk, rêbazeke bi vî awayî esas tê girtin. Kurdistaneke azad bi gelê Tirkiyê re, bi rêbazên demokratîk û siyasî re em biçin çareseriyê, pêvajoyeke wisa destpê dike. Li gorî vê guhertina stratejîk Serok got, "*2'yê Tebaxa 1999'ê hêzên me yên li Bakurê Kurdistanê pêwîste paşde werin kişandin. Ev cejna gulê ye*." Bi rastî ev hem gavên dîrokî ne û hem jî gavên pir xeter in. Nimûne; di pêvajoya herî zêde tevlîhevî heye, nerihetî heye, şîlobûn heye, em bi vê pêvajoya zehmet re rû bi rû hatin. Serok gavên dîrokî davêje, pêwîste em ji pêvajoyê re bibin bersiv. Ez bi awayek vekirî bêjim, em ji vê re pir amade nebûn. Ev yekser ket rojeva me, ango guhertinên stratejîk wê çêbibe, gerîla wê paşde bikişe, beriya wê li

hemberî komployê wê bersiv bê dayîn. Ji bo wê li her cihî biryarên fedaîbûnê tên girtin. Li beramberî amadekariyek wisa, vê carê berevajî pêvajoyek cuda destpê kir. Lewma vê yekê nefêmkirin bi xwe re derxist holê.

Pêvajoya paşve kişandina gerîla ku destpê kir, fikar hebûn, ji ber ku di wê demê de em tam amade nebûn. Gerîla wê çawa fêm bike, naveroka wê çi ye û wê çawa were pêkanîn? Tenê tiştekî wisa hebû; Serok gotiye, em ê jî pêk bînin. Pir bi amadekarî nebû û talîmat jî pir vekirî nebû. Ji ber teredût hebû, destpêkê gelo nîve nîv gerîla were, piştre yên din werin, li ser vê nîqaş hebûn. Lê Serok gotibû pêvajoyeke stratejîk e û pêwîste gerîla were. Ji bo wê jî pir bê amadekarî di gelek eyaletan de heval kom dibûn. Piştre Konferansa HPG'ê ya Yekemîn çêbû. Wê demê rêveberiya Amedê Celal Şirnex e, Vedat Varto ye, wisa bêrêxistinî tevdigerin, xwedî li grûban dernakevin. Ji Dêrsimê, ji Erziromê, ji her derê grûp tên. Grûbên werin di Botanê re derbas bibin. Eyalet jî ji vê rewşê re amade nebûn. Ji ber ku pir belavbûn hebû windahiyên me pir çêbûn. Ev rewşa paşve kişandinê Serokatî piştre nirxand û got, hûn ewqas bêrêxistinî ne. Lê sedema rasteqîn, nefêmkirina pêvajoyê bû û em bêrêxistinî ketin nav pêvajoyê. Van salên dawî jî paşve kişandin çêbûn, lê em hîn birêxistinî bûn. Kîjan grûp wê kengî derbikeve, tevahî eyalet wê çawa werin birêxistinkirin diyar e. Rexmê wê jî di talîmatên hatin dayîn de li gorî xwe fêmkirin çêbû. Mînak; eyaleta me ya Dêrsimê li gorî xwe fêm kiribû û eyalet herêm bi herêm vala kiribûn. Sedema wê çi ye? Ji ber ku eyalet heta fêm dike, ew jî cuda fêm dike. Wê demê rêveberiya me ya jin hevala Melsa Dêrsim hebû, berpirsyara Erziromê bû, şehîd dikeve. Hevala Hêvîdar li Amedê şehîd dikeve, di asta rêveberiyê de bû. Qederek heval di asta rêveberiyê de di vê pêvajoyê de şehîd ketibûn. Di rêveberiyê de jî dev ji xwe berdan, psîkolojiya wekî êdî xilas bû, em ji Bakur jî dikişin, pir wate jî nedan pêvajoyê, wisa jî şehîd ketin. Me wê demê pir zêde nikarîbû pêşiya şehadetan bigirta. Li Dêrsimê helwesteke cuda jî derket. Hevalê

Îsa û hevalê Kazim wana gotibûn em nayên, helwesteke wisa danîbûn. Vê carê xwestin hinek hevalên jin jî bi xwe re bihêlin. Wê demê li Dêrsimê hevalên me yên rêveber jî gotin em nayên, salek şûnde mudaxele çêbû, nû hatin. Wê demê hinek helwestên wisa jî çêbûn. Hevalê Îsa wana dest danîbûn ser hinek hevalan. Piştre hevalan mudaxeleyê vê bûyerê kirin. Ji derveyî wî, rêveberiya hevalên jin helwesteke dişibe wana nîşan dan. Windahiyên xwe zêde bûn. Lê vana ji nefêmkirina pêvajoyê bûn. 2-3 hevalên jin jî têkiliyên wan hene, dixwazin bi xwe re bihêlin. Li hemberî hevalên jin hinek nêzîkatiyên wisa çêbûn.

Pêvajo hatiye guhertin, nefêmkirin heye, wê helwesta me çawa be nayê zanîn. Mînak; dijmin tê ser, radest nabe, lê dibêje “ez ê şer bikim ku pêvajo xira bibe”, gelek heval jî wisa nêz bûn. Ji nefêmkirina pêvajoyê gelek hevalan nizanibûn wê çawa xwe biparêzin û çi bikin, bi nezanî ketin destê dijmin. Hinek heval jî bêy ku bi dijmin re bikevin nav pevçûnê şehîd ketin. Ez bawer im hinek xweradestkirin jî çêbûn. Li gorî xwe hinek kesan wisa nirxandin; “eger em pevçûnê nekin, em ê bikevin destê dijmin.”

Wan salan li qada Erzirom têkiliya Yilmaz û Dewran hebû, jixwe bi wan nêzîkatiyên xwe hêzên eyaletê ji taqet xistibûn. Ev ferasetên wana ber bi tesfiyebûnê ve diçû. Heman demê pêvajo destpê kir. Ji bo wê wisa tevlîheviyek cidî çêbû. Heya hatina hevalan a Başûr hêzên qada Erziromê hîn di bin bandora wê atmosferê de bûn. Jixwe li Başûr di navbera hevalên jin û xort de alozî hene, hevalan jî tam ketin vê atmosferê.

Wê demê dola Şehîd Ayhan kirin kampa hevalên ji Bakur hatine. Hinek rexne çêbûn ji aliyê rêvberiya Hereketê ve, hevalên ji Bakur hatine pratîkên wana rexne dikin, an jî şekilgirtina di hin eyaletan de heye. Pêwîste mirov hinek xweser li ser bisekine, dahûrandin bike. Lê belê rêveberî pir dûz nêz bûn, heval bi rexneyan re rû bi rû hatin û wate nedanê. Piştre ev bû firsend ku tesfiyekar xwe li ser birêxistin bikin. Ji ber ku pêvajo giran û şîlo

bû ji milê pêkhateya ku ji Bakur hatiye ve nedihat fêmkirin, kesayetên wekî Yilmaz û Dr. Silêman xwe li ser vê zemînê birêxistin kirin. Hevalan wê demê ji min re gotin, Dr. Silêman dixwaze xwe birêxistin bike. Hevalên ciwan ên ji Amedê hatibûn pir şerker bûn, çend caran hatin gel min. Ez jî nû hatibûm, min got we xêr e hûn diçin gel Dr. Silêman, hûn Doktor ji Bakur nas dikin? Rast e, di eyaletê de ferasetên xwe dabû rûnişkandin, lê pir hevalên di pratîkê de pijiyabûn Silêman nas dikirin. Her kesî digot "Dr. Silêman tecawuzcî ye". Carinan hevalên xort ji me re digotin xwe jê biparêzin. Min pirs dikir, "ma hûn wî nas dikin, ev ji ku derket?" Digotin, "mesel ne tenê Dr. Silêman e, Yilmaz jî pê re ye." Wana digot, "Partî pir bi ser me de tê, hêza me tune ye em van rexneyan rabikin." Piştre di 19'ê Gulanê de piştî Kongreya PKK'ê ya 7. reviyan û gelek ciwan bi xwe re birin. Piştre hin hevalan rastiyên tesfiyekaran dibînin û careke din vedigerin çiyê. Hinek ji wan jî niha şehîd in, mîna hevalê Nûman û hevalê Rizgar. Di wê demê de gelek hevalên hêja bi lehengî derketin. Bi kurtahî, ew heval gava hatin û ketin nav wê atmosferê, van nêzîkatiyan ew bandor kirin. Weke Tevgera Jin me jî pir rola xwe neleyîst. Qet neba me dikarîbû hemû hezên jin ku ji Bakur hatine bigirtan cihekê û pêvajo bi wan bida fêmkirin. Bi tena serê xwe man û rêveberiya PJKK'ê xwedî li wan derneket. Ew jin jî bûn tesfiyekar, dema çûn hin jin jî bi xwe re birin.

Di nav vê pêvajoyê de tiştê herî bi êş û zehmet, artêşa jin piştçavkirin bû. Di paşdekişandinê de artêş belav dibe, heman demê Botan eşkere got, "Ji gerîlabûnê dûrbûn, ji şer dûrbûn". Atmosferek bi vî awayî çêdibe. Yek ji sedemên vê belavbûnê, bêbandorbûna Tevgera Jin e.

Di navbera 2-23'yê Çileya 2000'an de Kongreya PKK'ê ya 7. hat lidarxistin. Di bingehê de guhertina stratejîk hedef tê girtin. Li ser wî esasî Serok got, navê PKK'ê biguherînin. Ji ber stratejî guhertiye, navê PKK'ê jî divê were guhertin. Bi taybetî ARGK pêwîst bû êdî di stratejiya parastina rewa de were birêxistinkirin. Ji bo wê jî

ARGK pêwîste guhertinê çêbike. Piştre ARGK bû HPG û ERNK hat betalkirin. Jixwe navenda rêxistinê bi xwe wê xebatên civakî û siyasî bimeşîne. Ji bo wê jî xebata eniyê ne pêwîst e. Lê belê navê partiyê nehat guhertin, wekî atmosfereke hestiyar çêbû; "PKK kevneşopiyeke me ye, pêwîste em xwedî lê derkevin." Ev tiştek pir rast nebû, ji ber ku Serokatî dixwest nav were guhertin. Lê piştre di Kongreya 8. de nav hat guhertin. Vê carê li wir ne tenê nav hat guhertin, wekî rêxistin me xwe tesfiye kir. Tabî wê demê sedem cuda bûn.

Beriya Kongreya 7. rêveberiya jin civînek navendî çêkir, ji ber tecrûbeyên ku ji pêvajoyên derbasbûyî hatine girtin, hevalan xwestin bi amadekarî tevlî bibin. Mijarên wekî pêvajoya paşdekişandinê, grûbên aştiyê û hwd. hatin nirxandin. Dîsa nêzîkatiya zilam ku di vê kongreyê de me tengav bike, li hemberî wana wê helwestên me wekî jin çi bin, ev bi giştî hatin destgirtin. Rexmê amadekariyan tiştên cuda di Kongreya Heftemîn de tên destgirtin, mijarên stratejîk nayin biryarkirin. Ya yekê, navê PKK'ê nayê guhertin; ya duyem, wekaleta Serok digirin. Di dîroka partiyê de cara yekê em kongreyek bi vî rengî jiyan dikin û pêwîste em encamên dîrokî ji vê kongreyê derxînin. Rexmê ku wekaleta Serok rihet nîn e, tê çawa wekaletê bigirî? Serok bi xwe hîna bi fiîlî amade ye, parêzer diçin û tên, li gel Serokatî hevdîtin dikin. Mînak; Serok jî tiştek wisa nexwesta dikarîbû bigota ez nikarim bi fiîlî mudaxele bikim. Rast e, Serok dixwest rêxistinê bihêz bike, xwe bi xwe birêve bibe, lê di encamê de rêvebirineke Serok heye, Serok vê Tevgerê dimeşîne. Di tu zagonan de tiştek bi vî rengî nîn e. Ango kesek bi xwe amade be, tu nikarî wekaleta wî bigirî. Di zagonên cîhanê de encex mirovek ku aqilê wî/wê ne li cih be, yan jî mirî be, tu dikarî wekaleta wî bigirî. Eger ew kes jiyan dike tu nikarî wekaleta wî bê destûr bigirî. Lê di wê Kongreya 7. de wekaleta Serok hat girtin.

Kongreya 7. di sê mijaran de şaşîtî dike. Ya yekê, wekaleta Serok girtin û di wê kongreyê de dirûşmeta "Bijî Konsey" tê avêtin.

Ev nêzîkatî di dîroka me de cara yekê derdikeve. Tabî paşê hevalan ev feraset mehkûm kirin û ev feraseta Ferhat bû. Feraset ew bû ku, Serokatî ne amade ye, ji bo ku konseya partiyê bibandor be wekî dirûşme di nav hêzên me de "Bijî Konsey!" hat avêtin. Di dîroka me de cara yekê ev feraset hat pêşxistin. Di dîroka me de cara yekê bi hestên kadro re tê leyîstin. Serok ne amade ye û tiştekî wisa kirine. Ya sisêyê, îradeya jin nehat naskirin, ango îradeya jin hêzek e, ev partî xwe li ser van lingan dide rûnişkandin. Ji bo me ev nirxek bingehîn e. Yek hêza Serok e, du xebatên jin e û îradeya jin a ku hatiye birêxistinkirine. Di Kongreya 7. de Serokatî dixwaze xeta me ya şer û têkoşînê sererast bike. Heman demê feraseta Botan di navenda kongreyê de xwe ferz dike û dibêje, "Pirsgirêka me ne taktîk e, stratejî ye." Stratejî jî Serok diyar dike, rexneyên ku tên kirin di warê stratejiyê de em ne muhatab in, wê çaxê Serok muhatab e, ango Wî sûcdar dike. Dibe ku vê eşkere nabêje, lê gotinên Botan tên wê wateyê. Rexmê ku di kongreyê de nîqaş dike bertekên cidî li beramberî wî pêş nakevin. Di wê kongreyê de Ferhat ji bo Serok têgînên wiha bi kar dianî: "Serok lîderekî ruhanî ye." Serokatî wek serokekî manewî digire dest. Serokatî ev ji bo Zekî digot. Dema tesfiyekariya Zekî dahûrand, got, "Zekî xwe kiriye fermandarê ser erdê, ji min re jî dibêje 'tu Xwedayî'. Bi rastî jî wisa bû, Zekî tu caran di axaftinên xwe de nedigot, "Serok Xweda ye, her tişt Serok dizane." Yanî wisa bilind bike û ji kar dûr bixe, ruhanî bike. Heman tiştê vê carê Ferhat dike û di kongreyê de jî bi vî awayî biryar digire.

Beriya kongre çêbibe, hinek zemînên cuda jî hene. Dewletên herêmî û tevgerên hevkar ên derve hene. YNK, PDK û DYE (ABD) ji wana re dibêjin, "Serokê we hat girtin, pêwîste hûn serokekî ji xwe re derxin." Ango dixwazin serokekî li gorî berjewendiyên xwe derxînin. Ev nêzîkatiyên wan ên tesfiyekar tê wateya ku Rêbertî ji hole rabikin. Ev siyaseteke navnetewî ye. Di pêvajoya tesfiyekariya salên 2003-2004'an de nêzîkatiyên van tesfiyekaran eşkere bû.

Di wê demê de nêzîkatiyên me yên hevalên jin rexmê ku

tecrûbeyên ji Kongreya 6. hatin girtin, wekî hêza PJKK'ê em bi yek bin û yek blok ava bibûya; civînek hatibû lidarxistin, lê belê di nêzîkatiyên me de nêzîkbûneke belave derket holê. Bi navê Tevgera Jin tu rapor nayên pêşxistin. Wekî Tevgera Jin pêwîste em pratîka xwe binirxînin û pêşkêş bikin. Lê hevaleke jin li ser navê hevalên jin bi devkî agahî dide. Ev xebateke me ya stratejîk e, pêwîste bi vî awayî nehatiba kirin. Ew rol û mîsyona xwe nelîstine. Me perspektîfa ji bo Kongreya 6. xwend, Serok çawa mîsyon dide jinê, tu bi vî awayî rola xwe jî nadî pêş. Di vê kongreyê de wê rola min çi be? Ji ber ku wekî Tevgera Jin tu tevlî dibî, tu wekî ferdekê tevlî nabî. Li hemberî van nêzîkatiyan jin dibîne wekaleta Serok ji dest diçe, îradeya jin nayê naskirin. Ev tişt li ber çavan tê jiyîn.

Yek jî, tiştek wisa tê jiyîn; di dîwanê de du jin (Peyman û hevala Jiyan) hene, lê ew di lîsteya meclîsê de tune ne. Wê meclîs were diyarkirin, wê navend were diyarkirin, lê hevalên di dîwanê de di lîsteyê de tune ne. Hevalên jin dibêjin ev dîwan in, bi îradeya me hatine hilbijartin, lê belê lîsteya ku ji bo Navenda Tevgerê hatiye amadekirin, di wir de navê wana nîn e. Lîste hevalê Cuma pêşkêşî kongreyê kiriye. Hevalên jin vê rewşê dinirxînin. Pêvajo li ber çav e, ji bo wê jî helwestên bi vî awayî hene, em naxwazin ji derveyî vê pêvajoyê bimînin. Heval helwestên xwe raber dikin û porê xwe qut dikin. Ev helwest hem ji bo wekaleta Serokatî û hem ji bo rewşa ku di kongreyê de tê ferzkirine. Heval dibêjin "ne tiştekî rêxistinî bû", lê pir rêxistinî bû. Ne tiştekî bêrêxistinî bû, lê helwesta me hinekê pasîf bû. Mijar Serok e. Tu di kongreyê de Serok dixî nîqaşê, dibe ku hinek ji te bandor jî bibin. Tu jî îradeyek î, lê heval helwesteke wisa pasîf nîşan didin. Ev ji çi çavkaniya xwe digire? Ji ber ku beriya wê hinek şikandin çêbibû. Mînak; Ferhat van bûyeran wekî pêkenok digire dest. Di dîwanê de heval tên, dibêjin "Tu kê yî, navê te çi ye? Rabe biaxive." Ji ber porê xwe jê kiriye ya, henekê xwe pê dike, wekî ku cidî nagire.

Piştî van meseleyan vê carê hilbijartin dibin, di dîwanê de jî du

jin hene. Ew jî di lîsteyê de nîn in. Heval li ser vê nîqaş dikin, dibêjin, “Em hinek jin xwe ji lîsteya Navenda Tevgerê şûnde bikişînin.” Wê demê 19 heval xwe ji rêveberiyê dikêşin. Bêy ku tu kes ji hev re bêje, yek bi yek xwe ji lîsteyê kişandin. Bi hestiyarî bandorek jî çêdibe. Li vê derê îca 19 kes li pey hev xwe ji lîsteyê dikişînin, erk nagirin. Mirov dikare bêje ku xwe paşde kişandin erk û berpirsiyariya xwe ya partîbûnê li holê hiştine. Jixwe hestiyariyek heye, xwe paşde kişandin derbikeve jî, wê valatî bê dagirtin, ji ber ku berpirsiyariya me li hemberî Tevgera Azadiya Jinê heye. Helwestên bi vî awayî berpirsiyariyê li holê dihêlin. Li gorî xwe bûyîn e. Hinek heval xwe wisa pênase dikin: “Me xwe di asta rêveberiyê de nedît lewma me xwe paşde kişand.” Pêvajo di pêşerojê de bi xwe re xitimandinekê ava dike û wê helwest di kîjan astê de bin, pir nayê hesibandin. Ev pêvajo li ser moralê quwetê jin bi neyînî bandor dike.

Piştî Kongreya 7. hestiyariyeke ku bibêje Serok çû, ew tê wê wateyê ku her tişt çû, di nav hevalan de tê jiyîn. Her wiha di civaka Kurdan de por jêkirin tê wateya ku her tiştekî xwe winda kirine, ev wekî teslîmbûnê ye jî. Vê carê di beşek mezin de dev ji xwe berdanê re rê vedike. Di hinek beşan de jî ji meylên çînî re rê vedike. Ji bo wê jî piştî Kongreya 7. di nav hêza jin de cudabûn zêdetir dibe. Mînak; Hêlîn û Sakîne meylên çîna burjûvayê biçûk wekî xetekê ferz dikin. Helwest ji bo van nêzîkatiyan hene, lê belê pir lewaz dimînin û bi xwe re çareseriyê naynin.

Tiştê balkêş, piştî kongreyê ev 19 kesên ku xwe ji lîsteya rêveberiyê dikişînin, wana dixin lêpirsînê. Ev lêpirsîn jî di zemînek giştî de tê meşandin. Wê bi xwe re çiqas zelaliyê çêbike, nêzîkatiyeke cudabûnê derdikeve holê. Di vê demê de pêwîste em pratîka kesan bigirin dest ku, nêzîkatiyên wan çi bi xwe re tîne. Ev nêzîkatiyên takekesî ne, pêwîste em ji nêzîkatiyên giştî cuda bigirin dest. Di encamê de ev pratîka wan e û sekna wan mijara nîqaşê ye. Lê belê bi navê rêveberiya Tevgerê tê girtin, ev jî nahêle rewşên ku tên jiyîn zelal bibin. Mixabin pêkhateya jin xwedî lê

derdikeve. Tiştê lewaz jî dimîne, nahêle di nav xwe de zelaliyê çêbike.

Her wiha nêzîkbûnên zilam wê demê çi ne, pêwîste em vê ji hev derxin. Ev pir çênabe. Piştre encama Kongreya 7. ji quwet re tê ragihandin. Di encamê de di milê pêkhateyê de bêbawerî pêş dikeve. Piştî wê, ev bûyera por jêkirinê tenê bi pêkhateya kongreyê re sînordar namîne. Hêza jin a li derve jî pê dihese û pir heval wê demê dikevin helwesteke por jêkirinê. Di kongreyê de rêveberiya jin hemû tên girtin, hin rêveberî li derve dimînin ku ger rewşek biqewime, li hemberî wê helwesta me wê çi be, çareser bikin. Ez li vir baş nizanim hevala Şîlan Kobanê beşdarî kongreyê bû yan na, lê paşê ew jî tê girtin. Ez bawer im 3 meh li Qeletûka tê girtin. Ferhat wiha dibêje: “Hevala Şîlan hêza jin a derve provoke dike.” Li ser van esasan hevala Şîlan digire. Dîsa ji derve jî kî quwetên jin beralî bike, kî Ferhat wana rexne bike, digire. Pir hevalên jin wisa jî tên girtin. Dîsa hevala Yildiz Erzîncan hebû, demekê li televîzyonê mabû, piştî kongreyê tê girtin û paşê li Botanê şehîd dikeve. Li derveyî delegeyên Kongreyê jî wisa girtin hene, yanî helwesteke wisa hevbeş jî heye. 19 heval li wir dikevin lêpirsînê û piştre ragihandina Kongreya 7. dikin.

Di nav quwet de van kesên hatine hilbijartin nayên qebûlkirin. Rêveberiya me helwestek bi vî rengî diyar dike: “Hûn kî ne ku hûn hatine hilbijartin? Rêveberên me yên esasî helwest danîne û niha di lêpirsînê de ne.” Her wisa di navbera hevalên jin de nîqaş derdikevin. Bi awayekî vekirî ragihandina Kongreya 7. gumanên pir cidî çêdike. Di vir de behsa wekaleta Serok tê kirin, lê pir nakeve pê. Bi vî rengî zextek li ser hevalên jin çêdibe. Dîsa di vê Kongreyê de zêdetir meylên tesfiyekar ên jin derdikevin pêş. Ji wana re dibêjin, “rêveberî hatiye girtin, wê hevalên jin rapor binivîsin û wana berdin, ne tiştek pir cidî ye.” Bi vî awayî dixwazin pêşiya bertekan bigirin. Vê demê xeta hevkariya çete xwestin vê helwesta hevalên jin ji bo xwe bişixulînin. Berê jî me got di qada Şehîd Ayhan de hinek valatî heye, dixwazin ji bo xwe bi kar bînin.

Heman demê têkiliya Hêlîn, Sakîne bi wan re heye. Lê belê Tevgera Jin têkiliya xwe bi van kesan re nîn e. Ev jî dibêjin, “li hemberî jin neheqî çêbûye”, dixwazin li ser vî esasî xwe birêxistin bikin. Yanî wekî helwesteke hevbeş, lê helwestên me dibin zemîn ku ji jinên cuda re tê şixulandin. Dibe ku van kesan xwestin xebatên jin bi zanebûn jî bikin hedef. Niha Dr. Silêman hereketa jin biparêze! Berevajî wê bike hedef. Zilam bi xwe tecawuzcî ye, vê carê xeta ku ferz dike diyar e. Ji şer re, ji jiyanê re nêzîkbûna xwe diyar e. Hereketa jin rast e, tiştên şaş li hemberî wan tê kirin, Konsey rexne dike û dibêje şaş e. Lazime wisa nebe.

Ya rastî jin vê pêvajoyê ji bo xwe çawa dinirxîne? Çawa digire dest? Ev pir zêde dernakeve holê. Tenê tiştê tê gotin, “em ne tesfiyekar in”, hinek jî dibêjin “na, hûn tesfiyekar in”. Mixabin dahûrandineke xurt çênabe. Di aliyê din de raporeke lêpirsînê heye, di wir de jî dibêjin “jin tesfiyekar e”, jin jî dibêje “ez ne tesfiyekar im”. Em bêjin hundirê xwe zelal bike, nêzîkbûnên li hemberî xwe çêdibe baş dahûrandin bike û zelal bike, helwest li hemberî wê pir dernakevin hole. Ev jî bi xwe re şîlobûn û tengasiyekê pêş dixe. Bêguman li hemberî Tevgera Azadiya Jinê dizivire bertekan. Kesên ku di lêpirsînê de ne jî bi gotina “heta niha me ked da, me Tevger meşand, em xwedî helwest bûn; vê carê hûn diçin kongreyekê me tesfiyekar îlan dikin, hûn li ser vê kedê rûdinin” vê carê wana jî hesab xwestin. Li aliyê din çi derdikeve holê? Nirxên Hereketa Jin dibin mijara nîqaşê. Vê carê xwe înkarkirin derdikeve holê; *heta niha tiştên me kir tevahî şaş bûn*. Dîsa feraset û meylên ezezî rû didin. Hinek jî dixwazin desthilata xwe bidin rûniştandin. Ya rastî ev pêvajoyeke ku em yekîtiya jin xurt bikin, lê di şûna wê de di nav quwetê jin de perçebûn çêbû, di sekin de nezelalî, tevlîhevî, rojane jiyîn derdikeve, her wiha nêzîkatiyên dev ji xwe bardan derketin pêş. Em ê di pêş de jî bandorên vana bibînin.

## Dı Pêvajoya Partîbûnê De Nakokıyên Navxweyî Û Xwedîderketına Lı Xeta Azadıyê

Piştî Kongreya PKK'ê ya Heftemîn, Kongreya Partiya Azadiya Jinê ya 3. di navbera dîroka 29'ê Tîrmehê û 21'ê Tebaxa 2000'an de tê lidarxistin. 164 delegeyên jin tevlî vê kongreyê dibin. Me wekî Tevger ev kongre red nekiriye. Tiştên rast çi bûn, tiştên şaş çi bûn, ev ji nav hev derxistin girîng e. Kongreyeke pêwîst bû, ji ber perspektîfên Serok jî ji bo vê kongreyê hebûn. Di vê kongreyê de nêzîkbûnên şaş çi bûn, pêwîste mirov vê jî binirxîne.

Yek tiştê ku nahêle em dîroka xwe ya jin rast binivîsin, ev meseleya Kongreya Jin a 3. e. Ji ber cuda destgirtinek heye. Mînak; hevalên xort ji bo vê kongreyê dibêjin: Yek, ên berê jixwe Serok çêkiribûn; dudu, agahiya we jê tune bû û hûn jixwe tesfiyekar bûn; ya sisê, hûn ketin xeta rêxistinê; ya çarê, piştî hevala Gulan şehîd dikeve, dibêjin 'jixwe ev kongreyekî vala bû, ne pêwîst bû' û hwd. tiştên wisa bi zanebûn pêş dixistin. "Berê hûn tesfiyekar bûn, hûn di kongreya sêyemîn de êdî zelal bûn, hûn hatin xeta partiyê." Nirxandinên wisa ji aliyê hevalên xort ve hebûn. Di quwetê me yê jin de jî hinek nêrînên cuda hebûn û digotin rast bû, hinek kes ketin xetê. Ez bawer im ev nîqaşên di dîroka jin de hinek nîqaşên cuda cuda derdixin holê. Herî dawî hinekê zelalî çêdibe, lê kesayet îqna nabin. Ew jî di pêşerojê de dikarin îqna bibin. Ew nabe sedem ku em nikaribin dîroka xwe rast binirxînin. Lê ew ne kongreyeke ku me qebûl nekiriye jî, kongreyeke me qebûl kiriye. Ji bo wê jî pêwîste em rast binirxînin. Ez ê li ser vê kongreyê hinekê bisekinim.

Destpêkê perspektîfên Serok ji bo vê kongreyê hene. Em wê bixwînin. Di vê kongreyê de Serok dixwaze çi were nîqaşkirin di notên hevdîtinê de perspektîfê wê dida. Hinek nirxandin ji bo kongreyê hatin kirin, Serok jî wisa dinirxîne:

*"Serkeftina demokrasiyê wê jin bîne. Ev dikare bibe dirûşmeyek. Xebatên aştiyê ji şer hîn girîngtir in. Ji dayîkên aştiyê re, ji*

*dayîkên şehîdan re silavên min bêjin. Bila bi hemû hêza xwe tevlî xebatên aştiyê bibin. Bi wesîleya rojê mirov dikare vê bibêje. Eger jin hêza ku bi awayek serbixwe bimeşe raber bike, ev baş e. EZ NEFRETÊ JI JINA KOLE DIKIM. Ew bi xwe wê azadiyê diyar bikin, sînorên azadiyê wê ew bi xwe diyar bikin. LÊ AZADÎ ZEHMET E, xeter e. Li gorî min azadî ji her tiştî birûmetir e. Ez dibêjim ku, ez dildarê azadiyê me. Ez her tim li ser têkoşîna jinê kûr dibim û ji vê têkoşînê hez dikim. Ji bo quwetê jin ez dikarim vana bibêjim. Divê hemleyên azadiyê bên pêşxistin. Ez dikarim vekim. Di vê der barê de lêhûrbûna min heye. Li gorî min, di asta kesayeta rast de wê guhertinên bingehîn bijîn. Bila netirsin. Wê pêvajoya wêjeyê pêş bixin. Ez hêvî dikim ku perwerde, guhertin û pêşketinên xwe yên ruhî, fizîkî, îdeolojîk bidomînin. Eger pêwîst bike dikarin 10-20 salan xwe bikêşin înzivayê û xwe azad bikin. Pêwîste kesayetên xwe biafirînin û xwe bigihînin. Bi awayek cuda mirov nikare ji koletiyê rizgar bibe. Eger hewldaneke mezin çêbibe, wê mezin bi ser bixin. Xwe birêxistinkirina jinan yek ji hêviya min a herî mezin e. Di rastiya dîrok û civaka vê erdnîgariyê de esas destpêkê xwedawendî heye, di roja me ya îro ya pêşketî de jî bi temamî hatiye jibîrkirin, ji xistina mezelê xirabtir anîne serê wê. Ev rewşa ku jin xistine nav de ji bo min her dem bûye pirsgirêkek bingehîn. Ji bo vê min dest bi têkoşîneke azadiyê ya mezin kir. Li ser vê bingehê hevdîtina bi jinê re hatiye pêkanîn. Bi qasî aliyê hestan, yekîtiya îradî jî hatiye bidestxistin. Ez bawer im wê pêşketinên xwe yên di warê fikir, hest û fizîkê de kûrtir bikin û bidomînin. Ez vê baweriya xwe diparêzim. Ev, ji her tiştî hêjatir e. Ez birêxistinbûna wana ya nû wekî akademiyeke azadiya jinê dibînim. Yek jî, parêzer dibêjin van rojên pêşiya me PJKK wê kongreya xwe li dar bixe. PJKK gihaye asta hêzeke kesayet qezenc kirî? Ev gav hinek nûbûnan di nav xwe de dihewîne? Ez bawer im ev di warê kesan de girîng e. Ez jî li vir lêhûrbûn dikim. Ez di aliyê jinê de jî lêhûrbûn dikim. Ji aliyên ku min pêş xistîn zêdetir, herhal pêwîste vê lêhûrbûnê kûr bikin. Kongre gelo di ferqa pêşketineke demokratîk, bi tenduristî de ye? Li gorî min, ev ji nakokiya siyasî ya teng,*

*heta ji nakokiya sinifê girîngtir e. Ev nakokiya însan a herî bingehîn e. Ji bo demokrasî, civak bi tenduristî pêş bikevin, esas ji bo aştî hîn bi tenduristî pêş bikeve, ev pir girîng e. Li ser vê nakokiyê re projeyeke çareseriyê pêwîst dike. Pêwîste bi tenduristî pêş bikeve. Heya niha rast û durist bi ser nexistina vê, ji feraseta femînîst an jî ji teqlîdkirina zilam a qaba çavkaniya xwe girtiye. Fedakarî pêwîst e, xebat pêwîst e. Pêwîste mirov hîmaya zilam qebûl neke. Pêwîste hûn serbixwe, bi prensîb nêzîk bibin. Ji tiştên kevneşopî yên desthilatdariya zilam zêdetir, pêşketinên wan ên ruhî û fizîkî girîng in. Ji bo jinê ev tiştê herî bingehîn e. Ji zewacê re dibêjin 'koletiya herî kûr', pêwîste jin ji vê rizgar bibe. Bi vî awayî dibe ku têkiliyên bi malbata klasîk a berê re winda bikin. Kongre gaveke girîng û bi xêr e. Divê xurt bikin û encam bigirin. Berî niha jî hinek nirxandinên min çêbibûn. Ez ê ji bo kongreyê peyamekê bidim. Ji bo huner, wêjeyê di dema pêş de ez ê nirxandinekê bikim. Wextê me kêm ma, di vê mijarê de jixwe ez pêşnûmeyek kin amade dikim. Feqet niha wê negihe. Hefteya pêş me, em vê mijarê bigirin dest. Ez yek-du hevokan bibêjim. Ez alîgir im ku radîkalî were domandin. Hinek lêhûrbûnên min hene. Bila pir hay ji xwe hebin. Lê ez vê bibêjim. Afirandina jina azad, ji welatekî û ji serxwebûnê hîn girîngtir e. Erê, ez jî dixwazim di vî alî de nirxandinan bikim. Hefteya bihurî wext nemabû. Navê partiyê, navê yekîtiyê, kîjan ji vana guncav be bila ew be, lê bila ew bi xwe biryara vê bidin. Ya girîng, rexneya li jina di Sosyalîzma Reel de, rexneya li jina di sîstema kapîtalîst lîberal de baş danin. Divê dîroka koletiya jinê, pêşketina civaka bi desthilatdariya zilam bê destgirtin. Divê bi awayek kin dîrok û pêşketina wê bê lêkolînkirin. Heman tişt wê ji bo tevgera jin jî bibe. Divê dîroka tevgera jinê bê lêkolînkirin. Divê têkiliya vê ya bi hincetên civakî re bê lêkolînkirin. Di nav rastiya me ya civakî de cihê jinê çi ye? Nêzîkatiya ji jinê re divê hîn kûr be. Divê mirov rastiya jin a objektîf bîne ziman. Tevgereke jinê çima heye? Ev ne tevgereke cinsiyetê ye. Encex zext, çêbûna çînan û cudakariya li ser cins çima pêş dikeve? Divê vana bi awayek objektîf bên lêkolînkirin. Ev pirsgirêk tenê ne pirsgirêka*

*jinê ye, ev pirsgirêka zilam e jî. Piştî vê re divê bernameyeke rizgariya jinê û azadiya jinê bê derxistin. Ji bo navê wê, bila bibêjin pirsgirêkên azadiya jinê divê çawa bên çareserkirin. Ez azadiya jinê girîng dibînim. Ez di vê mijarê de wekî berê nafikirim. Ev bername û terzê tevgerînê girîng e. Ev tevgereke ku, pêwîste li hemberî kêm dîtin û kedxwariya li ser jinan bê pêşxistin. Ev pirsgirêka tevgera demokratîk e. Ev, bi sekna tevgera demokratîk a hundirê huqûqê ve girêdayî ye. Di dema pêş me de bernameya rizgariya jinê û terzê birêxistinbûna tevgerê girîng e. Ev jî, terzê tevgera demokratîk e. Terzê tevgera demokratîk a jinê, terzê aştiyê ye. Çareserî ji hembêza wê derdikeve. Bila li zarokan, extiyaran û kesên bêxwedî yên di rewşeke zehmet de ne, xwedî derkevin. Divê tevgera jin a komara demokratîk bê afirandin. Ji bo civaka demokratîk, destûra demokratîk, ji bo demokrasiyê azadî, rêxistin û çalakî girîng e. Bi van çalakiyên xwe wê bibêjin, temînata tevgera azadiyê em in. Heta derfet heye pêwîste ji atmosfera şîdetê dûr bikevin. Divê çalakiyên întiharê nebin. Bi êş e. Me pir êş kişandin. Ez çalakiyên wisa hem di warê exlaqî de, hem jî di warê siyasî de rast nabînim. Li şûna vê, divê çalakiyên heq xwestina demokratîk pêş bixin. Ji bo tevgera demokratîk pêş bikeve û mayînde bibe, divê xwe bi terzek demokratîk û legal pêş bixin û bigihînin. Di mijara ziman, çand, huner, demokrasiyê de pêwîste xwe pir mezin perwerde bikin, pêş bixin. Divê van hemûyan ji bo bersiv bidin van pirsan bikin; em bi zilam re têkiliyek çawa, cîhanek çawa, jîngehek çawa, aboriyek çawa, avahiyeke malbatê ya çawa, jinek çawa dixwazin? Tiştên min gotîn, hûn dikarin wisa bigihînin wana. Tiştên ku min berî niha jî gotine, hene. Bila wana jî bînin cem hev. Ez bawer im mirov dikare vê wekî nirxandineke giştî amade bike. Li ser vê bingehê ez hêvî dikim ku bi ser bixin. Ez hezkirin û rêzdariyên xwe pêşkêş dikim.”*

Pêwîst dike em hinek rewşên giştî jî binirxînin. Ji derve jî hinek êrîş hene. Di destpêka sala 2000’î de hêzên wekî YNK û PDK’ê digotin, “Serokê we jî çû, êdî pêwîste hûn serokekî xwe yê nû

derxin.” Di derve de nêzîkbûnên bi vî awayî hebûn. Her wiha destpêka salên 2000’î pêvajoya Kongreya 7. e. Dîsa di Çileya wê salê de li Garê operasyonek çêdibe. Di vê operasyonê de hinek heval şehîd dikevin, di nav wana de hevala Zeynep Pazarcik û Bêrîvan Dêrsim jî hene. Hevala Bêrîvan Dêrsim li saha Serokatî mabû. Di vê operasyonê de PDK piştgiriyê dide artêşa Tirk û artêşa Tirk bi teknîka xwe êrîş dike. Ev operasyoneke hevbeş e û armanca vê operasyonê, Tevgerê mijûl bikin û tawîzan ji Tevgerê bigirin. Yek jî, dema Kongreya PJKK’ê çêbû, wê demê Îranê jî nêzîkatiyek raber kir. Îran ferq dike ku di nav Tevgerê de nakokî hene. Îran ji rêveberiya Tevgera Jin re peyamekê dişîne û dibêje, “Deriyê me ji we re vekiriye. Eger hûn tengav dibin, hûn dikarin werin cem me.” Vê peyamê ji Tevgera Jin re rêdikin. Piştre jî ev pir hat şixulandin. Peyman di Konseyê de cih digirt û wekî berpirsiyara Tevgera Jin dihat dîtin. Hat gotin, “Îranê bangewazî ji Peyman re rêkiriye ku were.” Nêzîkatiyên bi vî awayî di aliyê dijmin de hene.

Di hundir de jî di aliyê jin de hinek nirxên xwe înkarkirin çêbû. Li hemberî têkoşînê jin wisa lewaz ket, dîroka xwe hemû bi lanet didît. Êdî helwestên bi vî awayî çêbûn. Lê vê demê bi giştî di nav Tevgerê de pirsgirêk hebûn. Xebatên me yên artêşê tên nîqaşkirin, ji çanda gerîlatiyê dûrketin çêdibe. Grûba Botan van helwestan bi zanebûn pêş dixin. Ji ber vê di gelek hevalan de ev nêzîkbûn pêş ket. Rexmê ku bi salane di şer de pijiya ye, di şer de mezin bûye, asteke xwe ya pêşketî heye, lê xwe tune dihesibîne. Çima wisa dihat dîtin? Kî çeka wî li ser milê wî bûya, digotin “ev paşverû ye, ev neketiye pêvajoyê”. Nêzîkatiyeke wekî şer xilas bû, ji bo wê jî hinek hevalan xwe paşde dîtin. Di rastiyê de meylên burjûvayê biçûk û teqlîdkirina burjûvaziya biçûk pêş ketin. Di Tevgerê de ji çanda gerîlatiyê dûrketin çêbû û heval ji şer dûr ketin. Vê rewşê manewiyata me ya rêxistinî kêm dikir. Gelek kadroyên kevin ketin bin bandora psîkolojiya “êdî karê me di vê rêxîstinê de nema, êdî em ê çi bikin!?” Vê jî di kadroyên kevin de

şikandin çêkir. Her wiha quwetê fedaiyan ê ku piştî Kongreya Şeşemîn hatibû sazkirin jî di destê Ferhat û Sakîne de bû. Li wir jî dixwestin xeta fedaîtiyê şîlo bikin. Qaşo ev pêkhate bi navê fedaîtiyê kom bûye, lê ferasetên di vir de ava kirin cuda bûn. Niha ev mijarên stratejîk in. Tevger bi çiyê xwe heye? Bi xeta xwe ya fedaî heye. Vana xwestin bi vê xetê re bilîzin. Piştî Kongreya 7'an jixwe ev pêkhateya fedaiyan hat belavkirin. Bi kurtahî Ferhat li Zelê xwestibe çi bike, heman tiştê dixwaze di pêkhateya fedaiyan de jî pêk bîne. Sakîne jî, çawa Newal jin pêşkêşî grûba Zekî dikir, heman tişt li ser pêkhateya fedaiyan vê carê ji bo Ferhat dike. Ev nêzîkatî bi ruhê PKK'ê lîstine. Bi giştî van grûban dixwazin çi bikin? Yek, li wir dixwazin bi xeta fedaîtiyê bilîzin. Du, yê ku me li ser piyan digire ku çanda me ya gerîlatiyê ye, ew dixwazin wê ji holê rakin. Ev çandeke ku di şer de pêk hatiye, heta niha jî em bi wê hene. Gerîlatî nebe, em wekî Tevger nîn in. Taybet jî, ji bo jin ev mijareke pir stratejîk e. Ji bo Tevgerê giştî jî wisa ye. Di mijarên jin de ger artêşbûna jinê nebûya, jinan nikaribûn bibin rêxistin. Jin nedibûn rêhevalên hev û jin nedigihan gel hev. Eger kesek vê çandê bêwate bike, êdî rêxistina jinê jî tesfiye dike.

Di vê atmosferê de em çûn Kongreya PJA ya Sêyemîn. Di dema çûyîna Kongreya 3. de hinek tirs jî hene. Grûba Dr. Silêman reviya ye, rewş pir aloz e, li ser Tevgera Jin zextek heye. Metirsiya Tevgera Jin ew e ku, xwe hinek komî ser hev bike û nebe amûrê destê tu kesî. Tevgera Jinê dixwaze rêxistinê biparêze, lê di wê atmosferê de wekî tesfiyekaran jî tê sûcdarkirin. Vê zextê jî di wê demê de em bi zilam re birin lihevkirinê. Di Kongreya 3. de ev rewşa heyî, pêwîste em wekî lewazbûneke xwe binirxînin.

Dîsa di nav Tevgera Jinê de jî hinek nakokî hene. Rêveberên ku di Kongreya 7. de nehatine erkdarkirin ji aliyê pir hevalan ve hîna wekî rêveberiya Hereketa Jin têne dîtin. Ji ber ku di vê kongreyê de 19 jin hatine girtin û ji vana hinek beş bi beş platformên wan çêdibin. Heta Kongreya 3. jî 6 jin tenê girtî dimînin. Heman demê rêveberên derveyî van hevalên girtî hatine erkdarkirin, ji aliyê

qismek hevalan ve wekî hevkarên zilam tên dîtin. Heval vana wisa dinirxînin: “Vana hevkarên zilam in, lê niha rêveber in.” Ji ber vê yekê jî li hemberî vê rêveberiyê bêbawerî heye. Beşek heval jî li hemberî vê rêveberiya di lêpirsînê de bertek nîşan dide û lanetê li wan tîne. Ev hevalên xwedî bertek bi rasteqîn li dîroka Tevgera Jinê xwedî dernakevin û aîdê xwe nabînin. Hemû tiştan di şexsê van hevalan de kom dikin û lanetê lê tînin. Li hemberî Tevgera Jinê aciz dibin û xwe înkar dikin. Bi riya van hevalan re jî wê demê hinek argumanên îdeolojîk ku zelaliyek tê de heye, tên mehkûmkirin. Argumanên wekî “*teoriya qutbûnê”*, “*hevkarî”* wekî ku wan kesan pêş xistine û wana gotiye dinirxînin. Têgeh jî ji aliyê jin ve wek bilanet tê dîtin. Bi van nêzîkatiyan jin jî bi dîroka xwe re dikeve nakokiyê. Hinek jin bi zilam re vekirî ketin îtifaqê. Tê bîra min, di Kongreya 3. de hinek mijar hatin nîqaşkirin. Wê demê grûba Nefel jî beşdarî kongreyê bûn. Digotin, “Nefel çûye ku derê, kî dîtiye?” Tê fêmkirin ku van grûban eşkere îtifaqan pêş dixin, hinek jin jî çûn, ketin xeta zilam. Di bingeh de zilam jî bi vê riyê dixwaze nakokiyên hundirîn kûr bike. Hinek jinan dikişîne aliyê xwe, hinekan jî li derveyî xwe dihêle. Ji ber heman polîtîka piştre li ser hevalên di lêpirsînê de hat meşandin. Ev 6 kesên li dawiyê man, bi taybet dibin armanca van polîtîkayan. Min bi xwe jî dît. Grûba Botan, ew şeş kes carina dianîn civînên me, di bin navê “ez ê we bibim seyranê” de me dibir Kelaşînê. Em sê tabûr bûn, em ê biçin seyranê û ew hevalên jin jî di lêpirsînê de ne, wana jî didan pey xwe û dianîn. Îca li ser wan teserûf pêş dixistin. Ji bo wê jî hinek ji wan girtiyan bi grûba Botan wana re îtifaq pêş xistin. Beşek ji wana jî li hemberî wan disekinîn. Kongre di rewşek wisa de çêbû.

Biryar derketibû ku ev hevalên lêpirsîna wana qediyane beşdarî kongreyê bibin. Komîteya amadekar a Kongreya Sêyemîn diçe, bi hinek hevalan re jî diaxive. Dibêjin xwe amade bikin, hûn ê tevlî xebatên kongreyê bibin, lê roja ku wê kongre destpê bike, dibêjin na, hûn tevlî nabin. Di rastiyê de zilam mudaxele dike û

dibêje, “wana beşdarî kongreyê nekin.” Ji ber ku dibêjin ew hevalên tevlî kongreyê bibin wê bandora xwe li ser kongreyê çêbikin. Zilam mudaxele dike û dibêje, “Hûn wana tevlî kongreyê bikin, wê kongre di bin siya wana de derbas bibe, wê li ser kongreyê bandor bikin. Ji bo wê jî bila beşdar nebin.” Wisa beşdarbûna van hevalan tê rawestandin.

Di kongreyê de wekî rojevekê, rapora meclîsê pêşkêş dikin. Li ser vê raporê xebatên hatine kirin tên nirxandin. Lê beriya rapora meclîsê were pêşkêşkirin, rapora ku komîsyona lêpirsînê amade kiriye, tê xwendin. Di vê rapora komîsyona lêpirsînê de Tevgera Jinê wekî *xeta tesfiyeger* tê binavkirin. Argumanên me yên esasî tên mehkûmkirin û şaşîtî di wir de. Pêşkêşkirina vê raporê di aliyê sîstema xebitînê (işleyiş) de jî şaş e. Rapora lêpirsînê çima di destpêkê de tê xwendin? Li gorî awayê xebitînê pêwîste rapora navendê bê xwendin. Bi rastî jî ev rapor bi hevalên xort re hatiye nîqaşkirin û wisa hatiye amadekirin. Ji ber ku hinek tespîtên hevpar di rapora navendê de jî hene. Rapora navendê, hevalan çûne di konseyê de xwendine. Konseyê jî nêrînên xwe gotiye, wisa pêşkêşî kongreyê dikin. Ji bo wê jî mirov dikare bêje ev kongreyeke ku hevalên xort xwestine birêve bibin. Mînak; hinek hevalên xort beşdarî kongreyê nebûn, lê dema kongre xilas bû hevalê Karasu hat. Me jê re merasîmek çêkir û gotin, “Em we pîroz dikin, we bi ser xist.” Wekî bêjin hûn heta niha tesfiyekar bûn, êdî we xwe ji xeta tesfiyekar xilas kir. Atmosfereke bi vî awayî hebû.

Rojeva din a di kongreyê de bi giranî bandor kir, ev bû: “Pêvajoyeke pir giran hatiye jiyîn, pêwîst dike em hemû bi rexnedan nêz bibin.” Lê tê rexneya xwe li ser çi esasî bidî, ev zelal nîn e. Rexnedan bi înkarkirina xwe nabe. Rexnedan li ser çarçoveya ku zilam diyar dike, nabe. We demê perspektîfên Rêbertî jî hene. Serok dibêje, “*Hûn ji min xetertir di nav çarmixekê de ne.*” Rexmê wê jî digot, avakirina jina azad ji bo min ji serxwebûnê girîngtir e. Her wiha Serok dibêje, “*Ez alîgir im ku hûn bi radîkalî li pey wê biçin.*” Serokatî vê riyê dide pêşiya me, lê me di vê kongreyê de

ev rê winda kir. Radîkalbûn xetek e, hevkariya zilam xeteke dijber e. Eger em ê rexneyeke xwe bidin, pêwîst dike em di vir de bidin. Her wiha pêwîste mirov rêxistinê biparêze. Em di xetê de rast tevnagerin, rastî ev e. Di kongreyê de mirov tiştê bi giranî bigire dest, ev in.

Xisûseke din, di rapora Navenda Partiyê de tê gotin, "Rêveberî zilam tê dîtin, li hemberî rêveberiyê têkoşîn tê kirin, lazime wisa nebe. Serdestiya zilam esas sîstemek e, pêwîste jin li hemberî sîstemê zilam a serdest têkoşîn bike, lê pêwîste vê têkoşîna xwe di şexsê zilamê nava partiyê de nede meşandin." Niha ev tê çi wateyê? Ev tê wê wateyê ku di têkoşîna cins de xeyalîkirin heye. Rastiyeke şênber heye, lê ev feraset dihêle têkoşîna te ya cins şîlo bibe. Vana xetên îdeolojîk in. Niha em li hemberî desthilatdariya zilam şer dikin. Wê zilam serdestiya xwe li ku nîşan bide? Gelo di civaka heyî de pergala zilamsalarî xwe di ku derê de birêxistin dike? Di malbatê de xwe birêxistin dike, di kesayetan de xwe birêxistin dike. Gelo em têkoşîna cins li derveyî xwe bigirin dest, wê têkoşîn bêwate nebe? Dibêjin, "pêwîste em bi vî awayî negirin dest." Wê demê ev çi ye, tê çi wateyê? Ev tê wê wateyê ku serdestiya zilam hedefeke ji me dûr e. Jixwe em bi dijmin re şer dikin, nakokiyeke me ya netewî heye, lê nakokiya cins bi kîjan ferasetan re rû bi rû ye? Serdestiya zilam tê li ku derê şênber bikî? Di encamê de ev tiştên me pirs kirin û anîn ziman, ji aliyê ferasetên derketine ve wekî mijarên sûnî tên binavkirin. Eger tu bi zilam re şer bikî, ev nabe nakokiya cins, ev dibe nakokiya sûnî. Tevlîheviyeke bi vî awayî di vê rewşê de derdikeve holê û kongre jî vê ferasetê dike biryar. Ew nakokiyên ku di zilam de hene wekî sûnî bi nav dike. Eger nakokiyên heyî sûnî bin, tê têkoşîna cins li hemberî kî bimeşînî? Wê demê tê wê wateyê zilam azad bûye û li pêşiya jin jî tu astengiyê dernaxe. Jin jî dibêje, wê demê ez hatime vê Tevgerê, ez jî azad im. Di encamê de wê çaxê em ê bi çi re têkoşînê bimeşînin? Dîsa teoriya qutbûnê jî tê mehkûmkirin. Dibêjin, "qutbûn rast e, lê Serok negotiye xwe bi fizîkî qut bikin."

Ev feraset di rapora navendê de jî heye. Dibêjin, "jixwe zilamên di nav partiyê de pergal red kirin û li dijî wê şer kirin; ji ber vê yekê jî li derveyî pergalê ye. Ji bo wê qutbûn ne pêwîst e. Şerê cinsî di nav partiyê de nabe, pêwîste em bikevin nav vê pergalê û em wisa têkoşîna cinsî bimeşînin."

Serokatî teoriya qutbûnê ji bo demekê pêş nexist. Lê şîroveyek wisa derket pêş: "Ev teorî ji bo jin bi hêza xwe bihese û têkeve ferqa îradeya xwe hat pêşxistin, lê êdî ev pêvajo derbas bû." Wê demê em li hemberî vê pergalê di derveyî xwe de têkoşîn bidin. Lê pêwîste êdî em bikevin nav sîstemê. Nexwe Tevgera Jin ji bo vê jî amade nîn e. Hîn negiştiye wê astê ku di nav pergalê de têkoşîn bide. Jin bikeve nav pergalê, wê jê bandor bibe. Ev nêzîkatiya zilaman ji bo jinê ye. Ji ber van sedeman Serokatî ji bo jinê dibêje: "*Xwe 10 salan, 20 salan bikişînin înzivayê û lêhûrbûn bikin. Ji bo azadiyê ev pêwîst e.*" Her wiha dîsa Serokatî got: "*ber-dana bêdawî*". Ev ji zilam bi her awayî qutbûn e. Êdî tu pergala xwe ya xweser ava dikî. Di vê kongreyê de ev mijar cuda hat destgirtin. Sekina Sakîne, sekina Hêlîn pêwîst dikir tu darizînî. Ev sekin jî hat destgirtin. Di encamê de van kesayetan burjûvaziya biçûk a lîberalîzmê li ser rêxistinê ferz dikin. Van nirxandinan baş in, lê tu di şexsê wana de argumanên xwe yên îdeolojîk hemûyan mehkûm bikî, ev şaş e. Di Kongreya 3. de tiştê şaş mirov bigire dest, bi giştî ev in.

Xisûseke din, jixwe biryarên Kongreya 7. jî ji aliyê Konseya Rêveber ve tên erêkirin. Lê wekî Tevgera Jin di Kongreya 7. de hinek biryarên ku jin tevlî nebibû jî hebûn, ew jî di Kongreya 3. de hatin erêkirin. Yek ji van biryaran jî mijara wekaleta Serok bû. Jin di vê pêvajoyê de ev biryar jî erê kir. Der barê vê pêvajoyê de mirov tiştê bi giştî bêje û encamekê derbixe ev e: Tevgera jin ku li hemberî ferasetên şaş berxwedanî dikir, lê zivirî û pê re bû yek. Ango tiştê tu li dijî sekinî, vê carê bi wê re dibî yek. Bi rastî jî piştre vê pêvajoyê bi Tevgera Jin da windakirin.

Biryarên di vê kongreyê de bi perspektîfên Serok hatin girtin, ev in: Partî êdi bi navê Partiya Jina Azad (PJA) hat birêxistinkirin. Serok, ji bo PJA perspektîfên pir berfireh da. Serok digot, partî ji gelek beşên civakê û pêvajoya demokratîkbûnê re dikare pêşengiyê bike. Sedema guhartina navê PJKK wisa diyar kir. PJKK hem navê çînekê ye, hem jî partiyeke Kurdistanî ye. Ji bo wê çarçove û hedefên PJA'yê hîn firehtir in. Biryareke din, avakirina Weqfa Jinên Cîhanî ye. Lê ev biryar pêk nehat. Ji ber ku Serok digot pêwîste hûn li zarok û jinan xwedîtiyê bikin. Her wiha li vir Projeya Jiyana Azad wekî projeyekê hat binavkirin û biryarkirin. Dîsa Projeya Guhertina Zilam di vê kongreyê de bû biryar. Her wiha yek biryara vê kongreyê, partî xwe di qadên civakî de jî birêxistin bike û fireh bike. Ji ber ku xebata ERNK'ê di Kongreya 7. de hatibû betalkirin, pêwîste PJA xwe di nava gel de birêxistin bike. Di vê kongreyê de biryarên ku Kongreya 7'an ji bo Tevgera Jin erê kiribûn û hinek tiştên ku pê re dijber bûn, ew ji nedîtî ve hatin, şaşîtiyek e. Şaşîtiya duduyan, heta niha tiştên me li hemberî wê têkoşîn dida, vê carê jî em bi xwe re rû bi rû man, em lê zivirîn. Şaşîtiyên ku em dijber bûn, em pê re bûn yek. Her wiha argumanên me yên îdeolojîk wateyên xwe hinek winda dikin. Der barê vê nediyariyê de, eger di stratejiya têkoşînê de muxlaqî hebe, di pêşerojê de wê Tevger tengav bibe û wisa jî çêbû. Ji ber wê em pir tengav bûn, me zehmetî kişand. Heta niha hîn jî me xeteke rast negirtiye. Sedema wê, kêmasiyên me yên wê demê ne. Niha jî di meşandina têkoşîna cins de em ê çawa tevbigerin, xeta me zelal nîn e. Her dem hinek nêzîkbûnên me yên cur bi cur derdikevin. Niha jî bi hevalên xort re li cihekê pirsgirêkek derdikeve, xort dibêje, "çi ye hûn nakokiyên sûnî derdixin!" Dema wisa dibêje, êdî tu nikarî têkoşîneke rast bimeşînî, îca helwestên lihevkirinê derdikevin pêş. Di vê rewşê de em ê çawa bibin îrade, em ê çawa bibin rêxistin? Van mijaran ji bo me girîng in.

## Lı Hemberî Êrîşên Komploger Sekna Jın

Piştî vê pêvajoyê êdî YNK'ê nêzîkbûnên xwe hîn berbiçav kir.

Wekî rêxistin jixwe di hundir de tengasî hene, bi ser de jî êrîşên dijmin çêbûn. YNK'ê di meha Îlona sala 2000'î de bi armanca teslîm girtina PKK'ê êrîşî me kir. Pêngavek li beramberî me da destpêkirin. Wê demê grûba Dr. Silêman reviya bû, ji bo agahiyên der heqê me de gotibûn, "Di nav PKK'ê de nezelaliyek heye û gelek kes bêçek in. Eger hûn biçin ser, hûn ê PKK'ê teslîm bigirin." Bi vê êrîşê YNK'ê dixwest em jî wekî projeyeke navnetewî ji dewletan re vekirî bimînin. Dixwestin me ji hêz bixin û me li hinek deveran tesfiye bikin û Tevgera me bixin kontrola hêzên navnetewî.

Pevçûna destpêkê li Qeredaxê destpê kir. Li Qeredaxê wê demê kampên şervanên nû hene. YNK bi ser van kampan de digire. Di vê pevçûnê de beşek heval li ber xwe didin, mixabin beşek heval jî dikevin dest, her wisa şehadet çêdibin. Hevala Tanya şehîd dikeve. Ji vir û şûn de pêvajoke nû destpê dike. Ev pêvajo ji bo me wekî pêvajoya hebûn û tunebûnê ye. Ger Tevger di vî şerî de bi ser bixe, wê hebûna xwe di Rojhilata Navîn de misoger bike. Li ser Tevgerê lîstok zêde bûn. Bi rastî komployên mezin hebûn. Lê êdî me vê pêvajoyê zivirand pêngavekê û me li beramberî YNK'ê dest bi pêngavekê kir. Ev pêvajo heta sala 2001'ê berdewam kir. Di vî şerî de bi giştî 111 heval şehîd ketin. Qada Qendîlê di encama vî şerî de ket destê Tevgera me. Niha asayîşên me hene, riyên Qendîlê hemû di bin kontrola me de ne. Bi rastî jî ev hemle ji gelek aliyan ve baş bû. Ji ber ku komployên li ser Tevgerê hatin valaderxistin. Ev komploya heyî bi destê YNK'ê tê kirin, lê komployeke navnetewî ye. Wekî Tevger tu komployê vala derdixî û bandora xwe nîşan didî, ev gavek erênî bû.

Di encama vê pevçûnê de di nava me de jî kombûnek çêbû. Beriya YNK êrîşî me bike di nav Tevgerê de belavbûnek hebû, ji çanda gerîlatiyê dûrbûn çêbibû. Li hemberî Tevgerê bêbaweriyek hebû û şikandinek pêş ketibû. Di encamê de me bi vê pêngavê xwe komî ser hev kir. Ji bo Tevgerê pêvajoyek krîtîk e, lê xeta berxwedanê nahêle em têk biçin û em di vê pêngavê de gelek

destkeftiyan pêş dixin û li beramberê komployê bi ser dikevin.

Ji nav şehîdên vê pêngavê hevalên jin; hevala Êrîvan, Medya (quwetê fedaî bû), Sosin Gabar, Gulaber, Nejbîr, Perwîn, Berfîn, Dîcle şehîd dibin.

Piştî vê pêvajoyê, bi giştî hevalên jin jî xwe komî ser hev kirin. Yek, xebatên perwerdê û saziyên xwe çêkirin. Bi rêya xebatên perwerdê xwe birêxistin kirin. Du, koordînasyonên giştî yên pratîkê birêve bibin hatin sazkirin. Her wiha di xebatên leşkerî de jî hinek navend çêbûn û van navendên leşkerî jî hatin cudakirin. Ez vê jî bibêjim; beriya vê pêngavê, bi giştî Kongreya 3'yan atmosfera heyî li ser hevalên jin jî pir bandor kiribû. Mînak; piştî Kongreyê 3. vesazî çêbûn. Heval ji hev hatin cudakirin. Wek hevalên siyaset bikin cuda ne, hevalên leşkerî cuda ne. Xwendevan in, çînên burjûvaziya biçûk in, wana dikarin di xebatên siyasî de cih bigirin, ên ji bo van xebatan jî nebin hemû ji xebatên leşkerî re dibin, ferasetên wisa şaş derxistin pêş. Ango hinek hevalan qadên leşkerî wekî cihê surgûnê dîtin. Eger rêveberî ji hinekan aciz in, wana rêdikirin qadên leşkerî. Wê demê Dîcle Andok di navenda leşkerî de cihê xwe girt, ev kesên pir zêde nedihatin ecibandin bûn. Ji demekê şûn de xebatên leşkerî û siyasî di kokê de ji hev hatin qutkirin. Nêzîkbûnên wisa derketin: "Xebatên leşkerî cuda ne, PJA cuda ye." PJA, cihê rewşenbîran, cihê xebatên siyasî ye. Nêzîkbûneke bi vî awayî pêş dikeve, vê carê ji leşkerbûnê rev çêdibe, yan jî hinek kes dema ji leşkerbûnê dûr dikevin xwe ji bo qadên siyasî pêşniyar dikin. Rêveberî jî vê riyê vekirî dihêle, ji ber vê yekê qutbûna qadên leşkerî û siyasî kûrtir dibe.

Bi giştî di vê pêvajoyê de encamên em derxin, ev in: Li beramberê Komploya Navnetewî sekna me çi bû? Em xeta Serokatî çiqas dikarin biparêzin? Di vê pêvajoyê de me li beramberî komployê rastiya xwe dît. Dîsa dema Serok fiîlî ne amade be, em çiqas dikarin rêxistinê biparêzin? Di van milan de em bi xwe re rû bi rû man. Serokatî amade nebe, em ê vê Tevgerê çawa bimeşînin?

Her wiha dema em hebûna xwe pênase dikin, em ê xwe bispêrin kîjan argumanên îdeolojîk? Rast e, me pir nîqaş kiriye, lê xuya bû ku me pir mayînde nekiriye. Çima jin di vê pêvajoyê de bi hinek tiştên cuda re rû bi rû ma? Çima rêxistin bi pêkanînên cuda re rû bi rû tê, yan jî çima hinek nêzîkbûnên serdestiya zilam çêdibin? Niha hebûna jinê bi çi ava dibe? Eger têkoşîna cinsî nebe, hebûna jin jî nîn e. Jin, bi têkoşîna xwe ya li beramberî serdestiya zilam hebûna xwe ava dike, ev hebûna jinê ye. Di vê demê de me ev têkoşîn jî wekî sûnî bi nav kir, em ji têkoşînê dûr ketin. Eksena me ber bi çi ve çûbû, çawa şemitî? Pêwîst dikir em çawa xwedî sekneke radîkal bûna? Di vî milî de nirxandineke Serok heye, dibêje: "*Di rojên baş de tu baş bî, di rojên xirab de tu xirab bî ev ne azadî ye, ev koletî ye.*" Di demên bihurî de Serok amade bû, Tevger mezin dikir, wê demê em pir baş bûn. Vê carê Serok bi komployê dîl hat girtin, roj xirab bû, vê carê em jî xirab bûn. Ev tê wê wateyê tu bi hêza xwe ya cewherî, bi îradeya xwe li ser piyan namînî. Te sekna xwe bi hêza xwe ya cewherî ava nekiriye. Me vê rastiyê dît. Ji bo wê jî pozîsyona me ya koletiyê berdewam dike.

Di encamê de sala 2001'ê bû sala berxwedanê. Serokatî jî li Îmralî berxwedaniyek raber dikir. Her wiha em jî li hemberî êrîşên YNK'ê li ber xwe didin. Bi rastî vê pêvajoyê hinekê em anîn ser hişê xwe û em ketin ferqa pratîkên xwe. Ew nêzîkbûn û feraseta wekî "gerîlatî êdî pêwîst nake" ku derketibû, bi vê pêvajoyê re ew jî hat valaderxistin. Dîsa piştî vê pêvajoyê, pêvajoya paşvekişandinê jî hat temamkirin. Taybet ew hevalên ku xwedî helwest bûn û nexwestin werin, hatin kişandin. Hevalên jin jî hemû paşve hatin kişandin û li Başûr hatin komkirin. Dîsa di vê salê de bi ruhê berxwedana gerîla fiîlî derbasbûna qadên Bakur jî çêbû. Qadên Bakur vala bibûn, lê bi êrîşên YNK'ê re me dît ku li ser Tevgerê xeterî heye. Ev çûyîna Bakur bi însiyatîfa HPG'ê çêbû. Sala 2001'ê hinek grûp şandin Bakur, piştî wê sala 2002'yê dîsa grûp çûn Bakur. Wana bêhtir hevalên xort bûn. Di sala 2003'yê de êdî hevalên jin jî derbasî Bakur bûn. Heta wê salê jî di hinek hejmaran

de grûp nedişandin. Rêxistinê xwest pêşiya bicihbûna dijmin li Bakur bigire, piştî wê ji sala 2003'yê şûn de wekî pêngavekê em çûn Bakur. Tabî ev jî seknek bû.

Di vê salê de wekî encama lêpirsînê platformên hinek kesan (Sewra, Dilar, Peyman, Sakîne, hevala Pelşîn, Jiyan Denîz) çêbû. Piştî platformên wan êdî zelalbûn çêbû û pêvajoya ji hev qutbûnê temam bû. Her wiha di şexsê hinek kesan de lêgerînên tewazûnê (denge arayışı) çêbûn. Wekî Tevgera Jin me di mijara van kesan de pir şaşîtî kir. Nexwe platformên wana çêbûne, lêpirsîn xilas bûne, lê mixabin vesaziyên wana pir şaş çêbûn. Wê demê kê bi kî re têkiliya xwe hebe, di wê qadê de hat vesazkirin. Hinek şaşîtî di wir de bûn. Taybet jî vana di qadên Botan û Ferhat birêve dibirin de hatin vesazkirin. Wekî Tevgera Jin, me van jinan avêt ber devê wan û me hişt ku li ser van jinan biçin teserûfê. Gelo me nikarîbû nêzîkbûneke cuda raber bikira? Li şûna ku tu wan bavêjî zemînê wan, di zemîneke dîtir de bihêlî wê baştir neba? Nexwe hemû hevalên jin jî li Başûr kom bûne, ev jî derfeteke mezin e. Wê demê şer jî nîn e. Qada Başûr êdî em dikarin wekî qada perwerdê, qadeke xwe birêxistinkirinê binirxînin. Xuya ye tirsek heye ku, van jinan tu di nav Tevgera Jin de bi cih bikî, ew Tevgerê xira bikin. Li gorî wê demê dibe ku wisa were nirxandin, lê bi vê rêbazê jî tu van jinan tavêjî hembêza zilam. Jixwe zilam bi nêzîkbûnên xwe dixwaze jinan bi hev bide şerkirin. Mînak; Botan piştgiriya Dilar dike, Dilar derdixe pêş, lê di bin de jinê biçûk dibîne. Nêzîkbûnên bi vî awayî hebûn. Taybet jî di şexsê Ferhat û Botan de ev nêzîkbûn pir berçav derdiketin pêş. Lewre Ferhat û Botan bi van helwestan bingeha tesfiyekariyê amade dikirin. Eger van ferasetan di dema xwe de bihatan dahûrandin, dîsa jin nebûna wesîle, dibe ku pêvajoya 2003-2004'ê nehatiba jiyîn. Mixabin ev pêvajo baş nehat nirxandin. Ev rewş ne ji aliyê me ve, ne jî ji aliyê rêxistina me ve nehat nirxandin, tenê hat temaşekirin. Ji bilî wê jî rêxistinê pêşiya hinek kesên wekî Ferhat wana vekir.

Di vê pêvajoyê de tiştê em li ser bisekinin yek jî, pêkhateya fedaiyan e. Pêkhateya fedaiyan bi navê Hêzên Taybet dihat birêxistinkirin. Beşek hevalên jin jî li wir cih girtin. Yek jî, ev xebateke stratejîk e, lê zilam dixwest vê quwetê ji Tevgera Jin qut bike. Mînak; rêveberiya Tevgera Jin nikaribû nêzîkî fedaiyan bibe. Di rêziknameya fedaiyan de qedexe bû ku rêveberiya jin bi jinên fedaî re pêwendî çêbike. Ji pêkhateya fedaiyan yek kes berpirsiyar e, wê demê ew kes Botan bû. Piştî Botan, hevalê Cemal bû berpirsiyar. Hevalê Cemal, piştî êrîşên YNK'ê xwest giraniyê li ser Tevgerê çêbike. Di terzê Botan de birêvebirina bi vî awayî jî hebû. Mînak; Botan eşkere xwe berpirsiyarê jinê dibîne, eşkere civînên xweser jî çêdikir. Botan digot, "Di fedaîtiyê de jin û zilam nîn e, fedaî fedaî ye. Ferq nake." Ev tê çi wateyê? Di pêkhateya fedaî de hevalên jin pêwîste têkoşîna cins nedin. Herdû cins jî fedaî ne, wî biryar dane, di fedaiyan de têkoşîna cins pêwîst nake. Ez çima vê dibêjim? Ji ber ku di hundir de hinek pirsgirêk hebûn. Mînak; carekê fermandarê tabûrê dest avêtibû hevaleke jin. Wê demê ez jî di rêveberiya Hêzên Taybet de bûm, hevalên jin bi me re parve kirin. Min ji Botan re got, "Fermandarê tabûrê dest avêtiye hevala jin. Em ê vî di civîna rêveberiyê de bikin rojev." Botan got, "Hûn pir paşde ne. Hûn çawa van tiştan dikin rojev?" Piştre hemû hevalên jin li hev kom kir û got, "Hûn fedaî ne, pêwîst bike hûn ê çil salan bi hev re li ser balîfekê razin." Weke rêveberiya jin me di nav xwe de nîqaş kir, em gihîştin wê zanebûnê ku Botan grûbên xwe çêkiriye.

Wê demê Tevgera Jin PJA, ji bo berekê bidin hevala Ekîn Sêwas wana rêkirin Hêzên Taybet. Armanca hatina van hevalan, têkoşîna cins pêş bixin û di xebatê de rola jin a pêşengiyê bû. Wekî me got, Botan grûbên xwe çêkiribû û di nav pêkhateya jin de ji aliyê van grûban ve çi şaş, çi rast hemû bûyer bi Botan re dihatin parvekirin. Rexmê van grûban, wekî rêveberiya jin Serok ji bo me esas bû. Wekî rêveberiya jin min bi xwe bi tabûran re civîn çêkir û min got, "Em gotinên tu kesî guhdar nakin. Perspektîfên

Serok ên der heqê jinê de hene. Ev ji bo me esas in. Fedaî be jî em nakevin cihê tu zilamî. Pêwîste em şiyar nêz bibîn." Wê demê rewşeke pir tevlîhev hebû. Mînak; me hin tiştan dixist nîqaşê, nêzîkbûn pir tund derdiket. Mahîr Garzan hebû, ew bi xwe milê rastê yê Botan bû. Der heqê me de digot, "Vana sizmayên PJA'yê ne." Li jinan wisa dikirin, wana dikirin rojev ku riyekê peyda bikin û ji Hêzên Taybet derbixin. Lewre bi van ferasetan jin ji hev qut kirin.

Wê demê ji rêveberiya me jin jî tu kesê nikaribû bihata nav Hêzên Taybet, tenê hevala Sozdar Avesta dikarî were, ew jî ji ber pozîsyoneke hevala Sozdar di nav me de heye. Ne ku weke berpirsiyara Tevgera Jin e, ji ber kevin bû û dihat zanîn destûr hebû were. Yek jî, hevalên fermandarê tabûran hevala Sozdar nas dikirin, hevala Sozdar jî dihat rewşa wana dipirsî, wisa dihat û diçû. Ji derveyî wê, tu endameke rêveberiya jin nedikarî were nav Hêzên Taybet. Gava kesek bihata jî, dibû rojev.

Di vir de ez dixwazim vê yekê jî bibêjim; nêzîkatiya Tevgera Jin jî li beramberî Hêzên Taybet rast nebû. Tevgera jin bi temamî xwe ji vê quwetê qut kir, vê carê wisa jî nirxand: "Di nav Hêzên Taybet de nakokiyên cins pir lewaz in, Hêzên Taybet pir zêde xweseriya xwe nas nakin." Tevgera Jin, Hêzên Taybet li derveyê xwe dît, psîkolojiyeke wisa çêkir. Vê nêzîkatiyê hişt ku di navbera Tevgera Jin û Hêzên Taybet de hinek nakokî çêbin. Halbûkî her du jî xebatên me yên stratejîk in. Dîsa hinek tişt di şexsê hevala Gulan de hatin meşandin. Hevala Gulan ji aliyê Tevgera Jinê ve nedihat naskirin. Helwesta hevala Gulan çi ye, nedihat zanîn. Mînak; di Kongreya 6. de hinek hevalên jin helwest datînin, hinek jin jî diçin gel Botan. Ji ber ku Botan nikare van jinan li gel xwe bide razandin, dibêje biçin gel fedaiyan û li gel hevalên jin bimînin. Wê demê hevala Gulan dikeve mangê, dinêre ku ew kesên daxilê helwestên hevalên jin nebûne li wir in. Vana çend kes bûn, 2-3 kes bûn. Hevala Gulan wan kesan ji mangê diqewitîne, dibêje, "Bila derbikevin ji manga me!" Wan jinan rêdike manga hevalên

xort. Piştre hevalên xort bi zorê dixwazin hevala Gulan îqna bikin. Hevala Gulan helwest datîne, lê kes vê nizane. Piştî şehadeta hevala Gulan pir polîtîka li ser kirin, mijar ji aliyê tesfiyekaran ve pir cuda hat destgirtin. Lê di Tevgera me de roleke berbiçav a hevala Gulan hebû. Hevala Gulan îradeyek bû. Cihê hevala Gulan lê hebûya, kesî bi hêsanî nedikarî bêrêxistinî tevbigere. Cihê hevala Gulan lê bû zilam nikarîbû hevaleke jin erkdar bike. Lê ev ji aliyê Tevgera Jin ve nayê zanîn. Çima? Ji ber qut bû.

Ez bîranînekê bêjim: “Rojekê hevala Gulan wê ji Qendîlê biçe Xinêrê. Wê demê Xinêrê-Qendîl navend bûn û em bi meş diçûn û dihatin. Rê jî qederekê heye. Tu derdikevî, ew gir zehmet e. Hinek hevalên din jî di rê de tên-diçin û hevdû nas nakin. Hevalek tenê ji hevala Gulan dipirse û dibêje, “Tu diçî ku derê?” Ew dibêje, “Ez ji Hêzên Taybet im, ez ê biçim Xinêrê.” Hevala Gulan rexmê ku ne fermandarê grûbê ye, ji grûbê re pêşengiyê dike, di rê de destê hevalan digire. Grûp tên cihekê, navber didin, hevaleke jin dibêje, “Tu çiqas hevalek xweş î. Tu jî di Hêzên Taybet de yî, lê ev Gulanek heye, li wir wekî zilama ye!” Hevala Gulan dibêje, “Tu nas dikî?” Ew dibêje, “Na, lê min bihîstiye. Hevalan wisa gotine, lê tu çiqas hevalek fedakarî! Bi rastî mirov dizane tu fedaiyek î.” Hevala Gulan dibêje, “Ew ez im.” Min vê bîranînê çima parve kir? Ji ber ku hevala Gulan pir bi pêşdaraziyan re rû bi rû ma. Bi kurtahî wekî Tevgera Jin me jî ji derve li mijaran mêze kir. Ji ber Tevgera Jin ne di nav de bû, di derve de mêze dikir. Misoger ez bejim, zilam xwest beralî bike û hinek giraniya xwe jî danî. Rexmê wê jî, bi giştî ji bo rûnişkandina xweseriyê hewldan hebûn, lê nebesî jî pir bûn. Mirov vê mijarê jî wisa bigire dest, baş e.

## Lı Ser Bıngeha Israra Dı Xeta Azadıyê De Cıvînên Gırîng Ên Jın

### Konferansa PJA ya Sêyemîn:

Sala 2001’ê Konferansa PJA ya Sêyemîn çêdibe. Konferansa 1. piştî Kongreya YAJK’ê di sala 1996’ê de çêbû. Konferansa 2. bi

navê Konferansa Jin a Rojhilata Navîn li saha Serok çêbû. Konferansa 3. sala 2001'ê di navbera dîroka 11-22'yê Tîrmehê de çêbû. 147 delege beşdar dibin.

Serokatî, cara yekê ji bo jinê Peymana Civakî dixe rojeva me û perspektîf rêdike: "*Pêwîste jin bi xwe peymana xwe ya civakî ava bike. Çawa Jean Jacques Rousseau peymana xwe ya civakî hebû di dema şoreşa Fransa de, piştî şoreşê jî projeyan ji bo civakê pêş dixe, ji bo mafê mirovan, mafê jin mirov heman tiştê pêş bixe. Ev tenê ji bo jina Kurd an jina Tirk nîn e, heman demê ji bo jinên cîhanê ye. Cewhereke xwe ya gerdûnî, cîhanî û navnetewî heye. Ev dibe temînata demokratîkbûna jinê jî. Dîsa pêşveçûnên heyî eger ne di eksena jinê de bin, ne pêkan e bi ser bikevin. Ronesans ne tenê ji bo jina Kurd pêwîst e, ji bo jina Rojhilata Navîn jî pêwîst e. Tevahî dogmayên hene, paşverûtî û serdestiya zilam a heyî û qirêjiyên pêş dixin, ez li hemberî wana lêhûrbûn dikim. Lê belê ev encex bi ronesansa jinê dikare bê derbaskirin. Di şexsê jinê de civak wê azad bibe. Zehmetiyên heyî, eger wê tengav bikin, ev tiştekî xwezayî ye. Ev ne mijareke ku mirov biçûk bigire dest. Rêzdayîn ji bo gel çi be, divê ji bo jinê jî di heman wateyê de be. Dibe ku jin kêmasî û şaşîtiyên xwe hebe, lê belê divê ev li pêşiya azadiya jinê nebe asteng. Min xwest pêşiya jinê vekim. Çînayetî ger xwe li ser jinê ferz bike, pêwîste ne xema wana be. Dîroka şaristaniyê ya 5000 salan çi dibêje, yan jî zilam çi dibêje, pêwîste ne xema wana be. Berxwedana herî mezin, di kesayeta jina azad de israrkirine. Di demê derbasbûyî de ji ber êşê xwe şewitandin, lê girêdana bi Serokatî re israrkirina kesayeta jina azad e.*" Serok, li ser van esasan konferansê pîroz dike. Di vê konferansê de Peymana Civakî dikeve rojevê. Dîsa tîne ziman ku di parêznameyên Wî de van nirxandinan hemû hene û mirov dikare jê sûd bigire.

Biryarên ku di konferansê de hatin girtin jî; amadekirina Peymana Civakî ye, veguherîna zilam e û li ser van esasan di konferansê de nîqaş jî pêş ketin. Bi vî awayî paşê hevalên xort li ser van mijaran perwerde dîtin. Dîsa di konferansê de wekî rojeva rêxis-

tinî pirsgirêkên kadrobûnê tên nîqaşkirin. Destpêkê di têkoşîna jinê de ev cemidandina ku tê jiyîn sedemên wê tên nîqaşkirin. Di şexsê hinek endamên rêveberiyê de pirsgirêkên wan ên hevsengiyê tê nîqaşkirin. Di kadro de şikandinên ku çêbûne, bêbawerbûna li hemberî Tevgera xwe, tevlîbûna xwe bi bahaneyan anîna ziman, meylên ferdperest heya astekê tên nîqaşkirin. Di encamê de wê kadro çawa tevlî têkoşînê bibe, vana tên nîqaşkirin.

Di vê konferansê de ji bo hevala Gulan jî hinek nîqaş çêdibin. Di xebatên Hêzên Taybet de potansiyeleke jin heye. Di van nêzîkbûnan de Tevgera Jin nakeve nav û tenê li derve dinirxînin. Lê di hundir de pirsgirêk hene, ew jî di şexsê hevala Gulan de tên nirxandin. Bi taybetî nîqaşên wekî ku zêdetir xeta zilam tê meşandin û xweseriyê naparêze, bi vî awayî der barê hevala Gulan de di vê konferansê de biryar tê girtin. Ev biryar di nav belgenameyan de pir derbas nebû, ji ber ku zilam xwest vê mijarê li hemberî me bişixulîne, li ser wê polîtîka bike. Yanî xwestin xebatên jin û Hêzên Taybet bînin hemberî hev. Jixwe herdû jî xebatên stratejîk in. Lê der barê hevala Gulan de biryarek wisa hat girtin; endametiya wê ya PJA'yê hat sekinandin. Lê ji ber ev biryar pir bû meseleyek siyasî, li ser vê siyaset hat kirin piştre derbasî pratîkê nebû.

Ya rastî perspektîfên Serok di wê Konferansê de hêzek da, ew girîng bû. Berê jî dema jin şaşîtiyek bikira elbet Serok dinirxand, dahûrandin dikir û rexne dikir, lê li kêleka wê hêz jî dida ji bo ku jin li beramberî van pirsgirêkan neşike û xwe paşde nekişîne. Taybetmendiyên jinê di nav civakê de zû dişike, zû bes dike. Li ser van esasan Serok hêz û cesaretê dide jinê ji bo ku bikaribe rol û mîsyona xwe bileyîzin.

Asteke biryar û nîqaşan derket holê, lê belê bi giştî her tişt di pratîkê de nehat guhertin. Piştî vê konferansê parêznameya DMME (AÎHM) tê, cîlda yekem hat, a duyem wê bê. Bi riya

parêznameyan Serok ji dîrokê re nêrandin derdixîne. Ango em ê çawa nêzîkî dîrokê bibin, çavdêriyên te li hemberî dîrokê wê çawa bin, Serokatî di vê mijarê de ronîbûnekê çêdike, hizrê mirov vedike. Bingeha nakokiyên cins ji ku derê derket, serdestiya zilam çawa xwe birêxistin dike, jinê di ku derê de winda kir? Ev jî dihêle jin xwe bispêre vê mîrasê.

Xala din, Serok hêzên me yên gerîla yên Bakur kişand û kom kir, bi vî awayî got, “Hilberîn nebe di warê hêz de, wê hêz di nav xwe de birize.” Hêzên me yên Bakur piraniya xwe hatine û hevalên jin li wir nemane. Ji bo vê jî divê mirov fikir hilberîne. Afirîneriya fikir û ramanê girîng e. Serok di parêznameyên xwe de dema Rojhilata Navîn vedike, dibêje ferdbûn nemaye, wekî pênase dike Modernîteya Kapîtalîst di bin navê pêşxistina ferdbûnê de ferdperestî pêş xistiye. Lê di Rojhilata Navîn de ferdbûn hatiye fetisandin û bûye qurbanê civakê. Ev perspektîfa Serok ji ber tam nehat fêmkirin, vê yekê hişt ku hinek kes vê nêrîna Serok li gorî xwe bigirin dest; ango di bin navê em ferd derxin pêş de meylên cuda pêş ketin. Serok dixwaze guhertina paradîgmayê çêbike, lê di nêzîkbûnan de şaşîtî hene. Nimûne; di nêrandina ferdperestiyê, destgirtina nakokiyên cins de hinek pirsgirêk hebûn. Ji ber ku li hemberî van pirsgirêkan nêzîkbûnên ferdî pêş ketin, êdî heman demê pênaseyên wisa pêş ketin; jina baş û zilamê baş, jina xirab û zilamê xirab. Yanî cudakirinek wisa derxist û çînayetî li vir derdikeve holê. Ev dihêle hinek têkiliyên ehbabçawîş, têkiliyên kafa-kol, ezezî, derdê xwe ji hev re gotin pêş bikevin. Ferasetên ku di wan deman de derketin hinekê bi vî awayî bûn.

Di hin kesan de tiştê xuyayî; erzan mezin bûne, ango Serok pir caran pêşiya hevalên nû vedikir, erk dida, jixwe ew pirsgirêk nîn e, lê ew kes xwe bi kedê re neke yek û xwe wekî serkeftî bibîne, ew dibe erzan mezinbûn. Ev jî ji nêzîkbûna desthilatdariyê re rê vedike. Li beramberî wê, kadroyên ku di nav kedê de mezin bûn, di şer de mezin bûn, wana paşde dibînin û derve dibînin. Wisa cudabûn dikeve navbera kadroyan. Serok gelek caran digot,

"bîrdozîbûn ne teorîkbûn e", lê di nav me de ev tê ferzkirin. Mînak; dibe ku hevalek xwendin û nivîsandina wê nebê, lê nêrandina wê ya jiyanê pir cuda be, bi xetê re ye, radîkal e û hwd.

Konferansa PKK'ê ya 6. ku çêbû, ew biryara der heqê hevala Gulan de li wir hat redkirin. Ev yek ji bo Tevgera Jin baş nebû, ji ber ku jin bi xwe di konferansa jinê de der heqê jinekê de biryar digire, lê paşê diçe konferansa giştî û vê biryarê li wir diguherîne.

Sala 2001'ê ji bo HPG'ê girîng bû, wana jî konferansa xwe di meha Tîrmehê de li dar xistin. Guhertinên ku di ARGK'ê de çêbûne, li wir bi fermî hatin parvekirin. Lê belê bi riya konferansê êdî HPG'ê xwe îlan kir. Şerê gerîla ji vir û şûn de wê çawa bimeşe, hat nirxandin. HPG, di xeta Stratejiya Parastina Rewa de wê çawa xwe birêxistin bike? Ji ber ku eşkere di pêvajoya paşvekişandinê de nefêmkirinek pêş ket. Heman demê ji bo gerîla bikaribe xwe nû bike, pispor bike gelek biryarên girîng hatin girtin. Mesela, hemû hevalên di perwerdeyên Hêzên Taybet re derbas bûne, pêwîste hemû hêzên din ên gerîla perwerde bikin. Hem di warê teknîk de û hem di warê taktîkê de nûbûnê çêbike. Jixwe piştî wê jinûve hêz derbasî Bakur bûn û gavek nû hat avêtin.

Di sala 2001'e de 11'ê Îlonê li Amerîkayê li ser Kuleyên Cêwî qaşo ji aliyê El-Qaîde ve êrîş çêbû. Ji ber ku di encamê de ew rêxistineke ku ji aliyê Amerîka ve hatiye çêkirin. Lê ev girîng e, ji ber ku Amerîka ji xwe re xistiye bahane ji bo li ser Rojhilata Navîn mudaxele bike, di bin navê "em ê bi terorîzmê re têkoşîn bikin". Vê jî bi xwezayî bandora xwe li ser pirsgirêka Kurd kir. Hêzên NA-TO ev biryar girtin û jixwe di lîsteya terorê de yekemîn PKK ye. Di encamê de wê li hemberî me têkoşîn bê destpêkirin. Lê belê bi kîjan şêwazan, hîn diyar nebû. Diviyabû wekî rêxistin me li gorî wê xwe plan bikira. Bi taybetî dema Serok guhertin ferz kir, Wî pêşeroj didît. Got, "Wê pêvajoyeke nû li Rojhilata Navîn destpê bike, pergala netewe-dewletê ya li Rojhilata Navîn heye, parçe parçe wê hilweşînin." Li beramberî vê, ger tu wek hêzeke demok-

ratîk xwe ava bikî, tê bibî hêza mudahîl û bikarî ji gelan re pêşengiyê bikî. Esas guhertin Serok ji bo vê li pêş didît. Li ser vê bingehê pêwîst bû me ev xusûs bi berfirehî bigirtan dest. Ya rastî Kongreya PKK'ê ya 8. di vê çarçoveyê de hat çêkirin.

Di navbera 4-11'ê Nîsana 2002'yê de Kongreya PKK'ê ya 8. hat çêkirin. 285 delege tevlî bûn, 106 delege ji wan hevalên jin bûn. Di dîroka me de kongreya herî kurt e, ji ber ku zêde nîqaş çênebûn. Beriya wê jî belgename hatibûn amadekirin, zêdetir wekî kongreyeke pejirandina wan belgeyan bû. Serokatî beriya vê perspektîf da ku navê PKK'ê bê guhertin di Kongreya 7. de, lê ya rastî mesele tenê nav guhertin nebû. PKK, berê wekî rêxistineke Marksîst-Lenînîst hatibû birêxistinkirin, program û rêzikname li gor wê hatibû derxistin. Heman demê Serok sedema hilweşîna Sosyalîzma Reel û paşê ew sîstem çawa li xwe zivirî, van hemûyan dinirxîne. Esas Serok dixwest ew nêrandin were guhertin. Di Kongreya 7. de nav nehat guhertin, lê al hat guhertin. Navê PKK'ê di Kongreya 8. de hat guhertin û bû KADEK (Kongreya Azadî û Demokrasiyê ya Kurdistanê), lê bi demê re me ferq kir ku PKK tenê bi nav xwe neguhertiye, wekî partî xwe fesh kiriye. Meylên tesfiyekaran cewhera wê vala kirin. Partî çima girîng e? Ji ber ku ew çarçoveya te ya bîrdozî diyar dike, girîng e. Ew nebe, wê li ser kîjan rastiyan bimeşe? Li ser esasê perspektîfên Serokatî ji gel jî hinek kes tevlî kongreyê bûn. Meylên rastgir ên girêdayî Ferhat eşkere gotin, "di kongreyê de me reforma siyasî çêkir, di kongreya pêş de jî em ê reforma sosyal çêbikin." Wê demê hevalên jin li hemberî vê nêzîkatiyê hin helwest danîn û gotin; "Perspektîfên me ne reformên sosyal in, ên di bin navê reforma sosyal de têkiliyên paşverû û civakî ne ku hûn li ser me ferz dikin."

Her wiha di wê kongreyê de biryara ku di her 4 perçeyên Kurdistanê de rêxistinên demokratîk ava bikin, heye. Ango ji derveyî dewletê tu bikaribî pergala xwe bi xwe ava bikî. Divê yekîtiyên netewî bên çêkirin. Perspektîfên Serok xistina teserûfa xwe pêş ket. Ya rastî em alîgirê guhertinê ne. Pirsgirêka ku di nav me de

hatiye nîqaşkirin, di navbera paradîgmaya kevin û nû de mayîn bû. Lê Serok paşê ferq kir ku em tengasiyan jiyan dikin. Ne em dikevin nav paradîgmaya nû û heman demê asta me ya têkoşînê hatiye guhertin, lazime em guhertinê çêbikin ji bo bikevin paradîgmaya nû. Meylên tesfiyekaran xwestin rexne û rexnedanê ji holê rakin, halbûkî PKK heya niha bi rexne û rexnedanê heye. Serok jî wê demê wiha got: “Ji bo pîvan zelal bibe ez dibêjim sekna Kemal Pîr û Bêrîtan”, yanî ji bo kadro pîvan danî.

Piştî Kongreya PKK’ê ya 8. di Hezîrana 2002’yê de Kongreya 4. a Tevgera Jin bi dirûşmeya “Di Jiyana Azad de Israr û Vebûn” hat lidarxistin. 255 delege tevlî dibin, ji nav wana 20 hevalên xort in, bi giştî 35 guhdarvan hene. Dewreyên perwerdê yên hevalên xort hene. Ev biryara konferansa berê bû, bi navê projeya guhertina zilam dewreyên perwerdê hebûn. Li ser vî esasî hevalên xort tevlî kongreyê bûn, lê ne di asta delege de, di asta temaşevan de. Perspektîfên Serokatî li ser esasê ku têkoşîn radîkal bibe, tên xwendin. Pêşiya vê kongreyê, Serok kulîlkek rêkiribû, hin wêneyên wê hene. Di dîwara hucreya ku Serok lê dimîne de kulîlkek derdikeve, wê kulîlkê ji hevalên jin re rêdike. Vê jî li ser pêkhateya kongreyê moral û motîvasyon ava kir. Ya rastî Serok di kîjan şert û mercan de be jî, bi awayekî dixwaze xwe bigihîne jinê û piştgiriyê dide xebatên me. Şandina wê kulîlkê tê vê wateyê.

Kongre di warê pratîk de zû kom bû, lê belê dereng destpê kir. Em wekî hevalên jin pirsgirêkên ewlekariyê pir nagirin dîqatê. Em hejmarek mezin kom dikin ji bo Kongreyê, lê heta niha jî şiyarbûna me lewaz e. Halbûkî ji bo dijmin pir girîng e, lê em di ferq û cidiyeta wê de nebûn, em ji bo dijmin tên çi wateyê û her wiha bêtedbîriyek bi vî awayî çêbû. Hejmarek zêde kom bûye, ji ber perspektîf ji Serok nehatiye, hevdîtin nebûye, ji ber vê yekê bendêmanek çêbû. Di rastiyê de jî şiyarbûna me kêm e. Di kongreyê de mijarên ku li ser tên sekinandin wiha ne;

1- Birêxistinbûna jinê. Êdî PJA wekî sîwan bê destgirtin û bi vî

awayî were birêxistinkirin. Di hemû qadan de, bi taybetî li her 4 perçeyên Kurdistanê divê xwe birêxistin bike.

2- Xwe bi civakî kirin û rêxistina civaka sivîl pêwîste saziyên xwe yên civaka sivîl ava bike, ji bo bikaribe demokratîkbûnê pêş bixe.

3- Pirsgirêkên pratîkbûnê. Bi wê ve girêdayî projeya Federasyona Jinên Rojhilata Navîn hat nîqaşkirin. Ev jî ji bo em bikaribin bi tevgerên navnetewî re têkiliyê pêş bixin, vebûnekê çêbikin. Heta di kongreyê de biryar hat girtin ku Konferansa Jin a Navnetewî bê lidarxistin. Ji ber ku hevalên xort perwerde didîtin, li ser esasê "guhertina zilam", ku êdî em zilaman tevlî têkoşîna xwe dikin berendamtiya wan a tevgera azadiya jinê tê nîqaşkirin û wekî endamê rûmetê hatin hilbijartin. Hevalê Fikrî Baygeldî û hevalê Şerîf Goyî (li Xakûrkê bi hevala Berçem re şehîd ket), wekî berendam hatin qebûlkirin.

Rast e, biryara ku tevgera me ya jin xwe fireh bike hat girtin, lê divê mirov rewşa xwe ya rêxistinî jî bigire dest. Heya astekê hin mijarên rêxistinî tên nîqaşkirin, lê belê hîna ji rexne û rexnedanê re girtîbûn heye. Mesela, hevalên ji rêveberiya PJA'yê wisa çend heval diaxivin, hevalên din tam beşdar nabin. Heta nêrînên wisa derdikevin; ji bo kadro, rêveberiyê wekî înkarkeriyê dinirxînin, pêşî lê digirin. Dixwestin wekî rojevê mijarek wisa jî binirxînin; "meclîsa YJA kar nake, xebat di kesayetan de navendî bûye." Ev nirxandin ji bo Tevgera Jin girîng e. Tu xebatan tenê di kesan de kilît bikî, kolektîfiyek dernakeve, ev jî ji bo jinê xeter e. Ji ber karakterê jin di rêxistinê de divê hîn kolektîf û parveker be, karakterê jinê bi vî awayî ye. Lê belê wekî di rêxistinê de ew pirsgirêka şikestina di kadro de çêbûyî, di têkoşîna cins de cemidandin, vana hatin nîqaşkirin. A din jî, meylên ku dibin pîvanên azadiyê, em ê di nav civakê de qada sivîl birêxistin bikin, meylên xwe ji çiyê xistin heye û xwe ji xeta azadiyê dûr dixin. Ev meyl ne tenê xwe ji mekanê çiyê dûrxistine, ji jiyana azadiyê dûrxistine.

Di rapora navendê de nirxandineke bi vî awayî heye; “Qada gerîla ya jin di bin bandora zilam de ye.” Gerîla jî ji bo me xebatek stratejîk e, jin hebûna xwe bi wê çêkir. Yanî gerîla ji bo me kok e, lê dibe ku ferasetên hin kesan di vê der barê de hebin. Tu wekî kes bigirî dest cuda ye û wekî qad bigirî dest cuda ye. Vê jî hiştiye di qada gerîla de tiştek wisa pêş bikeve; “PJA cuda ye, em jî cuda ne.” Di encamê de xwe perçeyeke vê hereketê dîtin çênabe. Xwe perçekî vê hereketê nabîne, xwe cuda dibîne, psîkolojiyek bi vî awayî pêş ket. Vê carê nîqaşên li beramberî hev derketin nerast bû, tu bi xwe xwe perçe dikî. Gerîla jî ev got: “Ya rastî ne ku em ketine bin kontrola zilam, hûn ketine meylekî ji çiyê derketin, hûn jî ji xeta azadiyê dûr dikevin.” Ev ji bo Tevgera Jin nîqaşek baş nîn e. Dibe ku mirov ferasetekê, nêzîkatiyekê binirxîne, lê tu tevgera xwe ya esasî bi hinek ferasetan re bixî nîqaşê, şaş e. Tê bi destê xwe xwe perçe bikî. Qada gerîla jî di nav xwe de nirxandine; “êdî hêdî hêdî jin ji çiyê dûr dikeve.” Ji zemînê azadiya jinê jin dûr dikeve. Ya rastî herdû meyl jî hene. Di qada leşkerî de hemû na, lê meyla ku xwe dispêre xeta zilam derdikeve. Ew rast e, lê hema eynî meyl jî di zemînê xebata xweser de mîna grûbên lêhûrbûnê, perwerdê xwe ji çiyê dûr dixe. Herdû feraset jî rast bûn, lê şêwazê destgirtinê pirsgirêk bû.

Di Kongreya PJA ya 4. de hevala Gulan di 7’ê Hezîranê de hat şehîdxistin. Mirov nikare pir tiştan li ser vê bûyerê bêje, ji ber ku lêpirsîn çêbû û heman demê di nav Hereketê de bû mijara nîqaşên cuda. Tesfiyekaran xwestin xwe li ser vê bidin axaftin. Dîsa bêrêbazî çêbûn, ji ber ku kongreya jin e û hevaleke jin tê qetilkirin. Hevala Gulan danekê nexweş e û tevlî rûniştina kongreyê nabe. Cihê bûyerê bi xwe pir dûr e û dikeve derveyî qada kongreyê. Piştî rûniştina danê sibê qediya û navber didin, heval diçin di manga wê de wê şehîd dibînin. Ya rastî vê bûyerê hejandin çêkir. Her çiqas ne kongreyek xirab bû jî, asta nîqaşan baş bû. Ev lîstoka dijmin e û dixwaze pêşiya pêşketinên jinê bigire. Ji ber aliyên xwe yên siyasî hene. Çima hevala Gulan? Me berê jî hinek

pêşketinên pêvajoyê anîn ser ziman. Ji ber bi tevgera jin re rû bi rû maye rexne li ser hevala Gulan hebû, di konferansê de biryar der heqê wê de hatibû girtin. Lê beriya her tiştî rêveberiya Hêzên Taybet e. Hedefeke ku wê yekser tohmetê bikişîne ser Tevgera Jin, potansiyelek bi vî awayî heye. Ji ber vê yekê taybet hatiye hilbijartin.

Di vir de armanc çi ye? Ya yekê, ji bo Tevgera Jin têkeve bin tohmetê, nikaribe gav bavêje, di encamê de di zemînê kongreya jin de qewimiye, ne zemînek cuda ye. Jin ji vê berpirsiyar e. Ya duduyê jî, beriya wê rexneyên ku bûne malê fermiyetê hene, biryar der barê heval de hatiye girtin. Di Hêzên Taybet de aciziyek da çêkirin. Di vê wateyê de ji şixulandinê re vekirî ye, kî bixwaze bişixulîne wê bişixulîne. Dikare ji dijmin û tesfiyekaran re bibe zemîn. Û dixwazin wekî du hêzên stratejîk Tevgera Jin û Hêzên Taybet bînin hemberî hev. Wê Tevgera Jin li ser vê nikaribe vebûnekê bike. Dema her tişt tê gel hev, kî bixwaze dikare vê rewşê li beramberî me bişixulîne. Lê baş bû şiyarbûna rêxistinê hebû, ew nebûya û pêşiya wê nehatiba girtin, di hevalên fedaî de hêrseke pir mezin çêbibû. Lê ewil vê bûyerê di nav Tevgerê de şikandinek ava kir, bêbaweriyek pêş xist. Gelek hevalan ji wê û şûn de tenê dernediketin derve, guman ji hevala xwe digire. Niha em bi hev hene, em bi hevalên xwe hene, bi hevalên xwe guman çêdibe. Dibe ku carina sîxur jî derkevin, lê di encamê de navgîna me zelal e. Em bi baweriya li hemberî hevdû hene. Rexmê ewqas sîxur di nav me de derketine jî, em li hemberî hevalên xwe bêbawer nebûn. Jixwe ew diyar in, PKK liv û tevgerên xwe zelal in, çanda wê cuda ye. Yê li dijî vê jiyanê hebe jî, beloq derdikeve pêş. Ji ber vê yekê, yekî sîxur jî derkeve nikare hevaltiya me bin bixe. Lê bûyerek bi vî awayî tu bixwazî nexwazî bi te re gumanan çêdike. Tu ji hevalên xwe guman dikî ku gelo pêkan e ez jî werim qetilkirin? Wê bûyerê tirsek çêkir, xîtabê îradê dike. Bi rastî yên ku ev plan kirin pir bi armanc in. Ev konseptek e. Bi vê bûyerê bi cewherê Tevgerê re dileyîzin. Ew cewher hat hedefkirin, ji ber

Tevger xwe li ser cewherê xwe ava dike. Mesela, Serok di parêznameya Atîna de got, “Min çûyîna xwe ya li Yûnanîstanê dît, min kêm hevaltî û dostê sexte dît. Lê rexmê wê, diviyabû min tewîz nedaba. Wekî rêgezekê ez pê bawer im û bi hevaltiyê heme, bi dostaniyê heme.” Ev girîng e. Niha di wir de li te dide, wê dixe mijara nîqaşê, baweriyê dixe mijara nîqaşê, hevaltiyê dixe mijara nîqaşê û her wiha rê ji hemû şîroveyan re vekirî ye. Her wiha PKK, xwe li ser du lingan birêxistin dike; yek jin e, yek jî xeta fedaî ye û van herdûyan tînin hemberî hev. Ev Tevger li ser xebata jin û xebata fedaî xwe dide rûniştandin.

Hevala Gulan ji Zanîngeha Hunerên Bedew (Güzel Sanatlar Üniversitesi) a Ankara tevlî rêxistinê dibe. Bi saetan dikarîbû bi mirovan re eleqedar bibe û nediwestiya. Hûrguliyên jiyanê yên zirav didît. Ji dema tevlî dibe û şûn de diçe saha Serokatî, paşê li eyaleta Garzanê dimîne. Di sala 1997’an de derbasî Amedê dibe û li wir jî du salan dimîne. Di Kongreya PKK’ê ya 6. de, piştî esareta Serok biryara fedaîbûnê dide. Wê demê diçe erkê û li ser wê erkê Serokatî pêvajoya nû îlan kir û çalakî da sekinandin. Jixwe piştî wê zivirî û bû rêveberiya wê xebatê. Di nav Tevgera me de roleke wê ya diyarker hebû. Yek jî, hevala Gulan di têkoşîna xwe de dijwar bû. Jin ba zilam ba tiştekî şaş ba, bê tirs digot. Dibe ku ewqas bertek li beramberî wê ji ber vê kom bûn. Tiştekî şaş bûya, şaş e. Bi têkoşîna xwe ya radîkal bihêz bû. Kadroyeke pêşeng bû, ji bo vê jî hedef hat girtin.

Piştî ev bûyer qewimî û şûnde komîsyona lêpirsînê hat avakirin. Hevalên jin gotin, “Komîsyon bila ji hevalên xort çêbibe, ji ber bûyer di zemînê jin de çêbûye.” Ne ku ji xwe nebawer bûn, di encamê de di kongreya jin de çêbûye, bi niyet rast e jî. Lê paşê komîsyon pir teng nêz bû. Jixwe çend caran ew komîsyona lêpirsînê hat guhertin. Çawa? Pir hevdû sûcdarkirin derdiket holê. Mesela, her digotin, “di zemînê jin de cînayetek wisa çêbûye…” Li gorî xwe girtina dest, guman zêde kirin hebû, her wiha komîsyon hatiye bûyerê zelal bike, meh û nîvekê pêkhateya kongreyê belav

nebû. Vê jî hiştiye guman ava bibin di nav pêkhateya hevalên jin de. Lêpirsîn maye ji hevalên xort re û tesfiyekaran li hemberî me ev pir şixulandin. Di dawiya meha Hezîranê de kongre belav bû.

Ji bo vê kongreyê ez vê jî bibêjim; erê berê hinek pirsgirêk hebûn, lê hevala Gulan dema diçe vê kongreyê rihet diçe. Ji ber ku beşdarî Kongreya PKK'ê ya 8'an jî bibû, wê demê rêveberiya tevgera jinê nîqaşek jî kirin û heta ji bo hevala Gulan gotin were tevlî vê kongreyê bibe. Nirxandinên hevala Gulan jî di vê kongreyê de hene, rihet dinirxîne. Hevala Gulan nêzîkatiya xwe wisa tîne ziman; "PJA nasnameyek e. Kî li ku derê dibe bila bibe, di encamê de bi wê nasnameya xwe beşdar dibe." Helwesta heval jî di kongreyê de bi vî awayî ye. Heta hinek fikrên wê ji bo vebûna Tevgera Jinê jî hene. Nimûne; ciwan wê çawa beşdar bibin, em rola pêşengiyê çawa bidin wana? Di van waran de nirxandinên hevala Gulan hene.

Elbet encamên kongreyê ji hemû quwet re hat ragihandin, lê bixwazî nexwazî di bin siya vê şehadetê de dimîne. Rexmê jî, biryarên hatine girtin, em ê çawa xebat bikin li ser vana tê sekinîn. Jixwe piştî wê giranî ji birêxistinkirina qadên civakî re tê dayîn, ango vebûn çêdibe, xebatên jinê di hemû parçeyan de tê birêxistikirin. Lê piştî demekê ev hat rexnekirin, ji ber Tevgera Jinê giranî dabû Bakurê Kurdistanê. Jixwe wekî komale, sazî û rêxistinên hwd. tên sazkirin. Xaleke din jî, hemû parçe di nav xwe de sînordar dimînin. Ango di aliyê Tevgera Jinê de sîstemeke ku bikaribe giştî xebatan sewq û îdare bike pêk nayê, ev lewaz dimîne.

Di salên 2001-2002'yan de li Dola Kokê navenda qadên civakî hebû û berpirsiyarê wê Ferhat bû. Bi vî awayî qada civakî di bin bandora Ferhat de meşiya. Jixwe paşê Ferhat meylên xwe yên tesfiyê heya Bakur bandor dike. Piştî wê Botan çû Rojava. Yanî wisa gelek qad tesfiye kirin. Di wê demê de Rojhilat hat birêxistinkirin, lê ne li gorî xeta rêxistinê û guhertina ku Serok dixwaze ava bike. Cihê Ferhad lê ye dîsa eynî xebatê xwe dimeşîne, dîsa

xwestiye bi hevalên jin bilîze. Lê êdî zanebûnek jî çêbûye. Gelek hevalên jin dibêjin, "Ferhad dixwaze cuda nêz bibe." Lê Tevgera Jin tam ne di asta hêza mudaxelê de ye. Bi rastî ew ji bo me wekî lewaziyekê ye. Dîsa Ferhat gelek kadroyên ji Bakur amade dikir, lê perspektîfa berxwedanê nedida wana. Ji ber wê demê gelek ji wan hatin girtin, ji wana re digot, "hûn herin, jixwe pêvajoyek siyasî ye." Yanî adeta wekî teslîm bibin, ne pêwîste hûn bibin xwediyê nêzîkatiyên cuda, perspektîfên wisa dida.

**Konferansa PJA-HPG a Yekemîn:**

Sala 2002'yan zilam ji Kongreya PKK'ê ya 6. şûn de ferasetên paşverû yên cur bi cur wekî îtifaq çêkir û hêdî hêdî ew hevsengî perçe dibe û meyl xuyayî dibin. Yanî êdî ew îtifaqa heyî xira dibe. Li Xinêrê civîna navenda giştî rêxistinê çêbû. Li wir meylên tesfiyekaran pir diyar bûn. Li şehîdgeha Şehîd Şerîf hêzeke me ya taybet li wir e, civîn di wê zemînê de çêbû. Êdî di vê civînê de hêzên Botan û Osman ji hev cuda bûn. Mesela, her kes bi grûba xwe re bi topê dilîst. Lê em ê wan meylan çawa binirxînin? Serok, di parêznameya xwe ya bi navê Parastina Gelekî de mudaxele kir. Mesele di vir de ye; erê ji hev cudabûnek çêdibe. Jixwe Ferhat û Botan wana dixwazin Tevgerê ji xetê derbixin, stratejiya me ya şer nîqaş dikin. Em ê paşê dem bi dem li ser wana bisekinin. Dixwazin bi stratejiya şer, bi Tevgera Jin re bileyîzin, bi cewherê PKK'ê bilîzin. Ev tiştekî normal nebû. Lê yên dijberê wî jî ne ku dixwazin xeta Serok biparêzin, dogmatîk in. Serok got ya, "Meyla çepgir jî alîgirê guhertinê nîn e." Çima? Dinêre yê ku guhertinê çêdike cewher vala dike, yê dijberê wî jî xwe dixe parastinê û dibêje aman tiştê heyî em biparêzin! Lê ev jî neketina xeta paradîgmayê ye, neketina stratejiyê ye.

Tevgera Jin di pêş de wê hîn diyar bibe. Di vir de şaşîtiyên me ev bûn; em nebin alîgirê tesfiyekaran û ne jî bibin alîgirê ji guhertina dogmatîk. Ango em bêteref in, em bi serê xwe ne. Tabî hinek kes cuda bûn, ew cuda ye, em ê paşê vê binirxînin. Jixwe hevsen-

giya nav zilam xira bûye. Ya rastî em bêdeng man, bi vê bêdengiyê me xeta Serok jî neparast. Paşê Serok got, “ma kes tune ye ku xeta min biparêze?” Eger me biparasta wê bigota xeta jin li min xwedî derketiye. Serok wisa nenirxand. Ya rastî mirov vekirî bêje, em bê siyaset man. Ew bandora êrîşên ku li ser xeta jin çêdibûn bandor dikir, lê her tişt ne ew e. Xwe di xetê de zelal nekirine.

1’ê Mijdara 2002’yan di HPG’ê de jin xwe birêxistin dike, lê jin wê di nav HPG’ê de çawa xwe birêxistin bike hîn tam zelal nebûye. Ji bo vê jî Tevgerê konferansek bi navê Konferansa PJA-HPG a 1. li dar xist. Di nav quwetê HPG’ê de gerîlayên jin bi nasnameya PJA hene, pêwîste konferans çêbike ku hem meyla ku xwe ji gerîla dûr dixe zelal bibe û hem jî êdî rêxistina jin zelal bike. Rêxistina xweser a xebatên gerîlayên jin, ê ku zemînê gerîla pêşketî nabîne û xwe jê dûr dixe, van ferasetan hatin mehkûmkirin. Dîsa yê ku di qada civakî de xwe dide jiyankirin, esas kar nake, lê belê xwe di wan zemînan de bi çandên cuda cuda dide jiyîn, hat mehkûmkirin. Êdî di kadro de statuyek pêş dikeve, kadroyên leşkerî, kadroyên civakî, kadroyên bîrdozî û hwd. Lê em hemû kadro yên vê Tevgerê ne, ango îro li vir dibe, sibe li cihek din dibe, em kadroyên Tevgerê ne. Serok wê demê perspektîfek wisa da: “*Hûn çanda kevneşop a 5000 salan hem ji derve de û hem jî di hundir de çanda desthilatdariyê hildiweşînin. Ji bo vê jî hem di hundir de û hem jî di derve de yên dijberî we derkevin wê hebin. Li ser van esasan li beramberî van xeteriyan divê hûn hêza xwe ya parastina rewa ava bikin.*” Balkêş e, ji ber ku piştî şehadeta hevala Gulan vê perspektîfê dide û agahiya Serok ji vê bûyerê nîn e, tekmîl jê re nehatibû dayîn, haya Serok jê nebû, rexmê wê jî balê dikişîne ser xeteriyên li pêşiya tevgera me ya jin. Yanî Serok got hem di hundir de û hem jî ji derve de dibe ku hûn bi êrîşan re rû bi rû bimînin. Tiştê hûn pê re têkoşîn dikin ne hindik e, hûn çanda 5000 salan hildiweşînin, jixwe wê êrîş bi ser we de were. Wekî xeteriyên çêdibûn hîs dikir. Ev ji bo me girîng e, ji ber ku em

xebatên pir stratejîk dimeşînin, posîzyona me êdî pir stratejîk bûye, lê em di ferqa giranî û cidiyeta wê de nîn in. Heya şehadeta hevala Gulan kes bi ve yekê nedifikirî. Mînak; zilam ewlekariya xwe digire, ji pozîsyona dijmin agahdar e. Dema dijmin berê xwe dide Serok, esas berê xwe dide jinê jî. Em wekî jin pir di ferqa vê de nîn in. Belkî piştî şehadeta hevala Gulan hinekî hişyarî çêbû, lê em nafikirin ku wê dijmin bi taybet Tevgera Jin jî hedef bigire, ji bo Tevgera Jin konseptan çêbike.

Di Konferansa PJA-HPG'ê de ji bo xebatên gerîlayên jin biryar hat girtin ku biryargeha sewq-îdareya xwe xurt bike û di her qadan de rêveberiya 3 kesî xwe birêxistin bike. Ya rastî ev wekî konferansa YJA-STAR a yekemîn e. Der barê pêkhateya Hêzên Taybet de jî hin biryar hatin girtin; wê çawa bikaribin zêdetir xwe pêş bixin, di warê jin de wê di xeta parastina rewa de çawa xwe birêxistin bikin û beşdar bibe, ev zelal bû.

Di dawiya sala 2002'yan de civîna navendî ya Tevgera Jinê çêbû. Li wir pirsgirêkên partîbûnê, pêşengiyê, kadrobûnê hatin nîqaşkirin. Nêzîkatiyên terz, şêwazê me çi ne û hwd. hatin nîqaşkirin û asteke rexneyan jî pêş dikeve. Lê belê ji hemû pirsgirêkan re nebû çareserî. Li hemberî rexneyan helwestên takekesî pêş dikevin, xwe ji rexneyan re girtin çêdibe. Di nav Tevgera Jin de nêzîkatiyên wekî "ez navend im, ez ferdî me" pêş ketiye. Ev feraset in û di roja me ya îro de jî hinekî dibin asteng. Tabî di vê demê de di Tevgera Jin de pêşketinek, vebûnek çêbûye, lê rexmê wê jî hîna hinek pirsgirêkên wisa tên jiyîn.

Di sala 2002'yan de êdî xebatên Başûr jî di bin navê PÇDK'ê de xwe birêxistin dikin. Li wir Tevgera Jinên Azadîxwaz a Kurdistanê (TJAK) tê avakirin.

Di rêxistina perçeyan de şaşîtiyek bi vî rengî hebû; wekî Ferhat wana bi zanebûn dikirin. Her kadro ji kîjan perçeyê bûya, ji wir re dixwestin. Hevalên Başûr ji Başûr re, yên Rojhilat ji Rojhilat re dixwestin. Ya rastî bi vî awayî karakterê hêzên me yên artêşa

gerîla bû yek reng, ev cudabûnek pir xirab bû. Çima? Ji ber ku artêşa me artêşek netewî ye. Pêkhateyeke me ya kadro netewî ye, tu nikarî cudabûnê têxî nav. Gelek kadroyên me jî wisa telef bûn, çûn. Di perçeyan de rêxistinên cur bi cur çêbûn. Mesela, li Rojavayê Kurdistanê Kemalê Sor ew hevalên Rojava hemû li derdora xwe kom kirin. Başûr jî, Bakur jî wisa. Di vê demê de ferasetên perçeyan pêş ketin.

**Konferansa PJA ya Çaremîn:**

Di sala 2003'yan de Amerîka amadekarî dikir ku mudaxeleyê Iraqê bike. Sala 2001'ê mudaxeleyê Afganîstanê kirin û bi vî awayî di meha Adarê ya sala 2003'yan de mudaxeleyê Iraqê kirin. Ev zemîn wisa kir; dewletên statukoparêz ên di herêmê de hene, Kurdistan jî di bin dagirkeriya wana de ye. Esas ew derfetekê jî te re diafirîne. Jixwe di derve de jî mudaxele tê, sîstema wan hildiweşîne. Tu hêzeke rêxistinî bî, bi însiyatîf bî tu dikarî ji vê hewayê sûd bigirî. Ev guhertin û pêşketin heya astekê hatin nîqaşkirin ku, em ê vê pêvajoyê çawa binirxînin, lê ji ber ku di nav rêxistinê de meylên cuda hebûn, meylên tesfiyekaran diyar bû.

Di wê sala 2003'yan de êdî Ferhat û Botan eşkere nîqaş kirin. Di nîqaşên wana de jî Amerîka ji herêmê re nûbûnê tîne, pêwîste em jî piştgiriyê bidinê, derdiket. Halbûkî xeta me cuda ye. Serok digot, "*Xeta me, xeta sêyemîn e, alternatîf e.*" Xeta me ji gelan re pêşengiyê dike, lê Ferhat wana dixwazin me bixin hêzên yêdekê quwetê Amerîkayê. Wê demê Amerîka xwest li ser Tirkiyê mudaxele bike, lê Tirkiyê qebûl nekir, hevsengî cuda meşiya. Ji bo vê, paşê Amerîka xwe sipartiye hêzên Kurd ên Iraqê. Amerîka ket Iraqê, hêza yekemîn ku ala Amerîka rakir hêzên Kurd bûn. Wekî Amerîka ji wana re azadî aniye! Peykerê Saddam Kurdan hilweşandin. Tirkan destûr nedan, destûr bidana wê bêfikar êrîşî me bikirana. Serok, wê demê ev xist rojeva me ku "*xeterî heye, pêwîste hêzên parastinê amade bin ku di vê pêvajoyê de mudaxil bibin.*" Li ser van esasan got, "*Edî çareseriya demokratîk çênabe,*

*derfeta wê nîn e, dijmin her dixwaze me tune bike. Pêwîste ev biryar bê guhertin.*” Serok, di sala 2003’yê de bi awayek zelal got û xwest em agirbestê rakin.

Di meha Tîrmehê de Civîna Navendî ya Partiyê hat lidarxistin. Careke din meylên tesfiyê ango Ferhat û Botan xwe pir diyar kirin û gotin; “Pêwîste em Amerîka destek bikin.” Di vê demê de êdî mudaxela li ser Iraqê çêbibû. Pozîsyona me pir bandor nekir. Li hinek cihan valabûna rêveberiyê çêbibû, quwetê me çûn ji cihên hilweşandî çek rakirin. Halbûkî sîstema Iraqê hilweşiya, derfetên siyasî, rêxistinî û heta leşkerî te dikarî bi kar bînî. Lê me wisa nenirxand.

Jinê jî ew cudabûn dida diyarkirin. Nimûne; Botan, Dilar û hevala Jiyan Deniz ji xebatên Rojava hatin, jixwe qad jî tesfiye kiribûn. Tîpên wan êdî ne li gorî kadro bû. Ya rastî xwestin peyamekê bidin. Normal di civînan de hevalên jin û xort wê li ku derê û çawa rûnin zelal e, lê belê ew li gel hev rûniştin. Ev hemû di bin navê em demokrat bûne de dikirin. Te digot qey tiştê berê dihat ferzkirin pîvanên feodal bûn, vê carê jî em biguherînin. Li wir kesên ku bi wana re bûn, zelal bû. Di vir de vesaziya wana çêbû. Di vê civînê de hinek mijar eşkere hatin nîqaşkirin. Di nav zilaman de ji hev cudabûnek hebû. Rêveberiya Tevgera Jinê jî got, “Em nebin alîgirê wana. Jixwe hinek kes ji hev cuda bûne, lê em bêteref nêz bibin, bila ew li hev bidin.” Bi vî awayî Tevgera Jin sekneke bibandor raber nekir. Yek jî, tevlîbûneke belav ji bo wê civînê çêbû, tevlîbûneke bi rêxistinî ji aliyê hevalên jin ve çênebû. Niha di nav me de çandeke me hevalên jin heye; kîjan civîna giştî be, dema em beşdar bibin, di navberê de hevalên jin cuda kom dibin, di nav xwe de li hev dişêwirin, nêzîkbûnekê diyar dikin. An jî dema rewşek tê jiyîn, wê helwesta me wekî tevgera jin çi be, ev tê zelalkirin, yek nêrîn derdikeve. Lê di vê civînê de qet tiştek wisa çênebû. Piştî civînê wê civînek din bikarana, jixwe em ji wir derketibûn, ango em ên Hêzên Taybet bûn, hevalan gotin pêwîst nake hûn tevlî bibin, ji ber ku sivîlbûn pir pêş ketiye. Dil xwe de

destpêkê hinek kesên ji hêzên me yên leşkerî man ku tevlî bibin, piştî nîv saetê ew jî hatin. Hatîce helwest datîne, dibêjin “me tiştek nîqaş nekiriye, meylên vana cuda ne. Em artêş in, em bi wana re nabin yek.” Jixwe hêzên me yên gerîla anîbûn û hatibûn.

Di wê civînê de van kesên tesfiyekar bi rêxistinî tevlî bûn, jixwe biryara şer nehat girtin. Rexmê ku Serok biryara rakirina agirbestê da, di civînê de biryara şer jî derneket. Lê biryar hat girtin ku Biryargeha HPG’ê biçe Behdînan û hêdî hêdî amadekariyên şer bike. Ev jî di meriyetê de çêdibû. Îhtimala ku di pêşerojê de şer derkeve û em amadekariyên xwe bikin, derket. Jixwe biryara herî saxlem ew bû: Biryargeha HPG’ê xwe ji Qendîlê bikişîne Behdînan, xwe nêzî Bakur bike, ji bo pêşerojê bikaribe şer bike.

Gelek mijarên wekî demokrasî û hwd. xistin nîqaşê. Mesela, eşkere digotin “pêwîste ev rêveberiya navendî bê guhertin, ev rêveberî kevn e, kes pêwîste werin guhertin, êdî em ciwanan têxin rêveberiyê, pêşiya ciwanan vekin. Divê em demokratîk bin, hûn pir merkezî ne, desthilatdarî heye.” û mijarên hwd. nîqaş dikirin.

Hevalên jin di wê civînê de qet bandora xwe nebûn. Yek ji hevalê bibandor, hevalê Erdal bû. Jixwe Ferhat ew jî bêdeng kir, jê re got “Tu sîxurê Almanan î.” Hevalê Erdal bi gotina “Divê em biryara şer bidin, ji ber Amerîka ne xeteke ku em qebûl bikin. Wê me ji cewherê me vala bikin û me bikişînin xeta xwe.” helwest danî. Wê demê eşkere êrîşî hevalê Erdal kirin. Bi taybetî Alî Dûrsûn hindik mabû bi ser de biçûya. Hevalê din ê bibandor jî hevalê Apê Huseyîn bû. Ferhat, ji Apê Hus re -kî wê çaxê cilên Hêzên Taybet kesk bûn- digot, “Ev çi ne? Vanên kesk mirov ji wan ditirse! Çi hûn biryaran reş dikin?” Ferhat bi vî awayî ew heval jî bêdeng kirin, pêşî li wana girtin. Li wir ev biryar hat girtin ku HPG bi awayek serbixwe xwe birêxistin bike. Ne ji bo HPG biryaran xwe bi xwe bide; êdî em dixwazin siyasîbûnê pêş bixin, em ê di civakê de xwe birêxistin bikin. Ji ber ku Ferhat got, “em demok-

ratîk bûne, divê HPG xebatên xwe xweser bimeşîne" û bi vî awayî biryar hat girtin. Jixwe piştî wê re HPG'ê konferansa xwe li dar xist, ji wir û şûn de xwe xweser birêxistin kir û heya roja îro jî wisa didome. Wana digotin "HPG amûrekî şîdetê ye". Wekî her tişt temam bûye, çareser bûye! HPG'ê, konferansa xwe li dar xist. Êdî jin jî rêxistina xwe ya xweser heye, lê belê wê di giştî de pozîsyona wê di kîjan astê de be, hîn zelal nebû. Demekê wiha dihat dîtin; HPG xebatên xwe xweser in, xebatên jin jî xweser tên birêxistinkirin, lê girêdayî HPG'ê ye. Ev dihat wê wateyê ku xebata jin a gerîla ji Tevgera Jin a giştî jî qut dibe.

Di nav nîqaşên wê civînê de meylên tesfiyê dixwestin biryara "Reforma Sosyal" bigirin. Helwesta hevalên jin jî wisa bû: Em ê konferansê çêbikin û li wir biryar bigirin li ser vî tiştê ku Ferhat ferz dike. Dîsa di wê demê de Ferhat rexmê ku berê ewqas jin ditepisand, pêşniyar kir ku êdî Tevgera Jin xweser bê birêxistinkirin. Ev hemû jî di bin navê demokrasiyê de dikirin, di cewher de jî dixwest hevalên jin bide pişt xwe. Ez dixwazim vê jî bibêjim, eger Tevgera Jin wê demê rola xwe bileyîsta, wê hevalên xort jî bandor bikira. Ji ber ku wê demê pêşengî pêwîst dikir. Rêveberiya Tevgera me di wê pêvajoyê de pêşengiyek rast nake. Hin hevalan di roja îro de jî rexneya wê didin. Ji bo wê demê Serokatî perspektîfeke wiha da: "*Şoreşa min sê merhele ye; şoreşa cinsiyet, ekolojî û demokrasî. Şoreşek ku xwe tenê bispêre siyaseta çînî, ew ji bo min teng e. Bi taybetî ji bo jin min şoreşeke zayendî pir mezin fikirîbû û vana esas in. Ez bi vî awayî li şoreşê dinêrim.*" Yanî Serok ji bo pirsgirêka jinê dîsa dibêje "şoreş". Çima? Ji ber meseleya "reforma sosyal" ket rojevê, wana jî digot "ne şoreş, reform". Lê Serok dîsa jî di vê perspektîfê de israr kir.

Dawiya meha Cotmeha 2003'yan Konferansa PJA ya 4. hat çêkirin. Ji nav eniya jinê ve guhertin wê çawa bên pênasekirin, pêwîste em bi amadekarî têkevin vê pêvajoyê, li ser vê nîqaşê re konferans tê meşandin. Dibe ku konferans wekî kongreyê bibandor nîn e, ji sedî sed nikare guhertinê çêbike, lê konferans bin-

geha guhertinekê çêdike. Dîsa biryara reforma civakî hat girtin. Nêzîkbûna wê wisa ye: Eger em vê biryarê negirin, zilam jixwe wê bigire. Ev ji bo me xeter e, ji ber ku hinek kesên di asta rêveberiya jin de ji xeta azadiyê derketibûn. Biryareke bi vî awayî girtin tê wê wateyê ku, êdî Ferhat di nav rêxistinê de hêz e, jixwe wê biryar bigire û xwe di ber xeta wî de razandine. Di encamê de xeta Serokatî bêparastin ma, xeta azadiyê bêbandor ma. Di vê pêvajoyê de xetaya me ya herî sereke, ev biryar bû. Tabî pirsgirêkên kadroyî û birêxistinbûnê hebûn. Di encamê de tu vê dikî biryareke konferansê. Biryara ku êdî Hereketa Jin serbixwe be hat girtin. Ev pêşiya perçebûnê vedike, êdî tu nabî hêzeke netewî. Ev jî bêbandorbûn e. Ji ber tu hem xwe perçe dikî, hem jî quwetê xwe perçe dikî; li qadan hevalên hene, wê çawa bin? Ev biryar wekî biryareke erênî, serbixwe tê dîtin, lê ev biryar bêbandorbûn e. Serokatî, her perspektîf dida ku em xweser xwe rêxistin bikin, qut bin, lê jin tu carî ji tevgera giştî qut nekir, ji ber ku ew wekî temînatê raber kir.

Ew hevalên xort ên di zemînê jin de perwerde dibînin, jixwe ew jî tevlî van biryaran dibin, ev encama perwerdekirina me ya zilam bû. Jinan ew zilam perwerde kirin, lê ew zilam jî biryara reforma civakî û biryara ku tevgera jin ji tevgera giştî qut bibe destek dikin. Ango xebata guhertina zilam jî bi vî awayî encameke berevajî derxist holê. Ji vê konferansê tenê 3 kes diçin zemînê gerîla. Ango êdî gerîla ketiye plana duyemîn. Bi vê konferansê re em ji “şoreşa civakî” êdî daketin “reforma civakî”. Ya rastî şoreşa civakî, dibe şoreşa reforman. Ev tê wê wateyê ku ji Serok re nêzîkbûnek stratejîk nîn e, şoreşa azadiya cinsiyetê nîn e. Ya yekê ev e. Ya duyem, li hemberî xetê nêzîkatiyeke pir seresere heye. Bîrdoziya te dikeve nîqaşê, mesela xetê tê berdan. Encama wê jî wisa ye; êdî tu zilam pir tehlîl nakî, tu zilam disekinînî, pirsgirêk em in, em ê tenê xwe bigirin dest, lê terefê ku tu pê re têkoşîna cinsî bikî tu bêpênase dihêlî. Êdî bi gotina “em bi zilam re mijûl nebin, bila ew bi xwe xwe re mijûl bibin” tehlîlên zilam disekinîne. Dema em

tehlîl nekin, bi xwezayî zilam serdest e, tu jî daxilê wî dibî. Em pê re di îtifaqê de nîn in, lê em daxil bûne. Jixwe têkoşîna cins hatiye cemidandin. Xala din, têkiliya me ya bi azadiyê re qut dibe. Wekî mekan jî be meylên ku dixwazin ji çiyê qut bibin, esas ji azadiyê dûrketine.

Piştî van xebatan Civata Giştî ya Kongra Gel a 1. di navbera 27'ê Cotmehê û 6'ê Mijdara 2003'yan de kom dibe. 360 delege tevlî dibin. Serokatî ji bo wê Kongreyê gotibû, "*Divê KNK û KADEK bibin yek*", lê ew çênebû, ji ber hinek kesan li Ewrûpa statu girtibûn. Ya din jî, gelek ji wan li Ewrûpa kar dikin, eger cihê xwe bigirin, divê werin çiyê. Ji ber vê sedemê bi rastî nabe. Komkirina Kongreyê li ser vî esasî çêdibe, lê meylên tesfiyekaran xwe li ser vê kongreyê ferz dikin.

Di destpêka Kongreyê de ji bo Tevgera Jin bibandor nebe, ji şehadeta hevala Gulan sê kesên ji rêveberiya jin wekî berpirsiyar tên dîtin. Jixwe wan kesan nagirin Kongreyê, derveyî Kongreyê dihêlin. Xefkek çêkirine û dibêjin, "ji şehadeta hevala Gulan hûn berpirsiyar in." Dibe ku wana kes bin, lê Tevgera Jin wisa di bin tohmetê de dihêlin, dixin bin êrîşê. Bi vê re dixwazin çi bikin? Bi vî awayî wê tesfiyekar meyla xwe di wê Kongreyê de bikin biryar, lê ger Tevgera Jin li ber xwe bide, wê bi vî rengî pêşiya wana bigire. Ji bo Tevgera Jin nikaribe li ber xwe bide nêzîkatiyek wisa derxistin pêş.

Xusûseke din, HPG'ê ji bo pîrozkirina salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê sala 2003'yan şahiyek amade kir, lê li wir hevalê Erdal bi qezayê şehîd ket. Di encama lêpirsînê de jî zelal bû ku qeza bû. Lê di Kongreyê de meylên tesfiyekaran ev rewş şixulandin û gotin, "Jixwe HPG rêxistineke kujeran e…" Rexmê ku dizanin qeza ye, dibêjin "hevalê Erdal jî di nav xwe de birin", yek-du bûyerên wisa hene. Dixwazin wisa hêzên ku li hemberî tesfiyekaran li ber xwe didin bêbandor bikin. Yanî du hêzên berxwêder hene; jin û gerîla ye. Dixwazin HPG'ê bi gotina "HPG kujer e" bêbandor bikin. Jixwe

bi vî awayî quwet dikeve kongreyê, ango zextek wisa heye. Heta piştî wê kongreyê jî, heta destpêka sala 2004'ê jî her roj komîteya amadekar xeber ji HPG'ê re dişand û digot, "Pêwîste HPG di nav xwe de biryara reforma sosyal bigire". Fermandariya HPG'ê wê demê di nav xwe de nîqaş dikin, dibêjin, "zoriyê didin ser me, me tengav dikin."

Têkildarî helwesta HPG'ê; ji wê Kongreyê şûn de hevala Nûda hemû dahûrandinên Serokatî yên der barê projeyên jiyana azad, şoreşa civakî û hwd. de kom kir, anî gel hevdû û sala 2004'an dema Konferansa YJA-STAR çêbû, ew nîşan da. Hevala Nûda got: "Min hemû nirxandinên Serok kom kirin û wekî projeyekê aniye. Jixwe ew hene, em pêkhateya kadro ne, milîtan in, em her roj li ser wana perwerde dibînin û di nav xwe de nîqaş dikin. Çi pêwîste em bi navê projeya 'reforma sosyal' tiştekê derbixin!" Hevala Nûda helwestek wisa raber kir. Em hîn di Konferansê de bûn hevdîtin bi Serok re çêbû û got: "*Bila kes vê neke meseleyeke siyasî, dahûrandinên min diyar in. Kî dixwaze têkiliyeke cuda ji xwe re jiyan bike, bila wekî kesên civakê jiyan bike, lê bila kes li ser navê nûbûnê neke.*" Perspektîfên me li wir wisa zelal bûn. Jixwe bi vî awayî me projeya reforma sosyal ji Konferansa YJA-STAR jî rakir.

Projeya reforma sosyal, paşê di Civata Giştî ya Kongra Gel de dikin biryar û di erêkirina Kongreyê re derbas dikin. Ferhat wana projeyek pêş xistine, rêveberiya Tevgera me ya Jin jî, di Kongreyê de radibin û vê dibêjin: "Em dikarin projeya xwe û ya Ferhat bikin yek." Bi vî awayî projeya Tevgera Jin û projeya Ferhat wana amade kirîn, dikin yek û tevlî ya Ferhat dibin. Ji bo HPG'ê serdegirtin çêdibe, ji bo rêveberiya HPG'ê Ekrem amade kirine. Wisa eyar dikin ku, wê hinek xwe paşde bikişînin, hinekan bihêlin, lê heval ferq dikin. Wana qurnaziyek wisa dikin: Giştî hevalên ku ji bo HPG'ê amade kirine, têxin rêveberiya Kongra gel, paşê jî wê bêjin "tu di rêveberiyê de yî, nabe tu bibî fermandarê HPG'ê." Li ser vî esasî hema hevalê Bahoz ji bo rêveberiya Kongra gel pêşniyar

dikin. Lê ji ber heval ferq dikin, jê re dibêjin xwe paşde bikişîne, hevalê Bahoz jî xwe ji rêveberiyê dikişîne. Bi vî awayî HPG'ê dixin temînatê, yan na HPG jî wê ji dest biçûya.

Di vê Kongreyê de biryara ku Tevgera Azadiya Jinê serbixwe be, tê girtin. Bi giştî ji bo Tevgera Jin dixwaze vê bêje. Hin kes jî wê bimînin. Jixwe biryara rakirina agirbestê ku di 1'ê Îlonê de pêwîst bû pêk bihata, nagire. Bi taybetî ji bo pêkhateya jin êdî xwe perçiqandin, xwe înkar kirin û hwd. sekneke bi vî rengî derdikeve holê. Heya hin kesan polîtîkaya "ka em binêrin wê çi bibe" pêş dixin, lê beşeke berxwêder jî heye. Demekê nîqaş dihat meşandin ku, gelo wê Tevgera Jin jî derbasî Iraqê bibe? Li dijî vê seknek hebû, lê rêveberiya tevgera jin a wê demê xwe pir zêde ji Iraqê qut nekir. Jixwe li Iraqê qezayeke trafîkê çêbû, ev bûyer wekî "*Qezaya Sûsûrlûkê*" derbasî dîroka me dibe. Di bûyera Sûsûrlûkê de erebeyek li kamyonekê ket, tonek çek ji erebê deketin. Yên me jî qezayek kirin, di erebeyê de ev kesên bi tesfiyekaran re bûn û hinek kesên di rêveberiya tevgera me ya jin de cih digirin, hemû bi hev re ne. Piştre wisa bi nav kiribûn û gotibûn "vaye em çûne ji bo wan kesên tesfiyekar ên çûne Iraqê îqna bikin." Esas mesele ne ew bû, di rastiyê de diçûn ji bo bi hev re xwarinê bixwin. Jixwe ev zelal bû. Heman demê li Iraqê civînekê çêdikin. Hevala Pelşîn e, Rengîn e û kesên ku bi meylên Ferhat re tevdigeriyan bûn.

Di wê civînê de bi hevparî nêzîkbûneke bi vî awayî diyar dikin: "Her kes bila ji rêveberiyê derkeve, lê bila Botan tê de bimîne." Wê demê jî hevalên ku li Iraqê hene hinekan beşdarî civînê nakin û rêdikin welat. Ev jî ji ber ku ew ê di demê pêş de civînekê çêbikin û dixwazin vê biryarê bidin hîskirin. Hevala Şîlan dinêre ku ev nêrînek pir xeter e, rexmê ku ew jî di nav rêveberiyê de ye pêşî lê digire, helwest datîne û tu nêzîkatiyek wisa pêş naxe. Lê li vê derê nêrînek wisa çêdibe; êdî pozîsyona Tevgera Jin yêdekê meyla Ferhat wana ye. Wexta em behsa van pirsgirêkên hundirîn dikin, Tevgerê giştî xeta berxwedanê berdaye, ne wisa ye. Di vê

demê de xebata gerîla heye, di qadan de heval dixebitin, dibe ku haya gelek hevalan ji van tiştan tune ye, lê di asta rêveberiyê de tê jiyîn. Hevala Şîlan helwest datîne, pêşî li wan digire, ew jî di rêveberî de ye.

Nerînek wisa jî derdikeve; Tevgera Jin ketiye yêdekê xeta Ferhat wana. Di destpêka meha Sibata 2004'an de li Şehîd Ayhan civînek çêdibe, wê demê jin eşkere hin mijaran nîqaş dike. Eşkere dikin ku ber bi meylên tesfiyekaran ve çûne, bi wana re li Iraqê hevdîtin pêk anîne. Ya rastî ev jî ji bo kombûna Tevgerê zemînekê ava dike. Rewşa jin a heyî hat nîqaşkirin û ev tespît çêbû; di bin navê ku em nebin alîgirê zilam, serbixwe bimînin de me xwe bêbandor hişt. Dîsa di xetê de helandinek çêdibe, heta ji xeta azadiyê dûrketin heye û her wiha bi zilam re ketina dengeyê heye. Ev mijar wisa eşkere tê nîqaşkirin. Dîsa di vê civînê de hat dîtin ku eger Tevgera Jin bi vê pozîsyonê dom bike, wê xwe ji Serokatî qut bike. Heman demê biryar hat girtin ku ew rêveberî ji erkê bê girtin. Di asta hin hevalan de lêpirsîn hat destpêkirin, dîsa ji navenda PJA rapor hat xwestin. Bi vî awayî mudaxeleyek cidî çêdibe. Biryara ku Kongreya PJA ya 5. bê lidarxistin hat girtin. Komîteya amadekar hat sazkirin, êdî em dixwazin kombûnekê çêbikin. Jixwe rêveberî jinûve tê birêxistinkirin. Di vê civînê de hêza Hêzên Taybet ku di bin navê serê xwe ji Tevgera Jin qut bûye de, têkilî jinûve hat avakirin. Di dîroka me de herhal civîna ku asta xwe ya rexnekirinê herî bilind, ev civîn e. Li ser vê bingehê têkoşîn tê bilindkirin.

Xala herî girîng, di sala 2004'an de Serokatî bi parêznameya xwe ya bi navê "Parastina Gelekî" mudaxeleyê pêvajoyê kir. Serok wê demê eşkere got pêwîste her kes xwe zelal bike. Bi vî awayî jinûve avakirina PKK'ê xist rojevê. Ya rastî Serok ji tevahî hereketa me xwest rexneyên xwe bidin. Ji bo vê di pirtûka Parastina Gelekî de dibêje, "Li ser navê PKK'ê rexne û rexnedan". Jixwe pêvajoya rexnedanê ji xwe ve destpê kir û ji her kesî rexnedan

xwest.

Di meha Nîsana 2004'an de civîna rêveberiyê çêdibe, ew jî civîna ku her kes xeta xwe zelal bike. Li wir Ferhat dîsa eşkere dike ku erka xwe, perçiqandina Tevgera Jinê bû. Jixwe Serok di wê demê de bi gotina "xeta rastgir û xeta çepgir" rexne kir. Bi piranî xeta çepgir ji ber xeta Serok neparastibû, hesab jê hat xwestin. Piştî vê civînê Hereketê hêdî hêdî xwe komî ser hev kir. Li ser van esasan Komîteya Jinûve Înşakirina PKK'ê hat sazkirin. Serok got, "*pêwîste hûn PKK'ê jinûve bigirin dest, bila jinûve were avakirin.*" Ji ber di holê de partî nemaye, heta xeta bîrdozî nemaye. Serok wisa mudaxele dike.

Di sala 2004'an de Civata Giştî ya Kongra Gel a 2. tê lidarxistin. Di vê kongreyê de biryardariya di xeta Serokatî de derdikeve holê. Bi rexneyên Serok êdî xeta tesfiyekaran jî bêbandor dibe, mudaxele li ser çêdibe. Biryara herî girîng di vê kongreyê de derdikeve, di xeta parastina rewa de têkoşîn kirine. Biryara Hemleya 1'ê Hezîranê di vê kongreyê de tê girtin.

Paşê tesfiyekaran dîtin ku ji wana re zemîn nemaye, reviyan. Halbûkî beriya wê armanca wan tesfiyekaran ew bû ku, Tevgerê giştî bixin destê xwe. Gelek kes bi tesfiyekaran re çûn, lê hemû ne bi tesfiyekaran re bûn. Ev şîlobûn û nezelalbûna di Hereketê de hebû hiştiye gelek kes di navberê de tengav bibin û ji ber wê jî gelek kadro çûn. Tesfiyekaran jî beşek zêde birin, xwe li qadan belav kiribûn, bandora xwe çêkiribûn. Ji ber texrîbatên wan zêde ye, bi taybetî li ser qada civakî, Rojava, Rojhilat, Bakur û Başûr. Jixwe zemînê Iraqê di wê pêvajoyê de bibû navenda tesfiyekaran. Eşkere bû ku di sekna jinê de nêzîkbûnên zilam bandor dikin û êrîşeke tesfiyekar heye, ev jî bandor dike, lê pêwîste mirov şikandina di kadro de tenê bi tesfiyekaran îzah neke. Rexnedana herî mezin ji me re ew e ku, di cihê rêveberiyê de xwe xistina pîvanan pêş ketibû û li ser Tevgerê xwe wekî xeta azadiyê ferz dikirin. Di wê pêvajoyê de gelek kadro bêxwedî di navberê de

man. Di encamê de ev pêvajo bedêlê xwe jî giran bû. Her çiqasî bilanço nebe jî, bi hezaran kes çûn. Bi vê ve girêdayî, kadro di navberê de man. Heta gelek kadro bêxwedî man, kes li wan xwedî derneket, li naverastê man. Jixwe gelek xebat bi serê xwe man, sewq-îdare kirin, li hev komkirin nebû. Di însafa hinek kesan de ma, ji bo wê bedêlê vê pêvajoyê girane. Em nizanin, bîlanço nîn e, lê bi hezaran çûn îxanetê. Serokatî ji bo vê jî got, “*Jixwe tesfiyekar zelal bûn, lê yên ku di navberê de mane, ji bo wan efûyê derxin, bila vegerin.*” Wisa bang li wan dikir. Jixwe qismek kesên bi dijmin re neketibûn têkiliyê, neketibûn lêgerînên cuda yên derveyî xetê vegeriyan, qismek reviyan û qismek jî winda bûn.

Di wê pêvajoyê girtina biryara Hemleya 1’ê Hezîranê ji bo me girîng e. Hemleya 1’ê Hezîranê ji bo me wekî Pêngava 15’ê Tebaxê ya duyemîn bû. Ji ber ku li hemberî tesfiyeyên di hundir de seknek e û xeta berxwedanê derxistina pêş e. Ya din jî, van meylên tesfiyekar ji dijmin qut nîn in. Ev kesên tesfiyekar, eşkere bû ku bi Amerîka re rûniştine, ango xeta Amerîka li ser me tê ferzkirin. Bi şîdetê nikarin me xilas bikin, ji bo vê jî di jiyanê de bi bêesilkirinê, bi rizandinê dixwazin me xilas bikin. Ya rastî êrîşî cewherê me kirin, êrîşî rêhevaltiya me kirin. Bi têkiliya jin û zilam a ji rêzê û hwd. xwestin Hereketa me tesfiye bikin û li bendê bûn. Jixwe konseptek navnetewî hebû, eger nikaribe PKK’ê bi leşkerî tune bike, vê carê di xetek cuda de “bê APO, bê PKK” ji cewherê xwe derkeve û bikeve bin kontrola van dewletan. Li ser van esasan Hemleya 1’ê Hezîranê dawî anîna li êrîşên dijmin e. Di sala 2003’yan de wekî hemleyekê HPG’ê biryar girt ku di Bakur de hinek amadekariyan bike, hevalên jin çûn eyaletên Botan û Dêrsimê. Di wê salê de rexmê ku şer nebû jî, çûyîna hevalan li Botan û Dêrsimê çêbû. Derbasbûna Bakur ji bo me hemleyek bû. Di wê salê de ji ber şer nebû, şehadet tune bû, tenê li Dêrsimê hevala Agirî ji tehtê dikeve û şehîd dikeve.

Pêngava 1’ê Hezîranê zehmetiyên xwe hebûn. Ji hemleya 1’ê

Hezîranê re planek çawa lazim e, wê şer destpê bike? HPG'ê bi rastî di asta taktîk de nîqaşên ku wê demê kir, hema hema wekî roja îro ye; yanî ev şer êdî bi şêwazê berê nabe. Di gerîla de nûbûnek çêbûye, perwerde hatiye dayîn û dixwaze bigihîne asteke profesyonel. Şêwazên cur bi cur derketin, taktîkên sabotaj, suîqest û hwd. esas hatin girtin. Em şer bi van şêwazan pêş bixin, em şer tenê bi çiya re sînordar nehêlin, em bipijiqînin bajaran û hwd. pir nîqaşên bi vî awayî çêbûn. Di sala yekemîn de şer nebû, lê di sala duyemîn de şer kûr bû.

***Di Pêngava 1'ê Hezîranê 2004'an de hevalên şehîd ketin;***

**Hevala Rûken**; ji Mêrdînê bû, endama Hêzên Taybet bû. Hevala Rûken, ji bo ku di metropolan de çalakî bike diçe Antalya û li wir bomba wê di destê wê de diteqe. Bi vî awayî wekî fedaî şehîd bû.

**Hevala Silav;** ji eyaleta Botanê çû navenda Sêrtê ku çalakî bike. Beriya biçe çalakiyê nameyên xwe hene, hem girêdana xwe ya bi Serokatî re û hem jî helwestên xwe li beramberî xeta îxanetê nîşan dide.

**Hevala Têkoşîn;** li Dêrsimê rêveberiya herêmê bû û li wir şehîd dikeve. Li ser kampê serdegirtin çêdibe, şer destpê dike, heval li wê derê li ber xwe didin. Hevala Şînda û Têkoşîn bi hev re şehîd dibin.

**Kongreya PJA ya Pêncemîn (Damezrandina PAJK):**

Kongreya PJA ya 5. di navbera 17'ê Hezîranê û 2'yê Tîrmeha 2004'an de hat lidarxistin. 240 delege û 60 guhdar beşdar bûn. Di çarçoveya parêznameya Serokatî de pêwîste bibe kongreya rexne û rexnedanê, heman demê xwe jinûve avakirinê. Ev kongre erkeke xwe ya wisa hebû. Dîsa di sekna bîrdozî de tespîta ku "em ji Serok qut bûne" hat kirin û di vê çarçoveyê de bi Serok re 24 sae-

tan jiyankirin wekî biryar hat girtin. Her wiha pirsgirêkên ku dihêlin em ji Serokatî dûr bikevin, pêwîste em wana derbas bikin. Biryardariyek wisa di vê kongreyê de derdikeve. Li gorî perspektîfên parêznameya Serokatî jinûve avakirina PJA bû biryar. Bi tevlîbûna hêzên YJA-STAR, YJA û PJA'yê ev kongre çêdibe û PJA êdî dibe PAJK (Partiya Azadiya Jin a Kurdistanê), di bin sîwana wê de çi xebat hebin, divê jinûve bên avakirin. Beşê me yê esasî gerîla, partî û xebatên civakî jinûve biryara birêxistinkirina wê tê girtin. Nêzîkatiya reforma sosyal hat mehkûmkirin û şoreşa civakî esas tê girtin. Konferansa Çaremîn a PJA'yê ku biryara reforma civakî derxistibû wekî tesfiye hat nirxandin. 3 hevalên rêveberiyê ku di lêpirsînê de bûn, di platforman re derbas bûn û helwest li hemberî wan hat nîşandan. Biryara ku PAJK di navbera salekê de xwe jinûve saz bike, hat girtin.

Hevala Nûda û Viyan Caf di nav Komîteya Jinûve Avakirina PKK'ê de cih girtin. Jixwe ev komîteya înşayê ji aliyê Serok ve hat pejirandin. Di destpêkê de nepejirand û got "*ez ê li pratîka wana binêrim.*" Xebata Komîteyê ya yekemîn wiha bû; bi kesên tesfiyekar re hevdîtin pêk bînin, nîqaşan bimeşînin û li ser esasê jinûve qezenckirina wana bi riya rexne û rexnedanê hewldan.

Ji bo Kongreya PJA ya 5. tiştên ku kêm mane, divê mirov bibêje. Berê di navbera PJA û YJA-STAR de nakokî hene, rewşeke nebaş bû. Hêzên gerîla wekî li derve hiştibûn. Lê hin kesan di kongreyê de bi gotinên wekî "Tevgera jin şaş bû. Hûn çima me dinirxînin? Em artêşeke fedaî ne." wekî meydan xwendin, wisa nêzîkatiyên xwe yên ezezî jî ferz dikin. Li gorî xwe bûyîn derdiket. Tabî tevgera gerîla hemû wisa nêz nedibûn. Ji hev qetandin, ji hev cudakirin dibe sedem ku hinek nakokî derkevin. Niha pirsgirêkan rexne bike û rexneya wê bide, ev baş e. Lê vê carê jî nêzîkbûneke wisa derdikeve; wekî Tevgera Jin bêwate ye. Ev wekî encam ji bo me baş nîn e. Lewaziyên wisa hebûn, hinek kesan lewaziyên xwe bi pirsgirêkên di navbera YJA-STAR û PJA'yê de hebûn re îzah dikirin. Ji bo vê rexnedana hinek kesan tam rast

nayê destgirtin, lewaz dimîne. Dîsa rexne zêde pêşde ye, lê çareserî ji wana re peyda kirin jî pêwîst e. Di rêveberiyê de berpirsyarî girtina ser milê xwe lewaz bû. Astek di nîqaşan de derket holê û asteke biryaran jî hebû. Ji ber ku PAJK di nava salekê de wê jinûve xwe ava bike, rêveberiyeke ji 15 hevalan hat diyar kirin, weke komîteya amadekar jî rola wan hebû.

Wê demê perspektîfên Serokatî wiha bûn: "*Di kesayeta jina di nav civaka Kurd de şopên ji serdema neolîtîkê mane, hîn jî bandora xwe didomînin. Li gel vê, qehra hemû pêvajoyên şaristaniyê kişandiye. Ew xwediyê avahiyeke berxwedêr e. Rastî îxaneta serdemê hatiye û ev jî eşkere ye. Dema van taybetmendiyên wê bi hewldanên gerdûnî yên femînîzmê re bên yekirin, partiyeke jin a cuda di têkoşîna azadî, wekhevî û demokratîkbûna civakî de roleke mezin bilîze. PAJK li gorî vê rolê hatiye avakirin. Her çiqasî bi hêsanî nikare ji feraseta zilamtiya serdest rizgar bibe jî, di azadiyê de israr kirin xwediyê girîngiyek wisa ye ku, dev jê nayê berdan. Cîhana jinê ku were azadkirin, jin zekaya hestiyar û zekaya analîtîk yekser bi hev re bixebitîne, ev wê bibe tiştê herî baş. Divê mîtolojî, felsefe, ol û zanist ji aliyê jinê ve di ber çavan re were derbaskirin, bi zekaya jin a xweser û azad were şîrovekirin û derbasî pratîkê bikin. Dema bi zekaya jinê nêzîkatî ji teorî û pratîkê re çêbibe, ev yek wê me ber bi cîhaneke nêzîkî xwezayê, aştîxwaz, azadîxwaz û wekhevîxwaz û bi awayekî hîn watedar me ber bi jiyaneke tijî xweşikbûn ve bibe.*

*Li Kurdistanê di PAJK'ê de israr kirin û pêşketin, dikare me bigihîne dilpakiya xwedawendan, safbûna melekan, xweşikbûna Afrodîtê. Sentezeke jin a bi vî awayî, tu çandeke zilam a çareser neke, tu hêzeke jiyanê ya nekişîne, tu çalakiyeke ku nemeşîne tune ye. Heta di dîrokê de, di mîtolojiyê de dilpakiyeke jinê ya li gorî pîroziya xwedawendan –li hemberî pîrekî û zilamtiya despot a wekî çandeke koletiyê di tevahî dîroka şaristaniyê de her tim hatiye kûrkirin- neyê pêşxistin, di jiyanê de esîlbûn, azadî û wekhevî nayê pêkanîn. Heta ev nirx neyin avakirin, jiyan wê tim wekî*

*nirxeke windakirî bimîne û ji vê yekê xilas nebe.*” Li ser van esasan êdî PAJK di çarçoveya xwedawendbûn, melekbûn û Afrodîtbûnê de pêvajoya jinûve avakirinê dide destpêkirin.

Dîsa nêzîkatiyên şaş ên di zemînê PAJK’ê de pêş ketin, çi bûn? Pirsgirêkên ku berê di zemînê PJA’yê de hebûn, êdî PAJK’ê wana dewr digire, di şêwazê jiyanê de seknên lîberal zêde pêş ketine. Pîvanên jiyanê ku ne aîde me ne, zêde pêş ketine. Di bin navê ku em pirsgirêkên navxweyî yên rêxistinê rexne bikin de, ya rastî nûhîna (aşinma) rêxistinê çêdibe. Ango di bin navê rexneyan de înkar û rêxistina xwe xistina nîqaşê pêş xistin. Tabî ev nêzîkatiyek xeter e. Di têkoşîna hundirîn de kêm mayîn derket holê. Dîsa zemînê PAJK’ê wekî cihekî ku ji artêşê qut e girtina dest pêş ket. Hin kesên ku wê demê di rêveberiyê de bûn, di şexsê wana de bêbawerî li hemberî tevgera jinê ya PAJK’ê pêş ket, wekî pirsgirêk hat nîqaşkirin. Erê niha komîteyek amadekar hatiye avakirin, lê ne di asta ku her kesî bihewîne hundirê xwe û sewq–îdareyê bike. Ev 15 kes encex di zemînê PAJK’ê de pêvajoya nîqaşan destpê bikin. Lê Tevger bê rêveberî ma, sewq û îdara xwe diyar nekiribû. Mijareke wisa jî heye; di Kongra Gel de komîte hatine avakirin, lê wê hemû çawa werin avakirin tam nehatiye zelalkirin. Ev wekî pirsgirêkekê li pêşiya me ye.

Di dawiya salê de êdî hinek nirxandin çêdibin, hem hereketa giştî xwe komî serhev dike, hem jî hereketa jinê. Hemleya 1’ê Hezîranê ketiye dewrê, Hereket hinekî komî ser hev bûye, bandora tesfiyekaran lewaz dibe, mudaxeleya Serok çêbûye. Dîsa li derveyî Tevgera Giştî rêveberiyek xweser jî çêdibe. Ji bilî wê Komîteya Jinûve Avakirinê, rêveberiyeke xweser a sewq û îdareyê tê avakirin. Li vê derê lewaziyên hene tên destgirtin. Di serî de koordînasyonek ji 9 kesan tê avakirin.

Rêxistina YJA (Yekîtiya Jinên Azad) ya civakî heye, dîsa komîteya Kongra Gel a qada civakî, di vir de pirsgirêk heye. Jixwe xebata civakî ya YJA heye, di Kongra Gel de jî heye, di wir de pirsgirêka

perçebûnê derdiket holê. Ji bo di bin siya PAJK'ê de YJA xebatên xwe hîn leztir û xurtir bike û bikaribe komîteyên xwe ava bike û komîteya Kongra Gel jî bihewîne, li ser vê tê sekinîn.

Jinûve avakirina PAJK'ê kêmekê dereng hat xistin. Komîteya ku li ser vî esasî ji 15 kesan hatiye avakirin, xebatên xwe dereng xistiye. Di civîna ku di dawiya salê pêş ketiye de biryar hat girtin ku, pêvajoya jinûve avakirinê bê lezkirin. Di vê civînê de biryarek şaş tê girtin. Ji ber êdî pir ziviriye pirsgirêkên navxweyî, li derve çi dibe çi nabe tam hakimiyetek li ser nîn e. Wê demê hevala Şîlan Kobanê li xebatên Rojava dinêre. Bi rastî hevala Şîlan di têkoşîna xwe de beşdarbûna xwe hebû. Hevaleke di artêşbûna jinê û giştî de, di pêvajoya agirbestê de rolek lîstiye. Li bemberî wan meylên tesfiyekar, nêzîkatiyên şaş sekneke xwe hebû. Di pêvajoya herî tevlîhev de qet ne xwe ji pratîkê da alî, ne jî ji berxwedanê. Mesela, di Kongra PKK'ê ya 7. de Ferhat xwest wê bigire. Çima? Ji ber ku sekna hevala Şîlan radîkal bû, rexnegir bû. Di wê demê de meylên tesfiyekar xwe li Rojava birêxistin kirine. Hevala Şîlan pêşiya wan digire û hewl da pêkhateya rêxistinê kom bike. Ji bo vê jî wan kesên xwediyê meyla tesfiyê hevala Şîlan tehdît kirine, ango ji bo wê xeterî hene. Li ser van esasan diviyabû di civînê de biryara ku wê ji Rojava bikişînin bihata girtin, lê ji ber her navxweyî dimînin, hevalan careke din wê rêdikin wir. Li Iraqê hin saziyên xebatên Rojava hene. Li Mûsilê di 29'ê Mijdara 2004'ê de hevala Şîlan, hevalê Fuat, Zekeriya, Cemîl û Ciwan wexta bi erebeyê diçin, pêşiya ereba wana digirin û derbê li erebê dixin, her pênc hevalan wisa şehîd dixin. Her yek ji wana fîşekekê li dilê wan, yekê li serê wan didin. Jixwe tê zanîn ev komplo tesfiyekaran kir. Fîşeka hem li mejiyê wan û hem jî li dilê wan didin. Ev jî peyamek e, tê vê wateyê ku ew mejiyê wek bi Serok re ye û dilê we yê bi Tevgerê ve girêdayî ye. Ez wan hevalan nas nakim, lê hevalê Fuat ji lingekî xwe gazî bû, Serok wî taybet ji bo karê Rojava şandibû. Hevalê Zekeriya hevalekî fedaî bû. Hevalên din ez tam nas nakim, lê heval di rêveberiya Rojava de bûn û bi zanebûn

hedef hatine hilbijartin. Şehadeta hevala Şîlan ji me re giran hat, nêzîkbûnek wisa seresere heye. Jixwe bi giştî hevalên jin ne di ferqa asta xwe de ne, hevala Şîlan jî wisa bû. Hevala Şîlan ewqas li beramberî tesfiyekaran sekiniye, ji bo vê divê tedbîrê heval bihata girtin, lê nayê girtin.

Sala 2005'an ji bo me salek girîng e, ji ber êdî kombûneke cidî çêdibe. Jinûve avakirina PKK'ê jixwe di rojevê de ye. Êdî pêşengiya îdeolojîk zelal dibe. Kongreya Jinûve Avakirina PKK'ê li Xinêrê hat lidarxistin.

Berî niha me gotibû ku, Tevgera Jin xwe birêxistinkirinê de kêm maye û me tekmîla wê da Serok. Koordîne dixwaze xebatên xwe li ser 9 kesan bimeşîne. Lê wê çawa pêşengiyeke bîrdozî bike ne di wê astê de. Ji bilî wê, wekî di asta agahdarkirinê de çêbû ku îrada xwe ya rêxistinî derxe, wekî sewq-îdare bike, ne bi vî awayî bû. Serok, ji bo Tevgera Jinê perspektîfeke wiha dişîne: "*Ji bo Tevgera Jin êdî mirov dikare rêxistineke sîwan çêbike. Heman demê organeke bîrdozî lazim e bi taybetî di rizgarkirina jinê de. Ji bo PAJK'ê 300-400 kes dibe. Ev jî pêşniyarên min in, lê dîsa hûn dizanin. Doza jin ji bo me girîng e. Rêhevalên jin yên hevgirtî hene û ez bawer im wê bidomînin. PAJK bi vî rengî dikare bimîne û di warê Bîrdoziya Azadiya Jinê de xwe kûr bike. Bi taybetî yê ku ji xwe bawer be û di nav vê pêkhateya bîrdozî de dimîne, ez dibêjim ez bi doza jinê ya mezin bawer dikim. Yê herî zêde ketiyê rûmeta azadiya xwe be, pêwîste dîsa yê ku ji xwe bawer be di vê yekê de cih bigire. Yê esasî cewherê bîrdozîbûnê ye, lê hûn dikarin şeklekê bidin wê. Li ser van esasan hûn dikarin Koma Jinên Bilind wekî rêxistina sîwan a konfederal saz bikin. Wekî modela Kongra gel, lê KJB jî dikare di nav de cihê xwe bigire. PAJK jî dikare wekî rêxistineke bîrdozî bimîne. Ez pêşniyar dikim, dîsa ew dizanin. Lê doza jin ji bo me girîng e. Ez bawer im hevalên bi xwe bawer bin, ku ez bawer im hene û wê bidomînin.*"

Jinûve avakirin bi rastî gavek girîng e. Pirsgirêkên me yên hene,

yek aliyê xwe sîstem e, du jî di warê ferasetan de pirsgirêkên rêxistinî ne. Niha li vê derê hinekî zelaliya sîstemê çêdibe. Pêşiya kongreya KJK'ê me atmosfera PAJK'ê gotibû; meylên jiyana lîberal hene, lêgerînên jiyanê yên cuda hene. Dîsa ew hevalên xort ên li ser projeya guhertina zilam perwerdê di zemînê PAJK'ê de dibînin, bi wana re têkiliyên şaş pêş ketine. Dixwazin li derdora xwe jî pêş bixin, ne tenê di şexsê wan de. Di komîteya amadekar a kongreyê de Sewra û Peyman hebûn. Li vir nîqaş çêdibûn. Ji ber wê zemînê PAJK'ê bi ber rizandinê ve bibin, ev pir xeter bû. Jinûve komîteya amadekar ji bo Civata Giştî ya KJB'ê û jinûve avakirina PAJK'ê tê sazkirin. Wê demê tê nîqaşkirin ku wê çawa helwest bê dayîn? Gelek nêrîn tên girtin û hin hevalan pêşniyar kirin ku ew kes bên girtin, ji ber meylên tesfiyekar pêş dixistin. Di encamê de biryara lêpirsînê hat girtin, lê vekirî bû. Jixwe piştî Civata Giştî ya KJB'ê direvin. Eger ev helwest bi vî rengî bû, tê wê wateyê ku meylên lîberal li ser me bandor kirine, di têkoşînê de radîkal nebûn xwe dide der. Ew xetek şaş ferz dikin, lazime mirov helwest raber bike, pêşî lê bigire, lê belê gelek kes wekî wan difikirin, hinek kes ketine bin bandora wana. Di bin navê “vana rêveber bûn, ev pîvanên azadiyê bûn” de nêzîkatiyên lîberalîze dikin derdikevin. Ji ber wê helwestên pêwîst li hemberî wana nayin girtin.

**Civata Giştî ya KJB'ê ya Yekemîn:**

Di navbera 7-18 Nîsana sala 2005'an de Civata Giştî ya KJB'ê ya yekemîn, bi dirûşmeya “Di Xeta Serokatî de Yekbûna Jin Temînata Azadiya Me ye” tê lidarxistin. 180 delege û 35 guhdar beşdar dibin. Esas rojeva xwe avakirin e, ji ber damezrandina Konfederalîzma Demokratîk tê pêkanîn. Gav tê avêtin, lê mirov nikare bibêje hemû pêwîstiyên me yên rêxistinî hatin pêşwazîkirin. Wekî koalîsyonê çêbûye. Ji temsîliya hemû saziyan ava bûye, ev jî hemû rêxistinê temsîl nake, sewq û îdareyê nake. Peyman, wê demê nakokiyên di navbera YJA-STAR û PAJK'ê de dixe belavoka encamê ya Civata Giştî ya KJB'ê. Vê jî hiştiye ku, atmosfer kême-

ke aloz bibe, tabî paşê ev tê sererastkirin. Di Tevgera Jin de xwe komkirin di astekê de çêdibe, lê wisa bibe pratîk, bîrdozî jinûve ava bike, hîn ew pirsgirêk derbas nebûne. Hîn ev nêzîkatiyên bîrdozî diyar derneketine, ji ber ew nêzîkatiya PAJK'ê di şexsê Sewra û Peyman de tê ferzkirin. Ji ber vê hinek tengasî hene. Lê herî hindik hêzeke ku vê derbas bike derketiye holê. Her wiha YJA (Yekîtiya Jinên Azad) tê sazkirin, êdî wê qada civakî jî di navenda jin de were birêxistinkirin. Ji Kongra Gel cudatir, wê di navenda xwe de xwe birêxistin bike.

Di sala 2005'an de grûbên me çûn qadên Bakur. Dem bi dem wekî mehekê agirbest çêdibe. Ji ber ku di warê siyasî û leşkerî de êdî nêzîkbûnên dewletê hene, yên me jî hene. Jixwe di Newroza wê salê de Serokatî Konfederalîzma Demokratîk îlan dike û li ser wî esasî hin xebatên me yên civakî tên birêxistinkirin. Lê pir cewherî nebû, ji ber ku naveroka wê nedihat dagirtin. Li gorî wê divê civak jinûve were birêxistinkirin û pêwîst bû li ser pirsgirêkên înşayê bihata sekinîn. Êdî gav tên avêtin. Nêzîkatiyên dewletê jî ji bo xebatên me yên siyasî çêdibe. Dîsa dewletê xwestibû bi riya Ahmet Turk û Aysel Tûglûk agirbest çêbibe. Di vê navberê de şerê 1'ê Hezîranê didomiya. Di wê demê de jî hinek grûbên me derbasî Bakur bûn.

***Hevalên di wê pêvajoyê de şehîd bûne;***

Di nav vê pêvajoyê de hevala Nûcan ji Pazarcikê bû, di xebatên Ewrûpayê de bû û piştre ji wir tevlî rêxistinê dibe. Xwest derbasî Dêrsimê bibe. Rola wê di nav Tevgera me de pir girîng bû. Serokatî pir ked daye ji bo wê hevalê. Saf û bi cewherî tevdigeriya, dilnizm bû. Di xeta berxwedanê de israr dikir. Li Beşîrî di rê de dikeve nav şer û şehîd dikeve.

Di hundir de jî berxwedanek dihat meşandin. Li Cudî hevala Amara Efrîn, Nûjîn Sêrt, Devrîm Sêrt şehîd dikevin.

Li Mêrdînê hevala Norşîn ji Colemêrgê bû. Hevaleke fedaî bû, ji

bo vê jî dijmin cenazeyê wê perçe perçe kiribû.

Li Bestayê hevala Ronahî Efrîn, Sarya Hakkarî, Diyana Efrîn, Eser Bagok û Amara Efrîn şehîd dikevin.

Li Colemêrgê hevala Bêrîvan Efrîn û Raperîn Goyî şehîd dikevin.

Li Dêrsimê hevala Peyman Kobanê, Dîcle Efrîn, Şervîn Dêrik û Bêrîvan Kobanê şehîd dikevin. Ev heval di asta rêveberiyê de bûn. Ev sekin, di helwesta berxwedanê de israrkirin e.

Di heman salê de li herêma Şehîd Harûn qeza çêbû, hevala Uta Alman û Amara Turk şehîd dikevin.

**Konferansa YJA-STAR a Sêyemîn:**

Di 25’ê Cotmeha 2005’an de Konferansa YJA-STAR a Sêyemîn çêbû. Ev Konferans di roja salvegera şehadeta hevala Bêrîtan de tê lidarxistin. Li wir rewşa eyaletên Bakur, pirsgirêkên mewzîgirtinê hatin nîqaşkirin. Li Botanê hin pirsgirêkên jiyanî hebûn û dikevin rojevê. Çima? Ji ber di sala 2008’an de tam zelal bû ku, Dr. Alî û Dîcle Andok di tesfiyekariyê de israr dikin. Hêdî hêdî bingehek wisa tê avêtin. Asteke rexneyan pêş dikeve, platformên rêveberiyê çêdibin. Lê mirov nikare bêje hemû pirsgirêk çareser bûne. Hîn jî di nav HPG’ê de pirsgirêkên tên jiyîn, hene. Ya pêwîst jî hevala Viyan beşdarî vê Konferansê bû, jixwe bi israra xwe derbasî hêzên leşkerî bibû. Ev xwe ferzkirina hevala Viyan ji bo YJA-STAR wekî seknekê bû.

Di sala 2006’an de di çarçoveya parêznameyên Serokatî de êdî lêhûrbûnek çêdibe. Hewldanên derbaskirina pirsgirêkan derdikevin pêş. Dîsa li ser Serokatiyê cezayê hucreyê hatiye ferzkirin. Vê jî li ser gel tengasiyek çêkir. Her wiha biryara lidarxistina konferansên kadro hat girtin ku, di her qadekê de çêbibe. Wê kadro li ser esasê parêznameyan perwerde bibînin, paşê platformên wan bên çêkirin. Ev jî ji bo ku vîna kadro derkeve holê. Di xeta azadiyê de pêwîste mirov zelalbûnekê çêbike.

Wê pêvajoyê, şeva 2'yê Sibata 2006'an hevala Viyan çalakiya xwe li dar dixe, bedena xwe dide ber agir. Hevala Viyan ji Başûr beşdarî rêxistinê bûye û ciwan e. Lê her israrên xwe hebûn ji bo bi Serok re bibe yek. Dîsa ji bo di qadên têkoşînê de cih bigire israrên xwe hebûn. Hatina wê ya xebatên leşkerî jî li ser esasê ku derbasî Botanê bibe bû. Jixwe di Komîteya Jinûve Înşakirina PKK'ê de cihê xwe girt. Di pêvajoya tesfiyeyê de xeta xwe diyar bû, sekna wê diyar bû. Erê tesfiyekarî zelal bûye, lê çirûskên wê hene. Mirov nikare hema bêje ji holê rabûye. Hevala Viyan jî vê wekî tercîh datîne; divê tercîha jiyanê ji bo jin çi be? Li Heftenîn çalakî pêk anî. Dibe ku tengasiyên wê yên demê bihurî hebin û nedikarî ji wê re bibe bersiv. Di tercîha jiyanê de ji bo jinê wê çi bibe, dixwest bide fêmkirin. Nameyên xwe hene, di wir de diyar dike û dibêje, "Di nav rêxistinê de dibe ku şaşîtî jî hebe, lê divê em wekî roniya çavên xwe Partiyê biparêzin." Me berê jî gotibû hinek di bin navê rexneyê de rêxistinê dixin nîqaşê. Di wê demê de jin û zilam hev digirin û direvin. Lê divê bê zanîn ku, em şehadetên bi vî awayî tam rast nabînin. Ji ber ku hevala Viyan di qadên têkoşînê de ye û çalakiyek bi vî şêwazî pêwîst nebû. Ew jî dizivire pirsgirêkên hundirîn û li hemberî pirsgirêkên hundirîn jî hêza me ya têkoşînê heye. Dibe ku wê salê çalakiya wê bibandor bû, lê divê em di xetê de zelal meyze bikin. Serok digot, "*Hûn bikevin bin mezelê jî, ez ê ji hestiyê we hesab bixwazim. Pêwîste hûn rast jiyan bikin û rast bimirin jî.*" Yanî di qadên gerîla de tiştek bi vî awayî ne pêwîst bû. Çeka wê di dest de ye û divê em bi rexne nêz bibin. Di şehadetan de divê em mijarên ku bên rexnekirin bibînin, nexwe wê dîrok baş neyê tehlîlkirin. Jixwe di Partiya me de şehîd ji bo me nirxek pîroz e. Ev şehadeta hevala Viyan, wê demê hêzên me kişand ber rexnedanê. Di vî warî de roleke xwe heye.

## Civata Giştî ya KJB'ê ya Duyemîn:

Di meha Adara 2006'an de Civata Giştî ya KJB'ê ya 2. hat li-

darxistin. Ev jî salê carekê çêdibe. Çima em nabin rêxistin, asteng çi ne, vana hatin nîqaşkirin. Dîsa KJB çima nikare rêveberiya xwe ava bike, hat nîqaşkirin. Çima rêveberiya xwe wekî koalîsyonê ye û mijarên hwd. hatin nîqaşkirin. Pêwîste KJB êdî ji hemû xebatan re bibe muhatab, ji ber ku rêxistina me ya sîwan e. Di vê wateyê de sererastkirinek çêdibe.

Di wê demê de rêveberên me yên Bakur "femînîzm divê çawa be?" nîqaş dikirin. Xuya ye bandora tevgerên femînîst li ser wana çêbûye. Jixwe biryara me ya vebûna bi derve re jî heye, pêwîste em bi tevgerên derveyî xwe re têkevin têkiliyê. Lê di rêveberiyên me yên Tirkiyê de bandorek wisa diyar heye. Serok jî dibêje ya hewldana me femînîst e, yanî di paradîgma xwe de nêrîna jin li ser eksena jinê bide rûniştin. Lê ev nayê wê wateyê ku em wekî tevgerek femînîst jî nêz bibin. Ji ber em tevgerek şoreşê ne, şoreşa jin hedef digirin. Dîsa di zemînê PAJK'ê de pirsgirêkên ku tên jiyîn, hene, her wiha rewşa Sewra û Peyman, ên ku bi ferasetên wana re dibin yek û hinek revên wan qebûl nakin û wana wekî îxanetkar bi nav nakin, hene. Ev jî ji bo me di xetê de zelal nebûne. Di rêveberiya Bakur de ferzkirinek wisa heye, lê pêkhateya Civata Giştî ya KJB'ê vê sererast dike, ev feraset vala tê derxistin. Dîsa di zemînê PAJK'ê de ew tengasiyên hene, rewşa Sewra, Peyman, yên ku di eynî meylê de ne. Mesela, hinek heval reva wana wekî îxanet bi nav nakin. Ev, di xetê de ne zelalî ye. Wisa di xeta lîbaral de meylên di xwe de israr dikin hîna jî derdiketin. Tabî kongreya KJB'ê li hemberî vê helwest datîne û piştî wê Kongreya PAJK'ê ya 6. tê lidarxistin, êdî di vê mijarê de zelalî çêdibe.

Di dema Civata Giştî de hevala Yildiz li Bakur bi grûba xwe re şehîd dikeve. Hevala Yildiz ji Erzîncanê bû. Di hemû pêvajoyên tevlîhev de hevala Yildiz xwedî helwest bû. Bi xwe ji kevneşopiyên çepên Tirkan hatibû, birayê wê hîn lîderê hereketeke çepên Tirkan e. Yanî malbat xwe nêzî me dibîne. Roleke hevala Yildiz di tevgera me de, bi taybetî di gerîlatiya Bakur de hebû. Di 30'ê

Adara 2006’ê de şehîd dikeve. Ji bo vê jî Civata Giştî ya KJB’ê ya 2. xwe wekî Civata Giştî ya Xeta Şehîdan bi nav dike. Di wê pêvajoyê de êdî hevalên jin di giştî rêveberiyên Tevgerê de cih digirin, KJB wekî rêxistinek sîwan rêxistinên xwe hene. Xebata ciwanan, wekî perçeyekî xebatê di nav pêkhateya konfederalîzmê de cihê xwe digire. Quwetê parastina rewa wekî hêzek jê tê pênasekirin. Lê di vê demê de nêzîkatiyên zilam ên wisa hene; xwestin YJA-STAR ji Hereketa Giştî ya Jinê qut bikin. Heta hinek hevalên di rêveberiya Konseyê de ne, ew jî dibêjin, “Hûn nikarin karê xwe ji hêzên YJA-STAR bînin. Ew rêxistinek taybet e, xweser e. YJA-STAR nikare tekmîla xwe bide KJB’ê.” Lê li hemberî wê têkoşînek jî heye.

Di heman salê de Kongreya PAJK’ê ya 6. tê lidarxistin. Li wir hinek pirsgirêk tên nîqaşkirin, xet zelal dibe. Di Kongreya Şeşemîn de Partiya Azadiya Jin a Kurdistanê tê avakirin, PAJK careke din xwe jinûve ava dike û dibe partî. Dîsa ew meylên lîberal, sekna rêveberiyê, sekna kadro, taybet kesayetên Sewra û Peyman tên mehkûmkirin. Di kesayeta rêveberiyê de meylên sivîlbûn, di jiyanê de dejenerebûn hatin nîqaşkirin. Yekbûn divê esas bê girtin û mesafebûn bê dûrxistin. Ev kongre nîqaşên xeta azadiyê wisa dimeşîne.

Xeta parastina rewa di sala 2006’ê de aktîf bûye, berxwedan dewam dike. Li Besta hevala Sorxwîn jî bi çend hevalên din re şehîd dikevin. Hevala Sorxwîn berê jî li Botanê di pratîkê de mabû. Pir zindî bû, dînamîk bû û di cihê xwe de nedisekinî. Sekna wê diyar e. Mesela, di Kongreya PKK’ê ya 7. de di hilbijartinê de kaxeza hilbijartina rêveberiyê vala dixe qutiya sindoqê, kesî hilnabijêre. Ya rastî li wir li hemberî tiştên ku dibîne helwest datîne. Radîkal bû û israra xwe di têkoşînê de hebû. Ji bo derbasî Dêrsimê bibe israr dikir, lê çû Botanê.

Di vê demê de YJA û KJB di eynî zemînê de xebatên xwe dimeşînin, bi hevbeşî xebatên civakî birêxistin dikin. Ev di Civata me ya giştî de car caran dibû sedema nîqaşan ku, YJA û KJB ji hev

cuda bibin. Lê mesele, di Tevgerê de yekbûn çêkirine. Ya din jî, KJB divê bikaribe hemû xebatên civakî bi yekbûnî birêxistin bike. Ev di zemînek hevbeş dibe. Bi vî awayî hinekê pirsgirêkên sîstemê jî dikevin rojeva me. Ji bo sala 2006'ê mirov dikare vana bêje.

## Pêşketınên Jı Sala 2007'ê Şûn De

Der barê sala 2007'ê û şûn de, ji ber heval piranî wan pêvajoyan dizanin ez ê tenê cihên girîng destnîşan bikim.

Di sala 2007'an de pêvajoya jehrdana Serok ketiye rojevê. Li beramberî wê, eniya jin bibiryar xwedî helwest bû. Ji ber ku Serok di xeteriyê de ye û Tevgera Jin xwe komî serhev kiriye, pêwîste em beşdarî vê pêvajoyê bibin û têkoşînê aktîf bimeşînin, bi biryardarî tevlî bibin. Ev rewş di zemînê YJA û KJB'ê de jî tê nirxandin û plansazî tê çêkirin.

HPG jî di 4'ê Sibatê de konferansa xwe li dar dixe, ji ber wê li ser bîranîna hevala Viyan Soran tê kirin û dîrokî ye. Di nav xwe de hin pirsgirêk hene, konferansa ku cara ewil ewqas eşkere pirsgirêkên xwe nîqaş dike, ev konferans e. Meylên cuda, ferasetên cuda, lêgerînên cuda di şexsê kî de derketine holê tê rexnekirin.

Civata Giştî ya KJB'ê ya 3. di meha Tîrmeha 2007'an de hat lidarxistin. Di vê kongreyê de şêwazê xebitîna di navbera rêxistinan de hat nîqaşkirin. KJB têkiliya xwe zelal bû, lê êdî wê PAJK têkiliya xwe çawa bibe, hat nîqaşkirin. YJA-STAR bi navê Komîteya Parastinê êdî di nav pêkhateyên KJB'ê de cihê xwe digire. Ji bo hemû pêkhateyan plansazî tê derxistin. Li beramberî nîqaşên ku bila YJA-STAR ji KJA'yê bê qutkirin hinek tedbîrên pratîk tên girtin. Êdî ji YJA-STAR sê nûner li ser navê wan wê di rêveberiya KJA'yê de cih bigirin û li ser vî esasî girêdan çêbibe. Ev jî wan nêzîkatiyên qutbûnê ji holê radike.

Hêzên me yên Bakur heta sala 2006'an du eyalet in, Botan û Dêrsim. Di sala 2006'an de hêzên jin derbasî eyaleta Amedê jî dibin. Sala 2007'an eyaletên wekî Erzirom, Garzan û Serhedê yên

hevalên jin neçûbûn, ew jî tên dagirtin. Dema heval derbasî eyaletan dibin û mewziyên xwe çêdikin, bi vî awayî di aliyê jin de vekirinek dîrokî çêdibe. Di sala 2007'an de wexta grûbên me diçin hin windahiyan didin. Li eyaleta Garzanê hevala Roza ji Mêrdînê ye, her di nav pratîkê de pijiya ye û pêşeng e. Dîsa di wê grûbê de hevala Delîla ya stranbêj hebû û hevala Avesta jî bi wana re şehîd dikevin. Di grûba Dêrsimê de hevala Berfîn Mûnzûr birîndar dibe. Hevala Rûken birîndar dikeve destê dijmin. Lê hîn jî aqûbeta wê hevalê nayê zanîn. Şehîd e, birîndar e, çawa ye nayê zanîn. Bi kurtasî winda ye. Lê em dizanin di wî şerî de birîndar dibe, ew jî di asta rêveberiyê de diçe. Hevala Arjîn li eyaleta Serhedê şehîd dikeve. Ciwan bû û nû tevlî pratîkê dibû. Li Botanê di meha Kanûna 2007'an de hevalê Adil û çend hevalên din dikevin nav şer û şehîd dikevin. Hevala Gulbihar, li wir di asta rêveberiyê de şehîd dikeve. Ji Kurtalan bû û di nav şer de xurt bû. Her di nav pratîkê de pijiya ye. Yek jî wê salê heval li Gabarê bû û hevalan çalakî li dar xistin, derbe li dijmin xistin. Ango hevala Gulbihar di şer de xurt bû. Bi wê re hevala Xwînda û hevala Zozan Efrîn ji Hêzên Taybet bû, ew jî şehîd dikevin. Hevala Ronahî Mêrdîn, bi xwe ji Mêrdînê ye û di sala 1995'an de tevlî partiyê bûye. Li ser Amanosê re diçe ji bo çalakî bike. Li Amanosê şehîd dikeve. Di hinek kongreyên me yên jin de amade bibû. Demekê ji grûbê qut dibe û 10 rojan tenê dimîne, birîndar e û li ber xwe dide. Dema leşker tê ser, ew bomba xwe bi xwe ve diteqîne. Hevala Zozan Hakkarî jî heman sala 2007'ê şehîd dikeve.

Destpêka sala 2008'an Operasyona Zapê çêbû. Ya rastî dijmin dixwest me biceribîne. Bi taybetî biryargeha me ya navendî hedef kirin. Di wan qadan de hevalên me yên jin xwe bi mevzî kiribûn, li gorî şer xwe bi cih kiribûn. Li hemberî vê operasyonê berxwedaneke cidî çêbû. Bi giştî 11 heval şehîd dikevin. Tevlîbûna hevalên jin di nav wî şerî de xurt bû. Heya asta koordînê hevalên jin rola xwe leyîstin. Ev jî ji bo leşkerên Tirk bû dersek baş ku, ew nikare her tiştî wisa milê xwe bihejîne û were qadên gerîla, ev rihet nîn

e. Mewziyên me yên Başûr êdî mayînde bûn, xwe bi cih kiribûn. Jixwe ji bo vê me weke Qadên Parastina Medya bi nav kir. Cara ewil e ewqas me xwe sipartiye arazî. Wê demê hevalên Konseya Serokatiyê bi xwe jî bawer nedikirin ku me di wî şerî kêm şehîd dane, lewma ji bo fermandariya HPG'ê digotin, "erê hûn ji çapemeniyê re nabêjin, lê ji me re rast bibêjin çend heval şehîd ketine?" Ji ber ku teknîk zêde hat bikaranîn hevalan digotin misoger şehîdên me zêde ne, yek jî artêşa Tirk hat û ket qadê. Ev encam ji bo me girîng bû. Di asta jin de êdî ji bo me pirsgirêkeke ku em xwe di şer de ispat bikin nîn e, lê bi xwe şêwazê şer diyar kirin, bi xwe hêza xwe koordine bike, bi mewzî bike, êdî ev ast hatibû girtin. Lewma ev operasyon ji bo me girîng e.

Di destpêka wê salê de li eyaletên hundir şehadetên giran çêbûn. Bi taybetî şehadeta hevala Nûda di meha Nîsanê de li Geliyê Hêzil û bi wana re hevala Ekîn jî şehîd dikeve. Hevala Nûda, di nav Tevgera me de roleke xwe ya diyarker hebû, dema li Bakur bû di asta Konseya Leşkerî ya HPG'ê de cihê xwe digirt. Beriya wê, di xebatên Komîteya Jinûve Avakirina PKK'ê ma. Ew jî her di pratîkê de pijiya ye. Bi safbûna xwe, xwezayîbûna xwe û cewherê xwe dihat naskirin. Perwerdeya Serokatî jî dîtibû. Piştî ku di malên lêhûrbûnê yên li saha Serok de ma û şûn de, dema tê gel Serok ji bo soza xwe bide beriya derbasî welat bibe, Serok jê re dibêje tu diçî Ewrûpayê. Hevala Nûda di wê kêliyê de şoq bû û li gel Serok dest bi girî dike û dibêje, "Ez naçim Ewrûpa, ez ê biçim welat." Serok jê re dibêje, "Na, tê biçî Ewrûpa", bi vî awayî jî Serok dikene. Herî dawî di nav rêveberiya Botanê de cihê xwe girt. Serok pê bawer bû ku, biçe Ewrûpa li wir nahele. Mesela, Serok carina hevalên Rojava dişand bajarê Tirkiyê. Lê niha em dibêjin "wê çawa biçe li wê derê kar bike!" Lê şêwazê Serok cuda bû. Kî di pîvanên xeta bîrdozî de zelal be, di xwe de çandibe ku biçe ku derê bikaribe kar bike pîvan bû. Serok dikarîbû ew bişanda her derê. Hevala Nûda, bi ruhê serhildanan cenazê wê tê rakirin. Hevala Ekîn Sêwas jî di nav saziya Hêzên Taybet de bû. Bi eslê xwe

Tirk bû. Hevaleke pir zana bû, di warê xweseriya jinê de xwedî helwest bû û radîkal bû.

Heman demê li eyaleta Serhedê di asta rêveberiyê de hevalên me şehîd ketin. Hevala Dîcle ji Efrînê bû. Di salên 2000'an de hevalên ciwan li Xinêrê perwerde dikir. Paşê di asta rêveberiya YJA-STAR de diçe herêma Serhedê. Pê re hevala Silav hebû, ew jî hevalek ciwan bû û ew jî şehîd dikeve. Jixwe fermandarê eyaletê hevalê Sîdar di heman şerî de tevî wana şehîd dikeve. Van hemû hevalan mohra xwe li pêvajoyê dan û di parastina xeta bîrdozî de xwedî helwest bûn.

Li aliyê din, Dr. Alî û Dîcle Andok xwestin li eyaleta Botanê texrîbatan çêbikin. HPG'ê kêmekê xwe parastiye li hemberî tesfiyekaran. Digotin, em ne tesfiyekar in û xwe dûrî wan dixistin. Lê di hundir de jî pirsgirek hebûn. Dr. Alî digot, "Êdî teknîka dijmin gihiştiye astekê ku ne pêkan e şerê gerîla bi ser bikeve." Her teoriya "xeta şer nabe" ferz dikir. Hem nêzîkatiyên wî yên şer wisa bûn û hem jî pirsgirêkên xwe yên liberal, ên têkiliyên jin û zilam ku mirov dikare wekî reforma sosyal binirxîne, ferz dikir. Gabar qadeke ku li Botanê kêmekê xweserbûna xwe heye. Ji ber ku li gorî qadên din zehmetiyên xwe hene, şer herî zêde li wir pêş ketiye. Heman demê qadeke stratejîk e, wekî warê hevalê Egîd tê zanîn. Ew zor û zehmetiyên xwe îradeyekê dixwaze. Bandora Dr. Alî û Dîcle li wir jî çêbû û derket holê ku, di pratîkan de jî hatiye jiyîn. Ya rastî berdewama meyla Ferhat wana bûn.

Di meha Tebaxa 2008'an de Kongreya PAJK'ê ya 7. hat lidarxistin. Esas wekî Tevgera Jin pirsgirêkên me yên bîrdozî yên em jiyan dikin çi ne, hatin nîqaşkirin. Li beramberî wê, wekî hemleya partîbûnê bidin destpêkirin, li ser van esasan komîte hatin avakirin. Divê di hemû qadan de PAJK wekî xetekê were rûniştandin û wekî komîte li ser bê sekinandin. Êdî pêwîste PAJK ango xeta jin bê rûniştandin. Polîtîkaya me ya kadro pir hatiye nîqaşkirin. Bi taybetî pîvanên milîtanbûnê li gorî qadan tên guhertin. Yanî li

gorî beşan kadro tên çêkirin û li gor xwe dixwaze pîvan bide rûniştandin. Di wê kongreyê de ji bo bê derbaskirin ev pirsgirêk hatibûn nîqaş kirin, lê heya roja me ya îro jî ev pirsgirêk derdikevin holê. Kadroyên qadan ji xwe re pîvanan çêdikin. Mînak; li qadekê pirsgirêkek heye, wê didarizînin, lê eynî pirsgirêk li qadên din xwezayî tê dîtin. Ev çi ye? Di pîvanê de ne zelalî heye, her kes ji xwe re pîvanan derdixe. Ev kongre di wir de zelalî çekir; "kadroyê qadan nîn e". Tê gotin ku, "Kadroyên qadan çêbûne". Di wê kongreyê de rexnedan jî pêş ketin. Biryara esasî ya kongreyê, Azadiya Serokatî ye. Ev biryar hem kongreya PAJK'ê ya 7. digire, hem jî Kongreya PKK'ê ya 10. girt. Hemû xebat bi azadiya Serok ve kilît bibin. PAJK, divê di tevahî xebatên kadro de wekî muhatab bê destgirtin. Ji ber ku KJB gel jî digire nava xwe. PAJK bîrdozî ye, ji ber vê ji hemû kadroyan berpirsiyar e. Hemû kadro nasnameya xwe PAJK e û muhatabê pirsgirêkên kadro PAJK e.

Di Cotmeha heman salê de YJA-STAR konferansa xwe pêk anî. Li wir jî wekî berdewama Kongreya PAJK'ê dirûşmeya "Em di Xeta Zîlanan de Xeta Fedaîbûnê Esas Bigirin û Li Ser Vî Esasî Rêber APO Azad bikin" esas hat girtin. Ango azadiya Rêber APO encex di xeta Zîlan de misoger bibe.

Di vê navberê de Kongreya PAJK'ê ya 8. di sala 2011'ê de tê lidarxistin. Di vê Kongreyê de platformên kesan çêbûn. Rêveberiya meclîsa PAJK'ê û PKK'ê platformên wan hatin çêkirin, di şexsê wana de nirxandinên kûr pêş ketin. Wê demê rexneyên Serok çêbûn û got, "*Bi qasî bihostekê pêşde neçûne.*" Rast e, wekî Tevgera Azadiya Jinê em di zelzeleyên pir giran re derbas bûn û pêvajoyên giran jî hatine derbaskirin, lê di encamê de Serok di dema komployê de got, "*Ev xebata min nîvçe ma*". Li ser van esasan jî perspektîf dabû, ew jî pêwîst bû Tevgera Jin temam bike. Di wê Kongreyê de sedemên neketina pêvajoyê hatin tespîtkirin;

Ya yekê, pirsgirêka neketina paradîgmaya Serokatî tê nîqaşkirin, ku em heya niha jî nîqaş dikin. Her wiha heya astekê agahdarî

çêbûye, lê ew di çarçoveya paradîgmayê de nazivire zanebûnê, di vê der barê de serveyîbûn heye. Em carina wan rexneyan bi gotina "em neketin paradîgmayê" pir normal digirin dest. Wisa seresere nêzîkbûn neketina xetê ye. Heta wê demê ev jî hat nirxandin; di xuyayî de wekî ez ketime paradîgmayê, ango zimanê me wekî paradîgmayê diaxive, lê nêzîkatiyên me, dil, ruh, halê me, beşdarbûna me ji wê dûr e. Ev wekî tevlîbûna sûnî hat nirxandin. Her wiha bi Serokatî re hevaltî û di prensîbên jiyankirina bi Serokatî re lewazî hatin nirxandin. Dîsa di têkiliyên rêveberiyê de hevsengiya desthilatdarî û hêzê hat nirxandin. Dema em sîstema xwe ya xweser diyar dikin, ne pêwîstiyên me yên xweser, lê bi giştî re çawa xwe eyar bike? Dîsa bi giştî re hevsengiya hêz bê çêkirin. Yanî xwe li gorî xebatên giştî eyarkirin û hinekî ketina têkiliyên desthilatdariyê dihat jiyîn. Îca vê carê bi zilam re ne hevkarî, hêzeke hebû, li ser vê hêzê ket mûsabaqa têkiliyên desthilatdariyê. Beşdarbûneke bi prensîb; rexne û rexnedan di dema xwe de şixulandin; îrade dernexistina holê; di rêxistinê de domdarî na, lê di kesan de domdarî pêş ketiye, ango hinek kes tim rêveber in, wisa rêveberî xwe nû nake û herikandineke pêwîst çênake; di stratejiya têkoşîna cins de lê veger, ji bo "teoriya qutbûnê" Serok bi vî awayî gotibû "di berdana bêdawî de yekirin û tê de israr kirin." Bi vê ve girêdayî hem li hemberî serdestiya zilam û hem jî li hemberî kevneşopiyên jinê têkoşîn di asteke jor de pêwîste pêş bikeve. Her wiha rêxistina xwe muhatab nedîtin di qadan de pêş dikeve. Berê xwe dayîna zilam, zilam wekî rêxistin dîtin û hêz dîtin. Di sekna kadro de seknên polîtîze; zanebûnên polîtîk pêwîst in, lê di cihê xwe de şixulandin. Nasnameya rêxistina jin temsîl bike û wisa tevlî xebatên giştî bibe. Ev wekî pirsgirêkekê derket pêşiya me. Pir zêde giştîbûn, lê nasnameya jin, xebatên jin dernexistina pêş. Elîtbûn ango di jor de mayîn. Di ziman de, di nêzîkbûnê de û di şêwazê rêveberiyê de elît mayîn pêş dikeve. Dîsa nêzîkbûnên çînî û hwd. derdikevin holê. Di berpirsyariya xwe de pratîkek meşandin heye, li gor wê pratîkê kadro ango rêveber hesab pirskirin û hwd. pir pêş nediket. Adeta wê te bigota qey

têkoşîn sekiniye. Kî bixwaze biçe ku derê diçe, hesab xwestin û dayîn nîn e. Rêxistinek çawa ku erk dide, pêwîste hesab jî bixwaze. Tabî ev nêzîkatî bi kêmbûna rexne û rexnedanê ve girêdayî ye. Întiharên ku di qadan de pêş ketine, sedemên wê, pirsgirêk çareser nekirin û hwd. Di tevlîbûna têkoşînê de nîvçe mayîn, ji rêzê bûyîn, seknek pêşeng dernexistina holê. Dîsa nêzîkbûna ji şehîdan re jî hat destgirtin û sererastkirin. Şehîd hêzeke moralê, manewî ye. Di nêzîkbûna ji şehîdan re hestiyarî pêş ketiye û xwe lewaz dike. Wekî nirxeke ku jê moral bigire na, berevajî bêmoral dikeve, pêwîste ew bê sekinandin. Wê têkoşîna cins çawa bê meşandin û temsîliyeta bi nasnameya bîrdozî wê çawa were pêkanîn, di van hemû xusûsan de zelaliyek çêbû.

## Kongreya PAJK'ê Ya Nehemîn

Kongreya PAJK'ê ya 9. di sala 2014'an de hat lidarxistin. Feraset mîna hev in, lê belê tam di pêvajoya Komkujiya Şengalê de bû. DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kiribû, hejmarek mezin ji jinên Şengalê revandibûn. Ya rastî vê hişt atmosfer bandor bibe. Ya din jî, êdî em ji tevgerek kadro derketine û ji civakê re pêşengiyê dikin. Ne tenê ji civaka Kurd re, em êdî ji herêm û civakên Rojhilata Navîn re pêşengiyê dikin. Bi taybetî tolrakirina jinên me yên Êzidî re ku hîn zêdetir têkoşîn bê xurtkirin, wekî biryarekê derket holê. Bi wê ve girêdayî, di warê çûyîna ser pirsgirêkên kadrobûn, pêşengiyê û hwd. de vê Kongreyê jinûve avakirin xist rojeva xwe. Çima? Ji ber ku êdî pergala me pir fireh bûye, ne wekî berê ye. Êdî têkoşîna me di pêvajoyek cuda de bû. Hem di herêmê de rewş hatibû guhertin û hem têkoşîna me perçe girtin nava xwe, qadên têkoşînê cuda çêbûn. Li ser van esasan pêwîste rêxistin xwe li gorî wê bigire dest. Tenê karakterê xwe yê Kurdistanî têrê nake. Mesela, hîn di roja me ya îro de em dibêjin PAJK bi xwe re sînordar dimîne. Erê rêxistinên xwe li her derê çêbûne, qad zêde bûne, di qadan de jî pirsgirêk hene. Pêwîste xwe li gorî wê bigire dest. Êdî artêşa me fireh bû, karakterê xwe cuda bû, tenê bi kadroyan re sînordar nîn e. Artêşên herêmî çêbûn û li her çar perçeyên Kurdistanê

belav bûn. Ji bo wê sîstemek nû lazim e. Cihê ku kadro diçe, pêwîste xwe li wir birêxistin bike. Êdî rêxistina me ya sîwan heye, wê bi wê re têkiliya xwe çi be, çawa bi hev re bimeşin û hwd. di van der baran de pirsgirêk hene. Dîsa di xweseriya herêman de pirsgirêk heye. Xas di qadên leşkerî de pirsgirêkên kadro û rêveberiyê di asta taktîk û şêwaz de hene, di asta perwerdeya bîrdozîbûnê û partîbûnê de hene. Grûbên leşkerî li ser van pirsgirêkan nîqaş dikin. Di qadên civakî de eynî pirsgirêk hene û kadroyên di nav de jî pirsgirêkan dijîn. Wisa li gorî beşan pirsgirêkên tên jiyîn, pêwîste jinûve destgirtinek çêbibe û bê derbaskirin. Yanî êdî pirsgirêkên me ne tenê ferasetên paşverû ne. Ji bilî wana, gelek qadên nû ava bûne. Ev qadên nû mayînde kirin, sîstem rûniştandin erkên me yên avakirinê ne. Sîstema Serokatî di warê feraset û model de divê bê rûniştandin. Pergala demokratîk were pêşxistin, bînin astekê ku bikaribe bi xwe xwe birêve bibe.

Di van salan de şerê leşkerî dijwar bûye.

***Hevalên di van salan de şehîd bûne;***

Hevala Bêrîtan Şemzînan di asta fermandariyê de sala 2009’an şehîd dikeve. Bi xwe ji Şemzînanê tevlî bûye. Di vê demê de carina agirbest çêdibû, şer dewam dikir. Lîstokên PDK’ê li ser wê herêmê pir zêde ne. Ew zêdetir di xebatên leşkerî de mabû. Li Amedê jî di asta fermandariyê de cihê xwe digirt.

Di sala 2010’an de zivistanê li Amedê hevala Canda (ji herêma Cizîrê bû û li Amedê fermandara herêmê bû), Berçem, Sema Amed, Têkoşîn Urfa û Axîn Amed ji ber jeneratorê bi jehriyê dikevin û şehîd dibin.

## Dı Pêvajoya Şerê Gel Ê Şoreşgerî De Sekın Û Tevlîbûna Jın

Bi taybetî sala 2011’ê Serokatî Şerê Gel ê Şoreşgerî dixe rojeva me. Di payîzê de hin çalakiyên mezin hatin kirin. Mesela, li Çelê çalakiyeke mezin hatibû çêkirin, lê windahiyên me pir çêbûn. Di heman grûbê de di paşvekişînê de 37 heval li Geliyê Tiyarê şehîd

dikevin.

Li Xakûrkê rêveberiya me di civînê de bû, cihê wan hat tespîtkirin û êrîşên awayî çêbûn. Hemû heval di asta rêveberî û fermandariyê de bûn. Hevala Çîçek Kiçî wekî fermandar berpirsiyara Xakûrkê bû. Di sala 1988'an de bi qanûna leşkerî tevlî Partiyê dikin. Her bi keda xwe tê naskirin. Xwendin û nivîsandina xwe pir nîn e, lê rexmê wê di nav Partiyê de fêrî xwendin-nivîsandinê bûye, rojnivîsên wê hene. Bi kurdî dinivîsand, girîngî dida pêşketina xwe ya şexsî. Di wateya rast de fermandar bû. Çawa? Mesela, ne tenê erk bigire ser milê xwe, di diyarkirina taktîkê de, di çalakiyan de û hwd. ji sala 1990'î û şûn de bi xwe pêşenga çalakiyan bû.

Hevala Rozerîn Mêrdîn hebû, sala 1993'yan tevlî rêxistinê bibû. Beriya wê, li Botanê mabû û herî dawî di Komîteya Parastina Rewa de bû. Di nav KJB'ê de temsîla YJA-STAR dikir. Hevala Rozerîn di têkoşînê de radîkal bû. Ya rastî ev heval rengê Tevgera me bûn. Roleke xwe ya diyarker hebû. Bi wana re hevala Amara, Nazlican Batman, Dîcle Gever şehîd dikevin. Ev heval di asta fermandaran de bûn. Her wiha hevalên xort jî di asta fermandar de şehîd ketin; wekî hevalê Rûstem, Alîşêr di rêveberiya Xakûrkê de bûn.

Sala 2011'an me îlan kir ku em ê dest bi Şerê Gel ê Şoreşgerî bikin, lê zivistanê dijmin bi xwe dest bi êrîşan kir. Di gelek eyaletên Bakur de me windahiyên komî dan. Wê demê li Geliyê Şêx Cuma yê herêma Garzanê hevala Arjîn bi 15 hevalan re şehîd ketin. Cara yekê ye zilamek wana îxbar dike. Jixwe ew kes paşê hat cezakirin. Cara yekê di dîroka me de şehadetên wisa bi hev re komî çêdibin. Paşê Serokatî şêwazê me yê mewzîgirtinê rexne kir. Li Bakur jî pergaleke me çêbûye, em bi serê xwe tevdigerin, çalakiyan dikin. Serok wekî rexne got, *"şer wisa nabe, ma kes tune bû ku wana du bi du bi mewzî bike, çima wisa 15 hevalên jin bi hev re şehîd dikevin?"* Ev şehadet li ser civaka me jî bandor dike.

Ewqas hevalên jin ji civakê re giran hat. Gel digot, “bila HPG îstifa bike.” Dibe ku ev pîvanê civakî ye, lê wiha digotin, “ma zilam nebûn ku wana biparêzin?” Jin asteke ku di şer de xwe biparêze girtiye. Bi lehengî jî li ber xwe didin, şer dikin, di şer de jî şehîd dikevin. Gelek ji wan bombeyê bi xwe ve diteqînin. Di nav wan 15 hevalan de hevala Rojda Efrîn, Berfîn, Bêrîvan, Yerîvan jî şehîd dikevin.

Heman zivistanê li Erziromê hevala Zîn şehîd dikeve. Kampa wana deşîfre bibû. Hevala Zîn jî fermandara giştî ye. Bi giştî 3 hevalên jin bûn û yên din hevalên xort bûn.

Li Cudî, wê zivistanê hevala Binefş şehîd dikeve. Êzidî bû, bi xwe jî hevaleke kevin bû, li Cudî fermandara herêmê bû. Bi wê re hevalê Rubar, hevala Zîlan Efrîn hebûn.

Zivistanê li herêma Besta hevala Ronahî Mêrdîn, Zîlan Bidlîs, Havîn Şirnex, Şerda Gever û Aysel şehîd dikevin.

Piştî wê, ji bo tola van windahiyan zivistanê hevalan dest bi hemleyê kirin. Di hemleyê de şerekî pir dijwar qewimî. Şer tenê bi Bakur re sînordar nema, qadên Parastina Medya, qadên sînor ên derbasî Bakur dibe, şerekî pir dijwar meşiya. Hemleya 2012’an bi navê Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî çêbû. Gerîla di asta hemleyê de bû, lê milê civakê kêm ma. Ew pêngav bi yek lingî meşiya, bi şerê gerîla re sînordar ma. Tabî ji destpêka pratîkê heta dawî gelek qad ketin bin serweriya gerîla. Bi taybetî dijmin serweriya xwe winda kir. Dêrsimê qad xist bin kontrola xwe, Amedê bi mehan rê qut dikir, dijmin nikarîbû biçûya û bihata. Botan dîsa wisa. Herêmên biçûk jî her di nav çalakiyan de bûn. Serhed, Garzan, Erzirom wisa bûn. Serhedê di dîroka xwe de herî zêde wê salê çalakî kir. Paşê ji bo serkeftina çalakiyên wan, sekna wan, wekî fermandariya giştî ya HPG’ê me wana pîroz kir. Beşdarbûnek wisa bi her awayî hebû.

Di sala 2011’an de bi êrîşa Îranê re şer çêbû. Hemleyê

destpêkê li Qendîlê, bi Îranê re destpê kir. Ev di navbera Îran û Tirkiyê de konseptek hevpar bû. Di hundir de li hemberî rejîma Îranê berxwedaneke pir xurt hat raberkirin. Di serî de hevala Sarya, hevala Berfîn û Evîndar hebûn. Hevalê Sîmko jî di vê berxwedanê de şehîd dikeve. Ya rastî ev ji bo Îranê wekî dersekê bû ku, li hemberî PKK'ê tu nikare ewqas rihet werî, qadên me tesfiye bikî. Dîsa li wir konsepta Îran û Tirkiyê ya hevbeş xira bû, ji ber ku Tirkiyê Îran anî lîstokê. Wekî gotibûn, herin êrîş bikin, hûn ê qadan bigirin. Îran jî li ser vî esasî êrîş dike.

Wê salê êdî şerekî pir dijwar destpê kir. Tenê bi Bakur re sînordar nema, lê êdî xwe li Qadên Parastina Medyayê jî belav dike.

Di sala 2012'an de êdî ev pêngav bi navê Şerê Gel ê Şoreşgerî hat meşandin. Gerîla di asta pêngavê de bû, lê lingê civakê kêm ma. Ango tenê yek lingê pêngavê meşiya. Ev şer tenê bi çiyê û gerîla re sînordar ma. Ji destpêka pratîkê heya dawî gelek qad ketin destê gerîla. Dijmin hema hema serweriya xwe winda kir, bi taybetî di çiyê de. Pêşengiya jinê bi taybetî di van xetên sînor ên Qadên Parastina Medya de derket holê. Di nav şer de koordîne kirin, taktîk dayîn, diyar kirin û hwd. hebû. Mînak; bi mehan dijmin nedikarî bikeve Şemzînanê, ji ber ku riya wê hatibû qutkirin. Çalakiyên li Oremarê hevala Rojin Gewda koordîne dikir. Ev sala ku herî zêde me çalakiyên xweser kirin. Ji wir û şûn de hevalên jin êdî çalakiyên xweser li dar dixin. Plan, biryar, keşif û hwd. wê hevalên jin amade bikin û li dar bixin. Herî zêde çalakiyên suîqestê pêş dixin, lê heman demê taktîkên serdegirtin, sabotajê jî hatin şixulandin. Dîsa di tu çalakiyê de jî me windahî nedane. Di pêvajoya hemleyê de pêşengiyeke xurt hatiye kirin, bi taybetî di şexsê hevala Rojîn Gewda de ku, wê demê fermandar e. Piştre bi xwe li Zagrosê şehîd dikeve. Li Botanê hevala Rêvan Qamişlo bi çend hevalên din re şehîd dikeve.

Li Zapê hevala Jîn Rojhilat bi xwe ji Rojhilat bû, çalakiya fedaî dike. Bi grûba xwe re çalakiyeke mezin li dar dixin û di wê çala-

kiyê de birîndar dibe, nikare xwe ji qadê bikişîne, roja din diçe û xwe di nav dijmin de diteqîne. Hevala Jîn di şerê Rojhilat de pêşengek e. Êdî taktîkên xuyayî ji aliyê jin ve pêş dikevin. Pêwîste ev heval jî di nav pêşengên Rojhilatê Kurdistanê de wekî mînak bê girtin.

Bîlançoya şehadetên sala 2012'an 105 heval bûn. Encex vê hemleyê îradeya dijmin pir tengav kir. Êdî dijmin tirsiya, ji ber ku qad ji bin kontrola wan derket. AKP'ê careke din peyam ji Serok re rêkir. Destkeftiyên me çêbûn, ji bo vê jî Serok xwest pêvajoya demokratîkbûnê bide destpêkirin. Di dawiya salê de êdî careke din agirbestê îlan dike.

## Komkujıya Parîsê Êrîşa Lı Ser Dîroka Azadıya Jınê Ye

Di 9'ê Çileya 2013'an de Komkujiya Parîsê çêbû, hevala Sara, Rojbîn û Ronahî şehîd dikevin. Wê demê Serok vê komkujiyê wisa nirxand: "*Ya rastî hewldanên min ên aştiyê bi vê komkujiyê re xwestin peşî lê bigirin. Ango kesên dewletê yên naxwazin bi rêbazên demokratîk çareserî çêbibe, dixwazin pêvajoyê sabote bikin. Wekî pêvajoyên berê yên salên 1993'yan ku dewlet bi xwe cînayetan pêk tîne. Ev komployeke ku wekî li ser şexsê min hatiye pêkanîn.*" Heya niha jî berpirsiyarê vê komkujiyê tam zelal nebûye. Rast e, endamên îstixbarata MÎT'ê bûn, ji bo ku delîl li holê nemînin ew zilamê destê wî di vê komkujiyê de hebû, kuştin. Lê ev bûyer tenê ya dewletekê nîn e; ev bûyer navnetewî ye. Ew her 3 heval taybet hatin hilbijartin. Hevala Sara (Sakîne Cansiz) dîroka me ye, dîroka jin e, yek ji avakera PKK'ê ye, heman demê avakera Xeta Azadiya Jinê ye. Hevala Rojbîn (Fîdan Doğan) jî di têkiliyên dîplomasiyê de roleke pêşeng dileyîst. Hevala Ronahî (Leyla Şaylemez) di xebatên ciwanan de pêşeng bû. Peyama wan dîsa wisa ye: "Em ê dîroka we ji holê rakin." Ya rastî vê peyamê didin. Hevala Fîdan pêşengiyê ji vekirina pêvajoyê re dike, hevala Ronahî pêşengiyê ji ciwanên civakê re dike. Bi vê komkujiyê re wekî xwestin bêjin, "Em ê nehêlin hûn vekirinan di têkoşîna xwe

de bikin û em ê nehêlin dînamîka we ciwan bimîne, em ê ji holê rakin.” Bi giştî hedefên zanebûn bûn.

Rexmê wê jî Serokatî di pêvajoya çareseriya demokratîk de israr dikir. Ew dixwazin sabote bikin, lê wê salê wekî Tevger paşdekişandin ket rojeva me. Ango hêzên me yên Bakur paşde bikişînin Başûr. Ev ji bo pêvajoyê hemleyek siyasî bû. Lê nemeşiya, heta ji ber ku em dereng man Serok rexne jî kir û got, “*Di paşdekişandinê de dema we dît nêzîkatiyên dewletê cuda bûn, diviyabû we paşdekişandin bida sekinandin.*” Ev pêvajo heya payîzê jî domand, lê agirbestê hîn berdewam dikir.

Di sala 2012’ê de Şoreşa Rojava hebû. Bi Sûriyê ve girêdayî rewşeke cuda derket holê. Jixwe êdî di herêma Rojhilata Navîn de tevlîhevî heye û ji bo rejîmên statukoparêz hewldanên hilweşînê hene. Kîjan hêz dînamîkên xwe birêxistinî be, ew dikare hemle bike. Bingehek xurt li Rojava heye. Serok ji destpêka Tevgera me ve her li wir xebat kiriye, civak a me ye û hat qezenckirin. Beriya sala 2012’an hin texmîn çêbûn, li gorî wê wekî xebatên parastina cewherî amadekariyên hinek xebatan hatin kirin. Ew jî di pêşengiya hevalê Xebat û hevalê Sadiq Kobanê de hat kirin. Xebata parastina cewherî bi navê YXK’ê dihat birêxistinkirin. Piştî ku li ser Şoreşa Rojava mudaxele çêbû, destpêkê Kobanê û hemû kanton hatin rizgarkirin. Efrîn, Kobanê û Cizîr hatin azadkirin. Bi bandora şoreşê re êdî hêzeke cuda bi navê YPG’ê hat birêxistinkirin û beşdarbûna hevalên jin jî tê de pêş ket. Her wiha rêgeha xebatên civakî hat guhertin. Ji ber ku êdî qad jî ketiye destê civaka Kurd, pêwîste pergala xwe ya xweser înşa bikin. Lê heya roja me ya îro jî pirsgirêkên avakirinê li wir tên jiyîn. Di destpêka sala 2013’an de hevalên jin rêxistina parastinê ya xweser bi navê YPJ’ê saz kirin. Ev bi xwe hêzeke ku li ser tevahî cîhanê bandor kir, ji ber ku Kurd êdî qadekê rizgar dike, azad dike û heman demê sîstemeke demokratîk tê de pêş dixe. Her wiha di nav de hêzên parastinê berxwedana xwe didomînin.

YPJ, şehîda xwe ya yekemîn hevala Silava ye. Ya rastî şehîda destpêkê hevala Bêrîvan Efrîn e, lê hevala Silava bi awayek fermî di Konseya Leşkerî ya YPJ'ê de bû. Ev têkoşîn di wê qadê de heya roja me ya îro jî didome. Pirsgirêkên ku li wir tên jiyîn, tê zanîn.

Di vê pêvajoyê de tiştê ji bo me girîng, sala 2014'ê Berxwedana Kobanê ye. Êdî Şoreşa Rojava bandorê tenê li ser Kurdistanê nake, bandoreke gerdûnî kir, hebûna Kurdan derbasî rojeva cîhanê kir. Berxwedana Kobanê 16 Îlonê 2014'ê destpê kir û heya 25'ê Çileyê 2015'ê dom kir. Ev jî konsepteke navnetewî bû. Jixwe dewleta Tirk yek bi yek di nav de bû. Kobanê ji bo ku ji hemû kantonên din qut bike û Şoreşa Rojava tesfiye bike êrîş dikin. Her çiqasî berxwedaneke giran bû jî, hêzên YPG-YPJ'ê bi ser xistin. Kobanê hiştiye ku hemû Kurdistan pê re bibe yek. Ji Başûr heya Rojhilatê Kurdistanê ciwan pêl bi pêl diçûn û beşdarî wê berxwedanê dibûn. Jixwe Bakur her li ser lingan bû. Tabî karakterê xwe yê gerdûnî heye, bi taybetî di wî şerî de di kesayeta Arîn Mîrkanan, Rêvanan de pêşengiya YPJ'ê derket pêş.

Her wiha sala 2014'an êrîşa li ser Şengalê çêbû. Li ser axên Başûrê Kurdistanê jî mudaxele tê çêkirin. DAÎŞ'ê xwest bikeve wan deran, lê ji bo parastina Şengalê em ketin wir û heya niha jî hêzên me li wir in. Paşê hêzeke herêmî bi navê YBŞ'ê li wir pêş xistin û hevalên jin bi navê YJŞ'ê tê de cih girtin. Dîsa meclîsa xwe ya giştî û ya jin îlan kirin.

Di pêvajoya êrîşên DAÎŞ'ê yên li ser gelê me de mudaxeleyên me ji bo Başûrê Kurdistanê jî çêbûn, ji ber ku gelê me yê Mexmûrê jî di bin xeteriyê de ma. Mudaxele esas ji bo gelê Mexmûrê bê parastin hat çêkirin, lê heman demê gelê Başûrê Kurdistanê roleke parastinê leyîst. Ya rastî di wê pêvajoyê de hereketa me êdî tenê Kurdistanî na, di parastina gelên herêmê de rol leyîst, bi taybetî di têkoşîna li DAÎŞ'ê de. Herî zêde jin rola xwe ya pêşengiyê kir. Rast e, mudaxeleya leşkerî li pêş bû, lê cihê ku em diçûnê, me dixwest pergala xwe ya xweseriya demokratîk jî

ava bikin.

Sala 2015’an rexneyên Serok wekî Tevger ji bo me pir çêbûn. Eşkere rexne kir û got, “*Di navbera min û we de meqes vebûye. Divê ev mesafe bê girtin. Li Tirkiyê yek mirovê PKK’yî nemaye. Yekî ku bikaribe pîvanên PKK’ê, xeta Serok ferz bike nemaye.*” Ya rastî Serok bi van rexneyan em dawetî rexnedanê kirin. Rêxistinê jî êdî dest bi pêngavê kir. Di encamê de platformên PAJK’ê û paşê jî yên PKK’ê çêbûn. Cara ewil li hemberî rexneyên Serok destpêkê hevalên jin di platformên rexnedanê re derbas bûn. Vê jî li ser hemû qadan bandor kir ku, kadro jî konferansên xwe pêş bixe. Erkên demê wisa hatin pêşwazîkirin.

Di sala 2015’an de wekî berdewama vê berxwedanê, li Bakurê Kurdistanê bi navê Hemleya Şerê Gel ê Şoreşgerî şer destpê kir, lê vê carê bi lingê civakê re çêbû. Cara yekemîn gerîla û gel dibe yek. Berxwedana şerê bajaran li ser vî esasî pêş ket. Berxwedana Nisêbîn, Cizîr, Sûr, Hezex, Kerboran, Şirnex, Gever, Silopya û gelek herêmên din pêş ket. Bedêlê xwe pir giran bû û têkoşîneke hêja ye ku hîn jî were nirxandin. Lê ev berxwedanî di şêwazê taktîkên leşkerî û hwd. de lewaziyên xwe pir hene. Ew hîn jî tên nirxandin ji bo guhertin bê kirin. Dîsa pergala me ya civakê lewaz bû. Rast e, bi navê înşayê xebat hebû, lê me dît ku rêxistina me ya xebatên civakî pir lewaz e û pirsgirêkên înşayê hene. Serok ji bo wê pêvajoyê got, “*Şerekî ku bê fermandar maye.*” Pêşengiyek rast hem di aliyê taktîkê de û hem jî di aliyê berpirsyariya meşandina şer de derneket. Pêwîste mirov wisa binirxîne. Birêxistin nekirina civakê hiştiye ku em bi bedêlên giran re rû bi rû bimînin.

Esas berxwedana bajaran pêvajoyeke raperînê bû. Jin, di serî de li Silopya, di şexsê hevala Sêvê, Pakîze û Fatma de xwedî li vê pêvajoyê derket. Êdî gel di her bajarî de pêşengên xwe yên jin derxist holê. Li Sûrê wekî hevala Nûcan, li Cizîrê hevala Rûken Hoserî ku hevalek pir kevin bû, di şer de pijiya bû. Li Nisêbînê hevala Binefş û Evîn Mêrdîn. Yanî hevalên xuyayî yên beşdar

bûne di asta pêşengiyê de û li ser civakê bandorek kirine. Hêja ye mirov wê berxwedanê tim binirxîne, ji ber ev têkoşîn hîna dimeşe.

Bi giştî tiştên em ji bo dîrokê bibêjin ev bûn. Elbet qad bi qad pirsgirêk hene, lê ev ji bo me dîrokek girîng e. Têkoşîn elbet berdewam dike. Hinek dem pir biêş bûn, janên xwe hebûn, lê astek hatiye girtin û hîna pirsgirêk hene. Lewma hêja ye mirov nîqaş bike.

Nirxandinên Serokatî yên herî dawî ji bo Tevgera Azadiya Jinê wiha ne: “*Ez di nêzîkatiya hevalên jin a ji bo şoreşa jin de werimandinekê dibînim. Adeta wekî şoreş pêk hatiye, bi vî awayî diaxivin û bi vî awayî dinivîsin. Erê hereket mezin bûye, lê em ne di wê astê de ne. Ez ditirsim ku ev bihêle xwe bixapînin. Hîna negihîştine vê astê. Mînak; feodalek li ser wê zext bike, yan jî di destê wî de hêz û raye hebe ku li beramberî wê derbikeve, wê çiqasî bikaribe li hemberî wan xwe biparêze? Ez bawer im feodalek di demek pir kurt de dikare wana bigire bin kontrola xwe. Ji bo vê hevalên ku îdîayên wan hene ji bo şoreşa jin pêş bixin, pêwîste mirov vê pirsê ji wana bike: Te heya niha kariye zilamekî azad derxî holê, yan jî tu dikarî derxînî? Eger nikarin zilamekî bi vî awayî derxînin, ev tê wê wateyê ku îdîayên wan ên şoreşa jin çîrok e. Ez mijara dayîkê wekî mijareke biyolojîk behs nakim. Di warê biyolojîk de dayîk ji bo min pir wateya xwe jî nîn e. Esas di wateya civakî de hezkirina dayîkê girîng e, avaker e û wê berhemên civakî ava bike.*”

Di encamê de tiştê ku Serok tîne bîra me, hîna Şoreşa Jinê pêk nehatiye. Lazime ji aliyê me ve ev were zanîn. Her wiha me ferzkirinên zilam ên desthilatdariyê çiqas derbas kir. Tiştekî din ku em ji vê fêm dikin; di destpêka vê pirtûkê de jî me gotibû, pirsgirêka cins tenê cinsê jinê eleqedar nake. Te çiqas civak azad kiriye û te çiqas zilamê azad afirandiye? Ev jî pirsgirêk e. Lazime em wisa li vê dîroka xwe ya têkoşîna azadiya jinê binêrin, erkên xwe

wisa pênase bikin. Ango dema me zilamê azad ava kir, serdestiya zilam ji holê rakir û pê re em ber bi civaka azad ve biçin wê demê wê erkên me bigihin serî û temam bibin.

# ENCAM

Wekî encam êdî Tevgera Jin bi Şoreşa Rojava re li Kobanê gihîşt asteke gerdûnî û pêşengiyê. Gelek kongre û konferans wekî vebûnekê çêbûn. Dîsa bi tevgerên çep ên cîhanî re têkilî çêbûn. Niha ev derfet zêdetir çêbûne. Cara yekê sala 1996'an li Pekîn-Çînê konferanseke navnetewî ya jinê çêbû, em jî vexwendin wê konferansê û li ser navê YAJK'ê 5-6 heval tevlî dibin. Îca di van salên dawî de hewldaneke wisa hebû ku, vê carê jina Kurd pêşengiyê bike. Destpêkê Konferansa Jin a Neteweyî çêbû, lê berdewama wê nehat. Konferansek li Bakurê Kurdistanê, yek jî li

Başûrê Kurdistanê çêbû. Biryar hatibû girtin ku konferansa sêyemîn li Rojavayê Kurdistanê were lidarxistin, lê çênebû. Di yekîtiya neteweyî de jî berxwedana jinê, sekin û helwesta jinê dikare jê re pêşengiyê bike. Dîsa vebûnek wisa heye ku, di asta Rojhilata Navîn de konferanseke hevbeş a jinan çêbibe. Konferansek jî çêbû, ya din jî amadekarî dihat kirin ku li Lubnanê çêbibe. Bi rêxistinên cur bi cur re heya astekê têkilî û naskirinek çêbûye. Ev jî rolekê dide ser milê me.

Hinek tevgerên din ên jin vê yekê dixin nîqaşê û dibêjin, "Serokê we zilam e". Tabî ew rastiya Serok nizanin. Li gorî wan tevgerên femînîst in, jin e, bîrdoziyek pir kûr e, her kesî dihewîne hundirê xwe, lê çima Serokê me zilam e? Ev ji wana re wekî nakokiyê tê, elbet ev yek bi wana dana fêmkirin û qebûlkirin ji bo me erkek e.

Xala din, ji bo hevala Sara jixwe di destpêka avakirina PKK'ê de, piştî wê li zîndanê di xeta berxwedanê de hevalek pêşeng bû. Li saha Serokatî, Serok di şexsê wê de dixwest hinek dahûrandinan bike. Konferansa Jin a Rojhilata Navîn a 2. hevala Sara pêşengiya wê ya rêvebirina pratîkî dikir. Serok hinekî di şexsê wê de digirt dest. Piştî wê hevala Sara derbasî Ewrûpa bû, li wê derê xebat meşand. Di pêvajoya Komploya Navnetewî de jî li Ewrûpa bû. Paşê hat tevlî Kongreya Jin a Yekemîn bû û piştî wê tevlî Kongreya PKK'ê ya 7. bû. Bi vî awayî hevala Sara hinek deman li welat û hinek deman li Ewrûpa hem di nav xebatên civakî de, hem jî di nav xebatên dîplomasiyê de xebitî. Esas hevala Sara kesayeteke aştîxwaz bû, karakterê xwe jî wisa bû. Dema hat welat, wisa yek bi yek xwe ji hevalan erkdar didît. Ez dizanim ji Tevgera me ya jin yek heval nehat, li ser quwetê me yê jin negeriya, lê hevala Sara li ser tevahî quwetê me geriya, keseke ku nedît nema. Li kîjan girî yek-du heval hebana, digot "ez ê herim wana jî bibînim". Ew ferq jî nedixist navbera hevalên xort û jin, her hevalek dît. Digot, "heval e, pêwîste em bibînin, we tenê xwe bi Tevgera Jin re sînordar hiştiye." Heta vê dawiyê nêzîkatiya me

ya YJA-STAR rexne dikir û digot, “we ewqas quwet ji hev qut kiriye, hûn ê bi pirsgirêkên cuda re rû bi rû werin.” Piştî sal derbas bûn, bi rastî me bi xwe dît ku em bi gelek pirsgirêkan rû bi rû man. Dîsa digot, “we xwe ji quwetê zilam qut kiriye, hûn ê paşê çawa li ser vê quwetê bandor bikin? Hûn ê çawa vê quwetê bi xet û pîvanên azadiyê pêş bixin?” Jixwe tevahî jî quwetên ciwan bûn. Hevala Sara hewldanên xwe yên wisa hebûn, weke kesayet pir bibandor bû. Hevala Sara, di avabûna PKK’ê de cih girtibû, ji pêvajoya avabûna Tevgera Jin heta roja şehadetê bi Tevgerê re bû, tim bi xeta Serok re meşiya.

Wekî Tevgera Jin danehevên me yên hene, em ê çawa bikin nirx? Divê em wisa nêzî dîroka xwe bibin. Dîrok ji me re danehevek e. Pêwîste em bi vî awayî li mîrasê xwe xwedî derkevin, nirxê xwe li ser wê ava bikin. Hevala Sara bi karakterê xwe mohra xwe li dîroka me ya Tevgera Azadiya Jinê xist.

Ji bo me dîroka xwe ya Tevgera Azadiya Jinê ji her alî ve naskirin girîng e. Ev tevahî tecrûbe ne. Dibe ku hinek pêvajoyên pir biêş dikevin dewrê, tiştên neyînî ku derdikevin holê hene, lê giştî tecrûbe ne. Tenê pêwîste mirov rast lê meyze bike, encam jê derbixe. Dîsa girînge hêzên ku tu li ser wê moral ava bikî, tu xwe bihêz bikî. Tiştê neyînî be jî, mirov dikare wekî tecrûbe hêz jê ava bike. Yek jî, ev bi xeta berxwedanê, bi xeta azadiya jinê danehevek nirxa ye. Lewma pêwîste her yek ji me li pêşber vê dîrokê bi rexnedan nêzîk bibe. Di pêşerojê de jî em ê bi vê hêzê bikaribin vê têkoşînê bibin serkeftinê. Serok jî dibêje ya, “*hûn di rê de ne*”. Ev tespît ji bo me girîng e, ango ev têkoşîn berdewam dike. Pêwîste em wisa nêzî dîroka xwe bibin.

## *AKADEMIYA JINA AZAD A Ş. ZEYNEP KINACI*

# *JI ALBUMA DEVRE YA "Ş. DEVRİM AMED"*


PAJK - 1999
Ş. DEVRİM AMED




26 03 2017


Fidan doğan
Sakine Cansız
Leyla Şaylemez


03 03 2017


DEWREYA PERWERDÊ YA


13 01 2017


AMED
Fidan doğan
Sakine Cansiz


Ş.Arin mirkan
YPS
Mehmet Tunç






19 02 2017

